ABDULLAH OCALAN

# MANÎFESTOYA CIVAKA DEMOKRATÎK

## Pirtûka Sêyemîn

# CERIBANDINEK LI SER SOSYOLOJIYA AZADIYÊ

Weşanên Mezopotamyayê

**ABDULLAH OCALAN**

**MANÎFESTOYA CIVAKA DEMOKRATÎK**

**Pirtûka Sêyemîn**

**CERIBANDINEK LI SER**

**SOSYOLOJIYA AZADIYÊ**

**Weşanên Mezopotamyayê**

**Werger: Rêşad Sorgul**

**Sererastkirin: Luqman Guldivê**

**Mîzanpaj û Bergê Pirtûkê:**

**Rêvan Mehmûd**

**Weşanxana Şilêr**

**Qamişlo – Adar / 2018**

**weshanashiler@gmail.com**

**weje.vejin@gmail.com**

# NAVEROK


**1- Li Ser Wergerê:** ........ **5**

**2- PÊŞGOTIN** ........ **9**

**3- DESTPÊK** ........ **15**

**4- HIN PIRSGIRÊKÊN RÊBAZÊ** ........ **29**

**5- PIRSGIRÊKA AZADIYÊ** ........ **39**

**6- HÊZA AQLÊ CIVAKÎ** ........ **49**

**7- DERKETINA PIRSGIRÊKA CIVAKÎ** ........ **59**

***A- PÊNASEKIRINA PIRSGIRÊKA CIVAKA DÎROKÎ*** ........ *62*

***B- PIRSGIRÊKÊN CIVAKÎ*** ........ *103*

**1- Pirsgirêka Desthilatdarî û Dewletê** ........ 103

**2- Pirsgirêka Civakê ya Exlaq û Polîtîkayê** ........ 108

**3- Pirsgirêkên Civakê yên Zêhniyetê** ........ 112

**4- Pirsgirêkên Civakê yên Ekonomîk** ........ 117

**5- Pirsgirêka Civakê ya Îndustriyalîzmê** ........ 121

**6- Pirsgirêka Civakê ya Ekolojîk** ........ 126

**7- Pirsgirêka Cinsperestiya Civakî, Malbat, Jin û Şêniyan** ........ 129

**8- Pirsgirêka Civakê ya Bajarbûnê** ........ 134

**9- Pirsgirêka Civakê ya Çîn û Burokrasiyê** ........ 142

**10- Pirsgirêkên Civakê yên Perwerde û Tenduristiyê** ........ 148

**11- Pirsgirêka Civakê ya Mîlîtarîzmê** ........ 152

**12- Pirsgirêka Civakê ya Aştî û Demokrasiyê** ........ 156

**8- FIKIRÎNA LI SÎSTEMA ŞARISTANIYA DEMOKRATÎK** ........ **161**

**A- PÊNASEYA ŞARISTANIYA DEMOKRATÎK** ........ 164

**B- Ji Aliyê Rêbazê Ve Nêzîkbûna Li Şaristaniya Demokratîk**........................................174
**C- Pêşnûmeya Dîroka Şaristaniya Demokratîk**................................................................185
**D- Hêmanên Şaristaniya Demokratîk**..........................................................................210
**9- LI DIJÎ MODERNÎTEYA KAPÎTALÎST MODERNÎTEYA DEMOKRATÎK......... 225**
**A- Jihevkirina Kapîtalîzm û Moderniteyê**......................................................................229
**B- Şaxê Moderniteyê Îndustriyalîzm û Moderniteya Demokratîk**..................................239
**C- Dewleta Netewe, Modernîte û Konfederalîzma Demokratîk**......................................244
**D- Îdeolojiya Cihûtiyê, Kapîtalîzm û Modernîte**...........................................................258
**E- Şaxên Moderniteya Demokratîk**...................................................................................278
**a- Şaxê Wê Civaka Exlaqî û Polîtîk (Civaka Demokratîk)**..............................................284
**b- Şaxê Wê Civaka Ekolojîk Îndustriyel**............................................................................291
**c- Şaxê Wê Civaka Konfederalîst a Demokratîk**...............................................................298
**10- PIRSGIRÊKÊN JINÛVEAVABÛNÊ YÊN MODERNÎTEYA DEMOKRATÎK..... 309**
**A- Pirsgirêka Şaristanî, Modernîte û Krîzê**.........................................................................313
**B- Rewşa Hêzên Dijberê Sîstemê**.........................................................................................328
**a- Mîrateya Sosyalîzma Pêkhatî..........................................................................331**
**b- Ji nû ve Nirxandina Anarşîzmê.......................................................................337**
**c- Femînîzm: Serîrakirina Mêtingeha Herî Kevin.................................................340**
**d- Ekolojî: Serîrakirina Hawîrdorê......................................................................347**
**e- Tevgerên Çandî: Tolhildana Rêûresmê Ji Dewleta Netewe.................................350**
**1- Etnîsîte û Tevgerên Neteweya Demokratîk.....................................................351**
**2- Tevgerên Çandî yên Dînî: Zindîbûna Rêûresma Dînî.........................................355**
**3- Tevgerên Xweseriya Herêmî, Xwecihî û Bajarî.................................................357**
**11- WEZÎFEYÊN JI NÛ VE AVAKIRINA MODERNÎTEYA DEMOKRATÎK .......... 361**
**12- ENCAM........................................................................................................ 415**

## 1- Li Ser Wergerê:

Di çarçoveya wergerê de pirsgirêk an jî xusûsên derdikevin pêşiya min û hêjayî lêkolîn û guftûgokirinê ne, di vê beşa sêyemîn de jî ez ê ji aliyekî din ve pê dakevim û li ser rawestim. Hema hema her pirtûka Rêzdar Ocalan a ez werdigerînim di dawiya her yekê ji wan de li ser hin babetên wergerê dinivîsînim. Çawa ku di beşên bihurî de jî min anîbû ziman, ez zêdetir xwe dispêrim tecrûbeyên xwe û li ser pirsgirêkên wergerê radiwestim. Ji ber ku gelek babetên der barê wergerê de min di beşên din de lêkolane, ez ê wan dubare nekim, dibe ku li vir hin xusûsên kêm mane lêkolim. Di dema wergera vê pirtûkê de zêdetir cihê têgînan di nava ziman û wergerê de bala min kişand. Ji ber ku hevok û ristdanîn weke qordanîna dîwaran bû û têgînan jî weke kevir an jî hîmên bingehîn di vê lêkirinê de cih digirtin. Zimanê ez jê wergerê dikim, zimanekî dewleta netewe ye. Tevî ku bi navê gelê Tirk tê hildan jî gelekî jê qut e, û bi avakirina dewleta netewe re zimanekî di nava heftê heştê salî de gotin li cih be bi darê zorê li hev hat çêkirin û tê çêkirin. Ev zimanê ji gel zêdetir ê dewleta Tirk e, hin taybetmendiyên xwe hene bi beriya xwe û dema avakirina xwe re têkildar in.

Di dema Împaratoriya Osmanî de jî zimanekî împaratoriyê hebû. Zimanê Osmanî zimanê qesrê ye. Zimanekî dîwanî ye. Di asta jor de hatiye pêkanîn. Di navbera xwe û arîstokrasiya gelên din de bi kar tîne. Li kolanê zimanekî bi vî rengî nîne. Bi vî zimanî, xwe ji mirovên li jêr cihê kirine ango serdestiya xwe îlan kirine. Bi vî awayî wexta dipeyivin bi tenê yên weke wan li jor ji wan fêhm dikin û mirovên li jêr ji wan fêhm nakin. Kengî ew tinebûn zimanê wan jî bi wan re ji holê rabû. Lê dîsa jî zimanê dewleta Tirkî li ser vê rêûresmê nexasim jî li ser vê mîrateyê li ber bayên neteweperestiyê rabû. Li vê pêvajoyê înkareke hişk û asîmîlasyoneke dijwar zêde bû. Dewleta Tirk di vê pêvajoyê de bi darê zorê rabû. Koka reng û dengên Mezopotamya û Anatolyayê qeland. Di van gavavêtinên qirkirinê de ji hin hêmanên van çandan vedizî. Ji gotin, biwêj,

folklor û muzîkên herêmê gelek tişt girtin û hewl da kirasê xwe li wan bike. Di vê hovîtiya xwe de tibabekî jî bi ser ket. Belkî jî ji tevkujî û qirkirinên fizîkî zêdetir a dilê mirov diêşîne ev hovîtiya di warê çandî de hatiye kirin e.

Ji ber xisleta wî ya ez behsê dikim, zimanê Tirkî ji zimanên din jî bi hêsanî gotin û têgînan digire û li gorî xwe naverok û reng dide wan. Ev jî dibe sedem zimanekî li gora xwe be. Dîsa ji ber ku nû ye, û xwe li hev çêdike, bi rahuriya derûnî ya pê mirov pêk tê û em nikarin xwe jê bikin, dikeve nava nakokiyê. Ev mijara ez hewl didim bi çend hevokan rave bikim bi serê xwe rê li arîşe û aloziyeke mezin vedike. Ev xusûsên bi xalên sereke destnîşan dikim ji aliyê Saziya Ziman a Tirk ve jî têne qebûlkirin, lê weke taybetmendiyên zimanekî serketî têne destnîşankirin. Bi ya min, ji serketinê wêdetir ev encamên avakirina dewleta netewe ne. Li ser qirkirin û kokqelandina çandan zimanek were avakirin, bi qirkirin û asîmîlasyonê neteweyek were afirandin, encam tevlîhevî ye. Bêguman ev tevlîhevî wê xwe di gelek warên civaknasiyê de nîşan bide. Ev rewş a zimanê em wergerê jê dikin nîşan dide. Li beramberî vî zimanî, zimanekî kevnare û roja me ya îro têra xwe zindî, zimanê Kurdî heye. Zimanê Kurdî ji mêj ve li vê cografyayê çêbûye. Reng û dirûvê xwe ji vê axê girtiye. Li vir ji dayik bûye û di dergûşa vê dayikê de beridî û seridî ye. Ji lewra gotin û têgînên di zimanê Kurdî de zelal û rûniştî ne. Hevoksaziya xwe xweş û qehîm e. Mîna kevirên bedena Amedê rast û şehkirî ne. Bila ev xweşbêjî, ciwanbêjî û rewanbêjiya di vegotina min de şaş neyê fêhmkirin û weke hisên neteweperestiyê neyên nirxandin. Li vir ez hewl didim zimanekî xweş bi kar bînim, lê bi awayekî bingehîn a ez dixwazim balê bikişînim ser ew e, ez dixwazim di navbera du zimanan de hin pirsgirêkan destnîşan bikim. Li vir mijara min têgîn in (term). Têgîn ew gotin û peyv in ku bi demeke dirêj re naveroka xwe dewlemendkirine; ji maneyekê zêdetir gelek maneyan di nava xwe de dihewînin; bi yek peyvê gelek tiştan tînin bîra mirovan. Gotin û têgîn li gorî rewş, cografya û avhewaya xwe çêdibin, distewin. Lewra bi temamî bi peyv û têgînên cografyayeke din a dûr li hev nakin. Li gotinan his, hest û can hatiye barkirin. Gotinên matmayînê, xweşiyê, xemê û henekan îfade dikin hene, li devereke din bi heman awayî nînin. Li ser xet û xalên rûyan cih digirin,

heta di reşikên çavan de pêjna wan tê, ji lewra jî bi çavnêrtina hevdu biryar têne dayîn. Ruh û can xwe bi gewde dike.

Di dema wergerê de têgîn yek ji wan mijaran e ku dibe pirsgirêk. Ji bo em baştir li hev serwext bibin divê ez çend mînakan bidim. Di Tirkî de têgîneke welê peyda bû 'toplumsal artik' wexta ku hûn vê têgînê rasterast wergerînin maneya wê bermahiya civakî yan jî ya ji civakê zêde bûyî îfade dike. Lê ya rastî ev di jiyana kurdewarî de zêde maneyeke xwe nîne. Min ji vê re 'mayeya civakî' got. Çima? Ji ber ku li cem Kurdan ji wê re ku di destê wan de dimîne ango wê pê debara xwe bikin 'maye' tê gotin. Eger bi vê mayeyê kar bikin û karê bi dest bixin ev 'ser-mayeyê' pêk tîne. Bala xwe bidinê ev di heman demê de awayek ji awayên sermayedariyê jî îfade dike. Ev awa xas bi civaka kurdewarî ye.

Mînakeke din; 'yogunlaşma' ango mitalekirin. Em ji vê têgîna Tirkî re 'ponijandin' jî dibêjin. Lê ya rastî, tevî ku di nava ponijandinê de maneya 'yogunlaşmayê' heye jî jê wêdetir û bêhtir jî heye. Ponijandin çi ye. Mirovek destê wî li ber rûyê wî hûrûkûr difikire heye, mirov ê di vê tabloyê de xwedî derd e, êşek wî heye, meraq û kakûniyek wî heye. Bala xwe bidinê naveroka wê berfireh e, û li gorî civaka xwe reng girtiye. Bêguman li gorî cihê gotinê di nava hevokê de maneya têgînan diguhere ew di zimanên din de jî bi heman rengî ye. Lewma em vê mijarê guftûgo nakin.

Di gotin û têgînan de mirov carnan dikeve bin bandora zimanê jê wergerê dike. Di vê wergera min de jî bawer dikim ev yek heye û ez lê hayil nebûme. Redektorê pirtûkê hin ji wan peyda kirin û nîşan min dan, belkî li yên mayî jî hûn ê xwendevanê hayil bibin. Mînak, di tirkî de gotina 'cephe' heye. Ev hê jî ji aliyê gelek kesan ve weke 'enî' tê tercumekirin. Ya rastî, 'enî' di tirkî de 'alin' e. Gotina em behsa wê dikin hem di zaravayê kurmancî de hem jî di zaravayê soranî de weke 'bere' heye û di nava gel de jî tê bi karanîn. Lê paşê min pirsî, li hin deverên Kurdistanê jî enî bi menaye berê tê bikaranîn.

Mînakên em bidin gelek in. Di wergerê de jî hûn ê karibin bi xwe wan bibînin. Belkî hinek bi serê we nekevin û hûn bibêjin ev çi ye. Heye ku di hin

waran de hûn mafdar jî bin. Ji ber ku yên bi kurdî li mijaran temaşe bikin di hişê wan de bûyer ê bi têgînên xwerû yên kurdî bi resim bibin. Di vê nuqteyê de pirsgirêkeke têgînên kurdî jî bi awayekî xwezayî derdikeve pêşiya me. Dem û dewran diguherin çawa ku mirov jî diguherin. Lewma divê kurdistanî jî têgînên xwe li gorî demê karibin bi kar bînin û naverokên wan li ser reseniya wan bi maneyên îro jî bigirin nava wan di cih de bixebitînin.

Di nava ziman de têgîn di warê pêşketina fikrê de bi roleke girîng radibin. Lê weke gelek tiştan, têgîn jî rast û di cih de bêne bikaranîn, wê ev yek deriyên nû li mejî veke. Rast e, di navbera ziman û fikrê de têkiliyeke xurt heye. Di vê de jî rola têgînan mezin e. Ji lewra divê em xwedî li têgînên xwe derkevin.

**Rêşad Sorgul**

## 2- PÊŞGOTIN

Dadgeha Mafê Mirovan a Ewrûpayê DMME'yê der barê min de 'biryara ji nû ve dadgehkirinê' da. Ji lewra ez hewl didim der barê vê pêvajoyê de parêznameya xwe ya bingehîn amade bikim. Ev sêyemîn beşa mezin a vê parêznameyê dewama du beşên berî vê ne, û temamkera wan e. Bi herdu beşên destpêkê armanca min ew bû ez bi giştî têgîna desthilatdarî û moderniteya kapîtalîst zelal bikim. Min têgîna desthilatdariyê weke 'amûrên zorê' yên li ser keda mirov xwe datînin, û bi xwe ji bo derfet û îmkanên berhem û nirxê zêde vedizin hatine avakirin, pênase kiribû. Amûrên desthilatdariyê yên pirrcure û berfireh hatine avakirin, di tehlîla dawî de weke nîzamên zordestiyê yên xwe li ser keda mirov ava kirine, hatine pênasekirin. Serdema modernîteyê ya weke 'sîstema kapîtalîst' bûye têgîn civak bi şêweyê herî pêşketî yê van mekanîzmeyan re rûbirû hiştiye. Sîstema kapîtalîst a di şert û mercên îro de weke globalbûnê jî tê binavkirin di nava modela me de ku em dixwazin pêşde bibin qonaxeke xweser a 'sîstema demokrasiyê yan jî desthilatdariya dinyayê ya giştî' pêk tîne.

Dadgeha Mafê Mirovan a Ewrûpayê bi wesfê xwe yê sazîbûnê weke meqamekî di ser netewan re bi tenê mafê serlêdanê weke ferd dide welatiyan. Di vê rewşê de mirov dikare bipirse ka çi têkilî di navbera vê saziyê û parêznameyeke bi vî rengî ya kesê bi navê Abdullah Ocalan pêşkêşkirî de heye. Têkilî heye hem jî bi awayekî gelekî balkêş heye. Ji vê jî girîngtir, sîstema şaristaniyê ya navendbûna Ewrûpayê esas digire heta neyê analîzkirin, sîstema huqûq, siyaset û îdeolojiyê ya weke 'hêza nerm' a Ewrûpayê tê binavkirin ji hev nayê derxistin; kengî sîstema şaristaniya navend Ewrûpa were analîzkirin, mirov ê karibe bi awayekî hosteyane vê 'hêza nerm' şîrove bike. Di heman demê de divê timî li ber çavan were girtin ku sîstema şaristaniya Ewrûpayê ji tevahî demûdewran û rojgarên dinyayê bi awayekî nû bi tesîrtir dibe 'sîstemeke şaristaniya dinyayê.' Ev

şaristanî, yek ji hêmanên wê yê bingehîn ew e, xwedî wê xisletê ye, dikare welatîbûna ferdî pêk bîne. Di ti dema dîrokê de ferd, ferdparêzî û welatîbûn evçend di nava civakê de bi mane nebûbû. Em bi rastiya serdemeke (modernîteya kapîtalîst) welê re rûbirû ne ku civak di nava ferd û ferd jî di nava 'civaka sembolîk' de di asta herî jor de hatine helandin.

Nasnameya min jî weke welatiyê KT'yê (Komara Tirkiyê) hatiye çêkirin û avakirin. Bi 'gumankariya xwe ya mezin' min ji vê nasnameyê şik bir û bi vê re ketim pêvajoyekê ku rizgarbûna jê gelekî zehmet (lê ne bêîmkan) e. Ya rastî, gumankariya min a mezin ez bi dadgehkirina herî giran a dîrokê û sîstema wê ya cezakirinê re anîm beramberî hev û ev rastiyek e ku nabe were înkarkirin. Ev rastî jî ya serdemê ye ku behsa wê dikim. KT'yê Peymana Mafê Mirovan a Ewrûpayê îmze kiriye, lê tevî vê yekê biryara 'jinûvedadgehkirinê' ya Dadgeha Mafê Mirovan a Ewrûpayê qebûl nekir û Konseya Ewrûpayê jî guh da wê û li ser vê yekê dosya li DMME'yê vegerand. Ev bi temamî sosret û binpêkirineke huqûqî bû. Dema ku biryar li DMME'yê hat vegerandin, gelek welatên piçûk li xwe mikur hatin ku bi zora DYE'yê helwesteke bi vî rengî nîşan dane. Bi vî awayî binpêkirineke bi tezên 'hêza nerm' re nakok eşkere li naverastê bû. Ji lewra bi temamî duwanzdeh sal in ku ez xistim rewşa 'kesê nikare dadgeh bibe'. Ez li Girtîxaneya Îmralî ya Bûrsayê ku zindaneke hucreyî ya yek kesî ye, (girtîxaneyeke giravê ya li Derya Marmarayê ye. Girtiyên navdar û cezayên wan giran bi awayekî rêûresmê li vir ji mirinê re diterikandin) hê jî rewşa xwe ya weke kesekî 'nikare adil dadgeh bibe' dewam dikim.

Pêvajoya bi gavavêtina min a Ewrûpayê destpê kir û heta bi Îmraliyê dewam kir, bi hevkariya DYE-YE'yê pêk hat. Min weke şexs ti carî ji vê guman nekir. Di vê de rola dan KT'ê jî gardiyantî bû. Min ji vê jî ti carî guman nekir. Tevî ku rastiya eşkere ev bû, çima rêyên evçend bi çiv û fitlok têne ceribandin? Dibe ku hinek vî hukmê min giran bibînin. Eger ez bi tenê bûyerekê bi bîr bixim, bawer dikim ku ez ê karibim têra xwe îqna bikim. Di 2'ê Sibata 1999'an de bi fermana taybet a NATO'yê balafirgehên Ewrûpayê hemû li balafira ez têde bûm, hatin girtin. Rojnameyên wê demê jî têra xwe

ji vê re cih veqetandibûn. Jixwe revandina min a ji Kenyayê û li wir di bin kontroleke ji rêzê de ragirtin û radestkirina min a Tirkiyê ji aliyê nûnerê Serokê DYE'yê Bill Clinton, General Galtierî ve bi awayekî fermî hat îlankirin. Ev bi xwe jî rewşê têra xwe rave dike. Jixwe xiyanetên dûrî aqilan ên miqamên Yewnanistanê ji wan xusûsên eşkere ne ku hewce nake ez qala wan bikim. Nexasim jî di serî de wezîfedarên Wezareta Karê Derve, Îstîxbarata Neteweyî û Sefaretê, fermandarê eskerî Kalenderîdîs û Serokwezîr Simitis bi xwe.

Madem di çarçoveya huqûqa ferdî de heqê min heye ez ji huqûqa Ewrûpayê sûdê werbigirim; wê demê çima serî li van rê û rêbazên bi hîle, tarî û bi dizî dan? Di nava vê dekûdolabê de bazarên bi çi awayî hebûn? Kî di berdêla çi de xistin bazarê? Di dîroka desthilatdariyê ya Ewrûpa û DYE'yê de ji şerên mêtinkariyê yên xeternak heta bi şewitandina pîresêhran, ji şerên mezheban heta bi şerên neteweyan, ji pevçûnên çînî heta bi pêvajoyên têkoşînên îdeolojîk di nava tabloyên herî bi xwîn ên dîrokê de serhatiya min belkî jî mîna dilopeke di nava okyanûsê de be, lê dîsa jî girîng e, û divê bê eşkerekirin.

Ez divê berê pêşî diyar bikim ku ez, têgihiştina ferd ji nasnameya wî ya civakî dişo, red dikim. Mafê 'serlêdana ferdî' yê bi israr tê ferzkirin ti carî xwedî wê maneya tê gotin nîne. Ji ber ku tesewirkirina ferdê ji nasnameya xwe ya civakî hatiye şuştin û muceredkirin, dereweke fermî ya epîstemolojiya navend Ewrûpayayê ye ku xwe gelekî 'ehlê zanistê' dihesibîne. Ev tev li aliyekî, jixwe yên di guhê gê de jî bihîstine, û pê hesiyane, ez li ser navê Kurdan ku di rewşa gelê herî trajîk ê dinyayê de ye, têm dadgehkirin.

Ev rastiyên min pirr bi kurtî anîn ziman jî der barê naveroka doza min de fikreke têr didin. Eşkere ye ku wê nikaribin min bixin rewşa kesê kujerê wî nediyar. Hêza sîstema şaristaniya navendî (di pêşengiya desthilatdariya hegemonîk a DYE û YE'yê de) çi dibe bila bibe, di binê doz, girtin û dadgehkirina min de bi awayekî nabe were redkirin, bi tevahî hêzên sîstemî bi roleke çalak radibin û ev yek rastiyek e ku înkara wê nabe. Jixwe di vê pêvajoyê de li dijî vê dekûdolaba mezin gelê min bi tevahî misêwa

rabû ser piyan. Protesto kir, bi sedan şehîd dan, bi hezaran jê jî hatin girtin. Gelê min pirr baş li têkiliya di navbera doza min û trajediya xwe ya dîrokî de serwext bû û fêhmkir ku bi xwedîderketina li vê dozê wê karibe vê trajediyê xira bike û pê re rizgar bibe. Wezîfeya bi şeref a eşkerekirina vê rastiyê jî ji min re ma, ango bû para min.

Di tevahiya dîroka sîstema şaristaniya navendî ya herî kêm pênc hezar salî de belkî jî gelê me li mêtinkarî û zilma herî mezin rast hat. Ev rastiya gelê me şêweyê civakî yê nasnameya min diyar kiriye. Ez heta ji hemû aliyan ve vê nasnameyê ji hev dernexim, eşkere ye ku ez ê nikaribim mijara doza xwe rohnî bikim. Ez ê di vê çarçoveyê de bi parêznameya xwe dakevim û krîterên vê yekê yên bêyî wan nabe di van rastiyan de veşartî ne. Ez gotineke xwe ya gelek caran dubare dikim divê dîsa bînim ziman: "Kêliyên welê hene, dîrok di şexsekî de, şexsiyet jî di dîrokekê de veşartî ye." Pirr bi êş û jan be jî kes nikare înkar bike ku rûmeta vê şexsiyetê qismî parve dikim. Cudahiya min di vir de ye; ez ji bûyîna 'qurbanê çarenûsê' yê vê dîroka trajîk wêdetir, ji ber ku dixwazim têde rol bigirim, ez pirr baş dizanim ku ev dekûdolab li serê min têne gerandin. Ji ber vê yekê, min slogana vê doza xwe weke **"Azadî wê Biserkeve"** destnîşan kir.

Di dekûdolabên trajîk de timî encama çarenûsî xwe dubare dike. Xirakirina vê çarenûsê bi awayekî ku bi kêra azadiyê bê, wê bihêle ku mirov karibe xwe li her êş û janê ragire. Doza min û hevalên min ên dozê, em vê carê di nava lîstikekê de ne ku navê wê rastî bi xwe ye, lê vê carê di vê lîstikê de ya para çarenûsê bikeve têkçûn e.

Ji ber van sedeman, bawer dikim ku tê fêhmkirin ka çima min navê **Sosyolojiya Azadiyê** li vê beşa parêznameya xwe kiriye. Her gaveke ji bo azadiyê bê avêtin, bi tenê dikare ceribandinek be. Ji lewra **Ceribandinek Li Ser Sosyolojiya Azadiyê** binavkirineke di cih de ye.

Bêguman şaristaniya Ewrûpayê ya navenda hegemonîk e, aliyekî madalyonê temsîl dike. Ev şaristanî zêdetir amûrên desthilatdariyê yên li ser nirx û berhemên zêde avabûne, îfade dike. Aliyê din jî rûyê demokratîk ê şaristaniyê ye. Fikrên bingehê vê parêznameyê pêk tînin, mîrateya şaristaniya demokratîk dikin bingehê xwe. Ji Sokrates heta bi doza min,

bêhejmar têkoşînên fikir û exlaq, şerên komin û gelan hene. Ez ji can û dil, bi xwestekeke mezin bi mîrateya wan ve girêdayî me. Ya ez dikarim bikim ew e, mîna dilopek li deryayê li vê mîrateyê zêde bikim. Beşa sereke ya çavkaniya min ev abîdeyên mirovatiyê pêk tînin. Di bingehê wan de helwestên demokratîk û hozantiya ji rêûresma Rojhilat a pênc hezar salî cih digirin û ew zemînê wan ê dîrokî ye. Mirov li vî zemînî nefikire, nikare dîroka mirovatiyê ya gerdûnî binivîsîne û nikare bi awayekî manedar roja me ya îro binirxîne.

Fikra sereke ya parêznameya min ew e, ji bo meşa civakî û dîrokî di sîstema şaristaniya demokratîk de bi awayekî azad bimeşe, jiyana çavkaniya xwe hîmên rast in, ji aliyê ferdan ve hê baş û xweş pêk bê.

Di mijara teknîka nivîsê de jî divê ez hin xusûsan diyar bikim. Ev yek ê bihêle ku hin rewş bêne fêhmkirin û efûkirin. Di şert û mercên hucreyê de bi tenê destûrê didin ku di destê te de pirtûkek, kovarek û rojnameyek hebe. Derfet û îmkanên min nebûn, ez ji çavkaniyekê pasajan û notan bigirim. Ji lewra her xusûsa min girîng dît, weke rêbaz min di bîra xwe de girt û min dawerivand kesayeta xwe. Min bi awayekî kolewarî xwe li her qedexeyê ranegirt. Min bîr û hifza xwe ya kewara agahî-zanîna gerdûnê ye, herçû zelal kir û fikrên giringiya xwe ya diyarker hene, kirin sereke. Bi vî awayî min bersiva qedexeyan da.

Lê kêmasî û qelsiya herî mezin a vê rêbazê ew e, ji ber ku jibîrkirin heye, seqet e. Ji ber vê sedemê, notnegirtinê bi roleke asteng û kelem a diyarker rabû. Dema min xwe amade dikir vî beşî binivîsînim pênûs jî li min qedexe kirin. Lê di roja dehan a cezayê hucreyê de ev qedexe rabû û çawa ev qedexe rabû, min yekser dest bi nivîsê kir. Ji ber ku her diçû dereng diket, û min soza xwe ya dayî nikarîbû pêk bianiya. Bersiva min dayî qedexeya li ser pênûsê ew bû, ez hê zêdetir, hûrûkûr li pêşnûmeya sereke ya parêznameyê ponijîm.

Ji vî beşî bi şûn ve du beşên din ên parêznameya min wê hebin. Di wan herdu beşan de ez ê fikrên xwe yên sereke nîşan bidim ka çawa dikarin bi awayekî berbiçav bi cih têne anîn. Ez beşên behsa wan dikim yekê jê weke **‘Li Rojhilata Navîn Krîza Şaristaniyê û Çareseriya Şaristaniya**

**Demokratîk**’ û ya din jî weke ‘**Parastina Kurdên Di Nava Pencê Qirkirina Çandî de**’ tesewir dikim. Ji bo van herdu beşan jî pêşamadekariyeke min heye. Her entelektuelê ku pêşamadekariyeke wê ya diyar heye wê karibe van beşan binivîse, bi herhalî ji bo ku ez wan binivîsînim wê demeke dirêjtir hewce bike. Lê Rojhilata Navîn a dikele û li Kurdistana vediguhere dilê wê, li ber rohniya analîzên civaka dîrokî guftûgokirina rewşa îro têra xwe mirov bi heyecan û berpirsiyar dike. Mîna ku ya rabihurî-aniha-paşeroj e, girêkeke kor a nû ya Gordîonê pêk tîne û mirov vê kêliyê bi derbeke antî-Skender (Ew hêz e ku mîna Skender lê dide, lê aliyê xwe yê fizîkî kêm e, lê wexta hewce bike bi kar tîne, aliyê xwe yê maneyê diyarker e) çareser bike, ev yek dibe wezîfeya herî sereke û herî pîroz.

## 3- DESTPÊK

Avahiya agahî-zanînê ya sîstema dinya kapîtalîst, herî kêm bi qasî amûrên danehev-hilberîn û desthilatdariyê di nav krîzê de ye. Ji ber ku xwezaya avahiya zanîn-agahiyê derfetê dide guftûgoya azad, li ser hêmanên krîza zanistî îmkana şîroveyeke berfireh pêşkêş dike. Rola agahî-zanîna di nava civak û desthilatdariyê de bi qasî ku bi ti demê re qiyas nebe, dikare xwe bigihîne asteke maneyê. Amûrên agahî û înformatîkê yên jiyana civakî şoreşeke dîrokî pêk tînin. Pêvajoyên şoreşî weke buhranê bi xwe, bi rola gera li rejîmên heqîqetê radibin. Hegemoniya bi tenê li qadên danehev, hilberîn û desthilatdariyê bi cih nabe; di qada zanîn-agahiyê de jî em li têkoşîneke dijwar a hegemonîk şahidiyê dikin. Di qada zanîn-agahiyê de ti avahiya hilberîn-danehev-desthilatdariyê heke xwe rewa nekiribe, demeke dirêj nikare hebûna xwe mayînde bike.

Zanistên pozîtîv ên heta dema nêz hukimraniya xwe dewam dikirin, çawa ku têne nîşandan xwedî perspektîfa antî-metafizîk û antî-dîn nînin, herî kêm bi qasî têgînên metafizîk û dîn xwedî asteke metafizîk û dînî ne, ev rastî eşkere bûye û tê guftûgokirin. Serketina zanistên xwezayê yên dikin malê civaka Yewnan a Klasîk û dema Rohnîbûnê ya Ewrûpayê, di himbêza zanistên xwezayê bi xwe de derbên herî girîng dixwe. Têgihiştina misêwa rast-pêşde diçe, aliyê herî qels û lawaz ê van zanistên pozîtîv e. Lewma mirov nikarin armanc û avahiyeke bi vî rengî ya gerdûnê tespît bikin. Çi dinya jêr-atoman, çi gerdûna kozmolojîk, nikarin ji dualîteya çavdêrî û ya çav lê tê gerandin, rizgar bibin. Lewma serwextbûna mirov jî di çarçoveya vê pêvajoyê de ye. Nikare pêş bibîne ka wê çawa bi rola li derveyî çarçoveyê, rabe. Hewcedariya potansiyela bê sînor a cudabûnê bi xwe, bi şîroveyên nû heye.

Sosyolojiya ku pêkhatineke wê ya agahiyê ya navend Ewrûpa heye, mîna hewesdarên zanista pozîtîv di fizîk, kîmya û biyolojiyê de dikin, ew jî civakê diyardeyeke bi heman rengî dihesibîne, bi heman nêzîkbûnan hewl

dide wê rave bike û ji vê îddîayê wêdetir jî naçe. Civaka mirov xwediyê xwezayeke gelekî cuda ye. Çawa diwêrin wê weke ojbeyekê bibînin û li ser rawestin. Nêzîkatiyeke bi vî rengî berevajî yeqînan wê rê ne li ber rohnîbûnê, wê rê li pûtbûneke çor veke û jixwe ya bûyî jî ev e. Gavavêtinên di warê felsefeyê yên îdeologên Elman ku ji bo avahiya agahî-zanînê ya dewleta xwe ya netewe dikin, zanista polîtîka ekonomiyê ya îdeologên Ingilîz û sosyolojiya fîlozofên Fransî her yek ji wan amûrekî rewakirinê yê mekanîzmeyên danehevê yên sermayeyê û desthilatdariyê ne. Guftûgoyên zanistî yên roja me ya îro vê rastiyê têra xwe eşkere dikin. Li gorî analîza dawî, felsefeya Elman, polîtîka ekonomiya Ingilîz û sosyolojiya Fransî ji milliyetperestiya dewleta netewe re ya ku mezin dibe, xizmet kirine û nikarîne bi rengekî din tevbigerin. Ev sosyolojiyên bi tevahî navend Ewrûpa ne, em bi hêsanî dikarin bibêjin avahiyên zanîn-agahiyê yên sîstema dinya kapîtalîst ên navend Ewrûpa ne.

Lê gotin û destnîşankirina van rastiyan pirsgirêkê çareser nake. Marks û Engels weke fikra dijber derketin, lê têra xwe eşkere bûye ku sosyalîzma wan an jî sosyolojiya wan şîroveyeke herî seresere û çor (vulger) a civakê ye. Tevî hemû îddîayên wan ên dijber, ji lîberalîzmê –îdeolojiya fermî ya kapîtalîzmê ye –zêdetir xizmeta kapîtalîzmê kirin û ev bû aqûbeta wan. Em vê yekê bi sosyalîzma pêkhatî, bi ekol û tevgerên demokrasiya sosyal û rizgariya neteweyî, sîstemên dewletan têra xwe dikarin fêhm bikin. Tevî rêûresma wan a têkoşînê ya gelekî esîl, hem jî li ser navê netewe û çînên bindest ketina wan a vê rewşê, ji nêz ve bi avahiyên wan ên zanîn-agahiyê ve têkildar e. Avahiyên agahî-zanînê yên xwe sipartinê, tevî aliyên wan ên erênî û neyênî, bi tevahî dijberî xwestekan encam dane. Eger di avahî û paradîgmayên wan ên bingehîn de qusûrên ciddî û şaşiyên zincîrwarî nebûna, encamên bi vî rengî wê bi hêsanî derneketana holê.

Ekoleke din a dijber teoriya wan a îzafiyeta zêde ye. Ne tenê bûn avahiya agahî-zanînê ya sîstema dinya kapîtalîst, belkî jî ji ber ferdperestiya xwe ya zêde, em dikarin bêjin, wan ji kapîtalîzmê zêdetir ji ferdparerestiya wê re xizmet kir. Nêzîkatiyên anarşîst jî di nava vê de cih digirin. Rexnekirina kapîtalîzmê û di gotinê de gelekî dijbertiya wê, weke

ku gelek caran tê dîtin mirov dixe rêya xizmetkariya wê. Di vê de jî bi awayekî bingehîn nêrtina paradîgmatîk, şaşî û kêmasiyên di avahiyên agahî-zanînê de bandorê dikin û rê li vê yekê vedikin.

Ne zanistên fizikê bi qasî ku tê gotin bi xwezaya fizikî re (kîmya û biyolojî jî di navê de ye) girêdayî ne, ne jî zanistên ji wan re beşerî tê gotin yên weke wêje, dîrok, felsefe, polîtîka ekonomiyê û sosyolojî bi tenê bi xwezaya civakê re têkildar in. Herdu zanist dikarin di têgîna zanista civakî de bigihîjin hev û mirov dikare vê erênî bibîne. Ji ber ku her zanist divê civakî be.

Li ser danasîn û pênaseya zanista civakî lihevkirin pirsgirêkê çareser nake. Ya ji vê jî girîngtir ew e, ka çi wê weke modela bingehîn were girtin, bi gotineke din di analîzkirina civakê de kîjan komik, yeke an jî şane wê esas bê dîtin. Eger mirov bibêje “Yekeya bingehîn bi tevahî xwezaya civakî ye”, ev yek ji bo zanista civakî zêde maneyekê îfade nake. Ji nava bêhejmar têkiliyên civakî yên girîng neqandin ji bo nêzîkatiyeke manedar a teorîk tercîha pêşî ye ku divê were kirin. Ew yekeya civakî ya were hilbijartin çiqasî giştiyê rave bike ewqasî wê manedar bibe.

Modelên cûrbicûr ên ji bo qada civakî hatine pêşdebirin têne zanîn. Ji van yekeya herî zêde tê zanîn û tê bikaranîn bi giştî dewlet, bi taybetî jî dewleta netewe ye. Nêzîkatiyên vê yekeyê esas digirin, para bêhtir xwe disipêrin perspektîfa çîna navîn a bûrjûwayê. Dîrok û civak li dora avakirina dewletan, hilweşîna wan û pirsgirêkên wan ên parçebûnê têne lêkolîn. Di rastiya civaka dîrokî de ev meyla yek ji modelên herî seresere ye, ji têgihiştina perwerdeyê ya fermî ya dewletan wêdetir bi ti rolê ranabe. Armanca wê ya bingehîn ew e, dixwaze bi rola îdeolojiya rewakirinê ya dewletê rabe. Ji rohnîkirinê zêdetir, ji veşartin û sergirtina pirsgirêkên tevlîhev ên dîrok û civakê re xizmetê dike. Ev nêzîkatî di pozîsyona herî bêrûmet a sosyolojîk de ye.

Nêzîkatiya Marksîst a çîn û ekonomî weke yekeya bingehîn bijart, li dijî yekeya dewletê xwest xwe weke modela alternatîf formule bike. Çîna karker û ekonomiya kapîtalîst weke modela lêkolînê ya civakî hatin hilbijartin. Vê nêzîkatiyê herçiqasî hişt ku dîrok û civak ji aliyê pêkhatin û

girîngiya ekonomî û çînî ve bêne ravekirin jî bi xwe re qusûrên girîng anîne. Ji ber ku vê nêzîkatiyê dewlet û saziyên din ên avahiya jor berhemên avahiya jêr hesibandin û bandorên wê yên besît nirxandin, kir ku rewşê daxîne ekonomîzmê. Reduksiyonîstiya ekonomîk jî mîna reduksiyonîstiya dewletê ya xwedî têkiliyên gelekî tevlîhev ên yekpare, ser rastiyên civaka dîrokî girtin û jê nehat ku nekeve vê rewşa biqusûr. Nexasim ji ber qelsbûna analîza desthilatdarî û dewletê, çînên kedkar û gelên bindest ên îddîa dikir ku bi navê wan radibe, ji aliyê îdeolojîk û polîtîk ve têra xwe gurçûpêç nebûn. Bi têkoşîneke teng a ekonomîk û bi têgihiştina hilweşandin û avakirina desthilatdarî û dewleta bi şêweyê komplogeriya dewleta firsendperest, ji kapîtalîzmê re ji îdeolojiya wê ya herî xas lîberalîzmê zêdetir xizmet kir. Rastiya Çîn û Rûsyayê vê xusûsê pirr baş rohnî û zelal dikin.

Têgihiştin hene, dîrok û civakê weke hêza desthilatdarî û erka wê şîrove dikin. Mirov pirrî caran li van têgihiştinan rast tê. Lê ev nêzîkatî jî bi qasî hilbijartina modela dewletê bi qusûr in. Herçiqasî desthilatdarî yekeyeke berfirehtir a lêkolînê be jî bi serê xwe nikare xwezaya civakî rave bike. Desthilatdariya civakî mijareke girîng a lêkolînê ye, û gelek aliyên xwe yên raveker hene. Lê reduksiyonîstiya desthilatdariyê çawa ku di her cure têgihiştinên reduksiyonîst de tê dîtin, qusûrên xwe hene.

Cureyekî din ê nêzîkatiyê ku timî derdikeve pêşiya me ew e, civakê ji rêzikan mehrûm, weke bûyerên tekane yên têkiliyan ên bêserûbinî lêdikole. Mirov vê nêzîkatiyê hema hema dikare weke modeleke nêzîkatiya wêjeyî ya tesewirî destnîşan bike û ev nêzîkatiyên zêde îzafî ne, bi tenê dikarin mirov li nava daristanên civakî bidin wendakirin. Modelên nêzîkatiyên zêde gerdûnî yên berevajî xuya dikin lê bi heman rolê radibin jî hewl didin bi çend qanûnan civakê bi tenê bi fizîkeke sivik pênase bikin. Li hemberî pirrcuretî û pirrengîniya dewlemend a civakê, wer xuya ye ku nêzîkatiya ji çavtarîkirin û korkirinê re herî zêde xizmetê dike ev nêzîkatî ye. Têgihiştina civaka pozîtîvîst a weke modela herî çor û seresere ya hem zêde îzafiyetê, hem jî zêde gerdûnîgiriyê di hinavê xwe de dihewîne, hêjayî bi bîr xistinê ye.

Lîberalîzm weke îdeolojiya fermî ya çîna navîn bûrjûwayê, ji van modelan tevan dineqîne û bi awayekî biserhevvekirî xwe pêşkêş dike. Bi vî awayî bi şêweyê xuya dike, mîna her aliyê rast ê her modelê di nava xwe de dihewîne, xwe sîstematîze dike. Bi xwe, aliyên herî bi qusûr ên tevahiya modelan bi hin rastiyan re têkel dike û bi vî awayî şêweyê herî bi tehlûke yê bi serhevvekirî weke modeleke timî ya lêkolînê pêşkêşî civakê dike. Weke têgihiştina fermî bîra kolektîf a civakê dike mêtingeh û dagir dike. Bi vî awayî hegemoniya xwe ya îdeolojîk misoger dike.

Navê parêznameya min a pêşî **'Ji Dewleta Rahib a Sumer Ber Bi Şaristaniya Demokratîk ve'** bû. Di vê xebatê de min nekarî xebata xwe bikim xebateke modelê. Ya rastî, hê haya min ji vê nebû, ez neçar mam pêşkêş bikim. Parêznameya min a ez behsa wê dikim pirr bi lez min amade kiribû û îmkana min a lêkolînê jî çênebûbû. Ez bi îddîaya amadekirina modelekê ranebûbûm. Bi awayekî ji dilê min hat, min rastiyên civakî anîbûn ziman. Paşê di serî de Murray Bookchin, Immanuel Wallerstein û Fernand Braudel, firsenda min çêbû ku ez karibim nêzîkatiya hin civaknasên girîng ji modelê re lêbikolim. Herweha ez li Nietzsche, Michel Foucault û hin fîlozofên din jî bi aweyekî cewherî serwext dibûm. Ji nava van ê herî girîng Andre Gunder Frank bû. Fikrên gelek fikirdaran di berhema xwe ya bi navê **Sîstema Dinyayê** de tomar û pêşkêşkiribûn. Ez pirr dereng nemam, min berhevkarî û dariştina vî fikirdarê navê wî jî nebihîstibû weke parêzvanê herî bi îddîa yê parêznameya xwe nirxand. Di dema dawî de gelek fikirdar di lêkolînên xwe de nêzîkatiyên bi heman rengî nîşan didin û vê yekê hişt ku ez di xebata xwe ya li ser modelê de bêtir biponijim.

Jixwe çi analîza I. Wallerstein a li ser sîstema dinyayê ya kapîtalîst, çi jî analîzên Fernand Braudel ên li ser 'dema dîrokî' yên yekpare rahiştiyê, parêznameya min bi xwe serê meseleyên girîng ên analîzên wan di nava xwe de dihewîne. Min demeke dirêj hewl dida têkçûna sosyalîzma pêkhatî bi nêzîkatiyên bi heman rengî rave bikim û van analîzên behsa wan dikim alîkariya min kirin. Wekî din, di warê serwextbûna li şîroveyên Nietzsche û Michel Foucault ên li ser desthilatdarî û modernîteyê de min hîç zehmetî

nekişand û min xwe gelekî nêzî meylên wan ên bingehîn dît. Nabe ku ez navê Gordon Childe li vir hil nedim. Di encama xebatên xwe yên arkeolojîk de berhemek bi navê **'Di Dîrokê De Çi Qewimî'** nivîsandî ye. Berhema wî mejiyê mirov têra xwe rohnî dike. Min rahişt hê gelek xebatên fîlozofîk bi rengê raporan û li ser wan sekinîm, û bêyî ku îddîaya 'yekeya modela' xwe bikim, ez neçar mam biryarekê bidim. Ez rêbaza analîzê ya pêşdebirî ya vê parêznameya xwe ya mezin, eger mîna modelekê pêşkêş bikim, divê şaş neyê fêhmkirin. Tevahiya pirsgirêka min ew bû ku min di warê yekeya analîzeke civakî-dîrokî ya yekpare û diyarker de tercîha xwe bikira. Bi tevahî modelên heyî, çawa ku min behsa wan kir, herçiqasî gelek aliyên wan ên rast hebûn jî şaşî û qusûrên wan ên mirov nikarîbû li ber çavan bigire jî hebûn. Min di hemûyan de jî gelek kêmasiyên hevpar tespît dikirin. Modela ez herî zêde nêzî wê dibûm a Andre Gunder Frank a bi navê **'Sîstema Dinyayê'** bû, lê di nava wê de jî gelek kêmasî û qusûrên ciddî hebûn.

Eşkere bû ku civaka Sumeran a me sîstema dinyayê disipart wê ew civak bû ku daneheva pêşî ya sermayeyê pêkaniye. Ji civaka Sumeran heta roja me ya îro hatina şaristaniyê weke çemekî sereke û weke daneheveke kumulatîf dîtina wê, gelekî nêzîkatiyeke rast dibînim. Ez pê re me ku danehev xwedî domdariyeke dîrokî ya bi şêweyê hegemoniya-reqabet, navend-dewrûber û bilindbûn-daketinê ye. Danehev li ser sêlingên distanî pêk dihat. Ew jî aliyên ekonomîk, polîtîk û îdeolojîk-exlaqî bûn. Ji lewra jî ev hêmanên bingehîn ên danehevê dihatin fêhmkirin. Ji şêwazê hilberînê zêdetir şêwazên danehevê girîng bûn, ji lewra jî di vê çarçoveyê de ji derbasbûna şêwazê hilberînê yê hegemonîk girîngtir encam derxistin holê. Frank analîza I. Wallerstein a li ser sîstema dinya kapîtalîst a navend Ewrûpayê rexne dike, çima wê weke sîstemeke bi tenê ya li nava dinyayê pêk tê pêşkêş dike. Bi ya min ev rexne di cih de bû. Ji ber ku ev nêzîkatiya şaristaniya Ewrûpayê weke îstîsna pêşkêş dike, nêzîkatiyeke zêde mezinkirî û nepixandî ye. Belkî jî mirov dikarîbû wê weke şaristaniyeke li seriyê din marjînal jî bihesibanda. Wekî din şêweyên bingehîn ên civakî bi têgînên weke sosyalîzm, kapîtalîzm, koledarî û feodalîzmê mîna rastiyên

îdeolojîk dîtin, nêzîkatiyeke zêdetir nêzî rastiyê bû. Fikreke din hebû ku ev têgîn ji ravekirina rastiya civakî wêdetir weke têgînên rastiyan vedişêrin didît û bi ya min hêja bû mirov li ser vî fikirî bisekiniya û paşguh nekiribûya. ‘Di nava cudahiyan de yekîtî’ dikarîbû alîkariya çareseriyê bikira, lê têrê nedikir û kêm bû. Lê eşkere bû ku di analîzkirina civaka dîrokî de alîkariyeke dewlemend pêşkêş dikir û ji bo jiyaneke xweş û baş a civakî, divê min ew weke sîstemeke analîzê ya kêm dikare bixape û şaş bike, binirxanda. Lê belê qusûra wê ya bingehîn ew bû, rîsk têde xuya dikir mîna ku xelekeke girtî ya mirov nikaribe jê bibihure pêşkêş dikir. Mîna çarenûs bin, nêzî sîstemên desthilatdariyê yên hegemonîk dibû. Ya rastî, bi awayekî diyalektîkî rêya derketinê nîşan nedida.

Immanuel Wallerstein di analîza xwe ya li ser sîstema dinya kapîtalîst de zemanekî pêncsed salî digire esas dibîne û ev nêzîkatî kêm e. Eger analîzên xwe li zemanekî pênc hezar salî bikira, eşkere wê zêdetir kêrhatî bûya. Di berhema xwe ya bi navê Sîstema Dinyayê de fikrên gelek fikirdar û zanyaran berhev kirine. Me têde serê gelek meseleyan dît. Aliyê kêrhatî yê vê berhemê ew e, I. Wallerstein dikare analîza derketina ji sîstema dinyayê, xurt bike. Nêzîkatiyên wî alîkar bûn.

Çi analîza kapîtalîzmê, çi jî têgihiştina li civaka yekpare ya bi şêweyê ‘demên dîrokî’ ya Fernand Braudel têra xwe mejiyê mirov zelal û rohnî dikin. Nexasim jî gelekî girîng bû ku dijberiya kapîtalîzmê ya bazarê tespît dike û destnîşan dike ku yekdestdariyên desthilatdariyê û yekdestdariyên ekonomiyê xwedî xisletên danehevê yên bi heman rengî ne. Hevoka wî ya herî zêde min jê hez kir û kêfa min jê re hat jî ev bû “Desthilatdarî timî kapîtalê pêk tînin.” Dîsa hevoka wî ya dibêje “Mîna pereyan desthilatdarî jî tê komkirin.” Ji bo kesên fêhm bikin tespîtên gelekî giranbuha ne, û mirov dikare ji wan hîn bibe. Hem I. Walletstein hem jî F. Braudel ji aliyekî ve serneketina şoreşên sosyalîst bi derbasnebûna wan a ji modernîteya kapîtalîst ve girê didin. Di vê mijarê de ev tespîteke diyarker e, û têra xwe mirov dikare jê hîn bibe. Lê ez jî pê re me ku herdu fikirdar divê di mijara ‘reduksiyonîzma ekonomîzmê’ de ku bi xwe tînin ziman, mirov wan bixe ber lêpirsînê.

Divê ez careke din diyar bikim ku nêzîkatiya min a ji zanista civakî re pirr kêm be jî ketibe bin bandora fikirdarên min behsa wan kir û bandora gelek fikirdarên min behsa wan nekir li ser nêzîkatiya min hebe jî dîsa jî nêzîkatiya min xweser e. Di duyemîn parêznameya xwe ya mezin a bi navê **'Parastina Gelekî'** de min xusûs diyarkiribûn. Ez yeqîn dikim ku min ew xusûs kûr û sîstematîze kirine. Ji ber van xusûsan ez yeqîn dikim; li gorî min epîstemolojiyên (avahiyên agahî-zanînê) heyî nikarîbûn nebin parçeyekî amûrên desthilatdariyan. Ev tevî dijberiya îradeya wan welê ye. Yekî mîna Karl Marks ê xwedî nêzîkatiyeke herî zanistî bi hostayî rûyê rastî yê kapîtalê didît. Di vê de şik û guman nîne. Lê ev xisleta wî ya girîng nikarîbû wî ji moderníteya kapîtalîst qut bike. Avahiyên agahî-zanînê yên Marks xwe disipart wan û jiyana wî bi hezar bend û tayî bi moderníteyê ve girêdabûn. Ez van gotinan bi armanca gunehbarkirina wî nabêjim, ez dixwazim rastiyê bidim fêhmkirin. Ji bo Lenîn û Mao jî heman gotin di cih de ne. Sîstema, difikirîn pêk bînin bi gelek bend û tayan berê pêşî jî avahiyên wan ên zanîn-agahiyê û têgihiştina wan a jiyana modern, hewcedarê moderníteya kapîtalîst bûn. Weke mînak, difikirîn ku mijarên mezin ên mîna îndustriyalîzm û dewleta netewe bi naverokeke sosyalîst fetih bikin. Lê ev ji aliyê şêwe û naverokê ve ji navikê ve bi qalibên bingehîn ên moderníteyê yên daneheva sermayeyê ve girêdayî bûn. Ji lewra jî yên ev bikirina bingeh, çiqasî dijber bûna jî encam wê kapîtalîzm bûya. Rexneyên min ên li sosyalîzma pêkhatî di van xusûsan hemûyan de gelekî zelal bûbûn. Lê rexnekirin têrê nake. Diviyabû ez çi deynim şûna wan? Pirsa girîng ev bû. Pirsa timî ez li ser zêde fikirîm û ponijîm jî ev bû.

Alternatîfa şaristaniya demokratîk, nêzîkatiya sîstematîk a modelekê ye. Tevî ku binavkirineke bi vî rengî besît xuya bike jî heta binavkirineke nû ya karibe cihê wê bigire bê dîtin, bi vî navî pêşkêşkirina wê pêwîst û çareserker dibînim. Beriya her tiştî ev alternatîf li dijî sîstema şaristaniya dinyayê ya navendî, sîstemeke alternatîf pêşniyar dike. Şaristaniya demokratîk bi tenê ji bo roja me ya îro û paşerojê utopyayek nîne; ji bo şîroveyeke berbiçav a civaka dîrokî jî heta dawiyê pêdivî û raveker xuya dike.

Di her şert û mercên zeman û mekan de daneheva sermayeyê û amûrên desthilatdariyê yên rê li wan vedike, berxwedan û alternatîfên wan hene, û xwezaya civakî vê yekê ferz dike. Civak li ti dever û zemanî li dijî danehevkarên sermayê û amûrên desthilatdariyê bê berxwedan û alternatîf nemane. Pirrî caran têkçûna wan ji tinebûna berxwedan û bê alternatîfbûnê nîne, divê mirov sedema vê di hin şert û mercên din de bigere.

Mirov heta çîrokên dûrî aqilan ên sermaye û danehevên desthilatdariyê baş fêhm neke, di têgihiştin û serwextbûna li têgîna şaristaniya demokratîk de em ê zehmetiyê bikişînin. Di vê mijarê de avahiyên agahî-zanînê timî di navbera du şaşiyan de çûne û hatine: yan bi temamî di nava avahiyên zanîn-agahiyê de heliyane, yan jî weke mezhebên sekter (bêyî ku zanist, alternatîfa siyasî û helwesta xwe ya exlaqî bi awayekî serbixwe hilbijêr in) bivênevê bûcirk man an jî bûcirk hatin hiştin. Bêguman di vê de rola sermaye û zorê ya ji rê derdixe, divê mirov timî li ber çavan bigire. Mirov heta van herdu têgihiştinên balkêş ên avahiya zanîn-agahiyê mehkûm neke, nikare alternatîfa şaristaniyê berbiçav bike. Ya ku divê mirov bixe ber lêpirsînê hebûna rastiya şaristaniya demokratîk nîne, mezhebgiriya sabitfikir û avahiyên desthilatdariyê yên zanîn-agahiyê yên biqasî vê nebînin bêhêz in. Ev rastiyên ku bi tenê bi kêmasî û şaşiyên vegotinên civaka dîrokî nayên ravekirin, 'bi gavavêtineke dîrokî' ango di zanistên civakî de bi şoreşekê dikarin bêne veguherandin.

Avahiyên desthilatdarî û dewletê yên li ser danehevên sermayeyê yên pênc hezar salî avakirî ji tecrubeyên xwe yên rojane pirr baş dizanîbûn ku avahiyên mezin ên zanîn-agahî û îdeolojîk bi rêxistin nekin wê rejîmên xwe nikaribin dewam bikin. Amûrên desthilatdariya hegemonîk di heman demê de amûrên berhemê zêde, nirxê zêde û yên rewakirinê timî kom dikin, eger mirov van amûran weke hêmanê bingehîn ê çavdêrîkirinê nebîne, divê mirov zanibe ku wê zanistên civakî nebin rejîmên heqîqetê yên manedar. Mîtolojî, dîn, felsefe û avahiyên zanista pozîtîv pirr xurt bi dîroka daneheva sermaye û desthilatdariyê re di zikhev de ne, û yekîtiya

xwe ya li ser berjewendiyan timî li ber çavan girtine û heta ev neyên fêhmkirin di zanistên civakî de şoreş gengaz nabe.

Duyemîn xusûsa girîng a mirov dikare ji têgîna şaristaniya demokratîk weke encam derxîne ew e, di zanistên civakî de ji şoreşê re zemînê herî berfireh pêşkêş dike. Em weke îddîaya bingehîn (em dikarin tez jî jê re bibêjin) çavdêriya vê dikin: Bi tevahî 'barbar', qewmên koçber, lumpen, qebîle, komin, mezhebên sabitfikir, cadû, bêkar û xizanên dîrokê, misêwa ji tevger û sîstemên manedar bêpar bûn. Eger mirov îddîa bike ku ev çarenûsa wan e, eşkere ye ku bi vî awayî mirov li ser navê berjewendiyên xwediyê daneheva sermaye û desthilatdariyê avahiyên mîtolojî, dîn, felsefe û zanistê lêdike; amûrên daneheva zanîn-agahiyê pêk tîne. Di dîrokê de bi tenê serweriya sermaye û desthilatdariyê nîne. Di heman demê de bi van serweriyan re mekanîzmayên agahî-zanînê (mîtolojîk, dînî, felsefî û zanistî) yên bi wan re di nava yekîtiya berjewendiyê de û serweriyên wan jî di zikhev de hebûn. Di serî de zanistên civakî yên Marksîst, gelek avahiyên zanista civakî ya muxalif di bingehê serneketinên wan de ev heye: wan şoreşa xwe ya zanista civakî, sipartî tevahiya dîroka daneheva sermaye û desthilatdariyê û bi sîstemeke şaristaniyê ya alternatîf di zikhev de nikarîbûn pêşde bibin. Bêguman gelek xusûsên behsa wan tê kirin bi awayekî berfireh hatine rexnekirin, lê hê zêdetir nehatine pêşdebirin, di çarçoveya yekeyeke vegotinê ya tevahiya dîrokê bigire nava xwe de nehatine rûşkandin. Nikarîbûne têgihiştina sîstema dinyayê pêk bînin, ji ceribandinên qutqutî û parçekirî wêdetir neçûne.

Sêyemîn hêmana girîng a sîstema şaristaniya demokratîk ew e, dikare hêmanên bajêr û îndustriyê yên piştî şoreşa cotkariyê bi pêş ketin, pêşde bibe, bêyî ku firsendê bide danehevên zêde yên sermaye, desthilatdarî û dewletê ku ev xwe disipêrin çîna navîn û di civakê de her tim bi rola şaneyên kansêrê radibin. Ango wisa tê gotin; ji bajar û îndustriyê re 'erê', lê ji şaneyên bi kansêr re ên di binyeya wan de 'na'. Dema ku em çavdêriya desthilatdarî-îndustrî-bajarên pirr mezin dibin û tevnên ragihandinê dinêrin, dîsa wexta em di nava van çavdêriyan de zirar û ziyanên li hawîrdorê dibin, statuya heyî ya jinê, bêkarî û xizaniyê bi cih bikin, em ê

bibînin gotina kansêrbûnê ya ji bo avahiyên civakî, gotineke tewş nîne û wê gelekî bi mane be. Nexasim di serî de ya I. Wallerstein, qêrîna zêde dibe ya civaknasên navdar û di pêvajoyên dîrokî de êrişên qaşo barbaran ên hîç kêm nebûn, mezhebên jirêderketî, serhildanên gundiyan, utopyager, anarşîst, herî dawî jî femînîst û tevgerên hawîrdorparêz, dikarin li dijî kansêrbûna xeternak a di binyeya civakî de, bi awayekî yekpare manedar bibin. Ti civak demeke dirêj nikare, bajar, çîna navîn, sermaye, desthilatdarî, dewleta heyî û danehevên amûrên ragihandinê hilgire. Civaka di qefeseke hesinî ya şidandî de hatibe girtin, bi qêrîna xwe negihîje asteke encamgir jî pirr baş diyar dike ku ekolojî rojane bi nîşaneyên S.O.S'ê dike hewar û rewşên krîz û kaosê yên hene ji sîstema şaristaniya navendî ya heyî ne; ji lewra em îdîa dikin ku derketina ji kaosê bi nêzîkatiyeke bi çavkaniyên dîrokî-civakî yên bi kok ve hatiye girêdan û rojaneyê jî weke rewşa heyî ya van çavkaniyan analîz dike, wê pêk bê û em herweha îddîa dikin ku paşeroj jî bi tenê li ser vî bingehî dikare bi Sîstema Şaristaniya Demokratîk a Navend Dinyayê pêk bê.

Ez ê di parêznameya xwe de ji gelek aliyan ve hewl bidim vê teza sereke rohnî û zelal bikim. Ez hewl didim dîrokê di asteke gerdûnî de fêhm bikim, ji ber ku ez weke prensîb bawer dikim, eger dîroka gerdûnî nebe, dîrokên xwecihî zêde maneyên xwe nînin. Bêguman mirov dikare civakên herî nexuya û wenda jî li ber şewqa dîroka gerdûnî rohnî bike. Herweha di asteke prensîbî de bawer dikim ku rojanetî (rewşa niha) dîrok e, dîrok jî niha ye. Lê divê ez vê xusûsa girîng jî lê zêde bikim, ez divê dubare bînim ziman ku ez bi van herdu prensîbên dîrokî re me: xwecih rewşa niha, bi tenê weke dubarebûnekê, weke rêûresmekê dîrokê dubare nake. Ji sedî sed CIHÊWAZÎ û XWESERIYÊN xwe lê zêde dike û di daneheva dîrokî de bi roleke girîng radibe. Ango dîrok bi tenê tekerur nîne; ew ya ku her zeman û mekan ji xwe lê zêde dike, kom dike, dide ser hev û tekerur dike.

Ne bi tenê di parêznameyên min ên berî niha de, ji ber ku bi awayekî giştî di tevahiya axaftinên min ên nivîskî û devkî de, di çarçoveya van prensîban de li cihêwaziyan hatiye nêrtin, ez guman nakim ku wê lome ji vê nêzîkatiya min neyê kirin û wê were fêhmkirin. Eşkere ye ku divê fikrên

min weke dubareyeke rijî yan jî weke bi kok ji fikrên xwe vegeriyayî û fitlan dide xwe, neyê şîrovekirin. Ji bo yên dizanin çavdêriyê bikin, eşkere ye ku cihêwazbûn pêşketin e, bi cihêwazbûnê pêşketin yekane prensîba gerdûnî ye. Wexta ku yek dike dido, bi tenê ketineke serhev a jimarî pêk nayê; bi vê re her tim dido ji yekê cuda û cihêwaz pêk tê.

Di vê beşa parêznameya xwe de ez ê piştî beşê **Pêşgotin** û **Destpêkê** di beşên bê de li ser hin pirsgirêkên rêbazê guftûgo bikim. Di zanistan de zêde parçebûn û dabeşkirin tê maneya krîza zanistî û wê têkiliya vê yekê bi krîza sîstemê re bê destnîşankirin. Bi awayekî yekpare nêzîkbûna zanistê tê çi maneyê, ev yek wê were diyarkirin.

Mijareke din a rêbazê jî xwezayên cihêwaz in, nexasim jî cihêwaziya xwezaya civakî wê were destnîşankirin. Ji bo vegera li xwezayê (Xwezaya Yekemîn) veguherînên bi kok hewce dikin. Em ê di heman demê de tevî têkiliya wê ya bi pirsgirêka jinê re jî behsa wê bikin.

Em ê bi îhtiyat nêzî ji hev cihêkirina obje-sûbjeyê bibin, em ê binêrin rê li kîjan pirsgirêkan vekiriye û em ê rêyên çareserkirinê guftûgo bikin. Herweha em ê têkiliya wê bi daneheva sermayê re nîşan bidin û pêdiviya jêbihurîna wê destnîşan bikin.

Gelekî girîng e ku mirov di dualîteyên rêbazî yên girîng ên mîna gerdûnîgirî-îzafiyetgirî, xelekwarîtî-xetî, globaltî-xwecihtî de zelal be. Herweha divê rêbaza diyalektîk ji nû ve were şîrovekirin.

Zelalbûna di têgînên rêbazî de wê vegotina mijarên din hêsan bike. Ji lewra hewce hat dîtin weke mijarekê were amadekirin.

Beşa çaremîn bi sernavê **Pirsgirêka Di Warê Azadiyê de** ye. Ji ber ku sîstema şaristaniya demokratîk ji nêz ve têkiliya xwe bi azadiyê re heye, ev yek rohnîkirina mijarê girîng dike. Rengê tehekumkar ê sîstema şaristaniya navendî, karekterê azadiyê yê şaristaniya demokratîk dike sereke. Di vî beşî de têkiliya xurt a wekheviyê bi azadiyê re wê were analîzkirin. Ji vê jî girîngtir, wekhevî weke têgîneke heqîqî wê li ser bingehê çawa cudahiyan li ber çav digire were şîrovekirin. Têgînên wekhevî û azadiyê li gorî têkiliyên wan ên bi sîsteman re nehatine

analîzkirin û wexta mirov rewşa wan a di nava zanistên civakî de ku rê li ber pirsgirêkên girîng vedikin li ber çavan bigire, wê ji nû ve şîrovekirina wan der barê teza me ya sereke de raveker be.

Di beşa pêncemîn de rexneya aqil û mejiyê li cem cinsê mirov mijara guftûgoyê ye. Em ê hewl bidin aqil û mejiyê civakî pênase bikin, herweha em ê dîsa hewl bidin kêrhatina wî ya di asta teorîk-pratîk, analîtîk-hisî de zelal bikin. Bikaranîna aqil ji aliyê sîstemên dinyayê ve dikare rê li ber çi veke? Aqil weke amûrekî çareserî û pirsgirêkafirandinê sînorên xwe hene? Em çawa dikarin Emmanuel Kant rojane bikin? Pirsên bi vî rengî me hişyar dikin ku aqlê me yê bi xwe amûrê çareseriyê ye, dikare rê li pirsgirêkên girîng jî veke.

Em ê di beşa şeşemîn de **Derketina Pirsgirêkên Civakî û Pêşketina Wan** lêbikolin. Em ê hewl bidin li tevahiya pêvajoyên dîrokî çav bigerînin ka sîstema şaristaniya navendî çawa bûye çavkaniya pirsgirêkan. Pirsgirêkên civakî herçûne şax berdane û ev yek jî bi sîstemê bi xwe ve girêdayî ye. Ji lewra amûrên daneheva sermaye û desthilatdariyê pirsgirêk bi xwe ne. Bi awayekî dîroka pirsgirêkan tê tesewirkirin.

Di beşa heftemîn de weke amûrê pirsgirêkan çareser dike sîstema şaristaniya demokratîk tê pêşniyarkirin. Dîrok ji nû ve weke dîroka civakî tê tesewirkirin, ev kîjan maneyan di nava xwe de dihewîne? Têkiliya qut nabe ya di navbera dîrokê û civaka demokratîk de tê destnîşankirin.

Di beşa heştemîn de weke dewama beşa heftemîn, em ê hewl bidin modernîteya demokratîk weke alternatîfa modernîteya kapîtalîst pênase bikin. Em ê pêdiviya bi herdu têgihiştinên modernîteyê û gengazbûna vê yekê li bin şewqa dersên dijwar bibînin. Nexasim em ê di vê çarçoveyê de têkçûna şoreşên hemdem dubare di ber çavan re derbas bikin.

Em ê di beşên nehemîn û dehemîn de hewl bidin pêxîrtengiya sîstemî ya kapîtalîzmê û derfetên derketina jê, analîz bikin. Modernîteya kapîtalîst weke rewşa rojane ya sîstema şaristaniya dinyayê ji hev de dikeve, gelo alternatîf û berdêlên wê dikarin çi bin? Em çawa dikarin modernîteya demokratîk ava bikin? Astengî û derfet çi pêşkêş dikin? Erk û wezîfeyên

jinûveavakirinê çi ne? Ev pirsên gelekî dijwar, bêguman bersivên xwe jî di nava xwe de dihewînin.

Ez beşa yanzdehmîn weke encamê tesewir dikim. Ji gelek aliyan ve bîlançoya vê ceribandinê tê danîn. Dîrok ne li ser xeteke rast a çarenûsî dimeşe, ne jî ber bi armanca li bendê, pêşde diçe. Ne bi serê xwe çavkaniya xirabiyan e, ne jî zûdereng pêşkêşvanê qenciyê ye. Civakbûna mirov dikare jiyaneke xweş mumkîn bike. Civak bi xwe çavkaniyeke mezin a çareseriyê ye. Cureyên kansêrê jî di navê de ya hewce dike ew e ku hema em zanibin wê ji nexweşiyên kujer biparêzin; em dinya xwe ya jiyaneke mîna cennetê muhteşem mumkînkirî fêhm bikin, û jiyîna xweş hilbijêrin!

## 4- HIN PIRSGIRÊKÊN RÊBAZÊ

Rêbaz bi maneya rêya mirov herî kurtebirr digihîne hedefê, têgîneke navend Rojava nîne. Ji serdemên herî kevin ve ekolên hozanî û zanyariyê yên Rojhilata Navîn wê diceribînin. Rêyên kêrhatî yên ji bo xwe gihandina zanîn-agahiyê her tim hatine ceribandin. Di nava wan de yên herî encamgir weke rêbaza bingehîn hatine hilbijartin. Ekolên fikrê herî zêde li ser têgîna mentiqekî ango pêşdebirina rêbazekê ponijîn e ku ev yek usûleke ji rêûresmê ye. Kengî Ewrûpa bû navenda hegemonîk a sîstema şaristaniya dinyayê, di gelek qadan de pêşketinên rê li serdestiyê vekirin li qada zanistî di mijara rêbazê de jî xwe nîşan da. Di sedsalên 16. û 17. de Bacon, Descartes û Galîleo bi nêzîkatiyên girîng ên rêbazê derketin holê. Ev derketina holê û gavavêtina wan ji nêz ve têkiliya xwe bi rewşa Ewrûpayê ya bûye navenda sîstema hegemonîk re heye.

Obje û sûbje ji têgînên girîng ên rêbazê ne. Pêşdebirina cihêkirina van têgînan têkiliya xwe bi hukimkirina li xwezayê re heye. Amûrên nû yên daneheva sermaye û desthilatdariyê, çiqasî giraniya xwe dan ser hem çavkaniyên xwezaya civakî hem jî fizîkî-biyolojîk, pirr neçû fêhm kirin ku çavkaniyên li ser sekinîne gelekî kêrhatî ne. Herdu çavkaniyên xwezayê çiqasî kirin obje, ewqasî jî li pey hev kêrhatina xwe ya zêde dibe, ji daneheva sermaye û desthilatdariyê re pêşkêş kirin. Di fikrê de berdêla vê pêşketina maddî cihêbûna obje û sûbjeyê ye. Ev rewş li cem Bacon xwe weke cihêkirina objektîv û sûbjektîv nîşan dide, li cem Descartes jî bi şêweyê dualîteyeke tûj a ruh û beden xwe dide der. Li cem Galîleo jî matematîk fena zimanê xwezayê, weke pîvaneke obje ya herî pêşketî derdikeve pêş. Meşa dirêj a dîrokê ya Mezopotamyayê, li Yewnanistana rê li ber pêşveçûnê vekir. Pêşveçûneke bi heman rengî, tevî cihêwaziyên xwe, li rojavayê Ewrûpayê dubare dibe. Ya rastî, civaka Sumer jî pratîka jiyanê ya li Mezopotamya Jor di parzûnkên hezar salan re hatibû dawerivandin,

bar kirin Mezopotamya Jêr û li vir xweseriyên jiyana xwe jî tevlî kirin û bi vî awayî şêweyê orjînal afirandin.

Di sîstemên şaristaniya navendî de sûbje (kirdar) her tim çavkaniya xwe sermaye û desthilatdarî ne. Serwextî, vegotin û îradeya azad temsîl dike. Carnan ferd e, carnan sazî ye, lê timî heye. Yên para obje'bûn dikeve jî timî gel, jin û barbarên li derveyî desthilatiyê ne. Kengî mîna xwezayê ji sûbjeyê re weke çavkanî xizmetê bikin, têne bîra kirdaran. Jixwe wekî din bi ti maneyê behsa wan nayê kirin û ev jî li gorî ya divê bibe, dibe. Di mîtolojiya Sumeran de mirov weke evd ji pîsiya xwedayan, jin jî ji parsûyê mêran hatiye afirandin. Ev çîrokên afirandinê asta objekirinê ya di kûrahiya dîrokê de nîşan didin. Bêguman ev nêzîkatiya cihêkirina obje û sûbjeyê piştî veguherînên girîng mumkîn bûye ku bigihîje Ewrûpayê. Lê mirov nikare înkar bike ku pêşketina zincîrwarî di vê çarçoveyê de pêk hatiye.

Di roja me ya îro de sînorê cihêkirinê yê di navbera obje û sûbje de qels bûye û ev jî bi sereketiya kapîtala fînansê re têkildar e. Di sîstema şaristaniya navendî de hegemoniya sembolîk a kapîtala fînansê tevahiya rewşên berê yên obje û sûbjeyê ji hev derxistine. Wexta cihê wê tê her kes xwe dixe şûna sûbjeyê, wexta cihê wê tê her kes xwe dixe şûna objeyê, têkiliyeke vê yekê ya xurt bi şêweyê nû yê daneheva sermaye û desthilatdariyê re heye. Bi amûrên sermaye û desthilatdariyê yên mîna aşûta tê xwarê, zêde dibin (çavkaniya xwe milletperestî, dînperestî, cinsperestî û zanistperestî), hem di asta rastî, hem jî di asta feraziyê de mîna extapot û sermûşaxê xwe li civakê gerandine, alandine. Di van şert û mercan de her kes û her sazî dikare xwe têra xwe di statuya obje û sûbjeyê de bibîne. Amûrên îdeolojîk fonksiyona xwedayên di dema civaka Sumeran de werdigirin. Veguherîna di cihêbûna obje û sûbjeyê de bivênevê wê pêk bê, xisletên nû yên sembolîk ên xwedayan û hukimraniya wan jî bêguman wê cihêbûna heyî bê kêr bike.

Tevahiya dîroka şaristaniya navendî zanîn-agahî her ku çûne parçe bûne û pîrozbûna xwe ji dest dane. Ev rewşa em behsa wê dikin jî çîrokeke xwe ya bi heman rengî heye. Mekanîzmayên sermaye û desthilatdariyê

çiqasî zêde bibin, zanîn-agahî jî ewqasî parçe dibin. Mirov çavdêriya vê xusûsê di dîrokê de dike. Di tevahiya civakên klan û qebîleyan de zanist yekpare ye. Nûnerên wê pîroz têne hesibandin. Zanist weke dayîneke xwedê tê qebûlkirin. Li gorî daxwaz û hewldana wê/wî li her kesî tê belavkirin. Di mîtolojiyan de ev bi tevahî welê ye. Di dîn û felsefeyê de nêzîkatiya vê yekê pîvaneke sereke ye. Lê parçebûna pêşî di avahiya zanistî ya Ewrûpaya Rojava û zanistên xwezayê de tê dîtin. Organîzasyonên zanînê yê nû (akademî û zanîngeh) her ku çûne ji civakê qut bûne û bi tevahî ketine xizmeta elîtên sermaye-desthilatdariyê û bi awayekî eşkere xwe di mertebeya saziyên nadîde yên dewleta nû (Levîathan) de dibînin. Pêvajoya desthilatdarî û sermayebûyîna zanistê, di heman demê de bûye pêvajoya xerîbketina bi civakê re. Biryargeh û perestgehên zanistê yên pirsgirêkan çareser dikin êdî bûne navendên hegemoniya îdeolojîk, xerîbkirin û pirsgirêk afirandinê. Çiqasî çavkaniyên civak û xwezayê hene, ewqasî beşên zanistî jî hatine zêdekirin. Ev rastî bi serê xwe jî têrê dike ku mirov ketina zikhev a zanist-sermaye-desthilatdariyê piştrast bike. Qada zanistê ji tevahiya civakê re cihekî pîroz e, lê ji vê xizmeta wê pîroz dike, gelekî hatiye dûrkirin. Navendên zanistê her yek ji wan kirine pîşeyên çavkaniya pereyan, heta bi xwe bûne sermaye; bûne hevparê herî gunehkar ên bi tehlûke yên desthilatdariyê. Em pirr baş dizanin ku di serî de sîlehên nukleer, her cure sîlehên hilweşîner ên dikarin hawîrdorê bi erdê re bikin yek, li navendên zanistê têne çêkirin. Li şûna ku fikara gihiştina heqîqetê (wicdanê kolektîf ê civakê) bike armanc û esas, ew li asta aqilmendê hilberandina sermayeyê û desthilatdariyê ya herî berdar/bi bereket hatine wezîfedarkirin.

Roja me ya îro, wexta ku zanist tê gotin pirsa pêşî tê hişê mirov ev e, "Gelo çiqas pere têde heye?" Lê ya civak ji zanistê hêvî dike ew e, dixwaze ji fikarên xwe yên bingehîn re bersivê bibîne. Ji ber fikarên xwe yên maddî û manewî, civakê zanist bi awayekî yekpare weke pîşeyekî xwedayî hesibandiye û wisa qebûl kiriye. Dejenerebûn û rizîna akademî û zanîngehê bi van şert û mercan ve girêdayî ye. Krîza zanistî çavkaniya xwe ev şert û merc in. Dîroka zanîn-agahiyê bi dîroka şaristaniyê ve girêdayî

veguheriye û ji pêxîrtengiya giştî ya sîstemê di heman astê de para xwe girtiye û ji vê aqûbetê nikarîbûye xwe xilas bike. Li cihê ku xwestiye bibe amûrê çareseriyê, bi xwe bûye amûrekî girîng ê pirsigrêk afirandinê. Encam, parçebûna zanistê, belavbûna wê û kaos e.

Xwezayên yekemîn, duyemîn û sêyemîn, bi gotineke din xwezayên cihêwaz, divê mirov li wan serwext bibe. Bi tevahî xwezaya ji derveyî mirov bi şêweyê Xwezaya Yekemîn tê cihêkirin. Ev di nava xwe de têgîneke bi nakok e. Ji ber ku ev yek, berê pêşî, dikare mirov ber bi dualîteyên weke bi can-bê can, heywan-nebat, heta fizîk-kîmya û gaveke din jî wêdetir maddeya xuya dike-ya nake, enerjî-madde cihêkariyên cihêreng ên bêserûbinî ve bibe û mirovî bi vî awayî bide fikirîn. Jixwe her cihêbûnek civakeke xwe ya li gorî xwe heye. Em wexta ji nêz ve li pirsgirêka xwezayan binêrin, em ê bandora kûr a cihêbûna obje û sûbjeyê li ser wan bibînin. Ev cihêkirineke têkûz nîne, herî kêm mirov divê hewcedariya bi şert a cihêkirinên bi vî rengî destnîşan bike.

Civaka mirov weke Xwezaya Duyemîn, bêguman xweseriyên xwe hene û qonaxeke pêşketina xwezayî ya girîng e. Li şûna ku weke xwezayeke cuda were diyarkirin, weke qonaxeke xwezayê ya cihêwaz were bi wesifkirin manedartir e.

Karekterîstîka herî girîng a xwezaya civakê ya wê ji yê din cihê dike ew e, kapasîteya zêhnî bilind e, nerm e, û hêza wê ya xwe avakirinê ye. Bêguman di Xwezaya Yekemîn de zêhn, nermtî û hêza xwe avakirinê heye. Lê li gorî xwezaya civakê giran, hişk û hêdî dimeşe. Bi tevahî teorîzekirina xwezaya civakê gelekî girîng e. Herçiqasî civaknasên pêşî di rêza yekemîn de cih dane vê xusûsê jî ber bi roja me ya îro ve analîzên parçe û avahiyê zêdetir derketine pêş: çawa ku mirov çavdêriya wê di analîzên xwezayên din de dike. Herweha cihêkirina xwezaya civakê bi şêweyên avahiyên jêr-jor, bi şêweyê ekonomîk-polîtîk-desthilatdarî dabeşkirin, bi awayê tebeqe û qonaxên weke komina destpêkê, koledarî, feodalîzm, kapîtalîzm û sosyalîzm-kominîzm parvekirin, eger bi tenê li ser bingehê nêzîkatiyeke ‘CIHÊWAZTIYÊ’ bi baldarî were kirin, dikare encamên manedar bide. Ti analîza avahî, tebeqe û parçe nikare şûna nêzîkatiya teorîk a yekpare

bigire. Mirov dikare bibêje, di vê mijarê de ti civaknas û fîlozof ji nêzîkatiya yekpare ya Eflatûn û Arîsto nebihuriye. Heta mirov dikare bibêje, şîroveyên yekpare yên pêxember û zanyarên bi koka xwe ji Rojhilata Navîn û bi giştî jî ji Rojhilat, li gorî civaknas û fîlozofên modernîteya kapîtalîst hê bêtir civakî ne, û mirov zêdetir ji wan hîn dibe. Nêzîkatiya wan li pêştir û pêşketîtir e. Divê bi girîngî were destnîşankirin ku di bêtesîrkirina nêzîkatiya teorîk a yekpare de rola herî girîng a amûrên daneheva sermaye û desthilatdariyê ye.

Di analîzên li ser civaka mirov de, pêdivî bi rêbazeke nêzîkatiyê ya nû û kûr a teorîk heye. Divê mirov bi girîngî fêhm bike ku rêbazên sosyolojîk ên di nava qelebalixiya hejmaran de fetisîne, ji eşkerekirina rastiyan wêdetir ser wan digirin. Eger ez bibêjim sosyolojiyên heyî ji mîtolojiyan zêdetir ser rastiyan digirin û dinixumînin divê ev weke gotinên ji xwe zêde û nepixandî neyên hesibandin. Heta, mirov dikare bibêje, hiskirina mîtolojiyê ya rastiyê, li gorî maneya di sosyolojiya modernîteya kapîtalîst de, heta dawiyê insanî ye, û zêdetir nêzî heqîqetê ye.

Bêguman zanista civakî girîng e, lê ji rewşa heyî re zehmet e ku mirov bibêje, zanist e. Vegotinên sosyolojîk ên li naverastê ji rewakirina modernîteya fermî wêdetir zêde maneyekê îfade nakin. Di vê mijarê de hewcedarî bi şoreşeke bi kok a zanistî û gavavêtineke rêbazî heye.

Qonaxa ku mirov dixwaze weke Xwezaya Sêyemîn maneyekê bidiyê, bi tenê bi vê şoreşa zanistî û rêbazî gengaz dibe. Xwezaya Sêyemîn weke têgîn di qonaxeke jor de ji nû ve ahenga Xwezaya Yekemîn û Duyemîn îfade dike. Sentezeke di asta jor de ya xwezaya civakî bi Yekemîn Xwezayê re bi qasî paradîgma teorîk a şoreşger pêdiviya wê bi şoreşeke bi kok a pratîk jî heye. Nexasim jî ji bo lidawîhiştina qonaxa sîstema şaristaniya navendî ya roja me ya îro ango sîstema dinyayê ya kapîtalîst yanî modernîteya wê, ev yek diyarker e. Ji bo pêkhatina vê jî herî kêm divê avahiyên şaristaniya demokratîk bêne lêkirin, weke xusûsên darî çav divê di karektera civakê ya ekolojîk û femînîst de pêşketin çêbin, hunerê siyaseta demokratîk fonksiyonel were kirin û civaka sivîl a demokratîk were avakirin, ev gav divê bi awayekî serketî bêne avêtin.

Xwezaya Sêyemîn sozdana cennetek an jî utopyayekê nîne; mirov ê cihêwaziya hêza xwe ya serwextbûnê ya li ser xwezayan zêde dibe biparêze, TEVLÎBÛNA xwe ya ahenga mezin pêk bîne. Ev bi tenê sozdana hesret, armanc û utopyayan nîne, hunerê jiyana xweş û baş e ku maneya xwe ya pratîk a rojane heye. Ez behsa biyolojîzmê nakim. Ez bi tehlûkeya vê nêzîkatiyê dizanim. Ez behsa utopyayên cennetê yên 'Xwedatî' yên danehevên sermaye û desthilatdariyê jî nakim. Ez xwedî pêşbînî me ka ev nêzîkatî jî hûrûkûr çi îfade dike, armancên wê yên bi tehlûke û hilweşîner çi ne. Materyalîzmê jî soza cenneta kominîzmê ya vulger dabû û ew jî kêrhatî nebû, çor bû, ez dikarim bibêjim ku bi awayekî varyanteke lîberalîzmê ya seriyê din bû. Jixwe em ji tecrûbeyên xwe yên jiyana rojane fêhm dikin ku ji her cure sozdana lîberalîzmê bêhna cehennemê tê.

Ji bo pêkhatina Xwezaya Sêyemîn hewcedarî bi 'dem'eke dirêj heye. Xwezaya Yekemîn û Duyemîn di qonaxeke jor de li ser bingehê cihêwaziyan weke sîstema demokratîk a rejîma pêkhatin û îfadekirina wekhevî û azadiyê, eger di nava wê de xisletên civaka ekolojîk û femînen pêş bikevin, mumkîn e. Xwezaya civaka mirov, hêzên pêkanîna vê qonaxê hildigire. Ya divê mirov zêde li ser bifikire meseleya xwezayên cihêwaz e, eger mirov bi vê rêbazê nêzîkî wê bibe, dikare mirov ber bi pêkanînên hê manedartir ên teorîk û pratîkê ve bibe.

Di van demên dawiyê de pirsgirêkeke girîng a rêbazê di çarçoveya gerdûnîgirî û îzafiyetê de tê guftûgokirin. Mirov vê weke gerdûngirî û taybetbûna maneyê şîrove bike wê heman naverokê îfade bike. Em bi pirsgirêkeke rêbazê re rûbirû ne ku divê bi baldarî ji hev were derxistin. Em dikarin vê pirsgirêkê weke qonaxa nû ya ku cihêkirina obje û sûbjeyê gihiştiyê jî pênase bikin. Ji nêzîkatiyên hişk ên amûrên sermaye û desthilatdariyê re bi pirranî 'qanûn' tê gotin, ev yek ji ber şertên maddî ye yên ku di bingehê pirsgirêkên rêbazê yên bi vî rengî de ne. Etîketa 'gerdûnîtiyê' li nêzîkatiya qanûnîk tê xistin û ev jî ji nêz ve têkiliya xwe bi amûrên rewakirinê yên îdeolojîk re heye. Gotina "qanûn hesin dibirre" ji vê derê tê. Divê mirov baş fêhm bike ku qanûn berhemekî desthilatdariyê ye. Em ji bîr nekin ku desthilatdarî tê maneya sermayeyê. Hukimraniya

desthilatdariyê di heman demê de tê maneya ‘qanûnê’. Qanûn jî çiqasî ‘gerdûnî’ be, ewqasî jî bi hêz e, û li ber rabûna wê ne pêkan e. Ji pêjna mirov bi vî rengî avakirina xwedê destpê dike. Mirovê xwediyê desthilatdariyê dîkteya xwe ya nikare eşkere îfade bike, îlahî dike û bi vî awayî amûrekî rewakirinê yê dahiyane diafirîne û tesewir dike ku wê desthilatdariya xwe bihêsanîtir dewam bike. Ji lewra divê mirov baş fêhm bike ku di bingehê tevahiya gerdûnitiyan de –ne bi tevahî be jî–hewldanên bi vî rengî bi rêje û nîsbeteke girîng cih digirin.

Îzafiyet herçiqasî weke qutbekî dijber bê nîşandan jî bi xwe jî tehlûkeyên bi heman rengî dihewîne. Rewşa mirovê bi tevahî piçûk hatiye xistin ji rêzik, rê û rêbazê hatiye dûrkirin, îfade dike. Ji têgihiştina li seriyekî din a dibêje “Çiqas mirov hene, ewqasa jî rêzik û rêbaz hene” derî vekirî dihêle. Li gorî ku di pratîkê de derfet û îmkanê vê yekê nînin, di encamê de îzafiyet bivênevê êsîrî qanûnên gerdûnîtiyê bibe. Herdu têgihiştin jî para mejiyê civaka mirov an zêde mezin dikin ango digihînin asta ‘qanûna gerdûnî’, yan jî mijarê dadixin astekê bi şêweyê “Herkesî qanûna xwe heye” pirr piçûk dibînin û ji rê derdixin. Gengaz e ku mirov mejiyê civakî bi awayekî realîsttir şîrove bike. Eger mirov şîroveya îzafiyet û qanûna gerdûnî negihîne asta wan bike qutbên dijberê hev, weke rewşa rastiyê ya di zikhev de bike têgîn, dikare rê li vegotineke kêrhatî veke. Rêzikgiriya gerdûnî ya naguhere digihîje pêşketina li ser xeteke rast ku dawiya vê hebûya, di gerdûnê de diviyabû heta niha em gihiştibûnayê. Qusûreke bi vî rengî ya li ser xeta rast a pêşketinê heye. Eger rastbûya ku gerdûn misêwa ber bi armancekê ve diçe, li gorî têgîna ‘ezeliyetê’ ya naveroka xwe bêserûbiniye, diviyabû heta niha gihiştibûya armanca xwe. Berevajî, eger îzafiyet a têgîna ‘xelekwariya bêserûbinî’ di nava xwe de dihewîne rastbûya, diviyabû guherîn û pêşketinên heyî yên gerdûnî pêk nehatana, neqewimiyana. Ji ber van sedeman li ser xeteke rast pêşketina gerdûnî û xelekwarîbûn (çemberwarîtî) têgihiştinên rêbazî ne, ji ravekirina pêşketina gerdûnî ya cihêwaz dibe û diguhere, mehrûm in. Rêbazên bi qusûr in. Rêbaza nêzî rastiyê ew e, “Bi cihêwazbûnê re guhertinê mumkîn dike; bi qasî kêlî, aniha jî di nava xwe de bêserûbinîtiyê

dihewîne". Ez bawer dikim ku divê bi vê avahiyê were pênasekirin. Pêşketin bi qasî ku xelekwarî ye, xelekwarîtî jî bi qasî ku pêşketin e, bêûserûbinîtî di kêliya aniha de veşartî ye, di navê de ye, yekparebûna pêkhatina kêliyê jî di nava xwe de bêserûbinîtiyê dihewîne, ji bo avakirina rejîma heqîqetê ev perspektîfeke rêbazî pêşkêş dike ku bêtir ravekir e, û dide fêhmkirin.

Girîng e ku di mijara rêbaza diyalektîkî de jî em li ser hin xusûsan rawestin. Bêguman keşifkirina rêbaza diyalektîkî destketiyeke gelekî mezin e. Bi çavdêriyeke hûrûkûr her kêlî mirov keşif dike ku gerdûn xwedî karektereke diyalektîkî ye. Lê xusûsa li vir dibe pirsgirêk ew e, divê diyalektîk çawa were pênasekirin. Di mijara diyalektîkê de cudahiya di navbera şîroveya Hegel û Marks de tê zanîn. Hilweşîna herdu şîroveyan rê li ber vekir, cihê kêfxweşiyê nîne. Şîroveya Hegelwarî rê li ber avakirina Dewleta Elman a Milletperest vekir û bi cihanîna faşîzmê, encamên xwe yên xeternak nîşan dane. Herçiqasî encamên bicihanîna çînparêziya teng û sosyalîzmê ya peyrewên Marks cuda be jî, tê zanîn ku rê li ber gelek rewşên neyênî û hilweşînê vekirin. Li vir, li şûna ku mirov qusûrê di Marks an jî Hegel de bibîne, divê mirov qusûrê di wan kesên diyalektîk têra xwe şaş şîrove kirî û bêtir rast nêzîk nebûyî de, bibîne. Jixwe rast nîne ku mirov nêzîkatiya diyalektîkî bike malê Hegel û Marks, herweha mirov wê bike malê fikra Yewnana Serdema Antîk jî tespîteke di cih de nîne. Di hozanî û zanyariya Rojhilat de mirov têra xwe li şîroveyên diyalektîkê rast tê. Bêguman li Yewnanistana Serdema Antîk û Rohnîbûna Ewrûpayê di vê mijarê de destketiyên girîng pêk hatine.

Mirov diyalektîkê çi weke yekîtiya dijberên hevdu hildiweşînin, çi jî guhertinê bê dijber bi şêweyê pêkhatin û afirêneriya kêliyê şîrove bike, ne rast e. Têgihiştina yekemîn herî çor e, qutban ber bi meyla dijmintiyê ve dibe, gerdûnê ji rêzikan bêpar û timî di nava koasê de dibîne û jê wêdetir jî ev têgihiştin ti encamê nade. Têgihiştina duyemîn jî pêşketinê ber bi encamekê ve dibe ku bê tengezarî ye, ji dijberan bêpar e, xwedî hêza xwe nîne û pêdiviya bi hêzeke ji derve timî ferz dike, jixwe piştrastkirina vê

têgihiştinê jî mumkîn xuya nake. Baş tê zanîn ku mirov di vî derî re digihîje metafizîkê.

Naxwe gelekî girîng e ku mirov diyalektîkê ji van herdu şîroveyên radîkal her yek ji wan li seriyekî, rizgar bike û bimale. Diyalektîkeke avaker û ne hilweşîner jixwe xusûsek e ku di bûyeran de tê dîtin. Mînak mirov bi xwe, belkî jî bi qasî temenê gerdûnê yê ku teqrîben tê hesabkirin, pêşketineke diyalektîkî di nava xwe de dihewîne. Ji perçikên jêr-atoman ên herî pêşketî heta bi atom û molekulan bi tevahî qonaxên biyolojîk ên beridînê di nava xwe de hildigire. Ev pêşketina harîqûlade, diyalektîkî ye. Lê bi awayekî neyê înkarkirin li naverastê ye ku diyalektîkeke pêşdebir û avaker e. Bêguman nakokiyên çînî (mirov dikare yên qebîleyî, etnîkî, neteweyî û sîstemî jî li van zêde bike) yên gelekî têne guftûgokirin hin dijmintiyên diyar dihewînin. Lê eger em hêza aqil a gelekî nerm ji bîr nekin, bêyî ku tevkujî bibin, mirov dikare van nakokiyan li gorî ruhê diyalektîkê çareser bike. Jixwe xwezaya civakê bi mînakên bêhejmar ên van çareseriyan tijî ye. Îdeologan li cihê xwestin pêşketinê baştir rave bikin, belkî jî li derveyî îradeya wan encamên berevajî bi dest xistin û ji wan nehat nekevin vê rewşê. Ji ber ku gelek caran ketin vê rewşê, ev jî nîşan dide ku hê jî girîng e, diyalektîk were şîrovekirin.

Di mijara diyalektîkê de ji bo rênedana şaşiyekê divê mirov qiyasa wê bi metafizîkê re jî bi kurtî şîrove bike. Ji ber ku metafizîkê li derve, bi afirênerekî li pêkhatinê geriyaye, bêguman ev di dîrokê de nêzîkatiya herî bêkêr e. Felsefe, dîn û zanisperestiya pozîtîv a vê nêzîkatiyê rê li wan vekir, bi temamî sîstemeke ‘mêtinkariya zêhnî’ afirand. Xweza hewcedariya xwe bi afirênerekî ji derve nîne, yan jî hebe ev afirêner wê ne ji derve be, dikare ji hundir be. Lê mirov bi hêsanî dikare îddîa bike ku metafizîkê ‘rejîmên mêtinkar ên zêhnî’ mîna afirênerekî ji derve li ser mejiyê xwezaya civakî bi cih kir. Ji lewra rexnekirina metafizîkê û jê bihurîn gelekî girîng e.

Lê belê aliyekî din ê metafizîkê heye dixwazim li ser rawestim. Ez dibêjim bê metafizîk tebata mirov nayê. Metafizîka ez behsa wê dikim, afirêneriyên çandî yên civaka mirov in. Tevî mîtolojî, dîn, felsefe û zanistan, her cure huner, polîtîka û teknîkên hilberînê jî di nava vê de cih

digirin. Berdêla fizîkî ya hisên qencî û bedewiyê nînin. Ev nirxên xweserî mirov in. Nexasim huner û exlaq nirxên metafizîk in. Li vir a divê were zelalkirin xusûsa dualîteya metafizîk-diyalektîkê nîne, ji hev cihêkirina afirêneriya metafizîka baş û xweşik, û metafizîka xirab û kirêt e. Wekî din, ya ku jiyanê balkêş dike û dihêle ku mirov karibe bêtir xwe lê ragire, ne dualîteya dîn-bêdînî, felsefe-zanist e, belê bawerî, heqîqet û rastiyên dînî, felsefî û zanistî ne.

Divê mirov ji bîr neke ku xwezayê lîstikeke mezin û pirrcure li pêşiya jiyana mirov daniye ser dikê. Rola mirov a li ser vê dikê nabe ku mîna ya xwezayê be. Ew li ser vê dikê bi tenê bi lîstikên çêkirine wê jiyana xwe sererast bike. Ji ber vê rastiya hûrûkûr e ku şano weke nîşandana jiyanê tê pênasekirin. Li vir a girîng ew e, di vê jiyana li ser dikê de daxistina asta herî jêr a şaşiyan, aliyên xirab û kirêt e; derxistina asta herî jor a rastî, qencî û bedewiyê ye. Em dema behsa metafizîka qenc, xweşik û rast dikin, em vê xisleta mirov a kûr destnîşan dikin. Naxwe ez behsa metafizîkên mirov kor, kerr û bêhis dikin, nakim. Ez yeqîn dikim ku wexta mirov muqayeseya der barê diyalektîk-metafizîkê de dike, ev tespît gelekî girîng in.

## 5- PIRSGIRÊKA AZADIYÊ

Ji dilê min wer tê, hema ez bibêjim armanca gerdûnê azadî ye. Min gelek caran ji xwe pirsiye gelo gerdûn li pey azadiyê ye. Li gorî min gelekî kêm e ku azadî bi tenê weke lêgerîneke kûr a civaka mirov were hesibandin; ez fikirîme ji sedî sed aliyekî xwe yê bi gerdûnê re eleqedar heye. Eger mirov li dualîteya perçik-enerjiyê weke hîmê bingehîn ê gerdûnê bifikire, bêyî ku xwe paşve bidim ez enerjiyê weke azadî destnîşan dikim. Ez bawer dikim ku perçika maddî jî pakêtoka enerjiyê ya di rewşa mehkûm de ye. Rohnî rewşeke enerjiyê ye. Ma gelo kes dikare înkar bike ku rohnî xwedî herikîneke pirr azad e? Kûantayên weke rewşa perçikê herî piçûk ê enerjiyê têne pênasekirin, di roja me ya îro de hema hema di ravekirina tevahiya pirrcuretiyê de weke hêmanekî bi mane têne dîtin û em jî tevlî vê yekê dibin. Belê, tevgera kûantûmî hêza afirîner a tevahiya pirrcuretiyê ye. Ez xwe nagirim û dibêjim, gelo Xwedayê timî mirov lê digere ev e. Dema ku tê gotin jor-gerdûn di karekterê kûantûmê de ye, ez dîsa bi heyecan dibim û dibêjim, dibe ku welê be. Dîsa ez xwe nagirim û dipirsim; gelo ji derve afirêneriya Xweda ji vê re tê gotin.

Bi ya min gelekî girîng e ku mirov di mijara azadiyê de egoîst û xweperest nebe û nekeve reduksiyonîstiya mirov. Ma kes dikare hilperîn û perpitîna heywanê di qefesê de ji bo azadiyê ji nedîtî ve bê? Li ber xwendina bilbil, senfoniya herî şaheser jî paşvemayî ye, ma vê rastiyê ji bilî azadiyê em dikarin bi kîjan têgînê rave bikin? Em hinekî din zêdetir pêşde biçin, ma bi tevahî deng û rengên gerdûnê azadiyê nayînin bîra mirovî? Koletiya herî kûr a pêşî û dawî ya civaka mirov jin e, ma hilperîn û perpitîna wê ji bilî gera li azadiyê, em dikarin bi kîjan têgînê rave bikin? Fîlozofên hûrûkûr ponijîne, weke mînak Spînoza, azadî weke derketina ji cehaletê û hêza maneyê şîrove kiriye, ma ev heman mabestê rave nake?

Ez naxwazim pirsgirêkê di nava naveroka wê ya bêserûbinî de bifetisînim, bêhnçikandî bikim. Herweha ez naxwazim pirsgirêkê weke

rewşa xwe ya ‘mehkûmiyeta’ bi jidayikbûnê, bînim ziman. Ispata wê ev e: bi awayekî helbest nivîsandin gera li azadiyê ye, dîsa jî ji bilî çend hevokên ji bo bîranîna Prometheus, min hîç nivîsîna helbestê neceriband. Ew jî tê zanîn ji bilî îmaj û pêjnekê wêdetir maneyek xwe nîne. Lê belê ma kes dikare ji nedîtî ve bê ku ez bi awayekî dijwar li maneya azadiyê geriyame û daye ser şopa wê?

Dema ku em azadiya civakî dikin pirsgirêk, me ev destpêka kurt pêşkêş kir da ku em der barê kûrahiya mijarê de hişyar bikin. Me civak weke xwezaya zêdebûna mejiyê wê herî pêşketî pênase kiribû û ev yek ê der barê analîzkirina azadiyê de rohnîker be. Qadên mejî yên zêde pêşketî, qadên ji azadiyê re nazik in. Çi civakê xwe weke hêza mejî, çand û aqil zêde xurt kiribe, wê ewqasî xwe ji azadiyê re amade kiriye. Gotineke bi vî rengî di cih de ye. Dîsa civakekê xwe ji mejî, aqil û nirxên çandî çiqasî mehrûm kiribe yan jî mehrûm hatibe hiştin, ewqasî di nava koletiyê de ye. Ev jî vegotineke rast û di cih de ye.

Ez dema ku li ser mijara qebîleya Ibraniyan diponijim, timî du xisletên wan ên bingehîn di hişê min de dimînin. Ya pêşî, mehareta wan a di mijara pereyan de ye. Hukimraniya pereyan timî di destê xwe de digirin. Bi awayekî hosteyane dizanin ku bi vê dikarin dinyayê bi xwe ve girê bidin, heta hem di warê teorîk hem jî pratîk de baş bi vê yekê dizanin. Em dikarin ji vê re bibêjin, hukimraniya dinya maddî. Bi ya min a girîng a duyemîn e, ango hunerê hukimraniya manewî baş bi cih tînin. Cihûyan pêşî pêxember, paşê jî nivîskar, di modernîteya kapîtalîst de jî her cure fîlozof, zanyar, hunermend û jinên xwe hema hema hukimraniyeke çandî ya manewî bi dîrokê re hemsal damezrandine. Ji lewra gelekî di cih de ye ku mirov bibêje, bi qasî qebîleya Ibranî ti qebîle dewlemend û azad nîne. Eger em çend mînakan der barê serdema me de bidin, wê vê rastiyê bi zêdeyî piştrast bike. Bi giranî hêza hukimdarên rastî yên kapîtala fînansê yên hukim li ekonomiya global dikin bi koka xwe Ibranî ne, ango Cihû ne. Eger mirov di qada entelektuelî de çend navên Cihû bijimêre dikare van mînakan bide; di derketina felsefeya hemdem de Spînoza, di sosyolojiyê de Marks, di psîkolojiyê de Freud, di zanista fizîkê de Einstein. Eger em bi

sedan teorîsyenên polîtîka, zanist û hunerê li van zêde bikin, bawer dikim ku wê der barê hêza entelektuel a Cihû de, fikrekê bide. Ma mirov hukimraniya Cihûyan a di cîhana entelektuel de dikare înkar bike?

Lê belê li rûyê din ê madalyonê 'yên din' ên dinyayê hene. Dewlemendiya maddî û manewî, hukimranî û hêza aliyêkî di berdêla xizanî, bêhêzî û kerîbûna yên din de pêk tê. Ji lewra gotina navdar a Marks ji bo proleteryayê gotibû ji bo Cihûyan jî di cih de ye. Marks weha gotibû "Eger proleterya dixwaze xwe azad bike (bi gotineke din rizgar bike), ji bilî azadkirina tevahiya civakê çareyeke wî ya din nîne." Tu dibêjî qey Marks li ser Cihûyan fikiriye û ev gotina xwe kiriye. Eger Cihû dixwazin ji azadiya xwe ango hêza xwe ya mane, dewlemendî û mejî piştrast bin, divê civaka dinyayê jî bi heman rengî dewlemend bikin û ji aliyê manewî ve hêzê bidinê, wekî din ti rêya wan nîne. Naxwe her tim dibe ku Hîtlerên nû li ser serê wan peyda bibin. Di vê çarçoveyê de, mirov rizgariya Cihûyan ango azadiya wan, tenê bi rizgariya civaka dinyayê û azadiya wê di zikhev de bifikire, rizgariya Cihûyan, ango azadiya wan mumkîn e. Ji bo Cihûyên ku ji mirovatiyê re gelek tişt bi ser xistine, ev wezîfeya herî bi anor û rûmet e, divê kes ji vê gumanê neke. Ji qirkirina xeternak a Cihûyan jî em dikarin fêhm bikin ku rûmeta manewî û dewlemendiya li ser cehalet û xizaniya yên din avabûyî, nirxeke xwe ya rastî ya azadiyê nîne. Maneya rastî ya azadiyê ku em dixwazin, ji cihêkirina em û yê din dibihure û xisleta wê ya ji aliyê her kesî ve bê parvekirin heye.

Em wexta sîstema şaristaniya navendî li ser bingehê azadiyê lêbikolin û binirxînin, em ê bibînin ku her diçe bi koletiyeke qatbiqatî tê barkirin. Koletî li ser sê qatan bi hêz û qehîm tê avakirin: Pêşî koletiya îdeolojîk tê avakirin. Di mîtolojiyan de xwedayên hukimran û xeternak têne avakirin, nexasim jî di civaka Sumer de ev yek balkêş e, û tê fêhmkirin. Qatê jor ê Zîggûratê weke mekanê xwedayên hukim li zêhnan dikin tê tesewirkirin. Qatê navîn biryargeha rêveberiya polîtîk a rahiban e. Qatê herî jêr jî weke qatê xebatkarên cotkarî û zenaetkariyê yên dibezînin her suxreyê, amade kirine. Ev model heta roja me ya îro jî bi xwe neguheriye, bi tenê bi awayekî berfireh şax berdaye û belav bûye. Bi vî awayî hûnandina çîroka

pênc hezar salî ya sîstema şaristaniya navendî, hûnandina dîrokê ya herî nêzî rastiyê ye. Ya rastî, ev rastiyek e ku weke ampîrîk çavdêriya wê tê kirin. Jihevderxistina zîggûratê, jihevderxistina sîstema şaristaniya navendî ye; ango bi vî awayî sîstema dinyayê ya kapîtalîst a roja me ya îro li ser bingeha wê ya rastî tê danîn û ji hev tê derxistin. Bi awayekî kumulatîf misêwa pêşketina sermaye û desthilatdariyê rûyekî madalyonê ye, li rûyê din jî koletî, kerîbûn, birçîtî û feqîriyeke xeternak heye.

Em hê baştir fêhm dikin ka pirsgirêka azadiyê çawa kûr dibe. Sîstematîka şaristaniya navendî, heta civakê gav bi gav ji azadiyê mehrûm neke û negihîne asta civaka bûye kerî, nikare xwe dewam bike, nikare hebûna xwe biparêze. Di mentiqê sîstemê de çareserî, zêdetir pêkanîna amûrên sermaye û desthilatdariyê ye. Ev jî zêdetir feqîrî û kerîbûn e. Ji ber dualîteya di xwezaya sîstemê de pirsgirêka azadiyê evçend mezin bûye û bûye pirsgirêka bingehîn a her serdemê. Me bê sedem qebîleya Cihûyan weke mînak nîşan neda. Mirov gelekî dikare jê hîn bibe. Tevahiya serdeman ji girîngiya xwe tiştek ji dest nedaye, ji lewra mirov dikare azadiyê jî koletiyê jî bi Cihûtiyê bixwîne.

Guftûgoyeke ji rêûresmê heye; gelo zêdetir pere yan jî serwextbûn azadiyê pêk tîne. Di çarçoveya vê vegotina me de mirov dikare baştir li vê guftûgoyê serwext bibe. Pere heta weke amûrekî daneheva sermayeyê ango bi rola desteserkerê berhem û nirxê zêde rabe, wê timî amûrekî koletiyê be. Ji ber ku pere ji bo xwediyê xwe jî bang li tevkujiyan dike di warê azadiyê de amûreke bawerî pê nabe û kes nikare pişta xwe pê girê bide. Pere bi rola perçikê maddeyê yê dijberê enerjiyê ye, radibe. Mirov dikare bibêje, serwextbûn her tim zêdetir nêzî azadiyê ye. Serwextbûn li rastiyê, her tim pêşiyê li azadiyê vedike. Ji ber vê yekê ye ku serwextbûn her weke herikîna enerjiyê tê pênasekirin.

Eger mirov azadiyê weke pirrbûn, cihêwazbûn û pirrcurebûna di gerdûnê de bide naskirin, wê di diyarkirina exlaqê civakî de jî ravekirinê hêsan bike. Hebûneke di hinavê xwe de zimnî be jî pirrbûn, cudabûn û pirrcuretiyê hilgire, jêhatbûna hebûneke bi aqil a dikare hilbijêre tîne bîra mirov. Lêkolînên zanistî piştrast dikin ku aqlekî nebatan ber bi pirrcuretî û

cihêrengiyê ve dibe, heye. Pêkhatinên di şaneyeke zindî de, heta niha ti fabrîkeyeke bi destê mirovî çêbûyî nikarîbû pêk bîne. Belkî bi qasî Hegel em nikarin behsa mejiyê gerdûnê (Geist) bikin. Lê dîsa jî mirov behsa tiştekî mîna mejiyê di gerdûnê de bike divê bi temamî weke tiştekî tewş neyê dîtin. Ji bilî mejiyê hebûnê, em cihêwazbûnê nikarin bi vegotineke din bînin ziman. Pirrbûn û pirrcuretî timî azadiyê bi bîra mirov dixin û dibe ku ev jî ji çipîskên ji mejiyê hebûnê diçin e. Bi qasî ku tê zanîn, mirov dikare insên weke hebûna herî bi aqil a gerdûnê bide nasîn. Baş e, mirov ev mejî û aqilê xwe çawa girtiye? Ji aliyê zanistî ve jî (fizîkî, biyolojîk, psîkolojîk û sosyolojîk) min mirov weke xulaseyeke gerdûnê dabû naskirin. Di vê danasînê de mirov weke kombûneke aqilê gerdûnî tê pênasekirin. Ji lewra di gelek ekolên felsefîk de jî mirov weke makêteke gerdûnê hatiye pêşkêşkirin.

Asta mejî û nermbûna wî di civaka mirov de bingehê rastî yê avakirina civakî pêk tîne. Di vê çarçoveyê de mirov azadiyê weke hêza avakirina civakî bide nasîn, di cih de ye. Em dizanin ku ji komên mirov ên pêşî û vir ve ji vê re helwesta exlaqî hatiye gotin. Hingê exlaqê civakî bi tenê bi azadiyê pêkan e. Ya rastî, azadî çavkaniya exlaq e. Em dikarin exlaq weke rewşa azadiyê ya hişk, rêûersma wê yan jî rêzika wê bi nav bikin. Eger hilbijartina exlaqî çavkaniya xwe azadî be, û mirov têkiliya azadiyê bi mejî, serwextbûn û aqil re li ber çav bigire, mirov dikare exlaq weke serwextbûna kolektîf a civakê (wijdan) destnîşan bike û ev jî tê fêhmkirin. Di vê çarçoveyê de ji exlaqê teorîk re gotina etîk, bi vî awayî dikare maneyeke xwe hebe. Ji bilî bingehê exlaqî yê civakê, em nikarin behsa etîkekê bikin. Bêguman ji ezmûnên exlaqî mirov dikare felsefeyeke hê bi tesîrtir a exlaqî ango etîkê derxîne. Lê etîka lihevçêkirî nabe. Tê zanîn di vê mijarê de jî E. Kant gelekî hewl daye. Mirov dikare fêhm bike ka Kant çima ji aqlê pratîk re etîk gotiye. Di heman demê de exlaq weke hilbijartineke azadiyê û îmkana wê şîrove kiriye, ev fikra wî jî ji bo roja me ya îro hê di cih de ye.

Têkiliya azadiyê bi polîtîkaya civakî re, rewşeke xuya ye. Qada polîtîk ew qad e ku herî zêde aqilên pêşbîn li ser wê pevdiçin û hewl didin encamê

bigirin. Bi awayekî din, mirov dikare wê weke qada ku têde kirdarên beşdar xwe bi rêya hunerê polîtîk azad bikin, bide naskirin. Her civaka nikare polîtîka civakî pêşde bibe, divê baş zanibe ku berdêla vê yekê bêparmayîna ji azadiyê ye û fatûra vê wê li wê were birrîn. Mezinahiya hunerê polîtîkayê bi vî awayî derdikeve pêşiya me. Her civaka (klan, qebîle, qewm, newete, çîn û heta amûrên dewlet û desthilatdariyê) nikaribe polîtîkaya xwe pêşde bibe mehkûmê têkçûnê ye. Jixwe pêşdenebirina polîtîkayê tê maneya nasnekirina wijdanê xwe, berjewendiyên xwe yên heyatî û nasnameya xwe. Ji bo civakekê ji vê têkçûn û ketinê xedartir têkçûn û ketin nîne. Ji bo civakên bi vî rengî, bi tenê dema ji bo wijdanê xwe yê kolektîf, nasname û berjwendiyên xwe rabûn ser piyan, bi gotineke din wexta ketin nava têkoşîna polîtîkayê, xwesteka azadiyê mewzûbehs e. Xwestekên azadiyê yên bêyî polîtîka, xwexapandineke bi tehlûke ye.

Ji bo têkiliya azadî û polîtîkayê neyê berevajîkirin, cudahiya wê ya bi polîtîkayên (mirov bibêje bêpolîtîkatî rastir e) desthilatdarî û dewletê re bi nazenînî û bi baldarî were xêzkirin. Amûrên desthilatdarî û dewletê, ji bo karê xwe dikarin xwedî taktîk û stratejî bin, lê bi maneyeke rastî polîtîkayên wan çênabin. Jixwe desthilatdarî û dewlet bi xwe kengî înkara polîtîkayên civakî pêkanîn, di wê qonaxê de bi gewde dibin. Li nuqteya polîtîka diqede, avahiyên desthilatdarî û dewletê dikevin dewreyê. Desthilatdarî û dewlet têne maneya cihê gotina polîtîk diqede ango azadî bi dawî dibe. Li wê nuqteyê bi tenê îdarekirin, guhdarîkirin, ferman dayîn û ferman girtin heye; qanûn û rêzikname hene. Her desthilatdarî û dewlet aqlekî hişkbûyî, qeşagirtî ye. Hêza xwe jî bêhêziya xwe jî ji vê xisleta xwe digirin. Naxwe qadên desthilatdarî û dewletê nabin qadên mirov lê li azadiyê bigire, azadiyê bi dest bixe. Hegel, dewlet weke qada rastî ya azadî lê pêk tê pêşkêş kir û ev jî bingehê tevahî avahî û fikrên tehekumkar ên modernîteyê pêk tîne. Ma ne faşîzma Hîtler di vî warî de mînakeke sereke ye, nîşan dide ev fikir dikare rê li ber çi veke. Heta têgihiştina sosyalîzma zanistî ya Marks û Engels pêşengiya wê kirin, desthilatdarî û dewlet weke amûrên bingehîn ên avakirina sosyalîzmê dîtin û bêyî haya wan jê hebe, bi

vî awayî derba herî xedar li azadiyê ango li wekheviyê dan. 'Çiqas dewlet ewqas hindik azadî' haya lîberalan zêdetir ji vê gotinê heye. Sedema serketina wan jî ev pêşbîniya wan e.

Desthilatdarî û dewlet weke amûrên tehekumkariyê, li gorî naverok û cewherê xwe, ji bilî nirx û berhemên zêde yên desteserkirî ango ji cureyekî cuda yê sermayeya komkirî, ti maneyeke xwe ya din nîne. Sermaye dewletdar dike, dewletdarî jî sermayedar dike. Heman xusûs ji bo her cure amûrên desthilatdariyê di cih de ne. Qada polîtîk a civakî çiqasî rê li azadiyê veke, qadên desthlatdarî û dewletê jî ewqasî azadiyê diqedînin. Belkî avahiyên desthilatdarî û dewletê gelek kesan, koman û neteweyan bêtir dewlemend û azad bikin. Lê me di mînaka Cihûyan de dît ku ev bi tenê di berdêla kolekirin û xizankirina civakên din de pêkan e; dawiya vê jî ji şeran heta qirkirinan her cure hilweşandin û kavilkirin e. Di sîstema dinya kapîtalîst de zirar û ziyana herî mezin li Polîtîkayê bûye. Di tevahiya dîrokê de mirov dikare di vê qonaxê de ku asta herî bilind a sîstema şaristaniya navendî ye, behsa mirina bi rastî ya polîtîkayê bike. Ji lewra bi qasî ku mirov nikaribe bi ti serdeman re bide berhev di serdema roja me ya îro de qedandina polîtîkayê pêk tê. Çawa ku qedandina exlaqî weke qadeke azadiyê fenomeke roja me ya îro ye, ji wê gelekî zêdetir qedandina qada polîtîk di rojevê de ye. Ji lewra eger em azadiyê dixwazin, divê pêşî em weke wijdanê kolektîf ê civakê exlaq û weke aqlê hevpar polîtîkayê, ji hemû aliyan ve û bi hêza xwe hemûyî ji nû ve rakin ser piyan û kêrhatî bikin, wer xuya dike ku ji bilî vê jî ti çareya me nîne.

Têkiliyên di navbera azadî û demokrasiyê de hê zêdetir tevlîhev in. Kîjan çavkaniya kîjanê ye, ev nuqte her cihê guftûgoyê ye. Lê bi hêsanî em dikarin bibêjin, têkiliya zêde ya herduyan hevdu xwedî dikin. Bi qasî ku em bi azadiyê ve girêdayî li polîtîkaya civakî difikirin, em dikarin ewqasî jî bi demokrasiyê ve girê bidin. Rewşa herî berbiçav a polîtîkaya civakî, siyaseta demokratîk e. Ji lewra mirov dikare siyaseta demokratîk weke hunerê rastî yê azadbûnê pênase bike. Heta mirov siyaseta demokratîk nemeşîne, bi giştî civak, bi taybetî jî her gel û kom ne dikare polîtîk bibe, ne jî mirov dikare bi rêya polîtîk wan azad bike. Siyaseta demokratîk ji bo

hînbûna azadiyê û bi cihanîna wê, dibistana rastî ye. Karûbarên polîtîk çiqasî kirdarên demokratîk biafirînin, siyaseta demokratîk jî civaqê ewqasî polîtîk dike ango azad dike. Eger em polîtîkbûnê weke şêweyê sereke yê azadbûnê qebûl bikin, divê em baş zanibin ku em her civakê çiqasî polîtîk bikin, em ê ewqasî jî karibin azad bikin, berevajiyê wê jî em civakê çiqasî azad bikin, em ê zêdetir jî wê polîtîk bikin. Bêguman di serî de çavkaniyên îdeolojîk, gelek qadên civakî hene ku azadî û polîtîkayê xwedî dikin. Lê bi awayekî bingehîn ên hevdu xwedî dikin û derdixin holê weke du çavkaniyên bingehîn azadî û polîtîka civakî ye.

Bi pirranî têkiliya wekhevî û azadiyê tê tevlîhevkirin. Lê ya rastî, bi qasî têkiliyên wê yên bi demokrasiyê re têkiliyên di navbera herduyan de tevlîhev û bi pirsgirêk in. Em carinan dibînin ku dema azadî berdêlê dide wekheviyeke tam pêk tê. Gelek caran tê destnîşankirin ku herdu bi hev re nabin, yek divê tawîzê bide. Herweha tê diyarkirin ku azadî jî weke berdêl, divê carnan ji wekheviyê tawîzê bide.

Eşkerekirina cudahiya di navbera herdu têgînan ango xwezaya herdu fenomenan de ji bo rast diyarkirina pirsgirêkê hewce dike. Têgîna wekheviyê zêdetir bêjeyeke huqûqî ye. Bêyî ku cudahiyê bixe navbera ferd û koman, parvekirina heman heqî ferz dike. Lê cudahî û cihêwazî bi qasî gerdûnê xisleteke bingehîn a civakê ye. Cudatî têgîneke welê ye, li parvekirina heq a heman cureyî girtî ye. Wekhevî kengî cudahiyan esas bigire, dikare manedar bibe. Yek ji sedemên herî girîng ên serneketina têgihiştina wekheviyê ya sosyalîzmê ew bû, hesabê cudatiyê nekir, nedît. Ev jî yek ji sedemên girîng bû ku dawiya wê anî. Dadeke rastî, kengî bi têgihiştineke wekheviyê ya cudatiyan bike bingeh rabe dikare pêk bê.

Em wexta tespît dikin ku azadî bi têgîna cudabûnê ve gelekî girêdayî ye, kengî wekhevî bi cudabûnê ve were girêdan, dikare girêdaneke manedar bi azadiyê re pêk bê. Pevgirêdana azadî û wekheviyê, yek ji hedefên bingehîn ê polîtîkaya civakî ye.

Nabe ku li vir em behsa guftûgoya di navbera têgîna azadiya ferdî û kolektîf de nekin. Hewl tê dayîn ku van herdu kategoriyan weke azadiya negatîf û ya pozîtîv jî bidin naskirin. Ji lewra danasîna têkiliya di navbera

van herdu kategoriyan de hê jî girîng e. Modernîteya kapîtalîst a azadiya ferdî (azadiya negatîf) rakir pêdarê, bêguman ev yek di berdêla zirardaneke mezin a kolektîvîzma civakê de pêk anî. Gelekî girîng e ku mirov tespît bike, azadiya ferdî ya roja me ya îro polîtîkaya civakî herî kêm bi qasî diyardeya desthilatdariyê diqedîne. Rohnîkirina rola ferdparêziyê di hilweşandina civakê de, nexasim di înkarkirina exlaq û polîtîkayê de ji bo guftûgoyên azadiyê, pirsgirêka herî girîng e.

Civaka bi ferdperestiyê hatibe atomîzekirin ti taqeta wê namîne ji bo li ber amûrên sermaye û desthilatdariyê rabe. Wexta em vê dibêjin, em baştir dikarin rîska kansêrbûna pirsgirêka civakî fêhm bikin. Eger mirov ferdperestiya civakî weke çavkaniyeke bingehîn a azadî û polîtîkaya civakî diqedîne destnîşan bike, ev yek dikare ji bo gavavêtineke manedar zemîn pêşkêş bike. Bêguman em li vir ferdîtiyê nakin mewzûbehs, em guftûgo nakin ku ferdîtî pêdiviyek e. Ya tê guftûgokirin ferdperestiya îdeolojîk e, lîberalîzm e, ev ferdparêziya tê îdealîzekirin, azadî û polîtîkaya civakî diqedîne.

Jixwe di vê rewşê de me azadiya kolektîf guftûgo kiriye. Em divê bi girîngî diyar bikin ku ji bo pêkhatina azadiya bi rastî bi qasî ferdîtiyê, pêwîst e ku her cure kom (qebîle, qewm, netewe, çîn, pîşe û hwd.) nasnameya xwe diyar bike, berjewendiyên xwe tedarik bike û xwedî li ewlekariya xwe derkeve. Hingê li ser van hîman em dikarin behsa azadiyên ferdî û kolektîf ên di nava ahengekê de xwe gihandibin nîzama civakeke azad a omptîmal bikin. Herçiqasî weke qutbên dijber hatibin pênasekirin jî di navbera azadiyên lîberalîzmê bi maneya ferdparêziyê rakirin pêdarê û azadiyên sosyalîzma pêkhatî bi navê kolektîvîzmê rakirin pêdarê de wekheviyeke xurt heye û ev yek jî bi ceribandina sedsala 20. derketiye holê. Herdu jî ji aliyê lîberalîzmê ve weke alternatîf hatine danîn. Wexta ku em bibêjin dekûdolaba dewletgirî û taybetîkirinê bi heman destî tê gerandin, hingî xusûsa em dixwazin rave bikin jî wê baştir bê fêhmkirin.

Piştî sedsala 20. zirar û ziyana mezin a ferdperestî (lîberalîzma hov) û modelên kolektîvîzmê (sosyalîzma firewnî) yên hatin ceribandin derketin holê, pirr baş eşkere bûye ku civaka demokratîk ji bo lihevanîna azadiyên

ferdî û yên kolektîf zemînê herî çê pêşkêş dike. Em dikarin diyar bikin ku civaka demokratîk bi qasî ku balansa azadiyên ferdî û kolektîf pêk tîne, bi têgihiştineke wekheviyê, cudahiyan esas digire dibîne, û mirov dikare bibêje, di pêkanîna vê têgihiştinê de jî rejîma polîtîk civakî ya herî di cih de ye.

# 6- HÊZA AQLÊ CIVAKÎ

Mirov heta li hêz û têkiliya asta mejiyê cinsê mirov bi pêvajoyên civakî yên xweser re serwext nebe, nikare ti derfet û îmkana der barê çareseriya pirsgirêkên civakê de bi awayekî heq dike binirxîne. Weke cins di qonaxa mirovbûnê de pîvana potansiyela asta mejiyê wî, li gorî destpêkê dibe ku mijareke spekulatîf be; ev dikare mumkîn jî nebe. Lê derketiye holê ku em bi mejiyekî pirr cuda re rûbirû ne, ev yek jî bi diyardeya şer a di dîroka mirovatiyê de ku di şertên me yên îro de dewrûber bi temamî aniye ber tinekirinê, diyar bûye. Bi tenê bi analîzên çînî, bi rêçeteyên ekonomîk, bi tedbîrên polîtîk, bi danehevên herî zêde yên desthilatdarî û dewletê pêşî li hilweşîna civakî û ekolojîk nayê girtin, ev hatiye fêhmkirin û heta mirov dikare bibêje, hema hatiye ispatkirin. Eşkere ye ku divê mirov hûrûkûr li ser pirsgirêkê rawest e.

Bêguman, tevahiya serdeman li ser hêza aqil timî hatiye rawestîn. Ez pirr tiştekî nû nabêjim. Ez bi tenê dixwazim bibêjim, ji her demê girîngtir bûye ku balê bikişînim ser aliyekî cuda yê aqil. Têkiliya aqil bi civakê re eşkere ye. Her çavdêrekî dîrokî yê ji rêzê jî dikare bibîne, civak pêş nekeve aqil jî pêş nakeve. Bi awayekî bingehîn a divê em lê serwext bibin ew e, hebûna civakî di kîjan şert û mercan de aqil rewa dibîne. Modernîteya kapîtalîst, nexasim jî serweriya sermayeya fînansa global a dema nêz bi rêya 'aqlê sembolî' pirr zêde kar kir û bi vî awayî rê li ber hilweşîna civak û hawîrdorê vekir. Bi ti şertê rewakirinê yê civakî ravekirina vê nabe, nayê fêhmkirin. Ya rastî, ti şêweyê civaka bi exlaq, bi azadî û bi polîtîka nikare derba 'aqlê sembolî' erê bike. Baş e, bendên rewakirinê yên civakî çawa, ji aliyê kê ve, bi kîjan zêhniyet û amûran ve hat perçeperçekirin? Li dijî hêza hilweşandina aqil, rola avakirin, tamîrkirin û têkûzîkirinê ya kê ye? Ji bo bi cihanîna vê rolê ji pêşdebirina kîjan rêzikên zêhniyetê û amûran berpirsiyar in? Ev pirs heyatî ne, û ji sedî sed divê bersiva wan were dayîn.

Wallerstein bi girîngî li ser dema derketina nîzama jê re sîstema dinyayê ya kapîtalîst dibêje sekiniye û ez jî girîngiyê bi vê hewldana wî didim. Herweha Fernand Braudel jî li ser mijarê analîzên hûrûkûr kirine û ez van hewldanên wî jî weke xebatên pêşiya mirov rohnî dikin, dibînim. Samîr Amîn jî di çarçoveya hilweşîna şaristaniyên Îslamî yên Rojhilata Navîn de li ser mijarê rawestiyaye, û analîzên wî yên li ser kapîtalîzmê mirov dikare hinekî jê hîn bibe. Gelek fikirdar bi nazikî nêzî mijarê dibin. Encamên hevpar ên gihiştinê hemû li dora qelsbûna rêûresma dewletê ya Ewrûpayê, jihevdeketina dêrê, tarûmarkirina şaristaniya Îslamê ji aliyê Cengiz Xanê Moxolî ve dizîvire. Kapîtalîzmê dişibînin şêrê di qefesê de û dibêjin; di van şert û mercan de şêr keysa xwe li deriyê vekirî aniye û pêşde çûye, pêşî li Ewrûpaya Rojava serdest bûye; paşê li gorî rêzê tevahiya Ewrûpayê, Bakurê Emerîkayê û ber bi roja me ya îro ve êrişa xwe li tevahiya dinyayê bi awayekî serketî temam kiriye. Hêza berê di qefesê de hatibû girtin bûye hukimran, hukimranên berê jî xistine qefesê. Civakê bi destê Levîathan dixin qefesê û vê yekê bi awayekî îstîare û metafor tînin ziman. Bi gotina navdar a Max Weber, burokrasiya modernîteya kapîtalîst civakê dixe qefesa hesinî. Civaknasên navdar hemû, pirr eşkere nebe jî, hinekî jî bi psîkolojiya gunehkariyê, bi tirsonekî û pistepistê hewl didin dîmenê civakî yê xeternak bînin ziman û ev dîmen bi vî awayî tê pêşkêşkirin.

Ez bi xwe bi awayekî berfirehtir û bi sîstema şaristaniya navendî ve girêdayî li pirsgirêkê dinêrim. Heta, ez difikirim ku divê pirsgirêk hinekî jî bi dîroka pêşketina aqlê analîtîk ê sembolî ve were girêdan. Gava ku aqlê analîtîk di sîstema şaristaniya navendî de avêtiye, bêguman gelekî mezin e. Bi tenê bi tevahî avahiyên şaristaniyan dikarin bandoreke bi vî rengî bikin. Hêmaneke din a girîng ew e, aqlê mirov rengê sembolî digire û bi vî awayî qabîliyeta çareseriya analîtîk jê tê. Bi vî şêweyî destnîşankirina rewşa aqil bi qasî hêmana şaristaniyê girîng e. Ji ber ku aqilê analîtîk derî li hêmana şaristaniyê vekiriye.

Heta bi mirovî, zindî û ruhber hemû bi prensîbên aqil ên xwe şaş nakin, dixebitin. Ev şêwazê aqil ê em dikarin jê re bibêjin xwezayî yan jî hisî li

gorî xerîze û ajoyên hundirîn e. Bi tesîrbûn bi reaksiyonên ji nişkê ve tê karekterîzekirin. Di vê mijarê de mirov dikare gelekî ji tesîr-reaksiyona li cem nebat û heywanan hîn bibe. Jiyana wan a ji zêdebûn, parastin û xwedîkirinê pêk tê, bi şêweyê ji aqlê xerîzeyî pirr hînbûn e, dimeşînin. Îhtîmala şaşiyê bi qasî mirov bibêje nîne, kêm e. Ez hez dikim ku mijarê bibim ser hebûnên bêcan jî. Mînak em hêza dinya me ya kişandinê weke aqlekî xerîzeyî yê hundirîn tesewir bikin (ez bi xwe xwediyê fikreke bi vî rengî me), her obje, heta her zerre wê li gorî rêjeya hêza bandora kişandin û dahfdanê bijî. Ji tesîrê rev gelekî bi sînor e. Lê dibe ku rev bi hêza rohnî û tîrêjê ji bandor û tesîrê mumkîn bibe. Di vê çarçoveyê de felsefeyên gerdûnê bêpîvan û beredayî dihesibînin zêde min têr nakin. Fikra ku dibêje gerdûn bi mejiyekî diyar tevdigere, fikreke hêja ye ku mirov têra xwe hûrûkûr li ser bisekine.

Mejiyê mirov seyr e, ji ber ku jê tê mejiyê vê gerdûnê binpê bike. Belkî weke me di mînaka rohnî û tîrêjê de jî dît, ev şêweyê mejî (mejiyê analîtîk) ji bo mirov weke serdestiyekê were şîrovekirin. Lê bi giraniya şêwazê aqil ê gerdûnê re nakok e, em ê vê çawa şîrove bikin? Belkî 'teorema kaosê' hinekî mijarê zelal bike. Çawa ku tê zanîn, di teoriya koasê de, di nava bênîzamiya mezin de li nîzamê tê gerîn. Nîzam bêkaos mumkîn nîne. Mirov aliyên rast û mafdar ên di vê nêzîkatiyê de nikare înkar bike. Lê li vir pirsgirêk ew e, jiyana mirov a di bin bandora kaosa civakî de (pêxîrtengî, krîz jî di navê de), di çiqas demê û mekanekî çawa de dikare dewam bike. Ji ber ku mekan û dema xweragirtinê ya civakê li pêvajoyên kaotîk bi sînor e. Gelekî dirêjbûna demê û zêde zirardayîna mekan (hawîrdora ekolojîk) bi hêsanî dikare dawî li civakan bîne. Di dîrokê de em dibînin gelek civak ketine vê rewşê. Em dizanin ku komên destpêkê yên mirov tevahiya 'dema dirêj' ya (ev dem ji sedî 98'ê jiyana mirov digire) hebûna xwe di nava rewşa kaotîk de bûn. Dema di bin nîzamên neolîtîk û şaristaniyan de derbasbûyî bi tevahî ji sedî diduyê giştî jî kêmtir e. Bi kurtî, belkî jî dirêjbûna demê bi tevahî jiyanê bi dawî nake. Lê vê carê tehlûke cuda ye. Di navbera pêvajoya kaotîk a beriya şaristaniyê û piştî wê de cudahiyeke diyar heye. Şaristaniyê hawîrdor ne tenê ji bo civaka mirov, ji bo tevahiya

bi can û zindiyan gihandiye sînorên tehlûkeyê. Ya ji vê jî xirabtir, desthlatdarî û sermayeya di hinavê civakê de her saet bi şêwazê kansêrê (zêde mezinbûna bajaran, çînên navîn, bêkarî, milletperestî, cinsperestî û zêdebûna şêniyan a pêşî lê nayê girtin) belav dibe. Ev şêwazê kansêrê bi awayê halîhazir jî belavbûn û mezinbûna xwe dewam bike, mirovatî wê xweziya xwe bi dema beriya şaristaniyê bîne. Pêvajoyên kaotîk ên bi kansêrê tên, ji nîzamên nû zêdetir, bi mirina civakê bi encam dibin. Em gotinên zêde mezin nakin û hukmên nepixandî nadin. Mirovên bi berpirsiyarî radibin, mirovên zanyar her roj di vê mijarê de hukmên hê girantir didin.

Mirov dikare bipirse ka çi têkiliya aqilê analîtîk bi pêşketina kansêrolojiya civakî re heye. Hingê divê em aqil hê zêdetir ji nêz ve nas bikin. Aqlê sembolîk bi roleke pêşeng rabûye. Em vê rewşê herî baş ji zimanê îşaretan (di vî zimanî de tevgerên bedenî zêdetir in) derbasbûna zimanê sembolîk dibînin. Êdî li şûna tevgerên bedenî, li ser hin awazên deng ên lihevkirî (bi yên têne îşaretkirin têkiliyeke fizîkî û biyolojîk nîne) dikarin têkiliyên manegir deynin. Mînak em bi gotina 'çav' dakevin: yên li ser vê gotinê li hev kirine, tevî ku ti têkiliya xwe ya fizîkî bi sewta 'çav' re nîne, wexta wê dibihîse pêjna 'çav' di hişê wî de zindî û geş dibe. Damezrîn û sazbûna zimanê sembolîk welê ye. Xebatên antropolojîk herçiqasî destpêka vî zimanî bibin bi komên Homo Sapiens ên pêla dawî ya koçberiya bi kokên xwe ji Efrîkaya Rojhilat ve girê bidin jî hemfikir in ku vî zimanî bend û sukrên bingehîn ên li pêşiya xwe li cografya Rojhilata Navîn rakirine. Nemaze komên ziman ên Semîtîk û Aryen vê tezê piştrast dikin.

Pêkhatina zimanê sembolîk li ser fikrê bandoreke gelekî mezin kiriye. Ji zimanê bedenî rizgarbûn û bi peyvan fikirîn, belkî ji şoreşên herî mezin ên zêhnî be, belkî jî ya pêşî be. Ev yek dihêle ku ji aliyekî ve cinsê mirov bi lez ji cîhana heywanan qut bibe, ji aliyê din ve jî dike ku civak li dora damezrînên zimanê sembolîk bi lez komik bi komik pêk bên. Ji ber ku yên bi heman nîzamê deng dipeyivin, her diçe cihêwaz dibin, hem jî bi hêza mejî ya bi destxistine, yekîtiya xwe pêşde dibin. Êdî zimanên sembolîk civakan bi nasname dikin. Şoreşa neolîtîk bi awayekî girîng bi saya vî

zimanî pêk hatiye. Zehmet bû ku bi zimanê îşaretan bigihîje vê asta şoreşê. Ji ber ku berê min gelekî qal kiribû çawa derbasî qonaxa şaristaniyê bû, ez ê dubare nekim. Lê divê mirov ji bîr neke û baş zanibe ku sîstema qûntara çiyayên Toros-Zagrosê ya jê re 'Kevana Bi Bereket' tê gotin û newalên Mezopotamyayê di pêşketinê de bi rola dergûşa sereke rabûne.

Yên hatin gotin bandora erênî ya aqlê sembolîk radixin pêş çavan. Fikara mirov jê bike jî ew e ku veqetîna ji hawîrdorê da destpêkirin. Civakên berê civakên hawîrdorê yên xwezayî bûn. Ev civak mîna têkiliya dayik-çêlikê di himbêza xwezayê de ne. Hêza fikra sembolîk pêdiviya bi vî şêwazê jiyanê qels kiriye. Lewra civaka nû bi zimanê xwe yê nû hawîrdorê bi nav dike ango rêya bikaranîna nû vedike. Ev rêya nû rêya hegemonya mezin li ser cîhana heywan û nebatan vedike. Şêwazên fikrê yên berî zimanê sembolîk, timî bi rêya aqlê hissî pêk dihat. Xisleta bingehîn a aqlê hisî jî ew e, bi hisên xwe difikire û ew jî bivênevê bi tesîrbûn û reaksiyonan tevdigere. Ji dil e, bê derew e, ji hîleyan dûr e. Dayikek bi zaroka xwe re ji dil e, û mirov nikare bi hêsanî mînakekê nîşan bide ku ew di vê rewşê de bi derewkerî û hîlekariyê rabe. Mejiyê di cîhana heywan û nebatan de jî bi vî awayî dixebite. Em timî dibînin, dema ku şêr xuya dike, mejiyê heywanên nêçîr yekser bi hisê xwe radibin. Li cem herduyan jî hîle nîne. Lê di zimanê sembolîk ê mirov de bi hezaran fikrên hîlekar, bi derew û ne ji dil mirov dikare bibîne. Tehlûkeya xeternak a vî şêwazê fikrê wê zirar û ziyana xwe ya mezin bi gavavêtin û ketina pêvajoya şaristaniyê re nîşan bide.

Fikra analîtîk a bi rêya zimanê sembolîk pêk tê di daneheva sermaye û desthilatdariyê de bi roleke diyarker radibe. Ev fikir berê pêşî xwe disipêre derewê, hêza xwe ya ne ji dil û hîlekar bi kar tîne û bi vî awayî di warê êsîrgirtin û mêtinkariya civakê de gelekî jêhatî bûye. Çawa ku tê zanîn, li pêşiya mejiyê mirov lobên rast û çep di warê van herdu mejiyan de fonksiyonel bûne. Loba têde fikra analîtîk pêş dikeve beşê herî dawî ye. Li ser tevahiya endamên din ên bedena mirov şopa mejiyê hisî heye. Piştî ku beşa fikra analîtîk serdestî bi dest xist, li ser tevahiya fikra şopa wê li ser bedena mirov, bi bandor dibe. Ev pêşketin her diçe tevahiya bedena mirov karekterîze dike. Ev bûyer û pêşketin bi heybet û balkêş e. Eger bi

awayekî erênî were bikaranîn dikare dinyayê ji bo cinsê mirov veguherîne ‘cihekî cejn û roşanê’ yê domdar. Lê eger bi awayekî neyênî were bi karanîn dikare ji bo pirraniyê û zindiyên hawîrdorê veguhere cehennemê. Mîna hêzeke nukleerê ye: eger enerjiya nukleerê baş were kontrolkirin dikare di xizmeta civakê de bi awayekî gelekî kêrhatî were pêşkêşkirin. Eger neyê kontrolkirin jî di mînakeke piçûk a Çernobîlê de (lê ya herî xeternak bi karanîna wê ya di şer de ye) hat dîtin, dikare rê li encamên çawa veke. Ez di aqilê analîtîk de hinekî teqîna bêkontrol a nukleerê dibînim. Ji tehlûkeyê jî wêdetir, ez yeqîn dikim ku tehlûke bi xwe ye, û her diçe bi awayekî zêde dibe, hawîrdor û civakê bi tehlûkeya nukleer re rûbirû dike. Bêyî ku pêdivî bi bombeya nukleer hebe jî bombeyên aqilê analîtîk ên di bin fermana sîstema kapîtalîst û yên di destên wê de ji niha ve civak û hawîrdor gihandine sînorê rewşeke jiyan lê nabe.

Bêguman, fikra analîtîk û zimanê sembolîk bi serê xwe neyênî nînin; bi tenê li gorî neyêniyan şert û mercan pêşkêş dikin. Bi awayekî bingehîn a ku neyêniyan bi şêweyekî zincîrwarî dide destpêkirin, pêşketina di amûrên sermaye û desthilatdariyê de ye. Sîstema daneheva sermaye û desthilatdariyê ya em weke şaristanî dikin têgîn, bi sedema karektera hebûna xwe, divê ji mejiyê hisî mehrûm be, û derewker û hîlekar be. Amûrên zordestî û mêtinkariyê li ser ewlekarî û qûtûzadên yên din ava dibin. Li gorî xwezaya jiyanê, ev amûr ê bi nerazîbûn bêne pêşwazîkirin. Dewamkirina bi tenê bi du rêyan gengaz dibe: Yan bi hêza îdeolojiyê ya bi nermî rewakirinê pêk tîne, yan jî bi hêza zora eşkere ya desthilatdariyê. Rastiyeke dîrokî ye ku kontrol bi pirranî bi van herdu rêyan tê kirin. Sermaye û desthilatdarî hebûnên welê ne ku kengî serî li hîle, derew û zorê bidin dikarin pêş bikevin. Beşa sereke ya zêhnê mirov tam di vê qonaxê de ji vê re şert û mercên di cih de pêşkêş dike. Em dikarin ji vê re bandora berevajîkirin û ji rêderxistinê jî bibêjin.

Wexta ku em bi vê paradîgmayê li dîroka şaristaniyê binêrin, em ê bibînin zêdebûna çîn, bajar û desthilatdariyan bi awayekî gelekî mezin, fikreke analîtîk pêkanîye. Di pêvajoyên şaristaniyan de çend rawestgehên mezin hene. Civakên Sumer û Misrê şaristaniyên orjînal bûn. Pêvajoyên

şaristaniyê yên di van civakan de bi salên 4000-3000 B.Z. destpêkirî îro jî bandora xwe ya bi heybet dewam dikin. Van şaristaniyan avahiyên mezin ên zêhniyeta analîtîk ava kirine. Di tevahiya dîroka şaristaniya navendî de mirov dikare zêhniyetên hatine pêşdebirin şopa wan di van şaristaniyan de bibîne. Ji matematîkê heta bi biyolojiyê, ji nivîsê heta bi felsefeyê, ji dîn heta bi hunerê, em dikarin şêweyên orjînal ên mînakên çalakiyên civakî yên ku mohra şaristaniyê li wan hemûyan, di van şaristaniyan de bi awayekî avakirî bibînin. Qonaxa Greko-Romen ev pêvajoya avakirinê hê zêdetir dewlemend kiriye û biaqiltiya di avahiya analîtîk de pêşde biriye. Piştî pêngava kurt a di Ronesansa Îslamê de, pêvajoyên Ronensans, Reform û Rohnîbûnê yên Ewrûpayê, fikra analîtîk derxistin asta herî bilind.

Di tevahiya van pêvajoyan de, di serî de şaristaniyên Çîn û Hindê, divê mirov şaristaniyên din ên li van pêvajoyan zêde kirine, li ber çavan bigire. Mirov dikare şaristaniya pênc hezar salî di çarçoveya mentiqê wê de weke girêkeke girs a ji diyalektîka jiyanê qutbûyî û mezin dibe, fena yekûna qalibên metafizîkê binirxîne. Ji mîmariyê heta bi muzîk û wêjeyê, ji fizîkê heta bi civaknasiyê, ji mîtolojiyê heta bi dîn û felsefeyê di tevahiya avahiyên huner, felsefe, dîn û zanistê de bûyer û pêşketinên gelekî mezin ên daneheva sermaye û desthilatdariyê nîşan didin, weke ku dîrok bin, em wan dixwînin. Şerên xeternak ên talanê qatê zemîn ê vê şaristaniyê ne. Aqilê li ser vî zemînî bilindbûyî û gihiştî, bi awayekî rastî bêaqiliya herî mezin e. Bi awayekî bingehîn fonksiyoneke hegemoniya îdeolojîk jî ew e ku ser vê bêaqiliyê, aqlê gunehkariyê, aqlê şer, aqlê hîle û derewê, bi kurtî ser vî aqlê daneheva sermaye û desthilatdariyê bigire, berevajî nîşan bide, pîroz û xwedayî bike. Wexta ku em bi tevahî qalibên fikra analîtîk, bawerî û hunerên bi şaristaniyê re di zikhev de pêş ketin, ji nêz ve lêbikolin, wê zehmet nebe ku mirov van rastiyên em wan rexne dikin, tespît bike.

Eger li ber rohniya van rastiyên dîrokî nebe, em ê nikaribin bi hostayî nîşan bidin ku ev cinawirê kapîtalîst (Levîathanê Hobbes) çawa ji qefesê derketiye. Ez bi girîngî destnîşan dikim ku ev cinawir bi tenê ji ber lawazî û qelsiyên sedsala 16. keys nedîtiye û ji qefesê nereviyaye.

Ji bo vê mijarê dixwazim mînaka jinê analîz bikim û bi vî awayî vî beşî bi dawî bikim. Bêguman lêkolînên femînîst hê bi pêşketinên nû ji bo rastiya jinê derkeve rûyê zemîn alîkariyeke girîng dikin. Lê ez yeqîn dikim ku ev xebatên ez behsa wan dikim bi giranî di nava şert û mercên serweriya zilam de têne meşandin. Bi zêdeyî reformîst in. Gelekî girîng e ku mirov bi qurmê mijarê dakeve û ji binî ber bi jor ve li mijarê temaşe bike.

Lêkolînên biyolojîk di nava cinsê mirov de rola jinê ya mak û kok rohnî dikin. Yê ji gewdê rastî veqetiyayî ne jin e, zilam e. Ji ber ku jin ji diyalektîka pêkhatina gerdûnê dernakeve, hestyar e. Nemaze di dema şaristaniyê de tim li qatê herî jêr hat hiştin, vê kir ku vê avahiya xwe heta roja me ya îro bîne. Aqlê zilam timî dixwaze aqlê jinê yê hisbarkirî timî weke 'kêmaqiliyê' û vê jî weke karektera wê bi xwe nîşan bide. Aqlê zilam, li ser jinê çend operasyonên mezin meşandine, dimeşîne:

Ya pêşî, ew kiriye koleya pêşî ya malê. Ev pêvajo bi tepisandin, zordestî, destavêtin, heqaret û tevkujiyên xeternak barkirî ye. Rola didin jinê ew e, ji nîzama milk re bi qasî ku tê xwestin 'dolan' bîne. Îdeolojiya xanedaniyê bi vê dolê ve gelekî girêdayî ye. Di nava vê statuyê de jin ji sedî sed milk e. Bi qasî ku nikaribe rûyê xwe nîşanî kesekî din bide, namûs û malê xwediyê xwe ye.

Ya diduyan, amûrekî seksê ye. Di tevahiya xwezayê de têkiliya cinsî ji bo zêdebûnê ye. Bi armanca dewama jiyanê ye. Li cem mirovê nêr, nexasim bi êsîrkirina jinê re, bi giranî jî di pêvajoya şaristaniyê de rola bingehîn dane seksê, xwesteka têkiliya cinsî ya sînornenas û çeloxwarîkirina pêşketina wê. Li cem heywanan demên cotbûnê gelekî bi sînor in (bi giranî salê carekê), lê li cem mirovê mêr hema hema dixwazin têkiliya cinsî derxin rojê bîstûçar saetan. Ber bi roja me ya îro ve jin êdî kirine amûreke timî her cure seks, xwesteka cinsî û desthilatdarî li ser tê ceribandin. Cihêkirina ji hev a malên taybet (mala taybet zilamek serwer) û giştî (kerxane) êdî ti maneya xwe nemaye. Ji ber ku her cih û her jin êdî jina mala giştî û taybet tê hesêb.

Ya sisiyan, kedkara bêheqdest û bêberdêl e. Karûbarên herî zehmet bi wê têne kirin. Berdêla wê, hinekî din wê neçarî 'kêmbûnê' dikin. Ewqas

piçûk hatiye xistin, bi rastî xwe li gorî mêr ‘kêm’ mayî qebûl dike, û ji lewra jî bi her çar lep û lingan xwe bi dest û serdestiya mêr ve girê dide.

Ya çaran, ew kirine metaya herî tenik. Marks ji bo pere dibêje ‘qralîçeya metayan.’ Ya rastî, ev rol zêdetir a jinê ye. Qralîçeya rastî ya metayan jin e. Têkiliyek nîne ku jin jê re neyê pêşkêşkirin. Ti qad jî nîne jin têde neyê bikaranîn. Ew jî tê de ferqek heye, herçiqas her meta berdêlekî xwe yê hatiye qebûlkirin hebe jî ji bo jinê ev berdêl ji bêşermiyeke mezin a bi navê ‘eşqê’ bigirin heta zirta mêran a dibêjin “Heqê keda dayikan nayê dayîn” bêhurmetiyeke mezin e.

Aqlê zilam ê şaristaniyê ku ew kiriye cinawir, piştî ku ev muamele ji bo jina bêyî wê natebite rewa dît, ma wê çi bi serê civaka mirov û hawîrdorê neyîne! Ev aqil bi hezar hîle, dekûdolab, derew, cinawiriya şer, çeloxwarîkirina îdeolojîk radibe ango aqlê civak û hawîrdorê xira dike, ji bilî dengê tenekeyê ti deng jê nayê, aqlê analîtîk e. Rawestandina vî aqlî, beriya her tiştî ji nû ve bi cîbicîkirina polîtîka û exlaqê civakî yê hilweşandiye mumkîn e. Ya rastî, mirov dikare bi vî awayî destpê bike. Ji ber asta aqlê analîtîk gihîştiyê di tevahiya neyêniyan de xwedî rol e, careke din li dijî sîstemên şaristaniyê girîngiya pêşdebirina sîstema şaristaniya demokratîk weke wezîfeyeke dijwar li pêşiya me radiweste.

Divê mirov qîmet û nirxeke mezin bide aqil, ev esas e. Aqlê civakî rastiyek e. Civak bi xwe ew qad e ku aqil lê tê cem hev, zêde dibe. Bêhêvîbûn ti maneya xwe nîne. Dengekî din heye ku ji tevahiya pîroziyan bilind dibe û tê, û weha dibêje “Me aqil da we, hema bi tenê di rêya şer de bi kar neyînin, di rêya xêrê de bi kar bînin. Hingê her tiştê pêdiviya we pê heye, hûn ê bi dest bixin!” Bi rastî divê em vî dengî bibihîsin û fêhm bikin. Dengê wijdan ku jê re aqlêselîm ê civakê jî tê gotin û dengê exlaqî yê civakê jî vê dibêje. Dengê dixwaze hunerê azadiyê yê jê re polîtîka civakî tê gotin were bihîstin jî heman tiştî dibêje. Xebatên civaka demokratîk pratîka vî dengî ne. Sîstema şaristaniya demokratîk teoriya vî dengî ye.

Armanca beşên ji niha û pêve wê zêdetir weha be: Daketina çavkaniyên berbiçav ên van dengan (dengên ji destdanahev a aqlê analîtîk û aqlê hisî derdikevin) û rohnîkirina rêyên çareseriyê yên ew nîşan didin.

# 7- DERKETINA PIRSGIRÊKA CIVAKÎ

Kêliyên pirsgirêkan di diyalektîka xwezayan de weke pêvajoyên di wan de danehevên çendayetiyê ji aliyê çawayetiyê ve weke ji qonaxekê xwe çipî qonaxeke din dikin têne pênasekirin. Nîzam, di teoriyên pêşketinê de weke navberên gelekî kin ên kêliyên veguherînê têne pênasekirin, di teoriyên kaosê de jî ya bingeh rewşa kaotîk e, û ji lewra nîzam û pêşketin weke kêliyên bi sînormayî têne destnîşankirin. Bi qasî fikrên kaotîka domdar, fikrên pêşveber ên domdar jî aqlê mirovî gelekî mijûl kirine. Bêguman ên aqlê mirov weke neynika nîşanker şîrove dikin hene, fikrên bingehê her aqlî di mirov de dibînin jî kêm nînin.

Zehmet nîne ku mirov di van fikran de şîroveyên gerdûngir û îzafîgiriyê bixwîne. Ji bo ez hinekî din bi awayekî berbiçav nêzî mijarên bi vî rengî bibim min hewce dît ku ez bi naveroka aqlê civakî ve dakevim û bidim naskirin. Ji lewra armanca gotara min a heta niha ew e, bi amadekariyeke asta wê ya sewextbûnê pêşketî, gav biavêjim nav çavkaniya pirsgirêka civakî.

Di tevahiya dîrokê de gavavêtinên girîng ên fikrî weke berhemên du deman diyar dibin: Demên nîzam li rêya xwe dimeşe, xweşhaliya civakî tatmînkar e, û pirsgirêkên mezin pêk nayên, ji aliyê fikrî ve jî pêşketina xwe bi heman awayî nîşan didin. Fikrên pirsgirêkên xwe kêm û pêşveber in, xweşhaliyê diyarî dikin. Mirovan ewle dikin. Gelekî behsa mayîndebûnê dikin. Pirsgirêkan weke arizî û tênûdiçin dihesibînin. Bêtir li ser Xwezaya Yekemîn radiwestin. Naxwazin xwezaya civakî bikin mijara guftûgoyê.

Demên nîzam asê dibe, dixetime û weke berê nameşe, fikir bi pirsgirêkan barkirî ne. Bêtir li ser Xwezaya Duyemîn radiwestin. Di van deman de gera li dîn û felsefeyên nû bi lez dibe. Li derketina ji nava pirsgirêkan di têgihiştina fikir, dîn û felsefeyên nû de tê gerîn.

Di dîrokê de pêngavên mezin ên fikrê di van demên bi pirsgirêk û xweşhal de pêk hatine. Mirov herikîna fikrî ya van deman dikare di tevahiya şaristaniyan de bişopîne. Em di dema xweşhaliya mezin a civaka Sumer de şahidiya derketina fikreke muhteşem a mîtolojîk dikin ku bandorê li tevahiya dînên mezin, felsefe, zanist û ekolên hunerê dike. Ti dînê mezin, têgihiştina felsefeyê, têgihiştina huner û zanistê nîne ku vê fikra Sumerê bandor lê nekiribe. Derketina fikra Yewnanistana Serdema Antîk jî bi civaka xweşhal a destpêkê re têkildar e. Li cem Sumeran cografya bi bereket a Mezopotamyayê di bingehê vê xweşhaliyê de cih digire, li Yewnanistanê jî bereketa li herdu peravên Egeyê ev yek pêkaniye. Li beramberî mîtolojiya Sumeran, li Îonyayê fikra felsefî derketiye pêş. Pêşketinên zanistî û hunerî di asta şoreşê de ne. Ewrûpaya Rojava jî wê bi xweşhaliyeke bi heman rengî gavavêtina xwe ya mezin a fikrî ji sedsala 16. ve li nava dinyayê bi tesîr bikira.

Di vir de xusûsa balê dikişîne ew e, di hersê ceribandinên xweşhaliyê de şoreşên fikrê der barê Xwezaya Yekemîn de gav avêtine. Lê kengî xweşhalî kêm dibe û pêxîr teng dibe, guftûgoyên li ser Xwezaya Duyemîn zêde dibin û fikrên nû bi lêgerînên nû barkirî dibin. Hinek fikrên bi hesreta nîzam û xweşhaliya berê barkirî timî li rabihuriyê digerin, lê yên nûtiyê dixwazin gazinan ji xirabûna nîzamê û giraniya pêxîrtengiyê dikin û fikrên utopîk pêşkêş dikin. Gelekî behsa şêweyên nû yên civakî tê kirin. Gelek civak di encama van lêgerînan de pêk tên. Ji komên mezheb û dînan bigirin heta bi derketina ezbetên nû yên qebîleyan û heta di mînaka Ewrûpayê de hat dîtin çawa netewe pêk tên. Bi vî awayî gelek şêweyên civakî pêk tên.

Dema ku em di çarçoveya dîroka fikrê de çav li dîrokê digerînin, em pirsgirêkên civakî nas dikin, lê herweha em dibînin ku pirsgirêkên civaka roja me ya îro jî weke çiyan mezinbûne û mumkîn nîne ku mirov vê mezinbûna zêde ya pirsgirêkan heta bi mejiyê hestiyê xwe his neke.

Ez hewl didim bêyî ku bi zanista civakî ya navend Ewrûpa ve girêdayî bimînim, bifikirim. Haya min jê heye ku ev şêwaz gelekî hewce ye. Hin kes dikarin vî şêwazê fikrê sivik bibînin û weke derketina ji rêya zanista civakî jî mehkûm bikin. Lê ev hukim wê ne xema min be. Bi rastî zanista civakî ya

navend Ewrûpa bêhna serweriyê jê tê. Yan serwer dike yan jî dixe bin serweriyê. Lê ya pêdiviya me pê heye, em bibin kirdarê demokratîk û bi awayekî dadiyane parve bikin. Zanista civakî ya Ewrûpayê bi xwe lîberalîzm e, ango îdeolojiyek e. Lê belê wê ev rastiya xwe ewqasî veşartiye, fikrên rexneker ên dijberên mezin jî karîbûye qebûl bike. Wexta ku ev kiriye, jê hatiye ku hêza xwe ya serdest a biserhevvekirinê, nîşan bide. Ji bo ez nebim qurban û bi ser wê ve nebim, ez dizanim ji bilî pêşdebirina cudatiya hêza analîzên xwe rê û çareyeke min a din nîne. Lê ev helwesta min antî-Ewrûpayîtî nîne. Antî-Ewrûpayîtî jî parçeyeke fikra navend Ewrûpayê ye. Ez wexta ku bi tespîta Ewrûpa li Rojhilat e, Rojhilat jî li Ewrûpayê ye, dikevim ser rê, ez dizanim kîjan nirxên me gerdûnî ne, û welê dibim xwedî helwest. Gelek nirxên Ewrûpayê yên îro nirxê me bi xwe ne, nirxên me yên pêşdebirî ne. Divê em baş zanibin ku yên xwe herî zêde antî-Ewrûpayî hesibandine, pirraniya wan bûne aliyên paşverû yên lîberalîzma Ewrûpayê. Pratîkên sosyalîzma pêkhatî û rizgariyên neteweyî bi van mînakan tijî ne.

Ceribandinên sosyalîzma zanistî yên Marks û Engels ji bo pirsigirêkên dema xwe weke çareserî pêşde birin. Ji dil ji vê yekê bawer kirin. Pirsgirêk pênase kiribûn, kapîtalîzm weke sîstem kiribûn têgîn û wexta dor hatibû çareseriyê, sîstema sosyalîst destnîşan kiribûn, baweriya wan bi van temam bû. Jixwe 'sosyalîzma zanistî' ya di bin destê wan de hat pêşdebirin, ev baweriya wan misoger dikir. Lê dîrok bi awayekî din meşiya û bi pêş de çû. Utopyagerên beriya wan jî bendewariyên xwe yên bi heman rengî hebûn. Bendewariyên Lenîn ji Şoreşa Rûsyayê bi awayekî din bûn. Hêvî û xeyalên gelek şoreşgerên Fransî şikiyan. Şoreşê gelek zarokên xwe daqurtandibûn. Kûrahiya dîrokê bi mînakên bi heman rengî tijî ye. Tevî ku çareserkerên pirsgirêkan hem gelekî bi îman bûn, hem jî gelekî bi serwextî tevdigeriyan. Naxwe di pênasekirina wan a pirsgirêkên civakî û ezmûnên wan ên çareseriyê de hinek tişt kêm û şaş hebûn ku ewqasî zêde jirêderketin û heta bûyerên berevajî qewimîn. Çawa ku em gelek caran dibêjin, mesele kêm hewldan, serhildan û şer nîne. Ev hene, belkî jî zêde hene. Rastiyên bi vî rengî min gelekî tengav dikin ku ez di warê

pênasekirina pirsgirêka civakî û mijara çareseriyê de gelekî bi îhtiyat bim. Eger em dizanin ji tecrubeyên mezin dersan bigirin û ji bîranîna qehremaniyên mezin re bi hurmet bin, her gava em biavêjin divê dersbarkirî û gelekî bi hurmet be.

## A- PÊNASEKIRINA PIRSGIRÊKA CIVAKA DÎROKÎ

Ez di du beşên pêşî yên parêznameya xwe de bi giştî desthilatdarî, bi taybetî jî li ser yekdestdariya desthilatdariya kapîtalîst hûrûkûr fikirîbûm. Herçiqasî di nava wan de gelek kêmasî hebin jî ez yeqîn dikim ku xetên sîstema şaristaniya navendî baş nîşan dane. Ya girîng ew bû, pêşkêşkirina xelekên sereke yên pêşketinê bûn. Hem mijar hatibûn pênasekirin, hem jî pêşketina zincîrwarî ya danehevên desthilatdariyê yên sermayeyê jî digirin nava xwe weke kumulatîf hatibûn pêşkêşkirin. Wexta ku min ev herdu beş nivîsîn, min berhema berhevkirî ya Andre Gunder Frank bi navê **Sîstema Dinyayê** nexwendibû. Ya min pêşkêş kir hem şêweyekî din ê veguhestina vê berhevkirinê bû, hem jî ji wê zêdetir sîstematîkeke xwe ya çareseriyê hebû ango meyla bi şaristaniya demokratîk ve girêdan hebû. Belkî ez niha binivîsim ez ê hê bi hostayî binivîsim, lê weke rêz û hurmeta ji dîrokê re weke xwe bimîne bi nirx û qîmetir e.

Mijara pirsgirêka civakî sernavekî cuda ye. Armanca xwe ne pêşkêşkirina dîroka yekdestdariya desthilatdariyê ye, ne jî guftûgokirina çareseriya demokratîk e. Ya ez dixwazim biceribînim ew e, pirsgirêka civakî di nava pêkhatina teorîk û pratîk de pêşkêş bikim. Ez yeqîn dikim ku ev yek ê alîkariya çareseriya pirsgirêkê bike. Ez nabêjim, ez heta niha li ser mijarê hîç ranewestiyam. Ji ber ku parçeparçe gelekî li ser sekinîm. Lê eger mirov bi awayekî yekpare pêşkêş bike, dibe ku mirov jê gelekî baştir hîn bibe.

Pirsa divê mirov pirsgirêka civakî çawa pênase bike, mirov difikirîne. Hin fikir hene ku feqîriya civakî, hinek jî bêdewletiyê, hineke din qelsiya eskerî, hinek jî şaşiyên polîtîk ên sîstemê, wekî din jî hinên din aboriyê û

rizîna exlaqî pirsgirêk dihesibînin. Belkî jî qadek bi tenê namîne ku pirsgirêk neyê hesibandin. Di nava van nêrînan hemûyan de dibe ku aliyên rast hebin. Lê ji nîşandana pirsgirêkê bi xwe gelekî dûr in. Bi ya min manedartir e ku mirov pirsgirêka civakî weke binpêkirina dînamîka bingehîn a civakê bide nasîn.

Civak ji civakbûnê tê derxistin, ez difikirim ku divê mirov vê bike pirsgirêka bingehîn. Di vir de xusûsa yekemîn hebûna wan nirxan e ku civakekê diyar dikin, hebûna wê ya civakî ava dikin û dihûnin. Ez behsa wê xusûsê dikim ku em jê re bi xwe, hebûn dibêjin. Duyemîn, ez behsa wan bûyeran dikim ku vê xwebûnê, hebûnê ji xwebûnbûnê derdixin, bingehê hebûnê ji naverastê radikin. Eger ev herdu xusûs di zikhev de biqewimin, wê wextê pirsgirêkeke mezin a civakî heye. Mînak, eger di dema klanan de demeke qeşabûnê tevahiya klanan ji holê rake, em ji vê re nikarin pirsgirêk bibêjin. Ji ber afet û belayên xwezayî li derveyî îrade û vîna me pêk tên. Ji bo bibin pirsgirêk divê bi destê mirov bêne afirandin. Pirsgirêka ekolojîk bi xwe jî kengî bi destê mirov pêkhatiye weke pirsgirêk hatiye pênasekirin. Naxwe em pirsgirêka bingehîn a civakî, bi hêzên civakê ji bingeh ve xira dikin, ji hev dixin girê bidin hingî em ê ber bi pênaseyeke rast ve biçin.

Ez di serê van hêzan de yekdestdariya sermaye û desthilatdariyê dibînim. Ji ber ku ev herdu hêz bi xwe weke desteserkerên berhema zêde binê hîmê civakê dikolin. Ji niha û pêve ez ê ji yekdestdariya sermaye û desthilatdariyê bi hev re yekdestdarî bibêjim. Ji bo mirov mijarê bêtir zelal bike û bi kêr bê, hewce ye ku rewşa civakê ya bêpirsgirêk, normal û xwezayî jî pênase bike. Di kîjan asta komê û şêweyê wê de dijî bila bijî, eger ew civak bi awayekî azad avahiya xwe ya exlaq û polîtîkayê pêk tîne, ji rewşa vê civakê re em dikarin bibêjin normal e, yan jî civaka xwezayî ye. Mirov dikare ji vê civakê re bibêje, civaka vekirî yan jî civaka demokratîk. Ji ber ku di beşên pêş de em ê li ser gelekî rawest in, bi kurtî ez ê çareseriyê weke tam lîberal, sosyalîst, dewleta netewe, civaka xweşhal, civaka zêde dixwe, civaka pîşesaziyê û civaka xizmetê pêşkêş nekim. Ji ber ku gotinên bi vî rengî bi giranî spekulatîf in. Di civaka rastî de ev pênase berdêla xwe nînin. Belkî mirov wan weke hinek sifetan bi nav bike, rastir e.

Naxwe em mehrûmkirina civaka azad a bi exlaq û polîtîk ji van xisletên wê yên bingehîn dikarin weke destpêka pirsgirêkê bihesibînin. Hêza pirsgirêkê dide destpêkirin jî yekdestdarî ye. Divê em çarçoveya yekdestdariyê jî pênase bikin. Çi taybetî çi jî bi destê dewletê, eger berhemên zêde yên cotkarî, bazirganî û sinaî hatibin berhevkirin, ev yekdestdarî ye. Di nava koma yekdestdariyê de rahib + zilamê bi hêz + şêx weke sêberên destpêkê bêguman hiyerarşîk in. Li gorî hêza xwe ji yekdestdariyê sûdê werdigirin. Di tevahiya dîrokê de ev yekdestdariya sêber wê dabeşî gelek saziyan bibe. Her sazî jî wê di nava xwe de dabeş bibe, lê ji aliyê cewherî ve wê bandorên xwe zincîrwarî heta roja me ya îro bînin.

Divê mirov karekterê dîrokî yê yekdestdariyê yê herikîna wê ya kumulatîf û zincîrwarî her tim li ber çavan bigire. Şaristaniya navendî hem sedema pêşketina zincîrwarî ya yekdestdariyê ye, hem jî encama wê ye. Ez ê bi rik û israr vê xusûsê destnîşan bikim. Fikra modernîteyê di roja me ya îro de tengavkirineke xeternak a zeman ferz dike. Her tişt tê tengavkirin, di 'aniha' de tê fetisandin. Lê ya rastî 'aniha' dîrok e, paşeroj e. Modernîte bi vê ferzkirina fikrê, bêsedem dîrokê qetil nake. Ji ber ku civakeke ji rêûresmê qutbûyî tu çawa bixwazî dikarî bi rê ve bibî. Ti dîrok bi qasî dîroka yekdestdariyê nebûye xwediyê wî şensî ku zincîrwarî, zêde û mezinbûyî be. Yekdestdarî bi vî awayî xwe dike dîrok û bi girîngiyeke mezin jî hewl dide civakan, bi tevahî koman bêdîrok bike, ya rastî wan di nava xwe de bihelîne û bike mêtingeh. Ji bo vê jî avahiyên mîtolojî, dîn, felsefe û zanistê pêk tîne. Kengî koman bêexlaq dike û wan dixe rewşekê ku nikaribin polîtîkayê bikin jî heman hewldanên xwe nîşan dide.

Em ê yekdestdariyê weke têgîn timûtim bi kar bînin, ji lewra divê neyê jibîrkirin ku wexta em wê bi kar tînin, em wê di çarçoveyeke aborî, eskerî, polîtîk, îdeolojîk û bazirganî de bi kar tînin. Ji ber ku ev kom ê berhemê zêde di nava xwe de bi awayekî parve bikin. Parvekirin rêjeya xwe çi dibe bila bibe û çawa dibe bila bibe, wê cehwerê ti carî neguhere. Hinek caran ên bereketa ekonomîk pêk tînin, carnan jî esker û yên din –çîna polîtîk, taximê îdeolojîk, zumreya bazirgan –li gorî girîngiya xwe wê di rêjeya para

xwe de bibin xwedî gotin. Têgînên mîna çîn û dewletê dikarin bi yek carê mijarê şîlo bikin. Yekdestdarî weke şîrketeke zordestî û mêtinkariyê hê bêtir bi roleke zelal radibe. Li pişt wê pêkhatinên weke çîn û dewletê jê zêdebûyî ne. Jêpeydabûnên destê duyemîn in.

Di rêza sêyemîn de avabûna bajêr ji yekdestdariyê peyda dibe. Bajar weke biryargeha zordestî û mêtinkariyê ya yekdestdariyê serê xwe radike. Bi perestgehê re ketiye zikhev, ji ber ku girîngiyê bi gera li rewakirina îdeolojîk dide. Naxwe bajêr bi rewşa xwe ya di dîrokê de pêk hatiye, berê pêşî weke perestgeh, biryargeha eskerî, binkeya avahiyên (qesr) rûniştina bûrjûwayê (bi maneya 'bajarî' em ji hemû beşên mêtinkar re dikarin bûrjûwa bibêjin) derdikeve ser dikê. Girse û qelebalixiya di kelheyan de weke xeleka duyemîn a li dora wan bi rola evdên xizmetkar radibin. Mirov ji wan re çîna kole jî dikare bibêje.

Di dîrokê de rastiya birc û kelheyan ku her tim derdikevin pêşiya me, avahiya yekdestdariyê li bajaran eşkere piştrast dike. Hingê me hêmanên ku pirsgirêka civakî derdixin holê, zelal kirine: Avahiya çîn, bajar û dewletê ya li dora yekdestdariyê bi xwe pêk hatiye. Dîroka şaristaniyan bi awayekî belavbûna van sê pêkhatinan li nava zeman û mekan e. Mentiq hêsan e: Derfet û îmkanên berhemê zêde çiqasî zêde bibin, yekdestdarî jî wê pirr bibin, piştre li gorî rêzê wê avahiyên bajar, çîn û dewletê bilind bibin. Ev avahiyên bingehîn di heman demê de rêûresmên gelekî hişk jî pêk tînin. Çîrokên bajaran, rêûresmên dewletan, dîrokên xanedanan mijarên vegotinê ne, yên ku serî û binê wan nînin. Bi tevahî kesên hişê wan dixebitin û bi devê xwe dikarin bipeyivin, weke artêşa ulameyan rojane wê karê îdeolojîk ê rewakirinê pêk bînin. Hema bêjin çîrok û meseleya li hev neanîne nîne. Ji avakirina xwedayan (xwedayên bajaran, xwedayên şeran), afirandina şeytan û cinan, tabloyên cennet û cehennemê heta bi wêjeya destanan qad namîne li nev neanîne. Li ser mayeya keda mirov avahiyên xeternak ên weke qebr, qesr, perestgeh, şano û stadyûm hatin avakirin, weke ku mirov dibêje qey yekdestdarî bi wan hêza xwe nîşan dide. Bi şerên bi heman xeternakiyê bi tevahî gelek, qebîleyek, bajarek û gundek ji bilî êsîrên kêrhatî, tevî şêniyên xwe hemû hatin tinekirin. Ev şêweyê

qirkirinê jî ji rêûresma yekdestdariyê ye. Jixwe her tiştê nirxekî xwe yê aborî hebe, ji mêj ve weke xenîmetê şerê pîroz di pirtûka pîroz a yekdestdariyê de cih girtiye.

Di derketina pirsgirêka civakî de guftûgoyeke girîng, piştî şoreşa cotkariyê der barê şêwazê yekdestdariyê yê şaristaniyê de ye, ango der barê şêwazê sêberên ji desthilatdariyê bûyî yê bajar, çîn û dewletê ye. Bi gotineke din, piştî qonaxa neolîtîkê gelo qonaxa şaristaniyê (qonaxên pêşketinê yên weke civakên koledar, feodal û kapîtalîst jî têne binavkirin) bi şêwazê xwe yê heyî mecbûrî bû? Bêyî ku bajarbûna çînî û dewledar pêk were, gelo derfet û îmkanên civaka neolîtîk hebûn ku derbasî qonaxeke jor a cuda bibe? Eger derfet û îmkanên wê hebûn, çima pêk nehat? Herçiqasî ev pirs weke pirsên spekulatîf bêne nirxandin jî balê dikişînin ser mijarên girîng. Ji ber ku em ê mijarê di sîstema şaristaniya demokratîk de bi awayekî berfireh guftûgo bikin, bersiva ez ê bi kurtî bidim, girêdayî şêwazê me yê lêkolîna xwezaya civakî dikare bê dayîn. Li gorî paradîgmayên şaristaniyên serdest, bûyer li gorî xeta çarenûsê, çawa divê bibin, welê dibin. Her tişt li gorî mûcîbtiya qederê dibe. Çi li enî û çareya kê hatibe nivîsandin, ew pêk hatiye. Tevahiya hûnandinên metafizîk bi vê îdeayê radibin.

Di analîza şaristaniya demokratîk de jî hem şîrovekirina şaristaniyê û şêweyên civakî yên di nava wê de, hem jî nêzîkatiyên wê yên der barê dewama civaka neolîtîk û veguherîna wê de cuda ne. Bi kurtî, rastiya civakî mîna ravekirina zanista civakî ya navend Ewrûpa nîne. Mirov dikare şîroveyên hê bêtir nêzî heqîqetê bike. Civak ji ya dixwazin behsa wê bikin, cuda pêk tê. Divê mirov cudahiya di navbera gotin û rastiyê de bibîne, herweha girîng e ku haya mirov ji têkiliya di navbera gotin û şaristaniya navendî ya serdest de hebe. Li ser navê zanista civakî gelek nirxandinên kategorîk ên têne pêşkêşkirin û weke rastiyên nayên guftûgokirin têne qebûlkirin bi giranî propaganda ne. Ev bi armanca piştperdekirin û veşartina rastiyê têne kirin. Yên li ser navê sosyalîzma zanistî jî hatine pêşkêşkirin di navê de, gelek ekolên zanîn-agahiyên civakî di bin bandora

giran a lîberalîzmê de ne. Bi kêmanî be jî ev mijar neyên rohnîkirin di bersivên bêne dayîn de wê para şaşiyê gelekî zêde be.

Eger mirov pirsgirêkên civakî bi derketina wan a orjînal pênase bike, ev yek derfet û îmkanê dide mirov pêvajoyên pêşketinê bêtir bi awayekî rast şîrove bike. Bi şêweyê qonaxên sereke pêşkêşkirina pirsgirêkan û bêyî ku wan dabeş bike bi kategoriyên bingehîn lêkolîna wan, pirsgirêkê di nava yekparebûna wê de nîşan dide û ji vê jî mirov bêtir hîn dibe.

**a-** Qonaxa pêşî ya pirsgirêka mezin a yekdestdariya şaristaniyê, mirov dikare (nêzî salên) di navbera salên 3000 B.Z.-500 P.Z. de bi cih bike. Yekdestdarî ew rêxistin e ku di şertên zeman û mekan ên cuda de bi rêbazên cûrbicûr ji civakê berhemê zêde yê mezin vediziye. Ji civakên Sumer, Misr û Harappayê ji salên 3000'î B.Z. ve bi rêbazên (rêxistiniyên) em dikarin ji wan re sosyalîzma firewn jî bibêjin ji cotkariyê berhemekî gelekî zêde bi dest xistiye. Modela pêşî ya mezin a daneheva sermayeyê ye. Li gorî civaka neolîtîk bereket têra xwe zêde bûye. Vê bereketê bi xwe re bajar, çîn û dewlet derxistiye holê. Li ser derfet û îmkanên berhemê zêde yên bi civaka neolîtîkê ji zû ve destpêkirî yan bi rêbazên zorê yan jî bi yekdestdariya bazirganiyê serdema mêtinkariya mezin a pêşî destpê dike. Bêguman di sosyalîzma firewnan de mirov bi nanozikê têne xebitandin û evdên têne xebitandin mîna cinsekî cihê yê heywanan têne dîtin. Di vî şêweyî de mêtinkarî bingeh e. Bi kurtî, xeleka orjînal a pêşî ya mêtinkariya navend-hawîrdor a roja me ya îro bi vî awayî hatiye damezrandin. Em bûyerên bi vî rengî bi awayekî eşkere di civaka Sumeran de li ber rohniya belgeyên di destên xwe de dikarin bibînin.

Bêguman bi vî şêwazî hilberîn û desteserkirina berhemê zêde mîna xencera li nava dilê civakê hatibe xistin, rê li ber pirsigrêkên mezin vedike. Dîroka mîtolojî û dînan bi çîrokên van pirsgirêkan tijî ye. Eger em mînakan bidin, dema ku Destana Gilgamêş, Tofana Nûh, efsaneyên Adem-Hawa û Habîl-Qabîl, hûnandina cennet-cehennemê, pevçûna Xweda Enkî-Xwedawend Înannayê, nakokiya şivan-cotkar ên pêşî tên vegotin, di meseleyê bi xwe de ya efsane dixwazin îşaret pê bikin bi awayekî pirr zelal ew e ku xencerkirina bi destê YEKDESTDARIYÊ ye ango yekdestdariyê

çawa bi zor girtiye û mîna heywanan bi zor xebitandiye û bi vî awayî berhemê zêde desteser kiriye.

Bêhejmar çîrokên bi vî rengî yên talan û xebitandinê dikin mijar û mirov matmayî dihêlin, bêguman wê zimanekî sergirtî bi kar bînin. Divê mirov baş zanibe ku di wê demê de bi qasî serdestiya îdeolojîk herî kêm serdestiya fizîkî jî bi bandor e. Eger dîrok bi rastî carekê jî bi zimanê bindestan û yên hatine talankirin bihata nivîsandin, wer xuya ye ku em ê ji ya ji me re hatiye pêşkêşkirin bi rabihuriyeke gelekî cuda re rûbirû bibûna.

Bi tenê hejmara koleyên di piramîdên (De ev qebrên wan in. Gelo qesrên wan çawa bûn?) firewnên Misrê de hatin xebitandin ji mîlyonan dibihure. Ev kole li devereke mîna xirbeyên heywanan komkirî dihatin girtin û bi qasî heywanan jî zikê wan nedihat têrkirin û di bin wan qamirçiyên kujer de di wan avahiyên xeternak de dihatin xebitandin. Wan heywan-kole, ên milkê xwe didîtin, bi vî awayî dixebitandin. Milekî din ê yekdestdariyê eskerên wê jî êriş dibirin ser komên li derve û ji van koman bi tenê erd û alavên kêrhatî desteser nedikirin, ji bilî yên dikuştin bi tevahî koma kêrhatî jî êsîr dikirin. Avahiyên weke kelhe, birc, qebr, arena, qesr û perestgeh ku îro jî mirovan matmayî dihêlin bi van êsîran dihatin avakirin. Eger bi mîlyonan ji wan di van cihok û erxên pêşî yên avdaniyê de nehatana xebitandin, bi herhalî wê ewqas berhemê zêde nehata bi destxistin û wê avakirina van avahiyên mezin mumkîn nebûyana. Ya din jî wê jiyana cennetwarî ya yekdestdariyê misoger nebûya.

Vegotinên (mîtolojî, dîn, felsefe û ekolên cûrbicûr ên hunerî-zanistî) bi koka xwe yên şaristaniya navendî (pêvajoya ji şaristaniya hegemonîk a Sumer Mezopotamyayê heta bi şaristaniya hegemonîk a DYE ya roja me ya îro), ji bo ku vê pêvajoya xeternak cuda nîşan bidin bi heman awayê mirovan matmayî bihêle, di serî de îdeolojî gelek saziyên joravahiyan pêşde birine. Nexasim aqlê analîtîk qonaxa xwe ya herî berdar pêk aniye. Di pêşengiya yekdestdariya rahib de ji utopyayên mîtolojîk heta bi tabloyên cennet-cehennemê; dema van têrê nekiriye ji ravekirinên felsefî heta bi zanistê, heta bi agahî û zanyarên bersivên herî baş bidin fenomenên xwezayê, bersiv hatine pêşxistin. Ji bo bi hêsanî bi rê ve bibin

gavên pêşî avêtine nivîs, matematîk, astronomî û biyolojiyê. Ji bo xweşhaliya tebeqeya yekdestdariyê di encama gera li dermanên nebûyî de bingehê zanista bijîşkî hatiye danîn. Gera Gilgamêş 'li gihayê bêmiriniyê' beşa herî bi heyecan ê destanê ye. Mîmariya avahiyên kevirî, ji bo nemiran, teknîka avahiyên nemir pêşde biriye. Wexta ku mîtolojî kêm maye, pêvajoya dînên bêtir hişk dogmatîk destpê kiriye. Ji bo ber dilê mirovên ketine rewşên xeternak xweş bikin, xwedayên bi pêjna xweda-qralan ava kirine. Aqlê analîtîk belkî jî berhema xwe ya herî mezin di gavavêtina dînên yekxwedayî de pêşkêş kiriye.

Ne bi tenê rê li ber pirsgirêka civakî hatiye vekirin; bi şêweyekî herî xeternak pirsgirêk hatiye çêkirin. Mîna kabûsê ketiye ser çanda maddî û manewî ya tevahiya civakê. Di Sumerî de maneya 'vegera li xwezaya dayik a pîroz' hê wê demê li gotina 'Amargî' hatiye barkirin. Mirovatiya piçûk hatiye xistin bi çirayê li rabihuriya xwe digere, xweziya xwe pê tîne. Ev kirine îdeolojiya demek berî demekê bimire û bigihîje cennetê. Jiyana cennetwarî ya li rûyê erdê carnan mîna xeyaleke dema neolîtîkê ya were jiyîn êdî ji dinyayên din re têne hiştin û dibe mijara utopyayan. Têgihiştina dinyewî, sekuler, cihê xwe ji wan têgihiştinan re hiştiye ku ji bilî axîretê nikarin li tiştekî din bifikirin. Li hemberî vê pirsgirêka xeternak, dinyayê pirrengî û cûrbicûriya xwe ya dewlemend ji dest daye, hiştine ku weke cihekî ezab were tesewirkirin.

Exlaqê civakî û polîtîkayê derba kuştinê ya pêşî bi vê pirsgirêka yekdestdariyê xwar. Qadên exlaq û polîtîkayê ku kevirên avakirinê yên civaka kominî ne, têne tarûmarkirin, polîtîka serwer (dewleta xwedayî) û exlaqê serwer (ya rastî bêexlaqî) ên xweserî endamên komên teng ên yekdestdariya jor serwer kirin. Polîtîka û exlaqê civakî beriya were pêşdebirin ji sedî sed ji hev hatiye belavkirin. Li şûna wan jî weke nîzama xwedayî dînîtiyên jiyanê û îdeayên îlahtiyê yên serweran hatin danîn. Bi tenê ew heq dane civakê ku van vegotinan weke baweriyên pîroz qebûl bike.

Çawa ku tê dîtin, bi tenê pirsgirêka civakî nehatiye çêkirin, ji wê jî wêdetir, civak ji civakbûnê derxistine, veguherandine xirbeyê heywanan ê

yekdestdariyê. Kirine ku evdîtî-koletî weke rejîmeke asayî were qebûlkirin. Koletiya jinê ya şaxên wê xwe heta bi dema pêşî ya hiyerarşîk berdidin jî veguheriye mijara herî berfireh a jiyanê. Mîna ku ji civaka dayikê ya neolîtîk, ji civaka dayika pîroz tolê hilînin, nîzamên xwedayî yên bi serweriya mêr hatin avakirin. Xwedawendiya jinê şopên wê hêdî hêdî wenda dibin, xwedayên di formê mêr de serdema serweriya wan a bi heybet destpê dike. Hê di wê demê de jin hem di tevahiya perestgehê de, hem jî di kerxaneyên rezîl de neçarî fahîşetiyê kirin, ew di wir de girtin.

Bi teknolojiya avdaniyê ya heyî ev dema bi bereket, mirov dibîne di dawiya salên 2000'î B.Z. de dikeve pêxîrtengiyeke dijwar. Hem hişkesalî hem jî xwêgirtina erdan di vê pêvajoyê de bi tesîr bûne. Lê bi awayekî bingehîn, piştî navbereke bi qasî du hezar salan hîmên damezrînê bi bandora pratîka civakî, bi awayekî xwezayî diderizin. Harrapa ji zû ve belav bûye, bêdeng bûye; Misr bi nakokiyên kûr ketiye rewşekê, nikare dewam bike; li cem Sumeran jî koma etnîk a serdest ji zû ve cihê xwe ji etnîsîteyên din ên şaristaniyan re hiştiye.

Sîstema şaristaniya navendî ya vê demê, ji bo pirsgirêkên giran ên rê li wan vekiriye çareser bike, du rêyên girîng ceribandine: Ya pêşî, xwe ber bi derve ve belav kiriye. Piştre pêvajoya emperyalîzm û mêtingehkirinê ku wê gelek caran derkeve pêşiya me, bi tenê ji bo demekê xwedî hin çareseriyane. Lê dîsa li ber pirsgirêkên nû rê vedike. Pirsgirêk çareser nebûne. Berevajî bêtir belav û zêde bûne. Pirsgirêkên li navendê, metrepolê zêde bûne, ji bo demekê derxistine derve, vê yekê kiriye ku qismî bêhna wan bê ber wan, lê paşê ev pisgirêk qatbiqat zêdebûyî li wan vedigerin. Di dîrokê de ev xelek bi cihguhertina timî ya navend û hawîrdorê, gelek caran derdikeve pêşiya me.

Ez yeqîn dikim ku metrepola (navend) Sumer ji sê aliyan ve heta mirov deryayê jî lê zêde bike ji çar aliyan ve xwe derxistiye derve. Ber bi Rojava ve berhema belavbûna wê ya pêşî Misra Nîlê ye. Heye ku Misr pêşî weke kolonî, paşê jî serbixwebûyî bi pêş ketibe. Bêyî desteka derve, pêşketina şaristaniyeke mîna Misrê ya li cografyayeke çar aliyên wê girtî, îhtîmaleke kêm e. Ber bi Rojhilat ve belavbûna Sumeran li peravên Sindê jî rê li

çêbûna Harappayê vekiriye. Heman helwesta me ji bo Harappayê jî di cih de ye. Bêyî desteka derve, Harappa li çolê bi tenê dikarîbû bibûya mûcîziyek. Li Çînê jî bi salên 1500 B.Z. re hilatina qraltiya pêşî, mirov bi heman nêzîkatiyê rave bike, di cih de ye. Hînê di destpêka hilatina xwe de têkiliya navend-hawîrdorê di pêkanîna şaristaniya wê de xisleteke bingehîn e. Yek ji qadên girîng ên belavbûnê ber bi Rojhilat ve li Îrana îro, cîranê Sumeran şaristaniya Elam-Sûsê ya li Sûsîanayê bû. Belavbûna ber bi Bakur ve jî ji aliyê komên otantîk ên Mezopotamyayê û hêza bingehîn a avakirina şoreşa neolîtîkê, Aryen-Hûrriyan ve di ser Babîl û Asûrên zêde ji navendê nedûr re, pêk hatiye.

Hûrriyên ku Sumer, Aqad (dema komên etnîk ên bi koka xwe Semîtîk), Babîl û Asûran timî hewl dida wan bikin kolonî mêtingeh, belkî jî berxwedana herî mezin a dîroka xwe li dijî vê şaristaniya navendî ya pêşî ya orjînal pêk anîye. Mirov dikare vê pêvajoyê di kevalên Sumeran de bibîne. Destana Gilgamêş bi xwe jî eşkere tîne ziman ku sefera pêşî ber bi daristanên bakur ve hatiye kirin. Jixwe Iraq-Ûrûq a hemdem ku hê dikele, dewama vê rêûresm û rastiyê, bi awayekî balkêş nîşan dide. Nakokiyên Kurdên bi koka xwe Hûrrî û Erebên bi koka xwe Semîtîk belkî jî xisletên xwe yên ji 'Nebî Nûh' mayî hê tînin ziman. Bi tenê tiştê guherî navend-hawîrdor, hegemon û teknîk e.

Hûrrî qebîleyên orjînal ên Kevana Bi Bereket in. Şoreşa cotkariyê hûrûkûr pêkanîne. Ji lewra xwediyê wê hêzê ne ku hem li ber xwe bidin hem jî şaristaniya xwe pêşde bibin. Bêyî ku hewcedarî navenda Sumer bibin, di salên 3000'î B.Z. de yekemîn navendên xwe yên bajaran ava kirine. Gelek daneyên arkeolojîk ên vê yekê piştrast dikin derketine ser rûyê erdê. Nexasim li nêzî Ûrfayê kevirên mezin ên abîdeyî yên beriya şoreşa neolîtîkê hatine danîn (Xirabreşkê, 10000-8000 B.Z.), ji aliyê nîşandana koka şaristaniya vê deverê di cîhana zanistê de bi awayekî xurt holan da, hê dewam dike. Li gorî texmîna min a şexsî, koloniyên bi koka xwe Hûrrî cara pêşî li Mezopotamya Jêr a Sumeran bi cih bûn. Ji lewra mirov dikare ku împaratorî avakirina Hîtîtî û Mîtaniyên bi koka xwe Hûrî ji salên 1600'î B.Z. ve li Anatolya Navîn û li Başûr-Rojhilat, fêhm bike. Li van

qadan îhtîmala pêşketina şaristaniyên din jî heye. Analîza abîdeyên li Xirabreşkê dikare der barê şaristaniyên cuda de rê li ber fikrên nû veke. Belavbûna Sumeran bi rêya deryayê (Kendava Basrayê), li Umman û Yemena îro û heta li Hebeşîstanê rê li avabûna koloniyên şaristaniyan vekiriye. Li Ummanê hebûna bajarekî herî kêm bi qasî Harappayê mezin hatiye tespîtkirin.

Rêya duyemîn a derbaskirina pêxîrtengiyê ji aliyê Babîl û Asûran ve hat ceribandin. Babîliyan îndustrî û zanist pêşde birin, Asûriyan jî yekdestdariya bazirganiyê ava kir, bi vî awayî bê navber hewl dan şaristaniya Sumer ji pirsgirêkên giran rizgar û belav bikin. Babîl di zanist û îndustriyê de London, Parîs, Amsterdam û Venedîka rastî ya demê ye. Heta di dema xwe ya mezinbûn û bilindbûnê de ji New Yorka roja me ya îro hezar qatî bêtir xwedî navûdeng bû. Skender bêsedem nefesa xwe ya dawî li Babîla temirî neda. Saddam jî belkî qurbanê dawî yê trajîk ê eşqa Babîlê ye. Hê bi hezaran ên wisa hene ku di nivîsê de bi cih nabin. Ez dema hewl didim yekdestdariya bazirganiyê ya Asûrê analîz bikim, yekser yekdestdariyên bazirganiyê yên Venedîk, Hollanda û Ingilîz têne bîra min. Yekdestdariyên bazirganiyê yên Asûr ên bi Fenîkiyan re belkî jî di dîrokê de bi rastî şîrketên herî afirîner û jêhatî bûn. Bêguman ji Asya Navîn (tê gotin li Çînê jî xuya kirine) heta bi Rojavayê Anatolyayê, ji Erebistanê heta bi peravên Deryareş tevna bazirganiyê (qarûmên navdar, ango cihên karê, karxane) danîn û xurt kirin. Ji sedî sed e ku Împaratoriya bazirganiyê ya herî mezin û pêşî damezrandine. Salên 2000-1600, 1600-1300 û 1300-600 B.Z. ev extepotê bazirganiyê ku xwe di sê deman de nîşan dide, di dîrokê de yekemîn e. Lê di bazirganiya xwe de ji bi sînor belavkirin û kûrkirina şaristaniya navendî ya Sumerê wêdetir ti nirxekî xwe yê çareserker nîne. Jixwe yekdestdarên bazirganiyê divê her tim rahib + esker + rêveber hevparê yekdestdariya sereke bin. Lihevnekirina di nava wan de ji pevçûna li ser pargirtinê wêdetir naçe. Lê Asûr bi qasî hezar û pêncsed salî şaristaniya navendî ya Sumerê li ser pişta xwe hilgirt û ev divê ti carî piçûk neyê dîtin. Yek ji xelekên bi hêz ên zincîra şaristaniyê ye.

Ji ber ku Harappa, Umman, Hîtîtî, Mîtannî û Misr nebûn xwedî heman serketinê di nava xwe de bi hêsanî ji hev de ketin. Asûriyan bi riya Fenîke, Med-Persan û Hîtîtên Dereng bi rêya bazirganiyê bandor li şaristaniya Grek kirin û nabe were înkarkirin ku di dewamkirina bênavber a şaristaniya navendî de bi rola diyarker rabûne. Yekdestdariya bazirganiyê pirsgirêkan çareser nake. Lê gelek berhemên şaristaniyê yên pêşveber (Fikir û bawerî jî di nava vê de ne) li her alî belav dike û ji bo bigihîje û demeke dirêj li ser piyan bimîne, derfet û îmkanê dide. Naxwe wê biketa rewşa Harappayê. Belkî jî dubareyên çend hezar salî di dîrokê de biqewimiya. Lê dîsa jî yekdestdariya bazirganiyê yekdestdariya herî bêrehm a daneheva sermayeyê ye; divê mirov ji bîr neke ku nûnerên wê yên siyasî çawa ku di mînakê bircan de hat dîtin (ji keloxên mirovan kelhe û birc avakirin) ji kirinên herî zalim û xedar xwe paşve nadin. Ji vê jî zêdetir, cudahiya di navbera buhayên alavan de û cudahiya di navbera mal û mesrefa lêçûyî de bi kar tîne û bi keda herî kêm karê dike. Ev kara yekdestdariyên bazirganî dikin, xusûsek e ku baş tê zanîn.

Em li vir behsa kirrîn û firotina metayên piçûk û bazirganiya wan a bi armanca serfkariyê û ne bi armanca karê ye, nakin. Divê timî di bîra me de be ku em behsa bazirganiya yekdestdariyê ya bi armanca karê dikin. Bi îhtîmaleke mezin bi sedema ku nikarîbû derkeve derveyî Harappayê û nikarîbû bazirganiyê pêşde bibe, Harappa hilweşiyaye. Tê zanîn, Xanedaniya Nû ya Misrê jî (1600-1000 B.Z.) ji ber ku nikarîbû ber bi derve fireh bibe û jênehat yekdestdariyê ava bike, bi pevçûnên navxweyî û êrişên ji derve temiriye. Eger bi qasî Sumeran belav bibûyana belkî jî dinya me gelekî cuda bibûyana. Çînê hewce nedît ku ber bi derve fireh bibe. Belkî jî ew bi xwe têra xwe fireh bû. Eşkere ye ku şaristaniya navendî ya pêşî, bi teqandina bendên li pêşiya xwe pirsgirêkên giran ên rê li ber wan vekir û bi belavkirina wan a li dinyayê, karîbûye bigihîje qonaxeke cuda.

Fikirdar hene ku dibêjin, dibe ku di dîrokê de, di demên 1600-1200 B.Z. de şaristaniya Anatolya, Mezopotamya û Misrê cara pêşî gelekî ketin zikhev û bi vî awayî karektera hegemonîk a navendî girtin. Jê re serdema zêrîn a bajarbûn, bazirganî û arîstokrasiyê neyê gotin jî eşkere ye ku ew ji

nişkê ve ji qonaxekê gihandine qonaxeke gelekî jor. Eşkere ye ku alîkariya belavbûna pirsgirêkê kiriye, di timûtim cihguhertina hegemoniya navendî de rol girtiye û kiriye ku temenê wê dirêj bibe. Peymana Qadeşê ya navdar (1280 B.Z.) vê rastiya demê nîşan dide.

Pêxîrtengiya şaristaniya navendî salên 1200-800 B.Z. ket navê, kengî teknîka hesin ket pêşiya teknîka tûnc (3000-1000 B.Z.) sivik bû. Pêşketinên di teknîkên hilberîn û şer de timî cudahiyên demên xwe diafirînin. Bêguman a diyarker pêşketina civakî ye. Lê ev pêşketin ji nêz ve têkiliya xwe bi teknîkê re heye. Navenda hegemonîk cara pêşî ye ku derdikeve derveyî Mezopotamyayê. Gavên pêşî yên ber bi Rojava, Ewrûpayê ve têne avêtin. Di erdê re împaratoriya Med-Pers (600-330 B.Z.), di deryayê re jî Fenîkiyan (1200-330 B.Z.) ev gavên qonaxa derbasbûnê pêk tînin, avêtin. Ûrartû jî (850-600 B.Z.) bi roleke bi heman rengî rabûn. Pêxîrtengiya civakî bi teknolojiya hesin û rêyên bazirganiyê yên belavbûn û kirin bin ewlehiyê bi temamî derbas nebe jî, sivik bû û dewam kir. Rêyên bejî yên bazirganiyê yên împaratoriya Med-Pers (ya hegemoniya wê), pêngava Fenîkiyan a li ser bazirganiya Deryaspî girîng e. Grekî demeke dirêj neçar weke kolonî û mêtingehên van herdu şaristaniyan man. Dîrok (dîroka navend Rojava), herçend şaristaniya Îonyayê orjînal bihesibîne jî lêkolînên rastî nîşan didin ku her tiştê xwe ji belavbûna van herdu şaristaniyan girtiye. Wexta em li bandora Med-Pers û Fenîkeyê bandora Misr, Babîl û Girîtê jî zêde bikin, em ê bibînin ku şaristaniya navdar a Grek bi giranî ji derve hatiye û ev rastiyeke înkara wê nabe.

Bêguman mirov nikare senteza Grek-Îonyayê piçûk bibîne. Lê eşkere ye ku orjînal nîne. Jixwe ti şaristanî orjînal nîne. Tevahiya wan nirxên civaka neolîtîk yan bi desteserkirinê yan jî bi yekdestdariya bazirganiyê û bi pirranî jî bi xebitandina herdu rêbazan di zikhev de bi devşîrmekirina nirxên civaka neolîtîkê xwe ava kirine. Dibe ku veguherandibin û sentezên nû afirandibin. Lê çawa ku Gordon Childe jî diyar dike, vedîtinên teknîkî yên civaka neolîtîk di dema 6000-4000 B.Z. de li kevana Toros-Zagrosê, xwedî wê giraniyê ne ku bi vedîtinên piştî sedsala 16. yên Ewrûpayê re

dikarin bêne muqayesekirin. Şaristaniya navendî pêşî ji salên 4000'î B.Z. ve bi pêşdeçûna bajarê Ûrûkê re li dora vê teknîkê tê avakirin. Mijara bingehîn a şerê navbera Xweda Enkî û Xwedawend Înannayê Me'yên ji wê dizîne (Tê maneya vedîtinên teknîkî). Li vir têkiliya di navbera serdestiya mêr a bi şaristaniyê re bi pêş dikeve û serdestiya teknolojiyê de tê destnîşankirin. Ev mînak bi xwe jî nîşan dide ka qîmeteke çendîn mezin a hînkirinê ya mîtolojiya Sumer heye. Jixwe zimanê demê bi mîtolojiyê barkirî ye. Hemin wê weke zimanê roja me ya îro neyê bi karanîn.

Şaristaniya Grek-Îonya ya li herdu peravên Egeyê pêşde diçe, bêguman di nava xelekên zincîra dîrokî de xelekeke girîng e. Di pêşketina civakî de pêngaveke mezin e. Hem di qada zêhnî hem jî di qada pratîkî de alîkariyên xwe gelek hene. Mîrateya di çûnûhatina deryayê de ya ji Fenîkeyiyan girtî, gelekî pêşde biriye. Li peravên Ewrûpayê xwe li avakirina koloniyên berfireh rakişandiye. Dîsa teknîka nivîsê bi saya mîrateya Fenîkeyiyan pêşde biriye, di alfabeya roja me ya îro de xwediyê pareke girîng e. Di tevahiya zanistên demê yên têne zanîn de rê li pêşketinên şoreşgerane vekiriye. Di felsefeyê de tam şoreşek pêk hatiye. Bi xwedayên Olymposê nuqteya dawî li dema xwedayên Sumeran daniye. Bi Homeros rêûresma Destana Gilgamêş derxistiye asta herî bilind. Di warê şano, mîmarî, muzîk û wekî din de rê li pêşketinên şoreşane vekiriye. Bajarên bi heybet hatine avakirin. Di teknîka avahiyên perestgeh, qesr, şano, stadyûm û meclîsan de guhertinên pêkanîn qîmeta xwe ya klasîk hê jî diparêzin. Mirov nikare pêngava wê ya hilberîn û bazirganiyê piçûk bibîne. Pêşketinên îndustriyel jî girîng in. Di qada polîtîk de mînakên demokrasiyê yên bibin malê dîrokê, pêşkêş kirine. Di çarçoveya şaristaniyê de be jî piştrast kiriye ku demokrasî ji şêweyên din ên rêveberiyê serdestir e.

Lê tevî van tespîtan hemûyan, rastiyek heye naguhere, ew jî ew e, qonaxa şaristaniya Grek-Îonyayê xelekeke sîstema şaristaniya navendî ya bi Sumeran destpêkirî ye; berevajî ev tespît vê yekê piştrast dikin.

Wexta ku em di çarçoveya mijara xwe de li şaristaniya Grekê binêrin, em dibînin rola wê ya di çareserkirina pirsgirêkan de, ya rastî para wê ya di pêşdebirina pirsgirêkan de, bi hêsanî em dikarin bibêjin ti cudahiya wê

ya bi kok ji şaristaniyên din nîne. Di serî de demokrasiya Atînayê, bi tevahî pêşketinên wê rê li wan vekir, nîşan didin ku wê pirsgirêkên şaristaniya navendî çareser nekirine berevajî ew girantir kirine. Eger em van rêz bikin:

Êsîrtiya jinê têra xwe hatiye kûrkirin. Jin ne bi tenê li malê zarokan tîne û weke koleya bi barên herî giran radibe xizmetê ji mêr re dike; tevlîbûna wê ya polîtîka, spor, zanist û rêveberiyê qedexe ye. Jinê dibezînin tevahiya karên giran ên hilberînê. Eflatûn di wê fikrê de ye ku jiyana bi jinê re wê zirarê bide esilzadetiya mêr. Ji ber vê sedemê homoseksualîte zêde bûye. Li derveyî jinê jî koletî gelekî pirr û belav bûye. Cara pêşî hejmareke zêde ya koleyan derdikeve holê. Saziya eskeriya bi mûçeyan tê vedîtin. Ne bi tenê alavan, koleyan jî difiroşin derve. Li beramberî vê, çîneke efendiyan a herî kurtêlxur çêbû. Têgîna arîstokrasiyê pêk tê. Qada civakî bi hêmanên civakî yên kurtêlxur tijî bûne. Beşên herî nêzî çîna bûrjûwayê berhemên şaristaniya Grek in. Bi kurtî, li pirsgirêkên qada civakî, yên nû zêde bûne û yên kevin jî bi awayekî hê zêdetir giranbûyî dewam kirine.

Di pêşketina avakirina bajar de bûne xwedî heybetekê, bajar şêweyekî avahiyê yê organîk bi dest xistiye. Lê ev pêşketin di berdêla girankirina pirsgirêkên civakî de pêk anîne. Avahiyên zîggûrat û piramîdan mîna ku veqetiyane parçeyan û di bejna çiyan de dubare bûne. Çawa ku qonaxa yekemîn a bajaran ji avahiyên perestgehan û qetên bi ser ve pêk hatibe, qonaxa duyemîn jî bi kelheyên hundir û bircên yekemîn û duyemîn ên qûntara wan hatibe temsîlkirin, di qonaxa sêyemîn de ev dabeş têne rakirin û qetên nû bi ser ve têne kirin û bi vî awayî dewlemendî û heybeta mekanî tê bidestxistin. Bi mezinbûna yekdestdariyê re parelel, pêşketinek heye. Bi vê pirsgirêk çareser nabin, bêtir têne mezinkirin. Artêşa koleyan ji berê qatbiqat bihurî ye. Wekî din jî koleyên bêkar pêk hatine. Cara pêşî ye ku mirov xwe evçend di rewşeke bêqîmet de dibînin. Ji vê girantir pirsgirêka civakî nabe. Sîstema bêkaran biafirîne ya herî xedar û zalim e.

Mirov mezinbûneke bi heman rengî li cem amûrên desthilatdarî û dewletê jî dikare bibîne. Desthilatdariyê ji qatên jor ber bi qatên jêr ve dagirkeriya xwe mezin kiriye. Zêdegaviya dewletê ya di fetisandina

polîtîkayê û hukimkirina civakê de pêşde çûye. Brukrasiya dewletê pêk hatiye. Çîna eskerî cihêwaziya xwe daye qebûlkirin. Bi awayekî giştî, otorîteya desthilatdariyê ya li ser jin, zarok, ciwan, kole, gundî û zenaetkaran ên di nava civakê de zêde bûye. Aliyê herî xemgîn ê demokrasiya Atînayê ew e, bi awayekî pirr eşkere xilasbûna polîtîkayê li hemberî dewletê raxistiye pêş çavan. Rêûresma demokratîk civakî di mînaka Atînayê de mîna ku bi destê arîstokratan nefesa xwe ya dawî daye. Bi herhalî dersa herî girîng a divê em ji demokrasiya Atînayê bigirin, ev e.

Yekdestdariya şaristaniya Romayê (750 B.Z.-500 P.Z.) di çarçoveya dewama rêûresma Îonya û yekparebûna wê ya hundir de ye. Fena mînakên ji nîvgiravekê veguhestine yeka din. Xusûsa herî girîng a mirov dikare bibêje, eger Grekî dema zarokatî û ciwantiya vê şaristaniyê bin, Roma jî dema stewîn û kaltiyê wê ye. Cara pêşî zanîbûn ku yên ji Rojhilat girtine li dijî Rojhilat bi serdestbûnê bi şêwazekî dawerivînin hinavê xwe û sentez bikin. Serketina Romayê ew e, di berdêla beşekî Ewrûpayê bi awayekî bêrehm dagir bibe û were kolonîkirin, karîbû tevlî şaristaniyê bike. Ji bilî vê, Roma ji her alî ve pîvanên zêde mezinbûyî yên Grekê îfade dike. Ji aliyê bajar, çîn û desthilatdariyê ve gelekî mezin bûye. Ji qraliyeta arîstokratîk ber bi komarê ve, ji wir ve jî xwe gihandiye împaratoriya di dîrokê de herî bi hêz û berfireh. Şêwazê jiyanê yê Romayê li her deverê bûye mode. Arîstokrasiya wê, mîna modernîteya me ya îro (bûrjûwayê), hêza diyarker a hemdemiyê ye. Arîstokratiya kurtêlxur û proleteriya lumpen (sûte-tolaz) sembola pirsgirêkên harbûyî û bitirbûyî yê Romayê ne.

Mirov ji dema Romayê re dikare bibêje ew dem e ku pirsgirêka civakî derketiye asta herî jor. Di vê de tiştekî mirov matmayî bihêle nîne. Di navbera yekdestdariya şaristaniya navendî ya kumulatîf mezin dibe û pirsgirêkên binyewî yên wê rê lê vekirî û mezinbûyî de, têkiliyeke yekser heye. Partiya Xiristiyantiyê ya xizanan û ‘qebîleyên barbar’ bûn, tevî cezakirinên xeternak ên Romayê (li çarmîxê xistin, avêtina ber şêran a mirovan, mîna Qartacayê bi erdê re kirina yek a bajaran, û hwd.) weke lehiyê bi ser Romayê de diçûn. Ev dihat wê maneyê ku pirsgirêk mîna

hêzeke fizîkî (ya rastî ruhê azadiyê) benda li pêşiya xwe diteqand, radikir. Eşkere ye ku barbarê rastî Roma ye, û hilweşîna wê ji ber pirsgirêkên civakî bû ku wê hem ji derve û hem jî ji hundir ve weke dêwan mezinkiribûn. Di şexsê Romayê de bi tenê bajar, desthilatdarî û arîstokrasiya Romayê xira nebûye. Xirabûna Romayê di heman demê de xirabûna Sîstema Dinyayê ye ku bi çîroka bajarê Ûrûkê, serhatiya şaristaniyê destpê dike û xwedî karektera navend-hawîrdor, reqabet-hegemoniya, bilindbûn-daketinê ye. Pirsgirêkên ku dijbertiya civakê ya sîstemê di rû û şexsê Romayê de bû sedema wan û berxwedanên hundir û yên derve yên li dijî sîstemê, dawî li demeke herî barbar a sîstemê anîn.

**b-** Di pirsgirêka civakî de duyemîn qonaxa mezin, mirov dikare di navbera dema ji hilweşîna Romayê heta bi bilindbûna Amsterdamê de bi cih bike: ango dema ji salên 500 P.Z. heta bi 1500'î dewam dike. Xisleta wê ya diyar ew e, dînên Brahîmî yên weke peyamên çareseriyê derketine holê mohra xwe li demê xistine. Dînên Brahîmî li şûna ku bibin çareserî hê bêtir rê li ber pirsgirêkên civakî vekirin û ev yek dike ku mirov bi girîngî li ser wan rawest e.

Dema ez ji bo peyama civakî ya dînên Brahîmî ji hev derxim ponijîm, min dît avahiya maddî ya bi pirsgirêk a sîstema şaristaniya navendî vediguhere avahiya manewî ya bi pirsgirêk. Bi gotineke din, pirsgirêkên çanda maddî weke pirsgirêkên çanda manewî holanan didin. Pirtûkên Pîroz eşkere dinivîsînin ku Hz. Brahîm ji ber zilma nûnerê Babîlê yê li Ûrfayê Nemrût (rêveberê bajêr), ango pirsgirêkên giran ên rê li wan vekiriye direve yan jî hîcret dike. Heta xelasiya wî ya ji şewitandinê bi mûcîzeyên îlahî tê vegotin. Weke sedema vê yekê, gera wî ya li xwedayekî nû weke nîşaneke sereke tê pêşkêşkirin. Mirov dikare gera li xwedayekî nû weke gera li rêveberiyeke nû jî tercume bike. Vegotin û serhatî, ji me re gelek xisletên din yên avahiya wê demê ya bi pirsgirêkên giran barkirî, pêşkêş dike. Dem nêzî salên 1700'î B.Z. tê texmînkirin. Brahîm ji şaristaniya bi koka xwe Mezopotamyayî hîcretî şaristaniya bi koka xwe Misrî dike. Ev tê wê maneyê ku di navbera herdu şaristaniyan de rê vekiriye. Belkî jî ji xwe re li stargeh û hevgirtiyan digere. Jiyana li welatê

Kenanê (Îsraîl, Filistîna îro) vê tezê piştrast dike. Weke malbatekê ji qebîleyeke piçûk vediqete. Li Kenanê dibe qebîleyeke nû. Neviyê wî Yûsiv weke koleyekî tê firotinî Misrê. Yûsiv bi jêhatbûn û qabîliyetên xwe di qesra firewn de heta bi mertebeya wezîrtiyê bilind dibe. Di vê de rola jinên qesrê girîng e. Di dîroka Ibraniyan de jin timî bi rola girîng radibe.

Li Misrê qebîleyeke Ibrî pêk tê. Lê di rewşa nîv-koleyan de ye. Ji vê gelekî ne biste û bêzar in. Mîna ku firewn şûna nemrûd girtibe. Dixwazin ji wî jî xilas bibin. Pêşengiya hîcretê vê carê wê Mûsa bike. Dîrok nêzî 1300'î B.Z. ye. Di Pirtûka Pîroz de ev gavavêtin û derketin bi mûcîzeyan barkirî ye. Dişibe gavavêtin û derketina Brahîm. Veger dîsa ber bi welatê Kenan e. Li gorî Misrê welatê Kenan mîna 'cenneta soza wê hatiye dayîn' e. Xwedayê lê digerin li Çiyayê Sînayê (Torê Sîna), bi Deh Fermanên zelal û vebirrî bang li qebîleyê dike. **Deh Ferman** bernameya siyasî û rêzikên rêxistinbûnê ne, û ya rastî qebîle di encama ezmûn û tecrûbeyên xwe yên demeke dirêj de gihiştibû wan. Qebîle ji sedî sed dînên Nemrûd û Firewnan diterikîne û dînê xwe yê etnîk (bername û fikra xwe ya dinyayê) dadimezrîne. **Pirtûka Pîroz** bi dengekî xwedayî dûrûdirêj qala pêvajoyên piştre dike. Li pêşberî me êdî ne çîrokên mîtolojîk ên mîna li Sumer û Misrê, belê rêzikên dînî yên vebirrî rast (Ortodoks) hene.

Di dîroka dînan de ev rewş tê maneya şoreşa mezin. Li gorî dema xwe tê maneya şoreşa fikra mezin. Lêkolîn nîşan didin ku rêûresma Ibrî yek ji çavkaniyên bîr û hafizeyê yên herî pêşketî yên Rojhilata Navîn e. Qinyeta min a şexsî ew e, Ibraniyan bi xwe, mîtolojiya Sumer û Misrê bi şêweyê 'dîn' veguherandine vegotinê (retorîk). Tevahiya pêvajoyên dîrokê ji çavkaniyên Zerdeşt, Babîl (nexasim di dema mişextiya 596 B.Z. de), Fenîke, Hûrrî û Grekan li vê vegotinê zêde kir û Pirtûka Pîroz (Tewrat) pêşde birin. Divê neyê jibîrkirin ku Pirtûka Pîroz cara pêşî di dema 700-600 B.Z. de hatiye berhevkirin, tomarkirin. Beriya wê ti çavkaniyeke nivîskî nîne.

Ez vê xusûsê divê bi girîngî diyar bikim: Cihû tevahiya dîrokê bi tenê **SERMAYE** û **PERE** nadin hev, berhev nakin; bi awayekî herî jêhatî **ÎDEOLOJÎ** û **ZANIST-ZANÎNÊ** jî berhev dikin, kom dikin. Bêhêzbûna xwe ya ji aliyê hejmarê ve bi van du danehevên stratejîk li nava dinyayê

vediguherînin hêzê. Etnîsîteya Cihû (berê qebîle, roja me ya îro netewe) ne bi tenê di roja me ya îro de, tevahiya dîrokê bi saya van herdu danehevan timî li peravên desthilatdariyê û mertebeyên stratejîk karîbû bibe xwediyê jiyaneke payeberz. Lê pirsgirêkên xeternak û felaketên bi serê wan de jî hatin ji nêz ve bi van rastiyan re têkildar in. Bêguman, em sermaye û zanînê hêz-desthilatdarî û desthilatdariyê jî weke yekdestdariya sermaye û zanînê di xwendina dîrok û aktualîteyê de timî bikin rêbaz, wê pirsgirêka civakî hê zêdetir bi awayekî zelal û rastî were fêhmkirin. Ez ê zêdetir di beşê **Şaristaniya Demokratîk** de bînim ziman ka dînên Brahîmî di pirsgirêkên mezin ên civaka dîrokî de çareserker bûne, ji lewra ez ê li vir bi kurtî hûrbikolim bê ka zêdetir çiqasî rê li pirsgirêkên civakî dîrokî yên tevlîhev vekirine.

**Ahdî Atîk** (navê din ê Pirtûka Pîroz e) piştî Mûsa bi şêweyê rêber, rahib (Levîliyan), pêxember-hukimdaran, pêxemberan û nivîskaran rêz dike, diçe. Hê piştre jî mirov dikare beşê ronakbîr û zanyaran (bi navên bi vî rengî) lê zêde bike. Wer tê fêhmkirin ku ji tevahiya zanyartiyên çavkaniya xwe mîtolojiyên Sumer û Misrê re (vedîtinên rahiban) pêxembertî tê gotin. Ahdî Atîk bi vî awayî tê şîrovekirin. Wezîfeya bingehîn a pêxemberan ew e, ji pirsgirêkên civakî yên mislê wan nedîtî yên yekdestdariya şaristaniyê pêkanîne, çareser bikin. Daneheva sermaye-berhemê zêde bi darê zorê yê eskerî û bi xebata bi darê zorê tê bi destxistin, eger em vê timî li ber çavan bigirin, ketina serhev a pirsgirêkên bûne mîna çiyan, wê baş bê fêhmkirin. Ji ber vê rastiyê, di nava beşên civakê de ku bi pirsgirêkên giran dixeniqin, pêxemberî weke bersivekê holan dide û derdikeve holê. Eger em li wesfê sazîbûnê bi vî rengî serwext bibin, ev yek wê xwendina me ya dîrokê zelaltir bike.

Bernameya siyasî û îdeolojîk a Mûsa, piştî mirina wî bi sêsed salan nêzî salên 1000'î B.Z. di bin hukimdariya pêxember SAUL-DAWID-SILÊMAN de rê li dewleteke hûrik vekir. Piştî ku ewqasî ji bo ewçend pirsgirêkên giran ên civakî têkoşiyan, di dawiyê de amûrê çareseriyê yê dîtin ji amûrê desthilatdarî û dewletê wêdetir ti amûr nebû. Gelekî eşkere ye ku ev dewlet ji dewleta Atînayê demokratîktir nîne. Dîsa eşkere ye ku ev dewlet

li gorî rêûresma dewletê ya Misr û Babîl-Asûrê ya ku ew demeke dirêj di nava wê de man, gelekî qels û bêçareserî ye. Baş e, di rêûresma Brahîmî de çima ewqasî li ser dewletê tê sekinîn? Ji ber ku vedîtineke pêxemberan e, ji ber wê. Ji endamên xwe re 'erdên weke cennetê soza wan hatiye dayîn' diyarî dike.

Tê zanîn ku dewleta Cihû ya pêşî piştî demeke kin di encama dagirkerî û pevçûnên li ser desthilatdariyê de hilweşiya (Pevçûnên kur û neviyên Dawid û Silêman, gefxwarinên Asûrê û dagirkeriya wê). Gelekî dişibe Îsraîla piştî sê hezar salan li heman şûna wê hatiye damezrandin. Lê dîsa jî divê mirov girîngiyê bi vê avakirina pêxemberan bide. Bandora wê tevahiya dîrokê ji ser desthilatdariyên şaristaniya navendî ti demê kêm nebû. Nexasim bi rêya îdeolojîk û sermayeya pereyî gelekî bi bandor bûye.

Rêûresma Hz. Îsa dibe duyemîn dînê girîng ê Brahîmî. Ji guloka pirsgirêkan re ku dagirkeriya Romayê bûye sedema wan, pêşkêşkirina peyamekê ye. Navekî din ê Îsa Mesîh e, ango **Xelaskar** e. Ev ekola salên miladî bi xwe dide destpêkirin, weke partiya pêşî ya ekumenîk (gerdûnî) a beşên xizan û proleterên lumpen ên Romayê were binavkirin, di cih de ye. Ji karektera milîtan a Tevgera Mûsa dûr e. Mirov dikare bibêje ji beşê jêr ê qebîleya Ibrî derketiye. Di rewşekê de ku qebîleyê jêhatîbûna xwe ya di warê çareseriyê de ji dest daye, çînîbûn, bajarbûn û desthilatdarbûnê nirxên kominî têra xwe kurmî kirine, weke berhemê şert û mercên berbiçav derketiye holê. Rengê xwe yê çînî û gerdûnî ji van şert û mercan digire. Di wê demê de jihevdeketinên bi heman rengî yên qebîle û qewman li Rojhilatê Derya Spî bi lez dibin. Grek, Asûr-Babîl û herî dawî tevgera kolonî ya Romayê gelek qebîle, bêkar û girseyên xizanan li naverastê birçî û bêcihwar hiştin. Pirr zêde gera li xelaskar û xwediyekî heye. Eşkere ye ku Tevgera Îsa îfadeyeke kolektîf a van lêgerînan e. Jixwe ji xwe re 'Peyam' dibêje. Ahdî-Atîk weke **Ahdî-Cedîd** (Încîl) tê nûkirin. Ziman û çanda şaristaniya demê Asûr-Aramî, Babîl-Keldanî, Grek-Helenî û Cihû-Ibranî ye. Latîniya Romayê hê nû çêdibe. Tê gotin, zimanê Îsa Aramî ye. Helenî, di dema Helenîstîk de li herêmê gelekî belav bûye. Aramî hezar sal e ku li herêmê zimanê çand û bazirganiyê ye. Helenî jî van xisletên xwe paşê bi

dest dixe. Ibrî jî wer tê fêhmkirin ku zimanê metnên pîroz e. Latînî hê nû weke zimanê rêveberiya nû cih dibîne.

Em hê li şopên erebî rast nayên. Em dibînin di nava qebîleyên çolê de pêşketî ye, li Nîvgirava Erebistanê bi bajarbûnê re vediguhere zimanê şaristaniyê. Dagirkirina wî ya herêmê wê bi Şoreşa Islamê re pêk bê. Tevî ku em li şopên zaravayên Farisî rast tên jî ew rewşa xwe ya pêşketî li sîstema çiyayên Toros-Zagrosê û navenda şaristaniya Pers-Sasanî pêk tîne. Herweha di serî de Sumerî û Qibtiya Misrê, gelek çand û ziman hene bi bandora şaristaniya navendî ji hev de dikevin û ji holê radibin. Zimanê Ermenî jî her diçe bandorê li herêmê dike.

Li herêmê du desthilatdariyên hegemonîk hene, yek çavkaniya xwe Rojhilat a din jî Rojava ye; împaratoriya navend Îtalya-Roma, împaratoriya Sasanî ya navend Îran-Qafqas e. Xwelihevrakişandina wan bi tevahiya leza xwe dewam dike. Şaristaniya sê hezar salî ya navend Mezopotamya cara pêşî ye ku derketiye derveyî herêmê û di navbera herdu şaristaniyên mezin ên hegemonîk de parvekirî mîrateya xwe dewam dike. Şerên di navbera wan de bi xwe li ser mîrateya şaristaniya Mezopotamyayê ye, û gelekî dijwar e. Belkî jî di dîrokê de têkoşîna hegemoniyayê ya herî domdar û zêde di vê demê de pêk hatiye. Mirov dikare Skender û piştî wî, weke raûnda pêşî ya vî şerî şîrove bike. Ji bo navenda şaristaniyê bikeve destê Rojavayê hê gelek zeman heye. Lê dîsa jî eşkere ye ku ji bo vê gavên destpêkê têne avêtin.

Di Împaratoriya Romayê de felsefeya Grek, di Împaratoriya Pers-Sasanî de jî doktrîna Zerdeşt (zêdetir sekuler û exlaqî ye) em dibînin ku ji pirsgirêkên çavkaniya xwe yekdestdariyên herdu şaristaniyan in, nikarin bibin çareserî. Jixwe rastiya şer çaresernebûnê destnîşan dike. Derfet û îmkanên nirxê zêde yê bi sînor mayî, dihêle ku yekdestdariyên ji aliyê hejmar û naverokê ve mezin û pirr dibin şer weke rêbaza herî baş a danehevê bibînin. Di dîroka şaristaniyan de şer bi awayekî amûrên daneheva sermaye û desthilatdariyê ne. Ango ti têkiliya wan bi çîrokên qehremaniyê re yên bûne efsane, nîne. Ev, di vê xebatê de dikeve aliyê propagandayê. Bi pênaseya xwe ya herî manedar, şerên roja me ya îro jî di

navê de, di tehlîla dawî de eşkere ye ku şer amûrê destguhertina sermaye û desthilatdariyê ye. Ji lewra wexta ku em ê dîrokê bixwînin, a divê ti carî neyê ji bîrkirin ew e, di navenda hêza herî bingehîn a hilberînê û têkiliyên wê de rol digire. Bêguman şerên bergirî û parastinê hene, armanca wan erdên di dest de, têkilî û hêzên din ên hilberînê, azadiyê, bi kurtî nasnameya civakê, ji bo vê jî avahiya polîtîk û exlaqî û eger hebe demokrasiya wê diparêze. Ji vê rastiyê rewabûna xwe digire.

Gelek caran tê gotin, şerên yekdestdariyê di dîroka şaristaniyê de bi erka motorekê rabûne. Ev, ji aliyê ku rê li ber teknolojiyeke jêhatîtir û nûbûnên rêxistinî-çalakî vekirine, rast e. Lê divê mirov zanibe ku ew bi xwe fenomenên herî li derveyî civakê, heta li derveyî xwezayê ne, û ji hovîtiyê jî wêdetir in. Dîsa jî ji ber ku amûrê yekdestdariyê ne, çavkaniya xwe civak in. Lê ji bo civakê ji civakbûnê derxin, van çavkaniyan diqedînin.

"Eger li aliyekî rûyê te dan, aliyê din jî bizîvirîne bila lê bidin" ev gotin li ser navê Hz. Îsa tê gotin. Bêguman ji bo wê demê gera mezin a li aştiyê îfade dike. Hay jê heye, şer çiqasî hilberînê diqedîne, aştî jî ewqasî tê maneya hilberînê. Di wê demê de tê zanîn feqîrî û bêkariya zêde ji ber şeran e ku ne serê wan ne jî dawiya wan heye. Lewma aştiyê mohr û daxa xwe kûr li Tevgera Îsewî xistiye. Tevger ê bi qasî sêsed salan van xisletên xwe biparêze. Her devera pêgeha Romayê û heta Sasaniyan pêketiye diçin û mîna avê diçizirin wan deveran. Bandora xwe heta bi Çîn û Hindê dike. Di wê demê de tevgerên bi heman karekterê yên derketî hene. Yek ji wan tevgera Manîheîst e ku zêdetir navenda xwe Sasanî ye. Mirov divê bi girîngî behsa vê tevgerê bike. Hz. Manî bi xwe dibêje "Ez ê heta bi Romayê biçim , aştiyê bi Sasaniyan re pêk bînim." Manîtî ji Îsewîtî û Zerdeştiyê têkel pêkhatiye, lê xwedî rengên hê hûrûkûr e. Eger ev doktrîn ji aliyê hukimdarên zalim ên Sasaniyan ve nehatibûya pelixandin belkî jî rê li ber Ronesanseke nû ya Rojhilata Navîn vekiribûya.

Di avakirina Konstantînopolîsê (Stenbol) de payeya dînê fermî dan Xiristiyantiyê (mirov jê re bibêje mezhebekî bi vî navî bûye giştî, duristir e), ji vê demê û pêve (325 P.Z.) bi lez bû îdeolojiya fermî ya Rojhilat û Rojavayê Romayê. Dîroka Xiristiyantiyê mijara me nîne. Aliyê wê yê bi

mijara me re têkildar, pêwendiya wê bi pirsgirêka civakî û yekdestdariyên desthilatdariyê re ye. Eşkere ye ku çawa orjînala Tevgera Mûsewî bi dewletê bi encam bû, versiyona wê ya duyemîn Tevgera Îsewî jî, qet nebe ekola wê ya pirraniyê, bi desthilatdarî-dewletê bi encam bû. Bi tenê îdeolojiya fermî ya Bîzansê nîne; bi xwe li Romayê salên 1000'î P.Z. dewleteke bi hêz e. Ji vê jî zêdetir, tevahiya çavkaniya bi hezaran amûrên civakê û zêdetir çavkaniya amûrên desthilatdariyê yên bi hêz û berfireh e. Belkî jî dewlet îfadeya wê ya herî fermî û sembolîk e.

Xwelihevrakişandinên navxweyî yên Xiristiyaniyê, pevçûnên Qatolîk û Ortodoksan, mezhebbûnên din ên navdar ji aliyê mijara me ve bi tenê gelek pirsgirêkbûna wan nîşan bide, xwedî mane ye. Armanca xwe ew bû, bibe dînê aştiyê, lê bi qasî ku mirovan biavêje êgir û bişewitîne bû şerûd, ev yek jî mohra şaristaniya navendî ya li ser piştrast dike. Ji îdeolojiyên şer ên bi koka xwe mîtolojîk zêdetir rê li şer vekir, gelo ev yek ê çawa were ravekirin? Li Rojhilat bi Îslamê re Şerê Xaçperestiyê, li Ewrûpayê berê şerê li dijî dînên qebîleyan û cadûyan, piştre şerên dijwar ên mezheban ên navxweyî û bi rola xwe ya di şerên mêtingehan ên li Emerîka, Efrîka, Awûstûralya û Rojhilatê Asyayê de Xiristiyantî bi temamî derketiye derveyî armanca xwe. Qewmên pêşî bûn Xiristiyan Asûrî, Ermenî, Keldanî û Helenên Anatolyayê ji bo ji pirsgirêkên wan ên giran re bibe çare, xwe bi dînê Xiristiyantiyê girtin, lê bûn qurbanê têkiliya Xiristiyantiyê bi şaristaniya navendî re. Xiristiyantiya bi awayekî milletperest şîrove dikirin, ew bi awayekî bi lez bi yekdestdariyên desthilatdariyên qewmên din re anî beramberî hev. Xiristiyantiya Rojava (di berdêla ji destdayîna peyama xwe ya cewherî) dibû desthilatdar û serketin bi dest dixist. Xiristiyantiya Rojhilat û Anatolyayê ji aliyê hêzên maskeya versiyona rêûresma pêşî ya dînê Brahîmî Musewîtiyê û versiyona sêyemîn Îslamê xistibûn rûyê xwe, hatin pelixandin, dîsa bi awayekî ji aliyê milliyetgiriyan ve (Ereb, Tirk, Kurd) hatin tesfiyekirin. Mînakên balkêş ên em li vir rûbirûyî wan dibin, nîşan didin ku pirsgirêka civakî çawa tê mezinkirin.

Ez divê teza xwe careke din dubare bikim: Rêûresma Brahîmî, her weha Xiristiyantî jî temsîlkirina çanda manewî îfade dikin ku çanda maddî ya

şaristaniya navendî nîşan didin. Ya rastî, bi awayê xuya dike, armanca wê çareserkirina pirsgirêkên civakî yên giran e ku vê çanda maddî ango yekdestdariyê rê li wan vekiriye: Çawa ku sosyalîzma pêkhatî (sosyalîzma zanistî) ji bo çareserkirina pirsgirêkên çavkaniya xwe kapîtalîzm, bû namzet. Lê ji ber qalibên jiyan û zanista wan, nikarîbûn ji qalibên modernîteya serdema pêwendîdar bibihurin, di encamê de dibin versiyoneke nû ya şaristaniya navendî ango yan dibe hegemoneke wê yan jî dibe hêzeke qels a bi ser wê ve. Yên di doza xwe de heta dawiyê radîkal û durist man jî herçiqas mîrateyeke girîng li dawiya xwe hiştin jî nikarîbûn xwe ji tesfiyekirinê rizgar bikin. Ji ber vê sedemê, ez rêrûresma Brahîmî timî dişibînim tevgera sosyal demokrasiyê. Çawa ku sosyal demokrasî ji pirsgirêkên giran ên şaristaniya kapîtalîst rê li wan vekiriye, ji bûna rêçeteyeke pansûmanê wêdetir neçûye, dînên Brahîmî jî bi rola xwe ya di pêvajoya dirêj a dîrokî û hê gerdûnî de ji pirsgirêkên şaristaniya navendî yên gelek êş dan, birçî û bêkar hiştin, weke çareserî ji hin hewldanên reformê wêdetir nikarîbûn biçin. Di encamê de ew bi xwe jî neçar bûn pirsgirêk û nikarîbûn ji vê aqûbetê xilas bibin. Xeta rêûresma Brahîmî weke bernameyeke siyasî û îdeolojîk, divê mirov wê baş analîz bike, ji hev derxîne. Ji ber ku ji bo fêhmkirina tevahiya sîstema dinya kapîtalîst ev hewldan gelekî girîng e. Hem ji bo ku mirov Sîstema Dinyayê ya I. Wallterstein bi sîstema şaristaniya navendî ya pênc hezar salî ve girê bide, hem jî ji bo fêmkirina jihevdeketina ji hundir a sosyalîzma pêkhatî, ev hewldanên çareseriyê gelekî girîng in.

Weke dîn sêyemîn versiyona girîng a rêûresma Brahîmî Îslam e. Wexta em vê versiyonê analîz bikin, cewherê di binya wê de wê baştir bê fêhmkirin. Ji aliyê xebata siyasî û îdeolojîk ve Îslam jêhatîtir e. Ez wexta li ser Hz. Muhammed diponijim, ez timî hewl didim wî weke nûnerê herî mezin û dawî yê wan rahibên pêşî yên Sumeran ên têgînên xwedayî ava kirin, şîrove bikim. Rahibên Sumeran wexta têgînên herî pêşketî yên demê ava dikirin, li pişt wan rêûresmên herî pêşketî yên mîtolojîk-dînî yên wê demê hebûn. Divê mirov baş zanibe ku Hz. Muhammed jî agahiyên mîtolojî û dînî yên di zeman û mekanê xwe de, heta agahiyên zanist û felsefeyê bi

sînor be jî dawerivandiye hinavê xwe. Bi qasî sîstemên qebîleyan, ji du hegemonên global ên li ber serê xwe ango Împaratoriyên Bîzans û Sasanî jî pirr hindik şaristanî jî nas dikir. Karîbû teşxîs bike ku pirsgirêkên giran ên civakê çavkaniya xwe herdu sîstem in. Haya wî ji bandora qebîlegiriya ereb a civakê dirizîne hebû û ji vê jî wêdetir, ji nêz ve dîtibû ka avahiya mêtinkar û zordest a yekdestdariyên desthilatdariyên Bîzans û Sasanî çawa civakê belav dikin û nikarin pêşde bibin. Ji lewra mirov dikare fêhm bike ka çima hewl daye bi awayekî radîkal ji herdu sîsteman qut bibe. Ew jî weke Îsa, bêtir nêzî tebeqeyên jêr e. Kole û jinan nêzî xwe dibîne û ji vê fikaran nake. Tevî ku ji komên Mûsewî û Suryanî yên li ber serê wî bi tesîr dibe jî şahid e ku ew jî nikarin pirsgirêkên civakê çareser bikin. Dînên Pagan (pûtên li Mekkeyê) weke rêûresmên paşverû yên ji zû ve dema wan bihurî û temambûyî îlan dike. Peyama 'pêxemberê dawî' ya di rêûresma Brahîmî de gelekî bala wî kişandiye. Di vê rewşê de ji ya bike ya herî zêde dike û diwêre xwe li sêyemîn reforma mezin (mirov dikare jê re şoreş jî bibêje) rakişîne.

Helwesta Marks û Engels li dijî utopyageran û helwesta Muhammed li dijî Musewî û Îsewiyan, heta Sabiiyan (komeke girêdayî baweriya yek xwedayî) wekhev in. Wan sosyalîzma rastî ji sosyalîzma utopîk veqetand, Muhammed jî rêûresmên Brahîmî yên zêde zeman di ser wan re bihurî bi rojanekirinê dike heqîqet. Bi gotineke din, wî şîroveya xwe ya rastir a dînî kiriye. Quran û hedîs di destên me de ne. Bi qasî bernameyeke siyasî û îdeolojîk, gelekî waza exlaqekî nû dikin. Rêzik û pîvanên ekonomîk jî hene. Heta qanûnên şer jî ji nû ve hatine sererastkirin. Ez ê di beşa zanistê de vê rêbaza em jê re dikarin bibêjin şêwazê pêxember, hê bi awayekî berfirehtir analîz bikim. Ez ê niha tenê bi gotina rêûresmeke baş e, qîma xwe bînim.

Bi hêsanî mirov dikare bibêje, Îslam ji fikrên orjînal yên Musewîtî û Xiristiyantiyê bêhtir şaristanîparêz e. Hê di deh salên destpêkê yên derketina xwe de karîbû mîrasa tevahiya şaristaniyên kevin ên Rojhilata Navîn bigire. Di salên 650 P.Z. de Îslam ê karîbû sîstema desthilatdariya hegemonîk a herî bi hêz li herêmê damezrîne. Ji ber ku pêdiviya mijara me bi qalkirina çîroka wê nîne, zêdetir em ê di çarçoveya pirsgirêkên civakî

yên herêmê û heta yên dinyayê (ji ber ku xwe ji tevahiya rûyê erdê re mizgîn dike) de lêkolîna xwe li ser wê dewam bikin.

Em ji têgîna Ellah a Hz. Muhammed piştrast in ku di asta herî jor de muceredkirina civakê û îfadeyeke wê ya nasnameyî ye. Li gorî min di vê mijarê de teolojiya Îslamê gelekî tiral e, û nikarîbûye hêjayî Hz. Muhammed bibe. Beridîn û dewlemendiya teolojiya der barê Xiristiyantiyê de mîna ku di Îslamê de hatiye rawestandin. Di pêş de ez ê li ser vê mijarê rawestim, ji lewra ez bi tenê vê dibêjim û derbas dibim. Hz. Muhammed pirr zêde li ser têgîna Ellah disekine û bi pîroztiyê barkirî li ser radiweste. Fêhmkirina vê nêzîkatiya wî girîngiya xwe hê diparêze. Li gorî min, Hz. Muhammed der barê hebûna Ellah de ji guftûgoyeke teorîk zêdetir, bi cewherê Wî yê civakê re mijûl bûye. Di vir de gelekî hewl daye. Wexta ayet hatine di nava xwêdanê de şil bûye, ji xwe çûye. Divê mirov vê rewşa wî weke nîşaneyên vê hewldana wî bihesibîne. Divê em karibin ciddî bigirin. Nodûneh sifetên ji bo Ellah destnîşankirî utopya û bernameyeke civakî ye ku ji utopya herî pêşketî ya civakî berfirehtir e. Hem jî têra xwe bi rastî nêzîk dibe û bi berpirsiyarî pêve girêdayî ye. Bêşensî ew bû ku kesên piştî Hz. Muhammed hatin cahiliya wan li aliyekî li aliyê din a xirabtir pir bi lez bi ber şehweta desthilatdariyê ketin.

Îslam weke şoreş belkî jî ji vî alî ve di serê wan şoreşan de tê ku xiyanet pê hatiye kirin. Xelîfeyên wî jî di navê de peyrewên Hz. Muhammed bihêlin serwextbûn, bername û şêwazê jiyana wî bi cih bînin, nikarîbûne wî fêhm bikin û di pratîkê de xiyanetên mezin lê kirine. Ji ber ku hewldanên Hz. Elî bi ser neketin, em nikarin pêşbîniyê bikin ka wê çiqasî Muhammed bi cih bianiya. Di serî de sunnîtî, bi tevahî hewldanên şîrove û emelên mezheban Muhammedî nînin, jê dûr in. Rêûresma seltenetê (desthilatdarî) ya bi Emewiyan destpê kir jî eger bi awayekî çor bînin ziman, ji yekdestdarên desthilatdariyê yên herî xirabtir, ti maneya xwe nînin. Ez ji xwe piştrast im ku Îslamgiriya radîkal nexweşiyeke desthilatdariyê ye. Bihêlin ku Îslamê zindî bike, bi awayekî hîç heq nekiriye têk dibe û diçe. Gotina Îslama provakatîf li van Îslamgirên cehîl tê. Eger wê peyamek ji Îslamê were

girtin, di bin nav û şêweyekî din de dibe ku manedar bibe. Ez vê xusûsê jî ji paşê re dihêlim.

Ez yekdestdariya desthilatdariya rastî ya di bin navê Îslamê de girîng dibînim, lê ne weke Îslam; ji ber ku di vê yekdestdariya desthilatdariyê de tiştekî bi navê Îslamê nîne. Li naverastê ji bilî desthilatdarî û sembolên dewletan ên li ser xeta Asûr, Pers, Roma û Bîzansê dimeşin zêdetir tiştekî din nîne. Weke desthilatdarî der barê Îslamê de vê diyar dikim. Bêguman weke hêmana çanda manewî xusûsên têde bi bandor bûyî hene. Di vê nuqteyê de xusûsekê divê ez bi girîngî diyar bikim; ez di çarçoveya îdeolojiyan de binavkirina civakan rast nabînim. Mînak binavkirinên weke Civaka Xiristiyaniyê, Civaka Îslamê û Civaka Hindû. Binavkirinên bi vî rengî civakê dikin dînî û ji lewra jî rê li gelek kêmasî û şaşiyan vedikin. Ev têgîn fêhmkirina xwezaya civakê asteng dikin. Heman xusûs ji bo têgînên civaka kapîtalîst û sosyalîst jî di cih de ne. Di pêş de ez rawestandina li ser van mijaran bi kêr dibînim. Mirov dikare binavkirina rast weke Civaka Şaristaniya Demokratîk û Civaka Şaristaniya Yekdestdar diyar bike. Ev ji ber ku dikare tevahiya civakê bide xuyakirin, dibe ku manedartir bibe.

Li Rojhilata Navîn di navbera sedsalên 5-15. P.Z. de bi giranî hukmê desthilatdariyên Îslamî meşiya, xwediyê serdestiya hegemonîk a sîstemên şaristaniya navendî ye. Desthilatdariyên Îslamê li ser mîrateya desthilatdariyê ya ku Bîzans û Sasaniyan dewr kir, hê bêtir berfireh û kûr bûn. Civak neçar ma bêtir bikeve nava desthilatdariyan û bibîne. Bi vî awayî, hejmara dewlet, xanedan û qewmên desthilatdariyê ew kirine çarçoveya xwe, zêde bûne. Bi vê ve girêdayî şerên desthilatdariyê ji leza xwe neketine, berevajî bi leztir bûne. Giranî ketiye aliyê yekdestdariya eskerî. Di yekdestdariya eskerî de jî pêşketin çêbûne. Îslam bi giranî îdeolojiyeke yekdestdariya eskerî û bazirganiyê ye. Bajar mezin bûne. Di cotkarî û îndustriyê de pêşketin hê bi sînor in. Pêşketinên di hunerê de jî bi sînor in. Mirov nikare bibêje ku ji Grekan jî bihurî ne.

Dema desthilatdarî û dewletên Îslamî, dema dawî ya desthilatdariya hegemonîk a Rojhilata Navîn e. Bi dawîbûna sedsala 15. P.Z. re navenda şaristaniya navendî ya hegemonîk bi rêya Venedîkê dikeve destê Rojavayê

Ewrûpayê, di wir re jî derbasî Amsterdam û Londonê dibe. Rojhilata Navîn ji tevahiya dema neolîtîkê (10000-3000 B.Z.) û dema şaristaniya navendî ya çar hezar û pêncsed salî re bûye navend. Ji vê demê û pêve ji ber pirsgirêkên mîna çiyan mezinbûyî yên şaristaniyê rê li wan vekirî, hilhiliye, serkorî û kotrimî bûye, westiyaye, nikare xwe nû bike û şibiyaye kavilekî civakan.

Dema ku em di çarçoveya pirsgirêkan de li rola rêûresma Brahîmî ya di sîstema şaristaniya navendî de binêrin, beriya her tiştî em ê bibînin ku nikarîbûye desthilatdariyê bi sînor bike, berevajî hê zêdetir kiriye. Di vê çarçoveyê de hejmara dewletan zêde û hecmê wan berfireh dibe. Ji lewra pirsgirêkên çavkaniya xwe yekdestdariya desthilatdarî û dewletê ne, qatbiqat zêde dibin. Bi vê ve girêdayî, şer weke amûrekî damezrandina yekdestdariyan bi zêdeyî hebûna xwe dewam kiriye. Têgînên demokrasî û cumhûriyetê hê nehatine naskirin. Bi giranî hukimraniyên weke xanedaniyên ji rêûresmê pirr dibin û dewam dikin.

Duyemîn, giraniya civakê li beramberî desthilatdarî û dewletê kêm bûye. Qada polîtîk û exlaqê civakî têra xwe teng bûne. Ji nerazîbûna vê tengbûnê mezheb derketine, çêbûne. Serweriya zilam li ser jin û ciwanan zêdetir dibe û dewam dike. Tevî ku koletiya herî kevin a weke dema firewn li dawiyê hatibe hiştin jî şêweyên nû yên koletiyê (nexasim koletiya ji Efrîkî û Slavan) ji leza xwe hîç nakevin.

Di bazirganî û bajarbûnê de tevî ku pêşketin hene jî lê ji heybetên xwe yên berê gelekî paşde mane. Bi ti awayî xwe nikarîbûn bigihînin asta bazirganî û bajarbûna Greko-Romen. Li cotkarî û îndustriyê tiştekî bi qîmet zêde nekirin.

Sêyemîn, belkî jî bandora wê ya herî neyênî ew pirsgirêk bûn ku bi serdestbûna milletperestiya qebîle û qewman a di rêûresma Brahîmî de derketin holê û gihîştin asta jenosîdê.

Gotina ‘Qewm û evdên Xwedê yên hilbijartî’ koka vê milletperestiyê ne. Berê Ibranî ‘Qewmê Xwedê yê hilbijartî’ hatine hesibandin, paşê Ereb hêjayî navê ‘qewmê necîb’ hatine dîtin. Ezbetên Tirkan di cengaweriya Îslamê de gaveke din pêşde çûne û Îslamtî kirine nasnameyeke bi kok.

Asûrî weke qewmê pêşî yê Îsewîtî qebûl kiriye xwe pîroz kiriye, piştre Grek û Ermenî jî ji vê paşve nemane û xwe weke qewmên pîroz ên pêşî îlan kirine. Belavbûna Xiristiyantiyê li Ewrûpayê rola xwe di pêşketina milletperestiyê de girîng e. Tê gotin ji ekumeniyê (gerdûnîtiyê) zêdetir milletperestî bi lez kiriye. Milletperestiya Rûs jî bi awayekî berhemê Xiristiyantiya Ortodoks e.

Rêûresma Brahîmî bi vê bandora xwe ya li ser qewmperestiyê, nexasim li ser qewmên qedîm ên Rojhilata Navîn ne tenê pirsgirêk, felaketên trajîk barandine. Ji qewmên herî kevin ên Xiristiyanbûyî Asûrî, Ermenî, Pontûsî û Îoniyayî, ji aliyê desthilatdarên Ereb, Tirk û Kurd ên Îslambûyî hatine ber tesfiyeya civakî. Mirov di vê de rola Cihûyan jî nikare piçûk bibîne. Tesfiyeya Ermenî, Asûr, Îon, Pontûs, Êzîdî, çand û gelên din ên misilman nebûyî, bi giştî Rojhilata Navîn, bi taybetî jî Anatolya ji aliyê çandî ve kiriye mîna çolê. Herêma ji van gelan mehrûm bûyî bi paşverûtiyeke mezin re rûbirû bûye, ji ber ku van gelan di nava xwe de çanda herî kevin dihewand. Ji bo tevahiya gelên herêmê jî ev zirar û ziyaneke trajîk e. Tesfiyekirina gelan û çandên wan, bi tenê pirsgirêkên civakî giran nekirine, hêza wan a çareseriyê jî gelekê qels kiriye. Ji van gel û çandên ji gelek zanist û huneran re pêşengî kirî mehrûmmayîn, tê wê maneyê ku civaka herêmê hafiza û jêhatîbûna xwe ya zanist û hunerê, ji dest dide.

Di bin bandora Xiristiyantiyê de trajediyên bi heman rengî li Emerîkayê bi serê Çermsoran, Aztek û Înkayan, li Awûstûralyayê jî bi serê xwecihan û Eskîmoyan de anîn. Herçiqasî rejîmên dînî bin jî, rejîmên bi desthilatdariyê şehwetbûyî û şerbetbûyî ti xirabiya nekin, pirsgirêk û trajediya rê lê venekin, nîne. Ez divê neçar dubare bikim ku rêûresma dînî ya Brahîmî ku di bin bandora giran a çanda maddî ya şaristaniya navendî de ye, serwextbûna wê, bername û jiyana wê, ji bihurîna vê şaristaniyê zêdetir, ew hinekî din nerm û adil kiriye. Ango reforma pargirtinê ya ji berhemê zêde ye; heqê tevlîbûna yekdestdariyê ye. Wan bi xwe ji bo vê, bi îdeolojiyê ji desthilatdariyê re qada rewabûnê pêk dianîn û di berdêla wê de jî ji desthilatdaran para xwe dixwestin. Wexta ku para xwe nedigirtin têdikoşiyan, serî radikirin, li ber xwe didan, lê wexta para xwe digirtin

bêdeng dibûn. Em ê heman çîrokê di sosyalîzma Ewrûpayê de jî bixwînin. Jixwe em ê bibînin ku herdu jî dewama hevdu ne. Bêguman rola wan a mezin di gerdûnîkirin û dewamkirina şaristaniyên qedîm de ango di zeman û mekanê wan de çêbûye. Lê vê rola wan pirsgirêka zordestî û mêtinkariya qedîm a civakê kêm nekiriye, berevajî zêdetir û domdar kiriye.

**c-** Di giranbûna pirsgirêka civakî de qonaxa dawî qonaxa desthilatdariya hegemonîk a şaristaniya navendî ya Ewrûpayê ye ku mezin û bilind dibe. Ji şaristaniya Ewrûpayê ya ji salên 1500'î P.Z. ve li nava dinyayê dest bi mezinbûnê kirî re gotina 'kapîtalîst' bûye mîna rêbazê. Herweha hatiye îddîa kirin ku yekane ye, mîna wê peyda nabin. Bi taybetî jî tê destnîşankirin ku gelek tiştên pêkanîne jî mîna wan (dewleta netewe, îndustrî, înformatîk, sîbernîtîk) nînin. Bi sedema hegemoniya entelektuel îddîayên zanista civakî ya Ewrûpayê navend digirin weke rastiyên pozîtîv têne pêşkêşkirin. Ev rastiyên pozîtîv ên ji dogmayên dînî zêdetir weke rastiyên vebirrî dixwazin bêne qebûlkirin, ya rastî dogmayên nû yên modernîteyê ne.

Bêguman mirov nikare înkar bike ku avahiya şaristaniya Ewrûpayê cudahiya xwe heye û veguheriye. Lê şaristaniya navendî tevahiya dîrokê pêşketiye, veguheriye, gelek zeman û mekan nas kirine. Dewamî heman şêwe dubare nekirine, timî cudabûna wê pêk hatiye. Jixwe li gorî herikîna gerdûnî divê bi vî awayî pêş bikeve. Îddîaya dibêje yên mîna wê nînin jî, îddîayeke ji xwe zêde ye. Ji destpêkê heta dawiyê xisletên bingehîn ên mohra xwe li şaristaniya navendî xistine û karektera wê diyar kirine jî tevahiya pênc hezar salan ji aliyê cewherî ve bi xwe neguherîne. Dibe ku ji aliyê teknîk û rêjeyê ve cudahî hebin. Dibe ku di rêxistinî, kêrhatî, îdeolojî û rêveberiyên wê de cihêrengî hebin. Tevî van şêwe û cudahiyên cihêreng, xisleta xwe ya her tim dewamkirî, hegemoniya wê ya yekdestdariya li ser NIRXÊ ZÊDE ye. Dibe ku naveroka yekdestdariyê biguhere, lê ew bi xwe naguhere. Sêberiya rahib + esker + rêveber her tim heye. Giraniya wan dikare li gorî zeman û mekan biguhere. Lê yekdestdarî van beşan timî li ber çavan digire. Dibe ku rêbazên bi destxistina berhemê zêde yan jî nirxê

zêde biguherin, lê ew bi xwe naguhere. Nirxê zêde, yan bi zêdekirina hatina ji cotkarî û îndustriyê, yan bi bazirganiyê, yan jî bi saya fethên eskerî dikare bê komkirin. Ji van rêyan yek dikare li gorî zeman û mekan bibe xwedî giranî. Lê dîsa jî danehev û komkirin encama giştî ya vê rêbazê ye.

Ji bo fêhmkirina yekdestdariyê divê em îhtîmameke mezin nîşan bidin. Ew çawa ku bi tenê sermaye nîne, desthilatdarî jî nîne. Bi tenê li qada bazirganî, eskerî û rêveberî pêk nayê. Îfadeya yekbûyî ya tevahiya van qad û nirxan e. Ya rastî, yekdestdarî ekonomî jî nîne. Bi zor, teknîk û rêxistiniyên di destê xwe de li ser qada ekonomîk hêza desteserkariyê ye; şîrketa wê ye. Lê şîrketa ekonomîk a em nas dikin nîne, di tehlîla dawî de hevpariya komkirina sermayeyê ye. Carnan xwe weke amûrê desthilatdariyê yê nebûye dewlet, carnan jî weke dewletê derdixe pêşiya me. Di roja me ya îro de sifetê 'şîrketa ekonomîk' gelekî bi kar tîne. Çawa ku min qala wê kir, ji ekonomîbûna wê zêdetir, mirov jê re 'şîrketa desteserkirina ekonomiyê' bibêje rastir e. Carnan dikare xwe weke artêş, li gelek deveran yekîtiya bazirganan û weke yekdestdariya îndustriyel jî nîşan bide. Yekdestdarî dikare weke extepotê gelek mil û şaxên xwe hebin. Carnan dikare weke bandora yekbûyî ya gelek hêzên cuda û potansiyelan derkeve holê. Ji van hemûyan jî girîngtir, nirxê zêde yê civakî weke sermayeyê di destên wan de kom dibe. Rastiya bingehîn a ku pênc hezar sal e naguhere, bênavber dewam dike û bi awayekî kumulatîf mezin dibe, ev e. Ji bo ku ev rastiya naguhere dewam bike û weke xelekên zincîrwarî qut nebe were meşandin, di mekan û zemanên cuda de reqabet-hegemoniya, bilindbûn-daketin û navend-hawîrdorê pêk tîne.

Gotinên 'kapîtalîzm' û 'sîstema kapîtalîzmê' têgînên bi armanca propagandayê ne. Divê haya mirov ji vê hebe. Berdêleke diyar a naveroka van têgînan dikare were diyarkirin. Lê eger bi temamî weke sîstematîka têkilî, bûyer û diyardeyên heqîqetê îfade dikin bêne şîrovekirin, tehlûkeya wan heye xwezaya civakî û pirsgirêkên wê berevajî bikin. Herikîn û meşa jiyana civakî cuda ye. Ji asta pirsgirêkên civakê gihiştinê eşkere diyar dibe ku ji vê herikîn û meşê re zanist û zimanekî nû divê.

Eger kapîtalîzm sîstemeke daneheva sermayeyê be, piştrast bûye ku cara pêşî bi awayekî berfireh ev danehev di dema dewletên bajêr ên Sumeran de pêk hatiye. Bi awayekî hê destpêk be jî şîrketên sermayeyê, pereyên wan, kewarên wan, rêxistinî û rêveberiya wan bingehê van dewletokên bajaran e. Belkî bajar bi xwe jî yekdestdarî û şîrketa sermayeyê ya pêşî bi xwe ye. Tevî bazirganî, eskerî, artêşa xwe ya zanist û hunerê, birêveberên rahib û koleyên karker hê di wê demê de çînên bingehîn ên civakî ne. Perestgeh (Zîggûrat) di heman demê de cihê fabrîke, devera hewandina karker-kole, navenda rêveberiya fermandar û rahib, rêveber û esker bû. Jixwe qatê herî jor ê perestgehê cihê kontrol û çavdêriya xwedayan bû. Hemû di navhev de û bêqusûr hatibû sererastkirin. Ez vê mînakê harîqa dibînim. Ez wê weke 'malzaroka dolê' ya şaristaniya me (bi tevahî avahiyên dewlet, çîn û bajêr şikilgirtî) dinirxînim. Çîroka şaristaniya navendî ya pênc hezar salî ji vê rastiya vê perestgeha li zeman û mekan vedibe û belav dibe zêdetir, tiştekî din nîne.

Ez yeqîn nakim ku ji rêxistiniya vê perestgehê orjînaltir û mukemmeltir şîrket, karxane û yekdestdariyeke kapîtalîst karibe were afirandin. Çawa şaneyên sereke çavkaniya tevahiya şaneyan e, şaneya sereke ya tevahiya avahiyên yekdestdariyê jî (rêveber, esker, ekonomî, bazirganî, zanistî û hunerî) rastiya vê perestgehê ye. Tevahiya erdkolanên arkeolojîk ên hatine kirin vê rastiyê piştrast dikin. Mînakên kevirên tîk hatine danîn ên li Xirabreşka Ûrfayê hatin keşifkirin, weke 'supernovaya' dîrokê têne binavkirin. Heye ku ev perestgeh (perestgeha komên nêçîrvan û yên berhevkar ên beriya neolîtîkê 10000-8000 B.Z.) di dîrokê de ya herî kevin be. Fikrên arkeologên navdar bi vî awayî ne. Berî dîrokê danehevên sermayeyê yên pêşî bi vî awayî destpê kirin û di her erdkolanê de bi mînakekê ev xwe eşkere piştrast dike.

'Kapîtala' navenda wê Ewrûpa ye, nabe were înkarkirin ku şêweyê herî dawî yê yekdestdariyê û asta wê ya herî jor temsîl dike. Ji şêwazê danehev û hilberînê heta bi avahiya rêxistinî û rêveberiyê, ji teşkîlata wê ya eskerî heta bi yekdestdariya huner, teknîk û zanistê, eşkere ye ku cudahiyan pêk tîne. Lê îddîaya dibêje, ya mîna wê nîne, îddîayeke zêde mezin e. Ya rastî

ev, propagandayek e ku navenda wê Ewrûpa ye; bi gotineke din, îddîayên rahibên perestgeha Ewrûpayê (zanîngeh, artêşa zanista akademîk û hunerê) yên çîna nû yên bi dilqê modern in. Mirov bi hêsanî dikare diyar bike ku ev, ji dêra Xiristiyantiyê gelekî zêdetir, ji rewakirina 'sîstema kapîtalîst' re xizmetê dikin.

Mijara me nîne ku em dîroka bilindbûna şaristaniya Ewrûpayê li ser bingehê 'sîstema kapîtalîst' binivîsînin. Lê ev şaristanî ji sedsalên 5. û 6. P.Z. ve li ser şopên şêwazê teolojî, bazirganî, zanistî, teknîk û rêveberiyê, di sedsalên 9. û 10. de jî li ser a Îslamê (nexasim jî bi rêya Îber, Îtalya û Nîvgirava Balkanan) mezin û bilind bûye. Ev xusûs di dîroka nêz de baş tê zanîn. Bi tevahî dîroknas hemfikir in ku ji sala 1250 P.Z. û pêve navenda şaristaniya hegemonîk ji cihê xwe liviyaye, şemitiye, bi vî awayî navendên şaristaniyê li Rojhilat nizm bûne û pê re li Ewrûpayê jî destpê dikin bilind dibin. Herweha ji vê sedsalê re ango ji sedsala 13. re Sedsala Şoreşa Bazirganiyê jî tê gotin. Nexasim bi pêşengiya Venedîk, Cenova û Floransiyan ji sedsala 11. heta bi dawiya sedsala 15. bi giraniya xwe hemûyî bi tenê ji Rojhilat mal û alav veneguhestin, bi tevahî rêûresmên şaristaniya hezar salî, fikir û teknîkên wê, rêbaz û usûlên wê, bi kurtî çi nirxê civakê yê 'kêrhatî û hêja' hebe vediguhezin. Ev rastiyeke dîrokî ye ku baş tê zanîn. Eşkere ye ku navenda şaristaniyê li ser vî bingehî hatiye veguhestin. Dîsa rastiyên dîrokî ne ku nayên înkarkirin, Xiristiyantî, heta şaristaniya Greko-Romen, ji wê jî wêdetir Şoreşa Neolîtîk (5000-4000 B.Z.) ji Rojhilat hatine veguhestinî Ewrûpayê. Li gorî bîrûbaweriya min a şexsî, bi veguhestina çanda civakî ya panzdeh hezar salên dawî ji parzemîna Asyayê, nexasim ji Rojhilata Nêz a Asyayê, Nîvgirava Ewrûpayê karîbû senteza muhteşem a pêncsed salên dawî bike. Bi yek hevokê şîroveya min a dîrokê ev e!

Pirsgirêka min ne Rojhilatgirî, ne jî Rojavagirî ye. Fikar, armanc û hewldana min a bingehîn e ku ez yekparebûna civaka dîrokî, bênavberbûna wê û dewamkirina cudatiyên wê, di nava yekîtiyê de bi awayekî rast şîrove bikim.

Bêguman ên hatine veguhestin bi tenê avahî û rêbazên bingehîn ên şaristaniya navendî nînin. Pirsgirêkên civakê jî bi qasî wan hatine veguhestin. Xiristiyantiyê çi veguhestine, me bi vegotineke gelekî kurt qala wan kiribû. Nirxên maddî (bazirganî, hilberîn, pere, dewlet) yên şaristaniya Rojhilat herî kêm bi qasî nirxên wê yên manewî (Xiristiyantî, zanist) bi pirsgirêk bûn. Bi awayekî pirsgirêkan jî bêhn li Ewrûpayê çikandibûn. Xwezaya civakî ya Rojhilat a bi nakok û fêhmkirina wê gelekî zehmet wexta bê veguhestin, Ewrûpaya hê zêde xira nebûye, ciwan maye û hê di qonaxa civaka neolîtîk-cotkariyê de ye, erdheja wê rê li berê veke, mirov dikare texmîn bike. Pêşbaziya kî wê yekdestdariyê bigire li Rojhilat rê li bi hezaran şerî vekirî ye. Ewrûpa ji vê pêşbaziyê re amade nebû (xebatên amadekariyê yên pêş ên Xiristiyantiyê têrê nedikirin). Li Ewrûpaya ji vê re amade nîne, bêguman wê rê li zirarên gelekî mezintir vekiribûna. Li ser şerên nava sîstemê yên ji sedsala 16. pêve gurr bûn, şopên mîrateya hezar salan a Rojhilat heye. Li ser şerên ji Romayê vir ve diqewimin jî şopên heman çandê hene. Bêyî ku ez zêde mezin bikim, ez dikarim bibêjim, bi tenê nirxên pozîtîv ên maddî û manewî yên şaristaniya navendî veneguhestin Ewrûpayê; nakokiyên giran, pirsgirêk, şer û pevçûn jî hatin veguhestin. Heta di qirkirinên xeternak ên Ewrûpayê de şopên rêûresma şaristaniya Rojhilat bi zêdeyî hene. Qralên Asûran ji serê mirovan kelhe û birc ava dikirin û bi vê jî pesnê xwe didan. Bi tevahî despotên Rojhilat pirr bi xweşî behs dikirin ku çend qebîle, gund û civakên bajaran tine kirine, mirovên wan êsîr birine. Hem jî weke çîrokên qehremaniyê behsa wan dikirin!

Civaknasên Ewrûpayê bê sedem şopgeriya Rojhilat nakin. Ez van hewldanên wan hêja dibînim. Lê oryantalîzma heyî ji vegotina rastiyê gelekî dûr e. Dîsa jî dema mirov li ber mejiyên serhişk ên Rojhilatî digire, divê ez bibêjim, em divê malavahiya wan bikin. Di bin van hewldanên wan de niyetên pêş mêtinkariyê hebin jî armanca bingehîn ev nîne, fêhmkirina çîroka şaristaniya Ewrûpayê ye. Bi vî awayî diyarkirin, wê îfadeyeke rast be. Ji ber ku rêya fêhmkirina nakokî, pirsgirêk û şerên Ewrûpayê nexasim bi analîzkirina Rojhilata Nêz dibe. Armanceke din a vê hewldana min ew e,

ez di vê mijarê de bi dilnizmî di warê rê û rêbazê de alîkariyekê pêşkêş bikim.

Pirraniya mirovên Rojhilatî, yeqîn dikin ku Ewrûpî mirovên bi xwe bawer û gelekî zîrek in. Ez jî her Ewrûpiyê lê rast têm pirr xeşîm û bi qasî ku nikaribe di nav çanda Rojhilat de bijî narîn, saf û ne gurçûpêç dibînim!

Ez yeqîn dikim ku rêûresma civaka neolîtîk a Ewrûpayê bandoreke mezin li ser şaristanîbûna wê ya piştî sedsala 16. kiriye. Mirovê Ewrûpayê yê ji rêûresmê, heta bi sedsala 16. Xiristiyantî bi temamî qebûl kir, dawerivand hinavê xwe. Lê piştî sedsala 10. dema şoreşên bajaran jî di navê de, di tevahiya van pêvajoyan hemûyan de yekser şîroveya teolojiya xwe pêşde birin. Ev ê wan bibe Ronesans, Reform û Rohnîbûnê, bibe şoreşa zanistî-felsefî. Rêûresma dawî ya şaristaniya Rojhilata Nêz, Îslam e. Herçend Îslam belav bû, Rojhilat nikarîbû bibe xwediyê pêşketineke mîna civaka neolîtîkê. Bêguman gelek hunermend, zanyar û şîrovegerên serketî yên bi koka xwe Tirk, Fars û Kurd gihandin. Bi sînor be jî Ronesansek di sedsala 8.-12. P.Z. de pêk hat. Lê despotîzma Rojhilat a ji rêûresmê, bi avahiya xwe ya mîna kevir hişkbûyî wê dereng nemana û xwe li ser tevahiya çaviyên civakê serdest bikirana. Bandoreke gelekî girîng a pevçûnên navxweyî yên Îslamê ev bû. Lê sedema bingehîn pêşbaziya bidestxistina yekdestdariyê bû. Herweha rêûresma civaka neolîtîk a Rojhilat nêzî pênc hezar salan di bin xweferzkirina yekdestdariya despotîk de gelekî westiyayî, ji hal de ketî, cahil û neçar hatibû hiştin. Li muqabilî vê rêûresma neolîtîkê ya Ewrûpayê zindî, azad û gelekî afirîner bû. Ji ber ku mîna Rojhilatiyan despotîzmeke pênc hezar salî li ser wan pêk nehatibû. Herweha çawa ku me behs kir, aliyên erênî yên tecrubeya mezin a Rojhilat karîbûn bigirin. Ev herdu xusûsên bingehîn pirr girîng û klîtin, ji bo têgihiştina li mezinbûn û bilindbûna dîrokî ya Ewrûpayê.

I. Wallerstein û civaknasên nêzî wî fikra wî, analîzên xwe yên li ser 'sîstema dinya kapîtalîst' ji sedsala 16. didin destpêkirin. Ev xebatên wan ji bingehê dîrokî û ji rastiya ku kapîtal vedîtineke pirr kevin e, qut in. Qet nebe, mirov dikare bibêje ku di vî warî de kêmasiyên wan ên mezin mezin hene. Daxuyaniyên me yên kurt yên beriya vê, van xusûsan têra xwe rohnî

dikin. Jixwe şêwazê ravekirina daneheva sermayeya kapîtalîst a li sêgoşeya Venedîk, Amsterdam û Londonê zêde dibe jî dîsa xwedî heman kêmasiyan e. Eger zordestiya Carlosê V. û kurê wî Felîpeyê II. tevahiya sedsala 16. li ser Îtalya, Hollanda û girava Ingilîstanê nebûya, gelo pere-sermaye mumkîn bû ku bi wê zêdebûnê li hilberîna manîfakturel û cotkariyê bihata razandin? Serhildan û pêşveçûna neteweyî ya di şexsê Venedîkê de Îtalyayê bi ser nexist, Hollanda-Amsterdamê destpê kir û Ingilîstan-Londonê ew bi ser xistin. Ma Hollanda-Amsterdam û Ingilîstan-Londonê li dijî zexta derve ya eskerî-siyasî bi berxwedana hundir a eskerî-siyasî serketina xwe pêk neanîbûn? Bersiva ji bo herdu pirsan bê dayîn wê gotina Fernand Braudel piştrast bike: “Desthilatdarî-dewleta zêde dibe, wê kapîtalîzmê çêke.” Bîrûbaweriya min a di vî warî de hê li pêştir e; desthilatdarî-dewlet bi xwe yekdestdarî û sermaye ne. Jixwe ev yekdestdariya sermayeyê nebûna, nikarîbûn sermayeyê pêk bînin. Eger em bi teşbîhê îfade bikin, em ê bibêjin, çawa ku ji nêriyan şîr nayê dotin, ji amûrên desthilatdarî-dewletê yên ne yekdestdarî jî sermaye nayê dotin.

Hem zexta derve ya desthilatdarî-dewletê, hem berxwedana hundir a dewletê, hêmanên rastî ne ku rastiya Hollanda û Ingilîstanê afirandine. Împaratoriya navenda wê Spanya, ji ber ku tehlûkeya bi serê wê de bê baş dîtibû, pêşî gavavêtinên bajarên Îtalyayê tepisandin paşê (dijberiya Prensê Machiavellî wê bi ser nekeve) bi tevahî hêza xwe bi ser eyaleta Hollandayê û li girava Ingilîstanê bi ser pêkhatina yekdestdar-neteweperest a nû de çû. Eger bi ser nekeve wê bi xwe ji hev de bikeve, biçe. Berxwedana Hollanda û Ingilîstanê berfireh û demdirêj e. Ji aliyê dîplomatîk, ekonomîk, eskerî, bazirganî, zanistî-felsefî, heta dînî (Tevgera Protestaniyê), ji gelek aliyan ve di gelek bereyan de berxwedaneke mezin hatiye kirin. Em ji teknolojiya eskerî, rêxistiniyên stratejî û taktîk bigirin heta bi şîroveya herî radîkal a Xiristiyantiyê (Calvînîzm, Anglîkanîzm), ekonomiyê bi rêxistinî û gurçûpêç dike ji bo di asta herî jor de berdar bibe, bi qasî ku li hevgirtina bi Osmaniyan re bifikire xebatên dîplomatîk dimeşîne. Bi vê berxwedana stratejîk a bi awayekî berfireh hat meşandin pê Dewleta Elmanya-Prûsyayê kişand cem xwe û di encamê de bi tenê serketin bi dest nexist,

baş tê zanîn, kir ku navenda nû ya hegemonîk a şaristaniyê bibe Amsterdam û London.

Dîsa baş tê zanîn ku di vê navberê de xebatên sermayeyê gelekî zêde bûne, di dîrokê de cara pêşî ye ku pere-sermaye bi rola sereke radibe (li nava dinyayê zêr-zîv dibe çirrik û ev hêza fermanê ya pere zêde dike), gelek malbatên xwediyê pereyan (malbatên bi koka xwe Cihû hêjayî destnîşankirinê ne) bi rêya deyndarkirina dewletan gelek sermayeyên mezin komkirine û bûyerên di vî warî de di weke çîn rêxistinkirina bûrjûwaziyê de bi roleke diyarker rabûne. Dîsa tebeqeyeke civakî ya bi cureyê çîna karker di vê pêvajoya berxwedana mezin a neteweyî de pêk hat, divê ev ji nedîtî ve neyê. Ez nabêjim bi tevahî vê pêvajoyê ew pêkanî, lê alîkariya vê pêvajoyê jî nabe bê înkarkirin. Dîsa nabe were înkarkirin ku bi ekonomiya ku bendên li pêşiya xwe teqandin rê li Kûmpanyayên navdar (yekdestdariyên dewletê, dewlet bi xwe) ên Rojhilat û Rojavayê Hindê hat vekirin û ev di nava agirê van pêşketinan de hilat. Ez naxwazim vê guftûgoyê bikim: ji bingeh ekonomîk (avahiya jêr) û avahiya eskerî-siyasî (avahiya jor) kîjan li pêş tê? Ez bawer nakim ku ev guftûgoyeke kêrhatî ye. Polîtîka ekonomiya bûrjûwa (Kapîtala Marks jî di navê de) ya bêhna fikrên propagandayê jê tê, ji ravekirina rastiyan zêdetir, wan vedişêre, dinixumîne. Ji mêj ve dem hatiye ku mirov êdî nebe destikê vê!

Eşkere ye ku gavavêtina sedsala 16. di dîroka şaristaniyê de hegemonîk û sîstemî ye. Dîsa eşkere ye ku navend bi rêya Venedîkê (Bajarên Îtalyayê hemû, Lîzbon û Anvers jî di nava vê de ne) ketiye destê Amserdam û Londonê, modelên pêşî yên dewleta netewe bi pêşengiya Ingilîstan û Hollandayê hatine pêşdebirin. Bêguman şaristaniya nû hiltê ji yên beriya xwe hemûyan cuda ye, û veguherîneke mezin pêk aniye. Lê belê heke mirov van bûyer û pêşketinan hemûyan ji meşa şaristaniya navendî ya pênc hezar salî, mînak Aqadan ji Sumeran, Asûr û Babîlan ji Aqadan, Med-Persan ji Asûran, Misr, Hûrrî û Hîtîtiyan ji şaristaniya Mezopotamyayê, şaristaniya Greko-Romen ji tevahiya van bûyer û pêşketinan, dînên Brahîmî ji hemûyan qut bike, ma hingê em dikarin behsa şaristaniya Ewrûpayê bikin? Bi tenê veguhestina bi pêşengiya bajarên Îtalyayê (1000-

1300 P.Z.) nebûya û ev veguhestinê ji Îtalyayê heta bi peravên Rojavayê Ewrûpayê ve (1300-1600 P.Z.) dewam nekirana, ma wê mûcîzeyên Amsterdam û Londonê pêk bihatana?

Li yekparetî û domdartiya sîstema şaristaniya dinyayê serwextî nebe, di daxuyaniyên li ser dîroka civakî, analîzên zanista civakî û teoriyên wê de wê her kêmasiyê mezin û para pêxapîne hebin. Li cihê ku Xwezaya Yekemîn hewcedariyê bi daxuyaniyên dîrokî yên yekpare bibîne, Xwezaya Civakî ya bi xelekên sereke yên zincîrwarî ketiye zikhev, bêguman wê zêdetir hewcedariya xwe bi analîzeke dîrokî-felsefî-zanistî ya yekpare hebe ku ev yek xwedî girîngiyeke rêbazî ye ya ku dest jê nabe. Hegemoniya zanista civakî ya Ewrûpayê, demeke dirêj bi metafizîka hişk a pozîtîvîst ev rastî ji nedîtî ve hat, belkî jî bi vî awayî ji hegemoniya şaristaniyê re xizmet kir. Lê di zanista civakî de rê li ber tevlîheviyên mezin vekir. Di vê mijarê de analîzên kapîtalê xwedî berpirsiyariyeke mezin in. Ji ber lod û gidîşa pirsgirêkên heyî, kes nikare înkar bike ku beşekî mezin ên têne gotin ji ravekirina kapîtal û sîstemê dûr in, berevajî ji veşartin û nixumandina wan re xizmetê dikin.

Yekdestdariyên şaristaniyê yên tevahiya dîrokê jixwe bi awayekî hegemonîk, pêxîrtengî û navendî meşiyan, di pêvajoya Ewrûpayê de sedsala 15. li Venedîkê, sedsala 16. û 17. li Amserterdam-Hollandayê, tevahiya sedsalên 18. û 19. bi giranî meşeke navend Ingilîstan-London şopandine. Di vê xusûsê de hemfikriyek heye. Yekdestdariya şaristaniya Franseyê tevahiya sedsalên 15.-18. şerên ji bo bidestxistina hegemoniya (xeyala Romaya nû) li dijî Spanya, Hollanda û Ingilîstanê meşandî bi ser neketin. Elmanyayê di dawiya sedsala 19. de gav avêt şaristaniyê, ev hewldana wê bi têkçûna sala 1945'an bi temamî veguherî kabûsekê. Sedsala 20. ji hilatina şaristaniya DYE re şahidî kir. Piştî 1945'an wê serdestiya xwe temam kir û di roja me ya îro de jî (piştî 2000'î) em dibînin destpê dike derz lê dikevin. Ceribandina hegemonîk a Rûsya Sovyetê di navbera salên 1945-1990'î de pirr zêde serketî nebû. Ji bo demên pêş tê îdeakirin ku Çîn navenda nû ya hêza hegemonîk be. Ev îdea vê gavê spekulatîf e. Çawa ku di dîrokê de gelek caran hatiye dîtin, pêvajoyeke

xwedî gelek navendên hegemonîk dikare dema pêşiya me diyar bike. DYE, YE, Federasyona Rûsyayê, Çîn û Japonya dikarin bibin navendên bi îddîa rabin. Lê belê vê gavê mirov bi hêsanî dikare diyar bike ku DYE hêza super a hegemon e.

Nexasim ez bi taybetî li ser şîroveyên civaknasê Ingilîz Antony Giddens ên der barê moderníteya Ewrûpayê de (mirov dikare şaristanî jî bibêje) rawestiya bûm. Giddens îdea dike ku mînaka weke moderníteya Ewrûpayê nîne. Tevî ku ez bi sernavên sereke li ser pirsgirêkê rawestiyabûm jî bi awayekî giştî divê ez bibêjim, ev îdea zêdetir navenda wê Ewrûpa ye, û ji dîrokê qut e. Şîroveyên Giddens ên der barê moderníteya kapîtalîst de divê em weke nirxandinên moderníteyê diyar bikin, kapîtalîzmê bi tevahî weke sîstemeke Ewrûpayî û îndustriyê jî zêdetir weke şoreşek Ewrûpayê dihesibîne, dewleta netewe jî weke lingê sêyemîn ê sîstemê bi şêweyekî nû yê ceribandin-nîzamê pêşkêş dike. Dubare be jî divê ez bînim ziman ku kapîtalîzm di tevahiya şaristaniyan de hatiye dîtin. Di her şaristaniyê de kêm zêde pêşketinên îndustriyel û şoreş hene. Mirov dikare dewletên netewe jî di nava rewşa civaka netewe de weke dewletên qewm û xanedaniyan diyar û pênase bike. Bi şertê ku mirov vê kategoriyê zêde mezin neke, ji bo serwextbûna li Xwezaya Civakî dibe ku bikaranînên wê yên hê manedartir hebin.

Şaristaniya Ewrûpayê, ya rastî pirsgirêkên wê yên civakî yên qonaxa wê ya şaristaniyê xwe bi nakokî, pevçûn û şerên mezin, heta bi şêweyê qirkirinan nîşan dane, tevahiya qadên bûyeran derxistiye asta herî jor. Pirsgirêkên zêhnî, îdeolojîk, siyasî, ekonomî, eskerî, demografîk, cinsperest, milletperest, dînperest û ekolojîk gelekî mezin bûne. Ji vî alî ve jî, hemû mijarên bingehîn ên zanista civakî ne. Çarsed salên dawî yên Ewrûpayê ji tevahiya dîrokê zêdetir şer dîtine. Her şêweyê şer dîtiye. Şêweyên şer ên dînî, etnîk, ekonomîk, bazirganî, eskerî, sivîl, neteweyî, çînî, îdeolojîk, cinsperest, siyasî, dewletî, civakî, sîstemî, blokî, dinyewî û hwd. dîtine. Hema hema cureyê şer ê nehatiye ceribandin nemaye. Di hemûyan de rekor hatin şikandin. Bi mirin, êş, zirar û ziyanên xwe yên maddî!

Rastiyên em behsa wan dikin, bêguman nabe ku di meşa dirêj a dîrokê de berhemê demeke kin ango çarsed salên dawî be. Jixwe lêkolîna me ya kin nîşan daye ku nabe ev berhemên demeke kin bin. Eger mirov şîroveyeke rast û qedirşînas bike, mirov ê bibêje; ev şer encama tevahiya pirsgirêkên civakên dema Şaristanî û Neolîtîka panzdeh hezar salan kombûne bi serê civaka li Nîvgirava Ewrûpayê de belkî jî teqiyan e. Civaka Ewrûpayê bi guloka pirsgirêkên ji civaka kevin mayî bi awayekî serketî nebe jî bi maharet û hostatiyeke mezin şer kiriye. Jê hatiye ku bi têgihiştineke mezin lêbikole û şerê xwe jî manedartir bimeşîne. Ji bo vê jî pêvajoyên Ronesans, Reform û Rohnîbûnê afirandine, keşfên mezin ên zanistî kirine, ekolên felsefî pêşde birine, pêvajoyên destûrên bingehîn ên demokratîk pêk anîne. Qraltî damezrandine, ji text xistine, komar ava kirine. Sîstemên ekonomîk ên xwedî bereketeke nedîtî bi rêxistin kirine, şoreşa herî mezin a îndustriyê kiriye. Di huner û modeyê de hevrik û reqîbên wê nebûn. Bajarên bi heybet ava kirine. Malên balkêş ên zanist û tenduristiyê damezrandine. Sîstema şaristaniyê li tevahiya dinyayê belav kiriye. Sîstema dinyayê ya herî berfireh a dîrokê dîtî, ava kiriye.

Lê van pêşketinên gelekî mezin pirsgirêkên civakê çareser nekirin, ew bêtir tevlîhev kirin. Di serî de pirsgirêkên bingehîn ên roja me ya îro li nava dinyayê yên weke bêkarî, şer û hilweşîna ekolojiyê, ev rastî xwe di pirsgirêkên herî seresere û besît de jî dide der û diyar dike. Sedema bingehîn ew e, pirsgirêk koka xwe şaristaniya pênc hezar salî ne; şaristanî bi xwe gulokeke mezin a pirsgirêkan e. Bi ya min alîkariya herî mezin a Ewrûpayê ew e, karîbû berê neynika zanistê bide van pirsgirêkên gelekî mezin ên şaristaniyê. Herçiqasî qelsî têde hebe, ji gelek aliyan ve bixape jî derfet û îmkan pêk hatine ji bo ku karibe van pirsgirêkan di vê neynikê de baştir bibîne. Para alîkariya mezin a şervanên mêrxas (herçiqasî îdeolojî bixapînin jî) di vê de lazim e ku ti carî ji nedîtî ve neyê. Nemaze qehremanên li ser navê wekhevî, azadî, xuşk û biratiyê şer meşandin, xwediyê alîkariya rastî ne.

Divê em tespîtkirina pirsgirêka bingehîn a civakî piçûk nebînin. Tevahiya dîrokê civakan bi hezaran salan şer kirin, ew dan şerkirin. Cihê

xemê ye, van civakan nizanîbû ji bo kê şer dikin. Ji aliyê zordar û mêtinkarên xwe ve bi tenê nedihatin xebitandin, di şerên bêhejmar de jî dihatin tinekirin.

Hozanî û zanyariya Rojhilat, bêguman haya xwe ji pirsgirêka civakî hebû. Ji lewra gelek doktrîn, sîstemên exlaqî, dîn û mezhebên mezin çêkirine. Li şûna ku bibin dewlet û şaristanî, jiyana demeke dirêj a eşîr û qebîleyan tercîh dikirin, xweziya xwe pê dianîn. Gewdeyên bingehîn ê civaka Rojhilat ji dewlet û şaristaniyê re xerîb in. Di navbera wan de kelhe û bircên mîna çiyan mezin hatine danîn. Destan û kilamên Rojhilat ev rastî hemû, bi nazikî û nazenîniya hunermendekî vegotine. Mirovê Rojhilat bi qasî ku di dinyayên din de li rizgariyê bigere ji cîhana şaristaniyê re xerîb ketibû, bê hêvî bû. Mezinahiya civaka Ewrûpayê ew e, xwe ewqas piçûk nexist, ji aliyekî ve hêmanên erênî dawerivandin hinavên xwe, ji aliyê din ve jî li dijî hêmanên xerîbker li ber xwe da. Pirsgirêka civakî çareser nekir; lê keys û firsend neda ku bi tevahî têkçûyî û bêçare bibe.

Mirov pirsgirêkên civakên roja me ya îro û pirsgirêkên civakên ji rêûresmê yên Çîn, Hind, Emerîka Latîn û heta Efrîkayê li pirsgirêkên vê şaristaniya bi rola çemê mezin û sereke radibe zêde bike, cewherê wan wê neguherîne. Hin pirsgirêkên ji aliyê şêwe ve balkêş bi tenê dikarin vegotinê bi hêz bikin. Jixwe Sîstema Dinyayê (sîstema bi gelek navend û hegemoniya super a DYE) ya roja me ya îro pirsgirêkên civaka tevahiya dinyayê weke xwe sîstematîze û yekpare kirine.

Min hewl da pirsgirêkên dîrokî-civakî pêşkêş bikim. Eger mirov şêweyên van pirsgirêkan ên rojanebûyî bi sernavên sereke bi awayekî xulase bide, ev yek wê mijarê temam û bêtir berbiçav bike.

# B- PIRSGIRÊKÊN CIVAKÎ

## 1- Pirsgirêka Desthilatdarî û Dewletê

Ez neçar im ku misêwa destnîşan bikim, dîrok bi qasî 'niha' ye, her çi hêmanekî niha jî dîrok e. Her şaristaniya nû hiltê, karê pêşî dike ew e, dîrokê û niha pirr zêde ji hev qut dike. Ev encama propagandayê ye; xwe pê rewa dike û dixwaze 'ezel-ebed' nîşan bide. Di jiyana rastî ya civakî de jihevqutbûnên bi vî rengî tinene. Xusûseke din a tê destnîşankirin ew e, dîrok heta gerdûnî neyê kirin, avakirina dîrokeke xwecihî yan jî taybet zêde ti maneyê îfade nake. Ji lewra pirsgirêka desthilatdarî û dewletê bi rewşa xwe ya avakirina pêşî, bi rengekî pirr kêmguherî pirsgirêka roja me ya îro ye jî. Cudatiya di navberê de jî parên şertên zeman û mekan lê zêde dikin in. Wexta em vê maneyê li têgînên cudatî û veguherînê bar bikin, wê para heqîqetê ya şîroveyên me zêde bibe. Divê di nava heman fikarên me de piçûkdîtin an jî girîng nedîtina cudatî, veguherîn û pêşketinê hebin. Mehrûmmayîna ji dîroka gerdûnî çiqasî mirov çavkorî û serkorî dike, mirov pêşketina dîrokî jî weke timî ji dubarebûnê pêk tê bibîne, ji cudatî û veguherînê bêpar bihesibîne jî ewqas tê maneya sergirtina rastiyê, nixumandina wê. Gelekî girîng e ku mirov bi van herdu şêweyên reduksiyonîst nexape.

Tespîta pêşî ya mirov di mijara desthilatdarî û dewleta roja me ya îro de bike ew e, di ser civakê û nava civakê de herdu jî bi awayekî awarte bûne xwedî hecm. Heta bi sedsala 16. hukimranî zêdetir li derveyî civakê, hem jî bi şêweyekî çav li ber venebin û xeternak dihat avakirin. Tevahiya serdeman şaristanî şahidê gelek şêweyên balkêş ên bi vî rengî ye. Weke şêweyê fermî yê desthilatdariyê, dewletê xetên xwe yên sînor bi nazenînî xêz dikirin. Cudahiya dewlet û civakê çiqasî bihata zelalkirin, ewqasî zêdetir jê li benda kêrhatîbûnê bûn. Weke diyardeyeke nava civakê xetên desthilatdariyê jî zelal bûn û xweş ji hev dihatin kirin. Li hemberî mêr sekna jinê, li hemberî kal û pîran sekna ciwanan, li hemberî serekeşîr sekna endamên ji rêzê yên eşîrê, li hemberî nûnerê dîn û mezheban sekna

cemaeta mumînan bi adab û rêzikên gelekî zelal hatibûn diyarkirin. Ji rabûn û rûniştinê heta bi tona dengê wan otorîteya desthilatdar û yên mijara rêveberiyê ne, kitebikite xwedî rêzik û pîvanan bûn. Bêguman ji ber ku desthilatdarî û dewlet hê kêmtir in di vî warî de hewl didin otorîteya xwe ava bikin û ev jî tê fêhmkirin. Wan amûrên rewakirinê, perwerde û li gorî vê xizmet pêşkêş dikirin.

Otorîteyên desthilatdarî û dewleta şaristaniya Ewrûpayê bi awayekî bi kok veguherîn. Di vê de cudahî ew bû ku xwe hewce his kirin, bi lez bikevin tevahiya çaviyên civakê. Mirov weke sedem dikare behsa du hêmanên bingehîn bike. Ya pêşî, girseya dihat mêtin mezin dibû. Eger rêveberî nehata mezinkirin mêtinkarî wê nemeşiya. Çawa ku keriyên zêde dibin hewcedariya xwe bi gelek şivanan hene, desthilatdarî û dewlet jî hewcedariya xwe bi zêde rêveberiyê çêdibin. Burokrasiya dewletê ya zêde nepixî û werimî vê diyardeyê piştrast dike. Divê mirov hêza parastinê ya birêveberiyê ya li dijî êrişên ji derve jî li vê zêde bike. Ev hêza nehîtî di tepisandina civakê de jî xwedî par e. Şer timî bûye sedem burokrasî derkeve holê. Artêş bi xwe rêxistina burokratîk a herî mezin e. Hêmana duyemîn, serwextbûn û berxwedana civakê ye ku her diçe zêde dibe. Ji ber ku civaka Ewrûpayê hem bi awayekî hûrûkûr mêtinkarî nedîtiye, hem jî timî li ber xwe daye, kiriye ku avakirinên desthilatdarî-dewletê mezin bin, bi gewde bin. Têkoşîna bûrjûwaziyê li dijî arîstokrasiyê, têkoşîna çîna karker li dijî herduyan, neçar kiriye ku li Ewrûpayê avakirina desthilatdarî û dewletê hûrûkûr be. Di dîrokê de bûrjûwa (çîna navîn) belkî jî cara pêşî weke çîna navîn dibe dewlet, ev jî di statuya desthilatdarî û dewletê de guhertineke mezin dike. Kutleyeke ji nava civakê derketî dibe dewlet, ji lewra bûyera desthilatdariyê ya zêde dibe neçar hatiye hiştin ku xwe di nava civakê de bi rêxistin bike.

Bûrjûwazî çînîbûneke mezin e. Ji lewra ji derve nikara xwe li ser desthilatdarî û dewletê hukimran bike. Xwe çiqasî bike dewlet, eşkere ye ku wê di nava civakê de rê li şer veke. Diyardeya jê re şerê çînî tê gotin vê rastiyê eşkere dike. Lîberalîzm weke îdeolojiya bûrjûwayê, ji bo ji vê pirsgirêkê re çareseriyê bibîne, bi roj stêrkan dibîne. Lê di dema bihurî de

ya qewimî bêhtir mezinbûna desthilatdarî û dewletê û kansêrbûna burokratîk bû. Di civakê de desthilatdarî û dewlet çiqasî mezin bibin, ev tê wê maneyê di wê civakê de şerê navxweyî heye. Di civaka Ewrûpayê de pirsgirêka bingehîn a ji destpêkê ve qewimî bi vî rengî pêk hatiye. Têkoşîna mezin a ji bo destûra bingehîn, demokrasî, komar, sosyalîzm û anarşîzmê bi şêwazê pêkhatina desthilatdarî û dewletê ve ji nêz ve têkildar e. Ber bi roja me ya îro ve çareya herî hêja hatiye dîtin ew e, mafên bingehîn ên mirovan bi rêzikên destûra bingehîn misogerkirin, serdestiya huqûqê û demokrasiyê ye. Ji çareseriyeke mayînde zêdetir, dewlet û civak neçar têne hiştin li ser desthilatdariyê li hev bikin, û bi vî awayî hewl daye pevçûnên mezin ên berê li dawiyê bêne hiştin. Di vê rewşê de pirsgirêka desthilatdarî û dewletê nehatiye çareserkirin, bi tenê kirine rewşekê ku karibe dewam bike.

Em dema ji nêz ve li mijarê binêrin em ê bibînin, bi milletperestî, cinsperestî, dînperestî û zanistperestiyên cûrbicûr civak bi deshiltadarî û dewletê re xistine zikhev, ango bi paradîgmaya “Herkes hem desthilatdarî û hem civak e, hem dewlet û hem civak e” xwestine dewleta netewe dewam bikin. Bi vî awayî di hundir de şerê çînî hatiye tepisandin, li dijî derve jî pozîsyona parastinê timî hişyar hatiye hiştin û bi vî awayî ji bûrjûwayê we ye ku ji dewleta netewe re çareserî dîtiye. Li nava dinyayê ev hatiye ceribandin û yek ji wan rêbazên sereke ye ku ji çareseriyê zêdetir rêbazeke tepisandinê ye. Dewleta netewe bi xwe wexta herî zêde dibe desthilatdarî û dewlet cewherê wê yê faşîzmê derdikeve holê û ev jî bi awayekî eşkere di faşîzma Elman de hat dîtin.

Mînaka pêşî ya dewleta netewe, di pêvajoya berxwedana Hollanda û Ingilîstanê li dijî Împaratoriya Spanî de xwe nîşan da. Dewleta netewe tevahiya civakê li dijî hêza derve seferber dike û bi vî awayî bahaneya xwerewakirinê diafirîne. Pêşdeçûna ber bi civaka neteweyî ve pêşî hinekî xwedî hêmanên erênî bû. Lê hê di dema derketina wê de wezîfeya wê ya veşartina zordestî û mêtinkariya çînî eşkere bû. Ji sedî sed etîketa çîna bûrjûwayê li ser dewleta netewe heye. Modela dewletê ya wê çînê ye. Paşê seferên Napolyon ev model li Franseyê bi hêztir kir û bû sedem li nava

Ewrûpayê belav bibe. Paşvemayîna bûrjûwaziya Elman û Îtaliyan û zehmetiyên wan ên di warê yekîtiyê de polîtîkayên hê milletperest bi xwe re anîn. Dagirkeriyên ji derve, berxwedanên arîstokrasiyê û çîna karker ji hundir ve bûrjûwazî neçarî ber bi modeleke dewletê ya zêde şoven û milletperest ve bir. Têkçûn û pêxîrtengiyê, di serî de Elmanya û Îtalyayê, gelek welat ber bi dualîteya, yan şoreşa civakî yan jî faşîzmê ve birin. Ya bi serket modela dewletê ya faşîst bû. Belkî yên weke Hîtler û Mûsollînî têkçûn; lê sîstema wan bi ser ket.

Dewleta netewe bi xwe ew e, civakê bi dewletê re, dewletê bi civakê re wekhev dikin û wisa pênase dikin, jixwe ev jî pênaseya faşîzmê ye. Bi awayekî xwezayî ne dewlet dibe civak, ne jî civak dikare bibe dewlet. Bibe bibe, îddîayên îdeolojiyên totalîter dikarin wisa bibin. Rengê faşîst ê van propagandayan tê zanîn. Faşîzm weke şêweyekî dewletê, her tim ji bo lîberalîzma bûrjûwayê kevirê çarqozî ye, li serê goşeyê cihê xwe heye. Şêweyê rêveberiyê yê demên pêxîrtengiyê ye. Wexta ku pêxîrtengî binyewî be, şêweyê rêveberiyê jî binyewî ye. Navê rêveberiyê dewleta netewe ye. Pêxîrgtengiya serdema fînans-kapîtalê derketiye asta herî jor. Di roja me ya îro de dewleta yekdestdariya kapîtalîst a di warê global de derketiye asta herî jor jî di dema xwe ya zordar û paşverû de bi giştî faşîst e. Herçiqasî behsa hilweşîna dewleta netewe tê kirin jî heke mirov îdîa bike ku ya li şûna wê tê avakirin demokrasî ye, ev ê safiktî be. Belkî jî hem globaliya makro, hem pêkhatinên siyasî yên faşîst ên mîkro yên xwecihî di rojevê de ne. Bûyerên li Rojhilata Navîn, Asya Navîn û Qafqasyayê diqewimin balkêş in. Başûrê Emerîkayê û Efrîka li ber ceribandinên nû ne. Ewrûpa dixwaze bi beridînê ji faşîzma dewleta netewe derkeve. Li Rûsya û Çînê wê çi biqewime ne diyar e. Hegemonê super Dewletên Yekbûyî yên Emerîkayê DYE bi her şêweyê dewletê re di nava danûstendinê de ye.

Eşkere ye ku pirsgirêka desthilatdarî û dewletê di yek ji demên xwe yên herî giran de ye. Dualîteya, yan şoreşa demokratîk an jî faşîzm bi awayekî girîng di rojevê de ye. Bi tevahî rêxistiniyên herêmî û navendî (yên NYyê) yên sîstemê kêrhatî nabin. Kapîtala fînansê di dîrokê de bi awayekî nedîtî di warê global de derketiye asta herî jor û bi rola beşê sermayê yê herî

zêde pêxîrtengiyê har dike, radibe. Yekdestdariya sermayeya fînansê di warê eskerî û siyasî de tê maneya şerekî zêde li dijî civakê. Li gelek bereyên dinyayê rastiya pêk tê bi vî rengî ye. Ji pêxîrtengiya avahiya sîstema dinyayê wê kîjan pêkhatinên siyasî û ekonomî derkevin, mirov vê bi ne kehanetê, belê bi asta xebatên entelektuel, siyasî û exlaqî dikare diyar bike.

Di serdema kapîtala fînansê de ku sermayeya herî feraziye ya modernîteya kapîtalîst e, civak bi qasî ku di ti dema dîrokê de nebûye bi jihevdeketinê re rûbirû ye. Çaviyên polîtîk û exlaqî yên civakê hatine parçeparçekirin. Ya pêk tê, diyardeyeke civakî ye ku mirov dikare wê weke 'qirkirina civakê' bi nav bike û ji tevahiya qirkirinan girantir e. Serweriya medya sermayeya feraziye di rewşa sîleheke welê de ye, ji Şerê Cîhanê yê Duyemîn girantir qirkirina civakê daye ber xwe. Topên xwe yên milletperestî, dînperestî, cinsperestî, zanistperestî û hunerperestî (spor, rêzefilm û hwd.) tevahiya bîstûçar saetên rojê wer bi serê civakê de diteqîne di bêvlê re tîne, ma li hemberî van sîlehên medyayê wê bergirî û parastina civakê çawa were kirin?

Medya jî bi awayekî mîna duyemîn aqilê analîtîk li ser civakê fonksiyonel e. Çawa ku aqilê analîtîk bi serê xwe baş an jî xirab nîne, medya jî bi serê xwe amûrekî notr e. Weke her sîlehê, yê wê bi kar bîne rola wê diyar dike. Hêzên hegemonîk çawa ku her tim xwediyê sîlehên bi bandor bûn, li ser sîleha medyayê jî hêza serdest in. Ji ber ku medyayê mîna duyemîn aqilê analîtîk bi kar tînin, di warê bêtesîrkirina hêza berxwedanê ya civakê de jî gelekî bi bandor in. Bi vê sîlehê civaka ferazî tê avakirin. Civaka ferazî, şêweyekî din ê qirkirina civakê ye. Mirov dikare dewleta netewe jî weke yek ji şêweyên qirkirina civakê bihesibîne. Bi herdu şêweyan jî civakê ji civakbûnê derdixin, dikin amûrekî yekdestdariyê ku çawa ber bidin pêşiyê welê dimeşe. Bi qasî ku mirov xwezaya civakî piçûk bibîne bi tehlûke ye, derxistina civakê ji civakbûnê jî tê maneya tehlûkeyeke wilo ku sînorê wê diyar nîne û derî li her cure tehlûkeyê vekirî tê hiştin. Serdema yekdestdariya feraziye jî mîna sermayeya fînansê bi civaka ji civakbûnê derketiye dikare hebûna xwe pêk

bîne. Herdu jî di heman demê de derketine holê û ev jî xweber nîne, yek bi ya din re têkiliya xwe heye. Civaka ji civakbûnê hatiye derxistin a dewleta netewe (civaka xwe dewleta netewe dihesibîne) û civaka medyayê ji rê derxistiye, bi temamî civakên têkçûyî ne, û hewl didin li ser xirbeyên wan tiştên din ava bikin. Hîç şik û guman têde nîne ku em di serdema civakeke bi vî rengî de ne.

Civaka em têde ne bi tenê civaka herî bi pirsgirêk e, di heman demê de em di nava civakeke welê de ne ku ti tiştî nikare bide ferdê xwe. Civakên em di nava wan de bi tenê çaviyên xwe yên exlaqî û polîtîk ji dest nedane, hebûna wan jî di tehlûkeyê de ye. Ne bi pirsgirêkan, bi tehlûkeya qirkirinê re rûbirû ne. Eger di roja me ya îro de pirsgirêk tevî hemû hêza zanistî misêwa mezin û kansêrwarî dibin, wê demê qirkirina civakê ne îddîayek e, tehlûkeyeke rastî ye. Tê îddîakirin ku desthilatdariya dewleta netewe bergirî û parastina civakê dike, herî zêde civak bi vê dixape û ev jî dihêle ku tehlûke gav bi gav pêk bê. Civak bi tenê ne bi pirsgirêkan re, bi qirkirinê re rûbirû ye.

## 2- Pirsgirêka Civakê ya Exlaq û Polîtîkayê

Haya min jê heye ku dabeşkirina pirsgirêkan dikare rê li ber tehlûkeyan veke, ji lewra divê mirov xwe jê dûr bigire. Zanista navend Ewrûpayê aqlê analîtîk bê sînor bi kar anî û ev rêbaz pêşde bir. Herçiqasî hin destketiyên vê rêbazê hebin jî di warê wendakirina yekparetiya heqîqetê de bi tehlûke ye û nabe mirov vê ji nedîtî ve bê. Bi şertê ku tehlûkeyên vê rêbazê yên em jê fikaran dikin timî li ber çavan bên girtin, tevî ku ez dizanim tehlûke heye ku wê pirsgirêka civakî weke 'pirsgirêkan' dabeş bike jî, ez ê bikaranîna vê rêbazê dewam bikim. Di beşa epîstemolojiyê de jî ez ê hewl bidim nêzîkatiyên cuda guftûgo bikim.

Me bêsedem di beşa pêşî ya pirsgirêkên civakî de cih neda desthilatdarî û dewletê. Ji ber ku çavkaniya bingehîn a pirsgirêkan e. Amûr û têkiliyên desthilatdarî û dewletê berê pêşî xwe li ser civakê û ji sedsala 16. ve gelekî xwe di nava civakê de bi cih kirin. Di vê de fonksiyona wan a bingehîn ew

e, civakê bê hêz bikin, bêparastin bihêlin û bi vî awayî wê ji mêtinkariya yekdestdariyê re amade bikin. Gelekî girîng e ku mirov rola desthilatdarî û dewletê bi vî awayî pênase bike. Mirov desthilatdarî û dewletê bi tenê weke tevahiya têkilî û amûrên zorê destnîşan bike têrê nake. Di pênaseyeke welê de kêmasiyên ciddî hene. Ez yeqîn dikim ku rola herî girîng a desthilatdarî û dewletê bêhêz û bêparastin hiştina civakê ye. Ji bo van rolên xwe bi cih bîne jî berê xwe dide amûrên 'hebûn'a civakê ango exlaq û polîtîkayê. Timî van çaviyên civakê qels dike û dihêle ku nikaribin bixebitin û wer dike ku nikaribin bi rola xwe rabin. Ji ber ku civak du qadên xwe exlaq û polîtîkayê pêk neyîne, nikare hebûna xwe dewam bike.

Rola bingehîn a exlaq ew e, civakê bike xwedî rêzik û pîvanên pê karibe li ser piyan bimîne, wan bi cih bîne û pê hebûna xwe dewam bike. Civakeke rêzikên xwe yên hebûnê û hêza bi cihanîna wan ji dest dabe, ew tê wê maneyê ku ew civak veguheriye civaka heywanan û çawa bixwazin dikarin bi kar bînin û bikin mêtingeh. Rola polîtîkayê jî ew e, rêzik û pîvanên ji civakê bi xwe re hewce dikin tedarik bike û tevî vê, timî rê û rêbazên peydakirina hewcedariyên bingehîn ên maddî û zêhnî guftûgo bike û civakê bi biryar bike. Polîtîka civakî bi van sedemên bingehîn misêwa hêza guftûgo û biryarê pêşde dibe, pêşiyê li mejiyê civakê vedike û wê zindî dihêle; dike ku civak xwe bi xwe rêve bibe, karên xwe bi xwe bike, pirsgirêkên xwe bi xwe çareser bike û bi vî awayî qada herî bingehîn a hebûna xwe pêk tîne. Civaka bê polîtîka weke mirîşka serê serjêkirî be, hê can nedaye, virde wirde diperpite. Rêya herî bi tesîr a bêkêrkirin û bêhêzkirina civakekê ew e, mirov wê ji POLÎTÎKA'yê mehrûm bike (Ji siyasetê bêpar bihêle, bi gotina Îslamî bêşerîet bihêle). Lewma polîtîka ji bo hebûna civakê bi xwe, ji bo pêdiviyên wê yên bingehîn ên maddî û manewî, organê mecbûrî yê guftûgokirin û biryarê ye. Ti rê bi qasî mehrûmhiştina civakê ji polîtîkayê bi tehlûke nîne û divê mirov xwe jê dûr bigire.

Ji ber vê sedemê, amûrên desthilatdarî û dewletê, û têkiliyên wan, di tevahiya dîrokê de, di dereceya pêşî de li şûna exlaqê civakê saziya bi navê 'huqûqê', li şûna polîtîkayê jî saziya bi navê îdareya 'dewletê' bi cih kirine.

Di her demê de wezîfeya bingehîn a desthilatdarî û dewletan ew bû, civakê ji du hêzên wê mehrûm bikin ango wê ji hêzên wê yên exlaq û polîtîkayê dikin û li şûna van herdu hêzên bingehîn ên bi rola stratejiya hebûnê radibin îdareya hukimranî û huqûqê datînin. Ev herdu wezîfe nebin, daneheva sermayeyê û yekdestdariyên mêtinkariyê jî nabin. Tevahiya rûpelên dîroka şaristaniya pênc hezar salî bi şikandina hêza exlaqî û polîtîk a civakê û li şûna wan bi cihkirina îdare û huqûqa yekdestdariyan tijî ye. Dîroka şaristaniyê bi sedemên xwe yên rastî û li ber çavan wisa ye, û rast nivîsandina wê bi tenê bi van sedeman dikare maneyê îfade bike. Di cewherê tevahiya pevçûnên civakî yên dîrokê de ev rastî veşartî ye. Civak ê bi exlaq û polîtîka xwe bijî, yan jî wê li gorî îdare û huqûqa yekdestdariyên mêtinkar ên har weke keriyan bijî? Dema ez dibêjim çavkaniya sereke ya pirsgirêkan îdare û huqûqa desthilatdarî û dewletê ye ku dûrî aqilan bi awayekî ‘kansêrolojîk mezin dibe’, ez dixwazim vê rastiyê îfade bikim.

Xusûseke din heye ku em rave bikin feyda xwe heye. Wexta ku cara pêşî hiyerarşî hat damezrandin û kengî ji bo civakê di warê ‘tecrûbe’ û ‘pisportiyê’ de girîng bû, em çi navî lê bikin ferq nake, çi dewlet çi jî otorîte, jê li benda feydeyê ne. Eger civakê dewlet û otorîte (desthilatdarî) bi tevahî neyênî nekiribe, sedema vê ev herdu bendewariyên sûdgirtinê ne. Ango ji dewlet û otorîteyê li benda tecrûbe û pisportiyê ye, û bawer dike ku bi vî awayî wê karûbarên wî hêsantir bibin. Ji ber van herdu sedemên girîng civakê xwe li hebûna dewletê ragirtiye. Tecrûbe li cem her kesî peyda nabe. Pisportî jî karê her kesî nîne. Lê otorîte û dewletê, tevahiya dîrokê ev herdu bendewariyên mafdar îstîsmar kirin, û bûn cihê bêkêrên herî bê tecrûbe û kesên ji pisportiyê mehrûm. Bi vî awayî di qada otorîte û dewletê de li şûna huqûqê dekûdolabê, li şûna tecrûbeyê awaretiyê cih girt. Felaket û rizîna mezin ji nêz ve têkiliya xwe bi vê berepaşkirina mezin a rastiyan û jirêderxistinê re heye.

Bûrjûwaziya ku di dîrokê de nexasim bi awayekî kanserolojîk pêşketina çîna navîn îfade dike, li şûna nava civakê li ser ‘navika wê’ rûnişt û berjewendiyên xwe yên herî egoîst weke ‘huqûqê’, rêveberiya xwe ya herî bêesil jî weke ‘îdareya destûra bingehîn’ pêşkêş kir. Ji bo vê jî desthilatdarî

û dewlet weke ‘amûrên’ sînornenas pêşkêş kirin û ew weke qadên qaşo ‘pisportiyê’ dabeş kirin û bi vî awayî zêdekirina wan tam veguherî felaketekê. Lewma mirov dikare bibêje, civaka xwest ji baranê bireve li zîpikê qelibiye. Lîberalîzm şêweyekî fikirînê yê bûrjûwaziyê ye. Mîna ava bin kayê dimeşe. Ji lewra guftûgoyên wê yên bê sînor li ser ‘cumhûriyet’, ‘demokrasî’, ‘destûra bingehîn’, ‘piçûkkirina îdareyê’, ‘bi sînorkirina desthilatdarî û dewletê’ bi qasî ku ser rastiyan digirin, mirov dikare wan weke îfadeyên bi maneyên berevajî barkirî jî binirxîne. Çîna navîn a bûrjûwa bi qasî serdema antîk jî jêhatî nîne ku destûra bingehîn, cumhûriyet û demokrasiyê pêşde bibe, îdareyê piçûk bike, desthilatdarî û dewletê bisînor bike. Ji ber ku yê ev têgînên biesil bêkêrkirine avahiya maddî ya çîna navîn e, şêwazê wê yê hebûnê ye. Civakê xanedanek, qralekî serdemên pêşî bi zor û zehmetî radikir, îcar wê xanedantî û amûrên bûrjûwayê yên sînornenas çawa rake, hilgire? Ez bi zanîn têgînên ‘malbata bûrjûwa û xanedan’ bi kar tînim. Ji ber ku ji heman çavkaniyê tên. Bûrjûwaziyê tevahiya hunerê rêzikan û rêveberiyê ji hêzên beriya xwe ji hêzên arîstokrasiyên esilzade yên mezin û qralan devşîrme kirine. Bi xwe jê nayê biafirîne. Ji vê xwezaya wê ya çînî, têkiliyên desthilatdarî û dewletê bandoreke kansêrolojîk di nava civakê de dikin. Xwezaya çîna navîn bi faşîzmê barkirî ye.

Ji lewra yek ji pirsgirêka sereke ew e, çaviyên siyasî (polîtîk) û exlaqî yên civakê kotrimî dikin û dihêlin ku nikaribin bixebitin. Bêguman qad, komik û çaviyên exlaqî û polîtîk ên civakê bi tevahî nikarin bêne tinekirin. Heta ku civak hebe, wê exlaq û polîtîka jî hebin. Lê ji ber ku desthilatdarî û dewlet ji qadeke pisportî û tecrûbeyê derdikevin, têne derxistin, jêhatîbûna xwe ya afirîner û kêrhatî nikare bi cih bîne. Di roja me ya îro de têkilî û amûrên desthilatdarî û dewletê (medya, yekîtiyên operasyonel ên îstîxbarat û taybetîkirinê, doktirînên îdeolojîk û hwd.) mîna avê heta bi çaviyên herî hûr ên civakê ve çizirîne, gelekî eşkere ye; kirine ku civak bêhnçikandî bibe, xwe nas neke, nikaribe ti rêzik û pîvaneke xwe ya exlaqî bi cih bîne, nikare ji bo pêdiviyên xwe yên herî bingehîn guftûgo bike û nikare ji bo xwe biryarê bide (siyaseta demokratîk bike). Dîsa di roja me

ya îro de ‘şîrketên global’ gelekî têne guftûgokirin. Ev şîrketên ku hêzên rastî yên hukimraniyê ne, ango yekdestdariyên ‘ezel-ebed’ di vê demê de bi awayekî di dîrokê de nehatibe dîtin sermayeya herî mezin danehev û ev jî ji nêz ve têkiliya xwe bi vê rewşa civak ketiyê, heye. Heta ku civak bi vî awayî nehatiba xistin û jihevbelavkirin, bi ewqas rêyên feraziye ango bi rêyên destê xwe nede ti amûrekî hilberînê, bi pereyan bi destxistina pereyan wê pêk nehatiba. Yekdestdariyan di tevahiya dîrokê hemûyî de yên bi destxistine û di roja me ya îro de bi ev çend hecmekî mezin ji hewayê bi destxistine, eger civak ji hebûna wê nekiribana, pişta wê neşikandibana û mejiyê wê pûç nekiribana, ev bi destxistin wê pêk nehatiba. Ji ber ku “Li hewayê pere tineye!”

Ez divê neçar dubare bikim ku bi tenê têkilî û amûrên desthilatdarî û dewletê yên bê sînor hatine zêdekirin civakê naxin vê rewşê; herî kêm bi qasî van bi bandor çavkaniya din a hegemoniyayê medya heye. Bi rêya wê civak ji aliyê îdeolojîk ve tê fetihkirin. Heta ku civak bi milletperestî, dînperestî, cinsperestî, zanistperestî û hunerperestiyê (huner, nexasim îndustrîkirina sporê) ji rê neyê derxistin û sergêjkirin, bi tenê bi têkilî û amûrên desthilatdarî û dewletê evqasî nayê xistin; her weha şîrketên ferazî yên global (kapîtala fînansî, mebest jê pere-sermaye ye) û yekdestdariyên dîrokî bi awayekî qira civakê bînin, nikarin civakê ji civakbûnê derxin û li mêtinkariya sînornenas vekin.

## 3- Pirsgirêkên Civakê yên Zêhniyetê

Bêguman ji bo civakek li mêtinkariyê were vekirin, yek ji şertên pêşî ew e, divê civakê ji polîtîka û exlaq mehrûm bikin. Heta zêhniyeta civakî ya bingehê fikrî yê exlaq û polîtîkayê ye, neyê hilweşandin, ev mehrûmkirin pêk nayê. Ji ber vê sedemê tevahiya dîrokê serwer û yekdestdarên mêtinkar weke karê destpêkê ‘hegemoniya xwe ya zêhnî’ ava kirine. Ji bo civaka Sumer li berdarî û bereketê vebe ango li mêtinkariyê were vekirin, rahibên Sumeran bê sedem pêşî perestgeh (Zîggûrat) ava nekirine, ev jî rastiya em behsa wê dikin bi şêweyekî eşkere piştrast dike. Ev mînaka

perestgeha Sumer gelekî girîng e. Ji ber ku di dîrokê de weke çavkaniya orjînal û bandora wê dewam dike tê zanîn. Ev mînak a berevajîkirin û fetihkirina zêhnê civakî ye.

Min bi girîngî hewl da diyar bikim ku xwezaya civakî ji avahiyên zêhnî yên herî nerm pêk hatiye. Heta neyê fêhmkirin ku civak xwezaya herî bi mejî ye, civaknasiyeke manedar bi pêş nakeve. Ji lewra zordar, serwer û xasûkên ku civakê weke çavkaniya mêtinê dibînin, karê wan ê pêşî ew e, mejiyê civakê û îmkanên wê yên fikrê qels dikin, yekdestdariya pêşî weke yekdestdariya zêhniyetê pêk tînin ango avakirina perestgehê weke wezîfeya bingehîn datînin pêşiya xwe. Perestgeh li gorî orjînalbûna xwe du fonksiyonan bi hev re pêk tîne. Ya pêşî, amûrê serweriya zêhnî weke amûrê hegemonîk heta dawiyê girîng dibîne û bi cih tîne. Ya diduyan, ji bo civakê ji nirxên wê yên zêhnî bi xwe (cewherî) qut bike, têra xwe derfet û îmkanan pêk tîne.

Zêhniyeta civakê bi xwe weke têgîn divê baş were fêhmkirin. Mirovatiyê wexta rahiştiye kevir û çoyê pêşî û xistiye destê xwe, li vê yekê fikiriye û kiriye. Ev çawa jê hatiye ango bi xerîzeyên hundir nekiriye, gavên pêşî bi fikra analîtîk têne avêtin. Tecrûbeyên di vî warî de çiqasî dikevin serhev û kom dibin civak bi pêş dikeve û ev bi xwe zêdebûna fikrê îfade dike. Civakek çiqasî tecrûbe û ezmûnên xwe ango fikra xwe zêde bike, ewqasî jî dibe xwediyê hêz û qabîliyetê. Dikare xwe baştir xwedî bike, bergiriya xwe bike, xwe biparêze û zêde bibe. Ev pêvajo, pêşketina civakî çî ye, nîşan dide û ji ber vê yekê gelekî girîng e. Kengî civakê xwe xist rewşa timî fikirînê, rêûresma exlaqî ya em jê re aqlê hevpar an jî wijdan dibêjin ango fikra kolektîv pêk tê. Ji ber vê sedemê exlaq gelekî girîng e. Ji ber ku ew xizna herî mezin a civakê ye, koma tecrûbeyên wê, sedema li ser piya mana wê, organê bingehîn ê dewamkirina jiyana wê û pêşdebirina wê ye. Ji ber tecrûbe û ezmûna xwe ya jiyanê civak baş dizane ku vê ji dest bide wê ji hev de bikeve, belav bibe. Lewma bi awayekî mîna xerîzeya hundir, hişk girîngiyê bi exlaq dide. Di civakên berê yên klan û qebîleyan de yên guh nedana rêzik û pîvanan an dihatin kuştin an jî ji civakê dihatin avêtin û bi

mirinê re rûbirû dihatin hiştin. Herçiqasî gelekî were berevajîkirin jî di bingehê 'kuştinên namûsê' de hê jî ev rêzik û pîvan hene.

Exlaq rêûresma fikra kolektîv temsîl dike, lê fonksiyona polîtîkayê hinekî cuda ye. Ji bo di karên rojane yên kolektîv de guftûgo bêne kirin û pê xwe bigihîne biryardariyê, pêdivî bi hêza fikrê heye. Ji bo polîtîkayê fikra afirîner a rojane şert e. Dîsa jî civak baş dizane ku weke çavkanî xwe nesipêre exlaqê ji kombûna fikrê pêk tê, ne fikra polîtîk çêdibe, ne jî polîtîka bi xwe tê kirin. Polîtîka ji bo karên rojane yên kolektîv (berjewendiyên hevpar ên civakê) bivênevê qadeke çalakiyê ye. Der barê karan de fikrên cuda û heta yên dijber hebin jî ji bo guftûgo û biryardana wan polîtîka şert e. Civaka bê poltîka, yan weke keriyan li pey rêzik û pîvanên yên din diçe, yan jî weke mirîşka serjêkirî virde wirde diperpite. Hêza fikrê ya civakê bi xwe saziyeke joravahî nîne; mejiyê civakê ye. Organên wê jî exlaq û polîtîka ne.

Organê din ê civakê, weke mekanê pîroz, bêguman perestgeh e. Lê ev perestgeh ne ya hêza hegemon (hiyerarşî û dewlet) bû, mekanê wê yê pîroz bi xwe bû. Gera civakê li mekanê xwe yê pîroz di vedîtinên arkeolojîk de li pêş cih digire. Belkî jî avahiya bi tenê ya girîng e ku heta roja me ya îro li ser piyan maye. Ev rastî xweber nîne. Mekanê civakê yê pîroz û pêşî ew mekan e, tevahî rabihuriya wê, pêşiyên wê, nasnameya wê û hevpariya wê temsîl dike. Cihê bîranînên civatî û perestinê ne. Mekanê xwe yadkirin û bi bîranînê ye; nîşaneya xwe veguhestina paşerojê ye; sedema girîng a bihevrebûnê ye. Civak baş serwext bû ku perestgeh çiqasî li devereke balkêş, bi heybet û hêjayî jiyana xweş were avakirin, ewqasî wê qabîliyeta wê ya temsîlê û qîmeta wê ya jiyanî hebe. Ji lewra heybet herî zêde li perestgehan hat nîşandan. Çawa ku di mînaka Sumer de jî hat dîtin, perestgeh di heman demê de cihê amûrên hilberînê, kewarên kedkaran û stergeha wan bû. Ango cihê karê palûte û zibareyê bû. Ne bi tenê cihê îbadetê bû, cihê guftûgo û biryarê bû. Navenda polîtîk bû. Hêlîna zenaetkaran bû. Cihê vedîtinan bû. Navend bû ku mîmar û zanyaran hunerên xwe lê diceribandin. Mînaka pêşî ya akademiyê bû. Bi tevahî navendên kehanetan ên serdemên destpêkê li perestgehan bûn û ev jî

xweber nîne. Ev hêman hemû û hê bi sedan hêmanên din girîngiya perestgehê datînin holê. Bawer dikim ku wê duristir be, mirov bi hêsanî ji vê rewşê re bibêje, navenda zêhniyeta îdeolojîk a civakê.

Li Xirabreşka Ûrfayê kevirên tîk ên dora xirbe deribandine heta beriya duwanzdeh hezar salan diçin. Şoreşa cotkariyê hê nehatiye kirin. Lê diyar e ku ev şêweyê kevir niqirandin, verotin û tîk danînê îşaret bi mirovên pêşketî dike ango hebûna civakê ji vê yekê re divê. Ew kî bûn, çawa dipeyivîn, çawa xwe xwedî dikirin û zêde dibûn? Fikir û rêûresmên wan çawa bûn? Çawa debara xwe dikirin? Ti şop nînin bersiva van pirsan bidin. Bi tenê kevirên tîk ên abîdeyî hene, ew jî bi îhtîmaleke mezin bermahiyên perestgehê ne ku weke şop mane. Li gorî ku îro jî gundiyên ji rêzê nikarin wan keviran biniqirînin û bi awayekî manedar deynin, wê wextê ew mirov û civaka kevir danîne ji gundî û civaka gund a îro paşvemayîtir nebûne. Xusûsên bi vî rengî bi tenê em dikarin pêşbîniya wan bikin. Herçiqasî hatibe berevajîkirin jî belkî pîroztiya Ûrfayê mîna çemekî ji vê rêûresma wêdetirî dîrokê diherike û tê. Di vê çarçoveyê de ez hebûn û girîngiya perestgeha civakî guftûgo dikim. Girîngiya hebûn û fonksiyona perestgeha hegemonîk guftûgo dikim.

Rahibên Misrê herî kêm bi qasî mînaka Sumeran di pêkhatina perestgeha hegemonîk de cih girtin. Brahmanên Hindî ji wan kêmtir neman. Rojhilata Dûr di wê rewşê de nebû ji wan kêmtir û jêrtir bimîne. Perestgehên Başûrê Emerîkayê jî hegemonîk bûn. Bê sedem ciwan weke qurban nedihatin neqandin. Bi tevahî perestgehên serweran ên serdemên şaristaniyan hegemonîk bûn. Mîna kopyayê orjînalê bûn. Ji bo civak li gorî berjewendiyên serweran bê bikaranîn navendên behsa wan tê kirin dixebitîn, ango fonksiyona wan a sereke ev bû. Milê eskerî yê yekdestdariyê bi awayekî xeternak û hovane serê mirovan jê dikir û di avakirina kelhe û bircan de bi kar dianî û milê rûhanî jî bi fetihkirina zêhniyetê heman karûbar temam dikir. Herdu xebatan jî di kolekirina civakan de bi qasî hev cih girtin. Yekê ji wan tirs, ya din jî îqna û razîkirin afirand. Bi vî şêwazî domkirina bi hezaran salan a civakên şaristaniyê, ma kî dikare înkar bike?

Di vê mijarê de şaristaniya hegemonîk a Ewrûpayê ji aliyê şêwe ve guhertinên mezin kirin. Lê dest neda cewherê wê. Bi çavdêriyên rojane jî tê dîtin, amûrên pirr û girs ên dewleta netewe yên li ser civakê bi vê jî qîma xwe nayînin, hûrûkûr bi çaviyên herî piçûk ên civakê ve dadikevin û wan hewcedarî xwe dikin, bi xwe ve girê didin. Zanîngeh, akademî, hê li jêrê wan lîse, dibistana navîn, dibistana seretayî û baxçeyê zarokan navendên pêkanîna zêhniyetê ne. Ya ku ew didin, dêr, hawra û mizgeft temam dikin. Qişle jî wê misoger dike. Ma ev tişt ne feth, dagirkirin, asîmîle û mêtingehkirina zêhn, exlaq û çaviyên polîtîkayê yên civakê ye, çi ye? Wexta ku hin şîrovegerên hêja dibêjin, 'girsekirina' civakê kerîkirina wê ye, tewş û pûç napeyivin. Di heman demê de hê teze di hişê me de ye, tê bîra me ku bi vê mêtingehkirina zêhn civaka faşîst pêkanîn. Gola xwînê ya dîroka nêz jî encama vê fetihkirina zêhnî bû.

Zirara dubarekirinê nîne: Eger tu îkonên milletperestî, dînperestî, cinsperestî, sporperestî, hunerperestiyê bihejînî dikarî civakê –pardon, keriyî -, girseyê bibî her devera tu dixwazî. Fetha zêhn bi qasî ku ti zor nikaribe bike, civaka îro li sermayeya fînansa global vekiriye. Careke din divê mirov rehmê li rahibên Sumeran û vedîtinên perestgehan bîne! Hûn çi fatihên jêhatî û yeman bûne, tevî ku di navberê re pênc hezar sal derbas bûne, nûnerên we yên dawî yên îro û yên di perestgehên wan de destê xwe ji ava sar di ya germ de danakin û daneheva sermayeyê ya herî mezin a dîrokê pêk tînin! Sî (zîlûllah) û pêjnên herî bi hêz ên xwedayan jî nikarîbûn evqasî karê bikin. Ev tê wê maneyê ku kombûna kumulatîf û dewamî ya sermayeyê têgîneke pûç nîne. Berevajîkirina zêhnan operasyonên sivik û ji rêzê nînin. Dr. Hîkmet Kivilcimli û Antonîo Gramsciyê Îtalî jî fetha hegemonîk bi heman awayî pênasekirine. Wexta ev pênase dikirin, dema herî zêde dewleta netewe dihat mezinkirin û pîrozkirin bû. Ew jî wê demê di zindanên wan de bûn. Zanîna wan ji serhatî û jiyana wan bû. Li gorî tehlîla dawî, ez jî 'mehkûmê' sermayeya global im. Eger min wê rast nas nekirana, di şexsê zêhnê xwe de (nasnameya xwe de) min ê xiyanet bi zêhnê civakê bi xwe bikirana.

## 4- Pirsgirêkên Civakê yên Ekonomîk

Dema ku pirsgirêkên ekonomîk têne gotin morî û gêrik têne hişê min. Heywaneke hûrik mîna moriyê jî pirsgirêkên wê yên ekonomîk çênabin (ma ne ji bo her hebûnê ekonomî xwe xwedîkirin e), çawa dibe ku hebûneke mîna mirov pêşketî xwedî aqil û tecrûbe pirsgirêkên xwe yên ekonomîk hene, heta rewşên wî yên weke bêkariyê yên ku rûyê mirovî sor bikin çêdibin? Wexta mirov mejiyê xwe bixebitîne di xwazeyê de çi heye ku nikare bike kar? Ji sedî sed pirsgirêk ne eleqeya xwe bi hawîrdorê re heye, ne jî eleqeya xwe bi xebat û meşa xwezayî re heye. Mirov gurê wî yê zalim û dirrinde di hundirê wî de ye. Di serî de bêkarî, her pirsgirêka ekonomîk bi sermayekirina civakê re têkildar e.

Bêguman analîza Marks a sermayeyê hêja ye. Hewl dide bêkariya der barê pêvajoya pêxîrtengiyê de jî eşkere bike. Cihê xemê ye ku nexweşiya pozîtîvîzmê ew jî pirr di rewşeke xirab de zevt kiriye. Nexweşiya zanistperestiyê ew asteng kiriye û nehiştiye analîzeke berfireh a civaka dîrokî bike. Ya ez dikim ew e, ez hewl didim pênase bikim ku sermaye ekonomî nîne, berevajî amûrekî bi bandor e, yê ku ekonomiyê ji ekonomîbûnê derdixe. Ji bo vê jî sedema min a pêşî ew e, di pêşketina civakê de kar û sermaye ti carî hedef nînin, di civakê de cih ji xwe re nedîtine. Mirov dikare li civaka dewlemend û xweşhal bifikire. Exlaq û polîtîka li vê vekirî ne. Lê li cihê ku civak di nava bêkarî û hewcedariyê de bigevize, biperpite, li dewrûberê behskirina sermaye û dewlemendiyê, ji sûc û guneh jî wêdetir, bi herhalî ev bi qirkirina civakê re pêwendîdar e. Şaristanî weke guloka pirsgirêkan tê pênasekirin, ji ber ku xwe disipêre yekdestdariya sermayeyê.

Rosa Luxemburg wexta ku pêkhatina sermayeyê bi şertê civaka ne kapîtalîst ve girê dida, gihiştiye keviya heqîqeteke gelekî girîng. Eger ji keviyê hinekî din ber bi hundir ve bimeşiya, wê bidîta ku daneheva sermayeyê tenê bi hebûna civaka ne kapîtalîst ve girêdayî nîne, ew weke geneyê xwîna civakê dimije û diwerime û ji vê xwînê jî dilopekê jî bi karkeran dide vexwarin û bi vî awayî wan jî dike hevparê gunehê xwe. Ez

bi awayekî gelekî zelal destnîşan dikim: ez hewldana karker jî înkar nakim; lê ez dibêjim mirov pêkhatina sermayeyê pirr hindikî dikare bi keda karker ve girê bide, heta mirov di çarçoveya felsefî-dîrokî-civakî de bifikire wê ev mîqdara pirr hindik jî maneya xwe nemîne. Ji ber pirsgirêkên ekolojîk her diçe eşkere dibe ku îndustriyalîzm civak û hawîrdorê dişêlîne. Ma kîjan mirovê serwext û bîrbir dikare înkar bike ku di roja me ya îro de rêveberên saziyên kar û serkarên karkeran di nava civakê de dibin xwedî cihekî cihêwaz û li beramberî vê jî bêkarî jî weke artêşê û guloka berfê mezin dibe? Tebeqeyên îndustriyê yên pêşketî, beşên bazirgan û fînansî yên yekdestdar ango yekdestdariyên sermayeyê bi projeyên 'hevpariyên bi pirrhîsse' têgîna karkeriyê têra xwe bêmane kirine. Gelekî girîng e ku mirov bibîne, karkerî her diçe bi rola wê qayîşa yekdestdariya sermayeyê bi civakê ve girê dide, radikin. Mirov çawa ku rola sosyalîzma pêkhatî weke kapîtalîzma dewletê, weke 'karkerekî tawizkar' dikare pênase bike, kapîtalîzma taybet a klasîk jî bi heman awayî karkerekî xwe yê tawizkar heye. Ev her tim di nava civakê de wer hebûn û heta îro hatin. Civaka mayî, ew civak e ku kapîtalîst nîne û hatiye bîra Rosayê.

Eger mirov bala xwe bidê, mirov ê bibîne ku li vir cudahiya kapîtalîst û ya ne kapîtalîst tê pênasekirin. Li cem Rosayê herdu jî şêweyên civakî ne. Lê ez li vir bi awayekî cuda nêzî mijarê dibim. Ez kapîtalîzmê weke şêweyekî civakê nabînim. Ez wê weke rêxistiniyeke şebeke ya gelekî berfireh dibînim. Ji civakê nirxê zêde vedidize, ekonomiyê dimiçiqîne û rê li bêkariyê vedike. Ji bo vê bi desthilatdarî û dewletê re dikele û marên hegemoniyayê yên îdeolojîk bi kar tîne. Di dema dawî de beşê karkeran ê tawîzkar jî li vê rêxistiniyê zêde kirine. Ez wexta careke din naveroka tevna yekdestdariyê welê pênase dikim, armanca min ew e, ez pêşî li gelek şaş fêhmkirinan bigirim. Nexasim divê ez karektera xefik a têgîna 'civaka kapîtalîst' deşîfre bikim. Sifetekî welê diyarkirina yekdestdariya kapîtalîst lutûfkarî û qenciyeke zêde ye. Şebekeya sermayeyê dikare tevna xwe ya rêxistinî ava bike. Divê baş were zanîn ku mafya jî şebekeyeke sermayê ya baş e. Şebekeya sermayeyê weke mafya nayê bi navkirin, sedema bi tenê ya vê yekê jî ew e, ji ber hêza hegemonîk a şebekeya sermayeyê di nava

civakê de ye, û ji ber têkiliyên wê yên bi desthilatdariyê re ye. Naxwe wê weke şebekeyeke bi qasî mafya rêzik û pîvanên xwe yên etîkî nînin bimana.

Ez divê vê xusûsê jî lê zêde bikim ku ez îndustrîvan, bazirgan û cotkarê asta navîn, kapîtalîst nahesibînim. Bi giranî ji bo ekonomiya rastî pêdivî bi wan heye. Sermaye ji gelek aliyan ve wan tengav dike û wan dixe nava pencê xwe. Ev ên ku em behsa wan dikin beşên civakê ne ku hewl didin hilberînin. Herweha ez wan kesên ku karûbarên metaya piçûk li bazarê dikin û van metayan li kargehên xwe yên piçûk pêk tînin jî kapîtalîst nahesibînim. Hemin, xwediyên pîşeyên cûrbicûr kapîtalîst nayên hesibandin. Ji bilî beşê tawîzkar, tevahiya karker, gundî, xwendekar, karmend, zenaetkar, zarok û jin pişta civakê ne. Ez hewl didim vê pênaseyê ji bo civaka ne kapîtalîst pêşde bibim. Ango weke gelek Marksîst yeqîn dikin, wexta ez civaka ne kapîtalîst dibêjim, mebesta min ew civak nîne ku bi têgînên weke feodal, tîpa Asya, nîv-feodal tê pênasekirin. Ez îqna bûme ku têgînên behsa wan tê kirin rastiyê hînî mirov nakin, ji vê zêdetir ser rastiyê digirin û dinixumînin. Jixwe ez vê analîzê ji bo şebekeyên sermayeyê yên ku piştî sedsala 16. li Ewrûpayê navendîbûn bi tenê nakim, ez şebekeyên sermayeyê hemûyan ên tevahiya dîrokê nirxê zêde desteserkirin (yekdestdariyên bazirganî-siyaset-eskertî-îdeolojîk, cotkarî, îndustrî) di vê çarçoveyê de hûrdikolim. Sermayeya fînansa global a roja me ya îro bi awayekî balkêş vê analîza me piştrast dike. Ji bo mirov vê bibîne jî hewcedarî bi hûrûkûr lêkolîn û analîzê nîne.

Gelekî girîng e ku mirov karekterê antî-sermaye yê xwezaya civakî bibîne. Civak di meşa xwe ya hezarê salan de haya xwe ji bandora dejenerekar a daneheva sermayeyê hebû. Mînak, yek ji rêbazên bi bandor ên daneheva sermayeyê faîzxwerî ye. Bala xwe bidinê, dînê ku ev mehkûm nekiribe hema hema tine ye.

Eger mirov bêkariya di roja me ya îro de mîna guloka berfê mezin dibe, weke hewldana sermayeyê ya ji bo peydakirina karkerê erzan an jî afirandina karkerê hêsan bibîne, wê ev bibe dîtineke gelekî kêm. Tevî ku aliyekî rastiyê ev e, sedema bingehîn ev nîne. Sedema bingehîn ew e,

sermaye dixwaze civakê bi wan xebatan ve girê bide ku wê li pey karê didin bezandin. Xebatên ji bo kar-sermayeyê ji sedî sed bi pêdiviyên bingehîn ên civakê re li hev nakin. Eger hilberîna ji bo têrkirina civakê karê neyne, civak ji feqîrî û birçîna bikeve jî –jixwe di roja me ya îro de bi mîlyonan mirov di vê rewşê de ne –xema sermayeyê nîne. Mînak, heke ji sermayeya di dest de hinekî li cotkariyê razînin, ti carî pirsgirêka birçîbûnê çênabe û namîne. Lê ya em dibînin berevajiyê vê ye, sermaye misêwa qada cotkariyê vala û xira dike. Sedema vê jî ew e, di cotkariyê de yan rêjeya karê gelekî kêm e, yan jî hîç tineye. Wexta ku ji pereyan bi tomaran pere bêne bi destxistin, ti sermayedar li cotkariyê nafikire. Di karekterê sermayeyê de ti carî cih ji fikrên bi vî rengî re nîne. Dewletê weke yekdestdarî berê gelekî alîkariya cotkariyê dikir. Lê berdêla vê alîkariya xwe jî weke berhem an jî pere-bac werdigirt. Piyaseyên niha yên sermayeyê xebatên dewletê yên bi vî rengî jî bêmane kirin. Di rewşeke berevajî de ew dewlet neçar in ku bi îflasê re rûbirû bibin.

Hingê em dikarin bibêjin, sermaye ne ji ber polîtîkayên rojane û demî pirraniya civakê bêkar û xizan dihêle, sedema vê yekê karektera avabûna wê ye. Mirov bixwazin gelekî erzan bên xebitandin jî bêkariya di nava civakê de çareser nabe û ji bo fêhmkirina vê rastiyê hewcedarî bi lêkolînê nîne, bi çavdêriyeke ji rêzê jî ev yek tê dîtin. Ez careke din dibêjim, divê mirov baş zanibe, heta polîtîkayên karê yên li ser desteserkirina nirxê zêde hatine avakirin û sîstema wê ji holê neyên rakirin, civak ji bêkarî û feqîriyê rizgar nabe.

Eger na, mînak, wê wextê çima li deşta Mezopotamyayê ya panzdeh hezar salan ji civaka neolîtîkê re dayiktî kir û tevahiya dîrokê gelek civak têr kirin, bayê bêkartî, birçîtî û xizantiyê radibe? Eger pêngaveke hilberînê ya ne bi armanca karê were plankirin, li gorî pîvanên roja me ya îro ev deşt wê bi hêsanî bîstûpênc mîlyon mirovî xwedî bike û heta wê gelekî jî ji ber bimîne. Ji bo vê jî hewcedariya van deşt û mirovan bi destê sermayê yê naxebitîne nîne, berevajî divê ev destê (ev dest çi taybet an jî yê dewletê be ferq nake) rê li feqîrî, bêkarî û xizaniyê vedike xwe ji pêxîra wan bike. Ya pêdivî pê heye, bi tenê ew e ku destê kedkarê rastî û ax bigihîjin hevdu;

divê şoreşa zêhnî ya firsendê bide vê yekê were pêkanîn; polîtîka û exlaq dîsa weke organ û çaviyên bingehîn ên civakî bêne fonksiyonelkirin; ji ber van sedeman divê siyaseta demokratîk bi çar ling û çavan bi mejiyên rastî bazde û biçe ser wezîfeya xwe.

## 5- Pirsgirêka Civakê ya Îndustriyalîzmê

Şoreşa îndustriyê ya bi qasî şoreşa cotkariyê girîngiya xwe heye, li ser bingehê daneheveke hezarê salan, ji dawiya sedsala 18. ve heta bi sedsala 19. ve ji aliyê naverokê ve gelekî pêş dikeve, gotin li cih be xwe ji qonaxekê diqevizîne qonaxeke gelekî li pêş û heta roja me ya îro meşa xwe geh li jêr û geh li jor dewam dike. Pêşbîniya wê nayê kirin ka wê li ku, kengî û çawa were rawestandin. Ev şoreş xwedî xisletên welê ye, mîna ya aqlê analîtîk be, mîna aqlê analîtîk benda li pêşiya xwe biteqîne û bê, jixwe berhemeke aqlê analîtîk e. Ji sedî sed di hakimiyeta sermayeyê de ye. Bêguman sermaye bi xwe bi pirranî mûcîdê amûrên îndustriyal nîne. Lê ji bo wan bike amûrê sermayeyê timî bi lez li ser wan rawestiya ye, yên pêdivî bi wan dîtiye kiriye milkê xwe. Bi lez, li pey hev û erzan hilberîn ji bo civakê îmkanekî mezin ê pêşketinê ye. Mîna aqil, îndustrî jî di xizmeta civakê de bi nirx e. Pirsgirêk di îndustriyê bi xwe de nîne, di şêwazê bikaranîna wê de ye. Îndustrî mîna îmkana nukleerî ye. Dema ku ji bo berjewendiyên yekdestdaran were bikaranîn, dikare bibe amûrekî welê bi tehlûke dikare ji felaketan heta bi şeran gefan li jiyanê bixwe. Jixwe di roja me ya îro de bikaranîna wê ya bi armanca karê gelekî diyar bûye û hilweşandina hawîrdorê bi lez kiriye. Bi çargavan ber bi civaka ferazî ve dibe. Şûna organên mirovan bi lez robotbûn digire. Eger welê dewam bike, mirov ê bi xwe bêkêr bibe.

Li ser rewşa îro ya hawîrdorê fikra hevpar ew e ku ne bi tenê civak, jiyana ruhber û zindiyan hemûyan di tehlûkê de ye. Ez divê bi girîngî destnîşan bikim ku ji vê rêveçûnê diyardeya îndustriyê bi tena serê xwe berpirsiyar îlankirin bi temamî berevajîkirina rastiyê ye. Îndustrî bi serê xwe îmkaneke bêalî, notr e. Îndustriyeke bi sedemên hebûna civakê re

bûyî yek, ji sedî sed dinyayê ji bo mirovan heta ji bo tevahiya jiyanan dikare bike Xwezaya Sêyemîn û di vê de bi rola diyarker rabe. Potansiyeleke xwe ya bi vî rengî heye. Eger wisa bibe, divê mirov îndustriyê jî pîroz bike. Lê eger bi giranî bikeve kontrola kar-sermayeyê, dikare dinyayê ji bilî çendek yekdestdarî, li tevahiya mirovatiyê bike cehennem. Jixwe di roja me ya îro de rêveçûn jî hinekî ber bi vî alî ve ye. Kes nikare înkar bike, ev rêveçûn mirovatiyê dixe nava fikarên kûr û mezin. Weke yekdestdariya îndustriyel li ser civakê împaratoriyên rastî ava kirine. Li beramberî yek hegemoniya super a DYE'yê bi tenê, bi dehan hegemonên îndustriyel hene. Hegemonê eskerî-siyasî bê rawestandin jî rawestandina hegemonên îndustriyel hêsan nîne. Ji ber ku ew jî êdî global bûne. Eger welatek weke navend ji wan re teng bê, yekser mekanekî din, welatên nû dikarin ji xwe re bikin navend. Ma kî dizane ku împaratoriyeke îndustriyê ya DYE'yê wê sibe Çînê ji xwe re navend hilnebijêre? Wexta ku şert û merc derfet û îmkanê bidin, îro jî em dibînin ev yek hêdî hêdî dikare bi cih bê.

Îndustriyalîzmê li kevçîka dilê cotkariyê xistiye. Cotkariya ku hêmanê bingehîn ê civaka mirov û amûrê hebûna wê ye, li hemberî îndustriyê hildiweşe. Ev xebata pîroz a panzdeh hezar salan mirovatî li ser piyan girtiye, îro di halê xwe de hatiye hiştin. Xwe amade dikin wê ji serweriya îndustriyê re bihêlin.  Dema îndustriya di bin fermana kar-sermayeyê de bikeve qada cotkariyê, weke yeqîn tê kirin, wê rê li ber hilberîna bi lez û berdar veneke. Bi lîstina bi genan, yekdestdariyên îndustriyê wê axê bixin rewşa dayikeke bi rêya sûnnî avis tê hiştin. Çawa ku bi spermeke xerîb ducanbûneke bi sihet û dayiktî mumkîn nîne, bi tovên bi genên wan hatiye lîstin jî ji axê ber nayê girtin, dayiktiyeke baş a zeviyan pêk nayê. Yekdestdariyên îndustriyê di warê cotkariyê de xwe ji vê dînîtiyê re amade dikin. Dîroka mirovatiyê belkî jî dijşoreşa herî mezin wê di cotkariyê de bibîne, heta destpêkiriye dibîne jî. Erd, ax û cotkarî bi tenê têkilî û amûrên ji rêzê yên hilberînê nînin; parçeyên hebûnê ne ku ji civakê nabin û bi wan nayê lîstin. Civaka mirov bi giranî li ser ax û cotkariyê ava bûye. Qutkirina civakê ji van mekanan û hilberînê, dike ku hebûna wê bi derbxwarineke

herî mezin re rûbirû bê hiştin. Rastiya bajarên mîna kansêrê mezin dibin, hê ji niha ve vê tehlûkeyê bi awayekî pirr eşkere li pêşberî çavan radixîne. Rizgarî bi îhtîmaleke mezin û bi rêjeyeke zêde di tevgereke berevajî de tê dîtin: tevgera ji bajêr vegera li ax û cotkariyê. Slogana vê tevgerê bi herhalî wê wisa bê diyarkirin "Ji bo hebûnê (manê) yan ax û cotkarî yan jî neman". Kar-sermaye îndustriyê bi axê û cotkariyê re nake yek, nagihîne hev, nake dost, têkiliyeke sîmbîotîk pêk nayîne. Di navbera wan de nakokiyên bi qasî lod û gidîşan datîne û wan dike dijminê hev. Ev dijminahî di civakê de dikare heta bi nakokî û şerên çînî, etnîk, neteweyî û îdeolojîk jî biçe. Lê ev ji wan nakokiyan nînin ku mirov nikaribe wan ji holê rake. Çawa ku bi destê mirov hatine avakirin, bi heman awayî mirov dikare wan ji hev belav jî bike. Îndustrî weke amûrê sermayeyê nakokiya wê bi ax û cotkariyê re ji kontrola mirov û wê de ye. Ax û cotkariyê bi mîlyonan salî xwe weke ekolojî amade kirine. Eger xira bibin, bi destê mirov nayên avakirin. Çêkirina axê bi destê mirov nîne, herweha berhemên cotkariyê û zindiyên din, mînak nebat vê gavê bi destê mirov afirandina wan di çarçoveya derfet û îmkanan de mumkîn xuya nake, bendewariyeke welê jî nîne. Jixwe ev îmkan û derfet di rengê mirov de pêk hatiye. Maneya xwe nîne ya pêk hatiye mirov dubare bike û jixwe îmkana pêkanîna wê jî nîne.

Ji ber ku mijareke kûr a felsefî ye, ez ê zêde pêde danekevim. Çawa ku firewnan bi tenê ji bo paşeroja xwe pîramîdên bi şêwazê qebran xwestin amade bikin, şêwazê robotkirinê yê îndustriyalîzmê jî paşerojeke zêde mirov karibe têde bijî wê nikaribe biafirîne. Ev, ji mirov re jî bêhurmetî ye. Hebûneke muhteşem mîna xwezayê li naverastê hebe, çi mane û girîngiya robot û kopyayên wan hene? Dînîtiya sermayeyê ji bo karê li vir careke din derdikeve pêşiya me. Em bibêjin robotan hilberîna herî erzan pêk anî. Baş e, wexta yên bi kar bînin tinebin wê bi kêra çi bên? Ji vî alî ve îndustriyalîzm hêmana bingehîn a bêkarhiştina mirov e; li dijî hilberîneriya civakê sîleha herî mezin a sermayeyê ye. Sermaye hem ji bo herî kêm karkeran bixebitîne, hem jî bi buhayên erzan di manîpulekirina piyaseyê de timûtim sîleha îndustriyê bi kar tîne. Buhayên yekdestdar û pêxîrtengiyên xwe yên ji hilberîna zêde ne ku hêmana bingehîn a bêkartiyê

ne, bivênevê ferz dike. Di encamê de malên riziyayî û bi mîlyonan mirovên xizan, birçî û bêkar dibin qurbanê van pêxîrtengiyan.

Civak weke xwezaya duyemîn, tenê dikare bi hawîrdoreke berhemê mîlyonan salî û mekanekî di cih de hebûna xwe pê re bi têkiliyeke xurt bidomîne. Ti pêkhatina îndustriyal, nikare şûna jîngeh û hawîrdora harîqayeke gerdûnê ye, bigire. Ji niha ve li erdê, hewayê, deryayê û ezmanan trafîk gihiştiye asta felaketê. Îndustriya bi sotemeniya fosîlan dimeşe, avhewayê û hawîrdorê misêwa jehrî dike. Berdêla van felaketan hemûyan, daneheveke karê ya dused salî ye. Ma ev danehev hêjayî evqas zirar û ziyanan e? Ji lewra zirar û ziyana bûyî di encama tevahiya şeran de pêk nehatiye. Herweha ruhber û zindiyên ji dest hatine dayîn jî ne bi destê mirov û ne jî bi destê xwezayê di ti bûyereke din de evqasî ji dest nehatine dayîn.

Îndustriyalîzm weke amûrekî yekdestdarî û îdeolojiyê wê, pirsgirêka herî bingehîn a civakê ye. Divê mirov wê hûrûkûr bixe ber lêpirsînê. Tehlûkeyên derxistine holê bi tenê jî ji bo vê têrê dikin. Piştî ku cinawir mezintir bû û ji kontrolê derket, lêpirsîna wî û girtina tedbîrên der barê wî de dibe ku dereng û bêmane bibin. Tam dem e, ji bo mirov nehêle civak ji civakbûnê derkeve û nebe civaka ferazî, divê mirov vî cinawirî ji destê yekdestdaran bigire, pêşî wî kedî bike paşê jî wî li gorî xwezaya civakê bike dost.

Wexta ku mirov li dijî îndustriyalîzmê têbikoşe, divê avahiya îdeolojîk-yekdestdar a teknîka îndustriyal û bikaranîna wê, ji avahiya îndustriyê ya bi berjewendiyên giştî yên civakê re li hev û şêwazê bi karanîna wê ji hev bike, xebateke di vî warî de wezîfeya herî girîng a têkoşîna îdeolojîk e. Hin kom hene ku îdea dikin ew ji statuya civakî û çînî serbixwe li dijî îndustriyalîzmê li ser bingehê humanîstiyê (mirovperweriyê) têdikoşin, mirov nikare li bendê be ku ew bigihîjin armanca xwe. Ji ber ku komên em behsa wan dikin bi awayekî objektîv dijberî armancên xwe diçin, bivênevê wê weke yekdestdariyê ji îndustriyalîzmê re xizmetê bikin. Ji texmînan wêdetir îndustriyalîzm xwedî karekterekî îdeolojîk, mîlîtarîst û çînî ye. Weke îdeolojî zanist û teknîk e. Heta di bikaranîna ji vî alî de zanist û

teknîka di asta herî bi tehlûkê de temsîl dike. Cinawirê îndustriyê bi serê xwe derneketiye holê. Em bînin bîra xwe: bûrjûwaziya Ingilîstanê li giravê, li Ewrûpayê û li dinyayê wexta xwe li pêngava xwe ya dîrokî ya emperyalîzmê rakişandin, çîna ku îndustriyalîzm hem bi rêxistin kir hem jî bi awayekî herî berfireh û bi lez bi kar anî, ew bi xwe bûn. Îndustriyalîzm paşê li gorî rêzê bûye sîleha muşterek a tevahiya welatên bûrjûwaziyê. Di nava sêberên fînans-bazirganî-îndustriyê de sedsalên 19. û 20. herî zêde yên îndustriyê bûn. Ji ber ku serweriya bûrjûwayê ya di van sedsalan de li nava dinyayê pêk hat, vê rastiyê eşkere piştrast dike.

Heyf û mixabin, Karl Marks û tevgera sosyalîzma pêkhatî, civaka ne kapîtalîst paşverû îlan kirin û hevgirtina bi bûrjûwaya pîşesaziyê re weke stratejîk qebûl kirin, herçiqasî bi zanebûn nebe jî di dîrokê de herî zêde bi vê tevgera xwe dijberî armancên xwe diçin û heta bi awayekî objektîv ketin nav rewşeke welê trajîk ku dikare were maneya xiyanetê. Çawa ku Xiristiyantiya tevahiya sêsed salan bû dînê aştiyê bi desthilatdarî û dewletê re îttîfaq kir û ev bi awayekî objektîv û bi giranî jî bi zanebûn bi armancên xwe re li hev nekir û bi wan re xiyanet kir. Di tehlîla dawî de Xiristiyantî jî ber bi bayê cazîbeya yekdestdariya desthilatdariyê ket, dijberî armancên xwe meşiya û bû bengiyê şaristaniyê. Ya di Îslamê de jî bûyî, hê Hz. Muhammed sax bû pêk hat. Di encamê de li hemberî îndustriya desthilatdariyê têk diçin.

Eger di roja me ya îro de tevahiya mirovahiyê li ber hilweşîna jîngeh û hawîrdorê, mîna ku saetên qiyametê nêzîk bibin, destpê kiriye feryad dike, divê li dijî zirar û ziyanên endustriyalîzmê bi tevgerên mînak di çarçoveyeke civaka dîrokî û çînî de bi tevgerên têkoşînê yên têkoşînê hebûna civakê qebûl bikin û di asta tevgereke nû û pîroz a dînî de bivênevê bikin. Çawa ku ne mumkin e, agir bi êgir were vemirandin, di çirava îndustriyalîzmê de jî eger tu jiyanê nexî lêpirsînê û tu dest ji îndustriyalîzmê nekişînî, têkoşîna ekolojîk nayê meşandin. Eger em naxwazin trajediyên nû yên Xiristiyantî, Îslamtî û sosyalîzma pêkhatî bibînin, divê em dersan ji wan bigirin, têkoşîna zanistî-îdeolojîk, exlaqî-polîtîk rast bixwînin.

## 6- Pirsgirêka Civakê ya Ekolojîk

Eşkere ye ku pirsgirêka îndustriyalîzmê hem parçeyek ji pirsgirêka ekolojîk e, hem jî sedema wê ya bingehîn e. Di bin navekî din de şîrovekirin dibe ku bê maneya dubarekirinê. Lê ekolojî ji îndustriyalîzmê zêdetir mijareke civakî û bi pirsgirêk e ku xwedî mane ye. Herçiqasî weke têgîn were maneya zanista hawîrdor û jîngehê jî bi awayekî bingehîn ew zanist e ku têkiliya hişk a pêşketina civakî bi hawîrdora wê re analîz dike. Kengî felaketên hawîrdor û jîngehê li defa hewarê dan, bi giranî ket rojevê; xwedî hin maneyên divê mirov xwe jê dûr bigire di nava xwe de hilgire jî kirin şaxekî lêkolînê yê xweser. Ji ber ku ew jî weke îndustriyalîzmê pirsgirêkeke ji aliyê civakê ve hatiye afirandin nîne, ew weke marîfeta dawî ya yekdestdarên şaristaniyê di rojeva dîrok, dinya û civakê de hatiye danîn.

Belkî jî ti pirsgirêk bi qasî yên ekolojîk girîng û giran nebûn ku karibin rûyê rastî yê nîzamên kar-sermayeyê ango şebekeyên rêxistinkirî bixista rojeva mirovatiyê. Bîlançoya sîstema şaristaniyê ya kar û sermayeyê (tevahiya dîrokê weke koma yekdestdariyên eskerî, ekonomîk, bazirganî û dînî hemûyan) bi tenê ji her alî ve jihevdexistina civakê nîne (bêexlaqî, bêpolîtîkatî, bêkarî, enflasyon, fuhûş û hwd.), hawîrdor tevî jiyana ruhberan hemûyî xistiye tehlûkeyê. Em ê dij-civakbûna yekdestdariyê bi rengekî ji van rastiyan balkêştir û bibandortir, bi çi karibin ispat bikin?

Civaka mirov li gorî ruhberên din hemûyan weke xwezayeke mejî û nermiya wî di ser gişan re tê naskirin, jixwe di tehlîla dawî de civaka mirov jî hebûneke zindî ye. Dinyayî ye. Berhemê atmosfereke avhewayê ya bi nazikî û nazenînî hatiye birêkûpêkirin, beridîna dinya nebat û heywanan e. Nîzamên atmosfer û avhewaya dinya me û cîhana nebat û heywanên wê pêve girêdayî hemû giştî ne, û ji bo civaka mirov jî di cih de ne. Ev nîzamên em behsa wan dikin gelekî nazik in. Gelekî hişk bi hev ve girêdayî ne, mîna zincîrekê pêk bînin. Wexta xelekek jê qut bibe çawa zincîr bê kêr dibe, xelekeke ciddî ji zincîra beridînê jî qut bibe bivênevê tevahiya beridînê wê jê bi tesîr bibe. Ekolojî zanista van bûyer û pêşketinan e. Ji ber van

sedeman gelekî girîng e. Nîzamê hundir ê civakê bi çi sedemê bişkê jî bi destê mirov ji nû ve dikare bê sererastkirin. Ma ne dawiya dawî rastiya civakî rastî ye ku bi destê mirovan hatiye avakirin. Lê hawîrdor û jîngeh welê nînin. Hin komên jêdera xwe civak, ya rastî bi marîfeta hin komên ji nava civakê derketî û li ser wê bi yekdestdariya kar-sermayeyê xwe bi rêxistin dikin, bibin sedem ku ji xelekên hawîrdorê xelekên ciddî qut bibin, felaketên zincîrwarî yên bi beridînê dikarin hawîrdorê hemûyî di vê navberê de civakê bi qiyametê re rûbirû bihêlin.

Divê mirov ji bîr neke ku xelekên hawîrdorê bi beridîna mîlyonan salî pêk hatine. Zirar û ziyanên bi giştî di pênc hezar salên dawî de, bi taybetî jî di dused salên dawî de, weke qutkirina bi hezaran xelekên ji yên bi mîlyonan salî pêkhatî ne ku ev yek di nava demeke pirr kin de pêk anîne. Reaksiyona şikestinê destpê kiriye. Pêşbînî nayê kirin ka wê çawa were sekinandin. Di serî de rêjeya karbondîoksîtê ($CO_2$) û gazên din di atmoferê de rê li ber qirêjbûnê vedikin, û tê texmînkirin ku halê hazir bi sed salan heta bi hezar salan nayê paqijkirin. Encamên zirar û ziyanên di cîhana nebat û heywanan de belkî jî bi temamî derneketine holê. Lê eşkere ye ku herî kêm bi qasî atmosferê îşaretên hewarê S.O.S didin. Gemarbûna derya û çeman, çolbûn ji niha ve gihiştine ber sînorên felaketê. Bi tevahî nîşane diyar dikin ku qiyamet ê bi rêveçûna heyî ne bi bêbalansiyeke xwezayê, belê bi destê hin komên xwe weke şebekeyan birêxistinkirî bi serê civakê de bêanîn. Bêguman bersivên xweza jî wê bide vê rêveçûnê hene. Ji ber ku ew jî zindî û bi mejî ye. Sînorên wê jî hene. Sebra wê jî heta cihekî ye. Hêza wê ya xweragirtinê bi sînor e. Di cih û dema xwe de wê li ber xwe bide û wexta ev cih û dem bê, wê dilê wê bi mirovan neşewite. Lewma hemû wê ji xiyaneta bi qabîliyetên xwe û nirxên diyarî wan kirî re berpirsiyar bêne girtin. Ma jixwe pêşbîniya qiyametê jî welê nehatibû kirin?

Li vir armanca min ew nîne ku ez li senaryoyên felaketê yên nû zêde bikim; lê weke her endamê civakê yê divê ji sedî sed bi berpirsiyariyên xwe rabe, em jî bi berpirsiyariya hewce, bi têgihiştina li wezîfeyên xwe yên exlaqî û polîtîk ên ku sedema hebûna me ne, di çarçoveya qabîliyetên xwe de ya pêwîst bibêjin û bikin.

Di dîroka mirovatiyê de li ser aqûbeta Firewn û Nemrûdên kişiyan kelhe û pîramîdên xwe, gelek tişt têne gotin. Sedema vê yekê eşkere ye. Ma ne Nemrûd û Firewn jî çi weke kes çi jî weke nîzam YEKDESTDARÎ bûn ku bi îdeaya xwedayî radibûn. Belê, di serdema destpêkê de mînakên herî bi heybet ên yekdestdariyên sermayeyê bûn yên ku timî li pey karê diçûn. Çawa dişibin yekdestdariyên niha li bajaran kişiyane PLAZA'yan! Hemin di navberê de bi xwe cudabûn nebe jî di şêwe de heye. Kelhe û pîramîd tevî heybeta xwe hemû jî nikarin bi plazayên roja me ya îro re qayişê bikişînin. Jixwe weke hejmar hîç nikarin qayişê bikişînin. Eger hûn hemûyî bidin ser hev, tevahiya firewn û nemrûdan ji çend sedî derbas nabin; lê hejmara firewn û nemrûdên hemdem bi her halî ji niha ve ji sed hezaran bihurî ye. Mirovatiyê di serdemên berê de nikarîbû barê çend firewn û nemrûdî rake. Di bin barê wan de mirovatiyê her kir nalenal. Baş e, bi sed hezarên wan ên tevahiya hawîrdor û civakê ji hev de xistine, mirovahî wê barê wan hê heta kengî rake? Of, axîn û êşên bi şer, bêkarî, feqîrî û birçîbûnê rê li ber wan vekirin, wê çawa bidebirîne?

Wexta em dibêjin civaka dîrokî yekpare ye, me xwest li ber rohniya beridînê van rastiyan careke din bînin ziman. Ma ev rastiyên ku me bal kişand ser wan kêm dijwar û ne girîng in?

Zanista modernîteya kapîtalîst bi avahiya xwe ya pozîtîvîst gelekî ji xwe razî bû. Bawer kir ku keşfên mezin ên diyardeyî her tişt in. Heqîqeta mutleq bi tenê ji zanîna seresere ya diyardeyan hesiband. Ji sedî sed bawer kir ku ketiye pêvajoya pêşketina bêserûbinî. Lê nikarîbû pêşbîniya felaketa hawîrdorê ya li ber pozê xwe bibîne, mirov dikare vê çawa şîrove bike? Di serî de şer, ji bo felaketên civakî yên çarsed salên dawî yên ji tevahiya yên dîrokê bihurî pêşbîniya çareyeke bi kok û pratîze nekir, mirov dikare vê çawa şîrove bike? Şer weke desthilatdarî ketiye çaviyên civakê hemûyan, em bihêlin ew vî şerî asteng bike, ma em ê ji rast tespîtnekirina wê ya vê rastiyê re çi bibêjin? Eşkere ye ku di vê serdema serweriya yekdestdariyê de ku hegemoniya wê herî zêde vê serdemê heye, ji yeqînan wêdetir ji aliyê îdeolojîk ve dor li zanistê hatiye girtin û ketiye xizmeta sîstemê, bêguman zanista di vê rewşê de nikarîbûya bersivê bide van pirsan.

Zanista bi avahî, hedef û şêwazê xwe bi armanca rewakirina sîstemê hatiye îlankirin û rêkûpêkirin, nîşan daye ku bi qasî dînan jî bi tesîr nebûye. Lê divê mirov fêhm bike ku zanista ne îdeolojîk be jî nîne. Ya girîng ew e, mirov hay jê hebe ku zanîn û zanista kîjan îdeolojî û çîna civakî ye, û li gorî wê rewşa xwe diyar bike. Ekolojî weke yek ji zanistên herî nû di vê çarçoveyê de rewşa xwe diyar bike, ne bi tenê ya hawîrdorê, dikare bibe hêza çareseriya herî îdeal a xwezaya civakî jî.

## 7- Pirsgirêka Cinsperestiya Civakî, Malbat, Jin û Şêniyan

Têgihiştina jinê weke cinsekî mirov ê cudatiya xwe ya biyolojîk heye dibîne û fêhm dike, yek ji wan hêmanên bingehîn û girîng e ku dibe sedem di warê serwextbûna li rastiya civakî de mirov kor bibin û nikaribin û bibînin. Cudahiya cinsî nabe ku bi serê xwe bibe sedema ti pirsgirêka civakî. Li gerdûnê dualîteya di her zerreyê de çawa ku di ti hebûnê de weke sedema pirsgirêkê nayê dîtin, dualîteya di hebûna mirov de jî nabe ku weke pirsgirêk were bikaranîn. “Gelo hebûn çima dualî ye?” bersiva em bidin vê pirsê divê felsefî be. Analîza ontolojîk (zanista hebûnê) dikare li bersiva vê pirsê (ne pirsgirêk) bigere. Bersiva min ev e: Hebûn ji bilî dualîteyê nikare hebûna xwe pêk bîne. Dualîte, şêwazê mumkînbûna hebûnê ye. Jin û mêr bi rewşa xwe ya heyî nebin jî ango bêcins bin jî dîsa nikarin ji dualîteyê xwe xilas bikin. Bûyera jê re ducinsî jî tê gotin ev e. Divê mirov matmayî nemîne. Lê dualîte her tim ji bo pêkhatina cuda meyldar in. Bingehê mirov ji bo mejiyê gerdûnî (Geist) li delîl bigere jî di vê meyla dualîteyê de dikare bigere. Herdu aliyên dualîteyê jî ne xirab ne jî baş in; bi tenê cuda ne, divê cuda bin. Eger dualîte bibin wekhev wê wextê hebûn pêk nayê. Mînak du jin an jî du mêr nikarin pirsgirêka zêdebûnê ya hebûna civakî çareser bikin. Ji lewra bersiva pirsa “Çima jin an jî mêr?” qîmeta xwe nîne yan jî eger divê bersiva vê pirsê bê dayîn wê wextê divê bersiveke felsefî bê dayîn û bê gotin, ji ber ku gerdûn divê (neçar e, di wê meylê de ye, bi wî aqlî radibe, bi wê xwestekê) welê pêk bê.

Eger mirov jinê weke têkiliyên zêde yên civakî bibîne, wê ev bi tenê ne manedar be, di heman demê de ji bo bihurîna (çareserkirin) ji girêkên kor ên civakî jî wê gelekî girîng be. Ji ber ku herkes hînî nêrtina mêrê serwer bûye, şikandina çavkoriya di warê jinê de bi awayekî mîna parçekirina atomê ye. Ji bo şikandina vê çavkoriya di warê jinê de hewldaneke mezin a entelektuel û hilweşandina mêrtiya serwer divê. Ji alî û bereyê jinê ve em li mijarê binêrin, hema hema ev şêwe kiriye hebûna xwe û ya rastî jina bi awayekî civakî hatiye avakirin divê ewqasî jî bê hilweşandin. Em dema li tevahiya têkoşînên azadî û wekheviyê, têkoşînên demokratîk, exlaqî, polîtîk û çînî dinêrin, em dibînin di serketin an jî serneketina wan de li ser hêviyên wan ên şikestî (pîvan, bername û utopyayên bi cih nehatin anîn) şopên şêweyê têkiliyên (di navbera jin-mêr de) serwer (desthilatdarî) ên naşikên hene. Bi tevahî têkiliyên newekhevî, koletî, despotî, faşîzm û mîlîtarîzmê xwedî dikin, çavkaniya xwe ya bingehîn ji şêweyê van têkiliyan digire. Eger em dixwazin maneyên ku hêviyên me neşikînin, li gotinên wekhevî, azadî, demokrasî û sosyalîzmê bar bikin, divê em têkiliyên li dora jinê hatine deribandin û tevna têkiliyên bi qasî têkiliyên xweza û civakê kevin çareser û parçe bikin. Ji bilî vê rêyeke din nîne ku biçe azadî, wekhevî (li gorî cudahiyan) û demokrasiya rastî û exlaqê nedurû.

Ji dema derketina hiyerarşiyê ve îdeolojiya desthilatdariyê mane li cinsperestiyê bar kiriye. Ji nêz ve têkiliya xwe bi desthilatdarbûn û çînîbûnê re heye. Bi tevahî çavdêrî û lêkolînên rojane û yên arkeolojîk, antropolojîk nîşan didin ku demên jin bûye çavkaniya otorîteyê hene û demên behsa wan tê kirin demeke dirêj meşiyane. Otorîteya jinê ya navbihurî li ser otorîteya desthilatdarî û berhemê zêde nehatiye avakirin, berevajî çavkaniya xwe ji berhemdarî û zayînê digire. Ji lewra otorîteyek e ku hebûna civakî bi hêz dike. Mejiyê hisî yê li cem jinê bandora xwe zêde ye, bi vê hebûnê re têkiliyên xwe gelekî bi hêz hene. Di şerên desthilatdariyê yên li ser desteserkirina berhemê zêde de jin zêde diyar nîne. Ev jî, şêwazê wê yê hebûna civakî jî bi vê rewşa wê re pêwendîdar e.

Di pêşketina desthilatdariya girêdayî nîzamê dewlet û hiyerarşiyê de mêr bi rola pêşeng rabûye, çavdêriyên rojane û daneyên dîrokî vê yekê

eşkere nîşan didin. Ji bo vê jî otorîteya jinê ya heta qonaxa dawî ya civaka neolîtîkê jî pêşketîbû diviyabû bihata şikandin û li dawiyê bihata hiştin. Dîsa çavdêriyên rojane û daneyên dîrokî der barê vê de têkoşînên mezin ên cûrbicûr û yên dema wan dirêj piştrast dikin. Nexasim mîtolojiya Sumer hema hema weke hafiza xwezaya civakî û dîrokê têra xwe mirov rohnî dike.

Dîroka şaristaniyê di heman demê de dîroka têkçûn û wendakirina jinê ye. Ev dîrok bi xweda û evdên xwe, bi hukimdar û tebaên xwe, bi ekonomî, zanist û hunerê xwe, kesayeta mêrê serwer bi hêz kiriye. Ji lewra têkçûn û wendabûna jinê, li ser navê civakê ketin û wendakirineke mezin e. Civaka cinsperest encama vê ketin û wendakirinê ye. Mêrê cinsperest, dema ku li ser jinê hakimiyeta xwe ya civakî ava dike, ewçend dilbijok û bi mehd e, her cure destdan û têkiliya xwezayî vediguherîne xwenîşandaneke serweriyê. Li diyardeyeke biyolojîk a mîna têkiliya cinsî timî têkiliya desthilatdariyê bar kiriye. Mêr ti carî ji bîr nake ku mîna serketin bi dest xistibe têkiliya cinsî bi jinê re datîne. Di vî warî de gelekî zêde hînbûyî ye. Di vî warî de jî gelek gotin çêkirine: "Min ew temam kir", "Min karê wê qedand", "dêlik", "Divê tu ço ji ser serê wê, daşik ji zikê wê kêm nekî!" (Lê bixin bi tîran aş bikin bi qîran), "fahîşe, orûsipî", "kurikê mîna keçikan", "Eger tu qîza xwe serbest berdî yan wê bigihe daholvan an jî zirnevan" (Serê keçan bernedin), "Divê mirov wê zû bi mêrekî ve girê bide". Gelek çîrok û gotinên pêşiyan ên bi vî rengî têne gotin. Gelekî eşkere ye ku têkiliya cinsî û desthilatdarî di nava civakê de gelekî bi bandor e. Di roja me ya îro de jî her mêr 'mafê kuştina' jinê jî di navê de xwedî gelek heq û mafan e, û ev jî rastiyeke sosyolojîk e. Ev 'heq' her roj têne bicihanîn. Bi giranî karektera têkiliyan bi awayê tacîz û destavêtinê ye.

Di çarçoveya vê civakbûnê de malbat weke dewleta piçûk a mêr hatiye avakirin. Di dîroka şaristaniyê de saziya jê re malbat tê gotin bi şêwazê xwe yê heyî her çûye bi bandor bûye û ev jî bi sedema hêza mezin a daye amûrên desthilatdarî û dewletê ye. Yekemîn, malbatê li dora mêr desthilatdar dikin û bi vî awayî wê dikin şaneya civaka dewletê. Duyemîn, xebata jinê ya bêberdêl û bê sînor tê misogerkirin. Sêyemîn, malbat

zarokan mezin dike û bi vî awayî pêdiviya bi şêniyan tedarik dike. Çaremîn, weke modela rolê koletî û çilektiya cinsî li tevahiya civakê belav dike. Bi awayekî bingehîn malbat bi vê naveroka xwe îdeolojiyek e. Ew sazî ye ku têde îdeolojiya xanedaniyê fonksiyonel dibe. Her mêr di nava malbatê de xwe weke xwediyê xanekê his dike. Mirov malbatê weke rastiyeke gelekî girîng îdrak dike. Di bin vê yekê de pirr bi tesîrbûna îdeolojiya xanedaniyê heye. Malbat çiqasî zarok û jinên xwe hebin, mêr jî ewqasî ewlehî û anorê bi dest dixe. Gelekî girîng e ku mirov malbatê bi rewşa wê ya heyî jî weke saziyeke îdeolojîk binirxîne. Eger hûn jin û malbatê bi rewşa wan a heyî jî ji bin sîstema şaristaniyê, desthilatdarî û dewletê bikişînin, li dawiyê zêde tiştek bi navê nîzamê namîne. Lê berdêla vê şêwazê, rewşa jinê ya di nava şerekî dewamî yê asta navîn de ye ku ev şêwazê hebûneke têkçûyî, piçûkketî, feqîr û bi êş e. Çawa ku yekdestdariyên sermayeyê tevahiya dîroka şaristaniyê li ser civakê zincîreke yekdestdariyan dewam kirin, mîna ku bi awayekî parelel zincîreke yekdestdariyan a duyemîn jî li ser dinya jinê weke ‘yekdestdariya mêr’ pêkanîne. Hem jî weke yekdestdariya herî kevin a xurt. Eger mirov hebûna jinê weke cîhana mêtingeh a herî kevin bibîne, dibe ku me bigihîne encamên rast. Belkî jî mirov ji bo jinan bibêje, gelê mêtingeh ê herî kevin ê nebûye millet, rastir e.

Modernîteya kapîtalîst tevî hemû xeml û xêzên xwe yên lîberal, statuya ji berê mayî azad û wekhev nake, berevajî li vê statuyê wezîfeyên nû zêde dike û bi vî awayî jinê ji berê zêdetir dixe nava rewşeke girantir. Gotinên weke karkera erzan, karkera malê, karkera bê heqdest, karkera nerm û xizmetkar rewşa jinê ya nû û girankirî nîşan didin. Di ser de jî weke hebûneke magazînî û amûrê reklamê bikaranîna wê jî hûrûkûr tê kirin. Bedena wê bi xwe jî weke amûrekî îstîstmarê di asta metayê de sermaye jê nagere. Di karê reklamê de timî amûrê tehrîk û sorkirinê ye. Bi kurtî, nûnera herî berdar a koletiya modern e. Ma ji amûrekî bê sînor zewqê bide û ji koleya herî zêde karê bîne zêdetir malekî bi nirx heye?

Pirsgirêka nufûs û şêniyan ji nêz ve bi cinsperestî, malbat û jinê ve têkildar e. Çiqas şênî zêde bibin ewqasî jî sermaye zêde dibe. ‘Jina malê’

fabrîkeya nufûsê ye. Em dikarin jê re bibêjin, fabrîkeya meta û ‘dolên’ sîstem herî zêde hewcedarî wan e. Mixabin malbata di bin serweriya yekdestdariyê de xistine vê rewşê. Tevî ku zehmetî hemû para jinê dikevin, nirxê mal jî ji bo sîstemê diyariya herî hêja ye. Şêniyên zêde dibin herî zêde jinê dihilhilînin. Di îdeolojiya xanedaniyê de ev welê ye. Malbatgirî weke îdeolojiya herî nadîde ya modernîteyê, qonaxa dawî ya xanedantî gihiştiyê ye. Ev xusûs hemû bi zêdeyî bi îdeolojiya dewletdariya netewe re dibin yek. Ji dewleta neteweyî re timî zarokan mezin dike, ma ji vê hêjatir çi heye? Şêniyên dewleta netewe çiqasî zêde bibin, ewqasî jî hêza wan zêde dibe. Em bi vî awayî dikarin bibêjin, di vê zêdebûna şêniyan de ku sînorên xwe derbaskiriye, berjewendiyên heyatî yên yekdestdariya mêr û sermayeyê yên hişk rêxistinbûyî hene. Zor, zehmetî, qehr, êş, gunehbarkirin, feqîrî, birçîtî, cewr û cefa ji jinê re; bi destxistina kara kêfî ji ‘begê’ wê û sermayedarê wê re. Di dîrokê de ti serdem weke vê serdemê nebû xwedî hêz û ceribandinê ji bo ku jinê ji pirraliyan ve weke amûrekî îstîsmarê bi kar bîne. Jin weke mêtingeha destpêk û dawiyê di kêliya herî krîtîk a dîroka xwe de ye.

Felsefeyeke bi azadî, wekhevî û demokratiya bi kok barkirî, bi jinê re jiyaneke hevpar a were bi rêkûpêkkirin, jê tê ku di asteke bêqusûr de bedewî, qencî û rastiyê pêk bîne. Ez bi xwe di nava statuyên heyî de jiyana bi jinê re, bi qasî ku bi pirsgirêk dibînim ewqasî jî kirêt, xirab û şaş dibînim. Di nava statuya heyî de jiyana bi jinê re ji zarokatiya min ve yek ji wan mijaran e ku têde cesareta min herî kêm e. Ji ber ku jiyaneke welê ye, xerîzeyek mîna xerîzeya cinsî bi hêz dixe ber lêpirsînê. Xerîzeya cinsî ji bo xatirê dewamkirina jiyanê ye. Harîqayeke xwezayî ye, divê pîrozbûna xwe hebe. Lê yekdestdariya sermaye û mêr jin ewqasî qirêj kirine ku ev qabîliyeta harîqa ya xwezayê weke ‘fabrîkeyeke dolan’ a herî piçûkxistî veguherandine saziya hilberandina metayê. Bi van metayan civak tê serûbinhevkirin û hawîrdor jî di bin giraniya şêniyan de (niha şeş mîlyar e, em li hawîrdora bi deh û pêncî mîlyon şêniyî bifikirin) kêlî bi kêlî hildiweş e.

Bêguman mirov bi jinekê re bibe xwedî zarok bi xwe bûyereke gelekî pîroz e: Nîşan dide ku jiyan wê neqede. Bêserûbinîbûnê bi mirov dide hiskirin. Ma ji vê hisê hêjatir his dibe? Her cins û cure di bin vê rastiyê de ber bi heyecana bêserûbinîbûnê dikeve û bi vê hisê ditamije. Nexasim ev yek li cem mirovê roja me ya îro di asteke welê de ye, gotina hozanekî tîne bîra me. Hozan wisa dibêje, "Dola me bela serê me ye." Kes nikare înkar bike ku em careke din bi şaşî, kirêtî û bê exlaqiya mezin a yekdestdariya mêr û sermayeya dijberê Xwezaya Yekemîn û Duyemîn rûbirû ne.

Ya bi destê mirov tê avakirin, bi destê mirov dikare were hilweşandin. Di vir de ne qanûneke xwezayê heye, ne jî çarenûsek mewzûbehs e. Li vir a em behsa wê dikin, nîzamên desthilatdariyê ne, ew destên jiyanê yên bi hormon û bi kansêr ên zilamê bi hêz û xasûk ên şebekeyê ne. Min her tim hûrûkûr manedarkirina jiyanê ya du cotên herî harîqa yên di gerdûnê de his kir. Min cesaret kir ku berê bi jinê re bifikirim û li pêşiya hemû têkiliyên xwe, li ku, kengî û çiqas xirabî hebin, pêre guftûgo bikim û ji holê rakim. Bi tenê jina bi hêz, difikire, qenc, bedew û rast biryarê dide, bi vî awayî jî wexta ji min dibihure min heyranî xwe dike û dikare bibe muxatebê min, bêguman di gera min a felsefî de kevirê çarqozî ye ango ya serê quncikê ye. Min timî bawer kir ku sirrên jiyanê yên di vê gerdûnê de diherikin herî baş, bedew û rast wê bi vê jinê re manedar bibin. Lê bi qasî ku ti mêr ê nikaribin bi ser bixin, exlaqê min ê min jê bawerkirî heye; ez ê bi malê 'mêr û sermaye' yê li pêşiya min, şêwazê hebûna xwe ti carî bi Hurmuza nod hezar mêrî re parve nekim. Hingê ji femînîzmê jî wêdetir têgîna 'jineolojî' (zanista jinê-jinnasî) dikare bi awayekî baş bersiva armancê bide.

## 8- Pirsgirêka Civakê ya Bajarbûnê

Navekî din ê şaristaniyê medenîbûn e, bi Erebî bi maneya 'bajarbûnê' ye. Pirsgirêkên çavkaniya xwe ji bajarbûnê ne, ji pirsgirêkên ekolojîk ne kêmtir û ne jî bêqîmettir in. Di roja me ya îro de yek ji çavkaniyên bingehîn ê gefê li jiyana civakî dixwe bajarbûn e. Çi bajar xist vê rewşê?

Bi têgihiştineke rast û dûz, formulên bajar = çîn = dewlet dikarin mijarê sivik bikin. Lê kûrahiya maneyê û pirralîbûna wê kor dikin. Bi qasî avakirina gund, mirovatiyê avakirina bajaran jî li gorî xwezaya civakê li cih dîtiye û bi cih aniye. Bajar di serê wan mekanan de tê ku mejiyê civakî lê zêde dibe. Bajar jêhatîbûna mejiyê mirov tehrîk dike, sor dike, derdixe holê. Aqil têra xwe bi bajêr ve girêdayî pêşketî ye. Bajar ew mekan e ku mirov lê hay ji hêza xwe dibe ka dikare çi bike. Bajar ewlebûnê tîne. Mirovê bi xwe ewle zêdetir dikare rasyonel bifikire. Fikir jî rê li ber vedîtinên nû vedike. Teknîk û rêbazên zêdekirina hilberandinê pêş ve dibe. Mirovê ev ceribandî, bajar weke çavkaniya rohniyê dîtiye û her xwestiye ber bi bajêr ve baz bide. Ji ber ku perestgeh di dema xwe de cihê kombûna aqilê pîroz û ruhan bû, bajar jî li dora perestgehan pêş ketiye. Civak aqil û nasnameya xwe li wir zêdetir keşif dike, diafirîne. Ev îhtîmalên bi hêz ên em behsa wan dikin bi kêra bajêr tên.

Mîna ku di her rastiyê de dibe, rûyekî din ê bajêr jî bi derketina wî re xwe nîşan dide: ew jî çînîbûn û dewletbûn e. Bingehê maddî yê çînîbûnê, bêguman hilberîneriya zêde ye. Ji hin xwediyên aqil ên bajarê mezin dibe bi ceribandinê hîn bûbûn ku eger hejmara mirovan zêde bikin û li nava erdên bi bereket bixebitînin wê karibin qatbiqat bêhtirî şêniyên heyî, mirovan têr bikin. Ya pêdivî pê hebû bi tenê avakirina vê nîzamê bû. Nîzam ew dewlet e ku bi awayekî yekdestdar bû. Di asta bajêr de be jî, ev rêxistina nîzama nû, eşkere ye ku weke yekdestdariya cotkariyê derketiye holê. Bajarên Sumeran di vê mijarê de her tiştî eşkere rave dikin. Gelek şaristaniyên mîna Misr û Harappayê di derketina xwe de yekdestdariyên cotkariyê ne. Amûrên sererastkirina hilberînê ne. Wexta ku têra xwe tê hilberandin, herî kêm ji yên dixebitin qatekî zêdetir karibe berhemê zêde pêşkêş bike û hatibe wê astê, wê wextê bingehê maddî yê dewletê hatiye danîn. Bûyera jê re dewlet tê gotin, ya rastî ew kes in ku bi hilberîna zêde debara xwe dikin. Eger mirov dewletê weke rêxistina zêdeyiyan berhev dike bi nav bike dibe ku manedartir be. Bajar jî ji bo vê mekanekî di cih de ye. Di civaka qebîle û gund de têkiliyên bi vî rengî gelekî zehmet in. Şêweyê avahiya qebîle û gund derfet û îmkanan nadin vê yekê. Di binê derketina

dewletê li bajêr de ev rastî heye. Bi vî awayî mirovatî li bajêr bi diyardeya mêtinkariyê re rûbirû dibe. Bi şêweyekî têkiliyê yê berê nas nake rûbirû dibe. Navê hunerê nû êdî 'dewletgirî' ye. Yên vî hunerî di destê xwe de bigirin, ma nikarin çi bikin! Deriyekî mezin ê berjewendiyan e. Koleyê kedkar bi xwe jî fêhm kiriye ku di bêkariya dewletê de ji berê gelekî zêdetir ewle û xweşhal e. Mirov xebata wî bi tevahî bi darê zorê ve girê bide, ev ê bibe zêde mezinkirina dewletê. Pirr hindik çîroka derketina holê ya bajêr bi vî rengî ye.

Herçiqasî xwedî hin pirsgirêkan be jî (rêxistina mêtinkariyê û hêzdaran), eşkere ye ku di pêşketina rasyonel a civakê de bajar gaveke şoreşgerî pêk tîne. Arîsto ji bo mezinbûneke îdeal a bajêr li pênc hezar şênî difikire. Bajarên dema damezrandinê jî bi pirranî şêniyên xwe pênc hezar bûn. Mirovên nû têne cem hev. Mirov ji civaka qebîleyî bihurî ne. Kesên ji ezbet û qebîleyên cuda, bi welatîbûna bajêr bi hev têne girêdan. 'Xelkê bajêr', 'hemşehrî', 'bajarî' bi vî awayî pêk tên. Ev pêşketin dewlemendbûna bajêr nîşan dide. Bajar bi vê rewşa xwe amûrê pêşketinê ye. Çavkaniya pirsgirêkeke ciddî nîne. Di tevahiya serdema destpêkê de, car caran jî ji bilî Babîl û Romayê, pirsgirêka şêniyan li ti bajarî nayê dîtin. Bajar bi serdestiya civakbûna xwe balkêşiya xwe timî bi hêz dike. Modela Sumer weke lod û gidîşan zêde dibe, Misr jî bajarên hindik û esas ava dike. Ya rastî, şaristaniya Misrê weke şaristaniya nîv-bajar û gundî di dîrokê de bê hemta ye. Bazirganî û zenaetkarî gelekî bi pêş dikeve. Bi rê, mîmarî, spor, huner, avahiyên qesran ên li dora avahiyên perestgehê bi komikên nû fireh dibe. Gelek bajar jî li dora garnîzonên eskerî ava dibin. Nexasim garnîzonên Romayê her yek ji wan mîna kakilê bajarekî ne. Dîroknas behs dikin ku di vê demê de serê her deh gundan bajarek dikeve. Ango di navbera wan de têkiliyeke sîmbîotîk heye. Ev tê wê maneyê ku di navbera gund û bajar de hê pirsgirêk nîne.

Bajarê Romayê weke bajarê bi heybet ê dawî yê serdema antîk, belkî jî tevahiya pirsgirêkên serdema xwe di hinavê xwe de hildigirt. Vê yekê jî şaristaniya Romayê hem kiribû bajarê herî bi heybet hem jî yê herî bi pirsgirêk. Li Romayê mumkîn bû ku mirov li hemû çîn û koman

(arîstokrasî, bûrjûwazî, kole, proleteriya lumpen, her cure komên etnîk, her cure komên dînî, her cure nijad) rast bê. Çîn û komên berê bi awayekî bermahî, yên nû bi awayekî nû ruh bi wan bikeve dihatin temsîlkirin. Li aliyê din, dîsa mumkîn bû ku mirov li şêweyê her cure exlaq, polîtîka û îdareyê rast bê. Tevahiya mînakên qraliyet, cumhûriyet û demokrasiyê dihatin (li nava împaratoriyê) ceribandin. Mirov dikarîbû li tevahiya zanist, huner, felsefe û dînan weke bermahî û mînakên wan ên nû ruh bi wan dikeve rast bê. Roma bi rastî bajarekî ekumenîk (gerdûnî) bû. Tevahiya rêyan diçin Romayê, maneyeke vê gotinê jî ev rastî bû. Asta herî jor a şaristaniya navendî ya sê hezar û pêncsed salî nîşan dida. Hilweşîna wê jî hêjayî heybeta wê bû. Du hêzên mezin ên bûn bela serê şaristaniyê ango Xiristiyanên ku çîna xizanan pêk dianîn û komên hê hêzdarbûna etnîsîteyê diparastin (eger mirov ji van koman re barbar bibêje mirovê bi termînolojiya şaristaniyê bixape) bi ref û qefleyên ji derve û hundir dawî li bajêr anîn. Dema 476 P.Z. bi tenê dema hilweşîna bajarekî ango Romayê nîne, di heman demê de di kesayeta bajarekî de dîroka hilweşîn, xirabûn û rizîna şaristaniya pêşî ya sê hezar û pêncsed salî û serdema antîk e.

Dema weke serdema navîn tê bi navkirin, ji aliyê bajarbûnê ti carê xwe negihand serdema antîk. Bajarên serdema navîn bi kelhe û bircên xwe bi yeknesak û pirr piçûk destpê kirin. Bajarên serdema navîn bi awayekî mîna biryargehên derebegtî û mîrnîşînan bûn. Li dewrûberê bi kombûna hinek zenaetkar û xizmetkarên qesrê potansiyela xwe ya berfirehbûnê hebû. Çîna bazirganan ji bo heybet û mezinbûnê leza pêşî bide jî zehmet e ku mirov avahiyên weke mînakên berê yên bajarên Roma, Skenderiye, Antakya, Dara-Nisêbîn, Ûrfa-Edessayê bibîne. Di zêdebûna hejmarê de herçiqasî ji yên berê bibihurin jî di warê kêrhatin û mîmariyê de (perestgeh, şano, meclîs, agora, hîpodrom, amfîteatr, serşok, kanalîzasyon, kargeh û avahiyên hwd.) ti carî nikarîbûn xwe bigihînin îhtîşama yên berê. Serdema navîn weke bajar û şaristaniya konan a li ser xirbeyên serdema destpêkê û antîk hatibe avakirin. Bajar hê di wê rewşê de nîne ku serdestiyê li gund û derveyî bajaran bike, ji vê dûr e. Bi awayekî di okyanûsa gundan de mîna giravokan e. Herçiqasî di binyeya wan de

nakokiyên desthilatdarî û çînî hebin jî hê di wê rewşê de nînin ku rê li ber pirsgirêkên hawîrdorê vekin. Sîstema şaristaniyê bi giştî, ji ber yekdestdariyên sermayeyê hawîrdor hêdî hêdî dikeritand. Xwêgirtina erdan bi yekdestdariya cotkariyê re têkildar bû. Vê rewşê heta bi dawiya sedsala 18. dewam kir û her çû pirsgirêk girantir kirin.

Pêxîrtengiya bingehîn a bajarbûnê sedsala 19. bi şoreşa pîşesaziyê weke berhemê îndustriyalîzmê derket holê. Ev xweber nebû; Têkiliya wê bi xwezaya antî-civakî ya îndustriyalîzmê re hebû. Aliyê herî girîng ê bajêr ji aliyê ekolojîk ve dibû pirsgirêk, diyalektîkeke wî ya ji hawîrdorê qut hebû. Gund yekser têkiliya xwe bi hawîrdorê re heye. Bi her tiştê xwe pêve girêdayî ye, û dizane ew berhemê wê ye. Bi heywan û nebatên xwe re mîna bi zimanê hawîrdorê bipeyive jiyana xwe dewam dike. Zimanekî hevpar, zimanê cotkariyê pêk hatiye. Di avabûna civakê de bandoreke mezin a vî zimanî hebû. Li bajêr rewş berevajî ye; bajar her diçe ji cotkarî û hawîrdorê qut dibe. Zimanekî nû, zimanê bajêr pêşde diçe. Rasyonalîteyeke xwe ya cihê heye. Her diçe têkiliya xwe ya bi aqildariya hawîrdorê re qels dibe. Zimanê bajêr zimanekî welê ye, bi bazirganî, zenaetkarî, pîşesazî û pereyan re pêwendîdar e. Aqil û zanista van pêk tîne; ji aliyê van ve pêk tê. Diyalektîka pêşketina zimanê nû bi vî awayî ye. Eşkere ye ku li vir ziman û zêhniyeteke têra xwe xerîbketî û bi nakok mewzûbehs e. Bajarbûna demê çand û zaravayên komên klan, qebîle, eşîr, qewm û gund û yên li derveyî bajêr ên berê temsîl dikin, dihewîne. Zimanekî xweserî xwe yê zanist, huner, dîn û felsefeyê pêk aniye. Ji aliyê çînî ve arîstokrasî û yên din weke du kategoriyên sereke pêk anîne. Bajarsazî hê nebûye xwedî şexsiyet. Weke dewameke giştî ya civakê ye.

Sedsala 19. û 20. ev tewazûna dîrokî bi temamî xira kirine. Bêguman ev rewş ji nişka ve pêk nehatiye. Li Nîvgirava Îtalyayê di sedsalên 10.-16. de ji nû ve mezinbûn û bilindbûna bajêr (Venedîk, Cenova, Floransa, Mîlano û yên din), şoreşa bazirganiyê ya di sedsala 13. de bi rêya Îtalyayê derbasî Ewrûpayê dibe, îfade dike. Bajarên Îtalyayê ji pêvajoyê re pêşengiyê dikin. Bi Ronesansê re dîsa dixwazin li ser şopa Romayê mezin bibin. Di nava bajêr de û di navbera bajaran de reqabeteke gelekî dijwar heye. Di vir de

pevçûn û reqabet di qonaxa nû ya şaristaniyê de li ser pêşengiyê ye. Mîna ku tevahiya jiyana berê ji nû ve zindî dibe. Lê şert û mercên nû yê wê veguherînin. Roma wê bi teqlîdê neyê afirandin. Lê belê wê xwe bigihanda kopyayên Romayê yên mêşmirî. Ezmûna qraliyeta navendî û dewleta netewe jî wê bi ser nekeve. Lê bajarên Îtalyayê di sedsalên 10.-16. de bi rêya Ronesansê ji şaristaniya Ewrûpayê re pêşengî kirine û ev rastî ne ya guftûgoyê ye. Hem weke dêr (ekumen Katolîk) hem jî weke meyla laîk, sekuler bi rola xwe rabûye.

Şoreşa bajêr a Elman di qonaxa pêşî de bi yekîtiya bajarên Hansatîk (nêzî 1250-1450 P.Z.) destpê kiriye û şoreşa bazirganiyê ya bajarên xwe pêk aniye. Dema duyemîn jî (1400 P.Z.) weke qonaxa manîfakturel diyar dibe. Li dijî navendbûnê konfederalîzma bajaran têkoşîneke zêde dike. Gelek gundiyan û komên nîv-karker, bi awayekî bingehîn jî taximên zenaetkaran di van têkoşîn û serhildanên çarsed salî dewamkirî de bi roleke diyarker rabûn. Piştî pêvajoyeke gelekî xwînrij, ev ezmûnên pêşî yên konfederalîzmên demokratîk ên bajar û li derveyî bajaran, ji ber sedemên cûrbicûr (îdeolojîk, rêxistinî, pêşengî) li hemberî meyla monarşiya navendparêz û dewleta netewe şikestin, têkçûn. Eger têkneçûna, dibûya dîroka Ewrûpayê bi awayekî din bihata nivîsîn. Elmanya Federal a îro, ji faşîzma dewleta netewe ya bûrjûwaziyê ber bi vê modela kevin ve diberide û hêdî hêdî vediguhere. Lê ne weke konfederalîzma demokratîk, weke federalîzma bûrjûwayê.

Bajarên bi awayekî bingehîn bend û sukrên li pêşiya xwe rakirin û meşiyan bajarên Hollanda û Ingilîstanê bûn. Di vê de navendîbûna sê şoreşan bi hev re û gelekî zêde ya di binyeya wan de, rola xwe heye. Şoreşên bazirganî, fînans û pîşesaziyê bi awayekî bingehîn li Amsterdam û Londonê gihiştin serketinê. Federalîzma kominî li herdu welatan jî bi hêsanî hat tepisandin. Xelkên bajarên din û yên li derveyî bajaran bi hêsanî xwe radestî navendê û dewleta netewe nekirin. Ji bo vê jî pêdivî bi şoreşên sedsala 16. û 17. yên li Hollanda û Ingilîstanê hebû. Amsterdam di sedsalên 17. û 18. de, London jî di sedsalên 19. û 20. de bajarên pêşeng ên van pêvajoyên şoreşî ne. Herdu bajar jî navendên dinyaya serdema nû ne. Wan

sîstema şaristaniya navendî ya dinyayê ya ku di veguherîneke mezin re darbas dibû, rêve dibir. Navendên hêzên hegemonîk bûn. Şênî û nakokiyên wan bi lez mezin bûn. Di vê demê de avahiya kansêrolojîk a rastî ya bajêr destpê kir. Tevî avahiyên xwe yên nexweşokî, bi dorê bar kirin Franse, DYE, Rojhilata Ewrûpayê, Rûsyayê, Rojhilata Dûr, Emerîka Latîn, Rojhilata Navîn û Efrîkayê. Di dîrokê de bajarê sedsala 20. di vê 'demê' de destpê kir, serketina xwe ya ji sedî sed bi dest xist. Rola sereke ya şaristaniya kevin û cîhana paradîgmatîk a komunal a gundan/derveyî bajran duwanzdeh hezar salan dewam kir. Paradîgmaya kapîtalîst a bajarî şûna wan digirt û bi rola sereke radibû. Bajar êdî bi tenê navenda bazirganî, fînans û pîşesaziyê nebû; di heman demê de navenda hegemonîk a tevahiya fikra dinyayekê bû. Ev paradîgmaya ku di serî de bi zanîngeh û akademiyên xwe yên hêlîna zanistê, bi nexweşxane û girtîgehên xwe, bi çîn û burokrasiya xwe bi sazî bûye, li şûna fikra dinya navend eskatalojiya berê (axîret, ûxrewiyet), hewl dida bi fikra hişk a pozîtîvîst xwe serwer bike. Ya rastî, pozîtîvîzm dînê nû yê çîna bûrjûwa bû. Lê bi maskeya 'zanistperestiyê' ya li rûyê xwe dikir (bi sûdwergirtina ji zanistên girîngiya wan bi awayekî awarte zêde bûye) xwe serketîtir û pratîktir didît.

Bi vê avahiya bajaran bi rastî civak bi kansêra sosyal ketibû. Arîsto bi xwe jî bajarên deh hezar şêniyên wan heyî xeyal nekiribûn. Sed hezar, mîlyonek, pênc mîlyon, deh mîlyon, panzdeh mîlyon, bîst mîlyon û hedef bajarê bîstûpênc mîlyon e! Ma ev mezinbûneke rastî ya kansêrolojîk nîne, naxwe çi ye? Bi tenê ji bo xwedîkirina bajarekî bi vî rengî, welatekî mezinahiya wê di asta navîn de tevî dewrûbera xwe di demeke kin de dibe ku ji holê rabe. Ti mentiqê vê mezinbûnê nîne. Eşkere ye ku tevî civak û xwezaya bajêr ji bilî zirardana Xwezaya Yekemîn wê ti encamê nede. Ti welat û hawîrdor tevî gelê xwe nikarin barê bajarên mezin ên di vê astê de demeke dirêj hilgirin. Sedema bingehîn a xirakirina hawîrdorê ev mezinbûna kansêrolojîk e. Mîna ku bajarek welatê xwe bi xwe tevî gelê wê dagir dike, hildiweşîne û dike mêtingeh. Hêza nû ya mêtinkar bajar e; yekdestdariyên pîşesaz, fînans û bazirganiya global ên li bajêr in,

baregehên wan ên ku plaza ne. Ewlekariya li van plazayan ji ya kelhe û bircên berê kêmtir nîne û ev jî vê rastiyê piştrast dike.

Emperyalîzm û mêtinkariya sedsala 21. êdî li derveyî welatan nîne li hundirê wan e. Mêtinkar bi tenê xerîb nînin, zêdetir hevkarên wan in. Bi tenê yekdestdariyên sermayeyê global nebûn; desthilatdarî û dewlet jî global bûn. Desthilatdariya global a hundir û derve jî ji hev nayên cihêkirin. Kî bi ser kîjan neteweyî ve ye ew jî êdî girîng nîne; hemû hevpar in. Ji hev cihêkirina ji aliyê eskerî, ekonomîk û çandî ve jî zêde maneya xwe nema. Zimanê wê yê hevpar Ingilîzî, çanda wê Anglo-Sakson, rêxistina wê ya eskerî NATO û teşkîlata wê ya navneteweyî NY ye. Êdî ne yek û didu, gelek New York (Navenda hegemonîk a DYE; di salên 1930'î de ji Londonê nobet dewr hat girtin) û London hene. Em di serdema bajarên global de ne. Bajarên serdema global bi tenê bi leza şaneyên kansêrê hawîrdorê tine nakin. Eger bi şêwazê jiyan û zêhniyeta xwe Merîhiyek hebûya, bi herhalî wê ji bajarên vê serdemê kêmtir seyr û bêtir dinyayî bihata hesibandin. Esaleta bajarî ya zêde pêşneketibû, jixwe hê çênebû ji qîmeta xwe ket. Bi mode û moderntiyê xwe nîşan dide û bi vê dixwaze cinawiriya xwe ya rastî veşêre. Barbar û hovê rastî (faşîzm, qirkirin, bê sînor qirkirina çandî û herî dawî jî qirkirina civakê) bajar e. Her cure kes û komên (ji fanatîkên sporê bigire heta bi komên muzîkê yên di şahiyan de dînîtiyan dikin yên nava wan pûç, ji burokrasiya îmhaker heta bi şêlankerên piyasê, ji yên bi ti pîvana exlaqî ve ne girêdayî heta bi yên bûne robot; civaka medyakêş, dînên xeyalên sîmulark û ferazî) xweziyê bi barbar û hovên (ez ti carî bawer nakim ku qebîleyên koçber barbar û hov in) berê tînin êdî navenda wan li derveyî bajaran nîne, li bajaran bi xwe ne, bajar bi xwe ye.

Babîlên (heyfa Babîlê, ji ber ku heta hilweşiya jî hê esîl û pîroz bû. Dejenere û rizîn bi sînor bû) serdema modern pêk tên. Pêşbînî nayê kirin ka wê dawiya wê çawa bê. Lê li gorî tevahî daneyên zanistî wê dinya me nikaribe barê vê dinyayê (ev dinyaya sosret a xiyanet li xwe kirî, û bi biryar e ekolojiya dinyayê îmha bike) hilgire. Eger dîsa derkevin derveyî bajaran ango li gund û zozanan vegerin jî hem cih teng e, hem jî têra xwe bi

nexweşî ne. Divê mirov baş fêhm bike ku civaka bajêr di warê civakî de li ber sînorê 'qirbûnê' ye.

Hîç şik û guman têde nîne, ji vê rewşa bajêr ketiyê, avahiyên çînî yên desthilatdar û dewletdar berpirsiyar in. Kurtêlxurî û ranta bajêr ew bi awayekî dijwar kirin hov, û cinawiriya bajar (Levîathanê nû) afirandin. Eşkere ye ku mirov bi temamî nikare ji vê xelk û civaka bajêr berpirsiyar bibîne. Lê belê ter û hişk tev dişewitin. Mirovên li keviyên bajar, 'Xiristiyanên nû' yên bajêr, neçarbûn rêyekê bibînin. Naxwe neçar bûn ku bikevin rewşeke ewqas xirab, ne ji aliyê Neronekî bi tehlûke bêne şewitandin wê ji aliyê hezaran Neronî ve bihatana şewitandin. Divê mirov lê bifikire ku bedewî, exlaq û aqlê bajêr ê bi sînor mayî rizgar bike. Her projeya civakî êdî divê pirsgirêkên çavkaniya xwe bajar in (ji mêj ve êdî bûne nexweşî) bigire navenda xwe. Di vê çarçoveyê de em dikarin ji tevahiya pirsgirêkên civakî û ekolojîk re çareseriyên manedar bibînin û divê kes vê ji nedîtî ve neyê. Ji bo hilweşîna dinya û civakê em li sedemên din negerin, sedemên çavkaniya xwe bajar in bi tenê jî ji niha ve bi zêdeyî bi vê rolê rabûne.

## 9- Pirsgirêka Civakê ya Çîn û Burokrasiyê

Yên weke şert û mercên hebûna civakî li çîn û burokrasiyê dinêrin, di vê mijarê de ji pirsgirêkîbûna wan dikarin loma bikin. Îdea tê kirin ku pirsgirêkên ku çîn û burokrasî rê li ber wan vedikin dikarin hebin, lê weke hebûn bi xwe pirsgirêk nînin. Lê divê mirov fêhm bike ku herî kêm bi qasî bajêr avahiyên bi pirsgirêk in. Mîna bajêr, çîn û burokrasî jî di serdemên pêşî yên şaristaniyê de dibe ku zêde nebûbin giranî û rê li ber pirsgirêkan venekiribin. Dibe ku ber bi roja me ya îro ve avahiya wan a bi pirsgirêk bi awayekî zelaltir derketibe holê. Lê dîsa jî weke hebûn çînîbûn û pêve girêdayî burokratbûyîn hebûnên bi pirsgirêk in; ji aliyê polîtîka û exlaqê civakê ve hebûn in ku hewcedarî bi wan nîne. Civakê demeke dirêj li dijî van herdu avabûnan li ber xwe da. Herdu jî bi hêsanî qebûl nekirin. Bi dijwarî li ber wan rabû. Dîrok bi çîrokên van berxwedanan tijî ye.

Çawa ku em ê di beşên pêş de bi awayekî berfireh li ser rawest in, xwezaya civakî dikare di warê cudatî û cihêrengiyan de şêwe û guhertinên mezin pêk bîne. Ev normal in, û bûyerên li gorî ruhê xwezayê ne. Di cinsê nebat û heywanan de çawa ku hin çaviyên pêş neketine û hewcedarî bi pêşketina wan nehatiye dîtin hene, di xwezaya civaka mirov de jî li gorî min ji bilî çîn û tebeqebûnên (burokrasî jî tebeqeyek e) cûrbicûrî û cudatiyê manedar dikin û weke parçeyekî wan ê pirr bi sînor, kêrhatî û demî, çîn û tebeqebûnên bêkêr û mayînde yên mîna girêkekê zêde bandorê li çaviyên civakî bikin hewcedarî bi wan nîne. Pêşketina çînî ya rahib, arîstokrasî û bûrjûwayê ku demeke dirêj hin feydeyên piçûk mumkin kirin, mirov dikare bi şert lê negire û fêhm bike. Lê di tevahiya dîroka şaristaniyê de weke hêzên hegemonîk ên îdeolojîk, polîtîk, ekonomîk û eskerî bi karektera wan a mayînde, zêde zordest û mêtinkar, ji aliyê polîtîka û exlaqê civakî ve mumkîn nîne mirov li wan negire û wan qebûl bike. Nakokiya di vî warî de antagonîst e. Ji ber ku çîn û burokrasî bi rewşa xwe ya heyî têne maneya înkarkirina polîtîka û exlaqê civakî. Şertê ez datînim pêş gelekî girîng e. Çîn û burokrasiya xwedî xisletên cudatiyê yan jî bikêr dikarin mumkîn bin. Mînak, ma mirov dikare perestgeha çîna rahibên Sumer afirandî bi temamî bêkêr bihesibîne. Rahiban hîmê zanistê, hilberîna berdar, bajarbûnê, dîn, zenaetkarî û nîzamê li vir danî. Di gelek gavavêtinên çandî yên bi vî rengî de çîna rahib bi heman rolê rabû. Ji ber vê fonksiyona wan a erênî bi şert mirov dikare li wan negire û xweşbîn be. Lê çîn û burokrasî ji ber rewşa xwe ya tebeqebûyî, bêkêr û zêde mezinbûyî ji aliyê rewabûnê ve timî tê guftûgokirin û divê li dawiyê bêne hiştin.

Ji bo arîstokrasiyê xusûsên bi heman rengî di cih de ne. Arîstokratan jî ji aliyê pêşketina civakî ve hin tişt pêşkêş kirine, li nîzam, xebata berdar, zerafeta rêveberiyê, huner û zanistê zêde kirine. Di vê çarçoveyê de mirov dikare li wan negire û xweşbîn be. Lê tebeqebûn, despotbûn, xanedantî û qraltiyên pêkanîn, heta xwe weke xwedê dîtin, ev nexweşî ye, û nayên qebûlkirin. Polîtîka û exlaqê civakî bi van bûyeran re di nava nakokiya antagonîst de ye. Ji lewra bi rêya têkoşînê ji wan bihurîn û li dawiyê hiştina wan, pêdiviya polîtîka û exlaqekî rast e.

Yên têne gotin herî zêde jî ji bo bûrjûwayê di cih de ne. Pêşketina vî çînî û amûrên wê yên burokratîk di demên şoreşî de alîkariya wan bi pêşketina civakî re bûye. Bazirganî û amûrên gerrê ango pere û sened, di pêşdebirina pîşesaziyê de însiyatîfê digirin, car caran demokrasiyê diceribînin û alîkariya wan a bi sînor ji bo zanist û hunerê heye û divê mirov li van aliyên wan negire, xweş bibîne. Lê bûrjûwayê di çarsed salên dawiyê de hema hema ji tevahiya dîroka şaristaniyê ya çînî zêdetir bû sedema çînîbûn û burokratîkbûnê, û avabûna wê ya mayînde û zêde ya mîna şaneyên kansêrê çînîbûn û burokratîkbûnê zêde dikin, ji tevahiya çînîbûnên jor zêdetir û bi tehlûketir e. Di dîroka çînîbûnê de burokrasî û çînîbûna ku naverast dagirkirine, li gorî paradîgmaya min bi rola kansêrê radibin. Xwezaya civakî li gorî burokrasî û çînên bi vî rengî nîne û nikare barê wan hilgire. Eger hilgire ez ê jî bibêjim, “ha ji te re faşîzm.” Li gorî min pênaseyeke din a faşîzmê jî ew e, çîna navîn a ji burokrasî û bûrjûwaziyê pêkhatî qesta civakê dike. Li vir a vebirrî ew e, çîna navîn û civak nikarin bi hev re bimeşin ango faşîzm êriş û dijminahiya çîna navîn a li dijî civakê ye. Hinek rewşenbîr çîna navîn weke zemînê çîna rejîma cumhûriyet û demokrasiyê pêşkêş dikin. Yek ji propagandayên herî derew ên lîberalîzmê jî ev pêşkêşî ne. Di înkarkirina demokrasî û cumhûriyetê de herî zêde çîna rola xwe heye, çîna navîn e. Di vê de rola çînên din bi sînor e. Jixwe haya çînên din ji faşîzmê nîne. Çîna navîn bi vê rola xwe, bi rola xwe ya di zêdebûna bajaran de jî radibe: ango mezinbûna kansêrolojîk. Jixwe di navbera herduyan de têkiliyeke xurt a organîk û avahiyê heye. Çawa ku bajar vê nexweşiya xwe ji çilekî û mezinbûna çîna navîn digire, bajarên bi vî rengî jî timî çîna navîn mezin dikin.

Çîna navîn ji aliyê zêhnî ve pozîtîvîst e. Ango ji cewher û kûrahiyê mehrûm e, seresere nêzî mijaran dibe, diyardeyan dipîve û xwediyê şêweyekî avabûnê ye ku ji wan û wê de nabîne, û ji ber berjewendiyên xwe naxwaze bibîne. Tevî ku pozîtîvîzmê bi kirasê ‘zanistperestiyê’ pêşkêş dike, di dîrokê de çîna herî pûtperest e (Pirrbûna heykelan di dema vê çînê de bûne çirrik). Bi şêweyê xuya dike, laîk û dinyewî ye, lê bi xwe herî zêde dînperest û xeyalperest e. Dînperestiya li vir ez behsa wê dikim, di

dereceya baweriya hişk de bawerî û fikrên ‘diyardegir’ in. Em baş dizanin ku diyardegirî ti carî rastiya yekpareyê nîne. Qaşo laîktiyê, bi xwe jî projeyên xwe yên herî xeyalî (bi awayekî projeyên uxrevî) yên li dijî laîktiyê misêwa bêyî ku şerm bike ha ha dide ber civakê. Çîna navîn ew çîn e, yekdestdariya sermayeyê ji aliyê ekonomîk, polîtîk, eskerî, îdeolojîk û zanistî ve di asta global de pêşde biriye. Ji lewra di nava çînan de ya dijberiya wê ya civakê herî pêşketî ye. Dijbertiya xwe ya civakê bi du rêyan dimeşîne ango qirkirina civakê û kokqelandinê dimeşîne. Ev çîn dikare gelekî, komekê ji ber nijad, esil û dînê wê ji holê rake û ev ji ber karektera wê ya çîna bûrjûwayê mumkîn dibe. Ji vê jî xeternaktir, qirrkeriya wê ya civakê ye. Bi du rêyan qirkirin û kokqelandina civakê dimeşîne: rêya yekemîn, bi sazîbûna desthilatdarî û îdeolojiya dewleta netewe xwe weke şer û mîlîtarîzmê li ser tevahiya çaviyên civakê ferz dike. Desthilatdarî û dewlet xwe dikin yek û bi vî awayî şerekî topyekûn li dijî civakê dimeşînin. Bûrjûwa ji ezmûn û tecrûbeyên xwe baş dizane wekî din wê nikaribe civakê rêve bibe. Rêya duyemîn çalakiya li şûna civaka heqîqî afirandina civaka xeyalî û ferazî ye, ku bi şoreşa ‘medya û înformatîk’ê re meşiya ku bixwe di nîvê duyem ê sedsala 20. de pirr bi pêş ket. Ya rastî, şerê bomberankirinê yê medyatîk û înformatîk e. Nîvsedsala dawî bi vî şêwazê şer yê duyem bi awayekî serketî tê birêvebirin. Dema ku civaka xeyalî, ferazî û sîmûlakr ket şûna civaka xwezayî ya civaka rastî ye, û mirovan wer jê bawer kir, hingê bi rola qirkirin û kokqelandina civakê radibe.

Ez alîgirim ku em kategoriyên karker, serf û kole yên di dîroka şaristaniyê de weke çîna bindest û mêtingeh têne pêşkêşkirin bi awayekî cuda bi wan dakevin û li ser wan bisekinin. Rola van çînîbûnan a kirde û demokratîk gelekî bi sînor e; ji ber ku bi her tiştê xwe di nava avahiya zêhnî û binyewî ya efendiyê xwe de ye. Mîna dûvik an jî pêvekeke bê qîmet a efendiyê xwe ye. Di dîrokê de ti çîneke kirdar a efendiyê xwe aniye xwarê, nehatiye dîtin. Ev rewş rastiyeke girîng nîşan dide. Di maneya bindestî û mêtingehî de be jî çînîbûnên derdikevin, di qurmê civakê de, di dara giştî ya civakê de bi qasî çîqlekî ne. Çîqlê darê çiqasî şax berde û bişkê jî zêde bandorê li qurmê darê nake yan jî bandora bike bi sînor e. Ji ber vê

yekê, mirov civakê bi şêweyê civaka kole, efendî, serf, arîstokrasî, karker an jî bûrjûwazî bi nav bike, li pêkhatina termînolojiyeke şaş gelekî vekirî ye. Zanista civakî di vê mijarê de divê binavkirin û pênaseyeke nû pêşde bibe. Em çawa nikarin darê bi gulî yan jî çîqlê wê pênase bikin, em nikarin civakê jî bi çînên ji nava wê derketine bi nav bikin. Herweha û ji vê jî girîngtir, çînên mîna kole, serf, karker û bûrjûwaya piçûk nêzîkatiyên wan ên xwe kirdar dibînin, pesnê xwe didin û roleke girîng a şoreşgerî li xwe bar dikin, çawa ku di dîroka sosyalîzma pêkhatî û anarşîzmê de têra xwe têne dîtin, bi ya min ev awa encamgir nîne, û ez yeqîn dikim ku di bingehê vê de bi awayekî şaş nirxdana kirdariyê û rola şoreşgeriyê ya van çînan heye. Helwesta rast ew e, mirov li dijî her cure çînîbûnê be. Belkî di destpêkê de çînên kole, serf û karkeran di qonaxa derbasbûnê ya hê nîv-civakiyê de (bi pirranî nîv-gundî, zenaetkar) bi roleke şoreşger û kirdar rabûbin, rabûne. Lê ew jî çiqasî mayînde bûye û mezin bûye, ewqasî bêesl bûye, bi çînên jor re li hev kiriye û bê fonksiyon bûye.

Ya hê girîngtir ew e, fikreke dinyayê ya azadîxwaz, wekhevîxwaz û demokrat, nabe ku herdu çînîbûnan ji bilî maneya cudabûnê ya min behsa wê kiribû, erênî bibîne ku bibin kirdar û nirxên moral û polîtîk li wan bêne barkirin. Çînîbûnê ji herdu aliyan ve li dijî xwezaya civakê û weke antî-civakê dibîne, û divê li ber rabe. Pêkhatina wan, ferz nake ku mirov wan weke nirxên civakî yên rastî û rewa şîrove bike. Di bedena mirovekî de çawa ku hin girêkên çêbûyî em ji bedena normal nahesibînin, em dikarin ji bo diyardeyên civakî jî şîroveyeke bi heman rengî bikin. Herweha bi tevahî çînîbûnên bindest û mêtingeh, bi darê zorê yê desthilatdarî û dewletê û îdeolojiya wan a hegemonîk pêk hatine. Di van şert û mercan de koletî, serftî û karkertiya pêkhatî, em bi tenê dikarin mehkûm bikin. Eger bê gotin “Bijî kole û karkerê bi şan û şeref”, ev ê bi awayekî objektîv bibe pesindana hêzên desthilatdar ê hegemonîk, û erêkirina wan. Marks û peyrewên wî jî di navê de, gelek ekolan şîroveyên çînî yên bi vî rengî kirin û ev sedema bingehîn a serneketina wan e. Belkî çînîbûnên jor heta bi dereceyekê maneyek xwe hebin; lê çînîkirinên bi darê zorê û bi îqnaya îdeolojîk pêkanîna wan, dike ku çînîbûnên bi vî rengî timî bêne mehkûmkirin, pesnê

wan neyê dayîn û ji bo li dawiyê bêne hiştin timî têkoşîn bê kirin, bêguman ev helwesta rast e. Tevî ku nikare bibe kirdar payeya kirdariyê danê, tevî ku pirr eşkere ye, nikare şoreşê bike rola şoreşgertiyê lê hatiye barkirin, di dîroka têkoşînên civakî yên bi vî rengî de mînakên welê gelekî hene û ji têkçûnê xilas nabin. Sedema têkçûnê ew e, pirsgirêkê rast fêhm nake, rola şaş li çînîbûnê dike. Têkoşînên civakî yên sedsala 21. di dema nû de çiqasî ji vê şaşiya bi kok vegerin, ewqasî wê karibin serketî bibin.

Rast e, bûrjûwayê pirsgirêka çînî giran kiriye. Berjewendiyên xwe yên çînî heta bi çaviyên hûrûkûr ên civakê, kiriye desthilatdarî (desthilatdarbûn, bi civakê re şer e) û bi dewletê re fermî kiriye û di qonaxa xwe ya herî pêşketî de ye. Di serî de tawizkariya karkeran di bin navê 'hevpartiya sermayeyê' de gelek beşên civakê dike destikê xwe. Hema hema mirov dikare bibêje civak daqurtandiye. Lê dîsa çîna herî bi pirsgirêk e, heta ya herî rast ew e, mirov bibêje, ew çîn e ku herî zêde civakê bi pirsgirêk dike.

Di tevahiya dîrokê de burokrasî ji çînên serwer re destikê bicihanînê ya sazîbûyî bû. Lê ber bi roja me ya îro ve bi şêwebûna dewleta netewe ya dused salên dawî re gelekî berfireh bû, bi rola çîneke mîna serbixwe rabû, di desthilatdarî û dewletê de giraniya xwe zêde kir û mirov bi hêsanî dikare bibêje, bi zatî xwe dewlet dihesibîne. Bûye weke hêzeke xwedî giranî ya civak kiriye qefesa hesinî û bi destavêtina tevahiya qadên civakî (perwerde, tenduristî, dadgerî, çûnûhatin, exlaq, polîtîka, hawîrdor, zanist, dîn, huner, ekonomî) ev rola xwe bi hêz kiriye û ev jî rastiyek e ku redkirina wê zehmet e. Di civaka roja me ya îro de ne bi tenê burokrasiya dewletê gelekî mezin bûye; mîna li ser şopa wê bin, bi tevahî cîhana yekdestdariyê di bin navê "Em ji şîrketa malbatbûnê derkevin bibin şîrketa ji aliyê profeyonelan ve tê rêvebirin" de burokrasiya xwe weke bi qasî hûtan mezin kirine. Pirr zêde mezinbûna burokrasiyê bi vê rastiya nû ya şîrketan re têkildar e. Bi awayekî mirov dikare ji vê re 'dewletbûyîna' şîrketan jî bibêje. Ya rastî, di van şert û mercan de ku dewleta netewe têrê nake, kêm dimîne, û avakirina dewleta nû di rojevê de ye, pêşketina

dewletbûyîna şîrketên xwecihî û global weke meyleke serdest xwe nîşan dide.

Pirsgirêkên civakê yên ji ber van herdu pencan derdikevin holê rojane ne. Mîna ‘niha’ ya tevahiya dîrokê ye. Heta mirov dikare hê pêşde biçe û bibêje, ev herduberî xwezaya civakî (civaka ji rêûresmê) di nava milên xwe yên mîna extepotê de girtine, difetisîne û dihelîne. Ji vir encama divê mirov derxe ew e, pêvajoyeke kaotîk a herî têde pêxîrtengî heye pêk tê, azadîxwazî, wekhevîxwazî û demokratîxwaziya civakî bi tenê bi sîstemeke li ser hîmên şaristaniya demokratîk avakirî mumkîn e, ev jî têkoşîneke avakirinê ya bi zanisteke hatiye rastkirin ferz dike.

## 10- Pirsgirêkên Civakê yên Perwerde û Tenduristiyê

Herçiqasî weke mijareke zêde xuya bike jî perwerde û tenduristî jî bi sedema mîna zanistê ketine bin yekdestdariya desthilatdarî û dewletê rê li ber gelek pirsgirêkan vedikin û girîng e ku mirov li wan serwext bibe. Zanista bûye ya dewletê çawa ku bûye amûrekî herî bibandor ê hegemoniya îdeolojîk, tenduristî û perwerdeya bi desthilatdariyê re bûne yek jî heman karekterê nîşan didin.

Civak tecrûbe û ezmûnên xwe yên teorîk û pratîk weke agahî dide endamên xwe, nexasim jî dide ciwanan, mirov dikare vê hewldana civakê ya dixwaze tecrûbeyên xwe bide qebûlkirin, weke perwerde bi nav bike. Dîsa bi çalakiya perwerdeyê zarokan dikin civakî. Perwerdekirina zarokan wezîfeya desthilatdarî û dewletê nîne, wezîfeya herî girîng a civakê ye. Ji ber ku zarok û ciwan ên wê ne. Hem heqek e, hem jî wezîfeyek e ku civak zarok û ciwanên xwe li gorî rêûresmên xwe, xisletên xwezaya xwe ya civakî bigihîne, bike weke xwe û ev jî mijareke man nemanê ye; ji ber ku ji bo civak hebûna xwe dewam bike ev pirsgirêk e. Ti civak mafê xwe yê hebûnê û ji bo vê jî wezîfeya perwerdekirina ciwanên xwe bi ti hêzê re parve nake, nade hêzeke din û dewrî ti hêzê nake. Hêzên behsa wan tê kirin, herçiqasî dewlet an jî amûrên desthilatdariyê yên cûrbicûr bin jî ev heq û wezîfe nayê dewrkirin. Yan na, wê wisa were hesibandin ku xwe

radestî serweriyên yekdestdariyan kiribe. Pîrozbûna mafê perwerdeyê ji ber rola wê ya di hebûnê de ye, ango man û nemanê ye. Di serî de dê û bav ti hêz bi qasî civakê nikare nêzî zarok û ciwanên xwe be, ne jî dikare pêdiviyê bi vê nêzîkbûnê his bike. Di tevahiya dîrokê de yek ji çalakiya dijber a şaristaniyê ew e, civakê ji zarok û ciwanan mehrûm dihêle. Van çalakiyên xwe bi du rêyan pêk tîne: Yan yên mezin îmha dike û zarokên wan dike kole, yan jî bi armanca bikaranîna li qatê desthilatdariyê, qaşo ji bo perwerdekirinê, wan digirin cem xwe.

Yek ji armancên herî girîng ên şeran ew e, weke malê herî bi qîmet zarokan, keçikan û xortan bi van herdu rêyan di nava xwe de dihelînin, ji bo vê jî malên devşîrmekirinê çêdikin. Hem bingehê burokrasiya destpêkê bi vî rengî hatiye danîn hem jî dîroka şaristaniyê jî ji aliyêkî ve bi vê rêbazê hem qelskirina civakê ye, hem jî çalakiya pêkanîna hêza amûrên burokratîk e: ango li dijî civakê pêkanîna civakê ye; li dijî civaka xwezayî pêkanîna civaka desthilatdarî û dewletê ye. Di vê pêkanînê de zarok û ciwanên ji civakê bi xwe hatine şuştin bi ziman, çand û dîrokeke din têne perwerdekirin. Armanca bingehîn ew e, ciwan û zarok bi rastiya xwe ya civakî re xerîb bikevin. Dikin ku nikaribin bê desthilatdarî bijîn. Hem maddî hem jî îdeolojîk wan dikin xwediyê nasnameya herî zêde dewletdar. Dewlet û desthilatdariyê ji bo wan dikin rêya bi tenê ya hebûnê. Ev beşên têne devşîrmekirin hem xwe dewlet û desthilatdarî dihesibînin, hem jî bi vî rengî bi civaka xwezayî re dibin dijber. Carnan civaka dewletê û xwezaya civakî wekhev dikin. Ev şaş e, bi nakok e. Dîroka şaristaniyê li ser vê nakokiyê hatiye avakirin.

Ji ber van sedemên dîrokî desthilatdariyan perwerde desteserkiriye. Naxwe wezîfeya perwerdekirina civakê xema wan nîne. Sermayedarek karkerên xwe çiqasî perwerde bike, desthilatdarî jî bi heman mentiqî kesên ku hukim li wan dike weke karker û evdên xwe perwerde dike. Navê wê burokrasî be jî endamên wê ji herî jêr heta bi herî jor ve weke evd têne perwerdekirin.

Nexasim desthilatdariyên dewleta netewe tevna yekdestdariya xwe li ser tevahiya zarok û ciwanên civakê berê pêşî bi rêya perwerdeyê dihûnin.

Kesên bi têgihiştina xwe ya dîrok û huner, bi zêhniyeta dînî û felsefî strane êdî ew zarok û ciwanên malbatên xwe yên berê nînin, ew zarok û malên xas ên xwediyê desthilatdariyê ne. Xerîbkirina mezin bi vî awayî bi sazî dikin. Ji aliyê perwerdeyê çîna herî zêde yekdestdariya xwe li ser civaka gel pêk tîne bûrjûwazî ye. Perwerdeya seretayî û navîn mecbûrî dike û wexta dîplomaya zanîngehê bi bîra yên li kar digerin dixe, pêvajoya xistina qefesê û pencê hewcedarkirin û xerîbkirinê yê li ser ciwanên civakê êdî destpêkiriye. Zor, hêza maddî û perwerde êdî bûne sîlehên mêtingehkirinê yên mirov bi zor xwe li ber wan bigire.

Ji lewra mirov bi hêsanî dikare bibêje, di tevahiya dîroka şaristaniyê de civakê herî zêde ji şerê desthilatdarî û dewletê bi amûrê perwerdeyê li dijî wê meşandine derbên xedar xwarine. Mafê perwerdekirina civakan yek ji wan mafê wan e ku pêkanîna wî herî zehmet e. Li hemberî hêzên pirr mezin yên dewleta netewe û yekdestdariyên ekonomîk, civak ji bo bi perwerdeyê hebûna xwe pêk bîne, di dîroka xwe de ketiye pêvajoya herî zehmet. Dewleta netewe ya hegemoniya xwe ya îdeolojîk ava kiriye bi şoreşa dawî ya ragihandinê re bi şerê medyayê mêtingehkirina çandî bi qasî aliyên eskerî û ekonomîk, belkî jî ji wan jî zêdetir û vedizî li ser tevahiya civakê hê serketîtir ji nû ve rêve dibe. Li dijî vê mêtingerî û fetha çandî, amûrên bi tenê yên civak karibe bi wan hebe, polîtîka û exlaqê wê bi xwe ne. Divê zanibe bi van amûran li ber xwe bide, ji ber ku rêya bi tenê ya rizgarî û azadiyê ev e. Civaka ciwanên xwe wendakirî yan jî berevajî ciwanên civaka xwe wendakirî ji têkçûnê wêdetir mafê xwe yê hebûnê bi xwe wenda kiriye, xiyanet pêre kiriye. Piştre ya mayî rizîn, ji hev belavbûn û tinebûn e. Li dijî vê, wezîfeya bingehîn a civakî ew e, divê amûrên bingehîn ên hebûna xwe ango saziyên perwerdeyê pêşde bibe. Divê şîroveya zanistî, felsefî, hunerî û zimanî ji aliyê naverokê ve ji avahiya zanista desthilatdariyê veqetîne û di şoreşa maneyê de bi ser bikeve. Naxwe wekî din mumkîn nîne çaviyên polîtîk û exlaqî yên hebûna civakî bi kêr bên.

Bi vî awayî pirsgirêka perwerdeyê bi xwe saziyên (çaviyên) polîtîk û exlaqî yên civakê mecbûrî dikin û wezîfeya bingehîn a exlaq û polîtîkayê jî

bicihanîna perwerdeya civakî ye. Civaka nikaribe xwe perwerde bike nikare saziya xwe ya exlaqî û polîtîk pêşde bibe û li ser piyan bigire, herweha wê neçar timî di tehlûkeyê de be, birize û ji hev belav bibe.

Pirsgirêka tenduristiyê ya civakê jî mijareke gelekî nazik e. Bi qasî perwerdeyê girîng e. Civaka nikaribe tenduristiya xwe bi îmkanên xwe biparêze, bingeh, hebûn û azadiya wê yan di tehlûkeyê de ye yan jî bi temamî ji dest hatiye dayîn.

Hewcedariya tenduristiyê nîşaneyeke hewcedarbûna giştî ye. Civakeke pirsgirêkên xwe yên fizîkî û rûhî çareserkirî derfet û îmkanên azadbûnê bi dest xwe xistiye. Di civakên mêtingeh de bi awayekî belav zêde nexweşî heye û ev jî têkiliya xwe bi rejîma mêtinkar ve heye. Divê civak karibe saziyên xwe yên tenduristiyê û pisporên wê pêk bîne û ev jî weke wezîfe û mafekî bingehîn ê civakê bê dîtin. Dewlet û desthilatdarî vê wezîfeyê ji destê civakê bigire û bixe bin yekdestdariya xwe, ev derbeke mezin e ku li tenduristiya civakê dixe. Têkoşîna ji bo mafê tenduristiyê di mijara azadî û rêzgirtina xwe de hasasiyet e.

Moderníteya kapîtalîst weke mijara man û nemana xwe girîng dibîne ku perwerde û tenduristî bi ser dewleta netewe ve werin kirin. Civak hebûn, tenduristî û rohnîbûna xwe bi van qadan ve girêdayî dikare dewam bike, ji lewra heta ev herdu qad nekevin kontrolê, li ser wan serdestiya yekdestdariyê neyê avakirin, mêtinkarî û serweriya giştî gelekî zehmet e ku xwe dewam bikin. Ji ber ku baş tê zanîn, bi tenê bi zora mîlîtarîst a berbiçav civak nabe milk û lewma kontrola li ser tenduristiyê ji bo yekdestdariyan bi awayekî awarte girîng e.

Em careke din dibînin ku di bingehê tevahiya pirsgirêkên hebûnî yên civakê de yekdestdariya dewlet û desthilatdariyê heye. Kar-sermaye bêyî vê yekdestdariya desthilatdariyê nikare dewam bike. Li hemberî vê, bêyî têkoşîna sîstemî ya şaristaniya demokratîk ti pirsgirêka civakê bi awayekî mayînde çareser nabe.

## 11- Pirsgirêka Civakê ya Mîlîtarîzmê

Mirov dikare mîlîtarîzmê weke yekdestdariya herî pêşketî ya antî-civakgiriyê pênase bike. Mirov dikare qebûl bike ku li ser xwezaya civakî cara pêşî bi armanca zordestî û îstîsmarê hewldanên otorîtedanînê ji rêûresma nêçîrvaniya 'zilamê bi hêz û xasûk' weke encama mejiyê wî yê analîtîk û çalakiya wî hat pêşxistin. Yê herî xurt hewl dide otorîteya xwe bi awayekî esasî li ser du komên sereke ava bike: Li ser koma nêçîrvan a li cemê û li ser jina ku wî hewl dida wê di malê de bigire. Piştî ku hêmanên Şamanîstîk (Proto-rahib) û Jerontokratîk (koma kalemêran) tevlî pêvajoyê bûn, mirov dikare bibîne ku otorîteya hiyerarşîk a pêşî yekser li cem gelek civakan bi gelek awayên cûrbicûr pêk tê. Bi gavavêtina dîroka şaristaniyê re em dibînin ku zilamê bi hêz û xasûk û berdestiyên wî weke desthilatdariya fermî dibin, xwe weke milê eskerî yê dewletê (yekdestdariya pêşî ya li ser ekonomiyê bi desteserkirina berhemê zêde pêkhatî) bi sazî dikin. Di civaka Sumeran de yekser piştî dema rahib-qralan Xanedaniyên I., II. û III. yên Ûrê vê pêkhatinê nîşan didin. Di gelek civakan de rastiyên bi heman rengî pêk tên. Di Destana Gilgamêş de jî bi awayekî pirr eşkere mirov dikare gav bi gav bişopîne ka çawa qraltî ji rêûresma Xwedawend Înannayê (ji rêûresma jinê ya xwedawendiyê-rahîbetiyê) tê qutkirin û çawa rahîbe tê bêhêzkirin û li mala taybet û giştî (kerxane) tê girtin.

Eger mirov Gilgamêş weke fermandarê pêşî yê di dîrokê de sembolîze bike, mirov ê karibe pêkhatina rêûresma eskerî-mîlîtarîst- baştir ji hev derxe. Karê wan ew e, ji bo pêdiviya bi koleyan a bajêr tedarik bikin bi armanca nêçîra mirovan derdikevin seferê (Bi hevkartiya Enkîdoyê navê wî di Destana Gilgamêş de derbas dibe li Bakura Iraqa îro dima, diçin nêçîrê) û ji qebîleyên ji wan re barbar û koh-hovî (Hûmbaba) digotin nêçîra mirovan dikin. Pirr eşkere ye ku di çavkaniya hovîtî û barbartiya rastî de zordariya bajêr heye. Gotina 'barbar' a di rêûresma çanda Grek de berevajîkirineke bajêr e, weke propagandayeke wê ya derew li hev hatiye çêkirin. Bi armanca serdestiya îdeolojîk e. Qebîleyên li derveyî bajaran ên

li gund û zozanan diyar e ku li gorî rêxistiniya bajêr hê bêtir qels û bê rêxistinî ne, ji lewra eşkere ye ku wê bi qasî ku tê gotin barbar nebin. Têgîna barbartiyê di dîroka şaristaniyê de di serê derew, berevajîkirin û jirêderxistinê de li rêza pêşî tê. Duyemîn wezîfeya zordarê bajêr ‘ewlekarî’ ye. Ji bo vê jî rêbaza herî zêde serî lê dide, hê bêtir avakirina kelhe û bircan e, û hê bêtir vedîtin û pêşdebirina sîlehên bi hêz û kujêr e. Bi vê armancê jî bi mîlyonan mirov hatine kolekirin, serfkirin û kirine karker, yên ev rewş qebûl nekirine hatine kuştin. Mirov bibêje ev çalakî weke dîrok hatine nîşandan, ev ê bibe nêzîkbûneke heqîqetgir a neyê redkirin.

Milê eskerî li gorî hêza xwe, di vedizîna nirxên ekonomîk de para herî mezin ji xwe re vediqetîne. Di dîrokê de seferên bi armanca xenîmetê vê rastiyê têra xwe baş eşkere dikin. Herweha eşkere ye ku di bingehê dewletê de milk, di bingehê milk de jî fethên eskerî û desteserkirin hene. Yê fetih dike xwedî ye. Vê yekê jî weke mafekî xwezayî û dest jê nabe yê encama çalakiya xwe dibîne û îlan dike. Dewlet, di serî de erdên ji aliyê hêzên desthilatdariyê ve têne zevtkirin û fetihkirin, ji tevahiya milk û xenîmetan (milkê tê veguhestin) pêk tê. Mînak, “Memalîkeyê (memleket-milkên) Osmanî hemû yê padîşah in” ev pîvan têkiliya dewlet û fethên eskerî îfade dike û ev pîvan ji dewama rêûresma pêşî û sereke pêve maneyeke xwe ya din nîne. Rêûresm welê hatiye avakirin û di avakirina her dewletê de hatiye huqûqîkirin û bi vî awayî hatiye meşandin. Beşê eskerî, ji ber van sedeman wexta xwe weke xwediyê rastî yê dewletê dibîne ango xwediyê rastî yê milk dibîne û pênase dike, rêûresma dîrokî li ber çavan digire. Milê herî bi hêz ê yekdestdariyê ye, û ev jî li gorî xwezaya desthilatdarî û dewletê ye. Jixwe hêza sîleh û mirovan a di dest de bi hêsanî vê jêhatîbûn û qebîliyetê didiyê. Burokrasiya sivîl car caran hewl dide para xwe (yekdestdariya xwe) zêde bike û hewldanên bi vî rengî jî bi darbeyên eskerî bi encam dibin. Li ber rohniya van rastiyan mirov baştir dikare serwext bibe. Bêguman yekdestdariyên burokratîk û îdeolojîk ên ji wan re çîna ‘ilmiye’ û ‘qelemiye’ tê gotin di avakirina dewlet û desthilatdariyê de bivênevê xwedî rol in. Lê bi qasî rola eskeriyê diyarker

nînin. Amûrên dewlet û desthilatdariyê yên di dîrokê û roja me ya îro de bi seresere jî bêne lêkolînkirin wê van rastiyan piştrast bikin.

Ji aliyê mijara me ve ji xusûsên herî girîng a yekemîn, eskeriye yekdestdariya herî pêşketî û diyarker e. Çawa ku bi awayekî îdeolojîk tê pêşkêşkirin, esker û artêş ji bo şan,şeref û qehremantiyê nînin, (ev bi armanca berevajîkirin û veşartina cewherê mijarê propagandayên îdeolojîk in) weke hêmana yekdestdariya desthilatdariyê ya dest jê nabe, ew hene. Bi xwe ekonomîk e. Artêş yekdestdariyek e ku xwe disipêre ekonomiyê, di ser ekonomiyê re û nêzî wê disekine, lê hatina ji wê (mûçeyên xwe) misoger kiriye, li ber rabûna wê gelekî zehmet e, bi tevahî beşên din ên yekdetdariyê neçar in ku pê re parve bikin û pê re li hev bikin. Di tevahiya pêşketin û bingehê xwe yê dîrokî de yekdestdariyeke bi kok a xwedî sazî û rêûresm e. Bi xwe yekdestdariyeke ji nêz ve bi pêşketina ekonomîk re pêwendîdar e, lê yekdestdariya çîneke (burokrasî) welê ye ku pêdivî dibîne xwe ji ekonomiyê dûr bigire. Ji vî alî ve mîna ku xwe ji civakê dûr digire nîşan dide. Ya rastî, ji beşê wan yekdestdaran e, xwe bi sîlehên eskerî û yên ekonomîk ên herî baş gurçûpêç kiriye. Em analîza eskerî rast nekin, em bi temamî ne dikarin li yekdestdariya ekonomîk, ne jî li yekdestdariya dewlet û desthilatdariyê serwext bibin. Hersê jî yekpare ne. Bi heman cewherî ango bi nirxê zêde yê civakê xwe xwedî dikin. Di berdêla vê de îddîa dikin ku ewlekariya civakê, perwerdeya wê, tenduristiya wê û hatina wê ya aborî tedarik dikin, tenzîm dikin. Dewletgirî, dewleta îdeolojîk xwe bi vî awayî pêşkêş dike. Lê rastî bi awayekî din e, çawa ku me nîşan daye.

Eskerî û mîlîtarîzm, milê herî xurt ê rêxistinkirî yên sermaye û desthilatdariyê ne, lewma li gorî xwezaya wê ye, herî zêde civakê bixe qada xwe ya hukim lê dike û wê di qefesa xwe de bigire. Mîlîtarîzm tevî ku bi giştî di tevahiya dîrokê de û di dewletan de ketiye çaviyên civakê, civak kiriye kontrola xwe û hukim lê kiriye, herî zêde di serdema çîna navîn de (bûrjûwazî) di bin yekdestdariya dewleta netewe de gihiştiye asta herî mezin. Di dewleta netewe de li ser navê artêşa fermî tevahiya civakê bi awayekî fermî ji sîlehan tê kirin, yekane yekdestdariya sîlehê dikeve destê

artêş û dewletê û ev jî weke xisleteke wê ya diyarker derdikeve pêşiya me. Di ti dema dîrokê de bi qasî ku çîna bûrjûwayê civak ji sîlehan kiriye, civak ji sîlehan nehatiye kirin. Sedema vê rastiya gelekî girîng ew e, mêtinkarî gelekî zêde bûye û li dijî wê berxwedanên mezin pêk tên. Civak bi awayekî berfireh û dewamî ji sîlehan neyê kirin, desthilatdarî nikare heta bi çaviyên wê yên hundir biçe û xwe bide ferzkirin. Jixwe wekî din jî civak nayê birêvebirin. Wisa xuya ye ku civakê nexin ‘qefesa hesinî’ a modernîteyê nikarin serî pê re derxin. Herweha ji aliyê artêşa medyatîk a serdema yekdestdariya fînansa global ve dor li civakê neyê girtin, civak nayê birêvebirin. Şaxên yekdestdariyên mêtinkar, weke yekdestdariyên îdeolojîk-medyatîk, burokratîk-eskerî pêk tînin û nîşan didin. Bi tayên qut nabin bi hev ve girê didin. Şaristaniya navendî ya mezin û dawî, bi hegemonê super û hegemonên din ên herêmî re bi hevkarên xwe hemûyan li ser û hundirê civakê xwedî sermayeya îndustrî ya sîlehan a dêwane ya xwe disipêre mîlîtarîzmê, li gorî yekdestdarên din li pêştir e, ev jî ji vê rewşa wê ya dîrokî û rojane bi xwe tê. Mîlîtarîzm bi faşîzma yekdestdariya kapîtalîst re tê wekhevkirin û ev jî maneya xwe ji cewherê vê rastiya wê digire.

Bêguman tevahiya civaka xwezayî û di tevahiya dîroka nivîskî de civak bi şêweyên cûrbicûr li dijî pêşketina mîlîtarîst a şaristaniyê xwe gelekî parastine, bergiriya xwe kirine. Rêûresma jê re xweparastin tê gotin jî di nava hezarê salan de bi berxwedan û serhildanên cûrbicûr, bi şêweyên artêşên parastinê yên gel û gerîlla bi sazî bûne û şerên mezin ên parastin û bergiriyê meşandine. Bêguman em nikarin şerên parastinê û şerên yekdestdariyên mîlîtarîst wekhev bibînin. Ji aliyê naverok û cewher ve di navbera wan de cudahî heye. Yek ji wan karektera xwe antî-civakgir e (mêtinkar, dejenerekar, tineker), yê din jî civakgir e (civakê diparêze, qabîliyetên wê yên exlaqî û polîtîk azad dike). Şaristaniya demokratîk li ser bingehê sîstematîzekirina xweparastinê, li dijî mîlîtarîzma şaristaniya navendî civakê diparêze û bergiriya wê dike.

## 12- Pirsgirêka Civakê ya Aştî û Demokrasiyê

Di yanzdeh sernavên berî vî sernavî de me hewl da em bi pênaseyên gelekî kurt ên destpêkê bidin nasîn ka bi kîjan pirsgirêkan bêhn li xwezaya civakî hatiye çikandin. Zanisteke civakî û paradîgmayek eger xwe bisipêrin van pênaseyan, û analîzan bikin û bersivan bidin hingê nirxekî xwe hene. Naxwe wê ti cudahiya xwe ji retorîkên (hunerê gotinbêjiyê ya serweriyê vedişêre) ji rêûresmê û lîberal nemîne. Encama hevpar a ez gihiştimê ev e, di çavkaniya pirsgirêkên civakî de bandorên yekbûyî yên yekdestdariyên zordestî û mêtinkariyê, serwerî û mêtingeriya wan nexasim derfet û îmkanên ekonomîk ên berhemê zêde û bi giştî jî xwezaya civakî (hebûna civakê) îstîsmar dikin, hene. Ji hebûnê wêdetir ew sedem bi xwe ye. Pirsgirêk ne ji xwezayê (Xwezaya Yekemîn) ne jî ji hêmaneke din a civakî (Xwezaya Duyemîn) çêdibin.

Bi awayekî giştî ango bi maneyeke kolektîf ji bo meşandina karûbarên hevpar ên civakê, weke hêmanên hebûnê bêyî polîtîka û exlaqê civakî yên bûne çaviyên wê, civak nikarin hebûna xwe dewam bikin. Rewşa normal a civakê, hebûna wê bê polîtîka û exlaq nabe. Eger civakek, çaviyên wê yên exlaqî û polîtîk bi pêş neketibin an jî kotrimî bûbin, ji rê hatibin derxistin û hatibin tevizandin, wê wextê em dikarin bibêjin ku ew civak ji aliyê yekdestdariyên cûrbicûr ên weke sermaye, desthilatdarî û dewletê ve hatiye dagirkirin û mêtingehkirin. Lê bi vî awayî dewamkirina hebûnê, li dijî hebûna xwe xiyanet û xerîbketina bi xwe re ye; weke kerî, eşya, mal û milk di bin serweriya yekdestdariyan de heye. Di vê rewşê de xwezaya xwe ji dest daye, qabîliyetên wê yên xwezaya civakî têkçûne, yan jî serkorî bûye. Bûye mêtingeh, ji vê jî xirabtir bi her tiştê xwe bûye milk û xwe ji rizandin û tinebûnê re hiştiye. Di dîrokê û roja me ya îro de gelek civak hene di çarçoveya vê pênaseyê de ne. Yên hatine rizandin û tinekirin ji yên hê li ser piya mane qat bi qat zêdetir in.

Ji bo civak karibe hebûna xwe dewam bike, divê saziyên xwe yên exlaqî û polîtîk saz bike. Eger nikaribe van saziyên xwe bixebitîne û kêrhatî bike wê wextê ev tê wê maneyê ku ketiye nav lep û pencê zordestî û

mêtinkariyê. Ev ‘rewşa şer’ e. Mirov dikare dîrokê weke ‘rewşa şer’ a şaristaniyan li dijî civakê pênase bike. Wexta ku exlaq û polîtîka kêrhatî nebin, bi tenê tiştek maye civak bike; ew jî xweparastin e. Maneya rewşa şer nebûna rewşa aştiyê ye. Ji lewra aştî bi tenê dikare bi xweparastinê manedar bibe. Aştiya xweparastina wê nebe, dikare bi tenê koletî û teslîmiyetê îfade bike. Lîberalîzm di roja me ya îro de aştiyeke bêyî xweparastin li ser gelan û civakan ferz dike, tew jixwe lîstika jê re îstîqrara demokratîk û lihevhatin tê gotin, ji rewşa sergirtina serweriya çîna bûrjûwa ya bi hêzên çekdarî yên yekalî yên ji serî heta binî xwe gurçûpêç kirine ango bi awayekî sergirtî ji meşandina şer pêve ti maneya xwe nîne. Bi vî awayî pênasekirina aştiyê, weke hewldana herî mezin a hegemoniya sermayeyê ya îdeolojîk derdikeve pêşiya me. Di dîrokê de jî bi şêweyên cuda bi ‘têgînên pîrozkirî’ xwe îfade dike. Dîn bi van têgînan barkirî ne. Nexasim dînên bûne şaristanî bi vî awayî ne.

Pêkanîna aştiyê bi tenê bi xweparastina civakan dibe. Ango karektera civakan a exlaqî û polîtîk were parastin û misogerkirin, aştî dikare bibe xwediyê maneya xwe ya rastî. Nexasim pênaseya aştiyê ya hewce dike û Michel Foucault jî ji bo pênasekirina wê gelekî pê re mijûl bû, bi tenê bi vî awayî dikare were qebûlkirin û îfadeyeke xwe ya civakî hebe. Naxwe ji bilî vê manebarkirina li aştiyê ji bo tevahiya koman û gelan ji feqê, ji dewamkirina rewşa şer a sergirtî wêdetir wê ti maneyê îfade neke. Peyva aştiyê di şert û mercên moderníteya kapîtalîst de peyvek welê ye, bi xefik û dafikan barkirî ye. Rast neyê pênasekirin û were bikaranîn, divê mirov xwe jê dûr bigire, fikaran jê bike. Eger em careke din pênase bikin, aştî nayê wê maneyê rewşa şer bi tevahî ji holê rabûye, ne jî rewşa ‘aram’ û tinebûna şer a di bin serdestiya aliyekî de ye. Di aştiyê de alî hene. Serdestiyeke ji sedî sed a aliyekî nîne û divê nebe. Sêyemîn, sîleh li ser bingehê razîbûna karmeşandina saziyên polîtîk û exlaqî yên civakê bi xwe têne bêdengkirin. Ev hersê şert bi awayekî prensîbî bingehê aştiyê ne. Heke aştiyeke rastî xwe nesipêre van prensîban ti maneyê îfade nake.

Eger em hinekî din van sê şertan rave bikin, em ê weha bibêjin, yekemîn; divê alî bi temamî ji çekan bêne kirin. Îddîayên wan çi dibin bila

bibin, soz didin ku wê bi tenê bi sîlehan êrişê nebin ser hevdu. Bi pey serdestiya çekdarî nakevin. Ji maf û derfetên pêkanîna ewlekariya hev re bi rêz û hurmet in. Duyemîn, di dawiyê de serdestiya aliyekî mewzûbehs nîne. Belkî di bin serdestiya sîlehan de îstîqrar û aramiyek hebe, lê ev rewş nabe ku weke aştiyê bê binavkirin. Kîjan alî (heq-neheq) dibe bila bibe, heke herdu alî bêyî ku serdest bibin (bi sîleh) rawestandina şer qebûl bikin, hingê aştî dikare bikeve rojevê. Sêyemîn, alî di çareserkirina pirsgirêkê de qebûl dikin ku wê ji xebatên civakan (statuya wan çi dibe bila bibe herdu alî, civak an jî desthilatdarî) ên saziyên exlaqî (wijdanî) û polîtîk re rêzê bigirin. Şertê jê re 'çareseriya polîtîk' tê gotin di vê çarçoveyê de tê pênasekirin. Agirbesteke çareseriya exlaqî û polîtîk negire nava xwe nabe ku weke aştiyê were şîrovekirin.

Di bin van şertên prensîbî yên aştiyê de girîngiya siyaseta demokratîk bivênevê dikeve rojevê. Kengî saziyên exlaqî û polîtîk ên civakê bixebitin, bi awayekî xwezayî ya derdikeve holê pêvajoya siyaseta demokratîk e. Yên li hêviya aştiyê ne, divê baş zanibin ku li ser bingehê exlaqî polîtîk bi rola xwe rabin aştî wê karibe pêk bê. Di pêvajoya aştiyê de herî kêm divê aliyek di nava rewşa siyaseta demokratîk de be. Naxwe ya bê kirin, wê ji 'lîstika aştiyê' ya li ser navê yekdestdaran wêdetir neçe. Di vê rewşê de siyaseta demokratîk bi roleke heyatî radibe. Li hemberî hêzên desthilatdariyê yan jî dewletê bi tenê bi hêzên siyaseta demokratîk li ser bingehê diyalogê, pêvajoyeke aştiyê ya manedar dikare bimeşe. Eger pêvajoyeke aştiyê ya bi vî rengî ne mewzûbehs be, hingê aliyên şer (yekdestdar) ji bo demekê sîlehan bêdeng bikin jî rewşa şer wê bidome. Ji ber şer westîn, zehmetiyên lojîstîk û ekonomîk hene. Eger ev zehmetî ji holê bêne rakirin, şer ê dewam bike heta serdestiya aliyekî pêk bê. Ji van şêweyan re nabe ku mirov pêvajoya aştiyê bibêje, mirov dikare ji van re agirbestên ji bo şerên hê dijwartir bibêje. Ji bo agirbestek aştiyane be, divê rê li aştiyê veke û bi sê şertên me jimartî ve bê girêdan, ev ji aliyê prensîbî ve gelekî girîng e.

Di şer de carnan hin rewş çêdibin ku têde aliyê xwe diparêze jî (yên di rewşa mafdar de) dikare di dawiyê de serdestiyê bi dest bixe. Di rewşeke welê de jî sê şert naguher in. Çawa ku di gelek şerên rizgariya neteweyî

yên mafdar û sosyalîzma pêkhatî de hat dîtin, bi carekê berê xwe didin desthilatdarî û dewleta xwe û di bin vê desthlatdarî û dewletê de pêkanîna aramiyê nabe aştî. Vê carê jî li şûna hêzeke xerîb (yekdestdar) hêzeke xwecihî (kapîtalîzma dewletê yan jî beşekî bûrjûwaziya millî) cih digire. Jê re desthilatdariya sosyalîst jî were gotin rastiya sosyolojîk naguhere. Aştî weke prensîb diyardeyeke welê nîne ku bi serdestiya desthilatdarî û dewletan pêk bê. Desthilatdarî û dewlet bi çi navî dibin bila bibin, wexta serdestiya xwe bi hêzên demokratîk re parve nekin aştî nakeve rojevê. Di tehlîla dawî de aştî bi şert lihevkirina demokrasî û dewletê ye. Çîrokên van lihevkirinan tevahiya dîrokê zeman û mekanekî mezin zevt dikin. Di gelek dem û mekanan de hatine ceribandin. Yên prensîbî û demdirêj jî hene. Yên hê hubra wan zuha nebûne jî hene. Civak bi tenê ji damezrandina hêzên desthilatdarî û dewletê pêk nayên. Qada wan çiqasî were tengkirin bila bê kirin, heta topyekûn neyên tinekirin, baş dizanin di bin nasnameya xwe ya exlaqî û polîtîk de jiyana xwe dewam bikin. Belkî jî di dîrokê de ya nehatiye nivîsîn, lê rewşa rastî ya jiyanê ev rastî ye.

Divê mirov civakê ji çîrokên dewlet û desthilatdariyê pêkhatî nebîne, berevajî divê mirov civakê weke xwezaya diyarker ferz bike, ev awa dibe ku di pêkhatina zanisteke rastî ya civakî de alîkariyê bike. Desthilatdarî, dewlet û yekdestdariyên sermayeyê (mîna Firewn û Qarûnan) çiqasî mezin û dewlemend dibin bila bibin an jî weke di roja me ya îro de bi qasî ku karibin civakê daqurtînin cinawir (Levîathanê nû) dibin bila cinawir bibin, ti carî nikarin civakê ji holê rakin. Ji ber ku di tehlîla dawî de yên wan diyar dike civak e. Yên têne diyarkirin ti carî nikarin şûna yên diyar dikin bigirin. Hêza desthilatdariyê ya herî bi heybet hêza medyatîk a propagandayê (mîna roja me ya îro) jî nikare ser vê rastiyê bigire û veşêre. Ew hêzên welê ne ku ketine kirasê dêwan, lê gelekî reben û sefîl in. Li beramberî vê, civaka mirov ji roja pêkhatiye û virve weke afirîneriya herî harîqa û bêqusûr a xwezayê wê ji manegirtinê mehrûm nemîne.

Sîstema Şaristaniya Demokratîk hem bi rewşa xwe ya di dîrokê de hem jî bi rewşa xwe ya heyî, di binê vê paradîgmaya sereke ya civakê de weke

sîstema jinûveavakirin, zanistîkirin û şîrovekirinê, ji vir û pêve mijara beşê bê pêk tîne.

## 8- FIKIRÎNA LI SÎSTEMA ŞARISTANIYA DEMOKRATÎK

Ji dema ku min xwe nas kirî ve, gumanê pêxîra min berneda û weke pêjneke xeternak timî ez şopandim. Ev rewşa gumankirinê carnan dibû mîna nexweşiyekê. Wexta ku hin baweriyên min ên dogmatîk dihejiyan, min xwe di kêliya herî qels de his dikir. Di jiyanê de ez diketim rewşekê ku min xwe têde herî kêm bê îdea didît. Guman û şik birina min a ji mijarên ku bi ti awayî parastina wan mirov nikarîbû bikirana, bi kêra kesayeta min hat. Belkî jî dersa herî baş da min ew bû ku 'heqîqet' bi hêsanî nayê dîtin. Kir ku ez heta bi xerîzeyên xwe her tiştê xwe bixim ber lêpirsînê û ez yeqîn dikim ku vê yekê hêz da min, ji bo ez karibim ji şêwazê fikra dogmatîk a di rêûresma civaka Rojhilata Navîn de hê jî xurt e, qut bibim. Di tehlîla dawî de şêwazê fikra hegemonîk a navenda wê Ewrûpa çi di dogmakariya modernîst pozîtîvîst de, çi jî di fikirkariya postmodernîst de hê jî bi bandor e, û ev jî girîngiya mijarê nîşan dide. Min hewl da qabîliyeta fikrê ya Rojhilat a bingehê wê bawerî û hêza fikrê ya Rojava ya bingehê wê lêpirsîner bidim berhev û cihê xwe li gorî wê diyar bikim. Eşkere ye ku min li herdu aliyan jî ji xwe re cih nedît. Wexta ku fikra min welê bû, bi awayekî xwezayî jiyana min jî roj bi roj ji van qut bû û vê yekê her bi kûrahî dewam kir.

Fikrên weke bingeh bawerî û fikrên lêpirsîner hebûn, ti carî ez têr û tatmîn nekirim. Rexneya min a bingehîn li sîstemên mezin ê fikrê bûn û min berpirsiyariya wan ê di mezinbûna pirsgirêka civakî de dixist ber lêpirsînê. Vê yekê jî kir ku ez biwêrim li sîstematîka baweriyê ya Rojhilat û sîstematîka rasyonel a Rojava rexne bigirim.

Xisleteke min a din, serwextbûna min a hişyarbûyî ti carî ji pratîka min a civakî qut nebû. Di vê mijarê de kesayeta min di xwe de karektereke awarte ya parveker pirr zû nîşan da. Ez hê wexta bi peyatî diçûm dibistana seretayî (ev gundê cîran Cibîn bû), bi çend duayên min ji ber kiribûn min xwe li serê koma xwendekarên piçûk li îmamtiyê datanî. Herçiqasî weke

lîstikekê nêzîk bibûma jî min gelekî ciddî dikir. Ez yeqîn dikim ku di bingehê vê de duayên min bi zor û zehmetî ji ber kiribûn hebûn ango min dest bi fikirînê kiribû û bi parvekirina wê min dixwest rêzgirtina wê ji bo wê ispat bikim. Tişta tu hînbûyî zor û girîng e; lewma ji sedî sed divê tu parve bikî! Diyar bû ku min pîvaneke ciddî ya exlaqî nas kiribû. Di cildên berê yên parêznameya xwe de min bi kurteçîrokê behs kiribû ku tîrêjên pêşî yên moderníteyê çawa li rûyê min dabûn û min çi his kiribû. Ji lewra ez ê li vir wê çîrokê dubare nekim. Kengî di maratona fikrê de ez li hêza texrîbkar a vê beza dîn û har a moderníteya kapîtalîst hayil bûm, ez rawestiyam. Êdî parçekirina xwedayên çarsed salên dawî (sîstema dinya kapîtalîst) para min ketibû. Çi seyr e, di derketina Hz. Brahîmê Ûrfayî de hêzeke hisê ya mîna bexteweriya wî ya 'pût şikandinê' xwe li min jî bada. Min hem guman û şik birina xwe bi hêsanî dikarîbû kontrol bikirana, hem jî min bi 'heqîqetên' li pey wan dibeziyam re randevû û civanên tatmînkar dikarîbû pêk bianiya.

Ben-î adem bi tevahî ji taqet ketiye. Di dîrokê de randevû û civana wî bi heqîqetê re belkî jî daketiye asta herî xerîzeyên hundir û ev yek cihê xemê ye. Îro hevjînek, zarokek û mûçeyekî ku ferdê êsîr negire, hema hema nîne. Ez nabêjim ez vê diyardeyê înkar dikim. Ew weke fikra herî rasyonel a li şûna felsefeyê hat danîn tê perestin û ez dixwazim rebeniya di vî warî de diyar bikim. Dinya ku xwedatiya dewleta netewe ji evdên xwe yên bextewer re bexşandiye, evqas e. Ma mirov dikare înkar bike ku em li dinyayeke gelekî zêde hatiye tengkirin najîn? Ez bi xwe jiyana li bin sembola xwedayekî serdemên herî kevin qat bi qat ji jiyana di bin xwedatiya dewleta netewe ya îro de manedartir û pîroztir dibînim. Bêguman ez dizanim ku ez behsa xwedatiya pûç a yekdestdariya sermayeyê dikim. Lê dîsa jî yên jê derbên herî bi qehr û bi kerb xwarine jî nikarin ji bandora vê xwedatiyê derkevin û êdî ez pê diêşim ku bîr nabin derkevin. Haya min jê heye ku ev rewşeke rojane ya mirovatiyê ye. Ya vê herî baş nîşan dide jî bûyera qirkirinê ya Cihûyan e ku ev jî şaxên trajîk ên rewşê deşîfre dike. Çi heyf e, hem di pêkhatina vê rewşê de hem jî di qurbandana wê de çîroka qebîleya Ibranî para xwe gelekî girîng e. Mîna

gotina pêşiyan a dibêje “Te bi xwe kir, te bi xwe dît”. (Tu çi biçînî, tu yê wî biçinî) Ez ji karekterê hêza hegemonîk a fikra Cihû gumanê nakim. Ez di kesayeta xwe de jî vê hêza fikrê ji berkirina duayê heta bi pût şikandinê girîngiya bandorên wê ji nedîtî ve nayêm û ti carî piçûk nabînim. Lê trajediya qirkirinê ya bi serê wan de hat li ser Cihûyan ferz dike û wan deyndar dike ku Adornowarî xwe bixin ber lêpirsîneke bi kok û bingehîn. Ez bi xwe jî bi qasî ku jê bi tesîr bûme, bi niyeta dayîna piçekî vî deynî, min hewl da li Sîstema Şaristaniya Demokratîk bifikirim.

Di vê nuqteyê de em Brahîmî ne. Lê di serî de jî wexta em hinekî dibin Zerdeştî, cuda şîrovekirin bi hêz dibe. Têgihiştina serdest a dîrokê bi şêweyên çîrokkirina şaristaniyê têra xwe hatiye şikandin. Tê qebûlkirin ku meşa dewlet û desthilatdariyê dikare weke dîroka fermî were vegotin, lê dîroka civakî wê bi awayekî nikaribe hebe. Şêwazê wê yê dewlet û desthilatdarbûnê bi tenê dikare bibe seriyekî sembolîk ê vemirî yê heqîqeta dîrokê yê bi sûda yekdestdariyên sermayeyê. Ya dîrokê bêzarker dike dîsa ev vegotina li seriyekî din ê bersivê nade rêûresma civakî ye. Ev avahiya dîrokê ya bi xwe antî-civakgir e, wê nikaribe weke rêûresm civakê îfade bike, berevajî vê eşkere ye ku wê ji gelek aliyan ve serûbinî hev bike û ser rastiyan bigire. Çîrokên xanedaniyê jî şêweyekî van vegotinan e. Vegotinên dîrokê yên dînî ku ji aliyê temsîla civakê ve gelekî seresere ne, nexasim di ketina pêvajoya şaristanîbûnê de ji dîroka dewlet û desthilatdariyê wêdetir ti maneyê îfade nakin.

Şîroveyên dîrokê yên çînî û ekonomîk, bi xisletên xwe yên rastiya civakî ji tevahiyê qut dibînin û bi awayekî reduksiyonîst nêzîk dibin, ji aliyekî din ve be jî dîrokên dewletan bi bîra mirov dixin. Beşek ji şêweyê nirxandinê yê pozîtîvîst, bi qasî dîroka dînan jî ji hêza manedanê mehrûm e. Ev vegotinên dîrokê hemû, herçiqasî dijberê hev xuya bikin jî di koka xwe ya şaristaniyê de digihîjin hev.

Ez yeqîn nakim ku dîroka xwezaya civakî hem paradîgmatîk hem jî ampîrîk gihiştiye maneya xwe. Nivîsên li ser dîrokê yên ji wan re dîroka civakî tê gotin, ji beşên zêde parçebûyî yên sosyolojiya pozîtîvîst wêdetir ti

maneyê îfade nakin. Ji teswîrkirina parçeyekî yekpareya bedenê wêdetir naçin.

Mirov dûrûdirêj dikare van tespîtan bîne ziman. Lê bawer nakim ku alîkariya mijara me bikin.

Herçiqasî gelekî dubare dibe jî weke vegotina şaristaniya demokratîk ez li ser dîrokê gelekî diponijim. Ji ber ku ez hê jî ji bo fêhmkirinê gelekî zehmetiyê dikişînim bê ka çima pirsgirêkên civakî bê çareserî dimînin. Çaresernebûn bi tenê di jiyana pratîkî de nîne, vegotin jî têra xwe bi çaresernebûnê barkirî ye. Dema ku herdu rewş digihîjin hev, tu berê xwe bidî ku vegotinên fermî yên şaristaniyê hene. Li ser navê dîroka civakî pêvedanîna hin parçeyan jî ji tevlîhevkirina rewşê wêdetir naçin.

Ez timî diyar dikim, tevî ku sosyalîzma zanistî vê rewşê bi karektera çînî ya dîrokê îzah dike û bi vî rengî hin rastiyan rohnî dike jî nikarîbû pirsgirêkê çareser bike, heta bêdestê xwe, neçar, bû parçeyekî pirsgirêkê.

Ji ber van sedeman ez gelek caran tînim ziman ku heta paradîgma modernîst a kapîtalîst li dawiyê neyê hiştin, bihêlin fêhmkirina heqîqeta dîrokî, wê ji dîroka dînan zêdetir ser heqîqetê bigire û bêmane bike. Encamên dîrokî yên vê nêrtina paradîgmatîk a Marks di roja me ya îro de baştir têne fêhmkirin. Dîroka şaş, tê maneya pratîka şaş. Bi giştî şaristanî û bi taybetî jî nêzîkatiyên paradîgmatîk û ampîrîk yên moderníteya kapîtalîst heta li dawiyê neyên hiştin, xwe gihandina nêzîkatiya paradîgmatîk û ampîrîk a xwezaya civakî pêk nayê. Ya ez li vir dikim, herçiqasî bêyî amadekarî be jî xwe li ser şaristaniya demokratîk li caribandinekê radikişînim.

## A- PÊNASEYA ŞARISTANIYA DEMOKRATÎK

Mirov dikare sîstema şaristaniya demokratîk weke dibistana zanista civakî ya rewşa hebûna xwezaya civakî û pêşketina wê li ser bingehê civaka exlaqî û polîtîk lêdikole, pênase bike. Ekolên zanista civakî yên cûrbicûr komikên wan ên lêkolînê yên cuda hene. Teolojî civaka dîn dike bingeh. Sosyalîzma zanistî bingehê xwe çînî ye. Yekeya bingehîn a

lîberalîzmê ferd e. Çawa ku yên dewlet û desthilatdariyê dikin bingeh hene, yên şaristaniyê dikin bingeh jî kêm nînin. Ev nêzîkatiyên li ser bingehê yekeyê tev, weke min gelek caran destnîşan kir, ji ber ku xwedî nêzîkatiyeke dîrokî û yekpare nînin hatine rexnekirin. Ji bo civakê lêkolîneke manedar divê li ser nuqteyên man û nemanê ango nuqteyên heyatî hûrûkûr raweste. Divê nexasim di van nuqteyan de dîrok û rojane bibin xwediyê hêza vegotinê. Naxwe lêkolîn ê ji çîrokbûnê wêdetir neçin.

Me yekeya xwe ya bingehîn weke civaka exlaqî û polîtîk destnîşan kir, ev ji ber ku şaxên dîroktiyê û yekparetiyê digirin nava xwe, girîng in. Civaka exlaqî û polîtîk vegotina herî yekpare û dîrokî ya civakê ye. Mirov dikare exlaq û polîtîkayê bi xwe weke dîrokê jî bixwîne. Civaka şaxên wê yên exlaqî û polîtîk hene, civaka herî zêde nêzî tevahiya hebûn û yekparebûnan e. Dewlet, çîn, mêtinkarî, bajar, desthilatdarî û netewe nebin jî civak dikare hebe. Lê mirov nikare bê exlaq û polîtîkayê li civakê bifikire. Belkî ji bo hêzên din, nexasim jî ji bo yekdestdariyên sermaye û dewletan weke mêtingeh û çavkaniya maddeya xam hebin, lê di van rewşan de jî bermahiyên civaka ji civakbûnê derketiye weke mîrate maye.

Weke rewşa civaka xwezayî civaka exlaqî û polîtîk bi etîket û rengên weke koledar, feodal, kapîtalîst û sosyalîst bi navkirin maneya xwe nînin. Ya rastî, bi vî awayî binavkirin û pênasekirina civakê bi rola veşartina rastiya civakê radibin û civakê dadixin asta hêmanên wê (çîn, ekonomî, yekdestdarî). Wexta ku li ser bingehê van têgînan teorî û pratîka pêşketina civakî tê analîzkirin em di vegotinan de tengavbûn û asêbûnekê dibînin û ev jî çavkaniya xwe ji kêmasî û şaşiyên di cewherê wan de digire. Piştî ku tevahiya analîzên civakê yên navê wan bi van sifetên nêzî materyalîzma dîrokî tê hildan, ketine vê rewşê, eşkere ye ku vegotinên nirxên wan ên zanistî qels wê bêzar û bêçare bibin. Şaxê dînî tevî ku gelekî behsa girîngiya exlaq kiriye jî şaxê polîtîk ji zû ve bi ser dewletê ve berdaye. Nêzîkatiyên lîberal ên bûrjûwayê jî bi tenê ser şaxên civakê yên exlaqî û polîtîk nagirin; di heman demê de her cara keys û firsendê bibînin xwe ji şerê bi vê civakê re paşve nadin. Ferdparêzî herî kêm bi qasî desthilatdarî û dewletê rewşa şer a li dijî civakê ye. Lîberalîzm bi awayekî bingehîn tê

wê maneyê ku civak tê bêhêzkirin (civaka bêexlaq û bêpolîtîk) û ji her cure êrişên ferdperesteyî re tê amadekirin. Lîberalîzm îdeolojî û pratîka herî zêde li dijî civakparêziyê ye.

Di Sosyolojiya Rojava de (zanisteke bi navê Sosyolojiya Rojhilat hê li naverastê nîne) têgînên sîstema şaristanî û civakê gelekî bi pirsgirêk in. Divê neyê jibîrkirin ku sosyolojî ji ber pirsgirêkên şer, pevçûn, pêxîrtengî û nakokiyên mezin ên yekdestdariyên sermaye û desthilatdarî bûn sedema wan weke pêdiviyeke bi çareseriyê derket holê. Ji bo nîzam hilneweşe, were rizgarkirin û mirov karibin têde bijîn, ji her milî ve tez li ser tezê dihat çêkirin. Tevî hemû şîroveyên teolojîk, reformîst û mezhebî yên doktrîna Xiristiyantiyê, pirsgirêkên civakî her çûn girantir bûn û vê jî hişt ku şîroveyên bi awirekî zanistî (pozîtîvîst) li pirsgirêkên civakê derkevin pêş. Şoreşa Felsefeyê û dema Rohnîbûnê (sedsalên 17. û 18.) bi awayekî bingehîn encama vê pêdiviyê ne. Bi Şoreşa Franseyê re li şûna çareserbûna pirsgirêkan, pirsgirêk hê bêtir tevlîhev bûn û vê yekê jî kir ku meylên sosyolojiyê weke şaxekî zanistî yê serbixwe bibîne û pêşde bibe zêde bibin. Sosyalîstên utopîk Saint Simon, Fourier, Proudhon, Auguste Comte û Durkheim li ser vê rê qonaxa pêş temsîl dikin. Hemû jî zarokên Rohnîbûnê ne. Bêserûbinî baweriya wan bi zanistê hebû. Ji lewra jî bawer dikirin ku ew ê karibin bi rêya zanistê çawa dixwazin civakê weha ji nû ve biafirînin. Bi rola xwedê radibûn. Bi gotina Hegel, jixwe Xwedê daketibû ser rûyê erdê. Hem jî weke dewleta netewe. Ya diviyabû bihata kirin, proje û plansaziya 'muhendisiya civakê' ya bi nazikî û nazenînî bû. Bi rêya dewleta netewe ti plan û proje tinebû ku di pratîkê de bi cih neyê anîn. Hema bi tenê bila 'pozîtîvîst zanistî' be û dewleta netewe qebûl bike!

Civaknasên Ingilîz (polîtîkvanên ekonomiyê) bi çareseriyên ekonomîk alîkariya sosyolojiya Fransî kirin, îdeologên Elman jî bi rêya felsefeyê alîkarî kirin. Adam Smith û Hegel ji wan kesan in ku di serê alîkaran de tên. Ji ber ku kapîtalîzma pîşesaziyê ya sedsala 19. di asteke xeternak de civak îstîsmar kir û rê li ber gelek pirsgirêkan vekir, hem ji çepê û hem jî ji rastê rêçeteyên hatin pêşkêşkirin cûrbicûr bûn. Îdeolojiya navendî ya yekdestdariya kapîtalîst Lîberalîzm, bi hostatiyeke mezin ji her fikrê

dikarîbû sûdê werbigire û bi ser hev bike û mîna tûrikê pînekirî di afirandina sîsteman de ya herî dest sivik bû. Sosyolojiyên şematîk ên rastgir û çepgir jî wexta projeyên xwe yên der barê rabihurî (lêgerîna rastgiran a li serdema zêrîn) yan jî paşerojê (civaka utopîk) de amade dikirin, mîna ku haya wan ji xwezaya civakî, dîrok û rojaneyê tinebû. Dema ku bi dîrok û rojaneyê re jî rûbirû dibûn misêwa parçe dibûn. Rastiya hemû jî bûbûn êsîrê wê, ew 'qefesa hesinî' bû ku modernîteya kapîtalîst hûrûkûr deribandibû û ew giş ji aliyê zêhnî û şêwazê jiyana pratîkî ve xistibûn hundirê wê. Fîlozof Nietzsche dema ku ew hemû weke 'metafizîkvanên pozîtîvîzmê' 'bejinbohstên xesandî yên modernîzma kapîtalîst' destnîşan dikir hê zêdetir nêzî heqîqeta civakî bû. Yek ji wan kêm fîlozofên e ku cara pêşî bal kişandiye ser tehlûkeya daqurtandina civakê ji aliyê modernîzma kapîtalîst ve. Tevî ku tê gunehbarkirin ku bi fikra xwe ji faşîzmê re xizmet kiriye jî bi şîroveyên xwe yên ku xebera mirovan bi hatina faşîzmê û şerên dinyayê dixist, balkêş e.

Şerên dinyayê û pêxîrtengiyên mezin ên roj bi roj zêde dibûn têrê kirin ku navenda lîberaliyê bi milên wê yên rast û çepê sosyolojiya pozîtîvîst têk bibin. Muhendisiya civakê bi xwe, weke metafizîka herî seresere bi faşîzma otorîter û totalîter a gelekî rexne lê digirtin, nasnameya xwe ya rastî eşkere kir. Dibistana Frankfûrtê mîna belgeya fermî ya vê têkçûnê ye. Annales Ecole û serhildana ciwanên 1968'an, di serî de têgihiştina sîstema dinyayê ya kapîtalîst a I.Wallerstein, rê li ber gelek nêzîkatiyên sosyolojîk ên postmodernîst vekir. Ekolojî, femînîzm, îzafiyetgirî, çepgiriya nû û sîstema dinyayê, dema gelek zanistên civakî yên parçebûyî bi xwe re anî. Bêguman di vê de piştî salên 1970'î karektergirtina hegemonîk a kapîtala fînansê bi roleke girîng rabû. Aliyê wê yê erênî ew e, hegemoniya fikrê ya navenda wê Ewrûpa hilweşiya. Aliyê wê yê neyênî jî zanisteke civakî ya gelekî parçebûyî dibû sedema fikaran.

Eger em rexneyên li sosyolojiya navend Ewrûpayê xulase û serpilkî bînin ziman em ê wiha bibêjin:

**a-** Hukim û rexneyên wan ên li dîn û metafizîkê bi xwe jî bi awayekî ji dîn û metafizîkekê wêdetir neçûne. Divê mirov ji vê loma neke. Çanda

mirov bi xwe jî divê metafizîk be. Ya girîng ew e, mirov karibe metafizîka qenc û xirab ji hev cihê bike, ji hev derxîne.

**b-** Eger civak bi dualîteyên weke paşketî-modern, kapîtalîst-sosyalîst, pîşesaz-cotkar, pêşverû-paşverû, bi çîn-bê çîn, bi dewlet-bê dewlet bêne pêşkêşkirin, ev zêdetir pênaseya nêzî heqîqetê ya civaka xwezayî vedişêre û xwedî meyla sergirtina wê ye. Dualîteyên bi vî rengî mirov ji heqîqeta civakî dûr dixin.

**c-** Ji nû ve afirandina civakê ji xwedatiya modern wêdetir ti maneyê îfade nake. Ya rastî, di bin her pêngava jinûveafirandinê de meyleke nû ya afirandinê ya yekdestdariya sermaye û desthilatdariyê heye. Çawa ku xwedatiya serdema navîn bi monarşiyên mutleq re (padîşahî, şehînşahî, siltanî) di nava têkiliyeke îdeolojîk de ye, muhendisiya civaka modern jî weke jinûveafirandinê bi awayekî bingehîn meyla xwedayî ya dewleta netewe ye, îdeolojiya wê ye. Di vê çarçoveyê de pozîtîvîzm xwedatiya modern e.

**d-** Mirov nikare şoreşan weke çalakiya jinûveafirandina civakan şîrove bike. Wisa nebe wê nikaribin xwe ji xwedatiya pozîtîvîst rizgar bikin. Çiqasî karibin civakê ji barê zêde yê sermaye û desthilatdariyê bikin, ewqasî dikarin weke şoreşa civakî bêne nasîn.

**e-** Nabe ku wezîfeya şoreşgeran be, çi projeyeke çêkiribin weke modeleke civakê biafirînin. Çiqasî alîkariya pêşketina civaka exlaqî û polîtîk bikin, ewqasî pênaseya wezîfeyeke rast heq dikin.

**f-** Nabe ku paradîgma û rêbazên ji bo Xwezaya Civakî bêne pêkanîn, bi yên der barê Xwezaya Yekemîn de bêne wekhevkirin. Nêzîkatiya gerdûnparêz der barê Xwezaya Yekemîn de zêdetir rê li ber encamên nêzî heqîqetê (Lê ez li tiştekî weke heqîqeteke mutleq nafikirim) vedike, lê îzafiyetgiriya der barê Xwezaya Civakî de zêdetir nêzî rastiyê ye. Mirov gerdûnê ne dikare bi vegotina gerdûnparêz a li ser xeteke rast, ne jî xelekên çemberwarî yên bêserûbinî yên bi heman awayî rave bike.

**g-** Rejîma heqîqeta civakî bi zêdetir rexneyan divê ji nû ve were birêkûpêkkirin. Bêguman ez behsa ji nû ve afirandina xwedayetiyekê nakim. Lê ez bawer dikim ku xisleta herî jêhatî ya aqlê mirov di wê hêzê de ye ku li heqîqetê bigere û ava bike.

Li ber rohniya van rexneyan min xwest sîstematîka zanista civakî pênase bikim û bidim naskirin. Niha jî ez dixwazim pêşniyarên xwe der barê vê sîstematîka zanistên civakî de pêşkêş bikim:

**a-** Li şûna ku mirov Xwezaya Civakî bi maneyên mîtolojîk, dînî, metafizîk û zanistî (pozîtîvîzm) hûnandî weke heqîqeta hişk a gerdûnparêziyê pêşkêş bike, bi şertê zeman û mekan ve girêdayî weke şêweyekî herî nerm ê hebûna gerdûnî li ser bingehên cudahiyên dewlemend manedar bike, wê pêşkêşkirineke zêdetir nêzî heqîqetê be. Her şîroveya bêyî ku xisletên Xwezaya Civakî baş bêne naskirin were kirin, her pêngava zanista civakî û guhertina pratîk dikare rê li ber reaksiyonên berevajî veke. Ji nêzîkatiyên xwedayî heta bi nêzîkatiyên pozîtîvîst, tevahiya dîrokê vegotinên hatine pêşdebirin, eger nikarîbûne li yekdestdariyên sermaye û desthilatdariyê pêşiyê bigirin da ku dernekevin asta herî jor, wê wextê divê hûrûkûr xwe rexne bikin û şîroveyeke zêdetir mirovane li ser xwe bikin, ev ji bo xizmeta ji civaka exlaqî û polîtîk re wezîfeyeke bivênevê ye.

**b-** Hêmana bingehîn a Xwezaya Civakî civaka exlaqî û polîtîk e ku maneya wê hem a dîrokî û hem jî ya yekpare dide, û weke xisleta bingehîn a hebûna wê di nava cudatiyê de yekîtiya wê temsîl dike. Ya karektera Xwezaya Civakî didiyê pênaseya civaka exlaqî û polîtîk e ku di nava cudatiyê de yekîtiya xwe dewam dike, dîroktî û yekparetiya wê ya sereke bi rola diyarker radibe. Der barê civakê de sifetên weke kovî, modern, feodal, koledar, kapîtalîst, sosyalîst, pîşesazî, cotkarî, bazirganî, peredar, dewletdar, neteweyî, hegemon û hwd. yên gelekî têne bikaranîn yek ji wan jî sifetê diyarker ê Xwezaya Civakî îfade nake. Berevajî ser digire, di encamê de maneyeke parçebûyî dide û ev jî der barê civakê de cewherê bicihanîn û nêzîkatiyên teorîk û pratîk ên şaş pêk tînin.

**c-** Gotinên mîna nûkirina civakê, ji nû ve afirandina wê, tevî naveroka wan a îdeolojîk operasyonên pêkanîna yekdestdariyên nû yên sermaye û desthilatdariyê ne. Dîroka şaristaniyê weke dîroka van nûkirinan, dîroka daneheva kumulatîf a sermaye û yekdestdariyê ye. Li şûna afirîneriya xwedayî ya der barê civakê de çalakiya bingehîn a pêdivî pê heye ew e, divê têkoşîn li dijî hêmanên pêşketina çaviyên exlaqî û polîtîk ên civakê asteng dikin û dihêlin ku fonksiyonên xwe bi cih neyînin, weke wezîfe bi cih bê anîn. Civaka şaxên xwe yên exlaqî û polîtîk bi awayekî azad berde, bixebitîne ew civak e ku pêşketina xwe herî baş dewam dike.

**d-** Kengî civak bi awayekî azad nikaribin fonksiyona xwe ya exlaqî û polîtîk dewam bikin û bi awayekî hişk bicihanîna wan were astengkirin, weke şêweyekî çalakiya civakî berê xwe didin şoreşê. Şoreş ji bo afirandina civak, netewe û dewletên nû nayên kirin, kengî ji bo civak bi awayekî azad fonksiyona xwe ya exlaqî û polîtîk bi cih bînin, werin kirin wê wextê dibe ku ji aliyê civakan ve rewa werin qebûlkirin û divê bêne qebûlkirin.

**e-** Qehremantiya şoreşgerî divê bi alîkariya dide polîtîka û exlaqê civakê, manedar bibe. Her çi çalakî dibe bila bibe, wexta vê maneyê hilnegire, naverok û dema wê çi dibe bila bibe weke qehremantiya şoreşgerî ya civakê nabe ku were pênasekirin. Ya di civakê de rola ferdan bi maneyeke erênî diyar dike, alîkariya didin pêşketina civaka exlaqî û polîtîk e.

**f-** Zanista civakî ya hewce ye were pêşdebirin, divê van xisletên sereke hûrûkûr bike mijara lêkolîn û lêgerînê, û divê ne pêşketina li ser xeteke rast a gerdûnparêz ne jî îzafiyeta taybet a xelekwarî ya bêserûbinî esas bigire. Ev nêzîkatiyên qalibî yên dogmatîk in ku xizmetê dikin ji rewakirina danehevên kumulatîf ên sermaye û desthilatdariyê re. Di tehlîla dawî de divê li şûna van nêzîkatiyan zanisteke civakî were pêşdebirin ku îfadeya ahenga mejiyê analîtîk û hisî ye, ji qalibên hişk ên subjektîf û objektîf bihuriye, rêbazeke diyalektîkê ya tineker nîne bike esas.

Bi awayekî paradîgmatîk û ampîrîk (teorîk û pratîk) çarçoveya Sîstema Şaristaniya Demokratîk bi şêweyekî hîpotezî em dikarin bi vî rengî pêşkêş bikin. Lê eger em xisletên sereke yên yekeya Sîstema Şaristaniya Demokratîk careke din bi sernavên bingehîn pêşkêş bikin em ê wisa rêz bikin:

**1-** Civaka exlaqî û polîtîk, ji destpêka civaka mirov heta bi dawiya wê xisleteke bingehîn e, divê mirov lê bigere. Civak weke bingeh exlaqî û polîtîk e.

**2-** Civaka exlaqî û polîtîk, li qutba dijber a sîstemên şaristaniyên li ser sêberiya bajar-çîn-dewletê (avahiya berê ya hiyerarşîk) mezin dibin, cihê xwe digire.

**3-** Civaka exlaqî û polîtîk, weke dîroka xwezaya civakî bi sîstema şaristaniya demokratîk re di nava ahengekê de bi pêş dikeve.

**4-** Civaka exlaqî û polîtîk, civaka herî azad e.

Bi qasî xebata organ û komikên exlaqî û polîtîk hêzeke din a diyarker nîne ku civakê azad bike û azad bihêle. Ti şoreş û qehreman bi qasî şaxên exlaqî û polîtîk di azadkirina civakê de nikarin jêhatî bin. Jixwe şoreş û qehreman bi qasî ku alîkariya civaka exlaqî û polîtîk bikin, dikarin bi rola xwe ya diyarker rabin.

**5-** Civaka exlaqî û polîtîk civaka demokratîk e. Li ser bingehê hebûna civaka exlaqî û polîtîk ku civaka şefaf û azad e, demokrasî dikare manedar bibe. Civaka demokratîk şêweyekî rêveberiyê ye ku têde ferd û kom dibin kirdar û li beramberî hev civaka exlaqî û polîtîk herî zêde pêşde dibin. Ya rastî, em jixwe ji fonksiyoneliya civaka polîtîk re demokrasî dibêjin. Bi maneyeke rastî polîtîka û demokrasî têgînên wekhev in. Eger azadî ew qada atmosferî ya ku polîtîka xwe têde îfade dike, bê qebûlkirin, hingê demokrasî li vê qadê şêwazê îcrakirina polîtîkayê ye. Sêbera azadî, polîtîka û demokasiyê, nabe ku ji bingehê exlaqî mehrûm bin. Em ji rewşa rêûresmî ya azadî, polîtîka û demokrasiya bisazîbûyî re dikarin exlaq bibêjin.

**6-** Civakên exlaqî û polîtîk bi her şêweyê sermaye, milkiyet û desthilatdariyê re ku bi awayekî fermî dewletê îfade dikin, bi beramberî di nava nakokiyeke diyalektîkî de ne. Dewlet misêwa dixwaze li şûna exlaq huqûqê, li şûna polîtîkayê jî burokrasiyê bi cih bike. Di tevahiya dîrokê de vê nakokiya dewam kiriye li seriyekî wê şaristaniya fermî ya dewletdar û li serê din jî sîstematîka şaristaniya demokratîk a ne fermî bi pêş ketiye. Du tîpolojiyên cihê yên maneyê derdikevin holê. Nakokî dikarin pirr dijwar bibin, bibin sedema şer an jî dikarin li hev bên û pêşiyê li aştiyê vekin.

**7-** Hêzên civaka exlaqî û polîtîk û hêzên yekdestdar ên dewletdar bêyî sîleh û bêyî kuştin li hev bikin ji bo bi hev re bijîn û vê îradeyê nîşan bidin, pêkhatina aştiyê mumkîn dibe. Li şûna ku civak dewletê yan jî dewlet civakê tine bike, ji vê zêdetir aştiya bi şert a jê re lihevkirina demokratîk tê gotin pêk tê ku di dîrokê de jî ev rewş hatine dîtin. Dîrok ne bi temamî bi şêweyê îfadeya civaka exlaqî û polîtîk weke şaristaniya demokratîk, ne jî bi temamî bi şêweyê îfadeya civaka çînî û dewletdar weke sîstema şaristaniyê pêk tê. Bi rengê wan rewşan pêk tê ku têde bi têkilî û nakokiyên di zikhev de yên zêde, rewşên şer û aştiyê li pey hev tên. Ev rewş herî kêm bi qasî pênc hezar salan e ku welê dewam dike. Ji lewra bi şoreşên lezgîn tavilê ji holê rakirina wan çi qasî utopîk be, ji mêj ve hatina wan weke çarenûsê qebûlkiririn û wan di seyra wan de pejirandin û destnedana wan jî ewqasî rewşeke exlaqî û polîtîk a nerast e. Divê mirov ji bîr neke ku têkoşîna sîsteman wê dirêj dewam bike û biajo. Di vê çarçoveyê de nêzîkatiyên taktîk û stratejîk ên qada demokratîk û azadiya civaka exlaqî û polîtîk berfireh bikin, hê bêtir manedar û encamgir in.

**8-** Eger civaka exlaqî û polîtîk bi sifetên hev dişopînin ên weke komin, koledar, feodal, kapîtalîst û sosyalîst were pênasekirin, ev ê li şûna ravekirinê bi rola sergirtinê rabe. Bêguman di civaka exlaqî û polîtîk de ji sifetên koledar, feodal û kapîtalîst re cih nîne, lê di nava lihevkirina bi prensîb de bi mesafe, bi sînor û bi kontrol mirov dikare nêzî van sifetan bibe. Ya girîng ew e, mirov ne wan tine bike ne jî ji aliyê wan ve were daqurtandin; bi serdestiya civaka exlaqî û polîtîk timî hêz û qada wan bi sînor bike. Sîstemên komin û sosyalîst bi qasî demokratîk bibin bi civaka

exlaqî û polîtîk re wekhev dibin. Bi rewşên wan ên dewletê re wekhevbûn nabe.

**9-** Civaka exlaqî û polîtîk weke hedefên lezgîn di nava hedefên wê de dewleta netewe, tercîheke dînî yan jî li pey rejîmeke li derveyî demokrasiyê nabeze û nabe ku hedefên wê yên wisa hebin. Mafê diyarkirina hedefên civakê û wesfên wan bi tenê mafê îradeya azad a civaka exlaqî û polîtîk e. Bi qasî biryar û guftûgoyên rojane, biryarên stratejîk jî bi îfade û îradeya polîtîk û exlaqî ya civakê diyar dibin. Ya esas, guftûgokirin û bûyîna hêza biryarê ye. Civaka vê hêzê di destê xwe de bigire, dikare tercîhên xwe bi awayekî herî têkûz diyar bike. Ti ferd û hêz xwedî wê hêz û erkê nîne li ser navê civaka exlaqî û polîtîk biryarê bide. Di civakên exlaqî û polîtîk de muhendisiya civakê nabe.

Li ber rohniya van pênaseyên ku min ji gelek aliyan ve pêşkêş kirin, wexta mirov li mijarê temaşe bike mirov ê bibîne; Sîstema Şaristaniya Demokratîk bi xwe bi awayê yekparebûna exlaqî û polîtîk a xwezaya civakî timî weke rûyekî dîroka şaristaniyê her hebûye û her hebûna xwe dewam kiriye. Tevî hemû mêtinkarî û zordestiya sîstema dinya fermî, rûyê din ê civakê tine nebûye, nikarîbûne tine bikin. Jixwe tinekirina wê jî mumkîn nabe. Çawa ku kapîtalîzm, bêyî civaka ne kapîtalîst nikare hebûna xwe dewam bike, sîstema dinyayê ya fermî jî weke şaristanî, bêyî sîstema şaristaniya demokratîk nikare hebûna xwe dewam bike. Eger em hê berbiçav bikin, şaristaniya bi yekdestdarî bêyî şaristaniya bê yekdestdarî nikare hebûna xwe dewam bike. Berevajiyê vê rast nîne. Ango sîstema herikîna dîrokî ya civaka exlaqî û polîtîk weke şaristaniya demokratîk, bêyî hebûna şaristaniya fermî, bê asteng û hê bi bistetir dikare dewam bike.

Li gorî pênaseya wê, ez şaristaniya demokratîk hem weke sîstematîkeke fikrê, kombûna fikrê, hem jî weke yekparebûna organên polîtîk û pîvanên exlaqî îfade dikim. Ez ne bi tenê behsa dîroka fikrekê, ne jî behsa realîteya civakî ya di nava pêşketina exlaqî û polîtîk de dikim. Guftûgo di zikhev de herdu mijaran jî digire nava xwe. Ji ber ku ji aliyê şaristaniya fermî ve

weke yekparebûneke avahî û vegotinê hatiye astengkirin, ez hewce û girîng dibînim ku ji aliyê rêbaz, dîrokçe û hêmanên wê ve hinekî din veçirînim, vejinînim û ji hev derxim. Di bin sernavên ji niha û pê de wê ev mijar hebin.

## B- Ji Aliyê Rêbazê Ve Nêzîkbûna Li Şaristaniya Demokratîk

Rêbaza gerdûnparêz a li ser xeteke rast pêşketinê qebûl dike, di zanistên civakî de herî kêm bi qasî dogmatîzma dînî di fêhmkirina rastiyê de rê li ber pirsgirêkan vedike. Di hukmên xwe de weke yên dînî vebirrî ye: Gerdûn bêserûbinî pêşde diçe; di Lewh-î Mehfûzê de çi hatibe nivîsandin ew bi cih tê. Bi gotineke din, ya pêk tê, ew tişt e ku divê pêk bê. Her tişt çawa hatibe xwestin bi wî rengî pêk tê. Çawa ku tê zanîn, pozîtîvîzm antî-metafizîk û antî-dînî nîne, berevajî dînekî çor ê materyalîst e, bi tenê bi awayekî şayîk bi cîlaya zanistî ser şapinêzkirî ye. Ya rastî, pûtperestiya modernîteyê ye. Di navbera herdu rêbazên dogmatîk de wekheviya bingehîn ew e, ji hebûna hêzekê bawer dikin ku qanûnên wê li xwezayê hukim dikin. Li şûna qanûnên xwedê bi tenê gotina qanûnên zanistî hatiye danîn. Jê pê ve vegotin heman tişt in. Aliyê herî xeternak ê fikra pozîtîvîst, di hukmên wê de nêzîkbûna wê ya di hêza qanûnê de ye. Şîrove tineye. Ji sedî sed e, objektîv e, ev nêrtina hukmê wê ji bo her kesî wekhev tê, bi xwe tersê zanistê ye. Ji ber ku bi xetên tûj ên obje-sûbje ji hev tên qetandin di encamê de cih ji para şaşbûn û bi tiştekî xapînê re jî nahêle.

Çîna bûrjûwayê hewl dide teolojiya serdema navîn weke felsefeyeke zanistî û sekuler bi cîlaya pozîtîvîzmê boyaxkirî pêşkêş bike, mirov dikare vê fêhm bike. Hemin wê li ser wê şopên rastiya civakî ya malzaroka jê çêbûyî hebin. Ji serdema navîn, heta tevahiya dîroka şaristaniyê ji nêzîkatiyên formên li zêhnên me hatine barkirin em xwe rizgar nekin, bivênevê mîna ku êsîr bigire, pêla pozîtîvîst wê hukim li zêhnan bike. Vê rewşê kir ku mirov retorîkeke (hostatiya gotinbêjiyê, cambaziya wê) hişk, pûç, zêde tê dubarekirin, weke rastiyê bibîne û ji vê jî wêdetir firsend neda ti pêşketinê. Li şûna helwesta “Îmam çi bibêje ew rast e”, vê carê jî

“Mamoste û fîlozof çi bibêje ew rast e” cih digire. Di bingehê bêkêrî û bêberiya zêhnê me de ev rastî heye. Ji lewra em ji wî mafî mehrûm kirin ku em şîroveyeke bi tenê der barê xwezaya xwe ya civakî de bikin. Ev rewşeke gelekî xeternak e. Xwe bi xwe mejiyê xwe serkorî û êsîr dike. Dogmatîzma dînî qet nebe bi awayekî mîna hêza barhilgir a rêûresmê, hinek rastiyên dîrokî bi bîra mirov dixîne. Di pozîtîvîzmê de ev jî nîne. Di navbera me û rastiyên me de bendeke mezin a xerîbbûnê datîne, dideribîne. Weke hêza hegemon a îdeolojiya Rojava, bi awayekî mîna hîç sîlehê bernede (bêyî ku mejiyê xwe bixebitîne) teslîm digire. Eşkere ye ku ji ber ku dogmatîzm nehatiye şikandin, bi giştî şaristaniya fermî, bi taybetî jî paradîgmaya modernîteya kapîtalîst şikandina wan mumkîn nebû. Ji lewra nikarîbûn bigihîjin hêza şîroveya azad. Ez di vê fikra xwe de îqna bûme, ew jî ev e: sîlehên îdeolojîk ji sîlehên eskerî zêdetir bi rola qedexeker radibin.

Wexta min pirsa “Gelo mirov dikare şaristaniya demokratîk sîstematîze bike?” pirsî, ez hindikî neketim qirika van zincîrên rêbazan. Ya hê zehmetir jî der barê şikestina dogmayên sosyalîzma zanistî de bû. Ji ber ku min ji wan gelekî bawer kiribû. Mîna tu bi xwe re şer bikî, tu ji esareta dogmatîzmê rizgar dibe. Jixwe beşekî mezin ê jiyana min bi vî awayî derbas bû.

Nakokiyeke min a bi vî rengî jî hebû: Ji aliyekî ve ez li welatê esas ê şoreşa cotkariyê di bin bandora çandekê de bûm ku ji hezarê salan ve heta îro dihat (ji 10000 B.Z. heta roja me ya îro), li aliyê din jî min xwe li têkoşîna avakirina civaka piştî kapîtalîzmê rakişandibû. Di navbera herduyan de herî kêm bi qasî duwanzdeh hezar salan valatiyeke demê hebû. Ma min heta ev dema navberê ji hev dernexista, me yê çawa civaka nû ava bikirana? Sîstema fikra me bi awayekî veguherîbû zanista axîretê (eskatalojî). Eşkere ye ku di fikra min de rêbazeke berdar bi cih nebûbû. Ji yên hatibûn nivîsîn santîmekê wêdetir jî min nikarîbû pêşiya xwe bifikirim, bibînim, mirov vê rewşê jî bi tenê dikare bi dogmatîzmê rave bike. Em hê ji qalibên tewş ên dînî rizgar nebûbûn, em li bombebarana pozîtîvîzma fermî ya bi slogana gotin gotina min e, radibû, qelibîn. Min

fêhm kir ku hêza bingehîn a sîstema diparêze çavkaniya xwe hegemoniya îdeolojîk e. Ji ber vê, ez pevçûna Nietzsche bi hêza îdeolojîk a Elman a fermî re heta dîn bibe meşand, baştir fêhm dikim. Eger em der barê Rojava de çend heqîqetên sade dizanin, bi herhalî em deyndarê vê pevçûnê ne ku bi dînîtî hat kirin.

Dogmaya yekemîn a ez baş ji bin bandora wê derketim ev e: Teza sosyalîzma zanistî ya dibêje piştî civaka komin a paşvemayî, hatina koledarî û sîstemên din ên civakên çînî li pey hev mecbûrî ye. Min ev dogma demeke dirêj weke qanûnekê qebûl kiribû. Di zik vê dogmayê de dogmaya duyemîn ji aliyê çînî ve binavkirina van civakan bû. Ez dereng nemam, min ev dogma jî şikand. Pênaseyên civakê weke koledar û feodal rastî ji aliyekî gelekî nazik ve dinixumand, civak û efendiyên wê wekehev nîşan didan. Eşkere bû ku ev bermahiyên gotinên serdestan bûn. Dîsa di zikhev de dor hatibû dogmaya sêyemîn û êdî serê kete wan û ji hev de diketin. Jê pê ve çareserkirina dogmayan ji min re ne zehmet bû. Dogmaya ku qonaxên civakên çînî mecbûrî û pêşvebir qebûl dike, ez behsa wê dikim. Min fêhm kir ku qonaxên civaka çînî hîç mecbûrî û pêşvebir nînin; berevajî min bi cesaret ew weke herî paşverû û pêşketineke zincîrkirî nirxand. Encam, vegotinên dîrokê nêzî rastiyê bikin mumkîn bûn. Bêyî ku mirov ji pirrşîroveyan fikaran bike, berevajî divê mirov wan weke hewldanên dewlemendkirina maneyê binirxîne û ev rêbazeke di cih de bû. Wexta ku min di gelek qadan de dogmatîzm (pêşhukimtî) şikand, hemin hêza min a şîroveyê û dewlemendiya maneyê wê bi pêş biketa. Ez vê xusûsê pirr zelal dikarim diyar bikim: mirov li ku dibin bila bibin, di kîjan rewşê de dibin bila bibin, eger pirsgirêkên li pêşiya xwe nikaribin çareser bikin, hêmana bingehîn a di vê yekê de ew e, asta fikra wan a paşvemayî ye ku nikare dogmayên hezar salan xira bike û newêre xwe ji xerîzeyên xwe rizgar bike. Tirsa di fikrê de di bingehê hemû tirsan de heye.

Dema ku min şaristaniya demokratîk dikir fikir, duyemîn xusûsa girîng a bala min kişand, malzemeyê gelekî zêde yê ampîrîk bû. Çavdêriyên min ên dîrokî jî bi qasî vî malzemeyî şahidî li vê zêdebûnê dikirin. Çima xanedanî, talana nirxê zêde, kulmozên desthilatdariyê dibin sîstem, çima

şaneyên kok ên civakê malbat, qebîle, eşîr, gund û çînên bajêr ên li derveyî desthilatdariyê, gel û neteweyên nebûne dewlet, em nikaribin weke sîstematîkekê binirxînin? Ev bi xwe çima nikaribin sîstemekê pêk bînin, weke avahî û îdeolojîk maneyeke xwe çênebin?

Eger ên me hêvî ji wan kirî bersivên têrtijî nedabin van pirsan, bi herhalî sedemên xwe hene. Naxwe ev pirs ji heqîqetê mehrûm nînin. Jixwe sîstematîk nebe jî parçe parçe bersivên hatine dayîn hindik nînin. Bi tenê em zanibin lê bigerin.

Dema ku em li şaristanî û modernîteya cuda digerin hêmana sêyemîn der barê xwezaya civakî de potansiyela avakirina azad e. Eger li naverastê pirsgirêkên mîna gidîş û lodan hebin, mirov ji bêkarî û birçîbûnê bêtaqet ketibin, avakirina sîsteman (afirandin, bi maneya muhendisiya civakê nîne) hem mumkîn e, hem jî mecbûriyeteke girîng e; wecîbeyeke exlaqî ye. Jixwe asta pirsgirêkan pêdiviya bi şoreşê, şoreş jî avahiyên bibin bersiv wê bixe rojevê.

Hêmana çaremîn a lêgerîna min ev e: Eger sîstema serdest ti hêviyê nade te, te naxe şûna mirovan û eleqeyê nîşanî pirsgirêka te ya herî besît a nasnameyê nade, çareseriyê nabîne, weke erkeke insanî ya bi tenê tu bikî ew e, divê tu rêz û hêviya xwe zanibî bi hêza avakirina sîstema xwe ve girê bide. Naxwe li ser sofreya guran a li benda te ne hestiyên bermahî bin, dibe ku yê bê xwarin tu bi xwe bî.

Hêmaneke dawî, belkî jî ev xweserî min e, lê ez bawer dikim ku bi giştî heye. Ew jî ev e, eger a tu hêviyê jê dikî diya te be jî tiştekî pêşkêşî te bike tinebe, divê tu hîç fikaran nekî û xwe bisipêrî hêza xwe. Tu yê xwe radestî çep û rastê, xerîzeyan nebî. Eger li naverastê rewşeke mirov têde karibe bijî tinebe, divê tu zanibî tu wekî mirov xwediyê wê hêzê yî, dikarî aqil û îradeyê ji bo avakirina ya herî delal, rast û qenc nîşan bidî!

Li gorî şîrovekirina dîrokê ya li ser xeteke rast, piştî civaka gund û cotkariyê civaka bajêr a mezin û bilind bû di hukmê ‘gotina dawî’ de ye. Çîrokçêkirinên şaristaniyê li dora bajêr rastî bi xwe ne. Hêza li bajêr rêveberî xistiye destê xwe û xwe weke dewleta dînî bi rêxistin kiriye, weke çîna serwer hêza motor a dîrokê ye. Çi kiribe rast û pîroz e; pêkhatina

çarenûsa muqader e. Ji bo vê jî hegemoniyayên îdeolojîk ên xwedayî têne hildan. Her dengê dijber an jî ne li gorî wan, weke xiyaneta bi gotina ezelî û ebedî re ango bi îfadeya wî ya jiyanê re tê hesibandin û 'xezeba xwedê' bi seran de radikin. Bi tevahî karûbarên bê rûmet ên despot weke xwedê yan jî gotinên wan ên pîroz ji devê rahiban têne xwarê. Êdî li hemberî qanûnên xwedê stûyê evdan ji mû ziravtir e, ango evd dibêjin ev stûyê min e, û ev jî kêra we ye. Stû were jêkirin jî naêşe.

Şaristanî, serdema bajêr weke rêxistiniya sermaye û zorê bi rewşeke orjîn a mîtolojiyê yan jî bi vegotineke seresere ya dîn bi gelek awayan veguheriye û heta roja me ya îro hatiye. Tevî ku cewherê wê weke xwe maye, retorîk û formê (şêweyê rêxistiniya wê) wê her hatiye guhertin û bi her pêşkêşkirinê cîlayên wê hemû jê hatine xwarê û hîç paxav nake ku bi awayekî hişkî çor weke faşîzma dewleta netewe xwe pêşkêş bike. Qefesa hesinî ya burokratîk weke rêxistiniya zor û sermayeyê ya bajêr, tevî yên di hundirê wê de kansêrbûna wan a biyolojîk û AIDS her diçin zêde dibin, rewşeke ji vê jî bi tehlûketir xwezaya civakê bi hemû avahiyên xwe yên hundir û bi hawîrdora xwe ya xwezayî ketiye qonaxa kansêrbûnê. Ji bo were fêhmkirin ku ev vegotina me bi xetên stûr anî ziman, zêde vegotineke nepixandî nîne, mirov bi tenê li şer û mêtingeriyên çarsed salên dawî yên sîstema dinyayê (herî zêde pênc hezar salên dawî), rewşa şer a li tevahiya civakê belav bûye û rewşa rojane ya felaketa hawîrdorê binêre têrê dike.

Dema ku em li tevahiya şêweyên hegemoniya îdeolojîk ên lîberal û zêdetir jî li qadên fermî (îdeolojiyên dewletê) dinêrin, wisa nuqte li dawiya dîrokê hatiye danîn. Bi gotineke din, di asta herî jor a serdema global de sîstema kapîtalîst rewşa gotina dawî ya ebedî îfade dike. Ev qalkirin nû nîne, em dizanin di her serdema girîng a sermaye û zordestiyê de îlanên bi vî awayî yên 'ebediyetê' têne kirin. Ha jixwe heqîqeta 'zanistên' şaristaniya pênc hezar salî bi hezar kirasan pêçayî û kirine rêbaz, ev e. Ango rêbaz bûye heqîqet, heqîqet jî bûye rêbaz.

Wexta ku bi pistepistî be jî di ber guhên mirovan re bê avêtin ku dikare hebûna dinya, zanist û rêbazên din mumkîn be, tevî gotinên cehennemî, jirêderketî û kafirî her şêweyê 'terorê' yên sînornenas dikevin dewrê.

Şêweyê serjêkirinê yê herî sivik û besît e. Li çarmîxê xistin, di nava agir de şewitandin, bi dar ve kirin, heta bimire kelekvanî, êşkence, heta bimire xebitandin, di zindanan de rizîn, pîrekkirin, şêweyên bê sînor ên mêtingehkirinê, asîmîlasyon û hwd.

Şaristaniya navendî ya pênc hezar salî ku hewl dide civaka gund û cotkariyê hilweşîne, bi awayekî mîna heyfa xwe jê hilînê tevdigere. Em dibînin di salên 2000î de dixwaze vê civakê bi tevahî têk bibe û şopên wê yên dawiyê jî bi temamî ji holê rake. Têkbirin û hilweşandina hawîrdorê ya rastî şêweyê herî dawî yê tolhilanîna ji CIVAKA GUND û COTKARIYÊ ye. Gelekî seyr û balkêş e, li şûna Xwezaya Civakî ya hatiye bêdengkirin, Xwezaya Yekemîn bi felaketên cûrbicûr ên rê li wan vekiriye (germbûna avhewayê, hişkesalî, bi lez helîna qeşayên qutban, bi lez tinebûna cureyên heywan û nebatan, rabûna lehiyan, babîsok û felaketên din) bersivê dide van hilweşandin û têkbirinan. Carnan mirovatî (mirovatiya hatiye bêdengkirin) dikare bibe xwezaya herî bê zar û ziman. Rast e, ev cihê xemê ye, lê kî dikare rastbûna wê înkar bike?

Di paradîgmaya dîrokê de guhertina herî bingehîn ew e, eger civaka gund-cotkariyê (10000 B.Z. heta roja me ya îro) nebûya yekdestdariya sermaye û desthilatdariyê ya bingehê xwe bajêr jî bi pêş nediket. Di vê nuqteyê de mirov dikare guhertina herî bingehîn a rêbazê bike. Rosa Luxemburgê bi şêweyekî gelekî seresere wisa pênase kiribû “Civaka ne kapîtalîst e, nebe, yekdestdariya daneheva sermayê û kapîtalîzm nabe.” Mirov vê pênaseyê ji bo tevahiya şêweyên sermayeyê û dîrokê bike, wê bibe şêwazekî rasttir ê vegotinê. Ji ber ku ev di tevahiya civaka dîrokî de ji hev derxistin û analîzkirina sermayeyê îfade dike. Modela civaka xwerû kapîtalîst a K. Marks, şaşiya wî ya herî bingehîn e. Ji ber ku civakeke bi vî rengî ne pratîkî, ne jî weke teorîk mumkîn e. Piştrastkirina vê gelekî hêsan e: mînak em bibêjin di civakekê de bi tenê kapîtalîst (tevî burokratên xwe) û karker (tevî bêkarên xwe) hene. Ji ber ku li gorî civaka xwerû kapîtalîst divê ev wilo be. Em ferz bikin ku li fabrîka sermayeyê bi giştî yekeya sed malî tê hilberandin. Yekeya bîstûpênc malî di berdêla heqdestên wan de dibe ya karkeran. Bila yekeya bîstûpêncan jî ji bikaranîna çîna sermayedar

re bimîne. Baş e, yekeya pêncî malê mayî wê çi bibe? Yê mayî yan wê birize yan jî belaş were belavkirin. Li gorî modela civaka xwerû kapîtalîst bi awayekî din mumkîn nîne.

Rosa wexta ji vê nuqteyê destpê dike û dibêje, eger yekeya pêncî malî bi armanca karê ji civaka ne kapîtalîst re were firotin, wê pêkhatina sîstemê mumkîn be, li keviyên rastiyê diçe û tê. Rastiya civakî hê berfirehtir e. Herweha divê mirov baş zanibe û ji bîr neke ku berdêla kar û daneheva sermayeyê ya xwe disipêre wê, mayeya civakî ye ku nehatiye dayîn. Civaka ne kapîtalîst kîjan civak e? Di serî de civaka dîrokî ya gund-cotkariyê ye; civaka jinê ya girtine malê ye; beşê karker (bi xêrê debara xwe dike) û zenaetkar ên kedkar û xizan ên bajêr in. Dema ku rastî welê bê danîn, îmkan û derfet çêdibin ji bo mirov karibe şaristaniya pênc hezar salî û dema wê ya herî sîstematîk çarsed salên dawî yên sîstema dinya kapîtalîst analîz bike. Di tevahiya dîrokê hemûyî de sermaye û desthilatdariya xwe weke şebekeyê (arîstokrasî, efendî, bûrjûwazî, dewletlû, desthilatdar û hwd.) bi rêxistinkirin ti carî ji sedî dehê şêniyên giştî derbas nekiriye. Ji lewra gewdê giştî yê xwezaya civakî her tim di ser ji sedî nodî re ye.

Hingê ji aliyê rêbazê ve em bipirsin: Gelo mirov ji sedî dehî bike dîrok, bike sîstem û bike objeyê bingehîn ê fikrê ji aliyê zanistî ve rêyeke rast e, yan mirov ji sedî nodî bike dîrok, bike sîstem, bike objeya bingehîn a fikrê, rêbazeke rast a zanistî ye? Rastiya bingehîn a divê mirov li bersiva wê bigere ev e. Mirov dikarin bibêjin, ji ber ku pirraniya fikir, zanist û rêbazê di bin yekdestdariya ji sedî deh de ye bi awayekî din mumkîn nabe. Lê ev yekdestdarî, li gorî tehlîla dawî, ma li ser desteserkirin û vedizîna mayeya civakî pêk nehatiye? Gelo ji ber ku koma herî birêxistinkirî û îdeolojîk e, xwedî imtiyazbûna wê mafdar e? Ji sedî yek be jî, zoreke baş hatiye birêxistinkirin, dikare hukim li mîlyonan bike, dikare mîlyonan rêve jî bibe. Dikare gotinên xwe jî weke rêbaz û zanista herî bingehîn ferz bike. Ma ev rastî, dikare bê maneya heqîqetê? Kî çendeke zordar û yekdestdarî weke heqîqet îlan dike? Yên wan wisa îlan dikin, weke mîtolojî, dîn, felsefe, zanist û hunerê pêşkêş dikin, girêdana wan bi desthilatdariya şebekeya sermaye û zordaran ve gelo dikare heqîqeta civakî (heqîqeta ji sedî nodî)

biguherîne? Gelekî eşkere ye ku divê mirov pirsgirêkê bi vî rengî deyne holê. Ti hegemoniya îdeolojîk, zanistî, dînî, felsefî û hunerî hêza xwe ji bo guhertina vê heqîqetê têrê nake, divê têrê neke.

Dema ku em ji aliyê avahiyê ve li ber rohniya vê rêbaza sereke li civaka dîrokî bikolin û bixwazin bi şêweyên fikrê yên cûrbicûr (mîtolojîk, dînî, felsefî, zanistî û hunerî) bigihînin îfadeyekê, şaxên heqîqetê wê zêdetir diyar û manedar bibin. Mirov dikare şaristaniya demokratîk bigihîne sîstematîkeke gelekî pêşketî bi vegotina wê ya civaka dîrokî ya du-alî (objektîvîzma wê û subjektîvîzma wê wek şêwazê avabûna wê) hebe. Hewce dike û mumkîn e ku xwezaya civakî di nava yekparetî û dîrokîtiyeke berfireh de sîstematîze were kirin. Divê ev analîza sîstematîk di bingehê paradîgmatîk ê şoreşa zanistî û zanista civakî de were bicihkirin.

Nêzîkatiyeke bi vî rengî ji bo pirsgirêka rêbazê, di wê qabîliyetê de ye ku xwezaya civakî bi tevahî dewlemendiya dîrokî û di nava yekparetiyê de wê bêtir pêşkêş bike. Çawa pêşî mirov awirekî didiyê tê dîtin,

**a-** Civaka bê sermaye û desthilatdarî mumkîn e, lê sermaye û desthilatdarî bê civak mumkîn nînin.

**b-** Ekonomiya bê sermaye mumkîn e, lê sermayeya bê ekonomî mumkîn nîne.

**c-** Civaka bê dewlet mumkîn e, lê dewleta bê civak mumkîn nîne.

**d-** Civaka bê kapîtalîst, bê feodal, bê efendî mumkîn e, lê kapîtalîst, feodal û efendiyê bê civak mumkîn nînin.

**e-** Civaka bê çîn mumkîn e, lê çîna bê civak mumkîn nîne.

**f-** Gund û cotkariya bê bajar mumkîn e, lê bajarê bê gund û cotkarî mumkîn nîne.

**g-** Civaka bê huqûq mumkîn e, lê civaka bê exlaq mumkîn nîne.

**h-** Mirov dikare mîna kesê bi xwe li daholê dide û bi xwe govendê digire civakê bixe rewşeke bê polîtîka û bê exlaq. Lê wê demê jî civak ji

aliyê Levîathanê nû ve (faşîzma dewleta netewe) tê parçekirin û daqurtandin ku ew kêliya mirina mirov û civakê bi vî awayî dibe ya temaşayê. Ev kêlî, kêliya pêkhatina qirkirinê ye. Ev kêlî, kêliya mirina mirov e ku Michel Foucault îlan kiriye. Ev kêlî, ew kêlî ye ku Friedrich Nietzsche ew weke kêliya civak û mirov têde hatiye xesandin, têde kirine bejinbohst û bicirkî, kirine morî, kirine kerî û girse, îlan kiriye. Ev kêlî, ew kêlî ye ku civak di 'qefesa hesinî' ya M. Weber behsa wê kirî de hatiye girtin!

Paradîgmaya şaristaniya demokratîk divê di vê kêliyê de bikeve dewrê û mecbûr e bikeve dewrê:

**1-** Li gorî ku bê gund û cotkarî civak nikare dewam bike, ev beşê civakê ku tevahiya dîroka şaristaniya fermî timî bûye mijara mêtinkarî û zordestiyê, berxwedana wê ya tevahiya dîrokê nîşandayî bi tenê heke bibe civaka polîtîk dikare bigihîje armanca xwe.

**2-** Baregehên yekdestdariyên sermaye û desthilatdariyê nebin jî pêkhatina bajaran mumkîn e. Tevahiya dîroka şaristaniyê bajar neçar hatiye hiştin bibe baregeha mêtinkarî û zordestiyê, lê rizgariya rastî ya bajêr bi civakbûna bajarê polîtîk û rêveberiya demokratîk mumkîn e. Di dîrokê de rêveberiyên konfederalîst û demokratîk ên bajaran gelekî dewlemend bûn, ev dikarin bêne pêşdebirin û belkî bi vî awayî bajar ji avahiya xwe ya bûye xirbeyê kansêrolojîk bê rizgarkirin.

**3-** Yekdestdariyên sermaye û desthilatdariyê yên li ser ekonomiyê avabûne, heta dor li wan neyê tengkirin û ji holê neyên rakirin, ne pêxîrtengiyên ekonomîk ne jî pirsgirêk diqedin. Di serî de bêkarî, birçîbûn û feqîrî, sedema bingehîn a texrîbkirina hawîrdorê, her cure çînîbûnên bê mane, nexweşiyên civakî û şeran, têkoşîna komên sermaye û desthilatdariyê li ser nirxê zêde yê civakî ye ku her dixwazin para xwe zêde bikin û bi dest bixin. Xwezaya civakî li dijî van pirsgirêk û nexweşiyan bi perdeyeke tenik hatiye gurçûpêçkirin, eger amûrên sermaye û desthilatdariyê bi tenê bêne bisînorkirin jî Xwezaya Civakî dikare bi ser

bikeve. Eger dîrok ê ji aliyê ekonomîk û çînî ve were nivîsandin û xwendin, bi tenê bi vê paradîgmayê dikare bigihîje maneya xwe ya rastî.

**4-** Bêyî yekdestdariya sermaye û desthilatdariyê rewşa xwezayî ya civakê, civaka exlaqî û polîtîk e. Bi tevahî civaka mirov ji roja çêbûye û heta roja vemire divê bi vê xisletê rabe û bijî. Qalibên civakan ên koledar, feodal, kapîtalîst û sosyalîst ku xwestin mîna kirasekî li xwezaya civakê bikin, rastiyê îfade nakin. Îddîayên bi vî rengî dikarin hebin, lê civakên bi vî rengî tinene. Rewşa bingehîn a civakan exlaqî û polîtîk e, lê ji ber ku tevahiya dîrokê timî ji aliyê yekdestdariyên sermaye û desthilatdariyê ve hatine tengavkirin, hatin mêtin, hatine mêtingehkirin bi temamî îmkana pêşketinê nedîtine.

**5-** Wezîfeya bingehîn a siyaseta demokratîk, dibe ku civaka exlaqî û polîtîk li ser bingehê azad gihandina fonksiyona wê be. Civakên welê fonksiyonel, ew civak in ku vekirî ne, şefaf in, û demokratîk in. Civaka demokratîk çiqasî bi pêş ketibe, civaka exlaqî û polîtîk jî ewqasî dikare fonksiyonel be. Hunerê siyaseta demokratîk ji fonksiyonelkirina civakên bi vî rengî berpirsiyar e. Afirandina civakan bi 'muhendisiya civakê' wezîfeya siyaseta demokratîk nîne. Muhendisiyên bi vî rengî xebatên lîberalîzmê yên pêkanîna yekdestdariya sermaye û desthilatdariyê ne.

**6-** Tevahiya dîrokê li ser navê şaristaniyê qraltî, împaratorî, komar, bajar û dewletên netewe hemû, bi tenê û bi tevahî, bi rewşên xwe yên lihevkirî û reqabetkirî, bi seknên xwe yên hegemonîk û wekhev di cewherê xwe de şêweyên dewletbûyî yên sermayeya deshilatdarbûyî ne.

Nabe ku ti carî civaka exlaqî û polîtîk bike hedef da ku bikeve rewşa van yekdestdaran. Lê yan ji wan serbixwe yan jî bi şert dikare di nava aştiyê de bi wan re li hev bê û bijî. Di van rewşan de şaristaniya demokratîk û şaristaniya desthilatdariya fermî dikarin bi şêweyên cûrbicûr li hev bikin. Pêvajoyên aştiyê ji ber ku xwe disipêrin van lihevkirinên bi şert, tevahî demên din ên dîrokê bi rewşên şer ên an di nava civakê de yan jî li ser wê pêk tên.

**7-** Ji ber ku civak mecbûr nîne dewamî xwe bisipêre şerên (li hundir û derve) mêtinkariyê yên yekdestdaran, bi şêweyên cûrbicûr divê şaristaniya xwe ya demokratîk (hem li ser zemînê gund û cotkariyê hem jî di nav kedkarên bajêr de) bi pêş bixe. Dîrok bi tenê ji koma dewlet û desthilatdariyan pêk nayê, ew li derveyî mirovahiyê ne, avahiyên kohne ne, amûrên şer in. Dîrok qatbiqat ji wan zêdetir bi mînakên şaristaniya demokratîk tijî ye (xwezaya civakî her tim ji sedî nod hebûna xwe di ser wan re ye). Bi tevahî malbat, qebîle û sîstemên eşîran, konfederasyon, demokrasiyên bajaran (bi qasî ku tê zanîn mînaka herî balkêş Atîna ye) û konfederalîzmên demokratîk, keşîşxane, dergah, komin, partiyên wekhevîxwaz, civakên sivîl, terîqet, mezheb, komên dîn û felsefeyê yên nebûne desthilatdar, piştgiriyên jinê û bêhejmar meclîs û cemaetên piştgiriyê yên nehatine nivîsandin, komên civakî yên bi qasî stêrkên li ezmanan divê li xaneya şaristaniya demokratîk bêne danîn. Mixabin, dîroka van koman bi awayekî sîstematîk nehatiye nivîsîn. Dibe ku dîroka mirovane ya rastî îfadeya sîstematîk a van koman be.

**8-** Şaristaniyên desthilatdariya fermî, ji ber ku yekdestdariyên sermaye û sîlehê bi hegemoniya îdeolojîk re di zikhev de meşandine, îdeolojiya şaristaniya demokratîk tim qels û bê sîstem maye. Ji aliyê desthilatdariyan ve timî hatiye tepisandin û ji rêderxistin, bi pirranî jî hatiye tinekirin. Ji ber ku gelek hozan, zanist, felsefe, dîn, mezheb û hunermend teslîm nebûn, guh dan dengê wijdanê azad bi cezayên herî giran hatine cezakirin û bêdengkirin. Bi sedema ku dîroka van nehatiye nivîsîn, ev nayê wê maneyê ku ev tinene. Yek ji wezîfeyên me yên sereke yên entelektuelî ew e, divê em şaristaniya demokratîk bigihînin îfadeyeke sîstematîk a civaka dîrokî.

**9-** Li beramberî sîstema şaristaniya dewleta netewe ya çarsed salên dawî weke tevahiya yekdestdariyên deshilatdarî, îdeolojîk, îdarî, eskerî û ekonomîk xwe kiriye sîstema dinya kapîtalîst, sîstematîkeke şaristaniya demokratîk a bi temamî yekpare nebûyî heye û divê piçûk neyê dîtin, di nava vê sîstematîkê de gelek tevger li bazkekî cih digirin. Li vî bazkî demokrasiya bajêr (li Îtalyayê) û konfederasyon (li Elmanyayê),

serhildanên gundiyan û kominên wan, serhildanên karkeran û kominên wan (Komina Parîsê), ezmûnên sosyalîzma pêkhatî (ji sê paran parek dinyayê), pêvajoyên rizgariya neteweyî (rewşên wan ên nebûyî desthilatdar û dewlet), hejmarek zêde partiyên demokratîk, civakên sivîl, herî dawî tevgerên ekolojîk û femînîst, bi tevahî tevgerên demokratîk ên ciwanan, festîvalên hunerî û tevgerên nû yên dînî yên di armanca wan de desthilatdarî tineye, hene.

**10-** Sîstematîka dewleta netewe ya roja me ya îro herçiqasî pirsgirêkên xwe yên giran hebin û derzên lê ketine her roja diçe ji hev diçin jî hê jî di qada neteweyî, herêmî û global de xwedî sîstematîka herî bi hêz e. Dewletên netewe (hejmara wan ji dusedî dibihure) bi yekîtiyên herêmî (di serî de Yekîtiya Ewrûpayê, DYE-Kanada-Meksîka, Başûr-Rojhilatê Asya) û Neteweyên Yekbûyî NY ya global tê temsîlkirin, li beramberî vê ji bo sîstema şaristaniya demokratîk yekîtiyên gel û kedkaran ên cûrbicûr ên nebûne desthilatdarî û dewlet mîna Foruma Sosyal a Dinyayê sist û bê form kêm in, û têrê nakin. Kêmasî di bingehê avabûn û îdeolojiyê de ye. Ji bo jiholêrakirina vê kêmasiyê divê Konfederalîzma Demokratîk a Dinyayê, konfederasyonên demokratîk ên neteweyî yên xwecihî û herêmî, û weke amûrên van divê partî û civaka sivîl bêne pêşdebirin.

## C- Pêşnûmeya Dîroka Şaristaniya Demokratîk

Yek ji xisletên bingehîn ê xwezaya mirovê azad ew e, dikare dîroka xwe hilbijêre û dizane pêre bijî. Dîrok şîroveya pêvajoya pêkhatin û hebûnê ye. Çiqasî hebûnên cuda hebin, ewqasî jî dîrok wê hebin. Lê cudatiyên dîrokî nayê wê maneyê ku yekîtiya dîrokî nîne. Bêyî yekîtiyê cudatî ti maneyê îfade nakin. Cudatî bi yekîtiyê ve girêdayî hene. Ya girîng ew e, yekîtî wê çi temsîl bike. Dema mijar cinsê mirov be, bêguman jêhatîbûna bikaranîna amûr û mejî dikarin bibin bingehê yekîtiyê. Ji ber ku ev nebin di navbera wan de ti cudahî nîne. Carnan dewlet, carnan demokrasî, şaxên exlaqî û polîtîk, şêweyên zêhniyetê, rewşa ekonomiyê bingehê yekîtiya cudahiyan

in. Ya girîng, kîjan cudatî wê li ser bingehê kîjan yekîtiyê bi pêş bikevin, bê tespîtkirin.

Me weke bingehê yekîtiya şaristaniya demokratîk, civaka exlaqî û polîtîk kir esas. Ji bo were fêhmkirin, me hewl da pênase û rêbaza wê diyar bikin. Em ê niha jî hewl bidin bi kurtî pêşnûmeya wê ya pêşketina dîrokî xêz û pêşkêş bikin:

**a-** Em dizanin xwezaya civakî nêzî ji sedî 98'ê jiyana xwe bi yekeyên ji 25-30 kesî pêkhatî ku em ji wan re civaka klan dibêjin, derbas kiriye. Em dikarin klanê weke şaneya kok a civakê pênase bikin. Civaka klan bi pêvajoyê re di tevahiya civakên malbat, qebîle, eşîr, qewm û netewe yên pêkhatî de weke şêweyekî şaneyê cuda dibe, hê hebûna xwe dewam dike. Çi di rewşa zimanê îşaretan de be, çi jî di rewşa zimanê sembolan de be, li gorî pênaseya me ya bingehîn a xwezaya civakî, klan civakeke exlaqî û polîtîk e. Bêguman li cem klanê exlaq û polîtîkayeke gelekî besît heye. Ya girîng ew e, heye. Besîtbûyîn girîngiyê ji holê ranake. Berevajî girîngiya wê piştrast dike. Heta mirov dikare bibêje, exlaq îfadeya xwe ya herî bi hêz di dema civaka klan de pêk aniye. Mîna ku di rola îfadeya xerîzeyê hundir de be. Li gorî wê (exlaq) jiyan şertê hebûnê yê bivênevê ye. Klana exlaqê xwe ji dest dayî, klana ji hev belav bûyî, ji hev hatiye belavkirin an jî hatiye tinekirin. Bi rêzikên besît îfadeya wê mirov bi tenê dikare bi jiyanîbûna wê şîrove bike. Ji aliyê dayîna ber hev mirov dikare bibêje, di roja me ya îro de tevî ku timûtim rêzik û pîvanên huqûqê têne binpêkirin jî di civakê de ti tişt nabe. Belkî jî bi sedema muhafezekariya huqûqê, ev binpêkirin bi roleke erênî jî rabin. Lê di klanê de xirabûna rêzik û pîvanan dawiya komê tîne.

Ji bo polîtîka jî mirov dikare heman xisletan diyar bike. Klan du karên xwe yên gelekî besît weke nêçîrvanî û berhevkerina pel û pincaran heye. Bêguman bi tevahî endamên klanê bi xwe li ser nêçîrvanî û berhevkirina gihayan hezar caran guftûgo dikin, dişêwirin, danûstendina ezmûnan dikin, klan hin endamên xwe wezîfedar dike, polîtîkayên xwe yên nêçîrvanî û berhevkirinê pêk tîne û hewl dide bi awayekî herî berhemdar encamê jê bigire. Naxwe bi awayekî din jiyan mumkîn nedibû. Çi wê çawa

bê peydakirin û berhevkirin polîtîkaya bingehîn bû ango zibare û palûte bû (polîtîka weke karekî hevpar tê pênasekirin.) Hingê civaka klan gelekî besît e, lê komeke polîtîk a heyatî ye. Rojekê polîtîka nekirana wê bimirana. Ji ber vê sedemê polîtîka çaviyeke gelekî heyatî ya fonksiyonel û kêrhatî ye. Belkî jî xisletên wî yên din hemû bi prîmatên din re (heywanên nêzî mirovan) wekhev bûn. Cudahiya wan a bi tenê û girîng ew bû, çaviya exlaqî û polîtîk a besît pêşde biribûn. Amûr bi xwe jî kengî polîtîka bibûya diketin dewrê. Pêşketina ziman bi xwe jî li ser bingehê exlaqî û polîtîk mumkîn e. Divê em hîç ji bîr nekin ku hêmanên hewcedariya bi peyivandinê bi lez dikin guftûgo û biryar in. Li vir mirov bibêje, hewcedariya bi xwe-xwedîkirinê bingehê exlaq û polîtîkayê ye, li gorî min bê mane ye. Bêguman amîpên tek hucreyî jî hewcedariya xwe bi xwe xwedîkirinê heye. Lê em nikarin behsa exlaq û polîtîkaya amîpan bikin. Cudahiya mirov ji amîpan ew e, xisleta wî ya hewcedariya xwe ya bi xwe xwedîkirinê misêwa bi nêzîkatiyên exlaqî û polîtîk pêşde dibe. Di vê çarçoveyê de doktrîna Marksîst a dibêje “Ekonomî her tiştî diyar dike” zêde raveker nîne. Ya girîng ew e, ekonomî çawa tê diyarkirin. Li cem cinsê mirov ev rewş qada civakî, çaviya exlaqî û polîtîk hewce dike.

Em civaka klan bi sedema vê xisleta wê dikarin deynin destpêk û serê goşeya dîroka sîstema şaristaniya demokratîk. Bi vî aliyê xwe dîroka sîstemê dibe xwediyê ji sedî 98ê dîroka sîstemê. Herweha çawa ku me berê jî diyar kiribû, hebûna klanê hê jî di malbat, qebîle, eşîr, qewm, netewe, komên navneteweyî û heta komên jor-netewan de weke hucreya sereke dewam dike.

Nêzî bîst hezar sal berê di dema çaremîn a qeşayê de bi helîna qeşayan re di sîstema Toros-Zagrosan de bi şêweyên xwe yên herî muhteşem civakên mezolîtîk (nêzî beriya 15000-12000 salan a dema navberê) û neolîtîk (ji 12000 hezar salan û vir ve) ji civaka klan gelekî pêşketîtir bûn. Amûrên di destên wan de û nîzamên wan ên cihûwaran pêşketîtir bûn. Jixwe şoreşa pêşî ya gund û cotkariyê di vê pêvajoyê de pêk hatibû. Sîstema Toros-Zagrosê tevî ku sereke ye, li gelek mekanên Afro-Asyayê komên mirovan dest bi pêkhatinên bi heman rengî yên civakî dikin. Li gorî

vê, ev pêşketin bi belavbûna civaka neolîtîk a Toros-Zagrosan pêk hatiye. Di dîroka xwezaya civakî de serdemeke muhteşem e, ev dem. Ji pêkhatina şêweyên zimanên sembolîk ên sereke yên heta niha têne bikaranîn heta bi şoreşa gund (bi zanîn tov danîn û çinîna wan, kedîkirina heywanan), ji pêkhatina gundan heta bi koka bazirganiyê, ji malbata dayikê heta bi rêxistiniya qebîle û eşîrê gelek pêşketin li vê qonaxa dîrokî rast tên. Di dîrokê de ev dem weke Serdema Nû ya Kevir tê binavirin û ev jî îşaret bi amûrên kevir ên pêşketî dike. Gavavêtina mejiyê mirov jî muhteşem e. Alav û amûrên mohra xwe heta li îro dixin, bingehê tevahiya wan hema hema hatiye vedîtin. Duyemîn dema dirêj a dîrokê ye. Ji sedî du yê mayî yekê wê yê vê demê ye. Civak dîsa jî bi awayekî bingehîn exlaqî û polîtîk e. Hê dewlet û huqûq li naverastê tinene. Desthilatdarî nayê naskirin. Dayik pîroz tê dîtin, forma xwedawenda jin tê bilindkirin. Gav hatiye avêtin dema qebr û perestgehên pîroz. Mirovên vê demê ewqasî dîrokî bûn bi miriyên xwe re li heman mekanî di nav hev de diman. Bermahiyên perestgeh û qebran ên dîrokî vê rastiyê mîna bixin çavên me hene. Em ne bi yên hov re, bi mirovên rastî û heqîqî re rûbirû ne.

Duyemîn dema sereke ya dîroka şaristaniya demokratîk, mirov dikare bi vî awayî xêz bike. Ev dem bi nirxên xwerû yên şaristaniya demokratîk tê temsîlkirin. Bi pêşketina zimanê sembolîk û aqil civaka exlaqî û polîtîk li nava qebîle û gundan demokrasiyê bi heybet pêk tîne û dibe ku ji vê ravekirinê hin ehlê fikrê loman bikin. Lê rastî bi vî rengî ye. Ya exlaqî û polîtîk e, dema demokrasiya herî saf û nişmî ye. Bi zêdebûna derfet û îmkanên berhemê zêde, ev rewş wê pêşî li ser civakê rê li ber hêzên hiyerarşîk, paşê jî rê li ber mêtinkarî û zordestiya sîstematîk a hêzên şaristaniya navenda wan bajêr, veke.

**b-** Vegotinên şaristaniyê yên ji wan re dîroka nivîskî tê gotin (her cure vegotinên mîtolojîk, dînî, zanistî) bi fermana afirînerê dîrokê têne destpêkirin. Dîroka behsa wê tê kirin dîroka nêzî pênc hezar salên dawiyê ye. Min dema analîza sosyolojîk hûrûkûr kir û bi nêzîkatiyên bi heman rengî re bi hêz kir, min dît ji sedî sed di bingehê îdeolojîk ên van tesewirên dîrokê de pîrozkirina mêtinkarî û zordestiyê heye. Polîtîka ekonomiya îro

ya qaşo zanistî jî di navê de, karûbarê ekolên zanistî kirî ew e, li ser keda civakê ya pêş de biriye; berhemê zêde bi dest xistiye û heta li ser nirxên civakê yên jiyanê îdeolojiyek çêkirine. Em wer fêhm dikin ku ji bo rastiyê veşêrin di warê îdeolojîk de gelekî hewl dane û zor bi kar anîne. Avakirina bajar-çîn-dewletê di heman demê de bi awayekî pirr mezin dema avakirina îdeolojiyê ye. Fonksiyona wan a bingehîn ew e, afirandin û pêkhatinê cuda nîşan bidin û di nava forma xwedayetiyê de vê weke serketina rahib, zilamê bi hêz û rêveber bidin xuyakirin.

Dîroka şaristaniya demokratîk divê berê pêşî ji vê sergirtin û berbendkirina îdeolojîk bibihure. Hingê ne bi tenê malbat, civaka gund û cotkariyê, avahiyên qebîle û eşîrê, em ê bajar-çîn-dewlet, desthilatdariya hiyerarşîk a hê berê hatiye avakirin û hê dewam dike, û mêtingehkirina pêşî a jinê baştir fêhm bikin. Guhertina paradîgmatîk wê vê hêza maneyê gelekî pêşve bibe.

Bêguman ji bilî komên sermayeyê yên yekdestdar ku weke şebekeya şaristaniyê ya bi sêbera bajar-çîn-dewletê cuda bûye, herçiqasî bi wan re di nava nakokiyê de be jî şaristaniya demokratîk bi rewşa qonaxeke nû dewam dike.

Di navbera bajar û derveyî bajêr de nakokî pêk hatiye. Lê meyla bajêr û derveyî bajêr a hevdu temam û yekpare dike xurtir e. Tevî ku şaxên şaristaniya demokratîk ên bajêr (kole, zenaetkar, jin) hene, şaxên bajêr ên diçin derveyî wê jî hene. Nexasim avahiyên hiyerarşîk ên bihêzbûyî, hevkarên rêveberiya bajêr û dewletê li derveyî bajêr in. Ya rastî, nakokî û pevçûn di navbera van herdu blokên civakî yên berjewendiyên wan ên maddî cudabûyî de diqewime. Di navbera şaristaniya demokratîk a hêzên komin û civaka exlaqî û polîtîk îfade dike û şaristaniya yekdestdar a sermaye û dewletê ku li bajêr li ser karkertiya kole, li derveyî bajêr jî li ser talankirina qebîle û gundan û xenîmetan avakirî de em hebûna gelek şerên dijwar ên îdeolojîk, eskerî û îdarî dibînin. Herweha di navbera rêveberiyên bajaran de jî timî li ser girtina para zêde şer hene. Di destanên Sumeran de klam û lorîkên bajaran bi me didin hiskirin ku şerê behsa wan tê kirin çiqasî dijwar qewimîne. Mirov dikare bibêje, avahiyên qebîle û eşîran bi

giranî di bin êrişên şaristaniyên bi koka xwe bajarî de bi gewde bûne. Di salên 4000-3000 B.Z. de avahiyên etnîk ên em li hebûna wan rast tên, bi herhalî wê berhemên vê demê bin. Em dizanin Sumerî û Misriyan nav li wan kirine. Sumeriyan ji yên li bakur û bakur-rojhilatê xwe re Ûryan, Aryen (yên bi koka xwe cotkar, qewmê çiyê, gir), ji yên rojavayê xwe re Amorît (yên bi koka xwe Semîtîk, proto-Erebên nebûne Sumerî), Gotî, Kassît û ji yên Çola Sîna ya Misrê dihatin jî Apîrû (mirovên tozgirtî yên ji çolê tên) digotin. Tê qebûlkirin ku navê Ibrî jî ji Apîrû zêde bûye. Bedenên li dora bajar û bircan hatine lêkirin, hebûna civaka dijber pirr baş piştrast dikin.

Em têra xwe ji şîddeta pevçûn û şeran fêhm dikin ku civakê şaristaniya li ser bingehê çînî bi hêsanî qebûl nekiriye. Em dibînin carnan gund û heta navendên şaristaniyan bi carekê hatine şewitandin. Xebatên arkeolojîk di vê mijarê de gelek dane û mînakan didin. Mezopotamya bi navendên cihûwarên pirrqatî yên gelek caran hatine şewitandin tijî ne. Mîtolojî û wêjeya ji vê demê mayî bi giranî van rastiyan nîşan dide. **Îlyada**ya Homeros weke versiyoneke di dereceya sêyemîn de ev rêûresma destanê ya bi koka xwe Mezopotamyayî nîşan dide. Hesîodos jî versiyoneke bi heman rengî pêkaniye û bi vî awayî panteona xwedayên Sumeran veguherandiye panteona Olymposê. Şer di şexsê qralan de şerê xwedayan e, û ev jî di tevahiya rêûresma destanên demê de heye. Wekhevtiya xwedayan bi qralan re gelekî diyar e. Navûnîşanên Firewn û Nemrûdan mînakên balkêş in, vê wekhevtiyê îfade dikin. Bi şerên li dijî civakên gundan talana ekonomîk û êsîrkirinê heye, li dijî qebîleyan jî bi armanca alavên xenîmet û êsîrkirinê, seferên bi heman rengî têne kirin. Şaristaniyan herweha talan û êsîrkirina hevdu jî weke rêyeke karbidestxistinê dihesibandin. Avahiyên xwe sipartibûn lihevkirin û îxtîlafên berjewendiyên maddî heta roja me ya îro dewam kirin. Her tiştî xwe disipart hesabê “Kî zêdetir mezin e?” Pirr eşkere ye ku yekîtiya xwedayê li ezmên weke sembola qraltiya herî mezin a li rûyê erdê hatiye tesewirkirin. Siltanên Osmaniyan bi xwe jî xwe weke Zîlûllah ango siya xwedê ya li rûyê erdê bi nav dikirin û ev jî vê rastiyê piştrast dike.

Mirov nakokiya bingehîn a di vê dema dîrokê de weke nakokiyeke bingehê wê çîna teng pêşkêş bike, wê bibe kêmasiyeke mezin. Çîna koleyan xizmetkarên herî milahîm ên perestgeh û efendiyên xwe ne, û heta tê dîtin ku weke beşekî ji wan tevdigerin. Yên şer dikin, eşîr û qebîleyên koletiyê red dikin û gundî ne. Wekî din yekdestdarên dixwazin para zêde zevt bikin misêwa şer dikin. Ber bi salên 1500'î B.Z. ve tê dîtin ku têkoşînên hegemonîk di navbera şaristaniyên Hîtît, Hûrrî-Mîtannî û Misrê de destpê dikin. Salên 1500'î cara pêşî li Rojhilata Navîn dema pêkhatina şaristaniya navendî ye. Dema 1500-1200'î di dîrokê de cara pêşî bi awayekî bi heybet di navbera pirraniya bajaran de mînakên hilatina hegemoniyayê û pêşbaziya reqabetwarî pêşkêş dike. Ev dem, demeke pirr bi heybet û bi tevger a dîrokê tê hesibandin. Civakên qebîle, eşîr û gundan jî pêşketina xwe dewam dikin. Bazirganî cara pêşî ewçend girîng bûye, dihêle ku li dora wê împaratorî were avakirin. Asûr û Fenîkiyan bi awayekî bingehîn hêza xwe ji yekdestdariya bazirganiyê digirt. Di salên 1500'î B.Z. de wexta ku şaristaniyên Çîn û Hindê gavên xwe yên pêşî diavêtin, tevahî Ewrûpa, beşên din ên Asyayê, Efrîka û Emerîkayê hê nû civaka neolîtîkê nas dikirin û pêk dianîn. Di dîrokê de du demên ez herî zêde wan meraq dikim; yek jê civaka gund-cotkariyê û neolîtîka 6000-4000 B.Z., ya din jî civaka bajêr, jiyana bajêr a di salên 1500-1200 B.Z. de ye. Orjîntî û afirêneriya vegotinên destanwarî û tempoya pêkhatinê ya van deman gelekî balkêş e. Ez yeqîn dikim ku têgînçêkirinên der barê xwedayetiyê û qehremaniyên destanwarî de bi giranî ji van deman mane.

Ez demên şaristaniyan ên pêşketin û belavbûnê ji aliyê zeman û mekan ve timûtim dinirxînim, ez niha jî dikarim van nirxandinên xwe weha bi kurtî îfade bikim:

**1-** Dîcle û Firat xwe bi sîstema çiyê ya Toros-Zagrosan xwedî dike. Ev sîstem bi deştan digihîje hev û qadên wê yên xwedî avhewayeke xwezayî ya ji bo avdaniyê di cih de û gelek cureyên heywan û nebatên wê hene. Piştî civaka nêçîrvan û berhevkar a bi heybet (perestgeha Xirabreşkê ya li Ûrfayê xwedî wan xisletan e ku vê pêvajoyê rave bike) li van qadan di salên 15000-12000 B.Z. de civaka gund û cotkariyê destpê dike. Heta bi

salên 6000'î B.Z. civaka gund û cotkariyê di qonaxa derbasbûna tam bi cihbûn û çarpîkan de ye. Di navbera salên 6000-4000 B.Z. de civaka gund û cotkariyê di dema xwe ya herî afirîner de ye. Ji salên 5000'î B.Z. ve xwe bar û belavî her deverê dike. Koçberî pirr kêm e, bi pirranî îxraca çandî heye. Di dema 5000-4000 B.Z. de çanda El-Ubeyd a li Mezopotamya Jêr bi avdaniyeke xurt wer mezin û bi hêz dibe, dikare li dijî Bakurê Mezopotamyayê dest bi siyaseta kolonîkar bike. Bermahiyên arkeolojîk hene ku belavbûna kolonyal a vê çandê di salên 4000'î B.Z. de li Mezopotamya Jor nîşan didin. Lê çanda herêmê bi xwe hê jî xisleta xwe ya serekebûnê diparêze. Serdema Ûrûkê di dema 4000-3000 B.Z. de bilind dibe. Hilatina bajêr temsîl dike. Destana Gilgamêş ev pêşketina bi heybet kiriye mijara xwe. Ûrûk ber bi bakur ve bi heman awayî belav dibe. Çandên herdu deman jî bi îhtîmaleke mezin di tevn, çêkirina kûzik û dizîkan de gavên berdar avêtine û bi vî awayî serdestî bi dest xistine. Dema 3000-2000 B.Z. dema Xanedanên Ûr ên klasîk in. Xisleta wê ya diyarker ew e, bajar zêde dibin û di nava wan de pevçûnên dewamî û dijwar li ser parvekirinê hene. Mirov ji van re dikare bibêje şerên pêşî yên ji nû ve parvekirinê yên yekdestdaran.

**2-** Mirov dikare bifikire ku dema neolîtîkê ya navenda wê Mezopotamya ber bi salên 4000'î B.Z. ve gav ber bi Çîn, Hind, tevahiya Ewrûpayê, bakur û rojhilatê Efrîkayê ve avêtiye. Dema 4000-2000 B.Z. li van qadana dema baş bicihbûna civaka neolîtîkê ye. Komên neolîtîkê yên bi koka xwe Qafqasî û Ewrûpî yên gelekî bi hêz bûne piştî salên 2000'î B.Z. pêleke berevajî rakirine. Mirovên bakur ên zerik û çavşîn ezbetên pêşî yên qebîleyên mezin êriş û koçberiyên wan ji Anatolyayê heta bi Hindistanê ref bi ref belav dibin. Ev pêvajo serûbinbûneke girîng a dîrokî ye. Êrişên wan xwe dirêjî heta navendên şaristaniyên Mezopotamya û Misrê kirine. Herweha di salên 4000-2000 B.Z. de hem qebîleyên Erebistanê yên bi koka xwe Semîtîk, hem qebîleyên çiyayî yên Aryen ref bi ref, qefle bi qefle êriş biribûn ser navendên şaristaniyê.

Di van tevgerên belavbûnê yên yekemîn ên kolonyalîzm û anti-kolonyalîzmê yên dîrokê de, li cem herdu cûreyên şaristaniyê jî pêşketin

çêdibin. Beşên hiyerarşîk ên qebîleyan dikevin pêvajoya dewletbûnê û gelek endamên qebîleyan jî tevlî çîna koleyan dikin. Di nava refên qebîle û eşîran de jihevcihêbûn çêdibe. Li aliyekî şaristaniyên nû yên bajaran zêde dibin, li aliyekî din jî piştgirî û rêxistiniyên qebîle û eşîran xurt dibin.

**3-** Wexta ku demên klasîk ên Sumer û Misrê di salên 2000-1500'î B.Z. de bi dawî dibin; demeke welê mewzûbehs e ku di dema Babîl, Asûr, Hûrrî-Mîtannî-Hîtît û Xanedaniya Nû ya Misrê de di navbera şaristaniyan de têkilî û nakokî pirr kûr bûne. Cara pêşî ye ku dema şaristaniya hegemonîk destpê dike. Demeke cuda ya globalbûnê heye. Ezbetên qebîleyan ên bakur teknîk û adetên din ên ji şaristaniyan girtine, li dijî navendên şaristaniyan bi kar tînin û tevî qebîleyên çol û çiyan êrişên xwe bê navber dewam dikin. Di teknolojiya sîlehçêkirinê de li şûna tûnc hesin cih digire û ev bi xwe re rê li gelek bûyerên nû vedike. Cara pêşî ye ku gera li madenê û bazirganiyê gelekî girîng dibin. Di lêkirina kelhe û bircan de zêdebûn heye. Mînakên pêşî yên bi heybet ên kelheyan berhemê vê demê ne. Bazirganî jî di asta jor de bi rola xwe radibe. Mezinbûna zêde ya Asûr û Fenîkeyan bi yekdestdariyên bazirganiyê dibe. Skît û Dor ji bakur, qebîleyên şervan ên Aramiyan jî ji başûr êrişê dibin ser şaristaniyê. Di encama van êrişên navbera salên 1500-1200'î B.Z. de şaristanî derbên xedar dixwe. Dema 1200-800 B.Z. zêdetir dema paşveçûnê ye. Hêza bi tenê li ser piyan maye Împaratoriya Asûr e.

**4-** Grek-Roma weke şaristaniya dawî ya mezin a serdema klasîk a serdema destpêkê, mîna ku tevahiya mîrateya herdu sîstemên şaristaniyê (Mezopotamya û Misr) ya heta dema xwe, dawerivandibin hinavên xwe. Ev pêvajoya şaristaniyê ya dema navbera salên 1000'î B.Z.-500 P.Z. di ser Asya, Efrîka û Ewrûpayê re belavbûna xwe dewam kiriye û herweha li hundir bi pêkanîna serdemeke klasîk alîkariya xwe kiriye. Serdema mîtolojîk girîngiya xwe ji dest dide, gavên dînî, felsefî û heta gavên pêşketinê yên orjîn ên zanistî têne avêtin. Împaratoriya Romayê ya asta herî jor a yekdestdarên sermaye û desthilatdariyê pêk dianî, li hundir bi têkoşîna partiya Xiristiyaniyê ya feqîran, ji derve jî bi berxwedan û êrişên qewm û qebîleyan ên ji çar aliyan ve ref bi ref dihatin ango di bin derbên

hêzên şaristaniya demokratîk de dema xwe û pê re jî tevahiya serdema destpêkê bi dawî dike.

**c-** Di nava pêvajoya dîrokî de ji aliyê şaristaniyan ve ya herî zehmetiyê diafirîne statuya rêûresma dînên Brahîmî ye. Hê jî tê guftûgokirin wê sê dînên bingehîn di nava şaristaniyê de çawa bêne bicihkirin.

Li ser bingehê analîzên xwe yên şaristaniyê, ez li ser van rêûresman gelekî hûrûkûr fikirîm û ez wan di nava du hêzên bingehîn ên şaristaniyê de weke tevgerên biserhevvekirî, tîpîk ên lihevhatinê yên li rêyeke navîn digerin (bi awayekî mîna tevgerên sosyal demokrat ên roja me ya îro) pênase dikim. Herçiqasî ez van tevgeran bi awayekî sembolîk weke bi pêşengiya qebîleya Ibranî têne rêvebirin destnîşan bikim jî divê mirov van dînan ji maneyeke nijadî wêdetir weke tevgereke aliyê xwe yê îdeolojîk bi hêz binirxîne û ev ê tespîteke di cih de be. Rêûresma Brahîmî herçiqasî weke tevgereke qebîleyê were pêşkêşkirin jî di cewherê wê de bi tevahî şaristaniyên dewletdar û demokratîk ên Rojhilata Navîn li ser bingehê rêyeke navîn têne nirxandin. Ne bi temamî tevgereke çînî ye, ne jî tevgereke qebîleyî ye. Herweha ne bi temamî îdeolojîk e, ne jî bi temamî exlaqî û polîtîk e. Ji her alî ve rêya navîn e. Ji derketina Hz. Brahîm (Ji salên 1700'î B.Z. em bibin heta bi Adem û Hawayê, mirov dikare bisipêre derketina şaristaniyên Sumer û Misrê) heta bi şopên wê yên roja me ya îro ev xisletên xwe parastine. Lê timî hem îlham daye herdu şaristaniyan, hem jî hêzên xwe (mebesta min hêzên wan ên maddî û manewî ne) ji mîrateya wan qut kiriye. Ji lewra hem dostaniya wan, hem jî dijminatiya wan kirine û bi vî awayî rê li bûyerên dîrokî vekirine.

Dînên Brahîmî yên deriyê serdema vegotinên mîtolojîk ên şaristaniyê dadan û bi rola pêşengiyê ya serdema dînî rabûn, di bin paradîgma me ya nû ya şaristaniyê de dikarin baştir bêne fêhmkirin. Şêweyê herî berbiçav ê vegotina serdema mîtolojîk vegotina xweda-qralan e. Divê mirov ji bîr neke ku zimanê qalkirin û vegotina serdemên pêşî bi mîtolojiyê bar kiriye. Di vî zimanî de weke îro gera li rasyonalîteyê hewldaneke tewş e. Bi tevahî eşya, bûyer û diyarde bi zimanê mîtolojîk behsa wan tê kirin. Mîtolojiya Serdema Sumer a di bin bandoreke giran a anîmîzmê (baweriya li ser

zindîbûna xwezayê hatiye avakirin) de pêk hat, zindîtiya xwezayê (mirov dikare jê re bibêje dînê klanan) hinekî veguherand û cara pêşî bi şêweyê xwezaya xwedayî û xwezaya ne xwedayî ji hev cihê kir. Rahibên Sumeran bi tevahî naveroka vedîtinên xwe ji civaka neolîtîk a Mezopotamya Jor girtin û li şûna vegotina xwedawenda dayik, giranî dan mîtolojiya bav, xwedayê mêr. Em veguherîna mezin a maddî ya di civakê de (pêşî nîzama hiyerarşîk a bi giranî di destê zilam de, paşê û pê re otorîteya bi şêweyê dewletê), nîşanên wê yên îdolojiya mîtolojîk a nû di derketina Enkiyê bi heybet de dibînin. Di vê mijarê de têkoşîna di navbera Xwedawenda Ûrûkê Înannayê (Koka xwe ji Xwedawenda Dayik a Mezopotamya Jor Star-Îştarê digire) û Xwedayê Erîdûyê Enkî (xwedayê pêşî yê zilam ê bajêr) de gelekî balkêş e. Înanna hewl dide ispat bike ka çima mafên xwedatiyê hemû yên xwedawenda dayik in (îddîa dike ku 104 Me'yên navdar, nodûneh fazîlet, qabîliyet, vedîtin, afirêneriyên hunerî yên jinê ne), lê xweda Enkî jê re waz dike ku mafên ew behsa wan dike girîngiya xwe nemane, divê weke jineke milahîm li bavê xwe guhdarî (Kengî xwe weke bav-zilam-xweda îlan dike, Xwedawend Înanna jî êdî xistiye statuya keç û jina xwe) bike. Çawa dişibe tevahî wazên sekuler, laîk, dînî û zanistî yên roja me ya îro! Ez bi xwe şexsî bawer dikim ku xwedayê pêşî yê van beşan hemûyan xweda Enkî ye. Enkî orjînal û resen e, yên din versiyon in (kopî ne). Nexasim xwedayên Olymposê di rêza sêyemîn û çaremîn de cih digirin û bi xwedayên Romayê re şêwazê vegotinê yê mîtolojîk vedimire.

Çawa ku tê zanîn, li gorî çîroka li ser Brahîm tê gotin, piştî pût-xwedayên li Panteona Nemrûdê Ûrfayê dişkîne wî diavêjin agir, paşê li şûna agir bi mûcîziyeke xwedayî gola pîroz pêk tê, kengî îmkanên wî yên li wan deveran bihewe namînin, ber bi welatên Kenan hîcretê dike (ya rastî ji qada şaristaniya Babîlê ber bi qada di bin destê Misrê de diçe). Heye ku bûyereke tîpîk a penaberiyê pêk hatiye. Eşkere ye ku îxtîlaf li ser mal, milk û bazirganiyê ye. Di wê demê de, cara pêşî di navbera şaristaniya Babîl û Misrê de hem dema reqabetê û hem jî danûstandina bazirganiyeke geş destpê dike. Ji ber vê reqabetê berjewendiyên ji rêûresmê yên bi hezaran kesên mîna Brahîm derbê dixwin. Bingehê maddî yê penaberiyê ev e.

Welatê Kenan di navbera herdu şaristaniyan de hinekî nîv serbixwe ye. Dema hegemoniyayê giraniya xwe daye ser, hîcretê destpê kiriye. Heye ku bi hezaran bûyerên hîcretê diqewimin û bi zimanê demê yê hevpar bi awayekî sembolîk qala bûyeran tê kirin. Nîşane hemû didin xuyakirin ku di demên herdu şaristaniyên mezin Babîl û Xanedaniya Nû ya Misrê de dema qral-xwedayên bi navûnîşana Nemrûd û Firewnan radibin, begtî û qebîleyên herêmî yên li naverastê û navberê mayî yên berjewendiyên wan zirardîtî bi wan re di nava pevçûn û nakokiyê de ne. Çîrok jî ya van bûyeran e. Ev begtî û qebîleyên berjewendiyên wan zirardîtî qebûl nakin ku Nemrûd û Firewn xwe weke xwedayan pêşkêş bikin û kengî keys û firsendê dibînin bi şikandina temsîlên pûtan wan protesto dikin. Bi kurtî, şerê li ser berjewendiyên maddî weke têkoşîna îdeolojîk xwe nîşan dide.

Bi îdeolojiyeke qral-xwedayan a herî kêm sê hezar salî re têkoşîn hêsan nîne; cesaret û qabîliyeteke mezin jê re divê. Vegotina mûcîzewî ya çalakiya berxwedanê ya Brahîm li Ûrfayê girîngiya xwe ji vê rastiyê ye. Cara pêşî ye ku evd li ber xwedayê xwe radibin. Bûyera mûcîzewî ya bêhemta ev e. Hem çalakiya maddî, şikandina pûtan heye; hem jî lêgerîna nû ya îdeolojîk mewzûbehs e. Xwedayê nû wê li ku û çawa bibîne, bi awayekî wê tesewira îdeolojîk a fikra xwe çawa pêk bîne, ev mijarên guftûgoyeke mezin in. Ev guftûgoyek e ku bi sedsalan dewam dike. Brahîm cara pêşî ji dengê îlhamê didiyê re dibêje “Wa hewe” –Ev ew e – (Yahweh) bi vî awayî bi dîtina îdeaya xwedayê xwe radibe. Koka gotinê dişibe Aryenî. Di wê demê de li Ûrfayê qebîleyên Aryenî piranî ne, û însiyatîf di destê wan de ye. Têkiliya Brahîm bi van qebîleyan re hê jî tê guftûgokirin. Bi îhtîmaleke xurt ‘Wa hewe’ hatiye gotin û paşê veguheriye Yehovayê. Yehova xwedayê pêşî yê Brahîm e; îhtîmaleke xurt e ku bi koka xwe ji çanda Aryen be. Piştî ku derbasî welatên Kenan bûye, tê zanîn veguheriye xwedatiya El, Ûla, Ellah.

‘El’ bi koka xwe Semîtîk e; di nava çola bêserûbinî de hesret û xisletên yekîtî û wekhevîtiya yeknesakiya qebîleyê nîşan dide. Li cem Mûsa duyemîn îlhama mezin wê bi **Deh Ferman**an were îfadekirin. Hevdîtina bi xwedê re li **Tûrî Sîna** (Tor = çiya), ya rastî, pirsgirêkên qebîleyan yên giran

dibin û gera Mûsa ya li çareseriyê îfade dike. Deh Ferman rêzik û pîvanên tîpîk ên nîzama qebîleyê bi rêkûpêk dikin. Eger em bi vî awayî Deh Fermanan li ber çavan bigirin em dikarin analîzê hûrûkûr bikin. Rêûresm wê xwe li cem Îsa jî nû û dubare bike. Hz. Muhammed jî bi heman awayî hevdîtinekê wê li Mekkeyê li Çiyayê Hîrayê li devera wehya pêşî girtî, pêk bîne. Pirtûkên Pîroz hevdîtinên bi heman rengî yên gelek pêxemberan rîwayet dikin. Eşkere ye ku di qonaxên girîng ên demê de em bi vegotina ji rêûresmê ya fikra rê nîşan dide û çalakiya wê re rûbirû ne. Vegotin û qalkirin bi vî awayî ye. Metna pîroz, diyarde û bûyerên xwezayî (Xwezaya Yekemîn û Duyemîn) û civakî bi zimanê demê yê vegotinê (retorîka demê) û îfadeya wê ya ez jê re şêwazê pêxemberan dibêjim, nîşan dide.

Ji aliyê mijara me ve, ez bi hêsanî dikarim bibêjim ku qonaxeke dîrokî îfade dikin.

**1-** Li ber du şariştaniyên mezin ên pêşî ku di dema xwe û dîrokê de bi xweda-qraltiyê têne rêvebirin, radibin.
**2-** Îfadeyeke nû ya îdeolojîk tê afirandin. Qral-xweda jî mirovên besît û ji rêzê ne, nabe ku xweda bibe mirov û afirînerê her tiştî Ew e (Gotina navdar a "Ev Ew e" vê îlhama mezin îfade dike), bi tenê Ew dikare bibe Xweda û Reb (efendî). Bi vî awayî vegotina xwe pêk tînin.
**3-** Ne ji qral-xwedê re, bi tenê ji Wî re serî tê danîn.

Prensîbên sereke yên îdeolojiya nû bi vî awayî ne. Di bingehê kulliyata bi heybet a dînên Brahîmî de îfadeyên bi van sê xalan mirov dikare bi kurtî bîne ziman, hene. Beşên berfireh ên civakê, piştî gelek tecrûbeyên xwe yên dîrokî, fêhm dikin ku tebeqeya jor bi tenê bi yekdestdariyê qîma xwe nayîne dixwaze xwe weke Xweda ferz bike. Ji lewra li ber tebeqeya jor radibin û pîrozbûnên nêzî berjewendiyên xwe bi vegotineke xwedayî pêşde dibin.

Mirov guhertinên ji aliyê civaka exlaqî û polîtîk ve diyar bike hê bêtir girîng e. Di civaka serdema qraltiyên xwedayî yên beriya wê bi du hezar salan de (3500-1500 B.Z.) civaka exlaqî û polîtîk derba mezin xwariye. Nexasim li şûna 'xwedatiya xwezayê' xwedayên mîtolojîk ên zilam cih

digirin. Xwedatiya Xwezayê têkiliyên ji dil, wekhev, necihêkar û zindî yên dayika xwedawend û tevahiya klan û qebîleyan îfade dike. Li aliyê din, xwedayên mîtolojîk ên zilam têne ferzkirin. Erd, ezman û deryayan diafirînin. Evd û xweda bi awayekî çor ji hev hatine kirin (di cewherê meseleyê de pêkhatina çîna kole û efendiyan e). Ev yek eşkere nîşan dide ku di warê îdeolojîk de civaka exlaqî û polîtîk derbeke mezin xwariye. Di çanda maddî û manewî de veguherîneke mezin heye. Vegotinên mîtolojîk bi îfadeyên vê tijî ne, yan jî hatine tijîkirin.

Eşkere ye ku di vê dema dirêj a dîrokê de sêbera rahib-qral-fermandar a ku perdeya xwe ya îdeolojîk û şebekeyeke mezin a maddî ya berjewendiyan berfireh li ser xwezaya civakî raxistine, wê derbeke mezin li xwezaya civaka exlaqî û polîtîk bidin. Wexta ku em bi vê paradîgmayê binêrin, em ê karibin li civaka dema du hezar salan baştir serwext bibin. Çêkirina têgînan karekî zehmet e; kedeke mezin jê re divê. Paradîgmaya rêûresma Brahîmî pêk tîne jî bêguman dema rabihurî ya Nemrûd û Firewnan a herî kêm du hezar salî jî dike têgîn û derbasî vegotineke hê maqûl û mirovî (dîn) dibe. Bêguman vegotina nû ya dînî jî metafizîk e. Ji rasyonalîte û zanista civakî ya roja me ya îro gelekî dûr e, û hay ji xwe heye. Lê dîsa gavavêtineke girîng a dîrokî ye. Bi temamî vegera civaka bi hêz a exlaqî û polîtîk a berê nabe. Exlaq bi temamî weke dîn tê pêşkêşkirin û ev yek ji Deh Fermanan gelekî baş tê fêhmkirin. Deh Fermanên Mûsa eşkere pîvanên exlaqî ne ku kirasê dîn li wan hatiye kirin. Aliyên wan ên baweriyê qels in, û di dereceya duyemîn de ne. Wê wextê em der barê civaka exlaqî û polîtîk de dikarin bibêjin, di vê demê de bi vê veguherîna gelekî girîng dîn ketiye şûna exlaq. Jiyana berê ya hê bêtir sade exlaqî û polîtîk ji her alî ve bi têgihiştina xwedayekî her deverê zevt dike, tê nixumandin. Jiyan bi perdeyeke hê berfirehtir a dînî tê nixumandin, sergirtin.

Mijara bingehîn a divê mirov bixe ber lêpirsînê ew e, polîtîka û exlaqê kirine dîn, çiqasî dijberê şaristaniyê (dewletdarî-çînî-bajarî) ye, yan jî ew bi xwe çiqasî şaristaniyeke nû pêk tîne, nayîne. Îro nexasim di bingehê guftûgoyên şaristaniya laîktî-Îslamî ya li Tirkiyê û Rojhilata Navîn de ev

rabihuriya dîrokî heye. Eger mirov li dînên Brahîmî binêre û bibîne çawa heta roja me ya îro beridîne, mirov dikare ji du aliyan ve bersivê bide.

Meyla yekemîn mirov dikare di tebeya jor de bibîne. Ev beş di demên xwe yên pêşî de rastiya desthilatdariyê ya Nemrûd û Firewnan dixwaze di bin perdeyeke nû ya îdeolojîk de (li şûna bi xwe bibe xwedê, dibe qasidê wî, siya wî, cîgirê wî) bimeşîne û li pey avakirina mîrtî û qraltiyên xwecihî ye (ev beş mîna rastgirên sosyal demokratan e). Brahîm hem bazirganiyê, hem rêbertiya qebîleyê bi hev re dimeşîne û ev jî statuya wî zelal dike. Zehmet nîne ku mirov tespît bike, Brahîm li pey avakirina begtî an jî qraltiyeke xwecihî ye. Naxwaze weke evdekî ji rêzê yê Nemrûd bimîne. Vê yekê hem ji aliyê dînî ve hem jî ji aliyê exlaqî û polîtîk ve rezîl dibîne. Îhtîmaleke xurt e ku Mûsa bi xwe prensekî muxalif be. Xwe disipêre kesên koka xwe ji qebîleya Ibriyan û isyan dike. Qebîleya Ibrî ji wan kesan pêk tê ku xizan in, di şertên nîv-kole de ne, bi temamî nebûne Misrî û xwedî xisletên xweser in. Jixwe weke qebîleyên ji Rojhilat hatî, weke mirovên tozgirtî têne bi navkirin. Li gorî vegotina Pirtûka Pîroz bi Firewn re hevdîtinên zor û zehmet têne kirin û di dawiyê de dikare ji Misrê veqete yan jî bi dizî hîcretê bike (Hz. Muhammed jî bi heman awayî hîcret kiribû). Çîroka çil salên li çolê bi hewldanên avakirina begtî û mîrtiyeke nû derbas dibe. Rêzik û pîvanan datîne, pêşde dibe. Li erdên xeyala wan dike ‘erdên soza wan hatiye dayîn’ digere. Çawa ku tê zanîn, ev utopya li derdora salên 1000î B.Z. li qada Îsraîl-Filistîna îro ji aliyê pêxember Samûel, Dawid û Silêman ve bi cih tê anîn. Pêşengiya bingehîn a îdeolojîk rahib Samûel dike. Piştî salên 1000'î B.Z. gelek begtî û mîregtiyên bi heman rengî têne avakirin. Mînaka dewleta netewe ya piçûk a di navbera du blokên mezin ên roja me ya îro de bi bîra mirov dixe. Ev meyl bi mînakên bi heman rengî îro jî nexasim li Başûrê Emerîka û gelek qadên din bi awayekî din dewam dike.

Meyla duyemîn, ya beşê hê xizan û radîkal a beşê antî-şaristanî ye. Haya wan jê heye ku şaristanî pirsgirêkên wan girantir dike. Di Qraltiya Pêşî ya Îsraîl-Yehûda de jî ev nakokî têra xwe hebû. Rahibên mîna Samûel bi dijwarî li ber pêşengên dibûn qral radibû û ev jî hinekî vê rastiyê nîşan

dide. Di derketina Îsa de rewş hê bêtir zelal û diyar dibe. Di nava qewmê Ibrî de jî di dema xwe de cihêbûna çînî kûr bûye. Nûnerên tebeqeya jor a bi Romayê re hevkariyê dikin weke xwediyên Qraltiya Yehûdayê, Îsa gunehbar dikin ku ji binî ve qebra wan dikole û lewma hem wî didin girtin (Yê giliyê Îsa kir Yehûda Îskaryot e, Cihûyek e ku bi Romayê re hevkariyê dike û hawariyê sêzdehmîn e) hem jî wî li çarmîxê dixin. Di çarmîxkirina Îsa de Waliyê nûnerê Romayê zêde israr nake; lê nûnerên qraltiya Yehûdayê pirrtir çarmîxkirina Îsa dixwazin. Eşkere ye, Îsa ne bi tenê nûnerê Ibriyan, yê tevahiya qewmên Roma û Persan ew xizan kirine (di serî de Yewnan, Asûrî, Ermenî qewmên hingê şaristanî ava kirî)weke nîşaneya partiya pêşî ya mezin a înter-qewmgir tê qebûlkirin. Li dijî şaristaniya klasîk tevgereke nû bi pêş dikeve. Endamên vê tevgerê tam sêsed salan her cure birçîbûn û êşkence li ber çavan girtin û di bin erdê de jiyaneke antî-Roma, antî-Sasanî meşandin. Paşê rêveberiya jor a zêde polîtîkbûyî (konseya rahiban, konsula wan) di dema Împaratorê Romayê Konstantîn de bi awayekî fermî bi dewletê re hevkarî kir û hingê Xiristiyantî li Bîzansê li duyemîn Romaya mezin a hat avakirin bû organê îdeolojîk.

Li hemberî vê, berxwedaneke dijwar a mezhebên beşên radîkal û xizan heye. Vê rewşê bi sedsalan dirêj ajotî ye. Arîûsgir, Suryanî û Gregoryanî girîng in. Eşkere ye ku têkoşîna çînî, heta qewm û qebîleyên di bin zordestiyê de têkoşîna wan a civaka exlaqî û polîtîk di bin perdeya dînî de tevahiya sedsalan dûvdirêj meşiyaye. Di Xiristiyantiyê de guftûgo hatiye kirin, gelo Îsa ji xwezaya xwedê ye, yan jî ji xwezaya mirov e. Guftûgoyeke bi vî rengî di Xiristiyantiyê de hêmana bingehîn a cudabûna mezheban e. Koka wê diçe heta mîtolojiya Sumer. Tebeqeya jor xwe ji ezbet û zuriyetên xwedayan hesibandiye, li hemberî vê jî hatiye gotin, yên di tebeqeya jêr de ti carî nikarin ji zuriyet û ezbetên xwedê bin. Vegotinên bi vî rengî dînên Brahîmî dûrûdirêj mijûl kirine. Di vî warî de helwesta Hz. Muhammmed zelal e: mirov xwedê nîne, bi tenê dikare bibe evd û qasidê wî. Di Xiristiyantiyê de rewş bi nakok e. Mezhebên bi koka xwe ji xizanan pêk tên (Arîûsgir) îdea dikin ku Îsa ji zuriyeta mirov e, kesên bi rola hevkarên

desthilatdariyê radibin zêdetir meyla wan nêzî wê îdeayê ye ku Îsa ji zuriyeta xwedê qebûl dike. Cewherê meseleyê bi çînîbûnê re têkildar e. Têkoşîna antî-şaristanî ya di salên 3000-1500 B.Z. de bi baweriyên xwecihî û baweriyên mîtolojîk ên fermî yên veguherî hem xisletên xwe yên çînî û hem jî yên etnîk hene. Hesretên azadiyê zelal in.

Eşîr û qebîleyên bi koka xwe Aryen ên li qada Toros-Zagrosê bi têkoşînên mezin di salên 2150'î B.Z. de silaleya Aqad hildiweşînin û li şûna wê silaleya Gotî-Godeayê ava dikin, dîsa tevî Kassîtan di sala 1596 B.Z. de bi Hîtîtiyên Babîl dagirkirî re hev digirin, di salên 1500'î B.Z. de Konfederasyona Mîtannî ya navenda wê Serêkaniya îro, ya ku hêza xwe bi tevahiya bajarên Misr û Mezopotamyayê da qebûlkirin ava kirin û ev rastiya van qebîle û eşîran îfade dike.

Rêûresma berxwedana Brahîmî piştî vê qonaxa dîrokî pêş ketiye û heta roja me ya îro bi şêweyên cuda li ser pêkhatinên dîrokî bi bandor bûye. Dîsa jî rast nîne ku mirov rêûresma Brahîmî bi tevahî ji mîtolojiyê qut bike. Beşekî mezin bûyerên (di serî de çîroka Adem-Hawayê) di hersê Pirtûkên Pîroz de cih digirin di mîtolojiyên Sumer û Misrê de hene. Cudahî ew e, di serî de der barê xwedê de, li ser veguherînên deman derbaskirine. Ya girîng ew e, civaka exlaqî û polîtîk xwe bi îfadeyên bi hêz ên dînî û îdeolojîk ên xwecihî ferz kiriye. Dîn bi giranî berxwedaneke exlaqî ye. Nexasim rêûresma Zerdeşt veguherîneke bi koktir îfade dike. Rêûresma Zerdeştî weke çavkaniya herî zêde bandor li dînên Brahîmî kirî, bi giranî doktrîneke nîv-felsefe û nîv-dîn e, şaxên xwe diçe civaka exlaqî û polîtîk a bi cotkarî û heywan xwedîkirinê re li çiyayên Zagrosan debara xwe dikirin. Zerdeşt xwedayê bi koka xwe Semîtîk bi nîdaya xwe ya navdar "Bêje, tu kî yî?" dixe ber lêpirsînê û ev jî qutbûneke bi kok nîşan dide. Yekem car li şûna 'pîroztiyê' têgînên 'qenc' û 'xirab', 'ronahî' û 'tarî' bi cih dike û wê pêşî vekira li ekolên etîk (zanista exlaq) û felsefî yên ku Grekan wê ew gelekî pêşde bibira. Grek nexasim bi rêya Medan ji bo gelek tiştan deyndarê rêûresma Zerdeştî ne. Mirov dikare vê yekê di **Dîroka Heredot** de bibîne ku beşekî wê yê mezin li ser Medan e. Rêûresma Zerdeşt hê jî di nava qebîleyên çiyayî û civakên mezin ên cotkar ên Aryenîk ên nebûne

mêtingeh de rastiya civaka exlaqî û polîtîk nîşan dide. Civakeke têde koletî zêde pêş neketiye, têde jiyana azad bi hêz e, wê rastiya civaka exlaqî û polîtîk îfade bike û ev xusûsek e, tê fêhmkirin.

**d-** Di şaristaniya Grek-Romayê ya dema dawî ya serdema destpêkê de hersê rêûresm bi hev re hebûn. Dema qral-xwedê ya ji rêûresmê, li herdu nîvgiravan qonaxa pêşî pêk tîne. Weke mîtolojîk zêdebûna dawî ya ji orjînên Sumer û Misrê ne. Serdema mezin a dawî ya rêûresma mîtolojîk (li Olymposê Zeûs, li Romayê Jupîter) dema Qraltiyên Etrusk û Spartayê ye. Di dema Komara Romayê (508-44 B.Z.) û Demokrasiya Atînayê (500-300 B.Z.) de vegotina mîtolojîk her diçe vedimire, rêûresma felsefî jî derdikeve pêş. Sokrates û Cîcero xetîbên navdar ên vê demê ne. Welatiyên Atîna û Romayê yên bi hêsanî dev ji rêûresmên xwe yên azad ên berê bernadin, hê jî gelekî bi rêûresma civaka exlaqî û polîtîk ve girêdayî ne. Bi sîstema împaratorî û qraltiyê re gelekî têkoşiyane. Têkoşîna giregirên arîstokrasiya Spartî û Romayî yên Atînayê bi Sezar re kirin, vê rastiyê nîşan dide. Sokrates û Cîcero fîlozofên exlaq û felsefeyê ne. Di doktrînên pêşî yên li ser bingehê siyaseta demokratîk û etîk de navên girîng in. Herçiqasî di tevahiya civakê de nîşan nedin jî Atîna û Roma hêzên xwe ji rêûresma civaka exlaqî û polîtîk ya ku hê jî xwediyê rehên xurt e, digirin û ji vê guman nayê birin. Saziya koletiya bi sînor, nabe ku mirov wan hem bi girseyên welatiyên azad ên bi hêz ên li qadên li derveyî bajaran û hem ên li bajaran re bide ber hev. Ji ber ku rola wan di pêşdebirina doktrînên li ser komar û demokrasiyê de girîng e. Komara Romayê û Demokrasiya Atînayê ji ber ezmûnên Augustus û Skender şikestin û ev paşveketineke girîng îfade dike. Divê neyê jibîrkirin ku beşekî mezin nirxên erênî yên ji dema Roma û Atînaya klasîk mayî berhemên Komar û Demokrasiyê ne. Cara pêşî ye ku di dîroka nivîskî de derdikeve pêşiya me, bi tevahî civakên exlaqî û polîtîk nebin jî bi komar û demokrasiyê baştir hatine îfadekirin. Ji bo karibin bi temamî bêne îfadekirin, divê ji demokrasiya temsîlî bibihurin û demokrasiya yekser mirov tevlî dibin, pêk bînin.

Rola Xiristiyantiyê di împaratoriyê de ku rêûresma sêyemîn e, di dema pêşî de hilweşîner e. Heta bi hilweşîna Romayê (476 P.Z.) tevî êrişên

qebîleyên Germen yek ji hêza sereke ya şaristaniya demokratîk e. Bi mezinbûn û bilindbûna împaratoriya Bîzansê re dibe nûnerekî paşverû yê şaristaniya fermî ya dewletdar. Lê temsîlkirina wê ya bi rêya mezhebên muxalif ên pirr bi hêz jî nîşan dide ku Xiristiyantî rola xwe ya pozîtîf di pêşketina şaristaniya demokratîk de dewam dike.

Weke encam, sîstema şaristaniya klasîk a sipartî sêbera bajar-çîn-dewlet (şebekeyên yekdestdariya sermaye û desthilatdariyê) a sê hezar û pênc sed salî, tevî ku karektera xwe ya hegemonîk a navendî her ku çû pêşde bir, ji aliyê du pêkhateyên sereke yên divê antî-şaristanî (Xiristiyantiya antî-şaristanî û dîsa êriş û berxwedanên qebîleyên antî-şaristanî weke Germen, Hûn, Frank) bêne hesibandin hilweşiya (hilweşîna Romayê hilweşîna serdema pêşî ye) û ev jî pêşveçûna seyra dîrokî gelekî eşkere nîşanî me dide. Di nava hêzên şaristaniya demokratîk de rizîna di tebeqeya jor de pêk hat û şaristaniyên klasîk ên jê zêdebûn vê rastiyê naguherin. Divê neyê jibîrkirin ku bajar û sahayên şaristaniya klasîk hê jî mîna giravên li nava okyanûsên hêzên demokratîk in (qebîle, qewm, dîn, mezheb û rêxistiniyên zenaetkariyên bajêr). Mirovatî ji civaka exlaqî û polîtîk negeriyaye. Şerên hezar salan ji nêz ve bi vê rastiyê re têkildar in. Ya dixwaze xwe bi awayê dînî dewam bike, ya rastî meyla azadiyê ya xwezaya civakî ye; dixwaze weke civaka exlaqî û polîtîk xwe dewam bike; rastiya wê ya hebûnê ye. Ev tespît pirr girîng e.

**e-** Pirsgirêka bingehîn ji aliyê dînê dawî û mezin ê Brahîmî Îslamiyetê ve ew e, gelo dewama şaristaniyên klasîk e, yan jî dengekî xurt ê şaristaniya demokratîk e. Ez yeqîn nakim ku ev guftûgo hê ji hev hatibe derxistin. Bajarê Hz. Muhammed lê derket Mekke li ser bazirganiyê hatiye avakirin. Li gorî xwe hînterlandeke xwe ya fireh heye. Bakur-Başûr, Rojava-Rojhilat rêyên bazirganiyê tê re derbas dibin. Mîna ku bazareke navendî ya qebîleyên Ereban be. Li Mekkeyê ne tenê malên xwe, fikrên xwe, nîşaneyên xwedayên xwe û koleyan jî li vir pêşkêş dikin. Tevî rêûresma dînî ya Brahîmî, rêûresma dînî ya mîtolojîk û heta yên anîmîst li vir deng vedidin. Hec, navenda serdanê ye. Di dema jidayikbûna Hz. Muhammed de serdema pêşî derbasî serdema navîn dibe û yek ji du

împaratoriyên wê demê Bîzans li bakur heta bi Şamê daketiye û milê fermî yê Xiristiyantiyê di bin kontrola xwe de hildigire. Rahibên Suryanî zêdetir di pozîsyona muxalif de ne, Xirîstiyankirina Sasaniyan bi lez kirine. Sasanî jî ji bakur-rojhilat di ser Nîvgirava Erebîstanê re li pey belavkirina hegemoniya xwe ne. Li başûr-rojava li ser Yemenê bandora Hebeşîstana Xiristiyan (li Rojhilatê Efrîka Etiyopya îro) belav dibe. Rêûresma herî kevin Cihûtî ketiye her aliyê nîvgiravê. Ji çavkanî û jêderin milk û bazirganiyê sûdê werdigirin.

Qebîleyên Ereb ên xwecihên rastî yên nîvgiravê bûn, di nava pêxîrtengiyeke kûr a sosyo-ekeonomîk de bûn. Ji ber ku hebûna hêzên şaristaniyên heyî, nikarîbûn weke di dîrokê de kirî êrişê ji çar aliyan ve bibin ser dewrûbera xwe. Çawa ku tê zanîn, beriya şaristaniyên Sumer û Misrê, ezbetên Semîtîk êriş dibirin ser qadên neolîtîkê yên berhemdar û piştre şaristaniyên bajaran. Axirr qebîleyên Ereb di demeke welê de ne, gelekî tengav bûne. Ango di rewşeke welê de ne, weke baloneke zêde nepixî li ber teqînê ne. Ji bo ezbetên Semîtîk bi awayekî berfireh belav bibin, mîna ku Ereb li benda mûcîziyekê bûn. Îslamiyet navê vê mûcîzeyê ye. Eşkere ye ku Muhammed li zeman û zemîn baş serwext bûye. Bi tevahî xisletên ku pêdiviya dema nû ya dîrokê pê heye, di kesayeta xwe de dihewîne. Ji ti rêûresmên heyî yên îdeolojîk re nabe mirîd. Musewîtî û Îsewîtiya ku Ehlê Kitêb in, Sabîîn û Zerdeştî bandorê lê dikin. Helwesta wî ya li dijî pûtan dişibe ya Brahîm; haya wî jê heye ku ev ê ji armancên wî re xizmetê nekin. Çalakiyên wî yên pêşî yên propaganda û eskerî li dijî yekdestdariyên bazirganiyê yên Mekkeyê ne. Baş dizane ku heta bandora wan neşkîne wê nikaribe ji dînamîzma qebîleyan sûdê werbigire. Wehyên der barê Ellah de ku ji nû ve şîrove dike, pirr dişibe rêûresma Mûsa ya Deh Fermanan. Eşkere ye ku hewl dide ji sedî sed hedefeke exlaqî û polîtîk bi qebîleyan bide qebûlkirin. Eger naveroka têgîna Ellah bê tehlîlkirin (li ser bingehê 99 navan), wê bê dîtin ku Hz. Muhammed hewl daye utopyayeke civakî ya herî bijare ava bike. Hz. Muhammed di dema Medîneyê de ku lê dibe hêzeke siyasî, utopya xwe zêdetir zelal kiriye.

Serketina çalakiyên pêşî mûcîzewî hatine dîtin û kiriye ku baweriya wî ya bi wî zêde bibe. Şêwazê xebatê yê Muhammed li Medîneyê ji aliyê mijara me ve zêdetir girîng e. Cihê jê re camî tê gotin, ya rastî bi rola meclîs û civateke demokratîk radibe. Di destpêkê de bi tevahî pirsgirêkên civakî di civînên li camiyê de têne guftûgokirin û li wir li rêyên çareseriyê tê gerîn. Heta bi mirina wî jî camî vê rola xwe dewam dike. Rîtuelên îbadetan jî (nimêj, rojî, zekat) di çarçoveya xebatên perwerdeyê de bi armanca xurtkirina kesayetê têne kirin. Di cewherê Îslamiyetê de gavavêtinên bi vî rengî hene û kes nikare vê înkar bike. Gelekî eşkere ye ku di bin perdeya dînî de be jî bi temamî civaka exlaqî û polîtîk bi dînamîzmeke bi hêz tê zindîkirin û geşkirin. Ji lewra eger em ê behsa Tevgereke Muhammedî ya rast, Îslamiyeteke Muhammedî bikin, divê em bibêjin wê li ser bingehê demokrasiyeke ku mirov karibin rasterast tevlî bibin û civaka exlaqî û polîtîk ava bikin û pirsgirêkan li dawî bihêlin, dibe. Çawa ku tê zanîn Hz. Muhammed di hin çalakiyên xwe de zêde daye navê, lê çûye, û ew bi xwe jî dudil bûye. Nexasim di mijara Cihûyan û Qibleyê de, ji ber hevkariya qebîleya Cihûyan Qureyzeyê bi arîstokrasiya Qureyş re tevahiya mêrên wan dide ber şûran. Eger di vê mijarê de çareseriyeke rast bihata dîtin, belkî jî di wê demê de nakokiya Ereb-Ibranî bihata çareserkirin û Îslamiyet jî wê zêdetir berfireh bibûya.

Lê mirov dikare Îslamiyetê bi tevahî weke tevgereke nêzî wekhevî, azadî û demokrasiyê binirxîne. Di demeke pirr kin de li qadên şaristaniyên berê li beşekî mezin belav dibe û mirov nikare vê bi zora sîleh û şûr ve girê bide. Bêşensiya Îslamiyetê ew e, ji Tevgerên Musewî û Îsewî gelekî zûtir di demeke pirr kin de wê ji hêzên şaristaniyê re dikin destik û maşik. Di ser derketina wê re hê pêncî sal derbas nebûbûn, li Şamê bi xanedaniya Muawiye re mîna veguherînin rola pîneyekî bi hêzeke şaristaniya klasîk ve tê kirin. Qetilkirina Ehlî Beytê, pê re gelek xisletên erênî yên di naveroka wê de jî qetil dike. Li gorî min Îslamiyet di wê demê de hatiye qedandin. Mezhebên weke peyrewên Ehlî Beytê şikil digirin û Îslama beşên hê feqîr Xaricî jî ji rêûresma hêjayî destnîşankirinê ne. Milê Ehlî Beytê Şîatî li Îranê ji Xanedaniya Safewî û pêve dikeve ser rêya şaristaniya fermî û antî-

şaristantiya di cewherê wê de pûç dibe. Elewiyên Kurdistan û Anatolyayê jî bi sedsalan di bin zordestî û zilma dijwar a rêûresma desthilatdariya Sunnî de bi tenê karîbûn hebûna xwe di asta civaka exlaqî û polîtîk de dewam bikin. Nikarîbûne di pêşketineke sîstematîk de bi ser bikevin. Şax û milên din jî rewşa wan cuda nîne. Xaricî, Karmatî û yên mîna wan gelek tevgeran xwestiye Îslamê bi awayê wê yê herî hişk weke tevgera çînên bindest pêk bînin. Ev xisletên wan dibin sedem ku bi awayekî bêrehm bêne tesfiyekirin. Di bin perdeya Îslamê de bi vî rengî hebûna mîrateyeke pirr dewlemend heye û divê were lêkolînkirin. Ji bo vê yekê dîroka demokratîk hewce dike. Ji sedî sed Îslamiyeta di şexsê Muhammed de mewzûbehs nehatiye kirin. Ji aliyê Îslamiyeta Muhammedî ve mirov li tevahiya demên Emewî, Abbasî, Selçûkî, Osmanî, Safewî û Babûriyan binêre, mirov nikare behsa Îslamê bike. Ji ber vê yekê, gelek mezheb û terîqet pêk hatine. Serketineke ciddî nîne. Bi tenê feydeya xwe ew e, yekdestdariya xasûk a bazirganiya Mekkeyê (di şexsê Muawiye de) gelekî hêz bi dest xistiye, arîstokrasiya qebîleyên din (emîr û şêxên wan) yekdestdariya bazirganî û desthilatdariya di xewna xwe de nikarîbûn bibînin bi dest xistine, gelekî berfireh bûne û zêde destketiyên xwe hene. Eşkere ye ku ev jî bi Îslamiyetê re xiyanet e.

Tê zanîn, Hz. Mûsa û Hz. Îsa jî xiyanet li wan hatibûn kirin. Lê xiyaneta li Hz. Muhammed hatî kirin hê berfirehtir e. Tê zanîn, Îslama sedsala 19. û 20. di belavbûna mêtingeriya Ingilîstanê ya Rojhilata Navîn de çawa hat bikaranîn, di pêkhatina dewletên netewe de (bi tevahî Ereb, Îran, Tirk, Afganistan, Pakistan, Endonezya û hwd.) çawa roleke milletperest a paşverû dane ber û pê dan lîstin. Di roja me ya îro de jî tevî radîkalîzma El Qaîdeyê ya ku çi ye ne çi ye diyar nîne, pêkhatinên mîna Konferansa Îslamê yên hebûn û tinebûna wan yek e (Ez behsa gelek pêkhatinên bi navê Îslamê nakim. Ez behsa wan pêkhatinan dikim ku bi tenê di warê nav de têkiliya wan bi Îslamê re heye û pirraniya wan rêxistiniyên kapîtalîst, modernîst û milletperest in), hewl didin hebûna xwe ispat bikin û ev ji aliyê Îslamê ve tê wê maneyê ku di dema xwe ya herî bê mane de ye. Ez Hz. Muhammed û Îslama wî ciddî digirim; lê nexasim bi şertê li ser şêwazê

nêzîkatiya wî ya der barê fikir, exlaq û polîtîkayê de pirr bê guftûgokirin û kesên bi navê Îslamê radibin bi qasî misqalê zerre hurmeta wan hebe, divê ji vê rastiya Muhammedî ya derkeve holê re bi rêz bin û pêve girêdayî bin. Ez hêvî dikim ku di beşên pêş de hinekî din bi vê mijarê dakevim û rave bikim.

Ez hewl didim serdema navîn (476-1453 P.Z.) bi Îslamê û Hz. Muhammed ji hev derxim, lewma divê mirov ji vê loma neke û fêhm bike. Ji ber ku dîroka serdema navîn ne di çarçoveya bicihanîna wê de, bi xiyaneta bi nav û cewherê wê re bi rastî serdemeke 'Îslamî, Muhammedî' ye. Pêşengê sîstema hegemonîk a roja me ya îro jê re kapîtalîzm tê gotin, bi rastî ev Îslam e. Yekdestdariyên bazirganiyê cara pêşî di vê serdemê de derdikevin asta herî jor. Navenda şaristaniyê hê jî Rojhilata Navîn e. Demeke pêş e, bi tevahî dekûdolab û lîstikên kapîtalîzmê hatine vedîtin û bicihanîn. Venedîkê tevahiya sêsed salan bi van yekdestdariyan re hevkarî kir û çanda maddî ya Rojhilata Navîn veguhest. Xiristiyantiyê jî çanda manewî ya Rojhilata Navîn di navbera sedsalên 6. û 10. de veguhestibû tevahiya Ewrûpayê. Di dema sedsalên 8.-12. de ku ji vê demê re Ronesansa Îslamî tê gotin, hêzên şaristaniyê weke wan bejinbohst û bucirkan bûn ku li ser rêûresma şaristaniya hezar salan rûniştine.

Rojhilata Navîn çi rewşa wê ya îro ya asêbûyî, çi jî ji sedsala 12. pêve timî serberjêr çûna wê, ez bi xiyaneta bi navê Îslamê di nava têkiliyeke nêz de dibînim. Xiyanet ji nava tevgereke di buhayê zêr de jî derkeve, dîsa jî bi tenê dikare ya herî xirab bike. Ya di nava Îslamê de qewimî û pêkhat jî ya rastî vê rêzik û pîvanê piştrast dike. Ez vê xusûsê girîng dibînim û bawer dikim ku Muhemmediyan jî herî kêm bi qasî Musewî û Îsewiyan guftûgoyeke rastî ya teolojîk, etîk, felsefî, hunerî û polîtîk pêşdebiribûna û encamên wê gihandibûna civaka exlaqî û polîtîk, navenda hegemonîk a şaristaniya klasîk wê neketibûya destê Rojavayê. Ji vê jî girîngtir, li şûna şaristaniya klasîk şaristaniya demokratîk dikarîbû bi rola sereke rabûya.

Rêûresma Musewî û Îsewî ya ji Rojhilata Navîn vekişiya Ewrûpayê zêdetir li guftûgoyê vekirîbû. Bêguman dogmatîzma di cewherê rêûresma dînî de heye, rewşa xwe ya astengbûnê wê bi awayekî ciddî dewam

bikirana. Lê belê, karîbûn nirxên çanda manewî ya Rojhilata Navîn ku bi tevahî ne têgînên tewş in, li Ewrûpayê belav bikin û li gorî diyalektîkê vê yekê kir ku pêşketina qutba felsefî û zanistî bi lez bibe. Li Rojhilata Navîn a Îslamî ya nehatiye kirin û hê destûr nayê dayîn were kirin ew e, rêz were girtin ji vê guftûgoya diyalektîk û encamên wê re. Naxwe di pêşketina cotkarî û bazirganiyê de beriya hezarên salan gelekî li pêşiya Ewrûpayê bûn. Di îndustriya manîfakturel de ji Ewrûpayê ne kêm bûn. Bi kurtî, Tevgera Muhammedî dikarîbû bibûna gavavêtineke hêjayî dîroka Rojhilata Navîn. Lê şovenîzma têra xwe çavkorî ya qebîleyan, çawa ku Îbn-î Xeldûn di dema xwe de ji hev derxistî, bi şêweyekî mîna meylên milletperest ên faşîst ên roja me ya îro hê di derketina destpêka Îslamê de li ser hatin ferzkirin û bi vî awayî serdema navîn hewante çû û hat hebakirin. Sîstema şaristaniya navendî ya li Rojhilata Navîn ket meyla serberjêrçûnê, ji sedsala 15. pêve li Ewrûpayê dîsa berjor ve bilind bû. Kombûna çanda maddî û manewî ya di deh hezar salên piştî şoreşa cotkariyê de pêkhatî, wê pêngava xwe ya nû di vê demê de û li ser vê cografyayê pêk bianiya.

Ya ez dixwazim li vir bikim, ji pêşkêşkirina pêşnûmeyeke dîroka şaristaniyê wêdetir, ez dixwazim ceribandinekê li ser pênaseya wê, cihê wê, çi ye û divê fonksiyona wê ya dîrokî çawa be, bikim. Ez yeqîn dikim ku ji sedî sed hewcedariya dîrokê bi vê ravekirinê heye. Naxwe em ê çawa karibin maneyê bidin gavavêtinên ji wan re mûcîzewî têne gotin. Em ê çawa karibin li dîrokê serwext bibin heta em berxwedan, şer û avahiyên weke kominan di nava atmosfereke çandî ya pirr dewlemend a hezarê salan de li dijî yên xwe xwedê îlan kirî û xwestî kokên wan biqelînin, li ser wan pîşeyên bêrûmet ên weke koletî, karkertî û pîrektî ferz bikin, hemû nirxên wan ên maddî û manewî talan bikin, ji hev derxin? Em heta li dîrokê serwext nebin em ê mirovatiya xwe çawa nas bikin? Eger hurmeta me ji aqil, exlaq û weke hunerê azadiyê siyasetê re hebe ku ev nirxên civakî ne dest ji wan nabin, divê em van pirsan bikin û bersiva wan bidin. Ne bi çîrokên çînî yên teng, ne jî bi şovenîzma qebîleyan em dikarin çareseriyan pêşde bibin. Em heta bûyerên mehşerî yên di xwezaya civakî de diqewimin sîstematîze nekin, sedem û encamên wan daneynin holê, em weke mirov

nikarin hebûna xwe pênase bikin. Hingê jiyana me nikare bigihîje maneya xwe. Şebekeyên li ser pişta civakê yekdestdariya sermaye û desthilatdariyê ava dikin, li ser navê şaristaniyê gelek caran propaganda dikin û vê yekê weke dîrok pêşkêş dikin, lê bi van vegotinên wan dîrokeke manedar a mirovatiyê dernakeve holê. Şebekeya kapîtalîst propaganda dike ku dinyayeke bi tenê heye û dawiya dinyayê ye. Hewldana şaristaniya demokratîk a civaka dîrokî, ne bi tenê ji bo dawîanîna li vê xapandina wê, ne jî bi tenê ji ber ku bi qasî mirov bifikire û tesewir bike dinyayên nû hene, belê ji ber hewcedariyên dest ji wan nabin û pêdiviya bi wan e.

Dogmatîzma serdema navîn a mirov tine dike hê nehatibû hilweşandin, vê carê dogmatîzma dewletên netewe yên gelekî ji wan xirabtir bi ser de hat û zêhnê mirovan teslîm girt. Dîrokên neteweyan ên ji şovenîzma qebîleyan hezar carî zêdetir şovenîst, mirovan li hemberî rastiyan serkorî dikin û tine dihesibînin, çolên nû yên zêhnî afirandin. Ji bo afirandin û piştrastkirina van dîrokên rezîl, xwîn mîna lehiyê rakirine, rijandine. Milletperestiya ku ji pûtê herî paşverû wêdetir ti tiştekî din nîne, pûtê dewleta netewe tevahiya mirovahî da ber xwe û peritand. Di dîrokê de, di demên weke demên herî tarî bi navkirî de jî civakên mirovan evqasî nebûbûn xwediyê zêhnên çortanî û seresere. Ji ber ku ez jî dizanim mirovahî ti carî nekete vê rewşê, hewl didim tiştekî bikim.

Ez divê careke din diyar bikim ku rastî, tiştekî welê ye, heta dîroka xwezaya civakî neyê zanîn wê ti carî neyê fêhmkirin. Ji ber ku min demeke dirêj di bin bandora modernîteya kapîtalîst de bi awayekî reşbîn li dîrokê nêrî, ez ê ti carî xwe efû nekim. Lewra heta dîroka ku mehşereke rastî ya mirovatiyê ye, neyê zanîn, û li gorî vê mirov bi rastiya wê ya exlaqî û polîtîk ne girêdayî be, mirov ê ji ketina rewşên herî rezîl û bê hurmet nikaribe xwe rizgar bike. Bi qasî ku tu bibî dîrokî tu ewqasî jî bi rastiyê re yî. Dîrok jî, eger di maneya şaristaniya demokratîk de be, mirov dikare têkiliya wê bi rastiya civakî re deyne.

Ez ê hewl bidim, li dijî modernîzma kapîtalîst nêzîkatiya der barê dîroka şaristaniya demokratîk de, ji ber girîngiya mijarê di beşa piştî vê de weke sernavekî cihê pêşkêş bikim.

## D- Hêmanên Şaristaniya Demokratîk

Eger mirov yekeyên komên di çarçoveya civaka exlaqî û polîtîk de cih digirin zelal bike, dibe ku mirov baştir jê hîn bibe. Ji ber ku hêmanên civakî cuda dibin û diguherin, ji bo serwextbûna li yekparebûna mijarê, hewce dike mirov yek bi yek bi wan dakeve. Dibe ku yekparebûn di nava cihêrengî û cudahiyê de manedar be. Em nikarin bajêr weke dewlet ji hêmanên şaristaniyê bihesibînin. Ji vê serbixwe, herçiqasî bajarî bin jî zenaetkar, karker, bêkar û her cure xwediyê pîşeyên serbest ên bi keda xwe debara xwe dikin, di çarçoveya hêmanên demokratîk de ne. Em ê mijarên bi vî rengî guftûgo bikin.

**a- Klan:** Me berê bi kurtî behsa klanan kiribû. Me destnîşankiribû ku klan weke şaneya bingehîn a civakê di serhatiya jiyana dûvdirêj a cinsê mirov de ji sedî 98'ê temenê wî ye. Klan ji komên 25-30 kesî pêk dihatin; zimanê îşaretan bi kar dianîn; debara xwe bi nêçîrvanî û berhevkirina gihayan dikirin. Ji lewra mirov bi hêsanî dikare bibêje, jiyan ji bo wan gelekî zor û zehmet bû. Peydakirina qût û zadekî têkûz zehmet bû, heywanekî kovî dikarîbû wan bixwe. Avhewa carnan pirr sar dibû. Çar demên girîng ên qeşayî pêk hatibûn. Lewma divê mirov ji wan re nebêje pêşiyên me bûn û derbas nebe. Eger hewldanên wan ên mezin nebûna em ê nebûna. Divê mirov di vir de li yekparetiyê bigere. Bi tevahî mirovatiya me ya îro encama şerên wan ên man û nemanê ne. Dîrok bi tenê bi beşê hatiye nivîsîn nabe dîrok. Dîroka rastî, eger rewşa xwezaya me ya civakî ya mîlyonan sal berê li ber çav negire, nikare manedar bibe. Rewşa pêşî ya mirovatiyê bike yek, belkî jî xisletên sereke yên civaka klan in. Me hewl da, em klanê weke rewşa herî xwerû ya civaka exlaqî û polîtîk destnîşan bikin. Ev komên em behsa wan dikin li gelek qadan hê jî bi awayekî fizîkî hebûna xwe dewam dikin û di nava tevahiya hêmanên civakên pêşketî de jî weke şaneya bingehîn sekna xwe didomînin.

**b- Malbat:** Herçiqasî malbat bi xwe weke klanê neyê diyarkirin jî nêzî wê ye. Malbat di nava klanê de saziya pêşî ye ku cuda dibe. Demeke dirêj weke malbata dayikê hebû, piştî şoreşa gund û cotkariyê (texmînî di salên

5000'î B.Z. de) bi pêşketina otorîteya hiyerarşîk a di bin serweriya zilam de dema malbata bavik destpê dike. Sermiyantî û zarok di bin destê zilamê mezin ê malê de hatin hiştin. Xwexwediyêjinêdîtin, bingehê fikra pêşî ya milkiyetê pêkanî. Piştre jî dor hat kolekirina zilam. Di dema şaristaniyê de em li şêweyên malbatê yên demdirêj û berfireh rast tên. Malbatên gundiyên ji rêzê û zenaetkaran her hebûn. Desthilatdar û dewletan zilam-bavê di nava malê de weke kopyayekî otorîteya xwe bi erk û rol kirine. Bi vî awayî malbat kirin rewşekê ku bû amûrê herî girîng ê rewakirina yekdestdariyan. Ji şebekeyên sermaye û serweriyê re her tim kole, serf û karker, kedkar, esker û ji bo xizmetên din rola çavkanîbûnê girt ser xwe. Ji ber vê yekê girîngî bi malbatê dan û ew pîroz kirin. Şebekeyên kapîtalîst çavkaniya herî girîng a karê ji nava malbatê bi mêtina keda jinê pêkanîn û ev yek bi awayekî sergirtî kirin, lewma ji malbatê re ev bû barekî zêde yê veşartî û neyekser lê barkirî. Malbat kirine mîna sîgortaya nîzamê û bi vî awayî ew mehkûmî dema wê ya herî muhafezekar kirine.

Rexnekirina malbatê girîng e. Eger were rexnekirin dibe ku bibe hêmanê sereke yê civaka demokratîk. Bi tenê ne jin (femînîzm), bi tevahî malbat weke şaneya desthilatdariyê neyê analîzkirin, îdeala şaristaniya demokratîk û bi cihanîna wê, dibe ku ji hêmana xwe ya herî girîng mehrûm bimîne. Malbat saziyeke welê nîne mirov jê bibihure û wê li dawiyê bihêle, lê mirov dikare wê veguherîne. Îddîaya milkiyetê ya li ser jinê û zarokan a ji hiyerarşiyê mayî, divê were terikandin û di têkiliyên hevaltiya hevjînan de ti cureyê têkiliyên sermaye û desthilatdariyê cih negire. Divê nêzîkatiyên xerîzeyî yên ji bo dewamkirina cins li dawiyê bêne hiştin. Di bihevrebûna jin û mêran de nêzîkatiya herî îdeal ew e, felsefeya azadiyê ya bi civaka exlaqî û polîtîk ve girêdayî esas bê girtin. Malbata ku di vê çarçoveyê de veguhere, wê garantiya herî têkûz a civaka demokratîk be, û wê yek ji têkiliyên bingehîn ên şaristaniya demokratîk be. Ji hevaltiya (hevjîntî) fermî wêdetir hevaltiya xwezayî girîng e. Divê herdu hev-alî timî ji mafê jiyana bi tenê mayînê re amade bin. Di têkiliyan de tevgera bi koletî û bi çavkorî nabe. Eşkere ye, wê malbat di nava şaristaniya demokratîk de veguherîna herî manedar pêk bîne. Jina bi hezarê salan ji rêz û hurmeta

xwe gelek tişt ji dest dane, heta bi rêz û hêz nebe, yekîtiyên malbatan ên manedar pêk nayên. Malbatên li ser cehaletê avabûyî, rêz û hurmet ji wan re nabe. Di jinûveavakirina şaristaniya demokratîk de par û rola malbatê girîng e.

**c- Qebîle û Eşîret:** Yek ji hêmanên girîng ên civakê ye. Malbatan di nava xwe de dihewîne, heman çand û zimanî parve dikin, ji civaka gund û cotkariyê pêşketîtir e. Ji bo parastin û hilberînê yekîtiyên civakî ne ku hewceyî bi wan heye. Dema ku klan û malbat di çareserkirina pirsgirêkên hilberîn û ewlekariyê de kêm dimînin, hewce dîtine ber bi şêweyê qebîleyê ve veguherin. Bi tenê xwe nasipêrin têkiliyên xwîn û zuriyetê, hêmanên civakê yên bingehîn in, pêdiviya bi ewlekarî û hilberînê wan ferz dike. Ew weke saziyên paşverû hatine îlankirin û hatiye gotin, divê bi lez li dawiyê bêne hiştin, ev kokqelandin û qiranîna herî mezin a moderníteya kapîtalîst e. Ji ber ku mirov heta di nava yekîtiya qebîleya xwe de bimîne, bi hêsanî kes nikare wan bike karker û bimije. Ji lewra mirov bi gotineke bi tenê dikare bibêje, ji bo efendiyên feodal û koledar ha qebîle ha dijmin wekhev bû. Qebîleyê nikarîbû koletî, serftî û karkertiyê bi endamên xwe bide kirin.

Şêwazekî jiyanê yê qebîleyan ê nêzî komintiyê hebû. Şêweyê jiyanê yê qebîleyê yek ji wan şêweyên jiyana civakî ye ku têde civaka exlaqî û polîtîk bi hêz e. Qebîle her tim weke dijminên herî xedar ên şaristaniyên klasîk bûn, ev jî bi xisletên civaka exlaqî û polîtîk ve têkildar e. Herweha fetihkirina wan mumkîn nebû; yan dihatin tinekirin an jî azad diman. Lê hatiye dîtin ku bi demê re riziyane, dejenere bûne. Hevkarên di nava wê de çawa ku di nava malbatê de bi roleke neyênî rabûne di nava qebîleyê de bi heman rolê rabûne. Qebîleyên ku koçbertî yek ji xisletên wan ên herî li pêş bû, ji hêzên çêker ên rastî yên dîrokê ne. Kole, serf û karkeran ti carî rewşa qebîleyan a dîrokî ya berxwedan, serhildan û azadiyê nedîtine, ew bi giranî (ji bilî îstîsnayan) bendeyên herî sadiq ên berdestê efendiyên xwe bûn. Belkî jî li şûna şerê çînî weke şerê qebîleyan li dîrokê bihata nêrîn wê bêtir nêzî rastiyê bibûna. Piçûkdîtina rola qebîleyê, carnan neyînî hesibandina wê û carnan jî hîç rol nedana wê, berevajîkirineke girîng a avakerên dîroka şaristaniyê ye.

Eşîret bi awayekî weke federasyona komên qebîleyan hê bêtir girîng in. Hebûna xwe bi giranî li hemberî êrişên şaristaniyên koledar bi dest xistine. Ji bo tinenebûnê û pêdiviya bi berxwedanê rêxistiniya eşîrê derxistiye holê. Şêweyekî civakê ye, rêxistiniya wê ya eskerî û polîtîk bi lez pêk tê. Hêzeke polîtîk û artêşê ya xweber e. Yekîtiya rêxistinî û zêhnî bingehê wê ye. Çand û rabihuriyeke dîrokî ya dûvdirêj bi xwe re hildigirin. Çavkaniya bingehîn a çanda netewe ne. Mirov alîkarî û keda wan a di hilberînê de nikare piçûk bibîne. Avabûna wan a civakî ya kolektîf alîkarî û danûstendineke beramber hev, weke bingeh ferz dike. Di nava komên eşîr û qebîleyan de ruhê komin bi hêz e. Ji hêmanên avaker ê karektera neteweyî ye. Lê dema hevkartî têde pêk çêbe (yanî têkiliyên bi dijminan re) dibe ku bi tehlûke bibe. Tevî hemû hewldanên piçûkxistinê yên dîroknasên şaristaniyê jî ew ji hêzên bingehîn ên motor ên dîrokê ne. Eger berxwedanên eşîran ên ji bo rêûresma azadî, kominalîzm û demokrasiyê nebûna, mirovatî wê ji bûna girseyên keriyan û evdan rizgar nebûya. Jixwe ji ber van xisletên xwe yek ji hêmanên bingehîn ên şaristaniya demokratîk e.

Qebîle û eşîran ji bo azadî, demokrasî û wekheviyê li dijî êrişên hêzên şaristaniyê bi helwesta xwe ya di jiyana exlaqî-polîtîk de israr kirine, serî hildane, li ber xwe dane. Bi giranî ev serhatiyên qebîle û eşîran dîroka şaristaniya demokratîk pêk tînin. Dîsa jî yên rengên rastî yê civakê didinê avahiyên qebîle û eşîran in. Dewleta netewe di bin giraniya komeke etnîk de bi tevahî çandên qebîle û eşîran tesfiye dike û ev bi temamî qirkirineke çandî ye. Ev qirkirina mezin a li hemberî civakê herçiqasî hinekî sist bûbe jî hê tehlûkeya herî mezin e. Li şûna dewleta netewe, di pêkanîna neteweya demokratîk de qebîle û eşîr weke yekeyên avaker ên pêşî dikarin bi rola xwe rabin. Ji ber van sedeman û wesfên wan, qebîle û eşîr weke hêmanên esas ên şaristaniya demokratîk têne hesibandin û ev jî têra xwe tê fêhmkirin.

**d- Qewm û Netewe:** Di şaristaniya demokratîk de şekilgirtina civakan weke qewm û netewe û jiyana wan ji şaristaniya klasîk cuda ye. Şaristaniyên fermî, qewm û neteweyan weke dewameke koma etnîk û

xanedanê serwer, dikin têgîn. Qewm û netewe, ji koma fermî ya etnîk û xanedan re bi minnetdarî deyndar dikin û bi vî awayî wan dikin çîrok. Di nava dîrokeke lihevçêkirî de ser li rewşa civaka xwezayî tê girtin. Di nava koma etnîk a serdest û xanedanan de kesayetên derdixin pêş, dikin qehreman û bi vî awayî bavên qewm û neteweyan têne afirandin. Gaveke pêş û paşê xwedakirina wan e. Bi awayekî din, dîrok dibe hunerê vê çêkirina xwedakirin û bavkirinê (pêşiyên mirovatiyê – bavpîr) ye. Lê rastî gelekî cuda ye. Civakên bi şêweyê qebîle û eşîran bi pêş dikevin, çiqasî bi cih dibin, zimanê hevpar û çanda xwe pêşde dibin û nasnameya xwe ya exlaqî û polîtîk a di cewherê xwe de dewam bikin, destpê dikin weke qewm û netewe şikil digirin. Civak ji destpêkê ve bi nasnameya qewm û netewe dernakevin, lê di serdema navîn de bi nasnameya qewm û di serdema nêz de jî nêzî nasnameya netewe bûne.

Qewm bi awayekî malzemeyê nasnameya netewe ye. Bi serdema nêz re qewm bi du rêyan neteweyî dibin; şaristaniya fermî şovenîzma qewm vediguherîne milletperestiya modern, bi vî awayî şiklê nû yê civaka dewlet, bûrjûwazî û bajar hewl didin weke dewleta netewe diyar bikin. Komeke etnîk a serdest bi rola hêman û sîsika bingehîn radibe. Nasnameya wê weke ya tevahiya netewe tê qebûlkirin. Heta nasnameyên gelekî cuda yên qebîle, eşîr, qewm û neteweyan hewl didin bi darê zorê di nava çand û zimanê vê koma etnîk de bihelînin. Rêya jê re 'netewekirina hov' tê gotin ev e. Tevkujiya çandî ya herî mezin a dîrokê bi vê nêzîkatiya şaristaniya fermî di tevahiya neteweyan de li ser hemû ziman û çandên bi hezaran qebîle, eşîr, qewm û neteweyan hatiye meşandin. Qewm û neteweyên bi vî rengî di serê wan hêmanan de tên dîrok û sîstema şaristaniya demokratîk pêk tînin, lewma divê mirov herî zêde li ser van hêmanan rawest e.

Duyemîn rêya netewebûyînê di çarçoveya civaka exlaqî û polîtîk de bi komên çand û zimanê wekhev an jî xwediyê heman ziman û çandê li ser bingehê siyaseta demokratîk bi veguherîna civaka demokratîk pêk tê. Di netewebûyînê de bi tevahî qebîle, eşîr, qewm heta weke yekeya civaka exlaqî û polîtîk malbat cih digirin. Dewlemendiyên xwe yên çandî û zaravayên xwe vediguhêzin neteweya nû. Di neteweya nû de ji sedî sed

komeke etnîk, mezheb, bawerî û îdeolojiyek bi tena serê xwe nikare mohra xwe li serweriyê bixe. Senteza herî dewlemend ew e, mirov bi dilê xwe bikin. Heta gelek komên çand û zimanên cuda jî dikarin bi rêya heman siyaseta demokratîk weke civakên demokratîk bi yekeya jor a hevpar a neteweyan bi nasnameya neteweya neteweyan bijîn. Rêya bi xwezaya civakî re li hev dike jî ev e. Dewleta netewe di rêbaza xwe de jî li ser bingehê nêzîkatiya moderniteya kapîtalîst bi giranî bi awayekî xwe ji civaka xwezayî şuştî weke 'tek ziman, tek millet, tek welat, tek (uniter) dewlet' bi têgihiştina berê ya tek-yek dîn û yek xwedagirî bi versiyona wê ya nû û laîk xwe bi gewde dike, ji ber vê di heman demê de dibe şiklê nû yê yekdestdariya sermaye û desthilatdariyê, bi heman rengî dibe şiklê nû yê dewletê. Yekdestdariya sermaye û desthilatdariyê di qonaxa veguherîna kapîtalîst de ji serî heta binî di hinavê civakê de bi cih dibe, civakê dike mêtingeh, wê di nava xwe de dihelîne û ev rastî neteweya dewletê îfade dike. Desthilatdariya herî zêde, şêweyê pêkhatina diyardeya mêtinkariya herî zêde ye. Civak bi tevahî ji hêmanên exlaqî û polîtîk tê şuştin, li ber mirinê tê danîn, ferd dibe mîna moriyan û bi vî awayî civaka faşîst a kerî tê çêkirin. Modela herî zêde bi xwezaya civakî re li hev nake ev model e, û di binê wê de bandorên kûr ên dîrokî û îdeolojîk, hêmanên çîn, sermaye û desthilatdariyê bi tesîr in. Encamên yekbûyî yên van hêmanan weke qirkirinê pêk hatine.

Di sîstema şaristaniya demokratîk de pêkhatina netewe û pevkelîna wan, panjehra yekdestdariyên sermaye û desthilatdariyê ye, rêya bingehîn e ku ji bo illeta faşîzm û qirkirinê (girêkên kansêrolojîk ên civakê ) tevî sedemên wê ji holê were rakirin. Careke din ahenga xwezaya civakî bi karektera şaristaniya demokratîk re derdikeve pêşiya me.

**e- Hêmanên Wê Gund û Bajar:** Di perspektîfa (di paradîgma) şaristaniya demokratîk de maneya gund û bajêr diguhere. Çawa ku cotkarî û îndustrî di xwezaya civakê de du qadên hilberînê ne yên ku pêdiviya wan bi hev heye, gund û bajar jî du cihûwar in ku pêdiviya wan bi hev heye. Di navbera wan de tewazun û balanseke ji sedî sed divê were parastin heye. Kengî ev balans xira bibe rê li ber felaketa ekolojîk, dêwbûna çîn û

dewletê, yekdestdarîbûna sermayeyê vedibe. Bi îstîsmarkirina cudahiya buhayan bazirganî dikeve rêya ne rewa. Ji bajêr re 'erê', lê ji yekdestdarbûna çîn-dewlet-sermaye re 'na' nuqteyeke girîng e. Ji bo şîrovekirina dîroka pêşketina gund û bajaran ev krîterên bingehîn divê esas bêne girtin. Li sêbera bajar-çîn-dewletê etîketa 'şaristaniyê' danîne û ev jî tam îroniyek e. Navê 'hov' û 'barbar' jî li komên li ser xeta xwezaya civakî ya rastî jiyane kirine û ev jî mîsala, 'min diz berdaye diz min bernade' yan jî 'hem diz e, hem topiz e', tîne bîra mirovî. Hovîtî û barbartiya rastî texrîbkirin û talankirina xwezaya civakî ye ku ev ji ber hevgirtina sêbera bajar-çîn-dewletê, ji tevgera yekwucûd a vê hevgirtinê ye. Hegemoniya îdeolojîk rastiyan berepaş dike û çeloxwarî nîşan dide. Em girîngiya vê rewşê careke din bi awayekî îronî bi zelalî dibînin. Îdeolojiyê, hem di warê nêzîkkirina heqîqetê de, hem jî di warê dûrkirina ji wê de tevahiya dîrokê girîngiya xwe dewam kiriye, dike.

Şaristaniya demokratîk tevgera yekbûyî ya sêbera bajar-çîn-dewletê weke barbartiya rastî dibîne; yên li hemberî wê jî weke îfadeya rast a civaka exlaqî û polîtîk qebûl dike û wan îdeolojîk dike.

Civaka gund weke diyardeya cihûwarbûnê ya pêşî girîng e. Di serdema îndustriyê de divê were nûkirin û dewamkirin. Ev weke pêdiviyeke jiyana ekolojîk divê pêk bê. Gund bi tenê diyardeyeke fizîkî nîne, çavkaniyên bingehîn ên çandê ne. Mîna malbatê yekeyên bingehîn ên civakê ne. Êrişa bajêr, îndustrî û bûrjûwaziyê weke çîn û dewletê vê rastiyê naguherîne. Weke yekeya civaka exlaqî û polîtîk a herî bicihanîna wê li cih e, gelekî girîng e. Bajar jî eger ji nû ve bi gund re bikeve balansekê û bi şertê ku hem di warê şêniyan de û hem jî di warê fonksiyonê de vebirrî xwe veguherîne hewcedarî pê heye. Divê nebe çerxeke navendî ya mêtinkarî û zordestiyê. Lazim e, ji vê rewşê bê derxistin û divê bi rola pêşxistina civakê rabe. Ev jî bi tenê bi veguherîneke bi kok gengaz e. Hem weke dewlet û hem jî weke burokrasiya şîrketan divê bajar nebe mekanê mezinbûna kansêrolojîk a sermaye û çîna navîn, ev yek di warê rizgariya civaka serdema me de xwedî cih û maneyeke navendî ye. Bajar bi rewşa xwe ya heyî, hem ji aliyê naverok û hem jî ji aliyê maneya xwe ve, bi rastî bûne navendên civakê

(weke hilweşîna ekolojîk û qiranîna civakê) bi lez diqedînin. Belgeyên herî têkûz in ku îflasa şaristaniya klasîk nîşan didin. Roma tekane bû û tevahiya serdema destpêkê bû. Hilweşîna wê jî tekane bû û serdema destpêkê bû. Bajarên roja me ya îro jî weke navendên daqurtandina tevahiya civakê (gund û çolter di navê de) pirraniya civaka kansêrolojîk û hema hema her tiştê wê ne. Mirov weke civak heta ji vî bajarê ketiye vê rewşê xwe rizgar neke, divê kes şik û gumanê neke ku ev bajar ê wî ji xwezabûna civakî derxîne!

Di sîstematîka şaristaniya demokratîk de yekîtiya ahenga gund û bajêr, ji aliyê îdeolojîk û avabûnê ve xwedî girîngiyeke bingehîn e. Xwezaya civakî bi tenê li ser bingehê vê ahengê dikare hebûna xwe misoger û dewam bike.

**f- Hêmanên Wê Zêhniyet û Ekonomîk:** Bingehê ekonomîk ê şaristaniya demokratîk, her tim bi yekdestdariyên sermayeyê yên li ser mayeya civakî avabûyî re di nava nakokiyê de ye. Di pêşketina cotkarî, bazirganî û îndustriyê de bi şertê hêmanên ekolojîk û pêdiviyên civakî yên bingehîn li ber çav bêne girtin, bi awayekî azad li her xebatê vekirî ne. Ji bilî kara yekdestdariyê, hatina aboriyê rewa dihesibîne. Di mijara milkiyetê de jî pîvan berhemdarî ye. Rola yekdestdariyê weke milkiyet her tim bi berhemdariyê re nakok e. Ne milkdariya zêde ya ferdperestiyê ne jî milkdariya dewletê di çarçoveya şaristaniya demokratîk de nîne. Di xwezaya civakî de ekonomî her tim bi koman hatiye meşandin. Ji xêncî yekdestdariyê, bi serê xwe ferd an jî dewlet têkiliya xwe bi ekonomiyê re nîne. Ekonomiyên ferd û dewlet li ser wan xwedî gotin in, yan wê mecbûrî derbasî karê bibin yan jî wê îflas bikin. Ekonomî dewamî karê koman e. Qadeke bi rastî demokratîk a civaka exlaqî û polîtîk e. Ekonomî demokrasî ye. Demokrasî herî zêde ji bo ekonomiyê hewce dike. Di vê çarçoveyê de mirov ekonomiyê ne dikare weke binesazî ne jî weke jorsazî şîrove bike. Ekonomî weke çalakiya herî bingehîn a demokratîk a civakê were şîrovekirin hê rasttir e.

Polîtîka ekonomiyê ya kapîtalîst û şîroveya wê ya Marksîst, analîzên wan ên têkiliyên ekonomîk mucered dikin pir bi tehlûke ne. Ekonomî ti

carî nabe ku bibe çalakiya patron û karker. Ez bi xwe duberiya patron û karker, li hemberî çalakiya bingehîn a demokratîk a xwezaya civakî ekonomiyê neçar im weke şêweyê diziyê yê yekdestdaran binirxînim. Eger mirov demên klan û qebîleyê jî li vê zêde bike, mirov wê weke xebata bingehîn a civaka exlaqî û polîtîk destnîşan bike, wê bêtir di cih de be. Li vir mebesta min ji karker ev e; ji nirxa xizanên din ên civakê, nexasim jî ji nirxa keynik û keybaniyên malê yên bêheqdest dixebitin didizin û di bin navê heqdestê de beşekî pirr piçûk ji nirxê hatiye dizîn didin karkerê tawizkar. Kole û serf çawa ku bi giranî dûvikê efendî û begê xwe ne, karkerê tawizkar jî her tim dûvikê patronê xwe ye. Yek ji şertê sereke yê exlaqî û polîtîkbûnê ew e, divê mirov her tim bi şik û gumanê li kolebûn, serfbûn û karkerbûnê binêre, li ber rabe, û li ser vî bingehî îdeolojî û çalakiya wê pêşde bibe. Çawa ku sêberiya efendî-beg-patron hêjayî pesindanê nîne, sêberiya kole-serf-karker jî di çarçoveya dûvikbûna van de ti carî nabe ku weke beşên civakî yên baş bêne bilindkirin û mezinkirin. Divê weke beşên piçûk hatine xistin gunehê mirov bi wan were û hewl bide demekê berî demekê wan azad bike, helwesteke bi vî rengî ya rast e.

Ekonomî di çarçoveya naveroka xwe ya bingehîn de çalakiyeke dîrokî ya civakê ye. Ti ferd (weke efendî, beg, patron, kole, serf û karker) û dewlet nikare bibe aktorê çalakiya ekonomiyê. Mînak weke saziyeke herî civakî û dîrokî berdêla karê dayikê ti ferd ê patron, beg, efendî, karker, gundî û bajarî nikare bide. Ji ber ku dayiktî çalakiya herî zor û hewce ya civakê û domdarkirina jiyanê diyar dike. Ez bi tenê naxwazim behsa zarokanîna wê bikim; ez di çarçoveyeke berfireh de weke çandekê, weke diyardeyeke misêwa bi dilê xwe serî radike û weke xwediya çalakiya bi mejî barkirî li dayiktiyê dinêrim. Ya rastî jî ev e. Baş e, çi têkiliya xwe bi wijdan û aqil re heye, mirov jina xwediyê çalakiya evqas mecbûrî, zor, bi dil û aqil barkirî, timî radibe serhildanê weke kedkara bêheqdest bibîne? Gelo zanisteke aboriyê ya ku xwediyên van çalakiyên civakî û yên weke wan (îdeolojiya herî kedkar Marksîzmê jî ew neanîne bîra xwe) li derveyî heqdestiyê digire, xulamê patron jî li serê quncikê datîne, çawa dikare çareseriya xwe weke ku civakî be pêşkêş bike? Ekonomiya Marksîst bi awayekî pirr xirab

ekonomiyeke bûrjûwaziyê ye. Gelekî hewcedariya wê bi xwerexnekirinê heye. Eger bi wêrekî xwe rexne neke, li qada berjewendiyên bûrjûwaziyê gera li sosyalîzmê, ji têkçûna tevgera sedûpêncî salî (sosyalîzma pêkhatî) û jihevdeketina wê (hem jî ji ber xwe ve) wêdetir tiştekî nayîne û wê bibe xizmeteke herî hêja ji kapîtalîzmê re hem jî xizmeteke bêberdêl. Dema ku Lenîn digot, “Rêya cehennemê bi kevirên niyeta baş hatiye deribandin” çiqasî rast gotiye! Gelo ew difikirî ku ev hevok ê di çalakiya wî de jî rastiya xwe nîşan bide? Ez hêvî dikim ku di beşên pêş de van analîzên xwe berfireh bikim.

Divê mirov mijara ekonomiyê weke çalakiya bingehîn a civaka dîrokî ya exlaqî û polîtîk bîne ber çavên xwe û eger hewce bike, mirov dikare wê bike zanistek û mucered bike. Lê eger mirov polîtîka ekonomiyê ya navenda wê Ewrûpa weke zanist qebûl bike belkî jî piştî mîtolojiya Sumeran aqil ê bibe êsîrê mîtolojiyeke duyemîn a herî mêtinkar. Ji bo vê qadê şoreşeke zanistî ya radîkal wê bi roleke heyatî rabe.

Em divê bi israr bînin ziman ku ti çalakiya civakî bi qasî ekonomiyê nikare exlaqî û polîtîk be. Bi vî wesfê xwe wê weke mijara herî li pêş a siyaseta demokratîk cihê xwe hebe û nikare xwe ji vê xilas bike. Ji bo tenduristiya civakê hezar qatî ji tibbê bêtir hewceyî pê heye, ji lewra sîstema şaristaniya demokratîk li ser ekonomiya civaka dîrokî, bi qasî şîroveyeke rast, soza şoreşeke rast jî dide.

Hêmana zêhniyetê ne weke tê zanîn joravahiyeke ji ekonomiyê dûr e. Jixwe cihêkirin û veqetandin bi awayên jor û jêr pêvajoya fêhmkirina xwezaya civakî hê bêtir tevlîhev dikin. Xwezaya civakî bi xwe hebûneke welê ye, mejiyê xwezayê herî zêde li cem heye. Mirov li hêmanên cihê yên zêhniyetê bifikire, dibe ku di cih de neyê dîtin, lê zanist ji civaka dîrokî hat qutkirin û di xizmeta şaristaniya fermî de bezandin û xistin roleke welê ji desthilatdariyê re kirin çavkaniya hêzê ya herî berhemdar û ev jî dike ku em bi girîngî zêhniyeta jiyana şaristaniya demokratîk û avabûna wê di ber çavan re derbas bikin. Zanist û hegemoniya îdeolojîk a şaristaniya fermî weke zêhniyet û avabûna wê, tevahiya dîrokê timî çalakiya li dijderketina wê û pêkanîna alternatîfa wê dewam kiriye. Têkoşîna îdeolojîk û tevgerên

zanista alternatîf her tim hebûn. Şaristaniyên klasîk ji wan sîsteman in ku herî zêde pêşketina mejiyê analîtîk îstîsmar kirine. Ji bo rastiya îstîsmarkariya xwe veşêrin û serê bigirin, serî li her cure xapandinên tewşo mewşo dane, ji çaviyên form û nîşanên xeyalperest gelekî sûd wergirtine. Di qadên mîtolojî, dîn, felsefe û zanistê de rastiya xwe ya maddî weke rastiya giştî ya civakî pêşkêş kirine, û timî hewldane bidin qebûlkirin ku ji bilî heqîqeta wan, gera li heqîqetê hewldaneke tewş e.

Li ser vê îdeala 'tekperest', şopên sermaye û yekdestdariyê yên xwe weke 'rêya yekane û tek a rast' dibînin hene. Ji ber ku ew xwe bi vî awayî ferz dikin. Gelek rengên cuda yên Xwezaya Yekemîn û Duyemîn hene, lê mîna ku van rengan bi rengê gewr boyax bikin û hewl dane bidin qebûlkirin ku rengê bi tenê gewr e. Ji nirxê zêde yê berhevkirî bi mîqdareke gelekî kêm weke sermayeya entelektuel bi kar tînin û bi vî awayî ti carî hegemoniya îdeolojîk kêm nekirine. Sîstemên wan ên dibistan û perwerdeyê bûne cihê jiberkirina şêwazên wan ên jiyanê. Zanîngeh, ne weke qada lê heqîqet û nasnameya civakî tê qebûlkirin, lê weke qadên înkar û li derve hiştinê bi kar anîne. Avahî û naveroka zanistê, li ser navê objektîvbûnê bi îhtîmam hatiye tenzîmkirin ji bo rastiya civaka dîrokî ya xwezaya civakî bike obje û wê ji rola sûbje (kirdar) derxe. Mekanîzmayên li ser xeteke hişk a şaristaniyê weke form û pîvanên gerdûnî yên îdeal hatine pêşkêşkirin.

Ahenga şaristaniya demokratîk bi xwezaya civakî re di pêşketina zêhn de jî xwe nîşan dide. Zêhnê herî zarokwarî yê klanan hay ji girêdana zindî ya bi xwezayê re hebû. Îmaja 'xwezaya mirî' xiyanet û binavkirineke zêhniyeta şaristaniyê ye ku her çû ji xwezayê qut bû. Serdema fînansa global a îro xwedatî û zindîtiya di 'pere' de dibîne di ti pêkhatina xwezayê de nabîne. Em wexta vê rewşa wê li ber çavan bigirin, di mijara pîroztî û zindîtiya xwezayê de ya li pêş ne yekdestdariya roja me ya îro ye, rastiya klanê ye. Avahiyên qebîle, eşîr, qewm û neteweyên demokratîk bûne qadên hebûnê ji bo zêhniyeteke zindî. Avahî û mejî bi jiyanê re di nava têkiliyê de ne. Mejiyê analîtîk û hisî bi tenê di sîstema şaristaniya demokratîk de dikarin yekîtiyeke diyalektîkî pêk bînin.

Zêhniyeta şaristaniya demokratîk a bi guman li nîzamên dibistan, akademî û zanîngehên fermî dinêre, tevahiya dîrokê ji pêşdebirina alternatîfên xwe paşve nemaye. Ji sîstemên pêxembertiyê heta bi dibistanên fîlozofiyê, ji tesewifê heta bi zanistên xwezayê bêhejmar miqam, dergah, ocax, terîqet, medrese, mezheb, dêr, keşîşxane, mizgeft û perestgeh hatine pêşdebirin. Çawa ku tê dîtin, ne rewşa şaristaniyê ya tekane, ya dualî xwe di her qada xwezaya civakî de nîşan dide. Pirsgirêk ew e, divê mirov di avahiya tekane de xwe bêhnçikandî neke, li aliyê xwezaparêz ê dualîteyê çareserker be, û alternatîfa şaristaniya demokratîk weke cudatiya jiyana azad pêşde bibe.

**g- Hêmanên Wê Siyaseta Demokratîk û Xweparastin:** Hêmanên ewlekarî û siyasetê yên şaristaniya demokratîk di hebûna civaka exlaqî û polîtîk de bi roleke bingehîn radibin. Jixwe ew bi xwe xwedî têgihiştina civaka polîtîk e, lewma kategorîkirineke din a siyaseta demokratîk zêde ye. Lê di navbera herduyan de cudahî heye. Di civaka polîtîk de dibe ku her tim siyaseta demokratîk bi cih neyê anîn. Jixwe tevahiya dîroka şaristaniya fermî ya bi giranî li ser civaka polîtîk ferz kiriye, serweriya qraltiya despotîk e. Civaka polîtîk di bin serweriyê de bi temamî nayê tinekirin, lê nikare xwe demokratîk jî bike. Çawa ku mirov xwedî guh be nayê wê maneyê mirov dibihîse, bi heman awayî hebûna çaviya polîtîk jî nayê wê maneyê ku bi awayekî azad dixebite. Ji bo çavî bi awayekî têkûz û xweş bixebite pêdivî bi atmosfereke demokratîk heye.

Ji hebûna atmosfera demokratîk û bi giştî avabûna siyaseta civaka polîtîk re mirov dikare bibêje siyaseta demokratîk. Siyaseta demokratîk ne bi tenê şêwazekî, yekparebûna saziyan jî îfade dike. Gelek sazîbûnên weke partî, kom, meclîs, medya, mîtîng û hwd. nebin, pratîka siyaseta demokratîk jî bi pêş nakeve. Rola bingehîn a saziyan guftûgokirin û biryardan e. Di tevahiya karûbarên hevpar ên civakî de guftûgo û biryardan nebe jiyan nameşe. Encam ê yan kaos an jî dîktatorî be. Civaka demokratîk nebe timî çarenûsa wê bi vî rengî ye. Di navbera du seriyan ango kaos û dîktatoriyê de her wê were kilkirin. Di nava atmosferên bi vî rengî de civaka exlaqî û polîtîk bi pêş nakeve. Hingê têkoşîna polîtîk ango

siyaseta demokratîk hedefa wê ya pêşî ew e, pêkanîna civaka demokratîk, di vê çarçoveyê de karûbarên hevpar bi guftûgo û biryaran bixe rêya rewşeke herî baş û têkûz.

Di rewşa jê re demokrasiya burjûwa tê gotin û saziyên wê de ku dûrî fonksiyona xwe ya rastî tên girtin, armanca siyasetê berê pêşî desthilatdarbûn e. Desthilatdarî jî ji yekdestdariyê pargirtin e. Eşkere ye ku siyaseta demokratîk armancên xwe yên bi vî rengî nabe. Eger di saziyên desthilatdariyê de cih were girtin jî wê demê jî karê bingehîn heman kar e. Ev kar ji yekdestdariyê pargirtin nîne, ji bo berjewendiyên hevpar ên civakê yên heyatî girtina biryarên rast e; şopandina bicihanînên wê ye. Mirov bibêje, weke pîvan di nava demokrasiyên bûrjûwayê de cih nayê girtin, nêzîkatiyeke manedar nîne. Lê divê mirov zanibe bi şert têde cih bigire. Bêpîvantî timî bi kêra polîtîkvaniya çîna serwer a sexte tê.

Divê neyê jibîrkirin ku siyaseta demokratîk hewcedariya xwe bi kadroyên jêhatî, medya, rêxistiniyên partiyan, rêxistinên civaka sivîl, xebatên perwerdekirina civakê yên misêwa û propagandayê heye. Ji bo siyaseta demokratîk encam bigire û serketî be, hin xisletên wê yên bingehîn mirov dikare weha rêz bike; divê mirov bi rêz nêzîkî tevahiya cudahî û cihêrengiyên civakê bibe, li ser bingehê cudahiyan pêdiviya bi wekhevî û lihevkirinê, bi qasî uslûba guftûgoyê wêrekiya siyasî û li pêş girtina exlaq, di mijaran de 'serdestî', serwextbûna li dîrok û aktualîteyê û nêzîkatiya zanistî-yekpare.

Xweparastin, polîtîka ewlekariyê ya civaka exlaqî û polîtîk e. Ya rastî, civaka nikaribe xwe biparêze wesfê wê yê civaka exlaq û polîtîk maneya xwe ji dest dide. Civak di rewşeke bi vî rengî de yan bûye mêtingeh, heliyaye dirize; yan jî li ber xwe dide, dixwaze ji nû ve rengê xwe yê exlaqî û polîtîk bigire û fonksiyonel bike. Xweparastin navê vê pêvajoyê ye. Civaka di xwebûnê de israr dike, her cure mêtinkarî û hewcedarkirina yekalî red dike, bi tenê bi sazî û derfetên xweparastinê dikare vê helwesta xwe pêşve bibe. Xweparastin bi tenê li dijî tehlûkeyên ji derve tên pêk nayê. Di avahiyên hundir ên civakê de jî her tim nakokî û tengezarî mumkîn e ku pêk bên. Divê mirov ji bîr neke ku civakên dîrokî demeke

dirêj bi çîn û desthilatdar bûn, ji lewra wê hêzên demeke dirêj bixwazin van xisletên xwe biparêzin hebin. Hêzên em behsa wan dikin, ji bo hebûna xwe biparêzin wê bi hêza xwe hemûyî li ber xwe bidin. Ji lewra xweparastin weke daxwazeke civakî ya belav, wê dema dirêj di rojeva civakê de cihekî girîng bigire. Eger hêza biryarê bi hêza xweparastinê re bi hêz nebe, nikare bi hêsanî were meşandin.

Jixwe, di roja me ya îro de ne bi tenê ji derveyî civakê ve, ji nava wê ve jî rastiyeke desthilatdariyê heye ku heta bi tevahiya çaviyên wê cih girtiye. Gelekî girîng e ku di tevahiya çaviyên civakê yên munasib de komên xweparastinê yên dişibin hev werin pêkanîn. Civakên bê xweparastin, ew civak in ku ji aliyê yekdestdariyên sermaye û desthilatdariyê ve êsîr hatine girtin û bûne mêtingeh. Tevahiya dîrokê ji klanan heta bi qebîle û eşîran, ji qewm û neteweyan heta bi cemaetên dînî, ji gund û bajaran heta bi her yekeya civakê, timî pirsgirêka xweparastinê hebû. Yekdestdariya sermaye û desthilatdariyê mîna gurê li pey nêçîrê êrişkar e; yên ji xweparastinê mehrûm timî mîna keriyên pez ji hev belawela dike û bi qasî dixwaze desteser dike.

Ji bo civak bibe civaka demokratîk û hebûna xwe dewam bike, şert e ku bi kêmanî bi qasî êriş û mêtinkariyên yekdestdariyên sermaye û desthilatdariyê bi sînor bike, ji aliyê çalakî û avabûna xweparastinê ve xwe amade bike û fonksiyonel be. Ji ber ku dema dirêj wê bi amûrên sermaye û desthilatdariyê re di nav hev de bijîn, girîng e ku mirov du şaşiyan neke: Şaşiya yekemîn, mîna mîhê teslîmî gur dikin, divê mirov ewlekariya xwe radestî nîzama yekdestdariyê neke. Encamên vê yên têkbir bi hezaran mînakî derketine holê. Şaşiya duyemîn ew e, mirov li dijî dewletê bi parolaya tavilê bibe weke dewletê rabe û ev tê wê maneyê hewl dide bibe amûrê desthilatdariyê. Ezmûnên sosyalîzma pêkhatî di vê mijarê de têra xwe mirov rohnî dikin. Ji lewra xweparastineke manedar û kêrhatî, di dîrokê, roja me ya îro û paşerojê de wê bibe hêmanekî şaristaniya demokratîk ku nikare paşguh bike.

Bêguman mirov dikare hêmanên şaristaniya demokratîk zêde û rave bike. Lê ji bo serwextbûna li girîngiya mijarê û fêhmkirina wê, ez yeqîn dikim ku ev a min pêşkêş kir têrê dike.

# 9- LI DIJÎ MODERNÎTEYA KAPÎTALÎST MODERNÎTEYA DEMOKRATÎK

Rêbazên lêgerîna li heqîqetê yên zanistên civakî yên navenda wan Ewrûpa li gorî cewherê xwe hegemonîst in. Rêyên alternatîf ên heqîqetê bi du rêbazên bingehîn hema dikin ku ne mumkin dibin: Yekemîn, nêzîkatiya monîst (tekperest) gerdûnperest e. Her tim heqîqetê dadixin 'yekê'. Duyemîn, modela bêsînor li gorîxwebûnê ye. Dema ku dibêje her kes li gorî xwe heqîqeteke wî/wê heye, ya rastî hewl dide îfade bike heqîqeta xwe nîne. Ev tiştekî wisa ye, mîna ku tu ji bo îdîa bikî ti tişt naguhere, bibêjî her tişt diguhere. Eşkere ye ku herdu rêbaz jî di reduksiyonîzmê de dibin yek. Çi gerdûnparêziya 'yekperest', çi jî ligorîxwebûna 'tekîtiyê' heqîqetê dadixin tektiyê, bi vî awayî jî herdu karektera xwe ya hegemonîk eşkere nîşan didin.

Bêguman li pişt van rêbazan şaristaniya yekdestdar heye. Bingehê vê mijarê diçe heta dema ku rahibên Sumeran xwedayê herî mezin 'En' ava kirin. Sedema mezinkirina 'En' ew e, hiyerarşî û yekdestdariya bajar-çîn-dewletê bilind dibe, lewma hewce dibînin ku wan rewa bikin, li ser zêhniyeta civakî serwer û hegemon bikin. Di felsefeya Yewnan de sedema pêşî, weke vedîtina herî mezin xweda timî ji heman çavkaniyê tê (Li gorî têgihiştina Arîsto û Eflatûn a xwedê). Di dînên yekxwedayî de şêweyê 'En' xwe pê nixumandî xwedayê aleman 'Ellah' e. 'El' ji 'Ellahî' tê. Di bilindbûn û hilatina Romayê de weke 'Jupîter' derdikeve pêşiya me. Di her civakê de ku rejîmên xweda-qraltî û împaratorî têne avakirin, ji bo wan li ser civakê rewa bikin, weke gelek caran hatiye dîtin, serî li têgînên dînî yan jî mîtolojîk dane. Hema hema di her qraltî, împaratorî û rejîma despotîk de, bi têgînan mezinkirin û hewldaneke îdeolojîk a hegemoniyayê tê dîtin. Ji ber ku hegemoniyayeke bi vî rengî li ser zêhnan nebe, rejîmên behsa wan tê kirin nikarin mayînde bibin.

Yekdestdariya kapîtalîst a Ewrûpayê weke şêwe û navenda hegemonîk a nû ya şaristaniyê wexta ku di sedsala 16. de mezin dibû, eşkere haya xwe jê hebû ku hewldaneke bi heman rengî nebe wê nikaribe serwer bibe. Di dîrokê de cara pêşî heta wê demê pere-sermaye (cotkarî, bazirganî û weke amûrê desthilatdariyê ji sermayeyê cudatir şêweyekî sermayeyê) ya xwe di çavî û telşên civakê de veşartibû, weke hêza hegemonîk di nava civakê de û her diçe di çaviyan wê hemûyan de belav û mezin dibe.

Francis, Roger Bacon û Rene Descartes ên ji teolojiya koka xwe Xiristiyantî ye, tên (ango bi koka xwe Sumer Rojhilata Navîn in) li rêbazên nû digerin û ev lêgerîna wan ji nêz ve têkiliya xwe bi derketina hegemoniya maddî re heye. ‘Heqîqet’a bi pey wê ketine çi ji aliyê rêbazê ve, çi jî ji aliyê naverokê ve, bi vî cureyê nû yê sermayeyê re di mezinbûna hegemoniyayê de hevpar e. Yekdestdariya kapîtalîst çiqasî hegemoniya xwe têkûz û qehîm dike, hegemoniya xwe ya îdeolojîk jî bi vê re di zikhev de têkûz û mayînde dike. Rêbaza nû, şoreşên zanist û felsefeyê bi tenê bi hêza veguherîner a şertên maddî dikare ravekirina xwe ya zanistî bike. Bêguman mirov her tiştî bi kapîtalîzmê ve girê bide wê mirov serkorî bike. Nêzîkatiyeke bi vî rengî ketina xefik û reduksiyonîzmeke seresere ye. Lê eger girîngiya têkiliya di navbera wan de were paşguhkirin, lêkolînên heqîqetê wê seqet bimînin û di nava vegotinên metafizîk de wê qîmeta wan nemîne.

Wexta ku mirov têgîna modernîteyê rave bike, liberçavgirtina vê rêbaz û pêkhatina heqîqetê têra xwe hewce dike û mirov dikare gelekî jê hîn bibe. Modernîteyên weke têgîn têne maneya ‘serdemê’ cûrbicûr in; li gorî deman cuda dibin. Ji modernîteya Sumer heta bi modernîteya Romayê, heta der barê gelekî berê û paşê de jî têra xwe mînakên modernîteyê hene. Modernîteya Romayê demekê li tevahiya navendên şaristaniyan bi serbilindî pêk dihat û dimeşiya, ma kes dikare vê înkar bike? Sumerî û hê gelekî beriya wan modernîteya Mezopotamya Jor ji aliyê zeman û naverokê ve belkî mînakên herî bi heybet pêşkêş dikin û ma em bi vedîtinên arkeolojîk bi dilnizmî li van mînakan temaşe nakin û hîn nabin?

Çanda maddî ya van modernîteyên xwedî naveroka şoreşî, heta ku mirov maneyê nede wan ma dikare rave bike?

Anthony Giddens wexta cudahiya modernîteya kapîtalîst ji tevahiya modernîteyên din datîne holê, di ravekirina heqîqetê de hinekî alîkariyê dike. Eşkere ye ku mirov dikare vê rewşa Giddens fêhm bike, ji ber ku ew zarokê hegemoniya Ingilîz e. Ji bo her rewşenbîrê modern îddîakirina yekanetiya modernîteya wî, weke îbadet û deyndariya wî ya li hemberî welatê wî û dewleta wî ya netewe ye (xwedaperestiya nû). Modernîteya kapîtalîst li ser sêlingan dide rûşkandin û mirov ji vê jî dikare hîn bibe. Ya rastî, modernîteyê weke kategoriyeke jor ji kapîtalîzmê vediqetîne. Wexta vê dike, helwesta dibe xwediyê wê, eşkere ye ku zêhniyeta ‘yekdestdar’ a li ser rêbaza zanistê serdest e. Naxwaze şens bide tîpeke din a modernîteyê. Eger modernîte hebe wê tek be; di heman demê de du cure modernîte nabin! Ev xusûs bi rast, çep û navîn zêhniyeteke hevpar e, li ser tevahî ekolên zanista civakî serdest e. Di serî de K. Marks rewşenbîrên çepgir hemû, ji tektiya modernîteyê, cureyê wê yê Ewrûpayê şik û guman nedibirin. Beşên rewşenbîran ên rastgir û navîn, û rewşenbîrên lîberalan jî bi xwe bawerbûn ku gotina dawî ya rastiyê ne (Îslama Serdema Navîn jî gotina ‘pêxemberê dawî’ bi kar anî û ev jî gelekî dişibe vegotina wê!). Lê vegotinên cuda yên di vegotina postmodern de xwe nû nîşan didin.

Bêguman rexnekirina modernîteyê ya Nietzsche girîng e. Rexnekirina modernîteyê ya dînî bi tenê di çarçoveya modernîteya wan de (serdema kevin a li dawiya serdema nû mayî) maneyek xwe heye. Îdeaya Michel Foucault a dibêje, modernîte bi mirina mirov bi encam bû girîng e, lê kêm e. Sosyalîzma pêkhatî jî tevî hemû îdeayên xwe yên cuda, ne teorîk ne jî pratîk ti carî xwe weke modernîteyeke cuda pêk nehat. Derdorên fermî yên sosyalîzma pêkhatî timûtim îdea dikirin ku bûne medeniyet, ya rastî, mebesta wan ji vê pêşdeçûn û di her qadê de pêşbaziya bi kapîtalîzmê re bû. Fikirîne ku ji kapîtalîzmê bêtir nêzî qalibên bingehîn ên modernîteya kapîtalîst û sipartekên wê (îndustriyalîzm, dewleta netewe, li şûna kapîtalîzma taybet kapîtalîzma dewletê) ne, û dana pêşiyê ji xwe re weke wezîfe qebûl kirine. Di serî de ezmûnên Rûsya û Çînê ezmûnên sosyalîzma

pêkhatî dereng neman û ispat kirin ku ji modernîteya kapîtalîst re bûne xwîneke teze. Bi tevahî tevgerên rizgariya neteweyî armanca wan a bi tenê demekê berî demekê xwe gihandina modernîteya serdest a asta herî jor a serketinê bû û bi vî awayî wan ê jiyana şadî û bexteweriyê bi cih bianîya. Bi vî awayî hatibû hûnandin û pratîk jî bi vî rengî bû. Ji vê pirr kêm guman dihat kirin.

Ya rastî, wexta ku mirov ji aliyê şêwe û naverokê ve modernîteya serdest a çarsed salên dawî lêbikole, mirov ne tenê bibîne şêweyê herî dawî yê serdemên şaristaniyên (modernîteyên) pênc hezar salî ye; herweha mirov ê bibîne û ne zehmet be ku mirov analîz bike mîna neynûk û goşt hewcedarî hev in, û ji xelekên cuda yên zincîrwarî pêk tên.

Çi di vê cildê de çi jî di du cildên berî vê de ya min hewl da bikim, hilweşandina zêhniyeta vê modernîteya gerdûnî ya tekperest e. Wexta ku ez hilweşandin dibêjim, min timî anî ziman û hewl da piştrast bikim ku alternatîf jî timî bi modernîteya serdest re her hebû, tevî hemû hewldanên sergirtin û tepisandinê weke serê din ê diyalektîkê, bi tevahî şêwe û naveroka xwe, hebûna xwe dewam kir. Şaristaniya demokratîk weke nav belkî kêm be; dibe ku hewcedarî bi gelek rexneyan hebe. Lê ti carî dil û zêhnê min razî nebû ku ez çi wesfê civakê yê civaka dîrokî (nêzîkatiya Fernand Braudel der barê mijarê de cesaret dida mirov) çi jî ji civaka klan heta bi komên eşîr, qebîle, qewm, gund, cemaetên dînî û hwd. tevgerên di dîrokê de tijî ne, bi heman nêzîkatiyên şaristaniyê (bajar-dewlet-çîn) bi gotinên sivik ên weke 'barbar' an jî 'paşverûtiya dînî' bi nav bikim. Piştî ku ez baş lê hayil bûm ku diyalektîk timî weke qutbên hevdu tine dikin naxebite, çawa ku di pêkhatina gerdûnî ya giştî de tê dîtin, pirr zehmet nebû ku ez bibînim di pêşketina diyalektîkî ya civaka dîrokî de ku tine nake (car caran dibe, lê dewamî nabe), şaristanî ne tekperest, pêvajoyeke dualî ye. Ji vir û pêve, herçiqasî di şert û mercên zor de be û ez bê amadekarîbim jî di van cildan de hewl didim weke ceribandinekê bînim ziman û pêşkêş bikim. Ya min matmayî dihêle û min hêrs dike ew e, tevî ewqas gurçûpêçî û amadekarî, zanyarên civakî yên navenda wan Ewrûpa,

çima hewl nadin vê dualîteya şaristaniyê weke du modernîteyên cuda sîstematîze bikin.

Em careke din li sê hêmanên bingehîn ên ku Anthony Giddens ew weke modernîte kiriye têgîn vegerin û em binêrin ka çi maneyê îfade dikin û em hewl bidin bersivên qutba dijber ên têgîna modernîteya demokratîk analîz bikin.

## A- Jihevkirina Kapîtalîzm û Modernîteyê

Li gorî Anthony Giddens (Bêguman zanyarên civakî yê navenda wan Ewrûpa pirraniya wan di vê mijarê de hemfikir in) kapîtalîzm di dîrokê de cara pêşî li Ewrûpayê derketiye holê. Di ti dem û mekanê dîrokê de mîna wê nehatiye dîtin. Kapîtalîzma behsa wê tê kirin di sedsala 16. de kapîtalîzma weke navenda hêza hegemonîk a dinyayê li Amsterdam-Hollanda, London-Ingilîstanê mezin bûye. Amsterdam û London bi rastî ji vê sedsalê û pêve hegemoniya navendî ya şaristaniya klasîk dewr girtine û di vê de jî para rastiyê heye. Ev dewrgirtina hegemonîk çawa pêk hatiye, belkî jî dîroka dinyayê bi tenê der barê vê demê de xwedî lîteratura herî berfireh e. Ji lewra ne îmkana dubarekirina vê heye, ne jî hewce dike; ez bi tenê qîma xwe bi bibîrxistinê tînim. Hinekî jî min di cildên din de anîbû ziman. Aliyên vê pênaseyê yên kêm û şaş girîng in.

**a-** Îdeaya der barê tektiya kapîtalîzmê de rast nîne. Min bi awayekî berfireh diyar kiribû ku yekdestdariya sermayeyê ya pêşî (kapîtal) li perestgeha rahiban a Sumeran (Zîggûrat belkî banke û fabrîkeya pêşî ye) pêk hat. Bi vê ve girêdayî, em bi hêsanî dikarin bibêjin, sêberiya bajar-çîn-dewlet weke yekdestdariya hegemonîk şêwegirtina xwe deyndarê Sumeran in. Nexasim Andre Gunder Frank û koma hevalên wî yên nêzî van fikran, piştî ku ez fikrên wan ên der barê sîstema dinya û şaristaniya navendî de hîn bûm, ez di fikrê xwe de bêhtir bi hêz û îqna bûm. Herweha ez bi israr vê dibêjim: yekdestdariya desthilatdariyê jî şêweyekî cuda yê yekdestdariya sermayê ye. Min destnîşan kir ku girîng e, mirov serwext bibe ku ew yek ji çar cureyên danehevê ye. Di cotkariya berhemdariya xwe

zêdebûyî de yekdestdariya pêşî hatiye damezrandin. Ji ber ku herêm bazirganiyê ferz dike, îmkanên yekdestdariya bazirganiyê çêbûne. Herweha li ser zaneatkariya bajar-perestgehê yekdestdariya pêşî ya îndustriyê pêk tê. Rêveberiya bajêr jî erk û wezîfeya eskerî û îdarî girtibû ser xwe, lê di nav sisiyên pêşiyê yên hişk hevkar de yekdestdarê desthilatdariya herî bi hêz bû. Ji ber ku rêjeya hêzan diguhere û cuda ye, ev yek têkiliya hegemonîk ferz dike. Di destpêkê de hegemoniya rahiban bi hêz e, lê paşê ev rewş ê bi dor biguhere. Bi kurtî hem yekdestdarî, hem jî karekterê hegemonîk hê di qonaxa damezrandinê de hene. Min di cildên berê de hewl dabû bi xelekên seresere pêşdeçûna wê ya dîrokî pêşkêş bikim. Herweha tespîteke din a girîng a ku min der barê yekdestdariyên şaristaniyê de kiribû wisa bû: Di nava xwe de çiqasî şer bikin jî li dijî derve (li dijî hêzên şaristaniya demokratîk) xisleta wan e ku bi hev re û bi awayekî dîrokî mîna xelekên zincîrekê tev bigerin. Ti şaristanî bêyî mîrateya şaristaniya din hebe nikarîbû derkeve holê. Ez behsa sîstema şaristaniya navendî dikim, naxwe ez behsa Çîn û Înkayan nakim.

Min hewl dabû ez dûvdirêj çîroka pêkhatina xeleka şaristaniya Ewrûpayê pêşkêş bikim. Min têkiliya wê bi şaristaniya Rojhilat re heta bi neolîtîkê re, rola veguhestinê ya Venedîkê ya ji sêsed salî zêdetir bi girîngî diyarkiribû. Hêmana herî girîng a der barê îdeaya tekîtiya şaristaniya Ewrûpaya (bi maneya modernîteyê) piştî sedsala 16. de wesfê wê yê zêdetir pêşketî pere-sermaye ye. Bêguman yekdestdariya pere-sermayeyê yekemîn yekdestdariya xwe ya hegemonîk ji vê sedsalê û pêve karîbû li Ewrûpayê damezrîne. Di vê çarçoveyê de mirov dikare behsa tektiya wê û bêhemtabûna wê bike. Lê eşkere ye ku mumkîn nîne, mirov Ewrûpayê weke welatê esasî yê pere-sermayeyê û dîroka wan jî weke vê demê destnîşan bike. Alavên mîna pereyan ên pêşî bi gelekî beriya şaristaniyê ne. Pisporên der barê mijara serdema destpêkê de lêkolîn kirine, hemfikir in ku obsîdyen û maddeyên mîna wan bi rola pereyê pêşî rabûne. Gelek maddeyên bi nirx û qîmet di civakên komin ên pêşî de bi heman rolê radibin. Pereyê pêşî li Qraltiya Lîdyayê ku li rojhilatê Ege'yê di sedsala 7. B.Z. de hatiye avakirin weke pereyên zêr ên Kreuzus hatine çapkirin û

bawer dikim ku kesên bi mijarê re têkildar giş vê dizanin. Ji bo daneheva pere-sermayeyê jî mirov dikare heman xusûsan diyar bike. Komkirin û danehev rêûresmeke gelekî kevn e. Alav û madenên bi nirx di vê çarçoveyê de tevahiya dîrokê hatine komkirin. Belgeyên arkeolojîk di vê mijarê de têra xwe mînakan didin. Gotina 'mîna Qarûn dewlemend e' vê rastiyê tîne ziman. Bi karanîna pere-sermayeyê bi armanca karê, ti tişt bi qasî Karûmên Asûr (maneyek wê ya yekbûyî mîna pere, bazirganî, bazar û kewara berheman heye) bi awayekî orjînal û balkêş nikarin rave bikin. Berî Venedîk, Amsterdam û Londonê bi hezarê salan bi hezaran bajarên Rojhilat hene ji pere-sermayeyê re kon vedane.

Tektiya Ewrûpayê di warê pere-sermayeyê de ew e, pêşde diçe û cara pêşî hegemoniya xwe ava dike. Karl Marks, bi vî awayî pêşdeçûna sermayeyê û bi vî cureyî damezrandina hegemoniya wê ku mohra xwe li modernîteyê dide, erênî dibîne û bi şêweyê roleke pêşdebir dinirxîne. I. Wallerstein, vê hegemoniyayê dişibîne şêrê ji qefesê derketiye û xwe hewce his dike ku rola wê ya erênî bi girîngî destnîşan bike. Heta wexta sedemên derketina holê bi qelsbûna dêr û qraltiyê û li Rojhilat bi dagirkeriya Moxolan ve girê dide, hema hema mîna li xwe mikur tê (berê) ku bi pirsên mezin ên îşaretê re rûbirû ye. Di encamê de tê wê nuqteyê ku ji bo dîrokê alternatîfeke hîç baş nebûye. Ev der ne cihê wê ye ku mirov bîlançoya xeternak a serweriya çarsed salî ya pere-sermayeyê dubare bike. Bi tenê hejmara mirovên di şeran de mirin û birîndar bûn, hejmar û dema şeran, encamên hilweşîner ên pêxîrtengiya ekonomîk, rêjeyên bêkarî û xizaniyê, ya ji vê jî girîngtir mirov wexta di felaketên ekolojîk de para wê binivîsîne, wê zehmet nebe ku mirov texmîn bike, em bi hegemoniyayeke çawa û bi çi rengî re rûbirû ne.

**b-** Îdeaya kêm û şaş jî tektiya modernîteyê ya xwe disipêre kapîtalîzmê ye. Ev îdeaya zanista civakî ya navend Ewrûpa gelekî berfireh û dorgir e. Hebûna xwe weke sîstema dinyayê û şamilbûna xwe weke 'dawiya dîrokê', 'gotina dawî' ya heqîqetê ebedî dike û di vî warî de ji serdemên berê kêmtir nîne. Heta bi îdeaya zanistiyê hê bêtir bi misogerî radibe. Hegemoniya îedolojîk a lîberalîzmê bi hevgirtina yekdestdariyên

medyayê hewl didin vê îdeayê weke heqîqeta tevahiya mirovatiyê bidin qebûlkirin û ji bo vê jî mîna serdemekê (serdema înformatîk, medya) di nava serdemekê de pêk bînin bi awayekî awarte hewl didin. Rastiyê weke naverok û şêwe bi girîngî hewl dide di nava şaxên wê yên dîrokî de pêşkêş bike, lê ji avakirina futurolojiyeke (zanista paşerojê) ji rabihurî û îro qut jî paşve namîne. Bi awayekî çavsorane 'nihaperest e'. Slogana "Niha bijî wekî din tewş e" weke baweriya bingehîn bi kar tîne. Neolîberalîzma bi têgihiştina ji tevahiya qalibên fikr û îdeolojiyên berê û nû pevekirî pêkaniye, weke xirabê xiraban mîna rewşa dawî ya Romayê bi bîr dixe. Sê 'S' –spor, seks û sinaet (huner)-, di dema xwe ya herî zêde îdeolojîkbûnê de ne. Bi tevahî gihiştine asteke dînî. Di roja me ya îro de zehmet e ku mirov dînekî ji şahiyeke futbolê ya li stadyûmekê afyonkertir, peyda bike. Di îndustriya huner de jî bûyerên bi heman rengî hene. Xerîzeyeke xwezayî ya mîna têkiliya cinsî gelekî normal jî veguherandine îndustriya seksê. Bandora afyonker a seksê jî herî kêm bi qasî ya spor û hunerê kirine dînî. Mirov ji van sê 'S'yan re bibêje şahiyên dînî yên modernîteyê belkî jî bêtir di cih de ye. Li ser navê dîn, dînperestiya radîkal jî meyleke modernîteyê ye. Herçiqasî xwe weke antî-modern nîşan bide jî ev welê ye.

Wexta ku mirov hûrûkûr lê binêre wê bibîne ku modernîteya bi mohra kapîtalîzmê cureyê herî bi xwe nebawer e. Ev çend hewcedariya wê ya bi pevekirinê, vê rastiya wê piştrast dike. Postmodernîzm herçiqasî weke berhemê vê bi xwe bawer nebûnê derket holê jî nikarîbû bibe alternatîfê modernîteyê. Ji rewşenbîrên ji modernîteyê zivêr bûyî re dixwest bi tenê pencereyekê veke. Bi şêwazê xwe yê jiyanê heta bi qirika xwe di modernîteya kapîtalîst de noq bûye. Mirov mînaka vê ya tîpîk dikare li cem fîlozof Adorno bibîne. Adorno wexta dibêje "Jiyana çewt rast nayê jiyîn" modernîteyê bi hindikî û rindikî rave dike. Lê di warê pêşkêşkirina alternatîfê de tine bû. Ji ber vê yekê ciwanên şoreşger gelekî jê ne razîbûn. Ya rastî, neolîberalîzmê dixwest ji bo modernîteya cîla wê hatibû xwarê bibe cîlayeke nû. Lê çiqasî lê zêde bike û nû bike jî rizgarkirina sîstemê û sergirtina nakokiyên serdema yekdestdariya fînansê ya global, hêsan nîne.

Andre Gunder Frank di pêvajoya pênc hezar salî ya şaristaniyê de wexta cih û girîngiya şaristaniya Ewrûpayê diyar dike gelekî nêzî rastiyê bûye. Lê çawa ku ew bi xwe jî kêmasiyê his dike, ji bilî çend gotinên giştî, nikare çareserî yan jî alternatîfê pêşkêş bike. Ya rastî, hêviya xwe heye. Di nava şaristaniya klasîk de formula 'di nava cudatiyan de yekîtî' tevî ku rast e, zêde formuleke giştîkirî ye. Bi ti awayî rave nake ka wê çawa bi cih bê anîn. Şaşiya wî jî ew e, hêviya xwe heye, di nava sîstemê de jiyanên modern (di teorî û pratîkê de) ên cuda û baş pêkan bin. I. Wallerstein di vê mijarê de erênî û radîkal e; ji çareseriya di nava sîstemê de hîç bawer nake. Bêyî ku zivêr bibe, dubare tîne ziman sedema pêxîrtengiyê ji avabûn û sîstemê ye, û bi awayekî gelekî mafdar pêşniyar dike ku mirov bi çar destan xwedî li wezîfeyên entelektuelî, exlaqî û polîtîkî derkevin. Kêmasiya wî ew e, nikare bersiveke berfireh bide pirsa kîjan sîstem. Di vî warî de bi awayekî jidil xwe rexne jî dike û weha dibêje, "Me hemûyan li perestgeha pîroz a bûrjûwaziyê ji heman şerbetê vexwar." Herweha ji ber van sedeman tirsa xwe (bi awayekî mecazî) ji xezeba xwedayan a bi serê mirovan de bînin, îfade dike. Balê dikişîne ser sermayeya entelektuel û destnîşan dike ku çiqasî bi modernîteya kapîtalîst ve girêdayî ye, û bi awayekî radîkal qutbûna wê ji modernîteya kapîtalîst bi gotina, gelekî zehmet, tîne ziman. Di vî warî de gelek gotinên mirov ji wan ders bigire vedibêje.

Mirov dikare rewşa min jî bi gotina "Reva ji ruhstîn feydeya xwe nîne" fêhm bike. Ez ji 'modernîteya kapîtalîst' direviyam. Lê vê têrê nedikir ji bo ez karibim ji destê wê xilas bibim. Ji lewra li şûna ez di nav destê wê de bimirim, min hê bi cesaret û helwesteke rast dît ku ez xwe li pêkanîna alternatîfa wê rakişînim û biceribînim. Bi vî awayî, min weke Nietzsche ne bi tenê qîma xwe bi gotinê anî, ne jî weke Michel Foucault bi tenê bi îlankirina mirina xwe (weke mirovatî) razî bûm, ne jî weke Adorno bûm çarenûsperest û xeyidîm û min negot "Li çareya (eniya) mirov çi nivîsîbe mirov ê bibîne", ne jî mîna Andre Gunder Frank min xwe avêt bextê slogana 'di nava cudatiyan de yekîtî' û min qîma xwe pê neanî. Heta weke I. Wallerstein min bawer nekir ku sêberiya wezîfeyan a entelektuel, exlaqî (etîk) û polîtîk têrê dike. Bêguman ji bo vê ceribandinê, min ji van mirovên

fazîlet û fikrê gelekî cesaret û alîkarî girtiye. Lê ji bo min gotina diyarker û ya nayê guftûgokirin ew e, “Jiyana çewt, rast nayê jiyîn”. Ji ber ku li gorî vê gotin û hevokê ti jiyana min çênebû. Ez gelekî beziyam, lê ji bo ez jiyana modern a kapîtalîst zevt bikim ne hêza min û ne jî baweriya min têrê kir. Ji vê jî wêdetir a kezeba mirov dişewitand mirovê di şexsê min de serî hildabû digot “Me nefiroşe, tu li çi digerî di xwe de bibîne.” Ez serhildanên xwe dinivîsim.

Mirov dikarin bipirsin, hêzên moderníteyê û sêlingên wê yên ji nîzamên Nemrûd û Firewnan mîlyonan car zêdetir xwe bi hêz kirine, pênc hezar sal in ku ti zêhn û ruh nehiştine reh û şaxên xwe bernedabin nava wan, di çarsed salên dawî de jî, ji hundir heta derve, ji hewa hawîrdorê heta bi binê erdê ti devereke civakê nehiştiye ku destê xwe neavêtibiyê, ti nirxekî wê nehiştiye ku nekiribe meta, nefirotibe û nekirîbe, ma tu çi dikarî bi hêzeke welê bikî? Bi vî awayî pirskirin bêguman şaş e. Ji ber ku ez bi şêwazê modernîte dixwaze dipirsim. Armanca min ew e, ez ji her tiştê rê li hûnandina vê pirsê û yên pişt wê vedikin, bidim nîşan ku ti qîmeta wan nîne (bi maneya erênî).

Ez modernîteya demokratîk ne keşif dikim, ne jî îcad dikim. Di warê jinûveavakirinê de herçiqasî gotinên min ên ez bibêjim hebin jî zêde girîngiyê pê nadim. Ya rastî, xusûsa girîng tiştekî din e, ew jî ev e: Modernîteya Demokratîk weke dualî ji dema şaristaniya fermî pêk hatiye û vir ve her heye. Li mekanê pêkhatî û her demê heye. Ya ez hewl didim bikim ew e, bi hişkeberî û bêteşe be jî ev şêweyê şaristaniyê (şaristaniya demokratîk a ne fermî; nav jî gelekî girîng nîne) yê li her mekan û zemanê şaristaniya fermî hebû, nirxê heq dike bidimê û hêmanên wê yên sereke bi awayekî balkêş rave bikim. Herweha hewl didim, der barê şêweyê wê yê bingehîn ê zêhniyetê, avahiyên wê û civaka wê ya dijî de pênaseyan bikim.

Şaristaniya (modernîteyên cuda yên serdeman) tê îdeakirin ku tek e, li her devera destê wê pê bûye û dewra wê ya di her zemanî de derbas bûye, li gorî diyalektîkê diyarkirina dijberekî wê xusûsek e ku ti sedem nînin mirov fêhm neke. Berevajî, ya nayê fêhmkirin ew e, rêbaza diyalektîkê ev dijbertiya herî xwezayî çima tevahiya dîroka şaristaniyê bi awayekî

sîstematîk îfade nekiriye, ne aniye ziman. Wexta ku ji Sumer heta bi Misr û Harappayê, ji Çîn û Hindê heta bi Romayê ewqas şaristanî pêk dihatin, ên dihatin tengavkirin, kolekirin; ji Sahraya Mezin ber bi çolên Asyayê, ji Sibîryayê ber bi Erebistanê ve bê hejmar qebîle, eşîr û cemaetên dînî yên mîna lehiyan herikîn ma wê qet avabûneke wan dijber a fikrê, civakî û nerazîbûna wan nebe? Ma mumkîn e ku li vê nehatibe fikirîn? Komên gund û cotkariyê yên bi deh hezaran sal tevahiya şaristaniyan xwedî kirin, ma dibe ku ti deng, nerazîbûn û avahiyeke wan a dijber nebe? Ma ev xusûseke welê ye, aqil û însaf qebûl bike? Bajarên bi hezar salan e ku ava kirine, wexta ji aliyê serwerên wan ve her cure zordestî û mêtinkarî were kirin, gelên kedkar wê bê deng bibin û ji bo rewşa ketinê malavahiya wan bikin? Ma ev gengaz û mumkîn e?

Mirov dikare der barê bi hezaran qad û deman de bi hezaran pirsan bike. Bersivên wan jî hene. Ya tineye, bersiva pirsa çima sîstematîkeke şaristaniyê (avakirina fikrê, teorî) ya ji van bersivan hûnandî pêk nehatiye. Avahiyên dijber jî (helwesta civaka exlaqî û polîtîk) hene. Ya tineye, eleqeya ji hezaran despot, împarator û yekdestdarên sermaye û desthilatdariyê re tê nîşandan, ji rewşa herî bingehîn a xwezaya civakî re, ji rewş û pêşketina civaka exlaqî û polîtîk re nayê nîşandan.

Şaristaniya Îslamê ya em baş nas dikin, der barê tevahiya xelîfe, siltan, emîr, şêx, şehînşah û fermandarên wê de agahî kite bi kete têne dayîn, dikin çîrok û têne gotin, lê mezheb û terîqetên bawermend û mumînên li sê parzemînan belavbûyî, bawerî, hesret û berxwedanên wan bi awayekî heq kirine yan wê hîç di dîrokê de cih negirin an jî bi awayekî berevajîkirî wan bikin çîrok û bibêjin. Eşkere ye ku li vir şerekî navxweyî yê şaristaniyê û dualîbûnek heye. Lê li vir aliyek bi awayekî bê sînor pesnê wî tê dayîn û mezinkirin, dijber jî reş û xirab kirine, xistine bin erdê. Ez di jiyana xwe de bi xwe jî şahid im, min li cem Kurdên Elewî, Kurdên Sunnî û Kurdên Êzîdî jî dît. Ez eşkere bibêjim, min şaristaniya li cem Kurdên Elewî û Êzîdî dît ku ji hezarê salan ve tê, min ji şaristaniya dijber gelekî zêdetir exlaqî û polîtîk dît. Li beramberî vê, vegotinên şaristaniya klasîk der barê Elewî û Êzîdiyan de yên mirov nikare wan bi lêv bike tijî ne. Bêguman li vir mebesta min

kedkarên Sunnî, çandên qebîle û eşîran nînin. Mînakên vê jî mirov dikare li her zeman û mekanî nîşan bide. Bawer dikim evqasa ji bo armanca me diyar bike têrê dike.

Ez divê diyar bikim ku zelalkirina xusûsa der barê modernîteyê de jî girîng e. Têgîna modernîteya kapîtalîst bi awayekî rast nîne. Divê mirov hay jê hebe ku ez vê têgînê bi şert bi kar tînim. Çawa ku têgîna civaka kapîtalîst bi tehlûke ye, rîska xwe heye ser rastiyê bigire û bi guman e, belkî jî ji bo têgîna modernîteya kapîtalîst mirov zêdetir dibe xwedî fikarên bi heman rengî û divê mirov bi tevdîr nêzîk bibe. Modernîte bi maneyeke giştî navê şêwazê jiyana serdemekê ye. Bi tevahî hêmanên teknîk, zanist, huner, siyaset û modayê yên weke çanda maddî û manewî mohra xwe li demekê xistine, digire nava xwe. Di vê çarçoveyê de mirov moderniteyê bike malê kapîtalîzmê wê bibe şaşiyeke mezin. Heta bi gelek hêmanên xwe bi giranî li dijî kapîtalîzma yekdestdar e. Çawa ku şêwazê jiyana bingehîn ê xwezaya civakî weke civaka exlaqî û polîtîk bi giştî li dijî şaristaniyê, bi taybetî jî li dijî şaristaniya kapîtalîst e, modernîte jî xwedî helwesteke bi heman rengî ye. Civaka modern civaka kapîtalîst nîne. Hingê min têgîna modernîteya kapîtalîst çima bi kar anî? Ji ber ku yekdestdariya kapîtalîst tevî hevgirtiyên xwe yên hegemonîk bi qasî li civakê xistine dixwazin mohra xwe li şêwazê jiyana demê yê weke modernîte tê qebûlkirin jî bixin. Bi hevgirtiyên xwe yên îdeolojîk, polîtîk-eskerî mîna afirîner û pêkhênerê jiyana serdemê be, bi awayekî gelekî sîstematîk hewl dide. Hewldana xwe bi perwerde, qişle, perestgehên îbadetê û amûrên medyayê pêk tîne. Zêhniyeteke welê serwer diafirîne, tiştên ne yên wî bin, weke ku yên wî bin nîşan dide. Eger ji vî alî ve di hewldanên xwe de bi ser ketibe, ev tê wê maneyê ku serketî mohra xwe li civak û modernîteyê xistiye.

Antony Giddens wexta kapîtalîzmê weke lingê herî girîng ê modernîteyê dihesibîne, belkî jî haya wî ji wî nîne ku ketiye nakokiyeke dualî. Pirsa divê were kirin ev e, kîjan ji kîjanê çêbûye yan jî kîjan kîjanê diyar dike. Nabe ku mirov bifikire kapîtalîzm ji modernîteyê çêbûye; weke serdema xweser a xwezaya civakî pêk tê. Lê weke bajar-çîn-dewlet piştî ku yekdestdariyên zordestî û mêtinkariyê pêk tên, dixwazin mohra xwe li şêwazê jiyana demê

bixin û bikin malê xwe. Divê mirov qebûl bike ku di rewşeke welê de bi giranî bi serketine. Ya heta îro hatî û her hebû, serketina propagandayê ye. Serdemeke evçend mezin, kirine malê heramzadeyan. Ji lewra wexta em têgîna moderníteya kapîtalîst bi kar bînin divê ev şertê me hertim li ber çav were girtin û fikara me ya di vî warî de neyê jibîrkirin. Lê xwezaya civakî ti carî bi temamî kapîtalîzm an jî rengê yekdestdariyeke din, şêwazê hebûna wê weke nasnameya xwe qebûl nake. Xwezayên civakî weke ku xwe bi xwe ne, bi awayekî teorîk nikarin veguherin şebekeyeke yekdestdarî, mêtinkarî û zordestiyê. Çawa ku me ispat kir ku kapîtalîzma xwerû nabe, bi heman awayî pêkhatina şaristaniya xwerû jî mumkîn nîne. Yên dibêjin mumkîn e, divê mirov ji wan bipirse: Sêberiya bajar-çîn-dewlet, bêyî ku civakeke bibe mêtingeh û birêvebirin hebe, wê çawa bi tenê û bi xwe hebin? Bi kêmanî wê jiyana xwe ya maddî çawa dewam bikin? Lê ev sêber mohra xwe li xwezaya civakî ya demê dixin û dikarin îstîsmar bikin. Dema ku mijar bibe Ewrûpa, em nikarin Ronesans, Reform û Rohnîbûnê bikin malê kapîtalîzmê. Afirînerên wan ti carî pere-sermayedar û desthilatdarî nebûn; lê bi hêza pere û desthilatdariyê her tim hewl dane mohra xwe lê bidin. Ji ber ku baş dizanin ku di vê hewldana xwe de bi ser bikevin wê zêdetir bibin xwediyê pereyan û desthilatdariyê.

Weke dijber, civaka hedefa pere-sermaye û desthilatdariyane jî dikare mohra xwe li şêwazê jiyana serdemê bixe. Gelek rê û mînakên wê hene. Xwezaya civakî bi xwe jî bi awayekî bingehîn meyldarî vê yekê ye. Civak bi giranî antî-kapîtalîst e. Ji ber ku tehekum û mêtinkariya yekdestdariya sermayeyê rojane dibîne. Ciwan, jin, bêkar, gelên mêtingeh, gelek cemaetên dînî, her koma bi keda xwe debara xwe dike, girseya bingehîn a civaka dîrokî (demos) ew beş in ku rengê esasî yê moderníte û şêwazê jiyana serdemê didinê. Em ji tevahiya van beşan re ji bo hêsanî be dibêjin **gel** (demos). Beşên em behsa wan dikin wexta ku xwe bi xwe rêve bibin, em ji vê re **demokrasî** dibêjin. Têgînên civaka demokratîk û moderníteya demokratîk, tevî ku têgînên polîtîk in jî lê ji ber qad û beşên civakê yên girseya bingehîn dihewînin û pêk tînin, têgînên nêzî rastî û cewherê mijarê ne. Ji ber vê yekê misêwa bikaranîna min a van têgînan divê bi xweşbînî û

serwextî were qebûlkirin. Ez wexta dibêjim alternatîfa modernîteya demokratîk mebesta min ev rastî ye. Ji lewra şêwazê modernîteyê yê tekperest ê A. Giddens, hem jî têgîna modernîteyê ya bi mohra kapîtalîzmê, têgînên gelekî nediyar û xwedî potansiyela şaşiyên xwe zêde ne.

Ya rengê modernîteyekê diyar dike, îdeayên qutbên dijber, avahiyên wan, asta têkoşîn û serketina wan e. Bi tevahî mirov bibêje kapîtalîst an jî demokratîk e, reduksiyonîzmeke seresere û çavkorî ye. Jixwe wexta mijar civak be, divê mirov gotina 'bi tevahî' pirr bi baldarî bi kar bîne. Ji ber ku xwezaya civakî tevlîhev e, ti carî 'bi tevahî' nikare bibe berdêla tiştekî û rengekî. Divê mirov ji bîr neke ku ji nakokiyê re cudatî divê. Cudatî jî maneya jiyanê ye. Nakokî, ango kêliya cudatî rawest e, jiyan jî qediyaye. Mirin bi xwe jî ji bilî piştrastkirina jiyanê maneyeke din îfade nake. Jiyaneke hîç mirina xwe nîne, mînak mehkûmê jiyaneke bêserûbinî, hûn difikirin çiqasî tiştekî xeternak e? Ya rastî, jiyaneke bi vî rengî wê bibûya êşkenceyeke gelekî mezin. Timî li yê weke xwe gerîn, eger armanca xwe ya pelixandina dijberê xwe nebe jî dibe înkarkirina jiyanê. Faşîzm ew e, modernîteya kapîtalîst ji bilî modeyê (Mînak mode, cureyekî hunerê ye ku pê mirov têne xapandin. Ji aliyê kapîtalîzmê ve hatiye vedîtin. Bi vê dixwaze dijberiya xwe ya jiyanê veşêre. Di jiyanê de wekhevbûn êşkenceyek e, û dixwaze pê vê veşêre.) hewl dide tevahiya cudahiyên civakî tesfiye bike û her tiştî bixe yek rengî, ev hewldana wan mînakeke din e ku dijberiya wan a bi jiyanê re piştrast dike.

Weke encam, wexta ku em têgîna modernîteyê weke têgîneke nediyar û şîlo bi wesif dikin, destnîşankirinên dem û muhteviyatê girîng in. Tekkirin rê li ber şaşiyên mezin vedike. Serdemtiya şaristaniyê weke rojanetiya wê tê pênasekirin û çarçoveya wê ya civakî hilbijartinên bi dîqqet pêwîst dike. Di vî alî de şaşî û kêmasiyên mezin ên zanistên civakî bala mirov dikişînin. Em vê bi tenê dikarin bi hêza zext û pere ya yekdestdariyên sermaye û desthilatdariyê rave bikin. Çawa ku zanist desthilatdariyê, desthilatdarî jî sermayeyê çêdike, berevajiyê wê jî rast e. Tevî vê yekê, xwezaya civakî weke girseya xwe ya bingehîn di serdema hegemonîk a kapîtalîst de demokratîk e. Ji lewra weke şêwazê jiyanê yê serdemê, mirov nikare

bifikire ku modernîte demokratîk nabe. Modernîteya demokratîk weke hecmê civakî ji modernîteya kapîtalîstî û hevkarên wê qatbiqat bêtir serdest e. Ji bo em fêm bikin bi tenê ya em hewcedarê wê ne, divê em zanibin rast bifikirin.

## B- Şaxê Modernîteyê Îndustriyalîzm û Modernîteya Demokratîk

Serdema me ango şêwazê modern ê jiyana me bi rêjeyeke mislê wê nehatiye dîtin hewcedarê îndustriyê bûye û ev jî rastiyek e. Şoreşa îndustriyê ya sedsala 19. piştî şoreşa cotkariyê duyemîn şoreşa mezin a civakî ye, û kes nikare vê jî înkar bike. Çawa ku di daneheva sermayeyê de jî hat dîtin, îdeaya îndustrî bêhemtayiyeke modernîteya me ye, îdeayeke nepixandî ye. Belkî di asta sedsala 19. de nebe, lê bi giştî di xwezaya civakî de û bi taybetî jî di civaka cotkariyê ya neolîtîk û civakên demên şaristaniyan de gelek pêngavên îndustriyê hatine avêtin. Bi tevahî pêşketinên teknîkî bi awayekî gavavêtinên îndustriyê têne hesibandin û lewma jî ev gavavêtin pêşketinên dewamî ne. Di demên pêngavan de ya diqewime ji aliyê naverokê ve ji qonaxekê derbasbûna qonaxekê îfade dike. Îndustriyên pêşî yên kûzik û dizîkan, destar, destgehên tevnê, tekerik, alet, çakûç-sindan, bivir, kêr, şûr, aş, papîrûs, kaxiz, cûrbicûr aletên madenî û hwd. bi hezaran vedîtinên îndustriyê mirov dikare bijimêre. Lê nayê guftûgokirin ku şoreşa herî mezin a îndustriyê di serê sedsala 19. de bi pêşengiya Ingilîstanê pêngaveke mezin avêtiye. Ev, herçiqasî cudahiyeke girîng a modernîteyê be jî tektiya wê misoger nake, bi tenê cudahiya wê datîne holê.

Ji îndustriyê derbasbûna îndustriyalîzmê rewşeke cudatir e. Îndustriyalîzm îdeolojîkbûna îndustriyê îfade dike. Îndustrîvanî li dijî gund û cotkariyê bi pêş ket, herweha bû dijberê zenaetkariya ji rêûresmê ya bajêr û di pêşketina wê ya ber bi roja me ya îro de pêşî felaketên ekolojîk, di koka tevahiya nexweşiyên modernîteyê de heye. Bêguman îndustrîvanî îdeolojiya yekdestdariyên sermayeyê ye. Di dawiya sedsala 18. de li ber

destê wan mîqdara sermaye û pereyan gelekî zêde bûbû û qadên lê bi kar bînin teng bûbûn (li gorî rewşa wan a rêûresmê). Ji ber vê yekê berê xwe dan pîşesaziyê. Bi vê xwestin pêşiyê li kêmbûna rêjeya karê bigirin, heta xwestin rêjeya karê hê bilindtir bikin (li gorî qanûna karê). Nexasim pîşesaziya tevnê bi vî rengî ye. Kengî hilberîna mekanîk gihişt çavkaniyên nû yên enerjiyê li pêşiya hilberînê bend û sukir teqiyan û rêjeyên karê derketin asta herî jor û bilind. Diyardeya dewleta netewe û reqabeta dijwar a di navbera wan de jî bi vê rêjeya nû ya karê re têkildar e. Îndustriyalîzm ket pêşiya her tiştî û bû baweriya herî pîroz a dewleta netewe. Ev pêşbazî bêyî ku ji leza xwe bikeve heta roja me ya îro dewam dike. Ji niha ve her kes hemfikir e ku encamên wê gihiştine asta herî xeternak û bi tehlûke. Ne bi tenê di çarçoveyeke teng de talana ekolojiyê, bi awayekî hê bi koktir û berfireh qirkirinên çandî û fizîkî, şerên mirov nikare bi ti dema dîrokê re bide berhev di asta xwecihî, herêmî û gerdûnî de pêk tên, her diçe bi rêbazên têne pirrkirin ên îdeolojîk-metafizîk û desthilatdariyê civak ji nasnameya exlaqî û polîtîk tê qutkirin, ango qirkirina civakan ji nêz ve bi dîn an jî meyla îndustriyalîzmê ve têkildar e. Ji lewra zanist û teknîka îndustriyalîzm bi kar tîne bi awayekî bi ti dema dîrokê re mirov nikaribe bide ber hev, naverokeke îdeolojîk bi dest xistiye.

Îndustriyalîzm weke bêhemtatiya modernîteyê, tehlûkeya herî mezin hem a nava civakê û hem jî ya li pêşiya civakê ye. Desthilatdariyan cotkarî û gund xira kirin, bajar mîna kansêrê mezin û belav kirin, bi temamî civak kirin kontrol û çavdêriya xwe, ti çavî nema neçizirîn navê. Di mezinbûna mîna dêwan a desthilatdariyan de îndustriyalîzm hêmana bingehîn e. Dewleta netewe weke forma bingehîn a hegemoniya îdeolojîk û desthilatdariya îndustriyalîzmê, di van pêvajoyan hemûyan de bi rola sereke rabû.

Mirovatî weke xwezaya civakî ji zû ve ketiye bin tehlûkeya rastî ya mehşerî ya îndustriyalîzma bêhemta ya modernîteyê ye. Felaketên serê wan dayî der, îşaret bi tehlûkeyê dikin. Ji xwesteka dewamî ya mezinbûn û komkirinê ya sermayeyê re 'qanûna karê' tê gotin û ev jî tê maneya dijbertiya civakê. Darî çav e ku ka îndustriyalîzm di vê 'qanûna karê' de

çiqasî rol digire. Ferzkirina qanûna dewamî ya danehevê li ser xwezaya civakê, qirkirin û kokqelandina civakê bi xwe ye. Qirkirinên maddî û manewî gavên pêşî yên vê pêvajoyê ne. Her zanyarê hinekî aqilê wî li serê wî û hinekî xwedî wijdan dikare bibîne ku tedbîr neyên stendin rasterast em diçin mehşerê. Îndustriyalîzm weke duyemîn tektiya bêhemta ya moderniteyê, bi kapîtalîzma 'cêwiyê wê siyam' e, bi tenê qîma xwe nayîne mohra xwe li moderniteyê bixe; bi rêya moderniteyê bi tenê rê li pêxîrtengiyan venake, di kansêrbûna tevahî çavî û hêmanên heyatî yên civakê de bi rola sereke radibe.

Tam di vê nuqte û çarçoveyê de di hebûna civakî de statuya moderniteya demokratîk bi hemû pêdivî û eşkerebûna xwe derdikeve holê. Civak yan wê bi çargavan beza xwe ya mehşerê dewam bike, yan jî wê xwe li moderniteya demokratîk bigire, wê mezin bike û pêngava ji nû ve avakirinê ji vê bezê re bibêje, raweste. Mirov li naverastê bi erdê re kaş bibe, her roja diçe berdêlên wê gelekî giran û mezin dibin.

Ev tespît nabêjin îndustrî bi temamî xirab e; balê dikişînin ser felaketa îndustriyalîzma li pey karê diçe. Îndustrî jî mîna di têkiliya aqilê analîtîk de wexta li ser rêya civaka exlaqî û polîtîk rast were bikaranîn dikare mirov bibe jiyaneke mîna cennetê. Pêngaveke îndustriyê ya bi ekolojî û cotkariyê re dest daye hev bi tenê wê pirsgirêkên bingehîn ên ekonomîk çareser neke, wê karibe aliyên neyênî yên pirsgirêkan hemûyan jî erênî bike. Bi tenê xurdekariya otomobîlan a ketiye rewşeke sînor derbaskirî were rawestandin, ji petrolê heta bi çûnûhatinê, ji qirêjbûna hawîrdorê heta bi biyolojiya mirov wê di gelek qadan de encamên di asta şoreşê de derkevin holê. Heta îndustrîkariya deryayê bi vê lezê dewam bike, wê xêr di çûnûhatina derya û reşahiyê de nemîne, eger mirov vê jî li ber çavan bigire, bi awayekî vebirrî bi sînorkirina hejmara wesayîtan wê baştir were fêhmkirin û were zanîn çiqasî bi awayekî heyatî girîng e. Bêguman di serî de bi sînorkirina îndustriyalîzma nukleerî, di gelek şaxên îndustriyê de bi sînorkirina îndustriyalîzmê wê rê li ber gelek guhertinên bi kok vebe, lê cihê wê ye ku mirov di van rêzikan de li ser encamên guhertineke bi vî rengî hûrûkûr bisekine. Li vir bi tenê em dixwazin balê bikişînin ser

encamên bisînorkirina îndustriyalîzmê û were fêhmkirin ku encamên bi vî rengî wê di asta şoreşê de bin. Bi vî awayî serwextbûna li mijarê jî gelekî girîng e.

Bêguman ji bo rawestandina qanûna karê çalakiyeke mezin a civakî divê. Bi awayekî bingehîn a modernîteya demokratîk diajo û dimeşîne kar nîne, lewma ji bo alternatîfbûna şaristaniyê ya herî di cih de ye, û heyatî ye. Fikara sereke ya sîstema civaka exlaqî û polîtîk a xwe nasipêre sîstema çîn-sermaye-karê ew e, nasnameya xwe azad biparêze, ji bo vê jî amûrên siyaseta demokratîk di jiyanê de pêk bîne. Lîberalîzm xwesteka bê sînor a kar û qezencê datîne pêşiya ferd û ji bo vê jî weke yekane şêwazê jiyanê misêwa mizgîniya moderniteya kapîtalîst û îndustriyalîzmê dide. Bi awayekî mîna dînên serdema destpêkê timî hewce dibîne sîstemê pîroz bike. Îndustriyalîzma çandî şêwazê nû yê vê pîrozkirinê ye ku sînor nas nake. Têkoşîna çînî ya ekonomîk, her cure şerên desthilatdariyê, tevgerên femînîst û ekolojîk bi serê xwe, bi tenê dikarin bi moderniteya alternatîf moderniteyeke evçend weke dêwan mezinbûyî rawestînin. Çarsed salên hegemoniya kapîtalîst vê rastiyê têra xwe rave dikin.

Jihevdeketina sosyalîzma pêkhatî bi tenê jî nîşan dide ku nikarîbû moderniteya alternatîf bi pêş bixe û ji bo mirov vê rastiyê fêhm bike jî hewce nake mirov bibe civaknas. Mirov dikare pêşbînî bike ku sosyalîzma pêkhatî ji îndustriyalîzmê re çareserî bidîta jî dikarîbû bi hêsanî serdestiya xwe biparasta. Di serî de yên li ser xeta sosyalîzma pêkhatî diçin, bi tevahî komên sereke yên muxalif (utopyager, anarşîst, şerên rizgariya neteweyî, tevgerên ekolojîst û femînîst) ji bo serketina di şerê moderniteyê de ku hegemoniya kapîtalîst ji bo vê dibeze û ji bo mohra xwe lê bixe her tiştê xwe datîne holê, herî kêm ew jî ji bo têkoşîna xwe ya ji bo moderniteyê xeteke xwe ya sereke ya teorî û pratîkê pêkanîbûna, belkî jî li dinya me şêweyê moderniteya îro bi awayekî din gelekî cuda xuya bikirana. Nuqteya bi tenê û ya hevpar a têde wenda dikin ew e, pirsa "Kîjan modernîte?" nepirsîne û ji bo bersivê li pey xeteke sîstematîk a teorî û pratîkê bi hev re nebeziyane; bi giranî di nava şêwazê jiyanê yê kapîtalîzm û îndustriyalîzmê pêşkêşkirî de heta bi qirikê ketinê û ji jiyana di nava vê de

ti xirabiyê nabînin. Ji vê jî wêdetir û girîngtir, netewetiyeta dewletê weke hêmanekî modernîteyê rexne nakin û piştî ku weke formê bingehîn ê şêweyê jiyanê qebûl dikin, bi giştî muxalefet, bi taybetî jî muxalefeta çepgir xuya nake ku di dozeke bingehîn de bi ser bikeve û bê guman wê ev yek zehmet û nediyar be.

Mijareke din a min matmayî dihêle der barê slogana “Dinyayeke din mumkîn e” de ye. Ev slogan weke keşfeke girîng, peyam an jî zêhniyetekê tê pêşkêşkirin û ev yek matmayîna min zêdetir dike. Li naverastê pirsgirêkên modernîteyê yên bi qasî çiyan mîna ku bibêjin rim di têran de hilnayê, derketine holê, ji her alî ve sîstem kunkunî bûye û diherife tê xwarê, sererd û binerd isyan dikin, vedîtineke bi vî rengî bêhemdî be jî dike ku mirov bibêje evqas jî nabe. Ma wê ji mirov nepirsin? Modernîteya serdest a heyî (modernîteya kapîtalîzm û îndustriyalîzmê mohra xwe lêxistî) bi hemû çavsorî, dînîtî û pirsgirêkên xwe (mebest şêwazê jiyanê ye) li naverastê ye, tu yê bi kîjan alternatîfa xwe, di tevahiya hêmanên sereke de tu yê qîma xwe bi rexnekirinê neyînî, bersivê bidî, wê alternatîfê pêk bînî?

Di dîrokê de tevahiya dîn, felsefe, doktrînên exlaqî û zanyartiyên bi fazîlet, ji bo bersivê bidin pirsgirêkên modernîteya dema xwe, hatine kirin û pêşxistin. Têrê dikin têrê nakin, mirov dikare vê guftûgo bike. Lê ya girîng ew e, hewldanên ji bo civaka exlaqî û polîtîk kêm nebûne. Modernîteya demokratîk li ber rohniya van ezmûn û tecrûbeyan hemûyan, karibe bi bersiv û analîzên berfireh modernîteya kapîtalîst û pirsgirêkên xweserî wê pêşwazî bike, dibe ku maneyekê îfade bike. Dîrok û aktualîte, weke ku yeqîn tê kirin, bi awayekî mutleq meydana serdestiyê ya hêzên şaristaniyê nîne. Di encama gelek propagandayê de ev welê dane qebûlkirin. Çawa ku her dîroka hatiye nivîsîn rast nîne, vegotinên zanista civakî ya modernîteya roja me ya îro jî di her tiştî de rast nînin; bi giranî retorîka şaşkirin, korkirin û dogmakirina hegemoniya îdeolojîk e. Siyaseta demokratîk di çarçoveyeke teng de bi tenê fonksiyonelkirina amûrên civaka polîtîk nîne; di heman demê de çalakiya ji her alî ve ravekirina civaka dîrokî ye. Kengî modernîteya kapîtalîst û îndustriyalîzm bi siyaseta

demokratîk hat ravekirin û bi heqîqetê re bû yek, wê wextê hêza mezin a çalakî û biryarê ya civaka exlaqî û polîtîk wê derkeve holê. Hingê pirsa “Modernîte û jiyaneke serdemî ya çawa?” wê bersiva heq dike û hêja ye, bibîne. Ezmûna çarsed salên dawî ya hegemoniya kapîtalîst piştrast dike ku wekî din ti rêbaz bersivên têr û bibin serketinê nadin. Modernîteya demokratîk ji vê ezmûna dîrokî re bi îdea û pratîkên xwe bersiveke kêrhatî û jêhatî ye.

## C- Dewleta Netewe, Modernîte û Konfederalîzma Demokratîk

Sêyemîn nedomdariya herî girîng a modernîteyê dewleta netewe, forma amûrî ya herî bingehîn a mêtingehkirin û fetihkirina civakê ya kapîtalîzmê ye. Lîberalîzm xwe weke yekparetiya armancan (civaka îdeayan) pêşkêş dike, dewleta netewe weke formê desthilatdariyê yê bingehîn dibe xwedî mane. Fetihkirin û mêtingehkirina herî berfireh a li hundir û derve ya civakê di dîroka xwe de dîtî, forma dewleta netewe nebe nabe.

Mijara ku zanistên civakî li serê herî zêde korkirin, berevajîkirin û dogmakirinê dikin, dîsa dewleta netewe ye. Gelekî zehmet e ku mirov bibêje, analîzeke berfireh a dewletê hatiye kirin. Marksîstekî mîna Lenîn jî wexta ji bo yek ji şoreşa civakî ya herî mezin a dîrokê gav diavêt, nikarîbû analîzkirina ‘pirsgirêka dewlet û desthilatdariyê’ ji lingê modernîteyê dewleta netewe, rizgar bike. Bihêlin rizgarkirinê, tevî rexneyan hemûyan rêxistiniya civaka demokratîk weke Sovyetê bi lez ber bi veguherîna dewleta netewe ve çûyîna wê weke têkûzkirina şoreşê dinirxîne. Dewleta netewe ya Çînê ya xizmeta herî mezin ji kapîtalîzma dinyayê ya îro re dike mînaka dêwane ya heman nêzîkatiyê ye.

Nêzîkatiya Anthony Giddens a der barê tektiya dewleta netewe de tevî ku para rastiyê têde heye jî ji aliyê dîrokî ve têkiliya wê ya zincîrwarî bi yekdestdariyên desthilatdariyê yên kumulatîf re vegotineke gelekî kêm e. Ji ber ku min di cildên berê de bi awayekî berfireh behsa dewleta netewe kiribû ez ê li vir dubare nekim. Ez ê ji aliyên cuda ve mijarê rohnî bikim û

bi destnîşankirina encamên divê mirov jê derxe, ez ê vegotinê xurttir bikim.

Beriya her tiştî divê mirov li dewleta netewe weke formê herî mezin ê desthilatdariyê bifikire. Ti şêweyê dewletê bi qasî dewleta netewe (mirov bibêje neteweya dewlet belkî rastir be) xwedî kapasîteya desthilatdariyê nîne. Sedema bingehîn a vê yekê ew e, beşê jor ê çîna navîn bi rêjeyeke zêde bi pêvajoya yekdestdarbûnê ve tê girêdan. Divê mirov ti carî ji hişê xwe dernexe ku dewleta netewe bi xwe yekdestdariya komple ya herî pêşketî ye. Di qonaxa dewleta netewe de yekdestdariya sinaî, bazirganî û fînansê, bi yekdestdariya desthilatdariyê re hevgirtina herî mezin pêk aniye. Yekîtiya herî pêşketî ya tevahiya yekdestdariyan e. Ji lewra divê mirov di vê çarçoveyê de li yekdestdariya îdeolojîk jî weke parçeyekî ji yekdestdariya desthilatdariyê qut nabe, bifikire.

Yek ji qadên zanista civakî têde dixwaze mirovan herî zêde şaş bike der barê yekdestdariyan de ye. Pirr bi îhtîmameke mezin, hewl didin, amûrên desthilatdariyê weke baregehên ekonomiyê ji yekdestdariyên bazirganî, sinaî û fînansî cihê bidin bicihkirin. Bi vî awayî, dixwazin bi giştî desthilatdariyê, bi taybetî jî dewletê mîna diyardeyên ji yekdestdariyê cihê, pêşkêş bikin. Yek ji nuqteyên bingehîn ên zanistên civakî seqet dihêle ev e. Cudahiya di navbera yekdestdariyên desthilatdariyê û yekdestdariyên li jor ekonomiyê de, mirov bi tenê di çarçoveya dabeşkirina kar de dikare rave bike. Li derveyî vê, yekparetiya di navbera wan de dîrokî ye, û vebirrî ye. Divê ez li vir cih bidim hevokeke Fernard Braudel a ez gelekî bi tesîr dibînim. Braudel weha dibêje, "Desthilatdarî jî weke sermayeyê tê komkirin." Mîna ku yekparetiya di navbera wan de dîtibe. Jixwe zanyarek e ku ji gelek aliyan ve mijarê rave dike.

Desthilatdarî bi tenê weke sermayeyê nayê komkirin. Rewşa sermayeyê ya herî homojen, rafînebûyî û di dîrokê de kombûyî ye. Eger ez bi herfên mezin binivîsim, DESTHILATDARÎ REWŞA SERMAYEYÊ YA HERÎ HOMOJEN, RAFÎNEBÛYÎ û DI DÎROKÊ DE KOMBÛYÎ YE. Sermayeyên din ên jor-ekonomiyê bi awayên cudatir têne komkirin û rêxistinkirin. Bi tevahî weke yekdestdarî têne dîtin û bi vî rengî manedar dibin. Di bingehê vê de

jor-ekonomîbûna wan û bi giştî desteserkirina wan a nirxên civakî, bi taybetî jî desteserkirina nirx û berhemên civakî (desteserkirin = yekdestdarî) heye. Ji ber vê sedemê, divê têgîna yekdestdariyê di cih de û baş were fêhmkirin.

Dewleta netewe cihê wê yê nava dîrokê ew e, ev yekdestdarî hemû bi awayekî herî baş di çarçoveya xwe de anîne cem hev. Yekparetiya herî mezin a sermayeyê ye, û hêza xwe jî ji vê pozîsyona xwe digire. Amûrê herî bi bandor ê komkirina sermayeyê ye, û ev jî ji vê pozîsyona wê ye. Dewleta netewe ya Partiya Bolşevîk ava kirî, piştî heftê salî bi gewdeyekî dêwane weke yekpareyeke sermayeyê derket pêşberî me û vê yekê em hemû matmayî hiştibûn. Lê ya rastî, wexta mirov di çarçoveya analîza dewleta netewe de li mijarê binêre, ev rewş têra xwe tê fêhmkirin. Lewma rêxistiniya dewleta netewe, rewşa herî rêbirr û tîpîk a sermayeyê ye ku weke dewletê xwe bi rêxistin kiriye. Bi dewleta netewe ne sosyalîzm, kapîtalîzma herî xas xwe bi rêxistin dike. Çawa ku mumkîn nîne mirov hêstirê bike hesp, ewqasî jî mumkîn nîne ku mirov dewleta netewe bike sosyalîst an jî wê welê bihesibîne!

Tevî vê, bi qutkirina ji formên dîrokî, mirov nikare tekîtiya dewleta netewe rave bike. Çiqasî ji formên dewletê yên dîrokî yên berê cudabûna wê bi pêş ketibe jî ya diyarker kombûn û daneheva desthilatdariyê ya dîrokî ye. Em li Ingilîstana ku dewleta netewe ya pêşî bi rêxistin kir binêrin: Ingilîstan serê sedsala 16. di nava pencê desthilatdariya Spanya, Franse û Norman de ye. Eger xwe weke dewleta netewe bi rêxistin neke, tehlûke eşkere heye ku wê tesfiye bibe. Ew bi xwe qraltî ye. Xanedan li pey hev tên û diçin. Ekonomiya wê ji neolîtîkê ve bi koçberên di ser Ewrûpayê re tên ava dibe. Ji welatên din ên Ewrûpayê cudahiya wê ya bingehîn giravbûna wê ye. Dewleta xwe ya netewe di van şertên dîrokî û berbiçav de ava dike. Dîrok vê pêvajoyê bi temamî bi awayekî berbiçav tîne ziman; çawa zêdebûna hêza Sterlînê bi deyndarî û yekdestdariya herî mezin a jorekonomiyê re dest dane hev û meşiyane. Tê zanîn ku ji bo gavavêtina hegemonîk jî berê xwe dide şoreşa pîşesaziyê. Ev jî tê wê maneyê dîroka Ingilîz, nexasim jî dîroka xanedaniyê û xanedanî bi xwe nebe, bihêlin

pêkhatina dewleta netewe ya Ingilîz, eşkere ye ku mirov bi ti awayî wê nikaribaya lê bifikire. Xanedanî tevahiya dîrokê formê dewletê yê herî demdirêj û berfireh e. Ingilîstan hê jî dest ji forsa xanedaniyê bernade û ev jî têkiliya xwe bi vî aliyê dîrokê re heye. Demokrasî û komar pirr bi sînor in. Împaratorî hê formekî cudatir in. Eger kombûna desthilatdariyê ya bi hezarê salan weke yekdestdariya herî rafînebûyî hatiye nebe, bi giştî dewlet, bi taybetî jî dewletên netewe pêk nayên.

Pirr kêm behsa têkiliya dewleta netewe bi çavkaniyên teolojîk re hatiye kirin, lê ev mijar têra xwe girîng e. Carl Schmitt wexta diyar dike ku bi tevahî têgînên siyasî yên hemdem çavkaniya xwe teolojîk in (zanista xwedayî), rastiyê ji aliyekî ve zelal û rohnî dike. Kesekî bi baldarî li ser sosyolojiyê hûrûkûr dibe û diponije, jê re zehmet nîne ku tespît bike, dîn û pêve girêdayî forma xwedê, şêweyê herî kevin ê nasnameya civakî ye. Dîn û xweda ji nasnameyên formîk ên bi zanebûn wêdetir, divê weke pêdiviyeke zêhnî ya serdeman were fêhmkirin. Tesewira kolektîf a civakî xwe bi têgînên herî pîroz bi nasname dike û vê weke yek ji rêyên xwe pê li ser piyan bigire difikire. Di bingeh û koka xwedayetiyê de pîrozkirina hebûna civakî heye. Bi pêvajoyê re jihevqetîna desthilatdarî, dewlet û civakê bi lez dibe, û bi vê re payeyên pîroztî û xwedatiyê ji nasnameya kolektîf a tevahiya civakê tê stendin û dikin milkê xwediyên desthilatdarî û dewletê. Hegemoniya îdeolojîk di vir de bi roleke girîng radibe. Tê diyarkirin ku desthilatdarî û dewlet çavkaniya xwe xwedê ne; ango weke xwediyên desthilatdarî û dewletê rê vedikin da ku karibin xwedatî û pîroztiya xwe îdea bikin. Êdî zehmet nîne ku xwe bigihînin têgînên qralê xwedê û dewleta xwedê. Li pey van, têgînên qasidê xwedê û siya xwedê dereng namînin û tên.

Dewleta laîk herçiqasî xwe li derveyî vê pêvajoyê bigire jî ev rast nîne. Laîktî prensîba bingehîn a cemaeta Mason e ku bi koka xwe bi giranî Cihû ye, û ji bandora dêrê ne biste ye, ne rehet e, jixwe ji pêdiviya xwezaya wê ye ku weke qutba dijber a prensîba rûhanî, heyîna xwe bi giranî ji van têgînan bigire. Divê mirov bi awayekî eşkere bîne ziman ku weke yeqîn tê kirin, ne laîktî dinyewî ye -sekuler e, ne jî rûhanîtî weke yeqîn tê kirin

axîretî ye -uxrewî ye. Herdu têgîn jî dinyewî ne, civakî ne. Dogmayên îdeolojîk, cudahiya di navbera wan de mezin kirine.

Ji lewra dibe ku mirov li bendê be, resmê dewlet û desthilatdariyê yê ku çavkaniya wî xwedayî ye û tevahiya serdeman hatiye dîtin, di serdema me de jî xwe bi tevahî bide der. Ma dibe ku di dewleta hemdem de bandora vê xwe nîşan nede. Tevahiya dîrokê têgîn bi vî awayî hatiye stran. Têgînên dewleta laîk û desthilatdariyê bi nakok û nediyar in.

Ji texmînan wêdetir dewleta netewe bi têgînên xwedayî barkirî ye. Bi qasî ku di ti dema dîrokê de nehatiye dîtin li pey merasîmên pîrozkirinê ye. Têgînên mîna 'welat', 'al', 'unîter', 'serxwebûn', 'pîrozî', 'sirûd-muzîk', 'vegotina bi awayê çîrokkirinê', û yên wekî van ku xwe disipêre wan û ew weke hêma ji xwe re bijartine, ji qraltiyên xweda zêdetir xwedî payeyên xwedayî ne. Ti şêweyên dewletê bi qasî dewleta netewe bi zirxên îdeolojîk, huqûqî, siyasî, ekonomîk û dînî xwe ne nixumandî ye. Sedema bingehîn a vê yekê ew e, ji burokrasiyeke eskerî û sivîl a gelekî qelebalixbûyî re bûye deriyekî sereke yê debarê. Wexta ku qoltixên dewletê ji binî were kişandin, wê mîna masiyê ji avê derketî li burokrasiyê bê. Burokrasî ji bo dewletê meseleyeke man û nemanê ye. Sedema dewlet gelekî zêde bi payeya xwedatiyê tê nixumandin, ji nêz ve têkiliya xwe bi vê xisleta burokrasiyê re heye. Di modernîteya kapîtalîst de bi qasî ku di ti modernîteyan de nebûye li ser dewletê tê sekinîn û ji bo wê qiyamet tê rakirin, sedema vê jî veguherîna di avabûna wê ya çînî de ye. Modernîte, dewleta netewe, nexasim jî di navbera destnîşankirina 'yekîtîgirî-unîtertiyê' û têgîna yekîtiya xwedê de têkiliyeke nêz heye. Çawa ku di dîrokê de xwedayên qewm û qebîleyên din tevî qebîle û qewmên xwe hatine tesfiyekirin û di nava qebîleyên serdest an jî qewmê serdest de hatine helandin, xwedayên wan jî di nava xwedayê qebîle û qewmê hakim de têne helandin û tekkirin. Dema em di çarçoveya vê rastiya sosyolojîk de li têgîna yekîtiya xwedê binêrin, em ê hê bi hêsanî xwe bigihînin maneya wê. Di nava wê de mêtingerî û asîmîlasyon heye.

Dîroka unîtertiya dewleta netewe, bi awayekî gelekî zêde xwedayî ye. Civaka pêve girêdayî û hewcedarê wê bi tevahî ji sîlehan hatiye kirin, yekdestdariya sîlehan dane dest dewleta modern û vê yekê rê li ber uniteriyê vekiriye. Li vir a pêk tê, bi xwe yekdestdariyeke dijwar a mêtin û mêtingeriyê ye. Li ser navê zanistperestiyê teorisyenên serwertiyê di serî de Hobbes û Machiavellî wexta dewleta modern pênase dikin, ji

yekdestdariya kapîtalîst re xizmeta herî girîng dikin. Li ser navê xweşhaliya civakê, bi komkirina di yekdestî de ya tevahiya sîlehan, bi qasî ku di ti dema dîrokê de nehatiye dîtin civak ji hêza polîtîk tê xistin, maneya vê ew e ku civak ji hebûna xwe ya ekonomîk tê kirin, civak tê şêlandin. Dewlet û desthilatdarî, di tehlîla dawî de li gorî ku wê weke yekdestdariyekê tevbigerin, bi evqas sîlehên di destên wan de kombûne ti nirx û buhayê civakê nîne ku bi dest nexin. Çawa bixwazin wê şikil bidin civakê, yên naxwazin jî wê ji holê rakin. Jixwe yên di dîrokê de qewimîne jî di vê çarçove û şêwazî de pêk hatin. Qirkirinên dûrî aqilan pêk hatin.

Dewleta netewe weke paydara hevpar a tevahiya yekdestdaran bi xweavakirina li ser desteserkirin, fetihkirin û mêtingehkirina çanda maddî ya civakî qîma xwe nayîne; di asîmîlekirina çanda manewî de jî bi roleke diyarker radibe. Di bin navê çanda neteweyî de bi giranî bi etnîsîteyeke serdest an jî bi fermîkirina normên çandî yên cemaeteke dînî, li dijî tevahiya hebûna çandên mayî, dest bi şer dike. Bi bahaneya “zirarê didin yekparetiya neteweyî” çiqas dîn, etnîsîte, qewm, zimanên netewe û çandên wan ên ji hezarên salan ve tên, yan bi zorê yan jî bi teşwîqên maddî dawîanînê li hemûyan amade dikin. Bi qasî ku di ti dema dîrokê de nehatiye dîtin, ziman, dîn, mezheb, qebîleyên etnîk, eşîr, qewm û netewe bûn qurbanê vê polîtîkayê, ya rastî bûn qurbanê vê qirkirinê. Qirkirinên maddî (îmhakirina fizîkî) li cem qirkirinên çandî ji sedî yek e. Nirxên çandî û zimanên ji hezarên salan ve tên, tevî komên xwe di bin navê dînîtî û çavsortiya ‘yekîtiya neteweyî’ de mîna ku çalakiyeke pîroz be, dikin qurban.

Têgiştina dewleta netewe ya ‘welêt’ hê zêdetir bi pirsgirêk e. Her çawa dibe, sînorên cografî yên dixin bin serdestiya dewletê ango yekdestdariyê weke ‘welatê pîroz’ formalîze dikin. Ya rastî, welat dikin milkê hevpar ê yekdesdarên hevgirtî û sîstema li ser dadimezrînin jî mêtingertiyek e ku ji mêtingeriya kolonî ya kevin gelekî kûrtir e. Berê welatekî mêtinger hebû, lê li ser ‘welatê pîroz’ ê dewleta netewe ya modern bi qasî hejmara yekdestdariyan cureyên mêtingertiyê hene. Gelên kirine mêtingeh çawa ku ji sîlehan kirine, gelê ‘welatê pîroz’ jî bi heman awayî ji sîlehan kirine û li

hemberî her cure mêtinkariyê hêza wî ya berxwedanê şikandine. Di serî de hêzên wan ên hundir, bi tevahî hebûnên wan ên çandî yên maddî û manewî qatbiqat didin ber mêtinkariyê. Jixwe wekî din mumkîn nîne ku yekdestdariyên burokrasiyê yên weke girêkan di her derê de derketine bêne têrkirin.

Sedema pêkanîna dîplomasiya dewleta netewe ew e ku bi dewletên netewe yên din re yên ku bi xwe yekdestdariyên derve ne, koordînasyonê pêk bîne û karûbarên sîstema dewletên netewe ên cîhanê bişopîne. Eger li derve dewletên netewe wê nasnekin, dewleke netewe ya bi tenê nikare bîstûçar saetan li ser piyan bimîne. Sedema vê di mentiqê sîstema kapîtalîst a dinyayê de veşartî ye. Riza hêza hegemonîk nebe, hebûna ti dewleta netewe mayînde nabe. Çîroka hemûyan di deftera hegemon de nivîsî ye. Yên derkevin derveyî qanûnê yan wê aqûbeta Saddam bi serê wan de bê anîn, yan jî bi ambargoyan wê bikin ku îflas bikin û ji text bikevin. Wer tê qebûlkirin ku dewleta netewe wexta tê damezrandin an jî piştre, pirr baş dizane bêyî destûra hêza hegemon hebûna wê ti car wê mayînde nebe. Dewletên Yekîtiya Sovyetê û Çînê jî neçar ketin ber vê qanûnê.

Yek ji xisletên herî bingehîn ê dewleta netewe ew e, şêweyekî wê yê avabûnê heye li pêkhatinên cuda û pirralîparêz têra xwe girtî ye. Sedema vê mirov fêhm dike. Ji ber ku di nava sînorên heyî de pêkhatinên siyasî yên cuda û pirralîparêz wê li pêşiya mêtinkariya yekdestdariyê bibin asteng û li gorî pêdiviya xwezaya xwe civaka exlaqî û polîtîk bibe pêkhateyeke cuda, nexasim jî hebûna xwe bi pêkhatinên siyasî yên demokratîk bi dest bixe, wê qada yekdestdaran gelekî dijwar teng bike. Bi vê armancê, têgînên weke nabe serwerî were parvekirin, yekparetiya welat, avahiya unîter û hwd. hatine çêkirin. Meqsed ew e, nirxên welat bi gelê xwe û komên civakê re parve neke. Di têkbirina çanda manewî de jî ev bahane bi roleke bingehîn radibin. Tevî ku pirralîparêziya demokratîk a siyasî hem li ser bingehê azadiyê û hem jî li ser ê cudatiyan, ji bo wekheviyê rejîma herî di cih de ye jî weke çalakî û fikrên bi tehlûke yên neqanûnî yê 'yekparetiya welat û rejîma wê dixin tehlûkeyê' tên nîşandan.

Dewleta netewe, bi nasnameya milletperest a gelekî bi kar tîne, di dîrokê de belkî jî nûnerê hevkartiya herî zêde yê hêza hegemonîk e. Di bin perdeya millîperestiyê de hevkarê herî dilsoz ê sîstema kapîtalîst a dinyayê ye. Ti sazî bi qasî dewleta netewe, ji hêza hegemonîk, ji hêza navendî ya kapîtalîzma dinyayê re xizmetkar û pêve girêdayî nîne. Ji ber vî karekterê xwe mêtinkarên hundir in. Dewleteke netewe çiqasî xwe milletperest bihesibîne, tê wê maneyê ewqasî jî di zimeta hêza hegemonîk a sîstema dinyayê de ye. Hêza hegemonîk çarsed sal in ku dewleta netewe bi nazikî û bi destê xwe amade kiriye, şikil dayê û sîstematîze kiriye. Eger mirov yeqîn bike ku ev dewletadariya netewe ya ku hêza hegemonîk ev çarsed sal in bi îhtîmam amade dike û reng didiyê, dewleta herî milletgir e, ev ê bê wê maneyê ku ji şerên dijwar ên hêzên hegemonîk ên sîstema dinya kapîtalîst tiştek nehatiye fêhmkirin.

Wexta ku em têgîna dewleta netewe analîz bikin, girîng e ku mirov bi hin mijarên din re tevlîhev neke û bi vî awayî encamên şaş bi dest nexe. Ji lewra divê beriya her tiştî em têgîna dewleta netewe baş pênase bikin, bidin naskirin. Di dîrokê de dewletan bi giştî xwe weke rêxistin bi endamên xwe bi sînor dikirin û welê didan naskirin. Ango weke dewleta kadro diviyabû hev qebûl bikin, hevdu îqna bikin, mezin bikin, esilzade û heta xwedayî nîşan bidin. Bi dewleta netewe re ev nêzîkatî guherî. Ne bi tenê ji kadroyên dewletê re, ji yên welatî ji wan re digotin û hewcedarî xwe kiribûn û ji tevahiya civakê destpê kirin, xwe bi meznahî, bilindahî û pîroztiya xwedayê dewleta netewe pêşkêş kirin û dan qebûlkirin. Bi awayekî tevahiya civakê di nava dewleta netewe de helandin. Bûyera jê re ‘di qefesa hesinî de girtin’ tê gotin ev e. Heta ev rastî neyên fêhmkirin, mirov ne dikare dewleta netewe, ne jî modernîteyê fêhm bike. Yekemîn xusûsa ku zehmet dike mirov bi awayekî rast dewleta netewe fêhm bike ew e ku bi komar û demokrasiyê re tê nirxandin. Dewleta netewe komar nîne û herweha bi felsefeya komarê, saziyên wê yên bingehîn û rêveçûna wê re dijber û ne li hev e. Dewleta netewe înkara komargeriyê ye. Fikra “Dewleta netewe ya navendî nebe demokrasî û sosyalîzm nabe” xwe xapandineke gelekî mezin e, û di nava çepgiran de hê bi bandor e, û

sedûpêncî salan fikra fermî ya sosyalîzma pêkhatî bû. Encamên xeternak ên vê yekê, nexasim li Elmanyayê di serî de Rosa Luxemburg di têkçûna gelek sosyalîst û demokratan de hat dîtin; di jihevdeketina sîstema sosyalîzma pêkhatî de qewimî. Bi qasî bi vî awayî xapînê, ti xapandinê zirar nedaye demokrasî û sosyalîzmê. Komar û demokrasî li dijî yekdestdariya dewleta netewe bi tenê bi pêkhatinên siyaseta demokratîk ên pirralîparêz dikarin bigihîjin maneya xwe ya rastî. Hingê jiyaneke pêkve di nava cudatiyan de û welatparêziyeke manedar dikare bi rejîma siyaseta demokratîk a pirralîparêz a komara demokratîk pêk bê.

Yekdestdariyên fînans kapîtala global ên roja me ya îro ku di van şertan de li pey hegemoniyayê dibezin, mirov dibîne ku dixwazin dewletên netewe yên xwedî avahiyên kevin ji nû ve ava bikin. Ev meyla neolîberalîzmê armancên xwe yên cuda û wekî din (nexasim maskeya wê ya demokratîk a xapînok) hebin jî tê fêhmkirin. Yekdestdariya neteweyî ji gelek aliyan ve nikare bi yekdestdariya global re gav biavêje, pêdiviyên polîtîkayên global di qonaxa pêkanînê de nikare bi cih bîne. Ji lewra ji bo tevahiya sîstemê bi rola xetimandinê radibe. Ji nû ve avakirina dewleta netewe ne bi armanca tesfiyekirinê, li gorî xwestekên kapîtala fînansê ya hegemoniya nû ya global tê kirin.

Dewleta netewe, bi hegemoniya îdeolojîk a xistiye nava civakê çar formên sereke yên diyar di nava hev de û bi awayekî pevekirî bi kar tîne û xwe ji vê paşve nade. Forma îdeolojîk a bingehîn a dewleta netewe milletperestî bi temamî bi cewherekî dînî hatiye nixumandin. Dewleta netewe çiqasî kapîtalîst modernîst be, milletperestî jî ewqasî dînekî modernîst e. Weke dînê civakî yê felsefeya pozîtîvîst hatiye amadekirin. Welatperweriyê weke xwezaya civakî, divê mirov weke dijberê civaka netewe bifikire. Di vê çarçoveyê de milletperestî îdeolojiya herî antî-netewe ye. Netewe diyardeyeke demokratîk e, û wê bi milletperestiyê dixin bin hegemoniya îdeolojîk a kapîtalîst û ev ji yekdestdariyên mêtinkariyê re xizmeta herî mezin e. Tevahiya neteweyê heta dawiyê dike milk û mêtingeha hevpar a yekdestdariyên hev girtine (yekdestdariyên bazirganî, pîşesazî, fînans û desthilatdariyê). Nexasim vê fonksiyona xwe

di bin perdeya herî pozîtîvîst milletperest a dînî de bi cih tîne. Milletperest weke dînê dewleta netewe, ji vî alî ve herçiqasî bi nakok xuya bike jî esas xwe bi du fenomenên (diyardeyên) heman tişt in, nîşan dide.

Ji van şêweyên xwedayetiyê ya pêşî ‘dewleta unîter’ e. Di nava netewe de weke dewleta yek xwedayî gelekî nazik e. Di qada navneteweyî de ev şêweyê xwedayê bi tenê xwe weke Super Hegemon nîşan dide (Serokê Super Hegemonê DYE’yê G.W. Bush anî ziman ku ew li ser navê xwedê hatiye erkdarkirin û ev jî vê piştrast dike). Super Hegemon, bi gotina Hegel (Ya rastî, wî ji bo Napolyon û Franseya dema xwe gotibû) ‘Rewşa meşa xwedayê daketiye ser rûyê erdê’ ye. Ya diduyan, her dewleta netewe weke xwedê pûtê netewe yê Super Hegemon e. Bi vî awayî xwe zêdekirin, nayê wê maneyê ku Super Hegemon yekîtiya xwe parçe dike û derbasî sîstema pirrxwedayî dibe; ev tê wê maneyê ku pûtên xwe zêde dike. Di felsefeyê de çavkaniya vê pozîtîvîzm e. Di rêza duyemîn de îdeolojiya pevekirî ya dewleta netewe zanistperestiya pozîtîvîst e. çavkaniya îdeolojîk a herî nêzî milletperestiyê ye. Herdu jî xwe bi hev xwedî dikin. Damezrînerê wê Auguste Comte bi xwe hewl dabû pozîtîvîzmê weke dînê sekuler ê gerdûnî ava bike. Bi qasî Marksîzmê jî cih negirt. Dîsa jî di pozîsyona dînê bingehîn ê laîsîzmê de ye. Nietzsche wexta pozîtîvîzmê weke metafizîka herî çor a vulger bi nav dike, ya rastî hem îdeaya pozîtîvîzmê ya metafizîkbûnê eşkere dike û hem jî tespîteke gelekî girîng dike. Weke yek ji varyasyonên herî hêja yên îdeolojîk ên modernîteyê, di pozîsyona îdeolojiya hegemonîk de ye ku zanista civakî herî zêde kiriye pût, ji rê derxistiye û kor kiriye.

Pozîtîvîzm jî mîna zanistê felsefeya herî çor a diyardeyê ye. Diyarde dîmenê rastiyê ye; lê di pozîtîvîzm de diyarde rastî bi xwe ye, ji lewra ti tiştê ne diyarde rastî nîne. Ji fizîka kûantûm, astronomî û biyolojiyê heta ji fikrê bi xwe em dizanin ku rastî bi giranî ji bûyerên bi çavan xuya dikin wêdetir li aleman diqewime. Rastî (heqîqet) weke di têkiliya çavdêr û çavdêrî lêkirî de bi rengekî herî sirrdar wer hatiye nixumandin ku di ti pîvana fizîkî û pênaseyê de hilnayê. Pozîtîvîzm weke înkara vê kûrahiyê, herî zêde dişibe pûtperestiya (paganîzm) serdema destpêkê. Ji ber ku pût weke diyardeyekê xuya dike, têkiliya hevpar a di navbera paganîzm û

pozîtîvîzmê de nîşan dide. Ji ber vê yekê, bi tevahî zêhnên di nava dewleta netewe de bi dînê milletperestiyê hatine şuştin, bawer dikin ku dinya ji fenomenên besît pêk tê û vê jî bi awayekî weke perestinê fêhm dikin. Civaka zêde dixwe û serfkar, miriyê 'objeyê' ye, û ev perestin bi xwe ye. Ji vî alî ve, civaka zêde dixwe û serfkar berhemekî atmosfera dewleta netewe ye, û li gorî wê şikil digire, lewma ev tê fêhmkirin û gelekî girîng e. Bi vî awayî, ji aliyekî ve tevahiya ferdên civakê yên dikin êsîrê metayê (di dewleta netewe û civaka zêdexwer de meta bi temamî bûye pût) weke kesên zêde dixwin û serf dikin, firsendê didin yekdestdariyên kapîtalîst da ku zêde karê bi dest bixin; ji aliyê din ve jî zêdexweriya bi awayekî wekî dîn xuya dike, pê civak êsîr tê girtin, dibe girseya herî milahîm, asîmîle dibe û dibe civaka herî zêde bi hêsanî were rêvebirin. Civaka ber bi zêhnê sloganwarî û milletperestiya xeternak ketî vê rastiyê pirr eşkere îfade dike.

Sêyemîn formê girîng ê îdeolojîk cinsperestiya civakî ye. Sîstemên şaristaniyan tevahiya dîrokê sîleha herî zêde li dijî civaka exlaqî û polîtîk bi karanîne cinsperestî ye. Bi gelek armancan mêtingehkirina jinê mînaka herî balkêş a vê vegotinê ye. Zuriyetê zêde dike, karkera bêheqdest e, xwediya karên herî bi qehr e, koleya herî sernerm û milahim e. Di rewşa objeya domdarkirina xwesteka têkiliya cinsî de ye. Amûra reklamê ye. Metaya herî bi nirx e, qralîçeya metayan e. Zilam ji bo timî pêkanîna desthilatdariya xwe wê weke amûrê destavêtinê bi kar tîne û lewma weke fabrîkeyekê xuya dike. Weke objeya bedewî û deng (xeml) jî ji aliyê manewî ve civaka serwer a zilam domdar dike. Jin bi van aliyên xwe hemûyan, bi rewşa xwe ya di nava civaka zilam de piçûkketî, herî zêde di nava avahiya dewleta netewe de dibîne. Forma jinê (nasnameya hevbeş a jinê, tesewira wê) di nava civaka deweleta netewe de weke îlaheyê bi awayê xuya dike, alavekî perestinê ye. Lê li vir sifetê 'îlaheyê' bi maneya ya herî piçûkketî, ya kerxaneyê ye. Jina weke îlahe, jina herî zêde heqaret lê hatiye kirin û piçûk hatiye xistin e. Cinsperestiya di civaka dewleta netewe de ji aliyekî ve zilam herî zêde dike desthilatdarî (Her zilamê serwer têkiliya cinsî bi awayekî sergirtî bi maneya "Min heqê vê fahîşeyê dayê",

“Min ew temam kir” di mejiyê xwe de neqiş dike) û di şexsê jinê de civakê dike mêtingeha herî li binî ye. Di vê çarçoveyê de jin di nava dewleta netewe de dibe neteweya mêtingeh a herî pêşdebirî ya civaka dîrokî!

Dewleta netewe, dîn jî weke rêûresma beriya modernîteyê bi îdeolojiya milletperest re di zikhev de bi kar tîne. Sedema vê jî ew e ku bandora dînan a li ser civakan hê bi hêz e. Nexasim Îslam di vê mijarê de hê gelekî zindî ye. Lê rêûresma dînî bi awayê ku modernîte bi kar tîne, êdî ew dînê berê nîne. Çi bi rewşa xwe ya radîkal, çi jî bi rewşa xwe ya nerm, dînê di modernîteyê de ketiye xizmeta dewleta netewe, ji fonksiyona xwe ya rastî ya civakî hatiye qutkirin (rola wî ya mezin di civaka exlaqî û polîtîk de) û bi rewşa xwe ya xesandî tê pêşkêşkirin. Rola dîn a di civakê de bi qasî ku dewleta netewe destûrê didiyê ye. Asteng û kelemên dijwar li pêşiyê tên danîn da ku fonksiyona xwe ya erênî di civaka exlaqî û polîtîk de dewam neke. Di vê mijarê de laîktî di serê astengiyên behskirî de tê. Ji lewra divê mirov matmayî nemîne ku car caran di navbera herduyan de têkoşîn ji nişkê ve pêk tên. Dewleta netewe bi temamî destê xwe ji dîn nakişîne, sedema vê tevî giraniya mezin a dîn li ser civakê, avahiya dîn a bi hêsanî rê dide were bikaranîn û milletperestbûna wê ye. Carnan dîn bi xwe bi rola milletperestiyê radibe. Li Îranê Şîîtiya di piyaseyê de sîleha herî bi hêz a hegemonîk îdeolojîk a dewleta netewe ya Îranê ye. Şîîtî mînaka herî pêşdebirî ya dînê bûye milletperestî ye. Mînakên wê gelek in. Li Tirkiyê jî Sunnîtî bi sînor be jî herî zêde nêzî milletperestiyê ye, û bi hêsanî dikare bibe îdeolojiya dînî.

Dewleta netewe ji bo mêtinkariya yekdestdariya yekbûyî ya çar qatî (yekdestdariya bazirganî, fînans, pîşesazî û desthilatdarî) ku girtiye ser xwe, pêk bîne, qîma xwe bi tenê bi şêweyê herî xeternak ê zorê ango bikaranîna faşîzmê nayîne. Herî kêm bi qasî zora rejîma faşîst a sîstemîk, bikaranîna çar îdeolojiyên pevekirî yên hegemonîk ferz dike. Bêyî hegemondariya îdeolojîk rejîma faşîst nikare dewam bike.

Dewleta netewe ya modern bi rêbaza gerdûnparêz, rast, pêşdebir û vebirrî (têgihiştina rêbaza li alternatîf û îhtîmalan girtî) dixwaze mirovê homojen (tek tîp), civaka kerî û girseyê ava bike. Modernîteya demokratîk

jî bi rêbazên pirralîparêz, îhtîmalnas, li alternatîfan vekirî û dike ku civaka demokratîk berbiçav bibe û were dîtin. Bi avahiya xwe ya ekonomîk a teserufê dide destê koman, li pêkhatinên siyasî yên cuda vekirî ye, pirrçandî ye, li yekdestdariyan girtî ye, bersivê dide pêdiviyên bingehîn ên civakî yên ekolojîk û femînîst û alternatîfa xwe pêşde dibe. Li dijî dewleta netewe ya modernîteya kapîtalîst, alternatîfa siyasî ya modernîteya demokratîk Konfederalîzma Demokratîk e.

Bi Kurtî Xisletên Konfederalîzma Demokratîk:

**a-** Li pêkhatinên siyasî yên pirrtebeqeyî û cuda vekirî ye. Pêkhatinên siyasî yên cuda yên ji jêr ber bi jor ve û bi awayekî berfireh, ji ber avahiya tevlîhev a civaka heyî îcbarî ye. Pêkhatinên navendî, xwecihî û herêmî di nava balansekê de li cem hev digire. Ji ber ku her yek ji wan bersivê dide şertên berbiçav, avahiyên siyasî yên pirralîparêz, zêdetir nêzî çareseriyên herî rast ên pirsgirêkên civakê ne. Nasnameyên çandî, etnîk û neteweyî dikarin xwe weke pêkhatinên siyasî îfade bikin û ev heqê wan ê herî xwezayî ye. Ya rastî, civaka exlaqî û polîtîk vê ferz dike. Çi dewleta netewe, çi komar, çi bi şêweyên demokrasiyên bûrjûwayê be, bi awayekî prensîbî bi rêûresmên dewletê re dikare li hev bike. Li ser bingehê aştiya bi prensîb, dikarin bi hev re bijîn.

**b-** Xwe disipêre civaka exlaqî û polîtîk. Muhendisiyên civakî yên kapîtalîst, sosyalîst, feodal, îndustriyalîst û zêdexwer ên bi vî rengî yên bi projeyên şablonîst dixwazin civakan ava bikin, weke hewldanên di çarçoveya yekdestdariyên kapîtalîst de dibîne. Civakên bi vî awayî bi xwe nînin, propagandayên wan hene. Civak bi awayekî bingehîn exlaqî û polîtîk in. Yekdestdariyên ekonomîk, siyasî, îdeolojîk û eskerî vê xwezaya civakê dikeritînin û bi vî awayî nirxê zêde desteser dikin. Yekdestdariyên behsa wan tê kirin amûrên ji bo xûkîgirtin û xûkîxwarina ji civakê tevdigerin. Bi serê xwe ti qîmeta wan nîne. Şoreş jî nikare civakê biafirîne. Ji bo çaviyên civakê yên exlaqî û polîtîk ên dejenerekirî û bêqîmet hatine hiştin ji nû ve bi fonksiyona xwe ya bingehîn rabin, weke operasyonan serî li şoreşan tê dayîn û bi tenê di vê çarçoveyê de dikarin bi roleke erênî rabin. Jê pê ve îradeya azad a civaka exlaqî û polîtîk diyar dike.

**c-** Xwe disipêre siyaseta demokratîk. Li beramberî têgihiştina îdarî û rêveberiya burokratîk, hişk navendî û li ser xeta rast a dewleta netewe, bi pêkhatinên siyasî yên ku tevahiya nasnameyên çandî û komên civakî îfade dikin, rêveberiya civakê bi xwe pêk tînin. Ne bi tayînkirina di astên cûrbicûr de, bi rêveberên bêne hilbijartin kar û xebat wê bêne meşandin. Bingeh qabîliyeta biryarê ya bi meclîs, civat û guftûgoyê ye. Rêveberiyên bi serê xwe xwedî ferman netê ne. Ji desteya koordînasyona navendî ya giştî (meclîs, komîsyon, kongre) heta bi desteyên xwecihî li gorî binyeya her kom û çandê bi qevdên desteyan ên di nava pirravahî û cudatiyan de li yekîtiyê digerin, rêveberî û kontrola demokratîk a karûbarên civakî tê pêkanîn.

**d-** Xwe disipêre xweparastinê. Ne weke yekdestdariya eskerî, belê li gorî pêdiviyên civakê yên ewlekariya derve û hundir di bin kontroleke hişk a organên demokratîk de yekîneyên xweparastinê hêza bingehîn in. Erk û wezîfeya van hêzan ew e, îradeya siyaseta demokratîk a li ser bingehê azadî û cudatiyên civaka exlaqî û polîtîk weke avahiya biryarê ya wekhevîtiyê ye, bi cih bê anîn. Hêzên ji derve û hundir destwerdin vê îradeyê û hewl bidin wê asteng, pûç û tine bikin, bêtesîr dike. Saziya fermanê ya yekîneyan di bin kontrola cot a hem organên siyaseta demokratîk, hem jî endamên yekîtiyê de ye, û wexta hewce bê dîtin bi pêşniyarên beramber hev û erêkirinan bi hêsanî dikare were guhertin.

**e-** Bi giştî ji hegemoniyayê re, bi taybetî jî ji hegemoniya îdeolojîk re cih nîne. Prensîba hegemonîk li cem şaristaniyên klasîk dibe. Di modernîte û şaristaniyên demokratîk de bi xweşbînî li hêz û îdeolojiyên hegemonîk nayê nêrtin. Wexta ji sînorên îfade û rêveberiyên demokratîk ên cuda derbas dibin, hingê bi azadiya îfadeyê û rêveberiyên civakê bi xwe têne bêtesîrkirin. Di rêveberiya kolektîf a karûbarên civakê de, girêdana bi esasên li beramberî hev rêzgirtin, hurmet ji pêşniyarên cuda û biryarên demokratîk re şert e. Di vê mijarê de têgihiştina şaristaniya klasîk a giştî û têgihiştina rêveberiya modernîteya kapîtalîst bi têgihiştina dewleta netewe re bi ser hev de diçin, lê bi têgihiştina şaristaniya demokratîk û rêveberiya wê re xwedî cudahî û cihêwaziyên mezin in. Di bingehê cudahî

û cihêwaziyan de şêwazê rêveberiya kêfî û burokratîk, şêwazê rêveberiya exlaqî demokratîk heye.

Hegemoniya îdeolojîk nabe. Ev di nava îdeolojî û fikrên cuda û pirraliyan de jî welê ye. Hewce nîne ku rêveberî xwe bi kamûflaja îdeolojîk bi hêz bike. Ji lewra çawa ku hewcedarî bi îdeolojiyên milletperest, dînperest, zanistperest pozîtîvîst û cinsperest nîne, herweha li dijî avakirina hegemoniyayê ye. Her bîrûbawerî, fikir û dîtin heta avahiya civakê ya exlaqî û polîtîk nerizîne û li pey hegemoniyayê neçe, xwedî maf e ku xwe bi awayekî serbest îfade bike.

**f-** Li beramberî yekîtiya dewletên netewe ya bi kontrola hêza super a hegemonîk di bin banê Neteweyên Yekbûyî NY de, konfederalîzma demokratîk alîgirê Yekîtiya Konfederal a Demokratîk a Dinyayê ya komên neteweyan e. Ji bo dinyayeke hê bêtir ewle, aştiyane, ekolojîk, dadperwer û hilberîner çi ji aliyê hejmarê û çi jî ji aliyê wesif ve bi krîterên siyaseta demokratîk li bin banê Konfederasyona Demokratîk a Dinyayê bi awayekî berfireh anîna cem hev a gelek koman şert e.

Weke encam, em hê zêdetir bi awayekî berfireh cudatiyên modernîteya kapîtalîst û demokratîk dikarin bidin ber hev û ev berambertiya wan bi tenê îdeayek nîne, du dinyayên mezin ên berbiçav in. Ev herdu dinya tevahiya dîrokê bi beramberiyeke diyalektîkî carnan bi dijwarî bi hev re şerkirine, lê carnan jî di navbera xwe de ji aştiyê jî kêm nemane. Ev herdu dinya di roja me ya îro de jî bi heman şêweyî di nava têkilî û nakokiyan de carnan şer dikin, carnan jî li hev tên. Bêguman encama vê pêxîrtengiya avabûna sîstemîk a heyî ewên ku gavên rast, qenc û xweşik bi awayekî entelektuel, polîtîk û etîk biavêjin wê diyar bikin.

## D- Îdeolojiya Cihûtiyê, Kapîtalîzm û Modernîte

Mirov heta bi awayekî rast li çîroka Ibraniyan a di dîrokê û roja me ya îro de serwext nebe, zehmet e ku mirov vegotineke tam a pêşketina civaka dîrokî bike. Mirov di dîrokê de Ibraniyan, roja me ya îro jî Cihûtiyê tenê

weke komeke etnîk an jî netewe bibîne, wê nêzîkatiyeke gelekî bi kêmasî be. Gelekî girîng e ku mirov wê weke çavkaniya çandeke bingehîn a bi koka xwe Rojhilata Navînî, lê di dereceya yekemîn de bandor li tevahiya dinyayê kirî, bibîne. Ez di çarçoveyeke teng de behsa çandê nakim; weke tevahiya çanda maddî û manewî lê dinêrim. Der barê mijarê de divê mirov xwe ji du şaşiyên mezin dûr bigire: Ya pêşî ew têgihiştin e ku Cihûtiyê zêde mezin û bilind dike û bi vî awayî wê weke hêza dinyayê bi rê ve dibe, nîşan dide. Gotina "Qewmê Xwedê hilbijartî" jî di vê çarçoveyê de ye. Mirov xwe çiqasî ji van zêde mezinkirinên li îstîsmarê vekirî dûr bigire, bi awayekî rastî serwextbûna li mijarê jî wê ewqasî hêsan bibe. Ya diduyan, têgihiştina Cihûtiyê mîna şeytan û serê guneh nîşan dide. Fikra ku Cihûtiyê weke çavkaniya tevahiya xirabiyan nîşan dide gelekî hatiye guftûgokirin. Herî kêm bi qasî têgihiştina pêşî ya zêde mezin dike û rê lê vedike ku mirov şaş serwext bibe, divê mirov ji bandorên vê nêzîkatiyê jî xwe dûr bigire û ev ê bihêle ku mirov baştir mijarê fêhm bike.

Di cildên din ên parêznameyên xwe de ji gelek aliyan ve min hewl dabû ez Ibraniyan di çarçoveya dînên Brahîmî de bi awayekî berbiçav bînim ziman. Niha jî ez ê ji hin aliyên din ve hewl bidim wan bi awayekî berbiçav diyar bikim. Bi awayekî bingehîn, ez ê hewl bidim pirsgirêka Cihûtî û Cihûyan di çarçoveya modernîte û kapîtalîzmê de bigirim dest û li ser bisekinim.

Piştî ku Împaratoriya Romayê di sala 70'î P.Z. de cara duyemîn Perestgeh şewitand, dîasporaya (belavbûna li rûyê erdê) Cihûyan destpê kir, vê dîasporayê çi li Rojhilata Navîn, çi li Ewrûpayê û ber bi roja me ya îro jî rê li ber tevahiya pirsgirêkên mezin ên cîhanê û encamên wan vekir. Ya rastî, berê jî pirsgirêk û encamên bi heman rengî pêk hatibûn. Hîcreta Hz. Brahîm a ji Ûrfayê heta bi nêzî Qudsê, ji aliyê pirsgirêk û encamên rê li wan vekir, li nava dinyayê bi awayekî mezinbûyî bandora xwe hê jî dewam dike. Serhatiya kurên wî ya Misrê, bûyera Yûsiv û hîcreta Mûsa jî ji wan bûyeran e ku li nava dinyayê bandor kiriye. Tomarkirina Pirtûka Pîroz, hê berî damezrandina Qraltiya Ibranî ya pêşî, mişextkirina Babîlê, têkiliyên wê demê bi Pers û Grekan re hatibûn destpêkirin, rê li ber encamên girîng

vekirin. Bandora van bûyeran di dîroka şaristaniyê de xwedî cihekî diyar e. Tomarkirina Pirtûka Pîroz bi serê xwe bûyereke gelekî mezin e. Bi awayekî, dînên Brahîmî fermî dibin. Bûyîna xwediyê Pirtûkê, bûyereke mezin e ku bandora xwe di dîrokê de dike.

Lê belê dîasporaya piştî salên 70'î P.Z. xwedî bandoreke hê bi kok û xurt e. Ez ê li vir dîrokê nenivîsim, bi tenê nirxandinên kurt bikim û qîma xwe bi vê bînim. Fikra bi giştî tê qebûlkirin ew e, dîaspora û devera lê zêde dibin weke Rojhilat û Rojava ango Seferad û Aşkenaz dibin du beşên sereke. Bandora wan jî bi vê ve girêdayî cuda çêbûye. Tê zanîn ku Cihûtiya Rojhilat di serî de li Sûrî, Iraq, Îran, peravên Hezarê û Rûsya îro û paşê bi îhtîmaleke mezin ber bi Asya Navîn ve belav bûne û weke koloniyên girîng jiyane. Ber bi Rojava jî bi giştî li qadên di bin bandora Împaratoriya Romayê de hêz û koloniyên wan timî bi pêş ketine. Mirov ji Bakurê Efrîkayê heta bi Rojhilatê Ewrûpayê, ji Nîvgirava Îberîkê heta bi Balkanan li koç û koloniyên wan rast tê. Anatolya jî weke navenda ku Rojava û Rojhilat lê ji hev diqetin xuya dike. Ji aliyê dînî ve bandorên wê heta bi hilweşîna Romayê girîng in. Hem weke Musewîtî, hem jî weke Xiristiyantiya ji Musewîtiyê derketî di bandora wan a pêşengiyê de şik û guman nîne. Bi awayekî weke ku împaratoriya manewî ya demê ava kirine.

Cihû bi pereyan re çawa ketine têkiliyê û pere bi qasî bandora manewî çawa karîbûn bikin hêzeke maddî ya bi tesîr, bêguman ji bo vê mijarê lêkolîneke dûvdirêj divê. Lê eger mijara yekemîn a bi awayekî stratejîk li ser dixebitin bi giranî çanda manewî dîn, wêje û zanist be, bi awayekî vebirrî xebata wan a stratejîk a duyemîn jî mijarên der barê pere û karê de ne. Gelekî girîng e ku di dîrokê de ji aliyê stratejîk ve çanda manewî kirine yekemîn û çanda maddî jî kirine duyemîn. Hê di wê demê de yên pêşengtiya di van herdu mijaran de kirine destê xwe, di dîroka dinyayê de girîngiya stratejîk bi dest xistine. Li gorî texmîna min, Cihû di van sedsalan de hûrûkûr haya wan ji pêşengtiya stratejîk a van herdu mijaran heye û ji bo vê xebitîne. Sedemên bingehîn ê vê yekê jî şert û mercên wan ên berbiçav in. Hejmara wan kêm e, timî di nava penc û lepê herdu şaristaniyên bi koka xwe Rojhilat û Rojava de ne, ji aliyê îdeolojîk ve xwe

weke ‘evdên xwedê yên hilbijartî’ dizanin (em bi hegemoniyayeke îdeolojîk a dijwar re rûbirû ne). Ev hemû wan neçar dikin ku timî di nava lêgerîna stratejîk de bin. Kêmbûna hejmara wan, koçberiyên wan, baweriyên wan ên pîroz û timî bi tehlûkeya tevkujiyê rûbirû mayîna wan, hiştiye ku hem xwe gelekî zana û serwext bikin, hem jî ew timî neçar hiştine ku ‘stratejiyên rizgariyê’ pêşde bibin (Çiqasî dişibe stratejiyên rizgariyê yên şoreşgerî). Şêwazê wan ê jiyanê ferz dike ku mirov stratejîk bifikire û amûrên rizgariyê pêşde bibe. Naxwe weke hatiye serê bi hezaran qebîleyên din, ew jî bi hêsanî dikarin tine bibin.

Di vê nuqteyê de rewşeke berxwedanê ya domdar dibe rêya bi tenê ya rizgariyê. Berxwedan jî ji sedî sed pêdiviya xwe bi du tiştan heye; bawerî û amûrên maddî. Bawerî xwe weke hêmana stratejîk a manewî nîşan dide, pere jî xwe weke hêmanê maddî yê stratejîk nîşan dide. Ji lewra di Cihûtiyê de rola stratejîk a dîn weke hêmana manewî gelekî girîng e, û rola stratejîk a pere weke hêmana maddî bi armanca rizgariyê dibin du çavkaniyên sereke yên dest ji wan nabe. Çima li cem Cihûyan serweriya pere û dîn-maneyê heye? Eger em li bersiva vê pirsê bigerin, bersiv diyar e: ji ber ku çareyeke wan a din nîne. Şêwazê wan ê jiyanê timî berxwedanê li ser wan ferz dike. Ji bo tine nebin û bi kalîteyeke bilind (Ji ber ku bawer dikin, ew evdên xwedê yên bijare ne) bijîn, ev şert e. Berxwedan jî bêyî stratejiya rizgariyê (pêşengtiya îdeolojîk) û derfetên stratejîk ên maddî weke pere (pêşengê maddî) nebin, hunerekî zehmet e ku bê dewamkirin. Ji bo vê, divê hûn yan mîna Ereban li çolê yan jî mîna Kurdan li çiyan bin. Herdu jî li cem Cihûyan nînin. Li dawiyê bi tenê derfetên îdeolojîk û maddî dimînin.

Di hilweşandina Romayê de li hundir rola Xiristiyanan tevî ku hê jî tê guftûgokirin misoger e. Xiristiyanê pêşî Hz. Îsa bi koka xwe Cihû ye. Wexta mirov vê xisleta wî li ber çav bigire, bi temamî nebe jî di hilweşandina Romayê de rola bazkekî Cihû ji sedî sed e. Du perestgehên (perestgeh ango mabed, bi awayekî Quds paytexta Cihûyan e) hatine şewitandin bi vî awayî tola wan hatiye hilanîn. Jixwe li Romayê serjêkirina Saint Paul (Li Tarsûsê ji dayik bûye û yek ji Xiristiyanên pêşî ye; yek ji amadekarên doktrîna Xiristiyantiyê ye) wê bê bersiv nemaya. Bi hezaran Xiristiyanên li çarmîxê

têne xistin, diavêjin ber şêran û têne îmhakirin mîna ku parçeyek ji berxwedanê be. Ango pêngava pêşî û serketî ya dîasporayê weke hêza manewî ya stratejîk bikaranîna Xiristiyantiyê pêk tê. Mirov bi hêsanî dikare îddîa bike ku ji hundir ve hilweşîna Romayê bi awayekî berbiçav di encama pêngava manewî ya pêşî û stratejîk a Cihûyên dîasporayê de pêk hatiye. Bêguman di vê de êrişên qebîleyên Germen, Hûn û Frank ên li Ewrûpayê jî bi bandor bûne. Dîsa jî hêmanên hundir diyarker in.

Piştî Romayê derketina Cihûtiya Rojava, bi avabûna bajaran (ji sedsala 10. P.Z. û pêve Yekemîn Şoreşa Ewrûpayê) û li dora wan bi pêşketina bazarê li ser zemînekî maddî bi pêş ket. Pêşketina têkiliya meta-pere-bazirganiyê wê keysê bide Cihûyan ji bo pêngava duyemîn a stratejîk ango ji bo rola stratejîk a peran gav biavêjin. Serwertiya pereyan tê wê maneyê nîv bi nîv li ser bajêr ango di nava rêveberiyên dewletên nû hilatî de dibin xwedî gotin. Jixwe ji sedsala 10. û pêve fetha manewî ya Ewrûpayê (Xiristiyankirina wê) hatiye temamkirin. Ev fetih bi awayekî neyekser ji aliyê erênî û neyênî ve wê gelekî bandorê li Cihûyan bike. Aliyê wê yê erênî ew e, dînekî Brahîmî Ewrûpa fetih kiriye; aliyê erênî jî ew e, Musewîtî weke dînekî teng ê qebîletiyê (dînekî Cihûyan ê hatiye hilbijartin) her diçe tê tengavkirin. Ewrûpaya sekuler û ya qebîleyan, heta bi Hîtler û roja me ya îro wê di nava gelek pêxîrtengî û pirsgirêkên bi serî de hatî, bandora hêza manewî ya Musewîtiyê û hêza pere ya Cihûtiyê bibîne. Di sala 1179'ê P.Z. de Konseya Xiristiyantiya Katolîk cara pêşî biryara girtina Cihûyan li gettoyan da û ev jî encama vê bandorê bû.

Cihûtî ji sedsala 10. û pêve hem weke hêza stratejîk a maddî û hem jî weke hêza îdeolojîk a Ewrûpayê (Rûsya jî di navê de) timî di nava pêşketineke dewamî de ye. Rewşenbîr û dewlemendekî her bajarî ji sedî sed Cihû ye. Ev rewş bivênevê rê li ber çavnebarî, nakokî û pevçûnên mezin vedike. Gettoyên pêşî (kolanên girtî) îşaret bi bûyerên paşê biqewimin dikin. Cihûtî wê li hemberî van rewşên nû jî taktîk û stratejiyên nû diyar bike: Ya pêşî tevgera 'çerxkiriyan', ya diduyan jî tevgera 'sekuler-laîktiyê' ye. Cihû wê bi van herdu pêngavên nû yên stratejîk bi awayekî serketî ji serdema navîn derkevin. Divê neyê jibîrkirin ku ji dînê berê

çerxkirin yek ji pêngava stratejîk a pêşî Brahîm û Mûsa jî kirine. Gavavêtin bi hêsanî weke pêngaveke manewî ya stratejîk dikare were nirxandin.

Locayên Masonan ên di Serdema Navîn de hostayên avaker ên Cihûyan damezrandin, mirov dikare weke tevgera pêşî ya sekuler-laîk lê bifikire. Fîlozofê mezin ê bi koka xwe Cihû Spînoza jî wê li yek ji perestgehên destpêkê yên moderniteya kapîtalîst Amsterdamê bibe pêşengê gavavêtina pêşî ya felsefeya mezin a sekuler-laîktiyê. Laîktî di serî de Tirkiyê li welatên weke Îslam têne bi navkirin yek ji mijara guftûgoyê ye. Ez binavkirinên welatan an jî civakan weke kapîtalîst û sosyalîst propagandîf dibînim û ez difikirim ku binavkirinên weke laîk, Îslam, Xiristiyan, Bûdîst û hwd. jî bi heman armancê ne. Eger mirov civakan weke 'civaka exlaqî û polîtîk an jî civaka ne exlaqî û polîtîk' bi nav bike rastir e. Laîktî di çarçoveya sekulerbûnê (dinyewîbûn) de bi sedema ji dogmatîzma dînî dûr dixe û azad dike bi fonksiyoneke erênî radibe. Lê wexta ku ew jî weke laîktiyê, laîsîzmê-laîkperestiyê were bikaranîn, ew bi xwe jî weke serê dijber ê qutbekî bi lez dikare bibe dogma. Di vê çarçoveyê de divê ez bi girîngî bînim ziman ku laîsîzm jî zêde cudahiya xwe ji dînperestiyên din nemaye. Dijbertiya Cihûtiyê çiqasî bi pêş bikeve, çerxkirina ji dîn ango guhertîna dîn jî ewqasî wê bi lez bibe. Di pêvajoya dewleta netewe de ez ê rewşa Cihûyan dewam bikim bînim ziman, lê ji ber ku gelekî bi tesîr û balkêş e, divê di vî warî de li Rojhilata Navîn û li Rojhilat jî çi diqewime pêşî vebêjim.

Heta bi Îslamiyetê têkiliyên baş ên Cihûtiyê bi Dewleta Pers-Sasaniyan re hebûn. Bi qasî mirov fêhm dike, di qesran de bandora wan zêde ye. Tê zanîn, pêxembera pêşî ya jin bi navê Esterê li qesrên Sasaniyan xwedî roleke mezin bû. Di Pirtûka Pîroz de jî cihê wê heye. Bi îhtîmaleke mezin hem di karûbarên bazirganî-pereyan, hem jî di pêşketina îdeolojîk a împaratoriyê de xwedî statuyeke bi hêz in. Wexta ku hukimdarê Babîlan Nebûqednezar Cihû mişextî Babîlê kirin (596-546 B.Z.), damezrînerê Persan Kîros ew xilas kirin. Vê yekê, bandoreke xurt a rêûresmê afirandiye. Di qada Îranê de tevahiya dîrokê Cihûtî timî hêzeke ne kêm bû. Cihûtiyê di dîrokê de bi heman awayî li Erebistan, Bakurê Efrîka, heta li

Rojhilatê Efrîka-Hebeşîstanê timî cihekî girîng girtiye. Bandora Cihûyan di tevahiya pêşketinên çandî yên maddî û manewî de ne kêm in.

Di dema derketin û hilatina Îslamiyetê de, Cihû li Erebistanê weke komeke dînî ya bazirgan li pêş bûn. Erd û zeviyên bi bereket milkên wan bûn. Wer tê fêhmkirin ku di serê komên Semîtîk ên ne Ereb de ew dihatin. Rewşeke bi heman rengî ya Suryaniyan jî heye.

Bi derketina Îslamê re Ereb bi awayekî li şûna yekdestdariya Cihûyan li pey damezrandina yekdestdariya xwe ya bazirganî û desthilatdariyê ne. Îslamiyet gelekî ji Cihûtiyê bi tesîr bûye û ev jî vê piştrast dike. Mirov dikare vê rewşê di moderníteya kapîtalîst de bişibîne damezrandina dewleta netewe. Di moderníteya Serdema Navîn de Ereb bi Îslamê bersivê didin. Di bingehê nakokiyên wê yên maddî û îdeolojîk ên bi Cihûtî û Cihûyan re ev rastî heye. Divê mirov diyar bike ku di derketina Îslamê de bi qasî hêmana etnîk hêmana çînî jî bi roleke girîng rabûye. Bi belavbûna bi lez a Îslamê re, Cihû di berxwedana xwe ya pêşî li beramberî wê de bi awayekî hişk şikestin û ev jî felaketeke duyemîn a mîna Romayê bû. Li pêşiya wan du rê hebûn: Yan ji nû ve mişextbûn, yan jî 'çerxkirin'. Tê texmînkirin ku beşekî wan xwe avêtiye Îran, Bakurê Efrîka û Anatolyayê. Beşekî wan ê girîng jî bi awayê xuya dike weke ku Îslam qebûl kirine xwe nîşan didin lê di hundirê xwe de qebûl nakin bi awayekî takkiyetiyê dikin ango dikevin meyla çerxkirinê û di vî warî de gelek mînak hene. Îhtîmaleke xurt e ku di gelek tevgerên mezhebî û serhildanên li dijî desthilatdariya Ereb a şoven û sunnî de rola kesên ji dînê xwe çerxkirî heye. Nexasim, hêja ye ku mirov lê bikole bê ka di pêşdebirina ekolên muxalif ên bi koka xwe Îranî û Mezopotamyayî de para Cihûyan çi heye.

Bûyera herî ciddî jî li peravên bakur ên Derya Hezarê, li beşê îro yê Tirkmenistan û Azerbegcanê qewimî. Ew jî avakirina Dewleta Cihû ya Hezara bû. Ev dewlet bi koka xwe Tirk bû. Li gorî rîwayetê, pêşiyê Selçûkiyan Selçûk Beg di nava vê dewletê de xwedî payeya fermandariyê bû. Navê çar lawên wî navên esil ên Cihûyan bûn. Ev jî têkiliya wî bi Cihûtiyê re bi hêz dike. Eger ev rast be, mîna gelek tevgerên di ser Îranê re li dijî siltanên Ereb hatine kirin, di tevgera Selçûkiyan de jî rola Cihûtiyê

kêm nîne. Ev mijareke gelekî girîng e ku divê mirov lêbikole. Anatolya hê di serdema destpêkê de navendeke ciddî ya Cihûtiyê bû. Bi qasî Grekan, Cihûyan jî di avakirina gelek bajaran de cih girt. Di navbera wan de reqabet hebû. Cihûyên li Rojava û Erebistanê tengav dibin li Anatolyayê kom dibin û ev ji rêûresmê ye. Wexta ku mirov di vê çarçoveya perspektîfa dîrokî de binêre mirov ê baştir fêhm bike çima Cihû piştî Îsraîlê Anatolyayê weke welatê xwe yê duyemîn dibînin. Herweha Anatolya bazareke bi hêz a tevgerên îdeolojîk, pere û bazirganiyê bû ku di vê de para Cihûyan ne kêm bû.

Tê zanîn, Cihû di salên 1391, 1491 û 1550'î de ref bi ref di ser Spanyayê re çûne Anatolyayê û bi cih bûne. Wexta ku mirov giraniya wan a li cem siltanên Selçûkî û Osmaniyan li ber çav bigire, mirov ê baştir fêhm bike ku di vê de çiqasî bi kok cihek dagirkirine. Herweha girseyeke mezin a çerxkirî û bûyî Misilman jî heye. Sabetaytî (tevgera bi hêz a çerxkiriyan a bi koka xwe Îzmîr û Manîsa) ji sala 1650'î ve bi rolên gelekî girîng rabû. Rola Sabetayiyan di polîtîkayên pere û maliyê yên Osmaniyan de tê zanîn. Belkî jî bi rola mamosteyan radibûn ku Osmanî der barê girîngiya bazirganî û pereyan de serwext dikirin. Tevî ku hin caran musaderekirina mal û nakokiyên ciddî dibin jî di tesfiyekirin û diyarkirina gelek siltanan de rola wan nayê înkarkirin.

Wer tê fêhmkirin ku ji bo Cihûtî li ser piyan bimîne, çerxkirin bûye sêyemîn gavavêtina mezin a stratejîk. Diyardeya çerxkirinê nebûya, ne di nava pirraniya Îslamê ya li Rojhilat de, ne jî di nava pirraniya Xiristiyan a li Rojava de wê nikarîbûna hebûna xwe dewam bikin. Divê çerxkirin weke stratejiyeke jiyanê were fêhmkirin. Heta ku dogmatîzma dînî azadiyê nas neke, çawa ku di gelek îdeolojiyan de jî heye, wê meyla çerxkirinê û yên çerx bikin bivênevê, hebin. Cihû bi saya van hersê stratejiyan dikarin bêyî ku bi temamî îmha bibin ji serdema navîn derkevin.

Divê mirov bi tenê ji aliyê berjewendiyên maddî ve li pere nenêre. Bi saya hêza dide, dikarin bi cihûwar bibin û jiyana xwe dewam bikin. Bi saya hêza îdeolojîk jî bi rêbazên manewî hem bi tesîr dibin hem jî dikarin pê li jiyanê bimînin. Li cem Cihûyan tevahiya dîrokê hejmara rewşenbîr,

nivîskar, fikirdar, îdeolog û zanyarên mezin gelek e, û ev jî têkiliya xwe ji nêz ve bi pêşengtiya manewî ya hewcedarî wê ne, heye. Gelek tevgerên dînî, felsefî û zanistî pêşde dibin û ev jî ji ber pêdiviya stratejiya wan a jiyanê ye ku nikarin jê bigerin.

Stratejiya çerxkirinê jî girîngiya xwe ya mezin û bingehîn jî wê di serdema dewleta netewe de nîşan bide. Dewleta netewe ya pêşî Ingilîstan e. Ji bo serwextbûna li dabaşê Ingilîstan mîna kilîta mijarê girîng e. Du hêzên mezin, Qraltiyên Franse û Spanyayê ku hem li ser Xiristiyanên Protestan ên bi koka xwe Katolîk hem jî li ser Cihûyan tevkujî û mişextkirin meşandin, di sedsala 16. de hem ji bo Ingilîstanê li Ewrûpayê bê tesîr bike, hem jî pêşî li gavavêtina wê bigire, şer jî di navê de ketin nava gelek hewldanan. Cihûyan di vê sedsalê de (sedsala 16.) ji xwe re weke cihê ewle, li Anatolyayê li Îzmîrê, li Hollandayê li Amsterdamê û li Ingilîstanê li Londonê têkiliyên xurt danîn (di nava sê hêzan de xebatên hevgirtinê hene). Lê her çû ji xwe re London weke baregeha navendî hilbijartin. Ji wê rojê heta îro London vê statuya xwe dewam dike.

Tê zanîn, Ingilîstan di vê sedsalê de gav diavêje dewleta netewe. Çawa ku tê zanîn maneya dewleta netewe ew e ku ne bi tenê kadroyên dewletê, bi tevahî welatî û kadroyên dewletê dibin hevparê çarçoveya îdeolojiyeke muşterek (mîna dîn) û tevahiya civakê endamên dewletê, welatiyên wê têne hesibandin. Ha ev xislet ji destpêkê ve li cem qebîleya Ibrî heye. Ev xislet pêşî weke qewm, paşê jî dewleta netewe tê pêşdebirin. Qebîleya Ibrî çi qewm û herî dawî jî çi netewe, hem ji aliyê etnîk û hem jî ji aliyê dînî ve yekpare ye. Ya rastî, etnîktî di heman demê de dînîtî ye, dînîtî jî etnîktî ye. Herweha bêyî cihêwazkirina yên bi rê ve dibin û yên têne birêvebirin, di armanca hevbeş de dibin yek. Bi awayekî eşkere ez dibêjim, ev şîroveya min a şexsî ye, û gelekî girîng dibînim, dewletdariya netewe ji îdeolojiya qebîleya Ibrî zêde bûye û hatiye pêşdebirin, li ser tevahiya qewm û neteweyên li derveyî xwe ferz kiriye, şêweyek e ku li gorî wan hatiye fesilandin, edilandin û guhertin.

Dewleta modern a kapîtalîst, bi şêwazê Ibrî û Cihûyan (di roja me ya îro de Îsraîlî) xwe bi rêxistin dike weke dewleta netewe xwe berbiçav dike. Ji

vê jî girîngtir, kakilê her dewleta netewe ne ji aliyê nijadî ve, lê ji aliyê îdeolojîk ve xwedî karektereke Cihû Siyonîst e (dewletdariya netewe ya Cihû). Forma dewletê ya Cihûtiyê di modernîteya kapîtalîst de weke modela dewleta netewe ye. Verner Sombart wexta kapîtalîzmê weke berhemê Cihûtiyê dihesibîne, belkî jî zêde pêşde çûye. Fîlozofê mezin ê dîrokê yê Ingilîz Coolingwood wexta milletperestiya dewleta netewe pênase dike, dibêje "Gerdûngeriya Cihûyan (mirov dikare bibêje îdeolojiya wê jî) serketin bi dest xistiye, lê di şexsê yê ew qirkirî de". Bi vê gotina xwe, xwestiye vê rastiyê îfade bike. Dewleta netewe bi ser ketiye. Di bingehê vê de îdeolojiya Cihû (qebîlegirî, milletperestî, siyonîzm) heye. Lê di encamê de yê ew qirkirî jî pê re afirandî ye. Ya rastî ev tespît girîng e; xisleteke giştî rave dike. Her milletperestî siyonîst e. Di vê rewşê de milletperestiya Ereb jî siyonîst e. Mirov milletperestiya Filistîn, Tirk, Kurd, Îran-Şîa hemû bi xwe weke şêweyên îdeolojiya Cihû ya di serî de bi yekdestdarên neteweperest tê pêkanîn bi nav bike, wê ne şaş be. Jixwe wexta milletperestiya dewleta netewe ya Ingilîz û Hollandayê were lêkolîn wê bi awayekî balkêş were dîtin ku di pêşketina wan de ne bi tenê ji aliyê teorîk ve, bi awayekî berbiçav jî yekdestdariyên Cihû weke pere-sermayeyê bi roleke mezin rabûne.

Divê mirov vê rewşê weke komplo yan jî niyeteke xirab nebîne. Cihû weke banker û bazirganên herî zêde sermayeyê di destê xwe de digirin, di avabûna her dewleta netewe de qadeke mezin lê bihewin û lê sermayê razînin dibînin. Dewleta netewe jî dihişt ku sermayeya Cihû mîna guloka berfê bi awayekî dêwane mezin bibe. Eger Verner Sombart teoriya xwe bi vî awayî rave bikira, belkî rastir bibûya. Wexta ku sermayeya Cihû li nava dinyayê mezin bû, bêguman wê dijberê xwe jî biafiranda. Di roja me ya îro de nakokiya yekdestdarên neteweyî û yên jor neteweyan, çavkaniya xwe ji vê rastiyê digire. Bi awayekî pirr eşkere tê fêhmkirin ku sermayedarên Cihû rewşa xwe ya tengavbûyî ya di dîrokê de timî li ber çav digirin û li ser bingehê xeta xwe ya îdeolojîk a ji rêûresmê di pêkhatina dewletên netewe de xizmeteke dîrokî dikin, û bi awayekî objektîv rê didin ku komên Cihû yên haya wan ji tiştekî nîne û divê berpirsiyar neyên girtin, bêne qirkirin.

Hinekî jî mînaka Hz. Îsa û yê giliyê wî kir Yehûda Îskaryot tîne bîra mirovan. Cihûyan bi qasî sêsed salan ji bo pêşdebirina dewleta netewe ya Elman çanda xwe ya maddî û manewî seferber kirin (bê sedem îdeolojiya Elman neşibiya ya Cihûyan) û heta bi dema Hîtler jî pirr zêde bi milletperestiya Elman ve girêdayî bûn. Milletperestên herî bi hêz ên siyonîst ji gelek aliyan ve nûnerên bi hêz ên milletperestiya Elman jî bûn. Mirov dikare gelek mînakên din jî bide, nexasim jî di çarçoveya Rûsya û Osmanî-Tirkiyê de. Gerdûngeriya Cihû ya Coolîngwood diyar dike (milletperestî-pozîtîvîzm-dînperestî) gihiştiye serketinê. Lê ne bi tenê qirkirina Cihûyan, li tevahiya dinyayê failên qirkirinên çandî û fizîkî jî bi xwe re afirandin.

Ji ber girîngiya mijarê divê em hinekî din wê ji nêz ve bibînin û pê dakevin.

Di nava nasnameyên civakên dîrokî de Cihûtî ji aliyê îdeolojîk ve belkî yek ji mînakên pêşî ye ku xisletên wê yên dînî û etnîk ketine zikhev. Ji Hz. Brahîm û vir ve vê xisleta xwe diparêze. Wexta li vê, baweriya 'qewmê hilbijartî' jî zêde dibe, xwe di ser civakan hemûyan re dibînin û ev jî weke sêyemîn xisleta girîng a îdeolojiya wan diyar dibe. Ev têgihiştina wan a xwe di ser her kesî re dîtinê tevahiya dîrokê bû sedem ku bi civakên din re bêne beramberî hevdu û bi giranî jî rê li ber şerên heta bi qirkirinê ve biçin vekiriye.

Bi vê nakokiyê ve girêdayî Cihûtiyê xisleta xwe ya îdeolojiya civakekê timî parastî ye. Bi awayekî xwezayî Cihû neçar mane ku amûrên taktîk û stratejîk ên bergirî û parastinê bi pêş bixin. Stratejiya wan a bergiriyê, li gorî pêdiviya avabûna wê, divê ji aliyê teorîk û îdeolojîk ve were pêşdebirin. Amûrên taktîk jî zêdetir bi hêza maddî re têkildar in. Di serê van de jî hêza pere û sîlehê tê. Pere, bi rêya bazirganî û bankeriyê tê bidestxistin, sîleh jî zêdetir bi nûjeniya teknîkê re tê pêşdebirin. Di herdu qadan de jî hêza Cihûyan tê zanîn û hatiye ispatkirin. Di vê mijarê de em serdemên destpêkê û navîn bidin aliyekî; serdema nû ango serdema modern bi pêş dikeve, bêguman bi vê pêşketinê re li nava dinyayê gelê herî xwedî tecrûbe û rêxistinkirî Cihû wê ji nêz ve bi van qadan re têkildar û

eleqedar be. Ji sedsala 16. û pêve Ewrûpaya Rojava, nexasim sîstema dinya kapîtalîst a navend Amsterdam-Hollanda û London-Ingilîstan ji aliyê hegemonîk ve dest bi mezinbûnê kir, hêza îdeolojîk û fînansê ya Cihûtiyê ku ji aliyê stratejîk ve bi hêz bû, di vê de bi roleke girîng rabû. Yên wê demê ji nêz ve lêbikolin wê di tespîtkirina vê nuqteyê de zehmetiyê nekişînin.

Eger were gotin Cihûtiyê kapîtalîzm îcad kiriye, ev ê bibe gotineke zêde nepixandî (V.Sombart), lê di warê sîstembûn û ji aliyê hegemonîk ve bihêzbûna wê de rola wan gelekî girîng e, û nayê înkarkirin. Di serî de li London û Amsterdamê, li tevahiya fûar, borsa û bazarên bajarên girîng banker û bazirganên Cihû didin cirîdan û ev diyardeyeke ku tevahiya lêkolîneran diyar kiriye. Polîtîka ekonomiyê di vê mijarê bêdeng maye û ji nedîtî ve hatiye, ev jî bi rola korker a îdeolojiyê re têkildar e. Kapîtala Marks jî di navê de, di nirxandinên li ser mijara polîtîka ekonomiyê de rehûrîşên netewe û etnîk ên daneheva sermayeyê zêde li ser nehatiye sekinîn, ev hem kêmasiyeke gelekî girîng e, û hem jî têra xwe mirov difikirîne. “Sermaye dîn, îman û milliyeta xwe nîne” ev gotina gelek caran dugêsinî tê kirin û şaş e. Sermaye têkiliyeke xwe ya xurt bi dîn, îman û milliyetê re heye. Bêguman hin kesên xwedî dîn, îman û milliyetê gelek yekdestdariyên sermaye û desthilatdariyê pêk tînin, li beramberî vê pirraniyê dikin mêtingeh. Mînaka vê ya herî berbiçav û eşkere li DYE ye. Weke hem dîn, hem îman û hem jî milliyet herî zêde sermayedar ji wir in, û kes nikare vê înkar bike.

Rola Cihûtiyê di avakeriya kapîtalîzm, modernîte û herdu lingên wê yên din îndustriyalîzm û dewleta netewe de ya guftûgokirinê nîne. Ji yekemîn şoreşa bajaran a Ewrûpayê û pêve (1050-1350 P.Z.) banker û bazirganên Cihû yên pêşketina xwe dewam kirin, di dema bazirganiya kapîtalîzmê ya sedsalên 15.-18. de hê zêdetir xwe xurt kirin û derketin. Li bajarên Rojhilat jî li bajarên weke Qahîre, Heleb, Şam, Îzmîr, Tebrîz, Antakya, Bexda, Stenbol û hwd. bi heman awayî bi pêş ketine. Kengî Şoreşa Îndustriyê weke qadeke karê diyar bû, dereng neman sermayeya mezin a di destê xwe de xistin qada îndustriyalîzmê. Pirr hewce nake ku mirov vê jî rave

bike. Ji ber ku her devera kar lê zêde be, sermaye berê xwe dide wir û êrişê dibe ser. Ma prensîba ku qanûna karê jê re tê gotin ev nîne?

Hingê mirov çawa dikare sivik bibîne rola sereke ya yekdestdariya sermayeya Cihû, ya hem bi mohra kapîtalîzmê û hem weke moderníteya kapîtalîzma îndustriyalîzmê, ma çawa mirov dikare girîngiya wê destnîşan neke? Eger ji vê re neyê gotin, bi zanebûn hatiye berevajîkirin, bi hêsanî mirov dikare jê re bibêje çavkoriya îdeolojîk. Jixwe ji aliyê Cihûtiyê ve ev rewş guneh jî nîne. Di her koma etnîk, dînî û neteweyî de yekdestdariyên bazirganî û pîşesaziyê dikarin pêk bên. Li vir a girîng ew e, rola stratejîk a yekdestdariyên bazirganî û pîşesazî yên Cihû ne. Fînansê jixwe bi awayekî ezel û ebed hebûna xwe bi yekdestdariyên Cihû dîtiye. Polîtîka ekonomiyê bi giştî têkiliya yekdestdariyên bazirganî, pîşesazî û fînansê bi îdeolojiyê re (Lîberalîzm bi tenê di nirxa propagandayê de dikare bibe mewzûbehs) û bi taybetî jî bi îdeolojiyên milletperest, dînperest, zanistperest û cinsperest re analîz nake, xwe jê dûr digire, û ev yek weke ku îdea dike ji ber fikarên wê yên 'ojbektîvbûnê' nîne. Berevajî bi tevahî yekdestdarî naxwazin objektîv bibin. Polîtîka ekonomiyê, nexasim yekdestdariyên desthilatdariyê jî di navê de nasnameyên dînperest, cinsperest, milletperest û zanistperest ên tevahî yekdestdariyan vedişêre û nîşan dide ku ne zanisteke objektîv e. Bi sedema ku rastiya berbiçav û ya diqewime ji nuqte û aliyên girîng ve vedişêre û bêqîmet dide xuyakirin, nîşan dide ku ne weke zanist, lê weke amûrekî propagandayê yê îdeolojîk tê bikaranîn.

Di sîstema dinya hegemonîk a çarsed salî de Cihû statuya xwe ya stratejîk di yekdestdariyên sermaye, bazirganî, pîşesazî, fînans, medya û entelektuel de bi awayekî girîngiya xwe hê bêtir zêdekirî, dewam dikin. Mirov vê diyardeyê tespît neke, çi global çi xwecihî, ne ti pirsgirêk ji hev tê derxistin (teorîk) û ne jî çareserkirina (pratîk) ti pirsgirêkê bi temamî mumkîn dibe.

Cihûtî di avakirina dewleta netewe û moderníteyê de hem weke hêza îdeolojîk a stratejîk, hem jî weke hêza maddî ya stratejîk, bi statuyeke zêdetir diyar rabûye. Cihûtî bi rêya dewleta netewe wesfê moderníteyê yê kapîtalîst derdixe holê û pêk tîne. Moderníteyê jî bi rewşa bazirganî,

fînans, îndustrî û desthilatdariyên yekdestdariyê yên yekbûyî weke dewleta netewe berbiçav û misoger dike. Cihûtî bêguman xwedayê dewleta netewe nîne. Lê ji serdema qebîleyê heta roja me ya îro, ji rewşa wê ya malzarokê heta bi temenê wê yê girsbûn û rizînê di qada xwe ya hostatiyê de pêşde biriye.

Ez hîç girîngî û guh nadim teoriyên komployê. Timûtim îdeayan diavêjin naverastê. Tê gotin, Cemiyetên Mason ên veşartî dinyayê bi rê ve dibin, Civînên Bilderbergê, Civînên Davosê, Konseya Rêveber a Dinyayê ya 12 Kesî ya Daîmî, destikbûna NY a Cihûyan û hwd. bi van binavkirinan dixwazin teoriyên komployê mafdar nîşan bidin. Tevî ku di van îdeayan de para rastiyê heye jî xisletên hevpar ên van teoriyan ew e, zanistî nînin, dogmatîk in, û aliyên wan ên zêde nepixandî hene. Lê rastî li naverastê ne. Rim di têrrê de hilnayê. Serdestiya Cihûyan di sêlingên modernîteya kapîtalîst de hewce bi guftûgoyê nahêle. Di hersê qadan de jî ji aliyê stratejîk ve hem di warê îdeolojîk û hem jî di warê hêza maddî de bi bandor e, û heta di pozîsyoneke gelekî diyarker de ye. Divê hay ji çarçoveya gotina min hebe: Ez behsa tesîra wê ya di qada modernîteya kapîtalîst de dikim. Naxwe di nava rastiya civaka dîrokî ya hê berfirehtir de behsa cihê wan ê di nava modernîteya demokratîk de nakim. Cihûtî di van modernîteyan de jî heye. Lê bi awayekî ji hêza xwe ya stratejîk gelek tişt ji dest dayî.

Bîsteke din, berî ez derbasî vê dabaşê bibim, feydeya xwe heye ku mirov hinekî din dewleta netewe ji hev derxe, çareser bike. Dema îdeolojiya Cihû ji serdema navîn derket, weke stratejiyên jiyanê, hewldanên xwe yên bêbandorkirina muxalifên xwe yên Xiristiyan û yên Misilman ji xwe kêm nekirin.  Dewleta Netewe hem bi xwedatiya netewe ya di nava xwe de dihewîne (di Cihûtiyê de Reb, di maneya xwedayên netewe de ye), hem jî weke giş yekdestdariyên bazirganî, fînansî, îndustriyel, îdeolojîk û kulmozên yekdestdariyên desthilatdariyê, di vê mijarê de weke modela stratejiya jiyanê ya herî munasib derdikeve pêşiya me. Di dewleta netewe de laîsîzm, di rewşa Reb Xwedayê Neteweyî yê Cihû de fonksiyonel e. Ji vî alî ve avakirina têgînan a Masontiya Cihûyan gelekî girîng e. Ji vî alî ve û bi

vê maneyê, dewleta netewe dibe amûra rêveberiya gerdûnî ya herî girîng a Cihûtiyê.

Yekdestdariyên Cihûyan bi yekdestdariyên bi koka xwe Anglo-Sakson re modela dewleta netewe ji bo jihevdexistina Împaratoriyên Franse û Spanyayê weke amûrekî bi bandor bi kar anîn. Ji ber ku herdu hêz ji bo herdu hêzên din (Hollanda û Ingilîstan) xwedî pîlanên malwêranker û kujer bûn. Tehlûke hebû di dîrokê de tesfiye bibin û bi tevkujiyan re rûbirû bibin. Dewleta netewe weke hêza yekdestdariyê ya yekbûyî û herî pirr xwe gurçûpêçkirî li dijî yekdestdariyên Franse û Spanyayê modeleke serketî bû. Ji ber ku yekdestdariyên Franse û Spanyayê bi rêûresmên împaratoriyê yên zêdetir ji serdema navîn mayî û neorganîzekirî dixwestin bigihên encamê. I. Wallerstein di berhema xwe ya navdar **Sîstema Dinyayê** de weke hêmana bingehîn a serketina Ingilîstanê li hemberî Franseyê sîstematîka dewleta netewe destnîşan kiriye û bi vî awayî girîngiya vê rastiyê diyar kiriye.

Dema ku Xanedaniya Habsburg a Awûsturyayê tê hilweşandin, hêzên hevgirtinê şêweyê dewleta netewe yê Prûsyayê derdixin pêş. Pêkanîna yekîtiya Elmanyayê ji pêşengtiya Awûsturyayê tê stendin û pêşekiyê didin Prûsyayê. Di Şoreşa Franseyê de li dijî qral, dijminên wî yên ji rêûresmê weke muxalefet navenda wan dibe London. Teşkîlata Mason di îhtîlalê de bi roleke girîng radibe. Serê qral tê jêkirin. Di Şoreşên berê yên Ingilîstan û Hollandayê de jî tesfiyeyên bi heman rengî pêk tên. Heman lîstik li şûna Franseyê vê carê li hemberî hêza nû ya dixwaze weke hêza hegemonîk gav biavêje ango dewleta netewe Prûsyayê tê lîstin. Marks bi xwe jî weke muxalif li Londonê dimîne. Hevgirtin, bi Şerên Yekemîn û Duyemîn ên Dinyayê îddîayên Elmanyayê yên hegemonîk têk dibe. Sedema bingehîn a qirkirina Hîtler bi serê Cihûyan de anî ew e, sermayeya Cihû hêza xwe ya stratejîk li cem Ingilîstanê bi kar anî û bi vî awayî di têkçûna Elmanyayê de bi roleke girîng rabû. Heman hevgirtin wê bi şêweyên nû di şerê sar de jî îddîayên Rûsyayê yên hegemonîk têk bibira. Niha weke hîpotez pirr tê gotin, Çîn ê bibe hêza hegemonîk. Eger ev îdeaya Çînê ya hegemonîkbûnê bilebite, bila kes gumanê neke, bi îhtîmaleke xurt aqûbeta wê jî bibe ev.

Di roja me ya îro de ji dusedî zêdetir dewletên netewe li navenda bajarê New Yorkê li NY têne temsîlkirin. Tê zanîn ku NY jî bi pêşengiya heman hevgirtinê tevdigere, herî kêm heta hevgirtin erê neke, biryareke bi tenê jî nikare bide.

Ez dubare bînim ziman ku siyonîzm an jî hêzeke din a Cihû dused dewletên netewe bi rê ve nabe. Lê her dused jî (Dijminên wê yên sondxwarî dewletên netewe yên Ereb û Îran jî di navê de) bi paradîgma milletperest a Cihûyan hatine damezrandin û çarsed sal in ku hevsarên wan di destê heman kakilê hevgirtinê de ye. Herçiqasî di nava elîtên dewletên netewe de hîç Cihû tinebin jî çi ji aliyê paradîgmatîk ve û çi jî ji ber tedbîrên berçav ên hevgirtinê (ango bi awayekî teorîk û pratîk) qadên wan ên lê serbixwe tevbigerin gelekî bi sînor in. Karûbarên dewletên netewe bikin heta dernekevin derveyî qalibên avabûn û îdeolojîk ên rêûresmê yên modernîteya kapîtalîst a çarsed salî, ti pirsgirêk nîne. Dikarin di rêya xwe de bimeşin. Bi gotina G.W. Bush, eger bikevin rewşa ‘dewletên asî’ weke bi serê her dewleta netewe de hatiye wê aqûbeta wan jî bibe weke ya Talîbanên Aftanistanê, Saddamê Iraqê û bi dehan mînakên din ên di dîrokê de qewimîne. Diyardeya jê re statukoya NY tê gotin, ev e.

Rûsya Sovyetê ya heftê salî jî piştî ku îfade kir wê li gorî pêdiviyên modernîteya kapîtalîst tevbigere destpê kirin ew entegreyî sîstemê kirin. Çîn zûtir hat entegrekirin. Eşkere ye ku çawa ez ji destpêkê ve hewl didim bînim ziman, sîstem hêza xwe ji du hêzên stratejîk digire. Di herduyan de jî Cihûtî ji aliyê dîrokî û rojane ve di rewşeke nêzî diyarkeriyê de ye. Hêmanên hêza îdeolojîk stratejîk, îndustriya çandê, sermayeya entelektuel û medya ne. Naveroka wan milletperest, dînperest, zanistperest û cinsperest in. Hêmanên hêza maddî stratejîk, avahiyên yekdestdariyê yên bazirganî, pîşesazî, fînansî û desthilatdarî ne. Hevgirtinên navneteweyî yên dewletên netewe weke sîstemên dewletan avahiya fermî îfade dike. Divê mirov van qadên dêwane yên van herdu hêzên stratejîk bi xwe, weke îfadeya fermî bi dewletan û sîstemên wan re tevlîhev neke.

Girîng e ku li vê nirxandin û mijarê, bi awayekî kurt be jî nirxandineke der barê Cihûtiya Anatolyayê de jî pêşkêş bikim. Di vê mijarê de min bi

kurtî behsa serdemên destpêk û navîn kiribû. Têkiliyên Cihû-Selçûkî û Cihû-Grekî girîng in. Cihûyên Rojhilat di serdema navîn de ji Endulusê heta bi Asya Navîn belav bûbûn. Dewleta Tirk a Cihû ya Hazarayê berhema vê pêvajoyê ye. Cihûtiya eşkere û ya çerxkirî li welatên Misilman qedexe nebûn, nexasim di qadên stratejîk ên dewlet û desthilatdariyan de bi hêzên xwe yên îdeolojîk û maddî yên ji rêûresmê, bi bandor bûn. Bazirganî û bankertî di rewşeke welê de ye, ji Rojava kêm nînin.

Nakokiyên wan bi Xiristiyanan re yên ji rêûresmê (Çarmîxkirina Îsa û kengî Xiristiyantî bû baweriya fermî ya Rojava), kengî bi Biryara Konseya Lateran a sala 1179'an gihişt gettokirinê û mişextkirinên Spanyayê yên salên 1391 û 1492'an ketin rojevê, Cihû ji bo xwe bi pêdiviya welatekî hisiyan. Têgîna 'welatê soza wî hatiye dayîn' hê zindî ye. Hê di dema bilindbûn û mezinbûna Osmaniyan de têkiliyên bi siltanan re datînin encamên erênî didin. Kengî ji bo Osmaniyan girîngiya bankerî û bazirganiyê zêde bû, Cihûtiyê jî pozîsyona xwe bi hêz bikira. Osmanî timûtim desthilatdariya xwe li ser şêniyên Xiristiyan belav dikin û pêşde dibin. Ji lewra rewşa Cihûyan li Rojava di alema Xiristiyanên Katolîk û Ortodoks de her diçe zehmet dibe û lewma jî hevgirtineke mîna ya bi Ingilîstanê re bi padîşahên Osmaniyan re jî pêk tînin. Fikra hevpar ew e, ev hevgirtin di salên 1550-1600'î de bi hêz bûye. Di heman dîrokê de bi Hollanda ya Protestan û Ingilîstanê re jî hevgirtinên bi heman rengî hatine bi hêzkirin. Têkiliya Cihûyan bi Protestanî, kapîtalîzm, dewleta netewe û modernîteyê re girîng e, û hêjayî lêkolînê ye.

Nîvgirava Îberîk ya Spanyayê ji Misilman û Musewiyan hat paqijkirin (ev pêvajo heta bi salên 1600'î hat temamkirin), weke pêngava dijber paqijkirina Anatolyayê ji Xiristiyanan xist rojevê. Di dîrokê de ji gelên herî kevin ên Anatolyayê û xwedî çandeke bi hêz a maddî û manewî ya dîrokê, gelên Rûm, Pontûs, Ermenî û Suryanî yê zû bûn Xiristiyan, ji ber vê rojevê çerxa felekê ji wan re çep digere. Nîvgiravên li herdu seriyên Deryaspî mîna bersivê bidin hev gav bi gav tesfiyeyên beramberî hevdu pêkanîn. Piştî pêngava 1550-1600'î Cihû duyemîn pêngava xwe ya mezin bi Partiya Îttîhad û Teraqiyê re (di salên 1890'î de; Kongreya Siyonîst di sala 1896'an

de heman demê tê damezrandin) pêk tînin. Îttîhad û Teraqî bi tevgera çerxkiriyan a navend Selanîk û ji Sabetayan tê (ji salên 1650'î ve) di zikhev de bi pêş dikeve. Ev jî piştrast dike ku bazkekî Îttîhat Teraqiyê misoger Cihû ye. Netewetiya ava kirine (Moiz Cohen, Armîn Hermann Wambery) weke gotin 'Tirk' e; lê naveroka wê bi Mason û Kurd, Arnawûd û Cihûyên çerxkirî tijî ye. Weke diyardeyeke sosyolojîk ti têkiliya xwe bi Tirkîtiyê re nîne. Bi temamî Tirkîtiyeke siyasî mewzûbehs e. Ji bo bandorê li wan bikin, Cihûyên Elmanya û Ingilîstanê jî li ser tirkîtiyê di nava pêşbaziyê de ne, û ev girîng e. Dîroka vê dirêj e, û cihê wê ev der nîne.

Di encamê de, li gorî min dîrokeke Cihûyan a kevin li Anatolyayê heye; îca bi dersên ji vê dîroka xwe, mişextkirin û serhatiyên xwe, dîsa ezmûn xwe yên di warê avakirina dewleta netewe de, bi hêza xwe ya stratejîk, îdeolojîk û maddî re dikin yek û bi vî awayî, çi di damezrandina Komara Tirkiyê, çi jî bi lez (muhtemel e, di salên 1926'an de) di veguhertina wê ya dewleta netewe de bi roleke girîng radibin. Çawa ku rola di salên 1600'î de li Hollanda û Ingilîstanê pê rabûn li Komara Tirkiyê jî dubare dikin. Bi lez komarê vediguherînin dewleta netewe û piştî tesfiyekirina Xiristiyanan li Anatolyayê ji aliyê çandî ve tesfiyekirina Îslama rêûresmê û Kurdan dikeve rojevê (ya Xiristiyanan bi xwe, tesfiyekirina wan a fizîkî jî di rojevê de ye). Eger mirov vê bi tenê weke encama projeya netewebûna Tirkan pêşkêş bike di nava wê de gelek şaşî hene. Ji ber ku Cihûyan berî Îsraîlê Anatolya weke welatê xwe qebûl kiribûn û ev jî ji nêz ve bi vê mijarê ve têkildar e. Lewma ev mijar gelekî berfireh e. Tê zanîn ku ev mijar di nava Cihûyan de gelekî tê guftûgokirin. Projeya Cihû ya navend Edîrne yan jî Selanîk ku disipêrin Mistefa Kemal, mijarek e ku ser wê digirin. Lê bi damezrandina Îsraîlê re mirov dikare bibêje ku girîngiya vê mijarê êdî nemaye. Lê eleqeya Cihûyan û Îsraîlê li ser Anatolya û Komara Tirkiyê KT hê jî stratejîk e.

Di avakirina Komara Tirkiyê de statuya Mistefa Kemal Ataturk nayê guftûgokirin. Lê belê tevî ku nedixwest ew kirin mîna xwedê û ev jî çawa ku tevahiya dîrokê li gelek deveran kirin, avakirineke îdeolojîk a Cihûyan e. Di gerdûngeriya Cihûyan de (Lewhî Mehfûz, çarenûs, qanûnçêkerî,

determînîzm, li ser xetekê pêşde çûn; şêweyekî avakeriya xwedê ya Sumeran e ku veguherandine dînên yek xwedayî) xwedakirin têgînek e ku gelekî hatiye pêşdebirin û bicihanîn. Çi di dema pêxemberan de, çi jî di dema modernîteyê de her cure têgînên zêhniyetê yên weke utopya wêjeyî, serdema zêrîn, teorî, hîpotez û qanûn ên ji aliyê entelektuelan ve hatin pêşdebirin ji nêz ve bi vê rêûresmê re têkildar e. Çawa ku der barê tevahiya gelên Rojhilata Navîn de dogmayên hegemonîk, sekuler-laîk ên xwedayî zêde ava kirine, bi heman awayî li ser Tirkan jî ava kirine û heta ev rast neyê analîzkirin, serwextbûna li herêmê wê kêm û zehmet be.

Bêguman hêza maddî ya Cihûyan jî xwedî girîngiyeke stratejîk bû. Ez bawer dikim ku M. K. Ataturk teslîmî vê meylê nebûye. Lê tevî ku gelekî xwend û lêkolîn kir (bê sedem heta bi Sumer û Hîtîtiyan naçe), ez yeqîn nakim ku tam ji hev derxistibe. Bi sedema ku dixwest bibe komargirekî baş, dixwest komarê ne weke dewleta netewe, belê weke demokrasî pêşde bibe, ez ji vê jî gumanê nakim. Çawa ku tê îdeakirin antî-Kurd û antî-Îslam jî nîne. Lê eşkere ye ku nêzîkatiyên xwe yên lîberal ên di destpêkê de ji bo pirsgirêka Îslam-laîk (laîktî di sala 1937’an de ket destûra bingehîn) û pirsgirêka Kurd nikare dewam bike. Ez di vê mijarê de divê gumanên xwe bi girîngî bînim ziman ku kadroyên çerxkirî yên Îttîhadgir dor li wî girtibûn û ji ber vê yekê di mijarên behskirî de nêzîkatiya xwe ya destpêkê nikarîbû dewam bike.

Li ser Komara Tirkiyê xwe li hev rakişandina hegemonîk hê salên 1926’an di navbera Laîkî û Îslamiyan de destpê kir û bi hemû leza xwe dewam kir. Bi ya min, ev mijar divê weke qusûr û xwestekeke li gorî dilê Mistefa Kemal Ataturk pêkhatî neyê nirxandin. Delîl û îşaret zêdetir in ku nîşan didin meyla wî ber bi xeta Komara Demokratîk e. Xwelihevrakişandina hegemonîk a di navbera aliyan de ez bawer nakim ku di roja me ya îro de bi serketineke tam a aliyekî bi encam bibe. Ez hez dikim ku bînim ziman, hêviyên min zêde bûne, li ser erdên Anatolyayê ku xwediyê rêûresmeke mezin a demokratîk e, vê carê wê gavavêtina berê xwe daye hedefa Komara Demokratîk bi hêz bibe û bi ser keve. Ez hêvî dikim ku rûyê rastî yê têkoşîna hegemonîk li ser Anatolya û Tirkiyê di beşê

parêznameya xwe ya Rojhilata Navîn de bînim ziman. Ez difikirim ku vê parêznameya xwe weke cildekê amade bikim.

Eger mirov li Cihûtiyê bi tenê di çarçoveya kapîtalîzm, modernîte û dewleta netewe de bifikire wê kêm û şaş be. Li ser modernîteya demokratîk bandora wê girîng bûye. Tevahiya dîrokê bi qasî bazkê desthilatdar û dewletdar (Qraltiya Cihûyan, Dewleta Îsraîlê) nebe jî dîsa jî bazkekî bi hêz ê Cihûyan ê modernîteya şaristaniya demokratîk her hebû. Cihûtiya xizan û têkiliyên wê yê qebîletiyê sist û lawaz jî kiriye ku di dîrokê de timî behsa wê were kirin. Ji Smaîlê kurê Hz. Brahîm ê ji cariya wî Hacerê heta bi Yûsivê li Misrê, ji xuşka Mûsa Meryemê heta bi dayika Îsa Meryemê û ji wir jî heta bi roja me ya îro gelek pêxember, nivîskar, rewşenbîr, anarşîstên sosyal, femînîst, fîlozof û zanyaran bi tevahî kedkarên xwe rûyekî din ê gelê Cihû di têkoşîna şaristaniya demokratîk û têkoşîna modernîteyê de vedîtinên mezin, îcad, teorî, şoreş û berhemên hunerî pêkanîne. Cihûyan hêza xwe ya maddî û îdeolojîk timî li rê û xêra yekdestdaran bi kar neanîye. Ji bo dinyayeke ronaktir, adil, azad û demokratîktir jî gelek hewldanên wan ên girîng û serketinên wan çêbûne. Ma em li kîjan tevgera pêxemberan, piştgiriya biratî û xizanan, tevgerên utopîk, sosyalîst, anarşîst, femînîst û ekolojîk dikarin bêyî Cihûyan bifikirin? Li ekolên felsefî, tevgerên zanistî û hunerî, mezhebên dînî pirr kêm mirov dikare bêyî Cihûyan bifikire. Li dijî kapîtalîzm sosyalîzm, li dijî dewleta netewe enternasyonalîzm, li dijî lîberalîzmê kominalîzm, li dijî civaka cinsperest femînîzm, li dijî îndustriyalîzmê eko-ekonomîzm, li dijî dînperestiyê laîsîzm, li dijî gerdûngeriyê îzafiyetgirî, eger Cihû û Cihûtî nebûna ma dikarîbûn bi pêş biketana?

Eşkere ye ku Cihûtî ji aliyê herdu dinyayên modernîteyê ve jî girîng e. Di beşên girîng ên dîrokê û roja me ya îro de Cihû vê girîngiya xwe diparêzin. Tevî vê yekê, pirsgirêka Cihûyan çawa ku di dîrokê de bû, di roja me ya îro de jî hebûna xwe diparêze. Min di destpêkê de jî gotibû, mirov Cihûyan weke koma bijare ya xwedê bibîne û wan weke serê guneh binirxîne jî çawa ku gelek caran mînakên wê hatine dîtin, rê li pêkhatin û şaşiyên xeternak vedike. Ji ber vê sedemê, min hewce dît ku ez di asta pêşnûmeyê

de bi mijarê dakevim. Heta rastiya Cihûyan li ber çavan neyê girtin, analîzên xwecihî û yên global, wê têra xwe rast û encamgir nebin.

Ez dema vê mijarê girê bidim û bigihînim encamê, ez hez dikim ku gotineke K. Marks dubare bikim: Marks gotibû: "Eger proleterya dixwaze xwe rizgar bike, divê zanibe heta dinyayê rizgar neke wê ev pêk neyê." Ez jî dibêjim, eger Cihûtî dixwaze xwe rizgar bike, divê zanibe heta dinyayê rizgar neke nikare xwe rizgar bike, lewma jî divê hêza xwe ya maddî û îdeolojîk a ku stratejîk e, li ser vê bingehê bi kar bîne. Modernîteya demokratîk di serê vê bingehê de tê.

## E- Şaxên Modernîteya Demokratîk

Me di analîza xwe de bi awayekî berfireh şaristanî û modernîte rexne kir. Tevî vê, me şaristaniya demokratîk bi dîroka pêşketina şaristaniyê re di zikhev de û bi beşên hêmanên wê yên sereke yên cûrbicûr pênase kir û ez yeqîn dikim ku analîza bi vî awayî mijar têra xwe zelal kiriye. Ya ez ê li vir hewl bidim bikim ew e, mijarê bi şaxên wê yên sereke û bi awayekî yekpare bêtir berbiçav û diyar bikim. Eger mirov ji jor ve li modernîteya demokratîk binêre, gelo dikare şax û hêmanên wê yên sereke çawa pêşkêş bike. Ez ê bersiva vê pirsê bidim. Di bingehê xebatên me yên zanistî de divê hin hewldanên me hebin; divê em têgihiştina modernîteyê ya yekperest bişkînin û hebûnên mezin ên civaka dîrokî yên modernîteyê ser wan girtine berbiçav û diyar bikin. Dîroka şaristaniyê mîna bîrekê ye ku binê wê xuya nake, tu çiqasî dadikeve nagihîjî binê wê. Em çiqasî hewl bidin rohnî jî bikin yekser dîsa kunên din ên tarî diyar dibin. Bîr û hafizeya civakî (wijdanê wê) ya bi hezarê salan di bin bombebarana îdeolojîk a yekdestdaran de bêguman mirov dikare texmîn bike ku wê mîna kulora li hev badayî ya mejî li hev bigere û bikeve serhev, wê dirûvekî diyardeya jê re binbîr tê gotin weke hafiza civakî ya hezar caran bi şêweyekî dehlîzan li hev badayî pêk bê. Dîsa jî divê mirov ji ya xwe neyê xwarê û zivêr nebe. Ti pirsgirêka civakî heta têra xwe neyê zelalkirin çareser nabe. Çawa ku mirovekî teşxîsa wî rast nehatibe kirin, organê wî jî rast nayê dermankirin,

bi awayekî mîna vê, pirsgirêkên civakî jî rast neyên analîzkirin (teşxîskirin) û çareserkirin (dermankirin) ji holê ranabin.

Ez timûtim hewcedarî bi destnîşankirina hin mijaran dibînim û divê ji vê lome neyên kirin. Eger zanista civakî yan jî disîplîna zanisteke din a bi îddîayên bi heman armancan serketî bibûya, mirovatiyê ev çarsed salên dawî bi şerên evçend xeternak, qirkirin û kokqelandina civakan, bi dewlemendî û xizantiya navbera wan gelekî vebûyî, bi bêkarî û koçberî, bi rizîna çandî û bêexlaqiyê, bi yekdestdariyên mîna dêwan mezinbûyî û bi qasî ku bibin hîç ferdên piçûkxistî, bi talan û hilweşînên hawîrdorê yên mahşerê tînin bîra mirov îro neketibûya vê rewşê. Sîstema Şaristaniya Dinyayê pênc hezar sal e ku bi navê çareyê giraniya xwe dide ser tevahiya amûrên çandê yên maddî û manewî, lê wer xuya dike ku ew qedandine. Bi amûra şer êdî devereke were fetihkirin û ji nû ve were zevtkirin nîne. Eger were gotin heye jî zirara wê ji kara wê qatbiqat zêdetir e. Yên ji amûra bi navê bajar mayî bajarên bêbajar in ku qaşo hewl dan çareser bikin, lê di dawiyê de mîna kansêrê mezin bûn û civakeke gund û cotkariyê ya mehkûmî xizanî û tinebûnê kirin. Ji amûra bi navê ekonomiyê ya xwe pêve girêdayî yên li dawiyê mayî yekdestdariyên global in ku bi rêbazên li derveyî exlaq ên mîna bidestxistina pereyan bi pere werimîne û bi mîlyonan bêkar û xizan in ku her sal hejmara wan zêde dibe. Ji amûra bi navê dewletê ya xwe pêve girêdayî li dawiyê yekdestdariyên dewleta netewe û desthilatdariyên ti fonksiyona wan nemane û hingî ji civakê xwarine nepixîne, girseya kerî û welatî ya bi temamî hatiye ehmeqkirin û têkiliya xwe bi civaka exlaqî û polîtîk re xilas bûyî, maye. Ji amûrên îdeolojîk ên hêvî ji wan têne kirin, li dawiyê dînperestiya fonksiyona xwe ya exlaqî ji destdayî, cinsperestiya desthilatdariyê li tevahiya çaviyên civakê belav dike, milletperestiya wê ya hezar qat ji qebîletiyê zêdetir civakê bi şovenîzmê dixeniqîne, zanistperestiya wê ya ji bilî rêya kara herî zêde nîşanî yekdestdariyên sermaye û desthilatdariyê nade û wekî din armanca xwe nemaye, mane. Ji hunerê çanda îndustriyê ya hisa bedewbûnê û mezinbûna hisan dike meta, li dawiyê maye. Ya jê re dawiya dîrokê tê gotin bi herhalî wê ev bîlançoya şaristaniyê be. Civakeke bi

yekdestdariyên medyayê di dinyayeke ferazî de bêhnçikandî û serkorî hatiye kirin, çiqasî bêreaksiyon were kirin bila were kirin, bi amûrên desthilatdariyê heta bi çaviyên wê çiqasî were kontrolkirin û bixin bin çavdêriyê, pêxîrtengiya avabûn û zêhniyetê ya sîstema modernîte û şaristaniya dinyayê ya bi giştî pênc hezar salî û bi taybetî jî çarsed salên dawî li nuqteya herî binî ne. Kapîtalîzma fînansê ya bûye hêzeke hegemonîk û global bi awayekî eşkere vê yekê piştrast dike. Dinya ku çerxên wê ji aliyê kapîtalîzma fînansê ve têne gerandin, bûye dinayeyeke krîzan a ji ber pêxîrtengiyan diperpite.

Armanca min pêşdebirina teoriyên pêxîrtengî û krîzê nîne. Min kapîtalîzm ne bi tenê weke sîstemeke xwedî pêxîrtengiyên dewrewî, weke qonaxa dewrewî ya pêxîrtengiyên avabûnê yên sîstemîk ên sîstema şaristaniyê ya bi pêxîrtengiyên dewrewî û dirêj pênase kiribû. Eger qonaxa pêxîrtengiyê di nava xwe de qonaxên wê yên hundir ê dijwartir hebin, pêvajoya niha pêk tê ew e. Ez wexta van diyar dikim, divê ez bibêjim, ez ji wan sosyalîstan nînim ku hê ji van pêxîrtengiyan li hêviya pêkhatina şoreşê ne. Pêxîrtengî rê ne bi tenê li şoreşan, li antî-şoreşan jî vedike. Jixwe ez teoriyên bi vî rengî yên weke pêxîrtengî-şoreş-antî-şoreş ji rastiyekê wêdetir weke hewldaneke retorîk û propagandayê dibînim. Ji ber ku ez dibêjim atmosfer bi lez li modernîteya demokratîk vedibe, ez tam gotinê bi cih nakim. Ez pêvajoyên pêxîrtengî û krîzê weke diyardeyekê qebûl dikim. Lê ez di asta wan hêmanan de wan nabînim ku rê li bûyerên dîrokî vekin. Xeta pêşdebir a gerdûngir, demekê bi îhtîmam, ji teoriyên pêxîrtengiyê şêweyên civakan ên li pey hev ji xirabiyê ber bi başiyê ve diçin derdixistin. Rewşa berbiçav bi xwe vê teoriyê piştrast nake.

Ev tê wê maneyê ku divê mirov hêmanên di dîrokê û rewşa wê ya niha de xwedî nirxeke diyarker in di qadên din de li wan bigere. Alternatîfa modernîteya demokratîk bêtir encama hewldanên van lêgerînan e. Ez dema pêşkêş dikim, ez neçar im timûtim vê destnîşan bikim. Ez yeqîn dikim eger mirov xisletên vê alternatîfê ji yên din cihê dike nas bike, ev yek ê hewldanên di pratîkê de berdar û xurt bike. Ez bi mîrateya demokratîk a erênî ya dîrokê ve girêdayî me û jê re gelekî bi hurmet im. Ez vê di heman

demê de ji bo xwe weke xwerexnekirinê qebûl dikim. Ez bi tenê nabêjim min ders jê girt, ez bi dîrokê bi xwe ‘niha’yê çêdikim û ez yeqîn dikim ku ev rêbazek e ku dest jê nabe. Her fikir û çalakiya serwext nebûbe ku dîrok niha ye, niha jî dîrok e, nirx û encamên wê çi dibin bila bibin, ez heman dilsozî û rûmetê nîşanî wê nadim. Ji ber ku ez ji çalakî û fikrên bi vî rengî bawer nakim. Paşeroj û siberoj bi ‘niha’ dibe, lewma ez bawer nakim ku yê-ya nihaya xwe ji hev dernexistibe û ji hev dernexe, paşeroj û siberoja xwe hebe.

Ez der barê rêbazê de van dubare dikim, ji ber ku dixwazim bi israr destnîşan bikim ku li medeniyeta demokratîk di dema rabihurî de weke xeyaleke ‘serdema zêrîn’ a pêkhatî nayê fikirîn, ne jî weke ‘utopayeke’ der barê paşerojê de hatiye tesewirkirin. Ya rojane heta weke pêdiviya kêliyan di fikir û çalakiyê de pêk tê, îfadeya maneyê ya şêwazê jiyanê ye. Ne yadkirina bîranînên berê ye, ne jî bi xeyalên paşerojê dilê xwe xweş dike. Ne afirêneriya kêliyan, ne jî rewşa hebûnê ya rastiyên ezel û ebed e. Mejiyê nerm ê xwezaya civakî weke cudatiyên xwedî kapasîteyeke zêde ya azadiyê bi awayekî yekbûyî heye û belkî di cih de be ku mirov vê weke modernîteya demokratîk bi nav bike. Lê modernîte tê maneya serdemê, lewma modernîteya demokratîk bi awayekî diyalektîkî weke qutbê dijber ê şaristaniyên klasîk dibe xwedî hebûn. Ji ber vê sedemê divê em ji bîr nekin ku wê ji sedî sed bi vê pênaseyê re bikin yek.

Çawa ku modernîzm weke serdema hegemonîk a kapîtalîzmê navê xweser ê çarsed salên dawî yê şaristaniya klasîk tê tesewirkirin, mirov dikare modernîteya demokratîk jî weke navê xweser ê çarsed salên dawî yê şaristaniya demokratîk tesewir bike.

Xusûseke din a girîng ew e, modernîteya demokratîk li her qad û zemanî weke qutbê dijber ê şebekeyên (tor û tevn) modernîteya kapîtalîst pêk tê û heye. Bi serketiye yan jî bi serneketiye, azad an jî kole, wekhev an jî cuda, nêzî wekheviyê yan jî dûrî wê, maneyeke ekolojîk û femînîst girtiye yan negirtiye, bi kurtî nêz an jî dûrî xisletên civaka exlaqî û demokratîk bûye nebûye, modernîteya demokratîk li her zeman û mekanî di hinavê modernîteya kapîtalîst de hebûna xwe heye.

Muxalifên rastgir an jî çepgir bi şoreşê yan jî bi antî-şoreşê pêşî desthilatdariyê (ango dewletê) dixin destê xwe, paşê bi armanca plan û bernameyên xwe yên li wan fikirîne di jiyanê de pêk bînin, bi 'muhendisiya civakî' radibin û bi plansaziyeke navendî, civaka bi hesreta wê ne, hewl didin biafirînin. Ez eşkere bibêjim, ez fikrên bi vî rengî ne tenê tewş û propagandîf dibînim, ez dibêjim ên xwediyê van fikran di ser re heftê sal jî derbas bibin, wê lîberalîzmê karibe bi hêsanî wan di nava xwe de bihelîne.

Xwezayên civakî jî weke xwezayên biyolojîk bi heman şêweyî xwedî şîfreyên genetîk in. Haya min ji biyolojîzmê heye. Ez dizanim, mirov xwezaya civakî bi vê bipîve Darwînîzm e, û weke materyalîzma herî çor ji muhendisiyên civakî re malzemeyê fikrî tedarik dike. Lê xusûsa ez behsa wê dikim ew e, xweza weke mejiyê asta wê herî bilind xwedî qabîliyeta hilbijartina azadiyê be jî dîsa guhertina xisletên bingehîn ên avabûn û hafiza civakên dîrokî, xusûsiyetên xwe yên xweser hene. Çawa ku bi şîfreyên genetîk ên heywan û nebatan tê lîstin, nebatên cuda û heywanên ehlî têne gihandin, em nikarin civakan jî bi vî awayî biguherînin. Hafiza û bîra xwezaya civakî, ev jixwe bê sedem weke civaka exlaqî û xwezayî diyar nekiriye. Rêya guhertina civakî bi bilindkirina asta civakî ya exlaqî û polîtîk dikare rewa bê qebûlkirin, naxwe wê bi her cure rêbazên totalîter û otorîter asta civaka exlaqî û polîtîk daxîne, lewma pirr girîng e ku mirov bibêje encam çi dibe bila bibe wê rewa neyê qebûlkirin.

Xisleta modernîteya demokratîk ew e, sîstemek e ku derî li rêya rewa ya guhertinê vekirî dihêle. Ji ber vî cewherê wê yê sîstematîk nirxê wê yê exlaqî û polîtîk bilind e. Tevî ku rêya rewa ya guhertinê gelekî girîng e, besît e jî. Her endamê civakê, li ku dibe bila bibe û kengî dibe bila bibe, dikare alîkariya vê guhertinê bike. Hem endamekî/e wê yê/ya bi bermahiyên civaka neolîtîk radibe heta hê li gorî rêûresma civaka klan tevdigere û hem jî endamekî/e wê yê/ya li Moskova yan jî li New Yorkê dimîne, xwediyê wê potansiyelê ne ku her kêlî alîkariya guhertinê bikin. Ji bo vê jî çawa ku vegotinên mezin û pîroz şert nînin, çalakiyên qehremaniyê jî şert nînin. Şertê bi tenê ew e ku weke rewşa bingehîn a hebûna xwezaya civakî divê qabîliyeta tevger û fikra exlaqî û polîtîk were

nîşandan. Ez bawer dikim ku li cem her ferdî di asta herî nizm de jî ev qabîliyet (fazîlet) heye, bi tenê divê mirov vê qabîliyetê fonksiyonel bike. Bêguman ez bi vê naxwazim diyar bikim ku vegotinên pîroz û mezin ên ji bo rohnîkirina rêya rewa ya guhertinê bûne malê hafiza mirovatiyê û tevahiya civaka dîrokî derketine holê, girîng nînin. Berevajî, ji ber ku yekdestdariyên maddî û îdeolojîk pêşî li rêya rewa ya guhertinê girtine, roleke mezin para van vegotinan dikeve. Dîsa bi heman awayî çalakiyên qehremaniyê li ser rêya diçe azadiyê nirxên gelekî pîroz in ku dest ji wan nabe. Ya girîng ew e, divê mirov zanibe hewldanên yekpare yên civaka dîrokî nebin, guhertin wê di modernîteya demokratîk de pêk neyên. Rola rêxistinî û kesayetên girîng nayê înkarkirin. Lê heta nebe malê çaviyên exlaqî û polîtîk ên civakê û di rêya rewa re derbas nebe, wê ev rol zêde maneyê îfade neke.

Heman xusûs ji bo şoreşan jî di cih de ne: Guhertin weke pêşketina civakî nebe malê çaviya exlaqî-polîtîk û rêya rewa, divê mirov wê weke xwebûneke xwezaya civakî nenirxîne. Civak nayên afirandin, pêk tên. Bêguman jiyan hemû ne wekhev in. Çawa ku jiyana bi azadî, wekhevî û demokratîk heye, jiyanên di nava koletiyê, wekhevnebûnê û dîktatoriyên mirov nikare xwe li wan rabigire hene. Belkî jî hê zêdetir in. Modernîteya demokratîk îfadeya wê avabûn û zêhniyetê ye ku di nava tevahiya van şert û mercan de bi hemû rêbazan dixwaze jiyanê azadtir, wekhevtir û demokratîktir bike. Di çarçoveya modernîteya demokratîk de bi qasî rakirina kevirekî ketî ser rê bi nirx e, weke rêya bi tenê ya rewa ya guhertinê ya mayî, pêkanîna şoreşê jî bi nirx e. Li beramberî vê, rizgariya îlahî jî sofîtiyeke kolewar a çarenûsperest jî di heman çarçoveyê de nayê fikirîn û etîk nayê dîtin. Li ber rohniya dersên em ê karibin ji têkoşîna demokrasî, azadî û wekheviyê ya çarsed salên dawî bigirin, di vê dema pêxîrtengiya avabûn û sîstemîk a hegemoniya kapîtalîzma fînansa global de ku em tê re derbas dibin, em dikarin modernîteya demokratîk bi hêz bikin û cîh bi cîh bi jinûveavakirinên qehîm wê nû bikin. Ji lewra li ser şaxên sereke û bingehîn ên modernîteya demokratîk ponijîn û xwe rohnîkirin, wê hewldanên me yên di vî warî de serketîtir bike.

## a- Şaxê Wê Civaka Exlaqî û Polîtîk (Civaka Demokratîk)

Çawa ku mirov dikare modernîteya kapîtalîst di çarçoveya sê hêman û şaxan de bifikire, nêzîkatiyeke bi heman rengî ji bo modernîteya demokratîk jî di cih de ye. Ji bo modernîteya kapîtalîst xisletên xweser û nedomdar ên bingehîn weke civaka hilberînê ya kapîtalîst, civaka îndustrî û civaka dewleta netewe tê fikirîn û di berdêla van de ji bo modernîteya demokratîk jî şax û hêmanên civaka exlaqî û polîtîk, civaka eko-îndustriyel û civaka konfederalîst a demokratîk derdikevin pêş. Ji bo herdu sîsteman jî di detayan de mirov dikare gelek şaxan ji wan bibe û hêmanan destnîşan bike. Lê ji bo bi xetên sereke bêne pênasekirin ev hersê şax dikarin maneyeke têrûtijî bidin. Me di beşên berê de şax û hêmanên modernîteya demokratîk bi awayekî berfireh analîz kiribûn. Modernîteya demokratîk jî ji aliyê pêşketina dîrokî, bi qiyaskirina şaristaniya klasîk û modernîteyê bi hêmanên sereke me hewl dabû wê berbiçav û diyar bikin. Divê mirov şaxên wê yên sereke ji hev bike û wan pênase bike. Ev yek wê nêzîkatiyên vegotin û pratîkê bi hêz bike.

Mirov dikare civaka exlaqî û polîtîk weke civaka demokratîk (komintiya demokratîk) jî pêşkêş bike. Dibe ku ev nêzîkatiya kategorîkirinê li beramberî civaka kapîtalîst bibûya bersiva herî di cih de. Lê ji ber ku di xwezaya civaka exlaqî û polîtîk de civaka demokratîk jî heye, weke têgîneke hê bingehîn me ji bikaranîna civaka exlaqî û polîtîk weke esas xwe dûr negirt. Mijar di beşên cûrbicûr de hatiye ziman. Ya ez ê li vir bikim wê bibe berhevkirin û tomarkirineke sereke. Berî ku ez wesfê civaka exlaqî û polîtîk diyar bikim, xusûsek der barê cewherê wê de heye ku ez çiqasî dubare bikim wê ewqasî jî di cih de be. Ew jî ew e, civaka exlaqî û polîtîk bi xwe bi awayekî cewherî ji aliyekî ve bi bedewî, bextewerî, rastî û qenciyê re, ji aliyê din ve jî bi azadî, wekhevî û demokrasiyê re têkiliya wê heye. Qencî û bextewerî jixwe exlaq bi xwe ye, cewherê exlaq in. Rastî bi heqîqetê re têkildar e. Mirov li derveyî heqîqetê li civaka exlaqî û polîtîk bigere tewş e. Ya exlaqî û polîtîk nebe, nikare heqîqetê bibîne. Bedewî jî têgîna armancê ya estetîkê ye. Ez bedewiya li derveyî civaka exlaqî û polîtîk bedewî nahesibînim. Bedewî exlaqî û polîtîk e! Sêberên din azadî,

wekhevî û demokrasî têkiliyên wan bi civaka exlaqî û polîtîk re têra xwe hatine analîzkirin. Ti civak bi qasî civaka exlaqî û polîtîk di wê hêzê de nîne ku azadî, wekhevî û demokrasiyê pêk bîne û zêde bike.

Yekemîn xusûsa wê were berhevkirin der barê kapasîteya guherîn û veguherînê ya civaka exlaqî û polîtîk de ye. Şaxê şaristaniya demokratîk civaka exlaqî û polîtîk heta weke hebûna sereke ji holê neyê rakirin, mirov dikare li kapasîteya wê ya guherîn û veguherînê weke civaka herî berfireh bifikire. Bêguman di ti civakê de exlaq û polîtîka bi tevahî ji holê nayê rakirin. Lê fonksiyonên wan dikarin gelekî bêne tengkirin. Mînak di civaka modernîteya kapîtalîst de li bin hukmê dewleta netewe, exlaq û polîtîka daxistine asta herî nizm, heta dor lê wer tengkirine ku anîne ber sînorê tinekirinê. Em dûvdirêj li ser sedem û encamên vê rawestiyabûn. Bi dortengkirina exlaq û polîtîkayê ma civak diguhere? Na. Berevajî tê tengkirin, cihêwazbûn û guherîna wê tê sekinandin, heta homojenî li ser tê ferzkirin û di bin statuyeke huqûqî ya hişk de bêhn lê tê çikandin. Kapasîteya guhertinê bidin aliyekî, ji bo afirandina çandeke tek tîp û gihandina welatiyên tek tîp di bin navê homojenkirinê de civakê dadixin dualîteya em-yê din û bi vî awayî dorê lê teng dikin. Bi qasî ku bi çavan xuya dike, mîna civaka modern guhertineke bê sînor pêk tîne dîmenekî gelekî rengîn pêşkêş dike. Ev dîmen bi temamî medyatîk e, û propaganda ye. Rastiya di binî de tek rengek e; yan nêzî gewr e, yan jî reş e.

Li beramberî vê, civaka demokratîk a rewşa moderníteya hemdem a civaka exlaqî û polîtîk e, bi rastî ew civak e ku cudatî têde bi awayekî fireh hene. Di vê civakê de mirov bi çandeke tek tîp û welatiyê nayên mehkûmkirin, her koma civakî li ser bingehê cudatiyên li dora nasname û çanda xwe pêkhatî dikarin bi hev re bijîn. Ji cudabûna nasnameyî heta bi cudabûnên siyasî her kom dikare potansiyela xwe derxe holê û veguherîne jiyana çalak û aktîf. Derdê ti komê nîne ku were homojen kirin. Tek rengî weke krêtî, zivêrtî û feqîrtiyê tê dîtin. Pirr rengînî jî di nava xwe de dewlemendî, xweşbînî û bedewiyê dihewîne. Di van şert û mercan de azadî û wekhevî zêdetir pêk tê. Lê azadî û wekheviya xwe disipêre cudahiyan, bi nirx e. Jixwe azadî û wekheviya bi destê dewleta netewe hatiye pêkanîn,

çawa ku bi tevahiya ezmûnên li dinyayê jî piştrast bûye, bi tenê ji bo yekdestdariyan e. Wekhevîtî û azadiyên rastî bi yekdestdariyên sermaye û desthilatdariyê nayên dayîn. Bi tenê bi şêwazê siyaseta demokratîk a civaka demokratîk mirov dikare bi dest bixe û bi xweparastinê bergiriya wê bike.

Belkî mirov dikare vê pirsê bike: Gelo sîstem evqas cudatiyan çawa dikare hilgire? Bersiva mirov bide vê pirsê ev e: Yekîtiya li ser bingehê civaka exlaqî û polîtîk. Nirxa bi tenê ya her ferd û kom wê jê paşve gavê neavêjin, israra di mana civaka exlaqî û polîtîk de ye. Ji bo cudatiyan, ji bo wekhevî û azadiyan şertê bi tenê û têrê bike, civaka exlaqî û polîtîk e. Civaka demokratîk weke rewşa modern a vê civaka dîrokî her roja diçe xwe zêdetir ispat dike.

Îdeolojiya navendî ya sîstema fermî ya modernîzmê lîberalîzm, ji bo vê rastiyê berevajî bike têra xwe argumanan bi kart tîne. Hema hema xwe bi demokrasiyê re wekhev dibîne. Bi temamî aloziyeke têgînan tê afirandin. Lîberalîzm bi xwe tevî ku îdeolojî ye, xwe bi sîstema siyasî demokrasiyê re wekhev nîşan dide, û ev mînakeke tîpîk e ku vê rastiyê îfade dike. Lîberalîzm bi xwe texrîbata bêgem a ferd li hemberî civakê îfade dike û serweriya yekdestdariyan li ser civakê, vê yekê piştrast dike. Ji ber avahiya xwe ya ne demokratîk û her cure ferdperestiyê, ji malbatê heta bi dewletê xwedî meyla dîktatoriyê ye. Ferdiyeta demokratîk cuda ye. Weke biryar û dengê hevpar ê civakê ferd li pêş digire. Ferd kengî vî deng û biryardariyê esas bigire li cem civakê nirx û hurmeta wî-wê hebe. Ji lewra ferdiyetperestiya lîberal a bi awayekî yekdestdariyên bê sînor û bê hejmar e, antî-demokratîk e. Ti lafazanî û aloziya têgînan nikare vê xisleta lîberal an jî neolîberal biguherîne. Lîberalîzm weke gotin maneya wê azadbûn e, lê wê piştrast kiriye ku di pratîkê de ev jî ji pêşketina bêsînor a yekdestdariyan wêdetir nebiriye. Azadiya bi qasî ku xuya bike tê pêşkêşkirin, di pratîkê de bi awayekî di rejîmên firewnan de jî nehatiye dîtin qeyd û bendên îdeolojîk û maddî lê xistine. Di civakekê de azadiya rastî kengî bi hêman û şaxên civakî were destekkirin hingê dikare manedar bibe. Eger azadiyên ferdî ji aliyê civakê ve neyên destekkirin,

hingî yekdestdarî û însafa xwe, ew jî rewşeke bi ruhê azadiyê re li hev nake îfade dike. Jixwe pirsgirêkeke wekheviyê ya lîberalîzmê nîne.

Civaka exlaqî di şert û mercên modernîteya kapîtalîst de di dîroka xwe de di rewşa xwe ya herî hatiye tengkirin, bêkêrkirin û gincirîkirî de ye. Dîsa bi qasî ku di ti dema dîrokê de nehatiye dîtin li şûna pîvanên exlaqî şîfreyên huqûqê têde hatine danîn. Çîna bûrjûwaziyê exlaq bê qîmet dike û di bin navê huqûqê de serweriya xwe ya çînî kite bi kite dike şîfre û li ser civakê ferz dike. Li şûna civaka exlaqî civaka huqûqî tê bicihkirin. Em li vir bi guhertineke girîng re rûbirû ne. Di dîrokê de mirov li hewldanên huqûqîkirinê rast tê. Lê di ti hewldanan de jî bi qasî modernîteya bûrjûwayê di detayan de nehatiye fetisandin. Ya rastî, ya di bin navê huqûqê de tê pêkanîn yekdestdariya çînî ye, afirandina yekdestdariya huqûqî ye. Bi huqûqê bi rêvebirina xwezayeke heta dawiyê aloz a mîna civakê mumkîn nîne. Bêguman bi şertê dadî cihê huqûqê di civakê de heye; di vê çarçoveyê de dest jê nabe. Lê belê ya ku bi navê huqûqa pozîtîf dewlet li ser civakê ferz dike ne huqûqa adil e, ew yekdestdariya netewe û çîna serdest e ku li huqûqê hatiye barkirin û rêzikdariya dewleta netewe ye. Xirakirina exlaq û xirakirina civakê yek tişt in. Bûyerên diqewimin vê rastiyê piştrast dikin. Civakên bala her kesî li ser wan ên Rûsya û DYEyê îro saetekê jî bê statuko ango bê rêzikên huqûqê yên fermî nikarin dewam bikin. Car caran em di demên pêxîrtengiyê de lê rast tên, civak bê huqûqa fermî vediguhere qada hovîtiyê.

Ya rastî, ev rewş rastiyekê îfade dike. Wexta me dewleta netewe pênase kiribû me gotibû rewşeke şer e, heta bi çaviyan li ser civakê hatiye ferzkirin. Di demên pêxîrtengiyê, krîzê de ev rastî tê ispatkirin. Potansiyela herî mezin a krîzê li cem civakên xwedî huqûqa fermî heye. Sedem jî ew e, ji prensîba exlaqî mehrûm e. Eger hawîrdor di asta felaketê de ketibe krîzê, sedema vê mehrûmbûna ji hêmana exlaqî ye, û li beramberî vê huqûqa hawîrdorê hê pêşde nehatiye birin. Jixwe hawîrdor mijareke welê nîne ku bi huqûqê bergirî û parastina wê were kirin, ji ber ku bê serûbinî ye. Bandora huqûqî gelekî kêm û bi sînor e. Ji lewra di bingehê pirsgirêka ekolojîk de lawazbûna prensîba civaka exlaqî heye. Civakeke nikaribe cihê

prensîpa exlaqî heq dike bidiyê, ne dikare di binyeya xwe de, ne jî li hawîrdora xwe dewam bike. Rastiya aktuel û rojane vê gelek baş rave dike.

Li heman xusûsan mirov dikare ji bo prensîba civaka polîtîk jî bifikire. Ji ber ku li şûna polîtîkayê îdareya burokratîk a dêwane ya dewleta netewe hatiye danîn, fonksiyona demokratîk a civakan nemaye. Îdarekariya dewleta netewe ya ketiye heta bi çaviyên herî hûr ên civakê, rewşa tevizî ya civakê îfade dike. Civakeke tevahî suxre û karên xwe yên hevpar ji burokrasiyê re hiştibe, bi rastî hem ji aliyê zêhnî hem jî ji aliyê îradeyî ve têra xwe tevizî ye. Ewrûpaya li vê hayilbûyî, bê sedem xwe bi prensîba polîtîkaya demokratîk ve girê nedaye. Bi sînor be jî tevî burokrasiyê ji polîtîkaya civakî re jî meydan hiştî ye, û pirr hindik pêşketina xwe deyndarê vê yekê ye.

Li gorî dewleta netewe ya modernîteyê hebûna civaka polîtîk ji yekîtî û yekparetiya wê re tehlûke ye. Lê ya rastî, burokratîzm û îdarekariya dewleta netewe, hêmana polîtîk a ku hebûna civakê ye bi tenê teng nakin, bi awayekî pratîkî dikin ku bi kêr neyê, û bi tenê weke şûrê Demokles li ser serê civakê nasekinin, saet bi saet wê hûrûhûrî dikin. Pirsgirêka herî bingehîn a felsefe polîtîk a serdema me ev e, û di pratîkê de jî weke faşîzmê li pêşiya jiyanê astengiya herî mezin e. Min weha gotibû: Hîtler şexsî têkçû, lê sîstema wî bi ser ket. Dewletdariya netewe di çarçoveya jiholêrakirina civaka polîtîk de (Herçiqas Hîtler yekemîn kesê xas ev yek pêk neanîbe jî ew kes e, ev îlan kir û xwedî lê derket) bi faşîzma Hîtler re wekhev in.

Civakeke prensîba xwe ya polîtîk nebe, neyê bikaranîn an jî ji holê hatibe rakirin, mirî ye; rewşa wê ya herî baş jî civaka mêtingeh îfade dike. Ji ber vê yekê, fonksiyona civaka demokratîk daye prensîba polîtîk bi awayekî heyatî girîng e. Herweha weke sîstem ji bo serdestiya wê ispateke bingehîn e.

Dîroka şaristaniyê bi awayekî dîroka tengkirina civaka polîtîk e, û bi bêkêrkirina wê re bênirxkirina wê ye. Çînîkirina civakê bi têkoşîneke dijwar a polîtîk meşiyaye û di encamê de bi tepisandina wê re dewlet bi ser ketiye. Divê mirov di vê xusûsê de bi baldarî tevbigere û hay ji xwe hebe. Marksîst gelekî bi pirsgirêka têkoşîna çînî re mijûl bûn, lê wan jî

xwezaya çînîbûnê rast diyar nekir. Xwe negirtine û mîna ku çînîbûn fazîletek be, mîna pêşdebireke şaristaniyê be nirxandine. Mîna qonaxekê dîtine, mîna pireke têkiliyê dîtine û di çarçoveya materyalîzma dîrokî de bawer kirine ku divê mirovatî tê re derbas bibe. Min di analîza xwe ya şaristaniyê de çînîbûn weke tengkirin û bêkêrkirina civaka exlaqî û polîtîk nirxand; min bi girîngî diyarkir ku çînîbûn çiqasî pêşde diçe civak zêdetir dikeve bin desthilatdarî û hegemoniya dewletê. Di vê çarçoveyê de mirov dikare bibêje, dîrok têkoşîneke dijwar a çînî ye. Lê pêkanîna çînîbûnê bi xwe bihêlin pêşdebirin û pêşketinek be, berevajî paşketin û paşveçûneke civakî ye. Ji aliyê exlaqî ve ne baş, belê pêşketineke xirab e. Îdeaya dibêje ji bo pêşketinê çînîbûn rawestgehek e ku bivênevê wê pêk bê, û tew weke îfadeyeke Marksîstan destnîşankirina vê îdeayê, di têkoşîna azadiyê de şaşiyeke ciddî ye ku hatiye kirin.

Wexta ku em civaka polîtîk bi civakên çînî re didin ber hev, pênaseya wê ya herî rast ew e, ku wê li dijî çînîbûnê timî li ber xwe daye. Civaka herî hindik xwe çînî kiriye civaka herî baş e. Serketina têkoşîna polîtîk dikare xwe bi çînînekirinê diyar bike. Têkoşîneke serketî ya polîtîk bi tenê bi çînînekirina civakê, ango civakê nexe bin zora yekalî ya amûrên desthilatdarî û dewletê piştrast bike. Li civakên heta bi qirikê ketine nava zora desthilatdarî û dewletê, mirov nikare behsa têkoşîneke serketî ya ciddî bike. Eger mirov behs bike, ev xwe xapandin e. Ji bo civaka polîtîk a herî îdeal ango ya herî di cih de ew e, xwe yan bi tevahî naxe bin zora desthilatdarî û dewletê (di vê çarçoveyê de derve an jî hundir, millî an jî ne millî gelekî girîng nîne) yan jî di encama lihevkirina bi têkoşîneke dijwar diyarkirî de bi riza aliyan desthilatdarî û dewlet tê naskirin.

Modernîteya kapîtalîst qonaxa herî dawî ya şaristaniyê ye ku têde civaka polîtîk herî zêde hatiye tengkirin û bêkêrkirin. Divê ev xusûs baş were fêhmkirin. Têkoşîna polîtîk, heta demokratîk li gorî lîberalîzmê ya hegemoniyaya îdeolojîk e, di dema wê de têra xwe pêşketî ne. Dema ku mirov di ser re dinêre ev îdeaya rast xuya dike, bi xwe tersê xwe îfade dike. Ferdiyetperestî û yekdestdarî di dîrokê de bi awayekî herî xurt hatiye pêşdebirin û lewma ev dem ji bo civaka exlaqî û polîtîk dema bê fonksiyon

û bêkêr e. Weke desthilatdariya herî mezin dewleta netewe, civaka herî zêde ne polîtîk e. Dewleta netewe civakeke bi vî rengî derdixîne holê. Heta li naverastê tiştekî bi navê civakê namîne. Civak bi awayekî di nava dewleta netewe û globalbûnê de hatiye helandin. Michel Foucault di vê nuqteyê de parastina civakê weke bingehê azadiyê dibîne. Jidestdayîna civakê (ji aliyê ferdiyeperestiya zêde û yekdestdariyan, modernîte bi xwe) ne bi tenê weke jidestdayîna azadiyê, weke ji destdayîna mirovatiyê jî dinirxîne.

Di vê çarçoveyê de maneya modernîteya demokratîk weha ye: Parastina civakê di bidestxistina azadiyê de rêya bi tenê ya xelasiyê ye. Civaka xwe bi siyaseta demokratîk diparêze, çaviyên xwe yên polîtîk fonksiyonel û kêrhatî dike û bi vî awayî xwe vediguherîne civaka demokratîk a modern. Civaka demokratîk a modern jî li ser tevahiya karên civakî hem difikire û dibêje, hem jî weke civaka xwe digihîne biryarê û dikeve nava çalakiyê li ser bingehê cudatî û pirrçandîtiyê wekhevîtiyê pêk tîne û bi vî awayî çêtirbûna xwe ispat dike. Ji lewra modernîteya demokratîk bi tenê li ser bingehekî rast têkoşîna çînî nade; di heman demê de (nakeve şaşiya trajîk û dîrokî ya sosyalîzma pêkhatî) desthilatdarî û dewleteke nû ava nake û pê civaka xwe nafetisîne, nakeve vê xefik û dafika dîrokî. Hay ji xwe heye ku çiqasî çînayetî pêş bikeve ewqasî jî di têkoşîna çînayetiyê de têk diçe. Divê vê hayjixwehebûnê karibe weke yek ji xisletên xwe yên bingehîn diyar bike.

Çawa ku wê were fêhmkirin, bi modernîteya demokratîk tîpeke nû ya civakê ya ku çi kapîtalîzm û çi jî sosyalîzm e, nayê afirandin. Ev têgîn ji wesifkirina civakê dûr in, ji ber ku ev têgîn bi armanca propagandayê ne. Bêguman civakek tê pêkanîn. Ev civakeke demokratîk modern e; bi roleke mezin a prensîba civaka exlaqî û polîtîk radibe, di vê civakê de çînayetî zêde derfet û îmkanê pêşketinê nabîne, ango amûrên desthilatdarî û dewletê yan zora xwe nikarin ferz bikin yan jî derfet dibînin bi lihevkirineke dualî hevdu nas dikin, di nava cudatiyan de yekîtî, wekhevî û azadî hem weke xisleteke ferdîtî (ne ferdiyetperestî) û hem jî weke xisleteke civakbûnê pêk tê. Hê bêtir wekhevî, azadî û demokrasî weke

pêdiviya xwezaya vê civakê, encama veguherîn û pêşketinê ye ku saziya siyaseta demokratîk rê li ber vedike.

## b- Şaxê Wê Civaka Ekolojîk Îndustriyel

Bingehê hêmana ekonomîk û îndustriyel a moderníteya demokratîk ekolojîk e. Berê pêşî ya girîng ew e ku mirov ekonomiyê rast pênase bike. Di vê mijarê de ya divê mirov pêşî lê serwext bibe ew e, polîtîka ekonomiyê amûrekî mezin ê berevajîkirin û serkorkirinê ye. Nexasim têgîna 'ekonomiya kapîtalîst' bi temamî gotineke tewş û lîstikeke propagandayê ye. Çawa ku min di cildên berê de analîz kiribû, kapîtalîzm bi xwe ekonomî nîne, dijminê sondxwarî yê ekonomiyê ye. Rêxistineke şebekewarî ya sîstematîk e (bi hegemoniya çanda maddî û îdeolojîk), ji bo kara yekdestdariyê rûyê erdê kiriye ku jiyan lê nebe (ji bilî çend Firewn û Nemrûdan) û bi xwe li ser talana nirxên civakî (ne bi tenê nirxên zêde) ava bûye. Cudahiya vê şebekeyê ji çil heramî û korsanan ew e, xwe sipartiye rewakirineke îdeolojîk, kirasekî qanûnî û sipartekên desthilatdariyê. Bi van amûran hewl dide rû û cewherê xwe yê rastî veşêre. Di serî de polîtîka ekonomîk, bi qaşo hin disiplînên zanistî xwe weke heqîqetê pêşkêş dike. Eger wî zirxê mezin ê ji îdeolojî û zorê li xwe nepêçe, rojekê jî nikare hebûna xwe dewam bike. Bi vê avabûna xwe, çalakiya ekonomîk a maneya hawîrdorê ya hebûna bingehîn a civakê (şêweyê xebatê yê bingehîn ê civaka exlaqî û polîtîk) digire nava xwe, dixe bin zext û mêtinkariyê û bi vî awayî hem pêşketina wê astang dike, hem jî vediguherîne çavkaniya bexteweriya mistek hindikayî ye.

Di pênaseya ekonomiyê ya Fernand Braudel de pêdiviyên bingehîn ên mirov qatê zemîn, qada ekonomiyê ya xebatên metayê yên li dora bazarê yên îstîsmara yekdestdarî û buhayê nagire nava xwe qatê yekemîn, li ser van herdu qatan jî qatê jor ê bi tevna yekdestdarî û îstîsmara buhayan pêkhatî jî weke qada kapîtalîzma rastî tên diyarkirin û weke dijberê bazarê tên destnîşankirin (I. Wallerstein vê tespîtê gelekî girîng dibîne), ev ravekirineke bi nirx e ku mirov dikare jê hîn bibe. Lîberalîzm bi israr kapîtalîzmê weke ekonomiya piyasa û bazarê dihesibîne, lê li ber rohniya

vê pênaseyê em fêhm dikin ku ev israr bi tevahî tewş û pûç e. Têkiliya kapîtalîzmê bi bazarê re sîstemeke lîstikê ya hov e, xwe ji lîstina her cure şêweyên lîstikê yên bi dînîtî paşve nagire; bi lîstina bi buhayan kara yekdestdariyê bi dest dixe, ji bo vê jî pêdiviyê pê his bike her cure pêxîrtengî û şerî derdixe, ekonomiyê ji xebateke bersivê dide pêdiviyên bingehîn derdixe û ber bi qadên herî zêde karê tînin dibe (qanûna kara herî zêde). Em lîstik dibêjin, ango çalakiyeke welê ye, bi qasî ku civaka mirov ji sedemên hebûna wê ya bingehîn qut bike li dijî jiyanê ye; weke şêwazê êrişê lîstik e.

Bi giştî yekdestdariyên şaristaniyê bi taybetî jî yekdestdariyên kapîtalîst (amûrên cotkarî, bazirganî, fînans, desthilatdarî û dewleta netewe) tevahiya dîrokê faktora bingehîn a tevahiya berevajîkirinên ekonomîk, pêxîrtengî, pirsgirêk, birçîtî, feqîrtî û felaketên hawîrdorê ne. Li ser van faktorên bingehîn herweha her cure çînîbûnên civakî û siyasî, desthilatdarî, bajarên ji sînorên xwe bihurî yên cihê tevahî nexweşiyan, berevajîkirinên îdeolojîk yên her cure dogmayên dînî, metafizîk û zanistî, krêtî di warê berevajîkirina huner û xirabî di warê xizaniya exlaqî û rizînê de mezin bûn. Çarsed salên dawî yên modernîteya kapîtalîst der barê van tespîtan de bêhejmar mînakan pêşkêş dike.

Di modernîteya demokratîk de ekonomî digihîje maneya xwe ya rastî. Avahiyeke sîstematîk a manedar îfade dike; hem li qatê zemîn nirxên bikaranînê weke pêdiviyên bingehîn ên tedarikkirina pêdiviyên herî girîng, hem jî weke ekonomiyeke rastî ya piyase û bazarê nirxê pevguhertinê (rêjeya pevguhertinê ya metayan) derdixe holê. Ekonomî dibe qadek ku hesabên karê li ser nayên kirin. Bêyî ku rê li ber çînîbûnê were vekirin û zirar li ekolojiyê bibe, zelal dibe ku wê pêdiviyên bingehîn çawa û bi çi rêbazê bi awayekî herî berdar werin tedarikkirin; ev jî ekonomiyê weke qadeke çalakiya civakî digihîne maneya wê ya rastî. Weke şêweyê bingehîn ê xebatê yê ku civaka exlaqî û polîtîk li ser hem bi pêş bikeve û hem jî pêşde bibe, manedar dibe.

Polîtîka ekonomiyê ya Marksîst jî di navê de, têgihiştina modernîteyê ya ekonomiyê, ji nêrtina bi çavê çînî (awira bûrjûwaziyê ya hegemonîk) xilas

nebûne. Nirx bi duberiya karker û patron ve girêdane, û ketine rewşekê ku bi tevahî ser zemînê civaka dîrokî girtine û girîngî pê nedane. Nirx berhemekî civaka dîrokî ye. Patron û karkerê tawîzkar bihêlin bibin pêkhênerên vî berhemî, bi awayekî bingehîn di rewşa desteserkarê wê de ne. Piştrastkirina vê yekê hêsan e. Keda jina bêheqdest nebe bi tenê patronek û karkerekî tawizkar nikare zikê xwe têr bike; jiyana xwe rojane bi ser hev de bîne. Ev mînak bi xwe jî rûyê ne ekonomîk ê kapîtalîzmê zelal nîşan dide. Jixwe me bi awayekî berfireh nîşan da heke civaka dîrokî nebe, bi giştî şaristanî û bi taybetî jî modernîteya fermî wê nikaribin hebin.

Di hêmana ekonomîk a modernîteya demokratîk de nirxa pevguhertin û bikaranînê di nava yekparebûna ekolojîkî û îndustriyel de esas e. Sînorê îndustriyê xwe disipêre sînorê pêdiviyên bingehîn û ekolojiyê. Nikare ji van herdu sînoran bibihure. Di vê rewşê de îndustriya derkeve holê eko-îndustrî ye. Îndustriya ne ekolojîk, îndustriya ne ekonomîk e. Îndustriya têkiliya xwe bi ekolojiyê re nemabe, ti cudahiya wê ji cinawirekî makîneyî yê dewamî hawîrdorê dixwe nîne. Dîsa îndustriyeke têkiliya xwe bi pêdiviyên bingehîn ên ekonomiyê re qutbûyî ji bilî armanca karê ti nirxekî xwe nîne. Eko-îndustrî bi van rastiyan prensîba bingehîn e. Prensîba sereke ye ku divê tevahiya xebatên ekonomîk pêve girêdayî bin. Di vê rewşê de çalakiya ekonomîk dikare maneya xwe ya rastî bibîne û bi vî awayî wê zemînê bêkariyê, hilberîna kêm û zêde, herêm û welatên hindik û pirr pêşketî, dijberiya gund û bajar, pêxîrtengiyên ekonomîk, şerên civakî û newala navbera çînan, ji holê rabe.

Bêkarî bi temamî encameke çeloxwarî  avabûna ekonomîk a bi armanca karê ye. Di hêmana ekonomîk a modernîteya demokratîk de cih ji vê çeloxwarîkirinê re nîne. Bêkarî rewşeke civakî ye ku herî zêde li derveyî mirovatiyê ye.

Hilberîna kêm û zêde jî dîsa encameke çeloxwarî avabûna ekonomîk a bi armanca karê ye. Evqas pêdiviyên bingehîn hene û evqas îndustrî pêşketî ye, çi hilberîna zêde çi hilberîna kêm maneyek xwe nîne. Ez divê bi girîngî bibêjim, ji bilî rewşên avhewayê û xwezayê, hilberîna kêm zêde ya

bi destê mirovî herî kêm bi qasî bêkariyê rewşeke li derveyî mirovatiyê îfade dike.

Meseleya herêm û welatên kêm an jî zêde pêşketî jî îfadeyeke din a rewşa li derveyî mirovatiyê ye ku dîsa vê ekonomiya bi armanca karê pêk aniye. Bi vî awayî tovên her cure pevçûnê di navbera welat û herêman de datîne, dibe sedema şer û pêxîrtengiyên xwecihî, neteweyî û navneteweyî yên ne serî û ne dawî li wan tê. Eşkere ye ku ekonomiyeke di xizmeta civaka mirov de ti carî rê li rewşên bi vî rengî veneke û divê venake.

Tevahiya civaka dîrokî têkiliyên gund û bajar li ser dabeşkirineke kar û ahengekê hatibû avakirin, lê paşê têkiliyên di navbera gund û bajar de veguherîn nakokiyan û ev balansa di navbera du civakan de li zirara civaka gund û cotkariyê xira bû. Di bingehê vê bûyerê de meşandina ekonomiyê bi armanca karê heye. Têkiliyên gund û bajêr, yên cotkarî, zenaet û îndustriyê yên xwe sipartine hevxwedîkirinê paşê vediguherin têkiliyên hevdu tesfiyekirinê, ev jî yeke din e, ji encamên xeternak ên qanûna kara herî zêde. Civaka gund û cotkariyê hema hema anîne ber tesfiyeyê, bajar û îndustrî jî ketine pêvajoyeke mezinbûnê ya kansêrwarî. Ne bi tenê ekonomî, civaka dîrokî bi xwe jî bi tesfiyeyê re rûbirû hatiye hiştin.

Ekonomiya pişta xwe daye qanûna kara herî zêde bi çeloxwarîkirinên bi vî rengî çînîbûn û şerê polîtîk bi xwe re aniye; rê li her cure şerê xwecihî, neteweyî û navneteweyî vekiriye. Di bingehê van neyêniyan hemûyan de talan û mêtingehkirina aboriyê ji aliyê ferdiyetperestiya kapîtalîst û yekdestdariyan heye, û eşkere ye ku ew jî dijberên ekonomiyê ne. Rewşa em îşaret pê dikin, di vegotinên şaristaniyê de mîna ku çarenûsa mirovatiyê bin têne pêşkêşkirin.

Modernîteya demokratîk bi tenê ekonomiyê ji van meylên dijber rizgar nake. Di heman demê de xwedî sîstematîkekê ye ku bi şêweyên pêşketî yên şert û mercên jiyanê bêkarî û xizaniyê nas nake, cih nade kêm an jî zêde hilberînê, cudatiya pêşketin an jî paşvemayî yên herêm an jî welatan dadixe asta herî nizm, têkiliyên gund û bajaran digihîne asta têkiliyên hevdu xwedî dikin. Di nava sîstematîka xwe de rê nade cudatiyên civakî û ekonomîk bigihîjin asta mêtinkariya çînî, nahêle pêşketinên çînî kûr bibin,

nakokiyên civakî û mêtinkariya ekonomîk ên dibin sedema şer û pêxîrtengiyan şax berdin. Sîstema modernîteya demokratîk destûrê nade îndustriyalîzm û bajarbûn gund û cotkariyê daqurtînin, herweha nahêle bajarekî lê jiyan bibe û xebatên wê yên îndustriyê jî ji holê rabin. Mekanîzmaya vê di nava yekparebûna hêmanên bingehîn ên modernîteya demokratîk de heye. Bi tevahî kom di xebatên xwe yên ekonomîk de bi hêmanên exlaqî û polîtîk ve girêdayî, hêmanên ekolojîk û îndustriyel bi awayekî yekpare dibînin. Ev bi awayekî ji hev qut nebin bi hev ve girêdayî ne. Ji pencên parçe dikin ên ferdiyetperestî û yekdestdariyê re ti tişt nayê hiştin. Eko-ekonomî û eko-îndustrî, di tevahiya xebatên civakî de li ber çav têne girtin. Li ser vî bingehî, bi tenê ji nû ve tamîrkirina hawîrdorê û zindîkirina cotkariyê, projeyên gund bikin xwedî hawîrdoreke têkûz a jiyanek lê bibe jî bi serê xwe xwedî wê potansiyelê ne ku dikarin bêkarî û xizaniyê ji holê rakin. Bêkarî bi xwezaya mirov re li hev nake. Kurê mirovî [benî adem], keça mirovî yên xwedî mejiyekî evqasî pêşketî nabe ku bêkar bimînin, eger bibe bi darê zorê dibe, jixwe welê jî dibe. Di vê xwezayê de moriyek jî bêkar nayê dîtin, çawa dibe ku heman xweza hebûna xwe ya herî pêşketî bêkar û neçar bihêle? Teknolojî berhemeke harîqa ya mirov e. Di serdema teknolojiyê û îndustiriya xwe sipartî wê de xizanî çawa dibe çarenûs?

Eşkere ye ku ya hewce dike, veguherîna avabûna sîstemê ye. Hem rastiya dîrokî hem jî rastiya rojane ya modernîteya demokratîk xwedî wê xisletê ne ku mirov li hemberî pratîk û keda wî xerîb nake. Şoreşa îndustriyê weke yek ji qonaxên mezin ên vê pratîkê ji bo civakê û ekonomiya wê serketinek e. Pirsgirêk ew e, modernîteya kapîtalîst ev serketina bê hemta ji destpêkê ve xist xizmeta qanûna xwe ya kara herî zêde. Ji bo vê jî yekdestdarî (bazirganî, fînans, desthilatdarî û dewleta netewe) û ferdiyetperestiyeke bê hemta ava kir û civaka dîrokî anî ber tesfiyekirinê. Modernîteya demokratîk bi awayekî di van têgihiştin û kirinên çeloxwarî yên vê modernîteyê de navê şoreşeke avabûn û sîstematîk e. Eko-îndustrî yek ji hêmanên bingehîn ên vê şoreşê ye. Ev sedem bi tena serê xwe jî heyatîbûna modernîteya demokratîk ispat dike.

Yekeya ekonomîk a klasîk a modernîteya fermî weke malbat û şîrketên bi profesyonelî avabûyî bêne pêşkêşkirin jî ew yekîne ne ku armanca wan kar e. Yek ji wan jî ji bilî karê xwedî fikareke bingehîn nîne. Tevî ku li nava dinyayê mîna extepotan qadeke ekonomîk a destê xwe neavêtibinê nehiştibin jî pirsgirêka bi tenê pê re têkildar dibin ew e, wê hê zêdetir karê çawa bi dest bixin. Li aliyekî hejmara bêkaran bi awayekî sînornenas mezin dibe, feqîrî û cudahiya di navbera hatina aborî de mîna guloka berfê her zêde dibe, bi sed mîlyonan mirov ji birçîna mîna qirşên havînê dişkên, li aliyê din jî çerxa potansiyela hilberînê ya gelekî mezin nayê gerandin, rê li pêxîrtengiyên hilberîna kêm an jî zêde tê vekirin, cotkariyê dibin îflasê û civaka gund tesfiye dikin; ev bi tevahî encamên xebatên yekîneyên ekonomîk in (ya rastî yên li derveyî ekonomiyê) ku li ser bingehê qanûna kara herî zêde weke şîrketan têne avakirin. Yekeya bingehîn a ekonomîk a modernîteya demokratîk, bêguman wê weke avahî û zêhniyet li dijî van yekîneyên şîrket ên bi armanca karê be.

Ekonomî tevahiya dîrokê timî weke mijareke nazik û hasas fikara sereke ya civaka exlaqî û polîtîk bû. Ji ber ku li serê meseleyê diyardeyên mîna tinebûn, birçîtî û mirinê yên gefan li civakê dixwin hene. Danehev û komkirin jî weke karê ti carî ji aliyê civakan ve rewa nehatiye hesibandin, timî weke çavkaniya xirabî û diziyan hatiye dîtin û wexta keys lê anîne dest danîne ser û kirine malê civakê. Eşkere ye ku ekonomiyeke bi vê armancê ve girêdayî nabe were avakirin. Jixwe çawa ku hat ravekirin, nakokî bi xwe ew e, mirov weke ku ekonomî be behsa xebatekê bike ku bi xwe dijberê ekonomiyê ye.

Rêya yekane û bi tenê ya rizgarbûna ji vê nakokiyê ekonomiya eko-koman e. Li gorî pêdiviya şert û mercan bi hezaran eko-civak dikarin weke yekeyeke ekonomîk xwe bi rêxistin bikin. Ji ber ku malbatan zevî parçe parçe kirine erdan xisleta xwe ya yekebûnê ji dest daye, lê eger prensîba eko-îndustrî jî li ber çavan were girtin ji nû ve rêxistinkirina erdan, weke yeke, pirsgirêkek e ku ji zû ve weke mijareke lezgîn ketiye rojevê. Di cotkariyê de pêkanîna eko-koman yek ji prensîbên herî bingehîn ên ekonomiya modernîteya demokratîk e. Bi vê ve girêdayî têgihiştinên

gundikên ji serftî û koletiyê mayî êdî di cih de nînin. Yekîneyên cotkariyê yên bi pîvana ekolojiyê bêne çêkirin wê eko-koman pêk bînin û ev ê bibin bingehê modernîteya gundan. Ango gund an jî gundên modern weke eko-komekê, weke yekeyên ekonomîk ên bi pîvana ekolojîk dikarin ji nû ve hebûna xwe bi dest bixin.

Li bajaran jî mirov dikare eko-komên bi heman rengî pêk bîne. Ekonomî di çarçoveya plansaziyeke bajar de dikare weke parçeyekî yekpareya giştî were sererastkirin. Çawa ku divê burokrasiya bajêr dadiqurtîne nebe, divê ekonomiya bajêr dadiqurtîne jî nebe. Xebatên ekonomîk ên li gorî xwezaya her bajarî dikarin weke yekeyên xwedî mezinbûneke optîmal bêne birêxistinkirin; divê armanca wan a karê nebe û hedefa wan a nehiştina bêkarî û xizaniya xelkê bajêr hebe. Şênî dikarin li gorî qabîliyet û avabûnên xwe li van yekeyan bêne belavkirin.

Belkî jî hin kes dikarin wer bifikirin ku em behsa ekonomiyeke bi plana sosyalîst dikin. Lê modela em behsa wê dikin cuda ye. Ev model çawa ku eleqeya xwe bi wê ekonomiyê re nîne ku ji navendekê tê plankirin û fermankirin, ti eleqeya xwe bi ekonomiya hov, bi armanca karê û şîrketên qaşo ekonomiyê yên li derveyî ekonomiyê re jî nîne. Ev model xwedî avahiyeke welê ye, bi biryar û çalakiya civaka xwecihî ya exlaqî û polîtîk pêk tê. Bêguman koordînasyoneke şert û mercên neteweyî, herêmî , heta navneteweyî li ber çavan digire, her tim hewce dike. Lê ev, însiyatîfa biryar û çalakiya civaka xwecihî ji holê ranake. Em careke din dubare bikin, ekonomî pirsgirêkeke teknîkî ya binesaziyê nîne; weke avahiya bingehîn a hebûna civakan, xebatek e ku bi tevahiya fikir, guftûgo, biryar, hewldan û çalakiya rêxistinî ya civakê pêk tê. Qutkirina mirov ji ekonomiyê bingehê xerîbkirinan tevan e. Çawa ku pêşîgirtina li vê yekê şert e, rêya yekane û bi tenê ya vê yekê jî ew e, divê mirov ekonomiyê bike malê tevahiya civakê. Çawa ku “hinek bixwin, hinek lê binêrin” qiyamet radibe, “hinek bixebitin, hinek jî aware bêkar bigerin” qiyamet ji vê jî radibe. Ekonomî ji sedî sed divê di çarçoveya koman de û li ser bingehê berdarî û ekolojiyê were bi rêxistinkirin, ji ber ku ew şertê bingehîn ê hebûna civakan e. Ji bilî kom û civakan, ne ti kes dikare bibe xwedî heqê vê hebûnê û ne jî dikare wê ji

holê rake. Yekeyên ekonomîk çi bazirganî, çi sinaî, çi cotkarî, heta bi şertê ku bi tenê bi rola navgînê rabin çi fînansî bin, divê guh bidin van prensîb û pîvanan. Fabrîkeyeke gelekî mezin jî yekeyeke gund û cotkariyê jî divê li ser bingehê van prensîb û pîvanan be.

Di modernîteya demokratîk de milkiyeta yekeyên ekonomîk girîngiya xwe namînin û di dereceya duyemîn de dimînin. Milkiyet bêguman wê di çarçoveya prensîb û pîvanan de ya koman be. Ne milkiyeta malbatê, ne jî ya dewletê dikarin ji bo ekonomiya modern bibin bersiv. Milkiyeta malbat û dewletê ya ji hiyerarşiyê mayî, di modernîteya kapîtalîst de jî nikare hebûna xwe dewam bike. Heta şîrket jî bi sedema rastiyên ekonomîk zorê didin wan, her diçin dikevin milkiyeta hevpar a xebatkaran. Lê dîsa jî divê mirov normên milkiyetê bi xetên stûr ji hev cihê neke. Çawa ku du sîstemên şaristaniyê di zikhev de dijîn, sîstemên milkiyetê jî wê demeke dirêj di nav hev de hebûnên xwe dewam bikin. Di milkiyeta koman de jî milkiyeta malbatê hebûna xwe diparêze, herweha dewlet jî par û bandora hebûna xwe dewam dike. Ya girîng ew e, deriyên wan li normên milkiyetê yên nerm vekirîbin da ku bersivê bidin hawîrdorê, hilberîn û bêkariyê. Her teserufa ji hebûna ferd, azadiya wî, qencî û bedewiya wî re xizmetê bike milkiyet be jî bi nirx û qîmet e. Lê li gorî ku ev nirx ê bê kom ava nebin, dîsa ya herî rast ew e ku mirov di nava sînorên optîmal de pirsgirêkan çareser bike. Di bingehê modernîteya demokratîk de milkiyeta koman heye. Koman tevahiya dîrokê hebûna xwe ya komin ti carî ji dest neda. Modernîteya demokratîk xwedî wê pozîsyonê ye ku di şert û mercên modern de jî dikare vê têgihiştina milkiyetê bixe bingehê xwe û bi awayekî serketî bi vê rola xwe ya dîrokî rabe.

### c- Şaxê Wê Civaka Konfederalîst a Demokratîk

Sêyemîn şaxê xwezaya civakî di asta rêveberiyê de mirov dikare bi şêweyê sîstema konfederalîst a demokratîk diyar bike. Tevî hemû fikaran, mirov dikare ji sê şax û hêmanan hîn bibe. Ya girîng dizikhevdebûna şax û hêmanan e. Bi awayekî kêfî belkî dibe ku li şûna yekê tiştekî din were bicihkirin, lê tişta derkeve holê wê sîstema modernîteya demokratîk nebe,

tiştekî din be. Sêberiya moderníteya kapîtalîst jî di zikhev de ye. Şax û hêmanên wê pêdiviya wan bi hev heye, ango ji yekê re ya din divê.

Forma dewletê ya bingehîn a moderníteya fermî dewleta netewe ye, di moderníteya demokratîk de hemkûf û berdêla wê sîstema konfederalîst a demokratîk e. Mirov dikare vê weke şêweyê rêveberiya siyasî ya ne dewlet pênase bike. Ya xweseriyê dide sîstemê jî ev xisleta wê ye. Rêveberiyên demokratîk divê mirov ji sedî sed bi rêveberiyên îdarî yên dewletê re tevlîhev neke. Dewlet îdare dikin, demokrasî rêve dibin. Dewlet xwe disipêre desthilatdariyê, demokrasî xwe disipêrin rizaya kolektîv. Dewlet wezîfedar û tayîn dikin, di demokrasiyan de hilbijartin esas e. Di dewletan de îcbariyet, di demokrasiyan de rizadilî esas e. Cudatiyên bi heman rengî mirov dikare zêde bike.

Konfederalîzma demokratîk weke ku yeqîn tê kirin şêweyekî rêveberiyê yê xweserî roja me ya îro yê ji rêzê nîne. Sîstemek e ku di dîrokê de bi tevahiya giraniya xwe cihê xwe çêkiriye. Di vê çarçoveyê de dîrok ne dewletdar navendî, belê konfederal e. Formê dewletê ji ber ku fermî bûye hatiye naskirin. Lê jiyana civakî zêdetir nêzî konfederalîzmê ye. Dewlet dema timî ber bi santralîzmê ve dibeze, berjewendiyên yekdestdariyên desthilatdariyê yên xwe disipêre wan esas digire. Naxwe nikare van berjewendiyan biparêze. Lê santralîzmeke hişk dikare van berjewendiyan misoger bike. Di konfederalîzmê de berevajî vê ye. Ji ber ku ya ku esas digire ne yekdestdarî ye, belê civak e, bi qasî ku dikare divê xwe ji santralîzmê dûr bigire, jê bireve. Ji ber ku civak homojen (tek girse) nînin û ji gelek kom, sazî û cudahiyan pêk tên, divê wan hemûyan di nava ahengeke hevpar de bike yekpare û wan biparêze. Ji lewra ji bo pirraniyan rêveberiyeke zêde navendî rê li serhildanan vedike. Di dîrokê de bêhejmar mînakên vê hene. Konfederalîzma demokratîk ji ber ku her kom, sazî û cudatî kare xwe têde nîşan bide hê bêtir pêk tê. Weke sîstem gelekî nayê naskirin, ev ji ber îdeolojî û avahiya hegemonîk a şaristaniya fermî ye. Pênaseya wê ya fermî nebe jî dîrok bi awayekî bingehîn konfederalîst e. Bi tevahî rêveberiyên eşîr, qebîle û qewman timî bi wesfê têkiliyên sist destûrê didin konfederalîzmê. Naxwe zirar li xweseriya wan a hundir dibe.

Ev jî hebûna wan ji hev belav dike. Heta împaratorî jî di avahiya xwe ya hundir de xwe disipêrin bêhejmar rêveberiyên cuda. Her cure rêveberiyên qebîle, eşîr û qewman, dînî, otorîteyî, qraltî, heta komar û demokrasî jî di binya împaratoriyê de dikarin bibin yek. Di vê çarçoveyê de gelekî girîng e ku mirov fêhm bike, împaratoriyên gelekî navendî têne zanîn jî bi awayekî konfederalîst in. Meyla navendî ya civakê ne, modeleke îdarî ye ku pêdiviya yekdestdariyê pê heye.

Pêvajoya modernîteya kapîtalîst pêvajoya dewletê ya herî zêde navendîbûnê ye. Di leha tekela herî bi hêz de ya jê re otorîte tê gotin, navendên hêzê yên eskerî û siyasî yên di civakê de têne desteserkirin, civak bi awayekî herî zêde ji aliyê eskerî û siyasî ve bêhêz û bêrêveberî tê hiştin û ev rewş jî dihêle ku rêveberiyên monarşiyên modern û di pey re dewleta netewe ya hatiye pêşdebirin bûne ew rêveberî ku civak di wan de herî zêde ji aliyê eskerî û siyasî ve bê hêz û bê sîleh hatiye kirin. Nîzama jê re nîzama huqûq û huzûra civakî tê gotin, ji damezrandina serwertiya çîna bûrjûwayê bêtir tiştekî din nîne. Lewma mêtinkarî zêde bû û şêweyên wê yên nû dewleta netewe îcbarî kirine. Dewleta netewe ya em dikarin wê weke xwerêxistinkirina desthilatdariyê ya dewleteke herî mezin a navendî bi nav bikin, şêweyê bingehîn ê rêveberiya modernîteyê ye. Kirinên ji wan re ‘demokrasiya bûrjûwayê’ tê gotin mîna kirasekî lê tê kirin û ev bi awayekî bingehîn ji bo rewakirina yekdestdariya desthilatdariyê ya di nava civakê de ye. Dewleta netewe li ser bingehê înkara demokrasiyê û heta ya komarê bi gewde dibe. Demokrasî û komar ji aliyê naveroka xwe ve şêweyên rêveberiyê ne, ku ji dewleta netewe cuda ne.

Modernîteya demokratîk çi weke bingehê dîrokî, çi jî ji aliyê xwezaya civakî ya tevlîhev a rojane ve, weke modeleke bingehîn a siyasî konfederalîzma demokratîk diyar dike û ev hilbijartineke kêfî nîne. Ev banê siyasî yê civaka exlaqî û polîtîk îfade dike. Mirov heta bi temamî serwext nebe ku xwezaya civakî homojen û monolîtîk nîne, serwextbûna li konfederalîzma demokratîk jî zehmet e. Dîroka çarsed salên dawî ya modernîteya fermî li ser navê homojenkirina civaka pirretnîsîte, pirrçandî, pêkhatinên siyasî yên cuda û xweparastinê bi awayekî çalakiya qirkirin û

kokqelandinê ye (bi giştî çandî, car caran jî qirkirina fizîkî ye). Konfederalîzma demokratîk jî li dijî vê dîrokê, dîroka di xweparastin, pirretnîsîte, pirrçandî û pêkhatinên siyasî yên cuda de israr e. Postmodernîzm bi şêweyên nû dewamkirina dîroka bi şer a moderníteyê ye.

Dewleta netewe ya di dused salên dawî de weke hebûneke herî xwedayî hat pîrozkirin di serdema fînansê de derz lê ketiye, ji ber ku di binya xwe de rastiyên civakî yên bi darê zorê helandine û tepisandine bi awayekî jê tolê hilînin ketine rojevê û ev pêvajoyên bi hev re têkildar in. Têgihiştina karê ya serdema fînansê veguherîna dewleta netewe ferz dike. Di sîstematîkbûna pêxîrtengiyê de ev veguherîn bi roleke girîng radibe. Neolîberalîzm dixwaze dewleta netewe ji nû ve ava bike, lê dike û nake bi ser nakeve. Di vî warî de mirov dikare ji ezmûn û tecrûbeyên Rojhilata Navîn gelekî hîn bibe.

Sîstema demokratîk weke moderníteya dijber divê her biçe xwe berbiçav bike û di van şert û mercan de hebûna xwe bi hêz bike. Wexta van bike, bi awayekî serketî divê pirsgirêkên şêweyê jî çareser bike. Me bi vê armancê hewl da diyar bikin ku konfederalîzm ji dîrokê re xerîb nîne û ji xwezaya civaka roja me ya îro re ya tevlîhev dibe, bersiva herî baş e. Me timûtim anî ziman ku rêya xweîfadekirina herî baş a civaka exlaqî û polîtîk siyaseta demokratîk e. Siyaseta demokratîk şêwazê avakirina konfederalîzma demokratîk e. Demokratîkbûna xwe jî ji vî şêwazî digire. Moderníteya dijber a her ku diçe navendî dibe û bi amûrên desthilatdarî û dewletê yên heta çaviyên hundir ê civakê belavbûne, hewl dide hebûna xwe dewam bike, ya rastî qada polîtîk jî tine dike. Li miqabilê vê siyaseta demokratîk derfet û îmkanê dide her beş û derdorê ku bibin hêza siyasî û nasnameya xwe îfade bikin û bi vî awayî bi xwe re civaka polîtîk jî pêk tîne. Polîtîka ji nû ve dikeve jiyana civakî. Heta polîtîka nekeve dewreyê krîza dewletê nayê çareserkirin. Krîz bi xwe ji ber înkara civaka polîtîk pêk tê. Ji bo krîzên dewletan ên roja me ya îro kûrbûyî li dawiyê bêne hiştin, rêya bi tenê û yekane siyaseta demokratîk e. Naxwe gerên li dewletên navendî yên zêdetir hişk wê nikaribin xwe ji şikestinên xirabtir xilas bikin.

Ev hêman careke din nîşan didin ku konfederalîzma demokratîk weke alternatîfeke bi hêz dikeve rojevê. Di ezmûna Rûsya Sovyetê de pêşî ya di rojevê de û li pêş hat girtin konfederalîzm bû; ev konfederalîzm li ser navê dewleta navendî ji holê hat rakirin û ev jî yek ji sedemên bingehîn ên jihevdeketina sosyalîzma pêkhatî ye. Bi serneketin û di demeke kin de dejenerebûna Tevgerên rizgariya neteweyî ji nêz ve bi pêkneanîna wan a siyaseta demokratîk û kofederalîzma wê re girêdayî ye. Tevgerên şoreşger ên dused salên dawî dewleta netewe şoreşgertir hesibandin û konfederalîzm jî weke şêweyekî siyasî yê paşvemayî dîtin û li gorî vê jî bûn xwedî helwest û ev bû bingehê serneketina wan.

Kes û tevgerên xwe bi sîleha moderníteya kapîtalîst dewleta netewe ve girêdan yeqîn dikirin ku wê di demeke kin de bi vê sîlehê veguherînên civakî yên mezin pêk bînin, lê dereng serwextbûn ku bi vê sîlehê derb li xwe dane.

Konfederalîzma demokratîk xwediyê wê potansiyelê ye, ji neyêniyên çavkaniya xwe sîstematîka dewleta netewe ye, bibihure û di polîtîkkirina civakê de amûra herî di cih de ye. Besît e, û mirov dikare bi cih bîne. Her kom, etnîsîte, çand, cemaeta dînî, tevgera entelektuel, yekeya ekonomîk û hwd. dikarin xwe weke yekeya polîtîk bi awayekî xweser ava û îfade bikin. Di vê çarçoveyê de divê mirov têgînên Federe yan jî xweserî û xwebûnê binirxîne. Her **xwebûn** dikare û şensê xwe heye ji xwecihî heta bi globalbûnê konfederasyonan pêk bîne. Hêmana herî bingehîn a xwecihê mafê biryar û guftûgoya azad e. Her yekeya xwebûnê yan jî ya federe, bêhemta ye, ji ber ku ew şensê wan heye ku weke demokasiya rasterast bêne bi cihanîn. Jixwe vê weke demokrasiya beşdarî û tevlîbûnê jî dikin têgîn û bi nav dikin. Hêza xwe hemûyî ji rasterast bicihanîna demokrasiyê digire. Yek ji sedema hebûna rola wê ya bingehîn jî ev e. Dewleta netewe çiqasî înkara demokrasiyê be, konfederalîzma demokratîk jî berevajiyê wê, ewqasî şêweyê wê yê pêkhêner û fonksiyonelker e (dibe şêweyê bêkêranînê).

Yekeyên federe yên weke şaneyên sereke yên tevlîbûna rasterast ên demokrasiyê ne, wexta şert û merc hewce bikin xwedî wê nermbûnê ne ku

veguherin yekîneyên konfedere û ji vî alî ve bêhemta û îdeal in. Bi şertê ku xwe bisipêrin tevlîbûna rasterast a demokratîk her cure yekîtiya siyasî yekeyeke demokratîk e. Li deverên herî xwecihî demokrasiya rasterast a bê pêkanîn û di yekeyan de were meşandin û heta bi pêkhatinên global ve were pêşdebirin, mirov ji vê fonksiyoneliya polîtîk re dikare bibêje siyaseta demokratîk. Sîstema rastî ya demokratîk formulasyona pêkhatina van pêvajoyan hemûyan e.

Eger mirov bi baldarî çavdêriya xwezaya civakî bike, mirov ê bi hêsanî wesfê dewleta netewe yê ji 'qefesa hesinî' û wesfê konfederalîzma demokratîk ê azad dike bibîne. Dewleta netewe çiqasî civakan ditepisîne, dike tek tîp û ji demokrasiyê dûr dixe, modela konfederalîzma demokratîk jî ewqasî azad dike, pirr û demokratîk dike.

Xusûseke din a divê mirov bala xwe bidiyê ew e, yekeyên federe û xwebûnê di çarçoveyeke gelekî dewlemend de hatine fikirîn. Gelekî girîng e ku mirov fêhm bike wê li gundekî yan jî kolana bajarekî hewcedarî bi yekîtiyên konfedere hebe. Her gund an jî kolan bi hêsanî dikarin yekîtiyeke konfedere pêk bînin. Eger em mînakê bidin, li aliyekî yekeya ekolojîk a gund ango federeya wê, li aliyê din jî ji yekeya jina azad heta bi ya xweparastinê, ciwan, perwerde, folklor, tenduristî, zibare û ekonomiyê gelek yeke divê li nava gund rasterast tevlî demokrasiya gund bibin û bi yek bin. Ji vê yekeya yekeyan re jî bi hêsanî mirov dikare yekeya konfedere (yekeya yekeyên federe) yan jî yekîtî bibêje. Dema ku em heman sîstemê ji xwecihî heta bi herêmî, neteweyî û asta global bibin, wê wextê bi hêsanî wê were fêhmkirin ka konfederalîzma demokratîk sîstemeke çiqasî berfireh e. Bi sîstematîka konfederalîzmê mirov baştir dikare fêhm bike ku sê hêmanên bingehîn ên modernîteya demokratîk hevdu temam dikin. Ji ber ku her hêman û şax xwedî wê potansiyelê ye ku dikare xwe di nava sîstemê de guftûgo bike, binirxîne, bigihîje biryarê, ji nû ve ava bike û bixe çalakiyê, rastiya civakê ya dîrokî ya xwezaya civakî û yekparebûna wê jî bi awayekî herî baş tê pêkanîn.

Di sîstema konfederal a demokratîk de mirov xweparastina civakî jî bi awayekî herî baş dikare bi cih bîne. Xweparastin weke saziyeke siyaseta

demokratîk di çarçoveya sîstema konfederal de ye. Mirov dikare xweparastinê welê pênase bike; hûrûkûr û zêde meşandina siyaseta demokratîk îfade dike.

Dewleta netewe bi awayekî bingehîn sîstemeke eskerî ye. Bi tevahî dewletên netewe berhemên şerên li hundir û derve ne ku bi awayên cûrbicûr, demdirêj, bêrehm û bi şêweyên cuda hatine meşandin. Mirov li yek dewleta netewe ya bi tenê ya ne berhemê şeran nikare bifikire. Ne bi tenê di qonaxa damezrandinê de, heta ji wê gelekî zêdetir di demên bisazîbûn û jihevdeketinê de dewleta netewe ji hundir û derve xwe bi zirxekî mîlîtarîst (eskerî) li tevahiya civakê badide. Civak bi tevahî dibe eskerî. Desthilatdarî û saziyên dewletê yên ji wan re îdareya sivîl tê gotin, ya rastî weke perdeyekê ser vî zirxê eskerî digirin. Amûrên ji wan re demokrasiya bûrjûwayê tê gotin jî hê zêde diçin bi cîlaya demokrasiyê vê avahî û zêhniyeta mîlîtarîst dinixumînin û propaganda dikin ku sîstemeke civakî ya demokrat lîberal li ser kar e. Mirov heta vê nakokiya fena ya rêveberiya modernîteyê ji hev dernexe, mirov nikare behsa çi siyasîbûneke rast û meşandina siyaseta demokratîk bike. Diyardeya jê re esker-millet tê gotin ev e. Ev diyardeyek e ku ji bo tevahiya dewletên netewe yên çarsed salan û vir ve avabûne bi vî rengî ye. Di binê tevahiya pirsgirêkên civakî, pêxîrtengî û rizînan de ev rastî heye. Li ser navê çareseriyê ya tê ferzkirin û misêwa tê dubarekirin anîna desthilatdariyên faşîst e (bi darbe, bê darbe, faşîzmên eskerî, sivîl), ev jî pêdiviyeke xwezaya dewleta netewe ye; ev rewşa wê ya herî xweser e ku şêweyê wê îfade dike.

Konfederalîzma demokratîk vê mîlîtarîstiya çavkaniya xwe dewleta netewe ye, bi tenê dikare bi amûrê xweparastinê rawestîne. Civakên ji xweparastinê mehrûm in, nasnameyên xwe, xisletên xwe yên polîtîk û demokratîkbûna xwe ji dest didin. Ji lewra hêman û şaxê xweparastinê ji bo civakan diyardeyeke besît a parastina eskerî nîne. Bi parastina nasnameyê re, bi pêkanîna polîtîkbûna wê û bi cihanîna demokratîkbûna wê re di zikhev de ne. Eger civak karibe xwe biparêze, mirov dikare behsa parastina wê ya nasnameyê, pêkanîna polîtîkbûna wê û meşandina wê ya

siyaseta demokratîk bike. Li bin rohniya van rastiyan konfederalîzma demokratîk di heman demê de divê weke sîstemeke xweparastinê şax berde. Di serdema hegemonîk a yekdestdariyên global de û di van şert û mercan de ku bi şêweyê dewleta netewe tevahiya civakê milîtarîst kiriye, modernîteya demokratîk jî divê di heman çarçoveyê de di şert û mercên hemû zeman û mekanan de li ser bingehê xweparastin û siyaseta demokratîk, bi sîstematîka xwe ya ji tevnên konfederal pêkhatî dikare bersivê bide hegemoniyayê. Çiqasî şebeke, tor û tevnên hegemonîk (yekdestdariyên bazirganî, fînansî, sinaî, desthilatdarî, dewleta netewe û îdeolojîk) hebin, modernîteya demokratîk jî divê ewqasî tevnên xwe yên konfederal, xweparastin û siyaseta demokratîk pêşde bibe.

Di vê mijarê de xusûseke dawî ya divê em li ser rawestin ew e, di navbera dewleta netewe û xwezaya civakî de nakokî û têkilî wê çawa bên meşandin û dewamkirin. Nexasim ekolên rizgariya neteweyî û sosyalîzma pêkhatî, bi sedema bandora desthilatdaran li ser wan (li şûna desthilatdariya bûrjûwayê desthilatdariya proleteryayê, heta dîktatorya wê; li şûna rêveberiyên mêtinkar û hevkar, nêzîkatiyên desthilatdarîparêz ên millî) şaşiyên herî trajîk ên dîrokê kirin û ji ber van têgihiştinên wan şensekî dewamkirinê dan kapîtalîzmê ku wê hîç heq nekiribû. Ev ekolên ku bi awayekî desthilatî û dewlet hilweşandin û li şûna wan ên nû avakirin, divê mirov wan ji xeniqandina civakê di nava mîlîtarîzasyonê de, ji destdana civakê ya wesfê xwe yê polîtîk û ji têkçûna civakê di têkoşîna demokratîk de weke hêzên herî berpirsiyar bibîne. Ekol û nêzîkatiyên bi vî şêwazî yên dused salên dawî ji dewletdariya netewe ya hegemoniya kapîtalîst re li ser lengeriya zêrîn serketin pêşkêşkirine. Tevî anarşîstan û bi derengî be jî hin tevgerên femînîst ên postmodern, tevgerên ekolojîk, civakên sivîl ên din û têgihiştinên çepgir di vê mijarê de xwedî pozîsyoneke erênî ne.

Herdu sîstemên modernîteyê weke me bi awayê berê prensîb û şertên wan pêşkêş kirin di nava demeke dirêj a bi şer û aştiyê de bivênevê wê bi hev re bijîn. Ev, rastiyeke jiyanê ye. Ne rast e ku ev pêvajoya bi dema dirêj ne bi nêzîkatiyên aştiyane yên teslîmkar û bê prensîb, ne jî di her şert û

mercî de bi têgihiştin û pratîkên bi şer û pevçûn were dewamkirin. Sîstematîka dewleta netewe û sîstematîka konfederalîzma demokratîk bi qasî bi aştiyên bi şert û prensîb tijî ne, di rewşên binpêkirina van şert û prensîban de jî felsefeya siyasetê û nêzîkatiyên stratejîk û taktîk şerên xweparastinê li ber çavan digirin û ev bi meşa azadî, wekhevî û demokratîk a civaka dîrokî re bêhtir li hev dikin.

Ez yeqîn dikim ku di vî beşê dirêj ê xebata xwe de min karekterê dualî yê modernîteyê weke dema dawî ya dîroka şaristaniyê têra xwe rave kir. Çawa ku di pêşketina diyalektîk a dîroka şaristaniyê de, modernîzm bi xwe û dîrokçeya wê ya kiniktir jî bi gelek bûyerên diyalektîk barkirî ye. Wexta diyalektîk tê gotin, xusûsa divê bê fêhmkirin pêşketina têkilî û nakokiyeke du serî ye ku du avabûn û zêhniyetên cuda di nava xwe de hildigire. Dîroka çarsed salên dawî piştrast dike ku kapîtalîzmê mohra xwe li modernîzmê xistiye. Lê ji ber ku kapîtalîzmê mohra xwe li modernîzmê xistiye, ev nayê wê maneyê ku modernîte bi temamî kapîtalîst e. Jixwe kapîtalîzm jî ji şêweyekî civakê zêdetir, sîstema daneheva sermaye û karê ye. Ji bo diyardeyeke berfireh a mîna modernîteyê bi wesif bike sîstemeke di cih de nîne. Herçiqasî min gelek caran têgîna modernîteya kapîtalîst bi kar anî jî min dîsa timî destnîşan kir ku divê mirov vê wisa fêhm bike ango kapîtalîzmê mohra xwe li modernîteyê daye. Tevî vê yekê min timî hewl da analîz bikim ku para rastiyê hê zêdetir e, mirov rûyê duyemîn ê modernîteyê (ez di cih de nabînim jê re bibêjim modernîteya bi mohra demokratîk) weke modernîteya demokratîk (eger navekî din ê hê bêtir di cih de bê dîtin ew jî dibe) binirxîne. Di jihevkirina civakê weke kapîtalîst û sosyalîst de ji bo ez nekevim şaşiya dîrokî û bê çareserî nemînim, min bi taybetî jî hewl da ez xwe ji helwestên gelekî seresere yên weke modernîteya kapîtalîst û modernîteya sosyalîst dûr bigirim.

Min rêbaza diyardeya du modernîteyên cuda bi muqayesekirinê pê dakevim û ji aliyê dîrokî ve wan bidim ber hev, timî bi kar anî. Ji ber ku rastî bi xwe duserî û çeqelîkî bû. Çawa ku di dîroka şaristaniyê de jî tê dîtin, di qonaxa wê ya kin ango çaxên modern de jî tevahiya şer û têkiliyan li vê dualîteyê şahidiyê dikin. Ya ez hewl didim bikim, di asta ceribandinê

de be jî bi van şahidiyan dixwazim pênase û analîzên kin pêşde bibim. Ez guman nakim ku wê herî kêm weke pêşnûmeyeke fikrê were fêhmkirin. Şik têde nîne ku rexne û pêşniyarên bêne kirin, wê analîzan xurtir bikin.

Mirov nikare înkar bike ku kapîtalîzmê weke sîstema daneheva sermaye û karê mohra xwe li modernîzmê xistiye û hê jî weke hêza hegemon a global serdestiya xwe ya fînansa kapîtal dewam dike. Tevî vê yekê, dîsa mirov nikare înkar bike ku weke sîstem ji dema hatiye avakirin di tevahiya şertên zeman û mekan de hêzên gelekî bi hev re nakok di nava xwe de digire. Bi armanca têgîn hêsan bibe, ev hêz weke hêzên modernîteya demokratîk têne pênasekirin û ne bi tenê weke tevgerên rizgariya neteweyî û sosyalîzma pêkhatî, belê tê zanîn di serî de anarşîzm, di van demên dawiyê de li gavavêtinên mîna ekolojîk, femînîst û sîstemên dîndar ên radîkal jî şahidî tê kirin. Sînga sîstemê ji zû ve hatiye qelaştin, yên ji hundir û derveyî wê hatine (Zêdetir divê ez bibêjim ên ji derveyî wê hatine. Ji ber ku xwezaya civakî bi awayekî esasî hêzên ji derve hatine nas dike), di tevahiya zeman û mekanên vê sîstemê de hebûna xwe, xwestekên xwe yên wekhevî û azadiyê timî anîne ziman û xistine nava çalakiyê. Dîsa ji lêgerîna xwe ya sîstemê ti carî paşve nemane.

Çawa ku di tevahiya dîroka şaristaniyan de hatiye ceribandin, di demên modern de jî hewldanên sîsteman ên yekdestdarîbûn û hev tinekirinê encam nedane û berdêlên wan jî giran bûne. Bêguman korbûnên di vî warî de bîlançoyên van şerên sîsteman gelekî giran kiriye. Sîstem wê giraniyê li ser hev çêkin û bixwazin bi vî awayî jiyana xwe dewam bikin. Ji asta global heta bi asta xwecihî, timî hegemoniya wê bêne ferzkirin, berxwedanên dijber jî wê ji ceribandinan dersan bigirin û bi awayekî herî bi hêz dewam bikin. Heta çareserî nebe, em ê şer û aştiyê her bi hev re bibînin. Analîz û çareserî hê bêtir serketî bibin, rastî, qencî û bedewiyê çiqasî nîşan bidin, bêguman rewşeke em karibin jê re bibêjin bêşerî û bêaştî wê pêk bê û em ê karibin dinyayeke bi nirx û bi arezû bêtir xeyal bikin, pêk bînin. Bêguman hê zêdetir aştî û hê kêmtir şer rewşeke bi nirx e, û hewldanên ji bo pêkanîna wê jî hêja ne û esîl in. Bi şertê ku mirov bi prensîb, bi anor û bi rûmet be.

Me hegemoniya kapîtal a fînans globalê bi xwe weke pêvajoya krîza herî kûr pênase kir. Bûyer vê pênaseyê piştrast dikin. Herweha me bi awayekî berfireh anî ziman ku krîz sîstemîk û ji avabûnê ye. Nûçeyên rojane yên der barê krîzê de jî karekterê sîstemîk û avabûnê piştrast dikin. Di demên krîzan de sîstemên modern dikarin bizên û derkevin holê. Hinek wexta dizên bi felc tînin, yên bi awayekî têkûz dizên jî kêm nînin. Di utopya lîberal a kapîtalîzmê de paketên çareseriyê yên gelekî berfireh û pevekirî hîç kêm nabin. Nasekinin planên rojane, hefteyî, mehane, salane, deh salane û pêncî salane dikin. Ev karê wan e, wê her bikin.

Di van demên krîzan de şensê hêzên modernîteya demokratîk dikare zêdetir bibe. Dîrokeke mezin a berxwedanê ya pişta xwe danê, utopyayên azadî û wekheviyê pêşiya wan rohnî dikin. Herweha dersên mezin ên ji têkçûn û kêmasiyan derxistine hene. Dema ku mirov li hemûyan di zikhev de weke desteyeke wezîfeyên entelektuel, exlaqî û polîtîk serwext bibe û bixe nava çalakiyê, bêguman şensê wan ê serketinê zêde ye. Dîsa jî aliyên xweser ên demên krîzê yên avabûn û sîstemîk hene ku divê bi baldarî mirov li ber çav bigire. Herçiqasî li ser şopa rabihuriyê bin jî zanist û felsefeya exlaqî-polîtîk a divê pêk bînin, divê nûbûnan bigire nava xwe û divê ev neyê paşguhkirin. Naxwe weke ku gelek caran di demên berê de hatiye dîtin wê rê li seresere nêzîkbûn û serkoriyê veke. Tew misêwa xwe neo'kirina lîberalîzmê tehlûkeyê mezintir dike. Divê neyê jibîrkirin ku herkes ji pêxîrtengiya di sala 1929'an de li nava dinyayê pêk hat, li hêviya şoreşê bû, lê pêla faşîzmê ya bilind bû hê dewam dike. Civak ji her demê zêdetir ji wesfê wê yê exlaqî û polîtîk hatiye mehrûmkirin. Teknolojiya înformatîk dinyayên gelekî mezin ên ferazî û derfetên berevajîkirina rastiyên dinyayê pêşkêşî destê hêzên hegemonyayên îdeolojîk ên global dike. Avahiyên xwe yên riziyayî bi hêsanî bi sîstemeke nû ambalajkirî mîna nû çêbûye pêşkêş dike û di vê de ti xirabiyê jî nabîne. Girseya heyî ji zû ve veguherandiye girseya kerî ya faşîzmê. Li şûna hêvî şikandinê, divê mirov qîma xwe bi anîna cem hev a rastiya analîtîk û hiskirinê neyîne, ji sedî sed em heta jiyana exlaqî û polîtîk nexin her kêlî û mekanê xwe, bi hêsanî em dikarin bêne pûçkirin, ji lewra jî ez van diyar dikim. Piştî vê di beşa dawî de mijar ê ev bin.

# 10- PIRSGIRÊKÊN JINÛVEAVABÛNÊ YÊN MODERNÎTEYA DEMOKRATÎK

Aliyê herî trajîk ê şoreşên modern ew e, ew bûne qurbanê modernîzma alîkariya pêkhatina wê kirine. Kêmasiya hevpar a van şoreşan jî ew e, modernîzm ji hev dernexistin. Yeqîn kirine ku bêyî têkilî û nakokiyên xwe yên bi modernîzmê re ji hev derxin wê di armancên xwe de yên li pey wan dibeziyan bi serkevin. Wexta welê dibe, naverokên utopîk ên şoreşan pirr derbas nedibû di nava hesabên qeşagirtî yên modernîteyê de dicemidîn û nikarîbûn xwe ji vê xilas bikin. Ji dîroka şaristanî û modernîteyê ya bi giştî pênc hezar salî, bi taybetî jî çarsed salî dersa mirov derxe ew e, di tevahiya berxwedan û şoreşan de hêmana bingehîn a serneketinê ew e, nikarîbûn cudahiya xwe ji sîstema li ber radibûn deynin holê û sîstema xwe ya dijber pêk bînin. Şaristanî û modernîte bi nêzîkatiyeke tekperest nirxandine, bi jiyana gerdûnî ya divê mirov li gorî wê biçe wekhev dîtine. Tevî ku bêhejmar berxwedanî, şaristaniyên hilneweşandin nehiştin jî, yên pêkhatin bûn versiyoneke nû ya şaristaniya kevin.

Li vir çavkaniya hêza şaristaniyan derdikeve pêşiya me. Şoreşgerên herî mezin jî di navê de, ji xêncî kêm îstîsnayan, kes bi giştî zarokên şaristaniyên dema xwe ne. Dê û bavê wan ê rastî, serdema têde dijîn e. Ez bi awayekî qederwarî nêzî mijarê nabim. Ez dixwazim destnîşan bikim ku pênc hezar an jî çarsed salî be jî heta şaşiyeke bi kok li dawiyê neyê hiştin, şoreşa xwedî gotin û çalakiya herî radîkal wê neçar bi binkeve. Em nikarin bibêjin şoreş û berxwedanên civakî hîç mîrateya xwe nînin. Eger ev mîrate nebûya wê ti maneya jiyana me nemana. Lê belê, pêxîrtengiya li naverastê ya modernîzma me ya herî zêde jixwe razî jî têra xwe nîşan dide ku ji çareserkirina çavkaniya pirsgirêkan dûr e. Eger şaşîtiyê dirêj kişandibe jî ew her şaşîtî ye; pirsgirêk jî her pirsgirêk e. Ev jî heta welê dewam bike, xeyalên jiyana wekhevî, azadî û demokratîk jî wê her utopîk bimînin.

Di parêznameya xwe de bi awayekî bingehîn di hesabpirsîna ji şaristanî û modernîteyê de, ji aliyekî ve xwe hûrûkûr rexne dikim, ji aliyê din ve jî çiqasî kêm be jî hewl didim alternatîfa xwe pêşkêş bikim. Ev ji bo gotin û gavên mirov ê hevgirtî şert e. Zanista civakî ya navenda wê Ewrûpa nikare vê hevgirtinê nîşan bide. Hem em ê behsa serdemeke zanistê ya bê hemta bikin, hem jî em ê nikaribin ji heqê hovîtiyeke mîna şer bên! Di rewşeke welê de ne rewa ye ku bi sîleha zanistperestiyê serdemên berê bêne rexnekirin. Ya divê bê kirin ew e, divê mirov li pey zanisteke rewa be, biçe. Ez hewldanên xwe jî di vê çarçoveyê de dibînim.

Gotinên min ên der barê şaristanî û modernîteyê de divê zêde nepixandî neyên hesibandin. Dema pêxemberan weke kelama xwedê rexne li nîzamên Nemrûd û Firewnan dikirin, gelekî ji dil bûn û mirov nikare ji vê gumanê bike. Lê yên îdea dikirin timî li ser şopa wan diçin, bi awayekî mirov xweziyê bi heman Nemrûd û Firewnan bînin, nikarîbûn bi xwe û nîzamên nû yên Nemrûd û Firewnan pêkanîn. Eger siltan, şah û padîşah bûbin êsîrên nîzamên ava kiribin, divê mirov di vê de hêza şaristaniyan bibîne. Niyeta baş mirov li ser şopa pêxemberan be jî ji peyrewbûna sîstema Nemrûd û Firewnan xilas nake.

Marks, Lenîn û Mao wexta bi kapîtalîzmê re pevdiçûn ji dil û samîmî bûn. Heta baweriya wan tam bû ku li dijî kapîtalîzmê sosyalîzm ava kiribûn. Lê pirr neçû encama derket holê nîşan da ku avahiya damezrandine ti cudahiya xwe ji kapîtalîzmê nîne. Li vir jî hêza xwedî gotin şaristaniya nû ango modernîte bû. Nirxandinên seresere yên der barê sermayeyê de ji bo pêşdebirina sosyalîzmê têrê nedikirin. Ya kêm analîzên der barê modernîteyê de bûn. Fikra dinyayê ya pozîtîvîst a hûrûkûr di bin bandora wê de bûn, modernîte weke rewşa herî pîroz a rastiyê pêşkêş dikir. Bihêlin rexnekirina wê, difikirîn ku wê hê bêtir wê bêqusûr bikin. Encam jî li naverastê ne. Şaşiya dîrokî heta zincîrwarî dewam bike, armancên herî esîl û pîroz nikarin xwe xilas bikin da ku nebin amûrê hesabên bêrehm û qeşagirtî yên şaristanî û modernîteyê.

Postmodernîte, tevî ku li beramberî modernîteya kapîtalîst yek ji tevgerên ciddî ya rexnegîr a pêşî ye ku dibêje nikare pê re dewam bike, ji

alternatîfbûnê dûr e. Avahiya wê ya ne zelal û pevekirî, firsend nedayê ku bi awayekî serketî cudahiya xwe ji modernîteya klasîk deyne holê. Hewldanên bi heman rengî yên romantîkên sedsala 19. bi awayekî ji wêjebûnê wêdetir neçûn. Di dawiya sedsala 19. de F. Nietzsche, di nîvê duyemîn ê sedsala 20. de Michel Foucault, tevî ku serê rexneyên gelekî hêja yên li modernîteyê kişandin jî ev hewldanên wan ji hewldanên ferdî wêdetir neçûn, wesfekî ekola exlaqî û polîtîk a kolektîv negirtin. Yên hînê aktuel Fernand Braudel, I. Wallerstein, Andre Gunder Frank û hevalên wan ên nêz ên xebatê, tevî ku hê bêtir bi rexneyên rastî di nava yekparebûna dîroka civakî de nêzî mijarê bûne jî mirov nikare bibêje di warê alternatîfdanînê de heman serketin bi dest xistine. Ew şaristanî û modernîteyê mîna sîstemên xelekwarî yên girtî yên divê dewamî bin, pê dadiketin; rexneyên berfireh lê dikin, lê yên der barê alternatîfan de têne gotin ji çend hevokan nabihurin. Em dikarin dînbûn û velîstina Nietzsche, mirina zû û bêwext a M. Foucault fêhm bikin. Lê F. Braudel yeqîn kir ku alternatîf sosyalîzma pêkhatî ye, I. Wallerstein qîma xwe bi têgînên wekhevîxwazî, azadîxwazî û demokratîkbûnê anî, gotina Andre Gunder Frank a hê gelekî giştî 'di nava cudatiyan de yekîtî' mumkîn nîne ku têra me bike. Bi van kêmasiyên xwe mikur tên ku bi temamî nekarîne xwe ji zincîrên zanista navenda wê Ewrûpa ya gelekî rexne dikin, xilas bikin.

Di çarçoveya parêznameyê de li ser bingehê rexneyan analîzkirina min a mijarê û alternatîf pêşkêşkirina min, dibe ku weke dadgehkirineke şexsî ya şaristaniya qedîm û nûnerê wê yê roja me ya îro modernîteya kapîtalîst were dîtin. Ev dîtin û fikir bi awayekî rast e. Qenaeta min a şexsî ew e, kes heta mehkûmiyeta xwe ji hev dernexe, bi awayekî têkûz nikare bi karê zanistê rabe. Ez di çarçoveyeke teng de behsa mehkûmiyeta girtîxaneyê nakim. Ez behsa mehkûmiya giştî ya civakî dikim ku şaristanî û modernîte li ser jiyana azad ferz dikin. Şertê pêşî yê mirov karibe bi karekî têkûz û manedar ê zanistê rabe ew e, berê pêşî kirdarê/a bi vî karî rabe divê xwe çareser bike û di warê pratîkî de cihê xwe pêk bîne. Di rewşeke berevajî de agahî û zanista bi dest xistiye wê weke sermayeyeke entelektuel di

piyaseyê de bi kar bîne ango bivênevê wê bibe zanyar û zanistkarê desthilatdariyê.

Fikra sereke ya rexneyên min ew e, sîstema şaristaniya pênc hezar salî (sîstema hiyerarşîk a hê kevintir jî di navê de) bi daneheva sermaye û desthilatdariyê ya li ser komên gund-cotkariyê û koçeran li bajêr jî li ser zenaetkar û karkerên kole pêk hatiye. Tevî ku heta roja me ya îro ev cewherê xwe parastiye jî, şêweyên cûrbicûr ên weke bazirganî, pere û îndustriyê girtine, lê desthilatdarî û dewlet weke şêweyên sereke yên neguherî mane. Dîroka şaristaniyê ji aliyekî ve li ser şerên pargirtinê ava ye ku yekdestdariyan di nava xwe de meşandine, ji aliyekî din ve jî li ser şerên li dijî dijberan ava ye ku bi hev re meşandin e. Jê şûn ve jî şerên hegemoniya îdeolojîk in, lîstik û dekûdolabên li ser desteserkirina nirxên civakî yên xwe disipêrin şer û desthilatdariyan in. Dema şaristaniya kapîtalîst ango modernîte, rewşa herî pêşketî ya vê sîstemê ye. Karektera sîstemê ya hawîrdor-navendê, hegemoniya-reqabet û nizm-bilind ji destpêkê ve hebû. Dema modernîteyê jî nexasim di wê pêvajoyê de ku sermayeya fînansê têde bi roleke hegemonîk radibe, rewşa herî kûr a krîza avabûnê îfade dike.

Çareseriya alternatîv a ez pêşniyar dikim jî divê mirov di tevger û zanîna tevahiya hêzên xwezaya civakî de lê bigere û bibîne. Ji roja hiyerarşî derketiye heta bi pêvajoyên şaristaniyê û modernîzma bi mohra kapîtalîzmê, tevahiya dîrokê weke pêdiviyeke karektera diyalektîk a sîstemê hêzên behsa wan tê kirin li serê qutbê dijber cih digirin. Ti versiyona dîroka şaristaniya fermî nikare ji hêzên dijber re bibe çareserî. Eger têkoşînên civakî di dîrokê de di utopyayên wekhevî û azadiyê de bi serneketine, sedema vê ya bingehîn ew e, sîlehên şaristaniya ji hevketî bi kar anîne (hêzên desthilatdarî û dewletê) û paşeroja xwestine ava bikin, weke versiyoneke wê ya cuda tesewir kirine. Li gorî xwezaya xwe ya civakî nikarîne avahî û zêhniyetên serbixwe çêkin û vê yekê hiştiye ku di nava versiyonên qutbê dijber de bihelin.

Rêveçûn û meşa dîrokê çawa ku ji dubareyên sîstemeke xelekwarî pêk nayê, herweha li ser xeteke rast pêşketin jî nîne. Lê di nava xwe de çiqasî

tevgerên avahî û zêhniyetan pêkanîbe di wê giraniyê de parên wan hildigire û yekparebûna tevahiya tevgerên zanîn û çalakiyên wan e. Dîrokîbûn ango di dîrokê de cih girtin, her tim weke xelekê tê de cihgirtin pêkan e. Şertê vê yekê jî ew e, divê bi giraniya hewce dike bi hêza zêhniyetê formê avabûnê bi dest bixe. Dîrok di vê çarçoveyê de xwedî xwezayekê ye ku xwe şaş nake. Eger çalakî û fikrên nikarîbûn forma avabûn û hêza zêhniyetê ya bi qasî ku karibin pê di dîrokê de cih bigirin pêk bînin, divê beriya her tiştî berpirsiyarî û kêmasiya vê li cem xwe bibînin.

## A- Pirsgirêka Şaristanî, Modernîte û Krîzê

Sîstemên şaristaniyan li gorî avabûna xwe wesfê wan ê pêxîrtengiyê heye. Pêxîrtengî tevahiya zeman û mekanan di encama bandorên hundir û derve de rewşên car caran pêk tên, nînin. Sîstem bi xwe timî pêxîrtengiyê (bi awayekî zêdetir krîzê) çêdike. Mentiqê pêxîrtengiyê gelekî besît e: Nirxên civakî û berhemên zêde yên hatine ragirtin, desthilatdarî û bi awayekî hê fermî çînên dewletê, xwe li ser datînin. Ev çînên xwe li ser sînga civakê datînin li gorî avahiyên xwe yên çekdarî, timî xwedî meyla mezinbûnê ne. Beşên kedkar ên civakê bi zor û zehmetî debara xwe dikin, ji ber nexweşiyên cûrbicûr û şeran zû dimirin, hejmara wan li gorî rêjeya çînên dewletê kêm dibe. Şêniyên dewlet û her cure amûrên desthilatdariyê jî ji ber baş dixwin û vedixwin xwe diparêzin û ji ber ku gelekî zêde dibin û têra xwe pirr dibin. Desthilatdarî û dewletên pêşî ji ber wesfê xwe yê xanedaniyê alîgirê malbatên mezin û xwedî hejmara zêde ne. Ji ber polîtîkaya hêzê vê hewce dike. Ha ji vê rewşa bêyî hevsengî ya sîstemîkbûyî re pêxîrtengî tê gotin. Çînên dewletê yên hê bêtir pirr û bi hêz bûne, her ku li ser pişta civakê nirxan desteser bikin, nedomdariya sîstemê jî dikeve rojevê. Rewşa jê re demên pêxîrtengiyê tê gotin ev e.

Ji bo derketina ji pêxîrtengiyê du rê hewce dikin: Ya pêşî, di encama şerên hegemonîk ên dijwar de hêza reqîbên xwe tine dike weke hegemoniya nû derdikeve holê. Hêza hegemonîk ji ber ku reqîbên xwe yên

berê xwediyên parê bi awayekî xwezayî pelixandine, parên wan jî desteser dike û heta reqîbên nû derkevin holê pêxîrtengiyê ji bo demeke diyar hinekî be jî li dawiyê dihêle. Ya diduyan û pirranî jî bi ya pêşî re di zikhev de, rêbazên hilberîna hê berdar, bazirganî û sinaiyê dixin dewrê û bi vî awayî zêdekirina hilberandinê pêk tîne. Sîstema hegemonîk a zêdekirina hilberînê pêk tîne weke dijberê pêxîrtengiyê xwe digihîne dema xweşhaliyê. Di şaristaniyên destpêkê de pêxîrtengî hê bi navberên dirêj û demên dirêj in. Pêxîrtengiyên ji hezar salî heta bi dused salî navber diajon timûtim pêk tên. Her dema pêxîrtengiya mezin bi giştî bi xanedantî û guherîna navendê bi encam bûye. Ji şaristaniyên Sumer û Misrê û vir ve mirov dikare van pêvajoyan bi awayekî gelekî zêde bişopîne. Pêxîrtengiyên serdema navîn tevî ku bi heman rengî ne jî dema wan hê kintir bûye. Demên wan li derdora sed û sedpêncî salî gelekî zêde pêk hatine.

Tevî ku di çarçoveya vê seyra giştî de pêk tê jî pêxîrtengiyên sîstema kapîtalîst aliyên xwe yên xweser hene. Di sîstemê de destpêkê yekdestdariyên bazirganiyê û peretî bi rola pêşeng radibin. Têkiliya wan bi hilberînê re bi sînor e. Li muqabilî vê di ekonomiyê de pere gelekî zêde tê bikaranîn. Ji ber ku di pêşketina metabûna bazirganiyê û bidestxistina xisleta serdest de girîngiya pere gelekî zêde bûye. Di nava pêvajoyê de yekdestdariya pere û bazirganiyê di destê kêm hêzekê de zêde dibe. Di vê rewşê de ji ber tinebûna pere hêza civakê ya kirrînê kêm dibe. Ji ber ku hilberîna zêde ya derketiye holê naçe û dimîne, weke rewşa pêxîrtengiyê ya yekemîn pêxîrtengiya hilberîna zêde pêk tê. Li aliyekî ji ber hilberîna zêde malên nayên firotin îmha dibin, li aliyê din jî kedkarên hêza wan a kirrînê nemayî jî ji xizanî û birçîna dişkên. Di demeke kin de tersê wê jî pêk tê. Hilberîna pere nake, têra xwe kêm dibe. Têkiliya pereyê di dest de bi hilberînê re qut dibe. Li naverastê gelek pere, lê kêm hilberîn heye. Ji ber buhabûna pêdiviyên jiyanê (enflasyon) rewşeke nû ya pêxîrtengiyê derdikeve holê. Ji bo derketina ji herdu pêxîrtengiyan rêya hatiye dîtin ji rêûresmê ye; tevî şerên hegemonîk, lêçûnên dewletê têne zêdekirin, beşekî bi heqdestan dixebite tê afirandin û bi vî awayî hewl didin ku

hilberîna zêde û kêm telafî bikin. Di serdema hegemoniya çarsed salî ya kapîtalîzmê de pêxîrtengiyên bi vî rengî gelekî û di zikhev de pêk hatin. Demên wan hinekî din kin bûn, daketin heta pêncî û sed salan.

Şerên hegemoniyayê bi qasî ku bi ti dema şaristaniyê re mirov nikaribe qiyas bike berfireh, zêde û demdirêj bûne. Yekdestdariyên tevlî şer jî bûne di asta neteweyî û navneteweyî de bûne. Ji lewra cara pêşî şerên di asta dinyayê de hatine naskirin û dîtin. Şerên xwecihî û herêmî ti carî kêm nebûn. Ji vê jî xeternaktir, dewleta netewe her ku çû civak bi temamî mîlîtarîst kir û bi awayekî xist nav rewşa şer. Mirov ji civakên roja me ya îro re bibêje civakên di nava rewşa şer de rastir e. Rewşa şer a tê ferzkirin di du cihokan re dimeşe: Ya pêşî, cihoka rêya objektîv e, amûrên desthilatdarî û dewletê mîna torekê xwe li tevahiya çaviyên civakê dialînin dixin bin çavdêrî, kontrol û zextê. Rêya duyemîn, bi cihokên teknolojiya înformatîk (yekdestdariyên medyayê) a di pêncî salên dawî de ji aliyê naverokê ve bi şoreşekê pêş ket, li şûna civaka rastî civakeke ferazî da bicihkirin. Mirov ji herdu rewşên şer re dikare bibêje qirkirin an jî kokqelandina civakê. Tevî ku şêweyên qirkirinê yên berê bi sînor têne pêkanîn jî bi van qirkirinên nû yên zêde û dewamî têne kirin, dawiya xwezaya civakî tê amadekirin. Belkî afirînerên dişibin cureyê mirov hebûna xwe dewam bikin: lê weke girseya kerî û girseya faşîzmê. Bîlançoya qirkirin û kokqelandina civakê ji qirkirinên fizîkî girantir wê encama xwe diyar bike ango civak wê wesfê xwe yê exlaqî û polîtîk ji dest bide. Girseyên mirov ên li hemberî felaketên herî giran ên civakî û ekolojîk berpirsiyariyê his nakin, vê rastiyê ispat dikin. Kes nikare înkar bike ku rewşek heye ku rewşeke ji pêxîrtengî û krîzê wêdetir îfade dike. Dubare jî bibe, em ê careke din bi kurtî bînin ziman ka mirovatî çawa gihişt vê rewşê. Bawer dikim ku vegotineke bi vî rengî ji bo pêkanîna yekparetiya mijarê wê kêrhatî be.

**a-** Ji hiyerarşiyên pêşî yên desthilatdariyê û damezrandina serwertiyên dewletê heta roja me ya îro, dîrok, bi awayekî mezinbûna kumulatîf a desthilatdariyê ye, mîna guloka berfê her gindiriye xwe mezin kiriye. Hem mekan, hem demên zeman bi şerên desthilatdariyê yên

cewherê dîroka şaristaniyê bi xwe ne, tijî ne. Ji şerên xwecihî heta bi şerên dinyayê, ji şerên qebîleyan heta bi şerên neteweyî, ji şerên çînî heta bi şerên dînan, hemû bi pirrkirin û mezinkirina kumulatîf a desthilatdariyê bi encam bûne. Pirrkirina desthilatdariyê tê wê maneyê ku li ser nirxên civakî çînên weke kurtêlxuran debara xwe dikin pêş dikevin. Di destpêkê de rêveberiyê hiyerarşiyeke bi sînor pêkanî û carnan jî bi tecrûbe û pisporiyên xwe alîkariyên girîng kirin, lê kengî veguherî dewletê, hingê şêweyê kastan pêkanî. Komên kastan tevî xisletên xanedaniyê, xwe weke çînên cihêwaz bi rêxistin kirin û bi qasî ku bi îdeaya xwedatiyê rabin xwe cihêwaz kirin. Serdemên destpêkê desthilatdarî timî bi van îdeayan xwe mezin û bilind dike û dîrok bi qral xweda û împaratorên desthilatdar ên mînak tijî ne. Desthilatdarî û çînên dewletê yên xwe weke sêberiya rahib + rêveber + fermandar bi rêxistin kirin, dîsa jî bi vê rewşa xwe zumreyeke bi sînor bûn. Rêjeyeke pirr kêm a şêniyên civakî pêk dianîn. Lê em ji bêhejmar mînakan dizanin ku weke destpêka kurtêlxuriyê, li ser pişta civakê dibin barekî giran. Pîramît, perestgeh û arena wesfê vî barê giran gelekî baş rave dikin.

Di serdemên navîn de desthilatdariyê ji leza mezinbûna xwe ti tişt kêm nekir. Dîrok bi şerên desthilatdariyê yên li mekanên berfireh belavbûyî, tijî ye. Bêguman di vê de hilberîneriya civakê ya zêde dibe jî dibe hêman û sedem. Li xanedaniyên qralan çîn û tebeqeyeke berfireh zêde dibe. Lê tevî vê yekê jî mirov hê nikare behsa kansêrbûna çîna rêveber bike. Kengî burokrasî, bûrjûwazî û çîna navîn destpê kirin avahiya qraltî û arîstokrasiyê hilweşandin, veguherandin û bûn rêveberî û bi vî awayî bûn çînên desthilatdar, hingê felaketê destpê kir. Bêguman mirov dikare rêveberiyên berê jî weke felaket bi nav bike. Lê rêveberiyên berê hê di wê rewşê de nebûn ku civakê bi tevahî daqurtînin. Ji ber naverok û hejmara wan ji bo vê yekê derfet û îmkan wan peyda nedibûn. Tevî beşên yekdestdar ên jor ên bûrjûwaziyê, beşekî girîng ê bûrjûwaziya navîn û burokrasiyê bûn desthilatdar û bûn çînên dewletê û ev tê wê maneyê ku li şûna hêzên qraltî û çend xanedanên berê, bi hezaran, bi deh hezaran hêzên nû yên xanedaniyê têne bicihkirin. Tê wê maneyê ku li şûna qralekî bi

hezaran qral cih digirin. Di civaka cinsperest de kesayeta mêrê serwer bi vê hêza qraltiya nû re dibe yek û ev jî tê wê maneyê ku xwezaya civakî bi tevahî ji aliyê hêzên nû yên desthilatdariyê ve tê fetihkirin û mêtingehkirin. Di serî de jin, beşên civaka exlaqî û polîtîk hemû qurbanên vê mêtingehkirina hundir in.

Dewletbûna çîna navîn hê baş nehatiye analîzkirin. Ji ber ku zanista civakî hinekî têkiliya xwe bi vê çînê re heye. Ji bo dewlet li cem civakê maneyekê îfade bike, divê weke koma tecrûbe û pisporiyê ya ji sedî sed hewce ye, kêrhatî be. Zehmet nîne ku mirov fêhm bike, pisporî û tecrûbeya rêveberiyê li cem hejmareke gelekî bi sînor kes tê temsîlkirin. Lê burokrasî û bûrjûwazî bi gewdên xwe yên dêwane xwe weke çîna rêveberiya dewletê pêşkêş dikin û ev yek jî bivênevê desthilatdariyê mîna bûyereke kansêrolojîk di nava civakê de mezin dike.

Dewleta netewe û desthilatdarî ku yekbûna yekdestdariyên hegemoniya îdeolojîk û mêtinkariya ekonomîk bi amûrên desthilatdariyê re îfade dikin bûn her tişt. Civak jî bû hîç, bû ne tişt. Bûyera em jê re dibêjin krîza desthilatdariyê bi xwe ev e. Sîstema kapîtalîst bi rola hêza ku vê krîzê derdixe, radibe. Şebekeya kapîtalîst bi çîna xwe ya navîn a girs bûye û bi yekdestdariyên xwe yên sermayeyê yên li ser ekonomiyê di mezinbûnê de sînor nas nakin, bi tenê desthilatdarî weke dewleta netewe bi gewde bibe, dikare hebûna xwe dewam bike. Bûyera jê re tê gotin sîstem xetimiye jî ev e. Desthilatdarbûn rewşa ji krîzê wêdetir îfade dike.

**b-** Civaka exlaqî û polîtîk a normal rewşa xwezaya civakî ye, bi qasî ku bi ti dema dîrokî re neyê qiyaskirin di serdema me de bi mehrûmbûna xisletên xwe yên bingehîn re rûbirû ye. Tevahiya serdemên destpêkê û navîn civaka exlaqî û polîtîk a li dijî dewletê pêş ket, bi modernîteya kapîtalîst re neçar ma bi lez şûna xwe ji îdareya dewletê û xalên huqûqê yên pozîtîv ên pirrbûyî re biterikîne. Di modernîteyê de wesfên civaka exlaqî û polîtîk şûna xwe ji girseyên bûne kerî û endamên wê yên mîna moriyan bûne welatî û ti tiştî îfade nakin, hiştine.

Qaşo welatiyê modern ê ti fikara wî ya exlaqî û polîtîk nîne, berevajî wesfên wî yên têne gotin, dema herî qels a ferdbûnê îfade dike. Bi pîreka

xwe re ya li ser wê erka împaratoriyê pêk tîne, têkiliya wî ya civakî bi sînor e. Bi qasî ku bi dema firewnan re mirov nikaribe bide berhev di nava otorîteya desthilatdarî û dewletê de heliyaye, bûye hebûneke bê kesayet. Ya rastî bi hegemoniya îdeolojîk û fizîkî, xebatên înformatîk û teknîkî, ev kesayet bi tenê radestî nîzama yekdestdariyê nebûne, bê şert û merc bi dilê xwe bûne endamekî faşîst ê vê nîzamê. Bûyera ez jê re dibêjim krîza kesayetê jî ev e. Nabe ku xwezaya civakî ji kesayetên bi vî rengî pêk bê. Ji ber ku kom û çaviyên wê yên bingehîn bi wesfê exlaqî û polîtîk in. Wesfên em behsa wan dikin jî tu li ber rohniya tavê li wan bigerî di van kesayetan de nayê dîtin. Dewlet dikarin bi van kesayetan bimeşin. Lê ti civak nikare bi van kesayetan bimeşe. Ya rastî, kesayetên bi vî rengî înkara civakê îfade dikin.

Li gorî ku dewlet jî bê civak nabe, em careke din bi krîzekê re rûbirû ne ku di zikhev de bi hev re hatiye serê dewlet û civakê. Rewşa kesayeta bêkesayetiyê ya ferdperestiya kapîtalîst gihiştiyê, ji îrtîsama krîza hem hatî serê dewlet û hem jî serê civakê pêve tiştekî din nîne. Eşkere ye ku heta civak û ferd nekeve vê rewşê, ne sermaye ne jî yekdestdariyên desthilatdariyê û forma yekbûyî ya dewletê rêveberiya dewleta netewe jî mumkîn nabe. Krîza civakî, rewşeke ji krîza avabûnê wêdetir îfade dike. Mirov dikare li şûna avahiyekê ya nû ava bike. Lê dema ku wesfên bingehîn ên civakbûnê ji dest hatin dayîn, ev rewşeke welê nîne ku mirov bi jinûveavakirinê jê bibihure. Hewce dike ku civaka exlaqî û polîtîk ji nû ve were avakirin. Zor û zehmetî jî di vir de ye.

**c-** Bajarbûn yek ji hêmanên din ên herî bi krîz ê modernîteyê ye. Civaka bajêr a bi civaka gund-cotkariyê re di nava yekparebûnê de bi pêş ket fonksiyonên girîng ên civakî pêkanîn. Di pêşketina rasyonalîte (aqil) û îndustriyê de rola xwe ya civakî heye. Nakokiya xwe ya bi hawîrdorê re hê çênebûye. Pêvajoya dewletbûnê rola bajêr berevajî kiriye. Bajarê bi demê re veguherî baregeha çîna rêveber, bi pêvajoya dîrokî re dibe xwedî avabûn û zêhniyeteke li dijî civaka gund-cotkarî û ekolojiyê. Piştî ku bi çîna hilberîner re çîna bazirgan dibe xwedî statuyeke navendî, bajar bi fonksiyonên li dijî civakê bi bar dibe. Ev fonksiyonên neyênî yên di

serdemên pêşî û navîn de bi sînor bûn, bi moderniteyê re mîna çiyayan mezin bûn. Bajarên bi şoreşa pîşesaziyê re mîna kansêrê mezin û belavbûn, bûn navendên hilweşandina civaka ji rêûresmê. Bajarên pîşesaziyê ne bajar in, belê bêbajarbûna bajêr, ji wesfê bajarbûnê kirina wî ne. Bajarên şêniyên wan bûne mîlyon bidin aliyekî, bajarên şêniyên wan sed hezar jî bi mentiqê bajêr re li hev nakin. Bajarek bi tenê xwediyê mîlyonan şênî nabe, bajarên hejmara şêniyên wan di ser hev de dike mîlyon, dibin. Eger li deverekê bajarekî pênc mîlyon şêniyên xwe hebin, bi rastî li wir herî kêm pêncî bajar hene. Xisleta bajêr a civakê hildiweşîne di vê rastiya wê de veşartiye. Barê bajarên bi vî rengî, civak nikarin hilgirin, jixwe hawîrdor qet nikare rake.

Bi kîjan mentiqî bajarên bi vî rengî ji aliyê hejmarê ve mezin dibin. Armanc ji vê ew e, civaka kapîtalîst nebûye bikin mêtingeh, desthilatdariyan zêde bikin û çîna navîn bikin xwediyê statuya rêveber. Hersê hêman jî bi tesfiyekirina civaka exlaqî û polîtîk pêk tên. Bi tenê komên gund-cotkar û koçberan tesfiye nake; beşên bajêr ên ji rêûresmê yên xwedî fonksiyona erênî yên weke sinaetkar, zenaetkar, rewşenbîr û kedkarên din hem ji aliyê çanda maddî û hem ji aliyê ya manewî ve dixe pêvajoya tesfiyekirinê. Ji civaka bajêr ber bi girseya bajêr ve gavê diavêje. Yên ji derve tên; ji gund û zozanan tên, li keviyên bajaran bi cih dibin. Yên li vir bi cih dibin, bi hêsanî dixin kontrolê û dikevin kirasê mêtingehekê. Yekdestdariya sermayeyê û dewletê bajar, bajar jî yên ji derve hatî daqurtandine. Civaka nebûye civak jî hawîrdor daqurtandiye. Li gorî ku ne civaka li derveyî bajêr, ne hawîrdor, ne jî rewşenbîr û kedkarên bajêr ên ji rêûresmê mane ku karibin bajêr hilgirin, rewşa derketiye holê careke din rewşekê îfade dike ku ji krîzê wêdetir e.

Ne bi tenê felaketên hawîrdorê, qirkirineke rastî ya civakê bi vê kansêrbûna bajêr re yekser têkildar e. Tespîteke hevbeş a ku zanist gihiştinê ew e, bi gelek bajarên ku ne herêmek, welatek jî nikare wan hilgire, balansa ekolojîk a dinyayê derbên kuştinê dixwe. Nîşaneyên tesfiyeya li ser civakê tê ferzkirin jî ev in: welatiyên qelebalix ên

bêberpirsiyarî, girseyên bêkar û komên civaka exlaqî û polîtîk ên çîna navîn a rêveber a mîna girêkan mezin dibe, ew hilweşandine.

**d-** Yekdestdariyên dijberê ekonomiyê bi hêza xwe ya hegemonîk a her diçû mezin dibû, çavkaniyên ekonomîk bi pey daneheva sermayeyê ya karê xistin û ji bicihanîna pêdiviyên bingehîn ên civakê dûr kirin. Çawa ku tê bawerkirin kapîtalîzm sîstemeke berhemdar a ekonomiyê nîne, jixwe pêxîrtengiyên sîstemîk vê rewşa wê ya yekdestdariya dijberê ekonomiyê piştrast dikin. Tevî hemû tezên dijber ên polîtîka ekonomiyê, bi qasî ku bi ti demê re mirov nikaribe bide berhev, şebekeyên yekdestdariyê yên kapîtalîst ekonomî ji sîstemeke pêdiviyên bingehîn ên mirov hildiberîne veguherandine sîstemeke dewamî daneheva sermaye û karê pêk tîne. Pêşketinên zanist û teknîkî di wê astê de ne ku bi hêsanî pêdiviyên bingehîn ên mirov tedarik bikin. Rêveberiyeke rast a ekonomîk bi xebitandina teknîk û zanistê bi hêsanî dikare van pêdiviyan tedarik bike. Ji ber ku di rewşeke welê de daneheva sermaye û karê wê bikeve tehlûkeyê, ji pêşketina ekonomiyê re derfet û îmkan nayê dayîn. Di vê rewşê de dijbertiya ekonomiyê îcbarî dibe.

Divê di nava vê rastiyê de em li sedemên pêxîrtengiya sîstemîk û avabûnê bigerin. Di serî de bi bêkariya di dîrokê de mînakên wê nînin (Dîrok pirr kêm behsa kole û serfên bêkar dike), bi xizantî û birçîbûnê, bi krîz û pêxîrtengiyên xwe bi hilberîna kêm û zêde nîşan didin (şîddeta wan jî kêm û zêde dibe), bi amûrên çareseriyê yên ji rêûresmê bi şer û pevçûnên zêde û demdirêj dikin, bi awayekî rêveberiyeke krîzê pêk tînin. Dijbertiya ekonomiyê neçarî rêveberiya krîzê ye. Ji ber ku bi awayekî din rêveberî nabe. Divê mirov baş fêhm bike ku rêveberiya dewleta netewe rêveberiyeke krîzê ya anormal e. Civak ji civakbûnê derxistin û veguherandina wê ya girse û keriyekî faşîst bi tenê rêveberiyeke xweserî Hîtler nîne; bi karekterê mîlîtarîst ê dewleta netewe re têkildar e. Ji ber ku bi awayekî din nîzama yekdestdar nikare dewam bike, rêveberiya dewleta netewe weke forma desthilatdariyê ya dikeve çaviyên civakê hemûyan û bi tevahî dor lê digire, neçare bibe rêveberiya krîzê. Afirandina netewe

armanca wê ya talî ye. Milletperestî jî tevî hêmanên din ên îdeolojîk yek ji şêwazên vê rêveberiyê yên bivênevê ye.

Der barê yekdestdariyên kapîtalîst de yek ji şêwazên analîzkirinê yê mirov serî lê dide ew e, divê mirov pêxîrtengiyên bazirganî, sinaî û fînansê ji hev cihê bike. Herweha qonaxên pêxîrtengî û xweşhaliyê yên zêde têne mezinkirin û nepixandin ji nîşandana cewherê sîstemê gelekî dûr in. Çi xelekên navend-hawîrdor, çi hegemoniya-reqabet, çi jî pêxîrtengî-xweşhalî cewherê rastî yê sîstemê nîşan didin. Bêguman para van rastiyan hemûyan heye. Nexasim tespîteke rast e ku qonaxa hegemonîk a yekdestdariyên fînansê qonaxa herî zêde krîzê nîşan dide, îfade dike. Lê mirov heta li dijbertiya sîstemê ya ekonomiyê serwext nebe, ev rastî hemû wê zêde maneyeke xwe nebin, bi vê zanîn û têgihiştinê mirov analîzan pêş bixe, gelekî girîng e.

**e-** Xweber nîne ku krîza ekolojîk di dema modernîteyê de ji nişkê ve ket rojevê. Ev krîz bi dijberiya sîstemê ya ekonomiyê re têkildar e. Ji karekterê avabûna wê ye. Balansa biyolojîk bi awayekî bingehîn bi têkiliyên sîmbîotîk (bi awayekî beramber, hevdu xwedîkirin û dewamkirin) ên cureyan pêk tê. Nîzamekî bi vî rengî ya para mejiyê gerdûnî yê biyolojîk dikeve, pêk tîne. Me hewl dabû ku em jiyanê weke pêşketin û pêkhatina cudatiyan pênase bikin. Balans û tewazuna biyolojîk bi vê pîvanê ve girêdayî ye. Herweha me têkiliya pêkhatina cudatiyê bi qabîliyeta hilbijartin û azadiyê re jî destnîşan kiribû. Alema mîkro (paket û perçikên herî piçûk ên enerjî û maddeyê) û alema makro (di asta astronomîk de giravên mezin ên madde û enerjiyê) bi sîstemên bi heman rengî dixebitin. Şêwazên têkiliyê yên cudatiyê pêk tînin, mirov nikare sedemên wê bixe ber lêpirsînê. Vê gavê em qîma xwe pê tînin bibêjin “Ew ji ber ku hema wisa ne, wisa ne”. Belkî jî kêmasiya me ya zanîn û têgihiştina me ya şaş a zanistê, di têgihiştin û serwextbûna li rastiyê de me neçar û bêzar dihêlin.

Xwezaya mirov a civakî di têkiliyên xwe yên bi xwezayê re li pey vê pîvana gerdûnî diçe. Di heman demê de ji ber xwezaya xwe ya bi mejiyê herî nerm barkirî di qabîliyeta xwe ya azadî û hilbijartinê de cureyê herî

pêşketî ye. Yekdestdariyên antî-ekonomîk ên kapîtalîzmê bi vê pîvanê re nakok in, pê re li hev nakin. Têkiliya sîmbîotîk di avahiya hundir a civakê de vediguherîne serweriya herî mezin, têkiliya tehekum û desthilatdariyê, têkiliyên hawîrodrê bi ekolojiyê re jî vediguherîne têkiliyên hukimkirin û mêtingehkirinê. Çawa ku li cem kevzên kujer tê dîtin an jî çawa ku li cem cureyên bi heman rengî tê dîtin, bi awayekî yekalî tevahiya civakê û hawîrdorê dixe bin hakimiyeta xwe û gelekî girs dibe. Dibe hebûneke xwedî gewdekî dêwane (Levîathan). Sîstemeke xwe bi tenê sipartibe daneheva sermaye û karê, bi awayekî din tevnagere. Eger bi awayekî berevajî tevbigere ango têkiliyeke sîmbîotîk esas bigire, wê wextê qanûna karê nameşe. Sîstem wê neçarî veguherînê bibe.

Berevajî yeqîna giştî, xweza û hawîrdor bi sîstemên xwe yên mentiqê re xwedî balans û tewazunê ye. Eger mirov behsa esareta quwetên kor bike nirxandineke şaş e. Ya ev hasasiyet hilweşandiye, sîstema şaristaniyê û zêdetir jî modernîteya tehekumkar a yekdestdar a roja me ya îro ye. Çîna navîn a bûye hêza desthilatdariyê bi awayekî kansêrwarî mezin dibe, qadên bingehîn ên jiyanê bajar bi heman şêwazî kansêrolojîk mezin dibin, dinya bi zincîra dewleta netewe ve hat girêdan; ev hemû sedemên rastî yên civakî ne ku rê li hilweşîna hawîrdorê vedikin. Hem bi avahiyên xwezaya civakî yên bi mejiyê herî nerm barkirî re dibe dijber, hem jî têkiliyên sîmbîotîk ên bi xwezayê re vediguherîne têkiliyên tehekum û mêtinkariyê, bi vî awayî rê li hilweşînê vedike. Ji ber vê sedemê têkiliyeke xurt di navbera krîza civakî (ya rastî qirkirina civakê) û krîza ekolojîk de heye. Di herdu qadan de misêwa krîz hevdu xwedî dikin. Kara yekdestdaran bi awayekî îcbarî rê li zêdebûna şêniyan, bêkarî, birçîbûn û xizaniyê vedike, şêniyên zêde dibin ji ber vê bêkarî, xizanî û birçîbûnê neçar berê xwe didin xwezayê û wê talan dikin. Daristan, nebat û cîhana heywanan dikevin tehlûkeyeke mezin.

Bêguman ev rewş weke kara zêde li yekdestdariyan vedigere. Ev çerx wer dewam bike (mînak heke şêniyên dinyayê ji deh mîlyarî bibihurin û hê bêtir zêde bibin) wê balansa rakirinê ya dinyayê bi temamî ji hev de bikeve. Qiyameta mirov li bendê ne, bi vî awayî radibe. Şêweyê bi kansêr û

şêweyê bi tenduristî yê mezinbûnê çawa ku di asta hucreyê de şaşiyê dikin, li ber kansêr û mirinê rê vedikin, bi şêwazekî bi heman rengî mezinbûna kara yekdestdariyê jî mezinbûna bi tenduristî (di her asta xwezaya civakî de) asteng dike û bi vî awayî pêşketina kanserolojîk a civakî û hawîrdorî dide destpêkirin. Jixwe nexweşiyên kansêrê yên biyolojîk ên di cinsê mirov de weke encameke kansêrên civakî pêş dikeve û ev dikare ji aliyê bijîşkî ve bê ravekirin. Hebûneke mîna cinsê mirov ê ku asta mejiyê wî yê nerm herî bilind e, bi herhalî wê qabîliyeta wî ya hilbijartin û azadiyê ji moriyekê kêmtir nebe. Ma hatiye dîtin ku morî bêkar mane, mirov bi rewşa xwe ya heyî ya mejî çawa bêkar bimînin? Eger qanûna kar neyê parastin, bi rêkûpêkirinên ekolojîk bi serê xwe tenê dikarin tevahiya bêkariyê ji holê rakin û îmkanên karûbar bidin. Karûbarên bi armanca ekolojîk ji aliyekî ve wê hawîrdorê rizgar bikin, ji aliyê din ve jî dikarin ji binî ve dawiyê li bêkariyê bînin. Mirov dikare bi sedan qadên bi vî rengî bibîne. Lê wexta li gorî qanûna karê nebin, dikarin ji karûbar bêpar bêne hiştin. Têkiliya di navbera ekolojîkkirin û sîstemê de xwedî wesfekî bi krîz û nayê dewamkirin e.

**f-** Îdeolojiya hegemonîk a sîstemê lîberalîzm, ne bi şêweyê xwe yê klasîk ne jî bi şêweyê xwe yê neo nikare çareseriyê çêke. Lîberalîzma maneya gotina wê azadîxwazî ye, têgîneke têra xwe îzafî ye. Ya ji kesekî yan jî komekê re azadî be, dikare ji yê din re weke koletiyê xuya bike. Ji bo qralên xwedê yên serdema pêşî azadiya herî zêde weke çîna koledar a dijberê xwe afirandî ye. Azadiya ji bo arîstokrasiya serdema navîn bi kolebûna girseyên berfireh ên gundî û serfan pêkan bûye. Ji bo bûrjûwayên serdema nû lîberalîzm jî bi koletiya heqdestiya herî kêm a proleterên giştî yên bi awayekî koleyên nû, nîv-proleter û kedkarên din di zikhev de meşiyaye. Lîberalîzm bi maneya fermî jî ji bo tevahiya çînên dewleta netewe azadî ye, lê ji bo welatiyan ku evdên modern in, bêkartî, xebata bê heqdest, xizantî, birçîtî, newekhevîtî, tinebûna azadî û demokrasiyê ye. Divê mirov karibe baş bibîne ku lîberalîzm bi maneya rastî azadîxwazî nîne. Hegel dewlet weke amûrê herî baş ê azadiyê hesibandibû. Lê derket holê ku ev azadî bi tenê ji bo çînên dewletê û

burokrasiya wê ye. Bi gotineke din, ya ji bo yekdestdariyên desthilatdarî û ekonomiyê (giregir, kesên bijare û neqane) azadiya herî mezin e, ji bo tevahiya yên din bi her awayî koletî ye.

Gelekî girîng e ku mirov lîberalîzmê weke îdeolojî nas bike. Ji bo pênasekirinê mirov bi tenê jê re ferdiyetperestî û azadîxwazî bibêje kêm e. Lîberalîzm weke têgîn di Şoreşa Franseyê de bi têgînên wekhevîtî û biratiyê re derket pêş: Weke Lîbertê (azadî), Êgalîtê (wekhevî) û Fraternîtê (biratî) ya navdar. Weke têgîneke navendî, li rastê xwe muhafezekartî, li çepê xwe jî pêşî demokratîxwazî û paşê sosyalîst dîtin. Bi awayekî maqûl xuya bike rabû û anî ziman ku pêkan e, bê şoreşan sîstem (yekdestdariya kapîtalîst) were pêşdebirin û gav bi gav biberide. Muhafezekar, çi bi beridînê çi jî bi şoreşê bi temamî li dijî pêşketinê bûn. Qraltî, malbatgirî û dêr bi hişkî diparastin. Sosyalîst û demokratan jî ji bo guhertin bi lez bibin şoreş weke mecbûriyet didîtin. Xala hevpar a hemûyan jî modernîte bû. Herçiqasî hin aliyên li ber radibûn hebûn jî di xwemodernkirinê de xwe xwedî îdea didîtin. Bi xetên herî giştî veguherînê têra modernîstbûnê dikir. Jiyana modern a navenda wê Ewrûpa hîmê wê bi bajarbûnê hat danîn û bi Ronesans, Reform û Rohnîbûnê bi lez bû têgihiştina hersê îdeolojiyên sereke temsîl dikir. Pirsgirêk ew bû ku mesele di nuqteyekê de asê dibû, ew jî ev bû ka wê kî û kîjan, çi partî û kîjan îdeolojî, çi rêbaz û kîjan pratîk, çi çalakî û kîjan şer ê herî baş xwe bigihîne vê têgihiştinê.

Lîberalîzm ev rewş gelekî baş tespît kir. Haya xwe jê hebû ku modernîte bi mohra kapîtalîzmê pêş dikeve û zêdetir derfet ji bo pêşdebirina wê hene, ji lewra dereng nema, bi avahî û îdeolojiyên li dewrûbera xwe lîst. Xwe weke lîberalîzma çepgir û rastgir dabeş kir. Bi lîberalîzma rastgir muhafezekar bêtesîr kirin û ew kirin bazkekî ji nava xwe, bi lîberalîzma çepgir jî demokrat û sosyalîst qismî kirin yedekên xwe. Bi vî awayî li statuya navendî rûnişt. Di her zêdebûna krîzê de yek ji wan kir yedeka xwe û bi vî awayî xwe bi hêz dikir. Bi bûrjûwabûna arîstokratan beşekî karkerên tawizkar bûn sosyal demokrat û ev jî tevahiya rêveberiyên krîzê bi pêş ket. Pareke pirr kêm ji kara yekdestdariyê ji bo vê têrê dikir. Bi vî

awayî muxalifên dijberê sîstemê di sedsalên 19. û 20. de bi tenê nedihatin bêtesîrkirin, ji bo binyeya bi krîz di tevahiya pêvajoyan de were meşandin weke hêza yedek dihatin bikaranîn. Hegemoniya îdeolojîk a lîberalîzmê bi vî awayî dihat damezrandin.

Lîberalîzm ji bo hegemoniya xwe ya îdeolojîk dewam bike ji çar varyantên girîng ên îdeolojîk sûd wergirt:

**1-** Milletperestî bi awayekî bi tesîr bi kar anî. Çi di rewakirina şerên hundir û derve de, çi jî bi destê dewletê di pêkanîna netewe de milletperestî muttefîkê herî baş ê lîberalîzmê bû. Xeleka pêşî ya lîberalîzmê bi xwe vekirî ye. Ji bo ji krîzên herî giran bibihure di warê bikaranîna hisên millî de têra xwe bû xwedî tecrûbe. Milletperestî di asta dîn de bi îdeolojiyeke pîroz nixumandin. Di bin vê perdeyê de bi tenê bi hêsanî ji krîzan nayê bihurîn û dewamkirin, li aliyê din, yekdestdariyan sîstemên xwe yên herî giran ên mêtinkarî û zordestiyê bi heman perdeyê dikarîbûn veşêrin.

**2-** Rola milletperestiyê kirin malê îdeolojiya dînî ya ji rêûresmê. Lîberalîzmê, dînên ji rêûresmê yên ji xisletên wan ên exlaqî û polîtîk kirî, xistin bin hegemoniya xwe û ew millî kirin. Ya rastî, ew kirin dînên millî. Hisên dînî yên di civakê de rehên wan kûr diçin, bi hêsanî bi rengê milletperestiyê hatin boyaxkirin bi qasî milletperestiyê û heta jê zêdetir bi roleke pev bikelîne rabû. Hin caran herdu îdeolojî ketin zikhev û li ser bingehê dînî û etnîk hewl dan netewe ava bikin. Nexasim îdeolojiya Cihû û Îslamê bi hêsanî bi milletperestiyê re bûne wekhev. Dînên din jî (Xiristiyantî, dînên Rojhilata Dûr, dînên berê yên Efrîka yên ji rêûresmê) ji vê kêm neman û pirr neçû bi heman rolê rabûn. Lîberalîzmê jî bi cihokên dînî mîrateya çandî ya manewî ji şaristaniya kapîtalîst re ya mîrateya çanda maddî ya şaristaniyê dewr girtibû, dibir û bi vî awayî entegre dikir. Krîzên sîstemê hebûn ku gihiştibûn asta nabe ku dewam bikin. Ji bo li dawîhiştina van krîzan divê mirov rola îdeolojiyên milletperest ên dînî yên li lîberalîzmê hatibûn zêdekirin paşguh neke.

**3-** Îdeolojiya zanistperestiya pozitîvîst nexasim weke varyanta felsefî pirr bi hêz alîkariya lîberalîzmê kir. Îdeolojiya pozitîvîst a ji îtîbara bi hêz a zanistên xwezayî sûd wergirt, di warê tesîrkirina îdeolojiyên hem rastgir û hem jî çepgir de bi roleke sereke rabû. Weke etîketeke zanistî bi îdeolojiyan ve hat kirin û li ber jirêderxistinên mezin rê vekir. Nexasim mohra xwe li tevahiya gavavêtinên îdeolojîk ên çepgir xist. Sosyalîzma pêkhatî di vî warî de serê meseleyê dikişand. Bi zanistperestiya pozitîvîst ketin xefika modernîzma kapîtalîst. Di nava rastgiran de jî ekola herî li pêş a ku hêza xwe ji zanistperestiya pozitîvîst werdigirt, faşîzm bû. Bi vî awayî, pozitivîzmê ji serê herî radîkal ê çepgir heta bi serê herî radîkal ê rastgir, li guhereke fireh alternatîfên îdeololjîk ji lîberalîzmê re pêşkêş dikirin. Lîberalîzmê di şert û mercên her zeman û mekanî de ev alternatîf bi ser xwe ve kirin, bi kar anîn û di warê lidawîhiştina qonaxên krîzên avabûna sîstemê de herî zêde sûd wergirt.

**4-** Di dîrokê de cinsperestî herî zêde di serdema lîberalîzmê de weke hêmaneke îdeolojîk hat pêşdebirin û bi karanîn. Lîberalîzma ku civaka cinsperest dewr girt, qîma xwe pê neanî bi tenê jinê weke karkera bêheqdest di malê de bixebitîne. Bêtir zêdegavî kir, ew weke objeyeke cinsî kir meta û ew pêşkêşî piyaseyê kir. Bi vî awayî hê zêdetir bi dest xist. Li cem mêr bi tenê ked tê metakirin, lê ya jinê bi xwe, hem tevahiya bedena wê û hem jî ruhê wê tê metakirin. Ya rastî, bi vî awayî şêweyê koletiyê yê herî bi tehlûke hat avakirin. ‘Pîreka zilam’ herçiqasî sifetekî baş nebe jî îstîsmara li serê bi sînor e. Lê mirov bi tevahiya kesayeta xwe bibe meta, ev tê wê maneyê ku mirov ji koletiya dema firewnan xirabtir dibe kole. Li şûna mirov bibe koleyê kesekî an jî dewletekê, mirov bibe koleyê her kesî qatbiqat bi tehlûketir e. Xefika modernîteyê li pêşiya jinê daniye ev e. Bi awayê xuya dike jin li azadiyê vedibe, lê bi vî awayî jin dikeve statuya amûrê herî rezîl ê îstîsmarê. Ji amûrbûna reklamê bigirin heta bi seks û pornoyê jin amûrê herî bingehîn ê îstîsmarê ye. Ez bi hêsanî dikarim bibêjim, di hilgirtina kapîtalîzmê de herî zêde jin xistine bin barê giran.

Ji bo sîstemê, di warê pirrkirina mêtinkarî û desthilatdariyê de jin bi roleke statejîk radibe. Di nava malbatê de nûnerê dewletê zilam, li ser jinê

hem di warê mêtinkariyê de û hem jî di warê pêşdebirina desthilatdariyê de xwe berpirsiyar û xwedî erk dibîne. Zordestiya ji rêûresmê ya li ser jinê li her çaviyê belav dike û bi vî awayî zilam jî dike parçeyek ji desthilatdariyê. Bi vê rê, civak di asta herî jor de dikeve sendroma desthilatdarîbûnê. Statuya jinê fikir û hisa bê sînor a desthilatdariyê dide civaka zilam a serwer. Li aliyê din, ji pêkhatina karkertiya tawizkar heta bi bêkariyê, ji karkertiya bêheqdest heta bi heqdestiya herî kêm di her neyêniyê de ya berdêl pê didin dayîn jinên kedkar in; jin bi xwe ye. Îdeolojiya cinsperest a pevekirî ya lîberalîzmê ev mijar bi tenê ji rê dernexist û cuda nîşan neda; wekî din jî ji bo jinan bi ehemiyet veguherand varyeteyên îdeolojîk ên hatin pêşdebirin. Mîna tiştekî wisa ye ku mirov bi destê xwe koletiya xwe bide qebûlkirin. Mirov dikare bibêje, sîstem bi îstîsmarkirina jinê ji aliyê maddî û îdeolojîk ve bi tenê ji krîzên giran nabihure, hebûna xwe pêk tîne û misoger dike. Jin neteweya mêtingeh a herî kevin a dîroka şaristaniyê bi giştî û neteweya mêtingeh a herî nû ya taybet a modernîteya kapîtalîst e. Eger ji her alî ve rewşa krîzê di asta domnekirinê de be, di vê de para mêtingehkirina jinê di serî de tê.

Sîstema kapîtalîst a dinyayê di roja me ya îro de bi qasî pêxîrtengiyên giştî yên sîstemîk ên di bin hegemoniya yekdestdariyên fînansa global de bi awayekî hevpar xwedî krîzên xweserî fînansê jî ye. Pêxîrtengiyên giştî yên sîstemî (ji dijbertiya wê ya ekonomiyê ye) tevî krîzên xweserî fînansê (argumanên ji hilberîna pereyan, zêran, heta Dolaran û kaxizên ferazî hwd. timûtim qut dibe, têne temsîlkirin) di zikhev de, di pêvajoya herî aloz a dîroka xwe de ne. Sîstem heta niha bi awayekî bingehîn bi du rêyan ji pêxîrtengiyên xwe bihurîbû: Ya pêşî, bi desthilatdariya timî tê pirrkirin û amûrên zorê yên maddî yên dewleta netewe. Ev jî her cure şer, girtîxane, timarxane, nexweşxane, êşkencexane, getto, qirkirinên etnîk û kokqelandinên civakê ne. Ya diduyan, bi amûrên hegemoniya îdeolojîk ên lîberalî ên dewamî bi ser ve dibin û têne pêşdebirin. Di navendê de weke îdeolojî ew bi xwe ye û weke yên bi ser wê ve bûne jî milletperestî, dînperestî, zanistperestî û cinsperestî ne. Weke amûr dibistan, qişle,

îbadetgeh, organên medyayê, zanîngeh û herî dawî jî tevna înternetê ne. Divê mirov li vê, îndustrîkirina çanda hunerê jî zêde bike.

Lê belê zanyarên ji rêzê jî qebûl dikin ku herdu rê jî li şûna çareseriyê biafirînin rêveberiyên krîzê pêşde dibin. Bi qasî berê be jî ji pêxîrtengî û krîzan nayê bihurîn. Berevajî, krîz û pêxîrtengiyên îstîsnayî giştî û domdar dibin, demên normal dibin îstîsnayî û bi vî rengî herdu bi hev cih diguherin. Tevî ku di bingehê sîstemên şaristaniyê de hêmanên pêxîrtengiyê hene, civaka mirov ti carî li ya evqasî giran şahidî nekiribû. Eger civak ê dewam bikin, dema dirêj nikarin xwe li rêveberiyên krîzê ragirin. Yan ê ji hev de bikevin an ji hev belav bibin; yan jî wê li ber xwe bidin, sîstemên nû pêşde bibin û jê bibihurin. Niha em di demeke welê re derbas dibin.

## B- Rewşa Hêzên Dijberê Sîstemê

Dijbertiya sîstemê weke têgîn têra xwe bi pirsgirêk e. Beriya her tiştî gelo şaristaniyê jî digire nava xwe? Ji kîjan aliyan ve digire nava xwe yan jî li derve dihêle? Têkiliya sîstemê bi modernîteyê re çawa dibîne? Bêyî ku li beramberî modernîteya sîstemê raweste, gelo li derveyî sîstemê avakirina sîstemeke nû pêkan e? Çawa li modernîteyê serwext dibe, wê fêhm dike û dikare karekterê wê yê duberî tespît bike? Gelo têgihiştina wê ya modernîteya alternatîf heye? Heta bersiva van pirsan neyê dayîn, têgîna hêzên dijberê sîstemê wê maneya xwe nebe. Ne bi tenê porejeyên wan ên der barê paşerojê de, heta analîzên dîrokên der barê rabihuriyê de neyên kirin, zehmet e ku dijbertiyeke manedar a sîstemê were pêşdebirin. Di analîza xwe de ji bo ez ji van zehmetiyan bibihurim û bersivên potansiyel ên van pirsan pêk bînim, min têgîna şaristaniya demokratîk û modernîteya demokratîk esas girt. Ez yeqîn dikim ku ji bo mirov mîna rabihuriyê bi awayekî tewş li dora xwe nezîvire ev rêbazeke rast û lêgerîneke alternatîf e.

Tevî hemû avahiya xwe ya bi pirsgirêk hêzên dijberê sîstemê rastiyek in. Herî kêm bi qasî sîstemê bandor li serdema me jî kirine. Belkî sîstema

xwe weke teorîk û pratîk realîze nekirine, lê xwediyê koma mezin a tecrûbeyan in ku ev ne ya guftûgoyê ye. Hêzên dijberê sîstemê xwedî guhereke berfireh in, û tevî ku di navbera wan de cudatiyên girîng hene jî mirov bi awayekî eşkere dikare bibêje ku gelek nirxên hevpar jî parve dikin.

Mebest ji sîstemê kapîtalîzm e. Mirov nikare bi tevahî bibêje mebesta wan modernîte ye. Di warê herdu şaxên din ên modernîteyê îndustriyalîzm û dewleta netewe de gelekî ji hev cuda dibin. Di mijara şaristaniyê de zelal nînin. Bi fikrên xwe yên tevlîhev gelek caran dikarin di qutbên dijber de cih bigirin. Mirov pirr nikare bibîne ku utopyayên wan ên paşerojê ji modernîteyê dibihurin. Bihêlin jê bihurînê, mirov dikare bibêje ku sererastkirina wê esas digirin. Modernîteyeke bê kapîtalîzm dikare bersiva bernameya pirraniya wan bide. Lê hay jê nînin ku ev bi tenê utopya ye.

Bi giştî di mijara sîstemê de hemfikir in û herweha hemfikir in ku sîstem di krîzê de ye. Lê di warê gavavêtinê de di navbera wan de cudatî mezin dibe. Ji guherîna bi beridînê heta bi guherîna bi şoreşê, ji rêbazên aştiyane heta bi rêbazên şerxwaz gelek rêyên cuda têne pêşniyarkirin. Tevî ku yên guhertina dewlet û desthilatdariyê şoreş dihesibînin hene jî yên civaka bê dewlet û desthilatdariyê pêşniyar dikin jî hene. Bi awayekî bingehîn şax û rehên hemûyan digihîjin Şoreşa Franseyê. Avahiya wan a fikrê ji milletperestiyê heta bi kominîzmê, ji dînperestiyê heta bi pozitîvîzmê, ji femînîzmê heta bi ekolojiyê perspektîfeke fireh pêşkêş dike. Tevî ku bi van re gelekî di nav hev de ne jî haya wan ji van çênabe. Mirov der barê statuya wan a civakî de bi awayekî giştî û bingehîn dikare bibêje, beşa sereke ya li derveyî yekdestdariyên sermaye û desthilatdariya çîna navîn e. Ji van tevgerên ku pozîsyona wan li hemberî kapîtalîzmê her diçe zehmet dibe û rewşenbîrên perwerdeyeke modern a diyar dîtine pêşengiya wan dikin, ji himbêzkirina pirraniya civakê dûr in. Eger yên di kapîtalîzmê de berjewendiyên wan hene ji sedî deh bin, rêjeya muxalifan jî di vê astê de ye. Ji sedî heştêyê civakê ji bo herdu beşan civaka ne kapîtalîst e; ew di analîz û çareserkirinê de ne kirdar, belê di rewşa obje de ye. Dema

kapîtalîzm li ser civakê karê hesab dike, muxalif jî civakê bi tenê weke girseyeke ji derve tê kişandin û meşandin dibînin. Ji ber vê rastiyê nikarin ji modernîteya kapîtalîst bibihurin.

Em wexta diyar dikin ku li cem sîstemê krîzeke rêveberiyê ya pê dewam nabe heye, em behsa 'rewşeke şoreşger' a nû nakin. Rewşên bi vî rengî yên weke şertên objektîv ên şoreşê jî têne nirxandin di guftûgoyên rabihurî de gelekî hatin îstîsmarkirin. Mirov zêde nikare bibêje encamên serketî û baş jê hatin girtin. Ji krîzan têra xwe rêveberiyên krîzan derdikevin, lê dibe ku dijşoreşên hê dijwar jî derkevin. Belkî jî ya şensa xwe herî baş dimeşe şoreş e. Jixwe bi giştî rola wê ya di veguherîna şoreşan de zêde hatiye mezinkirin û pirranî jî şaş hatiye analîzkirin. Ne şoreş, belê cudatiyên sîsteman veguherînên bingehîn pêk tînin. Şoreş bi tenê di nava sîstemên dikevin navê de dikarin rê li ber guhertinên manedar vekin. Bêguman rast e, hêzên dijberê sîstemê ji krîz û pêxîrtengiyan gelekî bi tesîr dibin. Lê şaş e ku mirov hêviya xwe bi encama ji pêxîrtengiyan derkeve girê bide. Di demên rabihurî de şaşiyên bi vî rengî gelekî hatin kirin. Xeyal û hêviyên mirovan av û av çûn.

Sosyalîzma pêkhatî, demokrasiya sosyal û ekolên rizgariya neteweyî hê sedsalek derbas nekiribûn bi ser kapîtalîzmê ve bûn û vê yekê li ser dijberên sîstemê bandoreke mezin a neyênî kir. Hêza tevgeran gelekî kêm û qels bû. Ya rastî, ev rewş çavkaniya xwe ji fikrên wan ên programatîk, îdeolojiya şaş û kêmasiyên di binya wan de digire. Dema ku mirov avahiya wan a zêhnî lêbikole, mirov ê bibîne zêde ji lîberalîzm û modernîteyê nebihurîne. Lîberalîstên herî rastgir an jî yên herî çepgir jî bin, ev nabe asteng ku çi zû çi dereng bi lîberalîzmê bi encam bibin. Bi ser yekdestdariyên kapîtalîst ve dibin, ev jî bi têgihiştina wan a modernîteyê re têkildar e. Tevgerên postmodernîzm, dînperestiya radîkal, femînîst û ekolojîk zêdetir weke encama nerazîbûna ji van bûyeran nû derketine holê. Lê statuya wan a îdeolojîk û pratîk a heyî, dike ku mirov gumanê jê bike, ka gelo ew ê karibin qet nebe bi qasî dijberên sîstemê yên berê bi tesîr bin. Neolîberalîzm û dînperestiya radîkal ji ber vê sedemê hinekî bi tesîr dibin. Ji ber van sedeman dijbertiya sîstemê hewcedariya xwe heye di

warê entelektueliya radîkal, exlaqî û polîtîk de xwe nû bike. Di vê çarçoveya sereke de girîng e ku em hêzên dijberê sîstemê ji nêz ve nas bikin. Ev hewce dike û kêrhatî ye.

### a- Mîrateya Sosyalîzma Pêkhatî

Di serê wan tevgeran de tê ku bi zanebûn li ber sîstema kapîtalîzmê rabûye û nerazîbûna xwe nîşan daye. Bi gotina damezrînerên wê K. Marks û F. Engels, bi sê çavkaniyên sereke hewl didin sîstema xwe ya dijber pêşde bibin. Ev hersê çavkanî felsefeya Elman, polîtîka ekonomiyê ya Ingilîz û sosyalîzma utopîk a Fransî ye. Wer tê fêhmkirin ku ji felsefeya Elman materyalîzma diyalektîk, ji polîtîka ekonomiya Ingilîz teoriyên nirx, ji sosyalîzma utopîk a Fransî teoriyên têkoşîna çînî wergirtine. Bi senteza ji hersiyan pêk anîn, şîroveya xwe pêşde birin. Dema têde jiyan û muxalefeta pêşî kirin salên 1840-1850'î li pêxîrtengiya ciddî ya kapîtalîzmê rast tê û vê demê bandor li wan kiriye. Hêviyên wan çêbûne ku sîstem tavilê hilweşe. Pirsgirêkên Yekîtiya neteweyî ya Elmanyayê û pirsgirêkên komarê yên Franseyê jî di rojevê de ne. Ingilîstan weke hêza hegemon a sîstemê ber bi asta jor ve gav diavêje. Di sala 1848'an de şoreşên gel ên Ewrûpayê ji bo pêkhatina hêviyan weke nîşane hatine qebûlkirin. Li **Manîfestoya Kominîst** weke bernameya giştî ya van şoreşan hatiye fikirîn. Lîga Kominîstan jî weke rêxistin an jî partiya pêşî ya enternasyonal a giştî hatiye damezrandin. Ev herdu xebat pirr eşkere nîşan didin ku ji tevgerên şoreşger ên gel û pêxîrtengiya kapîtalîzmê li hêviya serketinê ne.

Wexta ku şoreş hatin tepisandin, hewcedarî dîtine ku hê bêtir hûrûkûr kapîtalîzmê lêbikolin. K. Marks weke mişextî li Londonê, li Kabeya kapîtalîzmê bi cih dibe. Ew û F. Engels timûtim hevdu dibînin. Xebatên **Enternasyonala Yekemîn** a sala 1864'an berhema vê demê ye. Yek ji bûyerên girîng ên vê demê ew e, tê gotin dibe ku şoreş dereng bikeve ango xebatên bi şêweyê beridînê qederekî dirêj bimeşin. Ji lewra xebatên parlementerî û sendîkayê di cih de hatine dîtin. Herçiqasî di sala 1871'ê de serhildanên Komina Parîs a Franseyê hêviyên wan nû kiribin jî pirr zû

tepisandina serhildanê kiriye ku di mijarên dîktatorî, desthilatdarî û dewletê de gelekî bifikirin. Ji ber ku li aliyê dewleta netewe sekinîne rê li muxalefeta anarşîstan vekirine û vê yekê guftûgoyên pêşî yên der barê revîzyonê de bi xwe re anîne.

Di salên 1880'î de îlana Duyemîn Enternasyonalê di bin bandora şovenîzma neteweyî de pêk hatiye. V.I. Lenîn bi xebata xwe ya bi navê **Enternasyonalîzma Proleteryayê û Kautskiyê Çerxkirî** vê pêvajoyê bi revîzyonîstiyê gunehbar dike. Partiya Sosyal Demokrat a Elman (Partiya Yekemîn) hê di wê demê de wê bi serkêşiya revîzyonîzmê (revîzyonîzma Bernstein) were gunehbarkirin. Şoreşa Cotmehê ya Rûsyayê hêviyên ji bo pêkhatina utopya kominîzmê (ya Komina Parîsê bi ser nexist, bi ser xistin) hê bêtir xurtkirine. Vê şoreşê li nava dinyayê rê li ber bûyer û pêşketinan vekir. Destek dan tevgera rizgariya neteweyî ya Tirk û Kurdan a Anatolyayê û di vê çarçoveyê de ev yek ji gavên wan ên pêşî bû, alîkarî dan serdema tevgerên neteweyî ji bo di asta jor de û bi awayekî serketî bimeşin. Mirina zû ya Lenîn, dema jê re têgotin têkoşîna bi tesfiyekariyê re, avakariya sosyalîst, di salên Şerê Cîhanê yê Duyemîn de têkoşîna antî-faşîst, di dema şerê sar de Pakta Varşovayê ya li dijî NATO'yê hat avakirin, xebatên ezmanî, bi kapîtalîzmê re pêşbaziya ekonomîk û desteka zêde ya ji bo tevgerên rizgariya neteweyî bîlançoya sereke pêk tînin. Di vê demê de salên 1920'î Enternasyonala Sêyemîn hatiye nûkirin, lê mîna Enternasyonala Duyemîn ji ber çaresernebûna dewleta netewe ji hundir ve tesfiyekarî pêk hatiye. Rûsya Sovyetê weke namzetê hegemoniyayeke nû ji sê parên dinyayê li parekê bi tesîr dibe. Wê tevgerên sosyalîst ên di nava dewleta netewe de bi serê xwe hiştine û ketiye heman rêya revîzyonîst (Yekemîn Partiya Sosyal Demokrat a Elman). Partiya Kominîst a Yekîtiya Sovyetê êdî li ser rêya kapîtalîzmê ye. Berxwedana Çîn (dema Mao 1960-76) û Arnawûd a dem kin ti encam nedaye. Tevgerên rizgariya neteweyî û tevgerên karkeran ên sendîkalîst pirr zû bi sîstema kapîtalîst re entegre bûn, di salên 1980'î de Çîn, di salên 1990'î de Rûsya û hevgirtiyên wê ji sosyalîzma pêkhatî dest kişandin û bi îlankirina vê re dawî li demekê hat.

Tecrûbeya dused salî (eger em Serhildana Franseyê esas bigirin) ya weke sosyalîzma pêkhatî tê binavkirin, derfet û îmkanê dide ku em van tevgeran karibin lêbikolin û binirxînin.

**1-** Wer tê fêhmkirin ku zêdetir li ber yekdestdariyên taybet radibin, kapîtalîzma dewletê weke hem yekdestdariya sermayeyê û hem jî ya desthilatdariyê li derveyî rexnekirinê dihêlin. Di analîzkirina mijarên desthilatdarî û dewletê de seresere ne, û ev jî ji ber vê meyla wan a sereke ye. Weke hêzên dewlet û desthilatdariyê, wan bi xwe ji dil bawer kiribû ku wê sosyalîzmê ava bikin. Li rêyeke din nikarin bifikirin. Demokrasiyê jî ji aliyê herdu çînan (bûrjûwa-proleteya) ve bi awayekî weke dîktatoriyê şîrove dikin. Ji ber polîtîka ekonomiyê ya Ingiliz a ku xwe disipêrinê, analîzên gelekî teng ê kapîtalîzmê kirine.

**2-** Ji bingehê çînî yê modernîteyê bê xeber xuya dikin an jî zêde hewce nedîtine ku bikin mijara analîzan. Dema kirine jî bi temamî bûne mînakeke rastgir a jirêderketî. Lingê pêşî yê modernîteyê kapîtalîzmê jî nikarîbûne ji bingehekî li ser patron-karker, kar-heqdest, berhemê zêde wêdetir bibin. Nikarîbûne bibînin ku kapîtalîzm şêwazekî danehevê ye ku hebûna wê ta ji dema Sumeriyan ve tê. Kapîtalîzma sêsed salî ya bajarên Îtalyayê destpêka sîstemê nehesibandine. Gavavêtina kapîtalîst a Hollanda û Ingilîstanê di sedsala 16. de bi awayekî destpêka dîrokî hatiye hesibandin. Pesnê duyemîn lingê girîng ê modernîteyê îndustriyalîzmê daye. Ji aliyê naverokê ve têkiliya wê bi kapîtalîzmê re û fikarên paşê derkevin holê nekirine mijara rexneyê, berevajî roleke xelaskar danê. Lingê kapîtalîzmê dewleta netewe jî pêşketin hatiye hesibandin û paşê derî li neteweyî û şovenîzma sosyal hatiye vekirin. Li şûna konfederalîzmê dewleta neteweyî ya navendî tercîh kirine. Mîna dîroknasên şaristaniyê yên ji rêûresmê, rûyê din ê modernîteyê weke ‘paşvemayîn, di xew de bûn, barbartî, tevgerên paşverû, berevajî zîvirandina çerxa dîrokê’ nirxandine û xwe ji vê paşve nedane.

**3-** Weke bîrdozî şêweyê materyalîst ê herî çor ê pozitîvîzmê weke zanistperestî qebûl kirin û bi vê di vê qadê de ketin nava şaşiyeke dîrokî. Sosyalîzma ava kirin, di heman asta pêkanînên Darwîn û Newton yên li

qada fizîk û biyolojiyê de zanistî hesibandin. Nêzîkatiyên wan ên civaknasiyê ji Darwînîzmeke çor wêdetir neçûye. Hewce nedîtine cudahiya naveroka xwezaya civakî diyar bikin, bawer kirine ku bi Xwezaya Yekemîn re bi heman wesfan girêdayî qanûnan in, bi vî awayî jî derî li determînîzmeke hişk vekirî hiştine. Hêzên pêvajoyên paşê hatin ji vî deriyê vekirî mayî sûd wergirtin û şîroveyên wan ên herî vulger jî bi rastiyên hişk ên zanistî re wekhev hatin hesibandin.

**4-** Xwe bi giştî li analîza desthilatdariyê, bi taybetî jî ya dewleta netewe ranekişandine, bi tenê weke komîsyonên karûbarên bûrjûwaziyê pêk tînin qebûl kirine. Aliyê herî kêm ê teoriya wan ew e, nikarîbûne analîz bikin ku desthilatdarî bi taybetî jî dewleta netewe yekdestdariya xurtbûyî ya kapîtalîzmê ye. Analîzên kirine jî ji erênîkirina dewleta netewe wêdetir tiştekî din nîne. Ji xwe piştrast in ku sosyalîzm herî baş bi dewleta netewe wê were avakirin. Ji analîza dewletê ya Hegel nikarîbûne bibihurin, qet guman nakin ku dewletê bi dest bixin, dikarin her tenzîm û pêşdebirina azadî û wekheviyê weke amûrekî bi kar bînin. Yek ji mijarên sereke yên şaş û seresere destnîşan dikin, têkiliya demokrasî û sosyalîzmê ye. Şoreşên Çîn û Rûsyayê jî di çarçoveya van nêzîkatiyan de pêş ketin. Desthilatdariyên sosyal demokrat û rizgariyên neteweyî yên din jî pirr zêde ji van cuda nebûn. Cudahiya wan ji kapîtalîzma taybet ew e, kapîtalîzma dewletê tercîh kirine. Bicihanîn û meşandina wan a desthilatdariyê vê rastiyê pirr zelal nîşan dide.

**5-** Rexnekirina şaristaniyê pirr kêm û seresere ye. Pirr zêde neanîne ziman ku qonaxa şaristaniyê ya kapîtalîst parçeyekî şaristaniya dîrokî ye, û xeleka dawî ya zincîra sereke ye. Hewcedarî nedîtine ku karekterê dîrokî yê desthilatdariyê ango daneheva kumulatîf destnîşan bikin. Pirr ji xwe re zêde nekirine derd ku wê bi hêsanî sîstema wan jî bi heman rengî bibe desthilatdarî û şaristaniyek. Li şûna fêhm bikin ku desthilatdarî daneheva sermaye, qirêjî, şer, derew, krêtî û êşkenceyê ye, hewl dane teoriya wê bikin ka di dîrokê de çawa amûrekî pêşdebirinê ye. Dîrokê ispat kiriye ku ew di van fikrên xwe de şaş û neheq in.

**6-** Hewcedarî nedîtin rûyê duyemîn ê dîrokê weke qutbê duyemîn ê diyalektîka dîrokî hêzên antî-şaristaniyê analîz bikin ku ew bi xwe jî bi ser vî qutbî ve têne hesibandin. Şîroveyên der barê van hêzan de kirine jî bi giranî neyênî ne. Mêtingeriya kapîtalîst a li Emerîka, Asya û Efrîkayê weke pêşketin anîn ziman û xwe ji vê jî paşve nedane. Dijberên xwe rexne kirine ku civaka kevin diparêzin.

Nikarîbûn bibinîn ku qutba dijber a şaristaniyê xwedî giranî, rêûresmeke demokratîk, berxwedan, wekhevî û lêgerîna dadê û tecrûbeyên kominalîteyê ye, û sedema vê korbûna wan jî ji nêz ve têkiliya xwe bi rastiya çîna bûrjûwa û bûrjûwaya piçûk re heye. Bêguman nikarin bibînin, ji ber ku yên ji van çînan hatine çavên wan ên van rastiyan bibînin nînin.

**7-** Nêzîkatiya wan a gerdûnparêz, li ser xeteke rast û pêşketî der barê xwezaya civakî de zû dereng ew gihandine têgihiştina sosyalîzma pêk bê. Eskatalojiya (baweriya bi axîretê) di Pirtûkên Pîroz de bi awayekî weke sosyalîzmê xwe daye der. Civak li ser xeteke rast weke modelên pêş dikevin bi navê destpêk, koledar, feodal, kapîtalîst û sosyalîst teswîr kirine. Li vir bi awayekî din têgihiştina çarenûs û qederê heye. Ev têgihiştinên dogmatîk ên hûrûkûr em ji wan bi tesîr bûne di bingehê wan de çarenûsperestiya dînî û baweriya axîretê heye. Dereng haya wan ji vê çêbû û ev cihê xemê ye. Nikarîbûn analîz bikin ku bi awayekî bingehîn wesfê xwezaya civakî exlaqî û polîtîk e, lê sîstemên şaristaniyê van wesfên wê dirizînin, li şûna wan pîvanên huqûqê yên çor û îdareya dewletê datînin, moderniteya kapîtalîst vê pêvajoyê bê sînor, kûr û berfireh pêşve dibe û ev ji aliyê ekonomîk, civakî, desthilatdarî û dewletî ve krîz e. Ya rast, qenc û bedew bi pêkanîneke tam a wesfên exlaqî û polîtîk ê civakê û ji bo vê jî pêşbîniya sîstema konfederal a demokratîk a bi siyaseta demokratîk dimeşe nekirine. Ji vî alî ve analîz û çareserî nehatine kirin. Nikarîbûne bibînin ku civaka azad, wekhev û demokratîk bi amûrên desthilatdarî û dewletê nayê pêkanîn, berevajî bi van amûran re nakok e; herweha nikarîbûn teorîze û pratîze bikin ku herdu bi tenê li ser bingehê hebûna hevdu qebûl bikin û bi aştiyeke bi prensîb dikarin bi hev re bijîn. Dema ku

weke paradîgma bingehîn şoreş-desthilatdarî-sosyalîzm hat qebûlkirin, divê mirov matmayî nemîne ku di encamê de ji kapîtalîzma dewletê pê ve tiştekî din pêk neyê.

Maneyeke din a bi kapîtalîzma dewletê bi encambûna sosyalîzma pêkhatî, bi bingehên wê yên çînî re têkildar e. Ez divê careke din dubare bikim ku bûrjûwa û bûrjûwaya piçûk û burokrasiya pirraniya wê ji van çînan hatî dema ku ya hêvî dikin ji yekdestdariyên taybet peyde nakin, nikarin sermayeyê kom bikin, heta ên di destê xwe de jî diferikînin, hingî alternatîfa wan a bi tenê ew e ku bi destê dewletê bibin sermayedarên kolektîv. Diyardeya jê re bûrjûwaya millî û kapîtalîzma millî tê gotin jî ji vê pêve tiştekî din nîne. Kapîtalîzma dewletê û yekdestdariyeke kolektîv, bi gotineke din weke dewleta netewe statuyeke gelekî bi hêz bi dest dixin. Ji lewra dewletdariya netewe ya sosyalîzma pêkhatî bi hêztir e. Ev bingehê maddî, bi hêsanî yekparebûn û lihevkirinên xwe yên bi modernîteyê re rave dike.

**8-** Tevgerên çandî, ekolojî û femînîzmê li dijî têkoşîna çînî weke asteng hatine dîtin. Jin ne bi tenê bi keda xwe, bi tevahî beden û ruhê xwe kirine mêtingeheke giran û ev rewşa jinê bi awayekî berfireh nehatiye analîzkirin. Nekarîne ji pîvanên wekheviyê yê huqûqa bûrjûwayê bibihurin. Di dîrokê de ev kedkara herî kevin û nû, bi pirranî bêheqdest û carnan jî bi heqdesta herî kêm, li gorî dîroka serwer a zilam ji objebûnê wêdetir ti mane îfade nekiriye. Eşkere ye ku çîna hatiye analîzkirin a zilam e. Bi heman awayî nêzî ekolojiyê jî bûne. Tevî ku pêşbîniya van pirsgirêkan nehatiye kirin, herweha hatiye îddîa kirin ku wê bi awayekî neyênî bandorê li yekparetiya têkoşîna çînî bike. Tevgerên çandî jî weke hêmanekî din ê ku têkoşîna çînî xira dike, hatiye qebûlkirin, bi sedema ku kevinbûnê zindî dikin. Di encamê de çînîperestiyeke mucered bi ekonomîzmê xeniqiye û ji hevgirtiyên xwe yên muhtemel qutbûyî derketiye holê.

**9-** Çînîbûn di çarçoveya exlaqî û polîtîk de weke pêşketineke neyênî nehatiye dîtin; weke pêdiviyeke azadî, pêşketin û qenciyê qonaxeke îcbarî hatiye qebûlkirin. Nikarîbûne fêhm bikin ku bi awayekî objektîv pêkhatina

çînî ji çînên dewlet û desthilatdariyê re xizmet e. Koletî, serftî û proletertî ji bo pêşketina dîrokî û li hemberî xwezayê ji bo azadiyê weke berdêlên divê bêne dayîn, hatine şîrovekirin. Berevajî, hersê şêweyên çînîbûnê xwedî heman cewherî ne, têkiliya xwe bi azadî û pêşketinê re nînin, civaka exlaqî û polîtîk nikare bi van pêkhatinan re bijî û li ser vî bingehî weke şîroveyeke dijber mirov bi hêsanî dikare bibêje, li dijî van çînîbûnan têkoşîna exlaqî, polîtîk û entelektuel divê.

Mîrategirên îro yên tevgera sosyalîzma pêkhatî ya dused salî bi sînor be jî ketine pozîsyoneke xwerexnekirinê, lê mirov nikare bibêje, ji binî ve xwe vediguherînin. Di demeke welê re derbas dibin, di warê pêewlebûnê de pêxîrteng in, û qelsbûyî ne. Dîsa jî di dîrokê de tevgerek e ku cihê wê heye. Herçiqasî nikarîbûn ji sîstema kapîtalîzmê bibihurin jî têra xwe ew mijûl kirine. Di gihiştina heta îro de hem xwediyê para erênî û hem jî xwediyê para neyênî ne. Pêxîrtengiya ketinê parçeyek ji pêxîrtengiya avabûna sîstemê bû. Dîsa jî nêzîkatiya herî rast ew e, mirov sosyalîzma pêkhatî weke tevgereke herî zêde bandor li dijberên sîstemê kirî, qebûl bike û bi dersên ji mîrateya wê bigire, wê weke parçeyekî avakirina moderníteya demokratîk di warê helwest û hevgirtinan de binirxîne.

## b- Ji nû ve Nirxandina Anarşîzmê

Tevgerên anarşîst bi sosyalîzma pêkhatî re hemsal in, û bi Şoreşa Franseyê re rehên xwe berdane. Piştî jihevdektina sosyalîzma pêkhatî, ya rastî piştî ku sosyalîzma pêkhatî bi sîstemê re bû yek ji nû ve nirxandinê heq dike. Îro hê baştir tê fêhmkirin ku nûnerên wê yên navdar Proudhon, Bakûnîn û Kropotkîn di rexneyên xwe yên li sîstemê û sosyalîzmê de bi tevahî neheq nînin. Tevgerek e ku kapîtalîzmê ne bi tenê weke yekdestdariya dewletê û taybet, belê weke moderníte jî rexne dike û xwe ji vê paşve nade, herweha li serê herî dijberê sîstemê cih digirin û bi vê rewşa xwe balê dikişînin ser xwe. Hem ji aliyê moralîst, hem jî ji yê polîtîk ve rexneyên li desthilatdariyê dikin, bi awayekî girîng para rastiyê di wan de heye. Bandora avahiyên civakî yên jê hatine bi awayekî diyarker li ser

tevgerê heye. Beşên arîstokrat ên kapîtalîzmê ew ji desthilatdariyê xistine û zenaetkarên bajêr ên bi awayekî îzafî rewşa wan hê bêtir hatiye xirabkirin, nerazîbûnên wan ên çînî vê rastiyê nîşan didin. Ferdî mane, nebûne xwediyê zemînekî bi hêz, nikarîbûne sîstemeke dijber pêk bînin, ev ji nêz ve bi avahiya wan a civakî re têkildar e. Pirr baş dizanin ku kapîtalîzm çi dike, lê baş nizanin ka divê ew çi bikin. Eger em bi kurtî fikrên wan kom û îfade bikin;

**1-** Sîstema kapîtalîst ji aliyê herî çepgir ve rexne dikin. Baştir fêhm dikin ku sîstem civaka exlaqî û polîtîk ji hev belav dike. Mîna Marksîstan roleke pêşdebir nadinê. Bi awayekî erênîtir nêzîkî wan civakan dibin ku kapîtalîzm wan ji hev belav dike. Ew civakên bi vî rengî paşvemayî û mehkûmê rizînê nabînin. Li ser piyan mayîna wan, zêdetir exlaqî û polîtîk dibînin.

**2-** Nêzîkatiya wan a desthilatdarî û dewletê li gorî Marksîstan hê berfirehtir û realîstir e. Yê dibêje desthilatdarî ji sedî sed xirabî ye, Bakûnîn e. Dibêjin, di berdêla çi de dibe bila bibe divê dewlet û desthilatdarî tavilê ji holê bêne rakirin. Ev nêzîkatî û xwesteka wan utopîk e, û di pratîkê de şensê xwe yê pêkhatinê nîne. Dikarîbûn pêş bibînin ku bi xwesipartina dewlet û desthilatdariyê sosyalîzm nayê avakirin û hewldaneke bi vî rengî belkî jî bi kapîtalîzmeke burokratîk a bi tehlûketir bi encam bibe.

**3-** Pêşbîniya dewleta netewe ya navendî kirin ka wê çawa ji bo tevahiya çîna karker û tevgerên gelan bi felaket be û derbên mezin li hêviyên wan bide. Ev pêşbîniya wan realîst bû. Di mijara yekîtiya Emanya û Îtalyayê de jî Marksîst rexne kiribûn û di vê de jî mafdar derketine. Dîsa ji wan xusûsên girîng e ku divê mirov diyar bike û bîne ziman ku gotine, eger dîrok li gorî dewleta netewe pêşde biçe wê ji bo utopyayên azadî û wekheviyê zirareke mezin be û ji ber ku Marksîstan helwesta xwe ji bo dewleta netewe nîşan da, ew bi tundî rexne kirin û bi xiyanetê gunehbar kirin. Ew bi xwe xwedî li konfederalîzmê derketine.

**4-** Fikir û rexneyên wan ên der barê burokratîzmê, îndustriyalîzmê û bajarbûnê de jî bi giranî hatine piştrastkirin. Helwesta xwe ya antî-faşîst û ekolojîk pirr zû nîşan dan û di vê de para van fikir û rexneyan bi awayekî girîng heye.

**5-** Rexneyên li sosyalîzma pêkhatî dikirin, bi hilweşîna sîstemê hatine piştrastkirin. Ji wan beşan bûn ku herî baş teşxîs kiribûn ku ya hatiye damezrandin ne sosyalîzm e, kapîtalîzma burokratîk a dewletê ye.

Tevgera anarşîst mirov difikirîne, tevî evqasî fikir û rexneyên hatine piştrastkirin û girîng li gorî sosyalîzma pêkhatî nikarîbûye girseyî bibe û şensê pratîzekirinê bibîne. Ez yeqîn dikim ku ev ji seqetî û kêmasiyeke ciddî ya ji teoriya wan tê. Kêmasiya analîzên wan ên şaristaniyê û ji ber ku nikarîbûn sîstemeke şaristaniyê ya karibe pêk bê, pêşde bibin. Analîzên civaka dîrokî û pêşniyarên çareseriyê zêde nikarîne pêşde bibin. Herweha li ser wan bi xwe jî bandora felsefeya pozitîvîst heye. Mirov nikare bibêje ku zêde karîbûne derkevin derveyî zanista civakî ya navenda wê Ewrûpa ye. Li gorî min kêmasiya wan a herî mezin ew e, di mijara siyaseta demokratîk û modernîteyê de nikarîbûne bikevin nav fikir û avabûna sîstematîk. Hewldana hûrûkûr a der barê rastbûna fikir û rexneyan de nîşan dane, di mijara sîstemkirin û pêkanînê de nikarîbûne nîşan bidin. Belkî jî statuya wan a çînî di vî warî de asteng e. Yek ji astengiyên din ên girîng ev e: Di fikrên xwe yên teorîk û jiyana xwe ya pratîk de nerazîbûna wan a li dijî her cure otorîteyê. Reaksiyona mafdar a li dijî desthilatdarî û otorîteya dewletê nîşan dane, li beramberî tevahiya şêwegirtinên otorîte û nîzaman nîşan dan û vê yekê kiriye ku modernîteya demokratîk ji aliyê teorîk û pratîk ve nexin rojeva xwe. Ez yeqîn dikim ku mijara herî girîng a divê xwe rexne bikin ew e, nikarîbûn rewabûna otorîteya demokratîk û pêdiviya bi modernîteya demokratîk bibînin. Herweha li şûna dewleta netewe nikarîbûn alternatîfa neteweya demokratîk pêşde bibin û ev jî kêmasiyeke girîng e, û mijara xwerexnekirinê ye.

Bi hilweşîna sosyalîzma pêkhatî re di roja me ya îro de tevgerên ekolojîk û femînîst tevî civakparêziya sivîl bi giştî pêş ketin û bêguman vê yekê bandoreke erênî li anarşîstan jî kir. Lê timî dubare dikin ku mafdar

derketine, ev zêde tiştekî îfade nake. Pirsa divê bersiva wê bidin ev e, çima nikarîbûn çalaktiyeke sîstemê ya bi îddîa û avakirina wê pêşde bibin. Ev jî jihevdûrbûna teorî û jiyana wan tîne hişê mirov. Ew jiyana modern a timî rexne dikirin, gelo bi xwe karîbûn jê bibihurin? Ya rastî, di vê mijarê de gotin û gavên wan çiqasî hevdu digirin? Gelo wê karibin dev ji şêwazê jiyanê yê navenda wê Ewrûpa berdin û gav biavêjin modernîtiyeke demokratîk a global a rastî?

Rexne û pirsên bi heman rengî mirov dikare gelekî zêde bike. Ya girîng ew e, ev tevger û mîrateya wê ya di dîrokê de fedekariyên mezin kirine, fikirdarên girîng di nava xwe de hewandine, bi fikir û rexneyên xwe di civata entelektuel de cihekî girîng girtiye, karibe di nava sîstemeke dijberê sîstemê de bi awayekî hevgirtî û pêşde biçe were birêkûpêkirin. Mirov dikare li bendê be ku anarşîst ji sosyalîstên reel bi awayekî hêsantir xwerexne bikin û berê xwe bidin pratîkê. Gelekî girîng e ku di têkoşîna xwe ya ekonomîk, civakî, siyasî, entelektuel û etîk de cihê heq dikin, bigirin. Anarşîst li ser zemînê Rojhilata Navîn di nava têkoşînên şaristanî û şaxên wê yên çandî de hem karin xwe nû bikin û hem jî alîkariyeke bi hêz bikin. Di xebatên jinûveavakirina sîstema modernîteya demokratîk de yek ji hêzên girîng e ku mirov dikare pê re îttîfaqê bike.

### c- Femînîzm: Serîrakirina Mêtingeha Herî Kevin

Têgîna femînîzmê bi Kurdiya xwe tê maneya ‘tevgera jinîtiyê’ (Tevgera ji bo mafê Jinan). Ji lewra bi temamî rengê pirsgirêka jinê nade û dijberê wê jî weke mêrîtiyê were tesewirkirin wê hê bêtir meseleyê sêr û stewr bike. Mîna ku bi tenê maneyeke weke ‘jina bindest a mêrê serwer’ nîşan dide. Lê rastiya jinê hê berfirehtir e. Ji cinsiyetê wêdetir şaxên wê yên berfireh ên ekonomîk, civakî û siyasî hene. Eger em têgîna mêtingeriyê ji çarçoveya welat û neteweyan derxin û daxin asta komên mirovan, mirov bi hêsanî dikare statuya jinê weke mêtingeha herî kevin pênase bike. Bi rastî, ti diyarde weke ruh û beden bi qasî jinê nehatiye mêtin û nebûye

mêtingeh. Divê baş were fêhmkirin ku sînorên jinê di statuyeke mêtingehê de tê hiştin ku bi hêsanî mirov nikare diyar bike.

Çawa ku di tevahiya zanistan de heye, vegotina mêrtiyê mohra xwe li zanista civakî jî xistiye û rêzên vê zanistê yên behsa jinan dikin, bi nêzîkatiyên propagandîf ên hîç behsa rastiyê nakin, tijî ne. Çawa ku dîrokên şaristaniyê yên çînî, mêtinkarî, zordestî û êşkenceyê statuya rastî ya jinê dinixumînin, ev vegotin belkî jî çil qat ji wan zêdetir dinixumîne. Li şûna femînîzmê têgîna jineolojiyê (zanista jinê) belkî çêtir bersiva armancê bide. Diyardeyên jineolojî wê derxe holê bi herhalî wê der barê gelek beşên teolojî, eskatalojî, polîtîkolojî, pedagojî û welhasil heta sosyolojiyê de ji loji'yên wan kêmtir xwedî pareke rastiyê nebin. Hem ji aliyê fizîkî ve hem jî ji aliyê maneyê ve jin beşê herî berfireh ê xwezaya civakî pêk tîne û ev ne ya guftûgoyê ye. Hingê çima ev parçeyê herî girîng ê xwezaya civakî nebe mijara zanistê? Sosyolojî gelek beşên xwe hene û heta pedagojî jî beşek ji wê ye, û der barê perwerde û hînkirina zarokan de ye. Zanisteke evqasî hatiye dabeşkirin çima jineolijiyê pêk nayîne û gelo ev xusûs ji vegotina wê ya bi serweriya mêr û pêve bi tiştekî din tê ravekirin.

Heta xwezaya jinê di tariyê de bimîne, wê tevahiya xwezaya civakê rohnî nebe. Xwezaya civakî bi awayekî rastî û berfireh were rohnîkirin, hingê rohnîkirineke rastî û berfireh a xwezaya jinê mumkîn dibe. Ji dîroka mêtingehkirina jinê heta bi mêtingehkirina wê ya ekonomîk, civakî, siyasî û zêhnî statuya wê were zelalkirin, wê ev yekê bibe alîkariyeke mezin ji bo zelalkrina tevahî mijarên din ên dîrokê û civaka îroyîn.

Bêguman zelalkirina statuya jinê şaxekî meseleyê ye. Şaxê wê yê girîngtir der barê pirsgirêka rizgariyê de ye. Bi gotineke din çareserkirina pirsgirêkê hê zêdetir girîng e. Gelek caran tê gotin, asta azadiya giştî bi asta azadiya jinê re di weznekê de ye. Ev gotin rast e, lê ya girîng ew e, wê nava wê çawa were tijîkirin. Azadî û wekheviya civakî bi tenê wekhevî û azadiya jinê diyar nakin. Ji bo vê hewcedarî bi teorî, bername, rêxistin û mekanîzmayên çalakiyê heye. Ji vê jî girîngtir, xuya dike ku siyaseta demokratîk a bê jin nikare bibe, heta polîtîkvaniya çînî jî wê kêm bimîne, aştî û hawîrdor jî wê neyên parastin.

Divê mirov jinê ji statuya ‘dayika pîroz, namûsa esasî, ya dest jê nabe, hevaleke bêyî wê nabe’ derxe û weke tevahiya obje-sûbje bixe ber lêkolînê. Bêguman beriya her tiştî divê mirov van lêkolînan ji qeşmertiyên bi navê eşqê biparêze. Heta şaxê herî girîng ê lêkolînê divê rezîliyên mezin ên di bin navê eşqê de (di serî de destavêtin, kuştin, lêdan, dijûnên yek ji ya din sosrettir) hatine veşartin, pêşkêş bike. Gotineke Heredot heye dibêje “Tevahiya şerên Rojhilat-Rojava seba jinê derketine.” Ev gotin bi tenê dikare rastiyekê rave bike. Ew jî ev e, weke mêtingeh bi nirx bûye, ji lewra jî dibe sedema şerên girîng. Jixwe dîroka şaristaniyê welê bû, lê modernîteya kapîtalîst hezar qatî ji wê girantir û bi awayekî pirralîbûyî mêtingehkirineke jinê temsîl dike. Mêtingehkirin li nasnameya wê kola ye. Dayika tevahiya kedan, xwediya keda bêheqdest, karkera xwedî heqdesta herî kêm, ya herî zêde bêkar, çavkaniya bê sînor a arezû û zordestiya mêr, makîneya zarokanînê ya nîzamê, pîrika mezinkirina zarokan, amûra reklamê, amûra seks û pornoyê, bi vî awayî mêtingehkirin dûvdirêj diçe. Kapîtalîzmê bi qasî ku di ti mêtinkariyê de mekanîzme pêşde nebiriye di mêtinkariya jinê de mekanîzma bi pêşxistiye. Herçiqasî bi dilê me nebe jî her û her em li statuya jinê vedigerin û ev êşê dide me. Lê ji bo yên mêtinkarî li ser wan dimeşe zimanê rastiyan bi awayekî din nabe.

Tevgera femînîst li ber rohniya van rastiyan bêguman divê tevgera herî radîkal a dijberê sîstemê be. Tevgera jinê bi rewşa wê ya modern em dikarin reh û kokên wê bibin bisipêrin Şoreşa Franseyê û piştî çend qonaxan karîbûye heta roja me ya îro bê. Di qonaxa pêşî de li pey wekheviya huqûqî beziyaye. Ev wekheviya zêde maneyê îfade nake di roja me ya îro de bi awayekî berfireh pêk hatiye. Lê divê mirov baş zanibe ku naveroka wê vala û pûç e. Mîna mafê mirovan, ekonomîk, civakî û mafên siyasî di mafên din de jî pêşketineke şeklî heye. Bi awayê xuya dike jin jî bi qasî mêran xwedî azadî û wekheviyê ye. Lê ya rastî, xapandina herî girîng jî di vî şêwazê azadî û wekheviyê de veşartiye. Ne bi tenê di dema modernîteyê de, di tevahiya demên hiyerarşîk û şaristaniyan de jin di hemû çaviyên civakî de ji aliyê zêhnî û bedenî ve dîl hat girtin û bi koletiyeke pirr kûr hat xebitandin. Ji bo azadî, wekhevî û demokrasiya vê

jinê hewcedarî bi xebatên teorîk ên berfireh, têkoşîna îdeolojîk, xebatên programatîk û rêxistinî, ji van jî girîngtir pêdivî bi çalakiyên bi hêz heye. Bêyî van, xebatên jinê û femînîzmê wê ji xebatên jinê yên lîberal ên ber dilê sîstemê xweş dikin wêdetir, ti maneyê îfade nekin.

Eger zanista jinê pêş bikeve, mirov çareserkirina pirsgirêkan bi mînakekê rave bike wê têra xwe me hîn bike: Divê mirov zanibe ku xerîzeya hundir a cinsîtiyê yek ji şêweyên herî kevin a hînbûnê ye. Bersivê dide pêdiviya cinsê mirov ji bo zurriyeta xwe dewam bike. Ji ber ku derfet û îmkanên ferd ê jiyana bêserûbinî nîne, xwe neçar dibîne weke potansiyela zêdebûnê xwe dubare di yekî din de pêk bîne. Ya jê re xerîzeya cinsî tê gotin, ev e. Kengî ev potansiyel şert û mercên di cih de dibîne xwe zêde dike û jiyanê dewam dike. Bi awayekî li beramberî tehlûkeya qirbûn û mirinê dibe çare. Mîna dabeşbûna pêşî ya şaneyê ye. Şaneya yek e, xwe pirr dike û bi vî awayî xwe bê mirin dike. Eger em hê bi awayekî giştî bibêjin bûyer ev e, gerdûn li dijî valatî û tinebûna dixwaze wê daqurtîne, xwe timî bi cûrbicûrkirinê zêde dike û bi vî awayî meyla xwe ya bêserûbinîbûnê di jiyana zindî de dewam dike.

Fer an jî ferda ev bûyera gerdûnî ya bi cinsê mirov dewam dike, zêdetir jin e. Zêdebûn û pirrbûn di bedena jinê de pêk tê. Rola mêr di vê bûyerê de têra xwe talî ye. Ji lewra di dewamkirina zurriyetê de bi tevahî berpirsiyarî ya jinê ye û ev ji aliyê zanistî ve jî xusûsek e, tê fêhmkirin. Jixwe jin bi tenê cenînê di zikê xwe de hilnagire, mezin nake û nazê. Hema hema heta bi mirina xwe jî li zarokên xwe miqate dibe û bi awayekî xwezayî bi vê berpirsiyariya xwe radibe. Hingê encama pêşî ya divê em ji vê bûyerê derxin ew e, divê di tevahiya mijarên têkiliyên cinsî de ji sedî sed jin xwediyê gotinê be. Ji ber ku her têkiliya cinsî ji bo jinê bi awayekî potansiyel rê li ber pirsgirêkên giran ên nikaribe ji binî rabe vedike. Divê mirov baş fêhm bike ku jineke deh zarokan bîne ji aliyê fizîkî ve heta ji aliyê rûhî ve dikeve rewşeke heft xwezî bi mirinê.

Nêrtina zilam li seksualîteyê hê zêdetir berevajî û bêberpirsiyarî ye. Di vê de korkirina desthilatdariyê û cehalet di dereceya yekê de diyarker in. Herweha bi hiyerarşî û dewleta xanedaniyê re bûyîna xwediyê pirr

zarokan ji bo mêr tê maneya bi hêzbûneke dest jê nabe. Pirrzarok ne bi tenê dewamkirina zurriyetê, her weha weke desthilatdarî û dewletmayînê jî misoger dike. Bi awayekî, ji bo dewleta tê maneya yekdestdariya milk ji dest neçe, divê xanedanî mezin be. Bi vî awayî, hem ji bo hebûna biyolojîk, hem jî ji bo hebûna desthilatdarî û dewletê, jinê dikin amûrê anîna pirr zarokan. Ji bo jinê bingehê xeternak ê mêtingehkirinê bi yekemîn û duyemîn xwezayê ve girêdayî bi vî awayî tê amadekirin. Mirov hilweşîna jinê bi van herdu xwezayan ve girêdayî analîz bike gelekî girîng e. Hewce nake ku mirov zêde rave bike, di bin statuya vê xwezaya duber de mumkîn nîne ku jin ji aliyê rûhî û bedenî ve demeke dirêj zindî û nehilhilî li ser piyan bimîne. Hilweşîna rûhî û bedenî di zikhev de pêk tên û ev jî dihêle ku jin ji bo jiyana yên din dewam û têkûz bike, di berdêlê de jiyanê bi qehr, kin û bi cefa bi dawî dike. Gelekî girîng e ku mirov dîroka şaristanî û modernîteyê li ser bingehê vê rastiyê analîz bike û bixwîne.

Em wehameta pirsgirêkê ji aliyê jinê ve li aliyekî bihêlin. Şaxekî din ê pirsgirêkê heye ew jî pirsgirêka zêdebûna şêniyan e. Polîtîkaya piranîna zarokan bandora xwe bi awayekî giran li ser tevahiya xwezaya civakî û hawîrora ekolojîk dide hiskirin. Çi ji aliyê zanista jinê ve, çi jî ji aliyê tevahiya zanistên civakî ve yek ji dersên herî bingehîn ên divê were girtin ew e, divê şênî bi rêbaza 'hînbûna xerîzeyên hundir' dewam neke, neyê mezinkirin û ji bilî hin rewşên îstîsnayî neyê piçûkkirin. Bi rêbazên zanistî yên ku tevahiya dîroka şaristaniyê hatine pêşdebirin, destekkirina bi rêbazeke herî paşvemayî ya mîna xerîzeyên hundir dewamkirina zurriyetê, sedema sereke ya zêdebûna bêhed a şêniyan e. Cinsê mirov weke xwezaya civakî, bi tenê bi rêyên xerîzeyên hundir, nexasim jî bi ajoyên cinsî hebûna xwe dewam bike, rewşeke gelekî paşvemayî îfade dike. Asta mejî û çandê ji bo hebûnên civakî bi naverokên pêşketîtir bên dewamkirin potansiyelên hînbûnê pêşkêş dike. Ferd û kom bi mejî û çandên xwe, bi saziyên xwe yên felsefî û polîtîk xwedî wan îmkanan in ku xwe demeke dirêj dewam bikin. Ango bi rêya xerîzeya hundir dewamkirina zurriyetê û pirrbûna mirov bi vî awayî maneya xwe namîne. Mejî û çanda mirov ji mêj ve ji vê rêbazê bihuriye. Ji lewra ji vê

paşvemayînê bi awayekî bingehîn şaristanî û prensîba karê ya modernîteyê berpirsiyar e. Hîç şik û guman têde nîne ku pirrbûna zêde ya şêniyan DESTHILATDARÎ Û YEKDESTDARIYA ZÊDE ye; ew jî tê maneya KAR'a herî zêde û mezin. Tevahiya dîrokê cinsê mirov bi pirr zêdebûna xwe ne bi tenê civak, hawîrdor û xwezaya xwe jî aniye ber tinekirinê û ji sedî sed ev encama DANEHEVA DESTHILATDARÎ Û SERMAYEYA KUMULATÎF e, û ev jî tê wê maneyê encama QANÛNA KARA ZÊDE ye. Sedem û tesîrên din hemû di dereceya talî û duyemîn de rol digirin.

Wê wextê ji bo çareserkrina pirsgirêka jinê ya ji niha ve bi qasî çiyayan mezin bûye û pêşîgirtina li hilweşîna ekolojiyê, berê pêşî divê pirsgirêka demografiyê were çareserkirin, û di vê de berpirsiyariya bingehîn divê ya jinê be. Ji bo vê jî şertê pêşî divê jin tam azad û wekhev be; mafê wê yê tam ê siyasetkirina demokratîk hebe; di tevahiya têkiliyên bi cinsiyetê re pêwendîdar de gotin û îradeyeke tam heqê wê ye. Li derveyî van rastiyan, bi temamî wekhevî, azadî û rizgariya jinê, civakê û hawîrdorê pêkan nîne. Bi heman awayî bigewdebûna siyaseta konfederatîf û siyaseta demokratîk jî mumkîn nîne.

Jin herweha weke hêmana bingehîn a civaka exlaqî û polîtîk, li ber rohniya azadî, wekhevî û demokratîkbûyînê ji aliyê etîk û estetîka jiyanê ve bi roleke heyatî radibe. Zanista etîk û estetîkê parçeyekî zanista jinê ye ku jê nabe. Ji ber berpirsiyariyên wê yên giran ên di jiyanê de jin ê di tevahiya mijarên etîk û estetîkê de hem weke hêza fikir û hem jî weke hêza bicihanînê rê li pêşketin û gavavêtinan veke û guman ji vê nayê kirin. Têkiliya jinê bi jiyanê re li gorî mêr hê bêtir berfireh e. Asta pêşketina mejiyê hisî têkiliya xwe bi vê re heye. Ji lewra estetîk weke bedewkirina jiyanê ji aliyê jinê ve mijareke hebûnî ye. Ji aliyê etîkî ve jî (Teoriya exlaq, teoriya estetîk = bedewî) berpirsiyariya jinê berfirehtir e. Aliyên çê û xirab ên perwerdeya mirov, girîngiya jînê û aştiyê, xeternakî û xirabiya şer, nirxandina pîvanên mafdarî û dadê, diyarkirin û gihiştina biryarê, ji aliyê civaka exlaqî û polîtîk ve jin ê bi awayekî hê rasttir û bêhtir bi berpirsiyarî tevbigere. Ji ber ku ev li gorî xwezaya wê ye. Bêguman ez behsa jina lîstok

û siya mêr nakim. Li vir a ez behsa wê dikim ew jin e ku azadî, wekhevî û demokratîkbûyîn dawerivandiye hinavê xwe û qebûl kiriye.

Zanista ekonomiyê weke parçeyekî zanista jinê were pêşdebirin wê hê zêdetir rast be. Ekonomî hê ji destpêkê ve şêweyekî xebata civakî ye ku jinê bi awayekî bingehîn têde rol girtiye. Ji ber ku xwedîkirina zarokan li ser pişta jinê ye, ekonomî ji bo jinê maneyeke heyatî îfade dike. Jixwe maneya peyva ekonomiyê “qanûnên malê, pîvanên debara malê” ye. Bi vê jî eşkere ye ku ekonomî karê bingehîn ê jinê ye. Ekonomî ji destê jinê hatiye stendin û ketiye destê tefekar, bazirgan, pere, sermayedar, desthilatdar-dewlet û rayedarên mîna axayan tevdigerin. Ev bûye derbeke mezin li jiyana ekonomiyê ketiye. Ekonomiya ket destê hêzên dijberê ekonomiyê, bi lez bû hedefa bingehîn a desthilatdarî û mîlîtarîzmê û tevahiya dîroka şaristanî û modernîteyê bû sedema sereke ya şer, pevçûn, pêxîrtengî û bihevketinên bê sînor. Di roja me ya îro de ekonomî, ji aliyê kesên têkiliya xwe bi ekonomiyê re nînin, bi lîstikên kaxizan, ji rêbazên qumarê xirabtir kirine qadeke lîstikê, bi awayekî bê sînor nirxên civakî desteser dikin. Pîşeyê pîroz ê jinê ku ew bi xwe bi temamî li derveyî vê qadê hiştine, veguherandine pîşeyê makîneyên şer, amûrên trafîkê yên ku kirine jiyan li hawîrdorê nebe, îmalatxaneyên berhemên bêkêr ên ji bo karê û ti têkiliya xwe bi pêdiviyên bingehîn ên mirovan re nînin, lîstikên borsa, buha û faîzê.

Tevgera azadî, wekhevî û demokratîk a jinê ya xwe disipêre zanista jinê û femînîzmê jî digire nava xwe, eşkere ye ku wê di çareserkirina pirsgirêkên civakî de bi rola sereke rabe. Divê mirov qîma xwe bi rexnekirina tevgerên jinan ên rabihuriya nêz neyîne, bêtir bi ser dîroka şaristanî û modernîteyê de biçe, lewra wan jin kir rewşekê weke nasnameyeke tinebe. Eger di zanistên civakî de mijara jinê, pirsgirêka wê û tevgerên wê hema hema tine bin, berpirsê vê yê bingehîn avahiyên çandî yên maddî û zêhnî yên hegemonîk ên modernîte û şaristaniyê ne. Bi nêzîkatiyên teng ên wekheviyê yên huqûqî û siyasî belkî alîkariya lîberalîzmê were kirin; lê bi nêzîkatiyên bi vî rengî çareserkirina pirsgirêkê bidin aliyekî, weke diyarde jî çareseriya wê nabe. Mirov îddîa

bike ku tevgerên femînîst ên heyî ji lîberalîzmê qut in, û bûne hêzên dijberê sîstemê, ev ê bibe xwexapandin. Yek ji pirsgirêkên bingehîn ên femînîzmê ew e, eger weke tê gotin radîkal e, wê wextê divê beriya her tiştî xwe ji binî ve ji hînbûnên lîberal, ji jiyan û şêwazên fikir û hisên wê qut bike, şaristanî û modernîteya dijminê jinê ya li pişt wan analîz bike û li ser vî bingehî giraniya xwe bide rêyên çareseriyê yên manedar.

Modernîteya demokratîk divê xwezaya jinê û tevgera wê ya azadiyê weke yek ji hêzên xwe yên bingehîn zanibe û di vê çarçoveyê de hem pêşdebirina wê û hem jî weke hevgirtiyê xwe di serê erkên xwe de bihesibîne û di xebatên jinûveavakirinê de wê binirxîne.

## d- Ekolojî: Serîrakirina Hawîrdorê

Yek ji pirsgirêkên bingehîn ku sîstema şaristaniyê rê lê vekir, tewazuna nazik a di têkiliyên civak û hawîrdorê de ye. Sîstema şaristaniyê ev têkilî xira kiriye. Xwezaya civakî di qonaxa dirêj a jiyan û pêşketina xwe de timî bi tewazuna nazik a ahenga bi hawîrdorê re girêdayî ma. Pêdiviyeke pêşketina xwezayî ye ku di pêşketina xweber de divê jirêderketinên ku tewazunê ji binî ve biguherin, pêk neyên. Bi awayekî bingehîn sîstem hevdu xira nakin, hevdu xwedî dikin û pêş dikevin. Dema ku jirêderketin pêk bê, divê mentiqê sîsteman ji wan bibihurin. Di vê çarçoveyê de şaristanî di sîstema xwezaya civakî de weke jirêderketinekê derdikeve pêşiya me. Herçiqasî em jê re dibêjin sîstema şaristaniyê jî ev gotin bi tenê nirxekî xwe yê propagandîf heye. Ji bo di şûna sîstema rastî ya xwezaya civakî de were bicihkirin li hev hatiye çêkirin. Ji wan kesan re ku sîstem in, barbar, koçer û komên marjînal hatiye gotin, şebekeyên bi kurtêlxurî, bi nirxên civakî xwe xwedî dikin jî hêjayî binavkirina ‘sîstema şaristaniyê’ hatine dîtin. Ji kîjan alî ve mirov lê binêre bila lê binêre, şer, talan, hilweşandin, qirkirin, yekdestdarî, xûkî û bacgirtin nîşaneyên pêşketina şaristaniyê ne, û heq dikin ku weke barbartiya rastî werin binavkirin. Misêwa hilweşandina gund û bajaran, kuştina bi mîlyonan mirovî, xistina pirraniya civakê bin nîrê sîstema mêtinkariyê pêdiviyeke xwezayî ya

sîstema xwezaya civakî nîne, bi tenê mirov dikare vê yekê weke rewşa jirêderketî destnîşan bike.

Dîroka şaristaniyê ya pênc hezar salî di heman demê de dîroka vê jirêderketin û mezinbûna wê ye. Felaketên ekolojîk herî zêde di vê serdema kapîtalîzmê ya tê îddîakirin şaristanî têde bi pêş ketiye pêk tên û ev jî bi awayekî neyê redkirin vê jirêderketinê piştrast dike. Xwezaya civakî di jiyana xwe ya nêzî sê mîlyon salî de ti carî rê li felaketên bi vî rengî venekir. Civak û sîstemên hawîrdorê hevdu xwedî dikirin. Di dîroka kin a şaristaniyê de krîzên ekolojîk ên derketin holê bi cewherê wê yê bi armanca karê re têkildar e. Ne bi tenê kara kapîtalîst, di tevahiya pêvajoyên şaristaniyan de komkirina zêde ya nirxan bi hilweşîna herdu xwezayan re pev re meşiyaye. Pîramît jî danehev û komkirinek e. Lê pirr hindik mirov dikare xeyal bike ku di berdêla çiqas hilweşînên civakî de pêk hatine. Danehev û komkirinên bêhejmar ên bi vî rengî timî barên zêde li hawîrdorê bar kirin. Hilweşîna civakê bi xwe re hilweşîna hawîrdor û jîngehê anî. Avahiyên kara bêsînor ên yekdestdariya modernîteya kapîtalîst hingî giraniyên ku civak û tewazuna wê ya bi hawîrdorê re nikaribin rakin komkirin, di encamê de em ketin serdema krîza ekolojîk. Di vê de rola stratejîk a îndustriyalîzmê diyarker bûye. Modernîzm û îndustriya xwe spartî sotemeniya fosîlan di vê diyarkeriyê de bandora esasî ne. Herweha bikaranîna sotemeniyên fosîlan di otomobîlan de yekser nebe jî di qezayên trafîkê de rê li ber felaketan vedike, ew jî dikare rê li ber hilweşînên zincîrwarî veke. Bi vî awayî felaketên hawîrdorê rê li felaketên civakî, ew jî dîsa vedigerin û rê li felaketên hawîrdorê vedikin, reaksiyoneke zincîrwarî çêdikin. Ji ber vê yekê şaş e ku ji serdema kapîtalîzmê re serdema rasyonalîzmê bê gotin. Çavê komkirin û danehevê kor e. Bi temamî danehev û komkirin, tevahiya dîrokê ne bi rasyonalîteya civak û hawîrdorê, berevajî bi korî tevgeriyaye û ev jî bi encamên xwe li naverastê ye. Belkî ji aliyê analîtîk ve rasyonel be, lê ji aliyê mejiyê hisî ve ku mejiyê bi tenê yê hawîrdorê ye, mejiyê analîtîk bi temamî korî ye û mejiyê xirakirinê ye, ev rastî têra xwe derketiye holê.

Di çarçoveya ravekirinên xwe yên berê de em dikarin bibêjin, bi sedema bajar û çîna navîn di navenda desthilatdariyê de cih girtin, pirrbûna şêniyan bi lez bû û bajarên mezinbûyî ew diyarde nînin ku hawîrdor karibe wan rake û xwe bide ber barê wan. Xwezaya civakê jî nikare xwe li van diyardeyan ragire. Ji ber ku bi pêvajoya komkirina sermayeyê ya dewlet û desthilatdariyê di zikhev de mezin dibin, ti tewazuna civak û hawîrdorê nikare van hecm û giraniyan rake. Krîza hawîrdorê û krîzên civakî dikevin zikhev û dewamî dibin, ev jî di herdu qadan de bi mezinbûna yekdestdariyê re têkildar e. Weke du sîstemên krîzê hevdu xwedî dikin. Di tespîtên zanistî de zanyar hemû hemfikir in ku ev rewşa li hev alandî pêncî salên din dewam bike hilweşîn ê bigihîje astekê ku êdî nikaribe dewam bike. Lê karektera kor û hilweşîner a yekdestdariyên sermaye û desthilatdariyê nikare vê yekê bibîne, bibihîse, ji ber ku ev li gorî cewherê wan wisa dibe.

Tevger û zanista hawîrdorê tevî ku dîroka wê nû ye, her ku diçe pêş dikeve. Çawa ku me di rastiya jinê de jî dît, der barê diyardeya hawîrdorê de jî zanist çiqasî pêş dikeve serwextbûn ewqasî, serwextbûn çiqasî pêş dikeve, tevger jî ewqasî pêş dikeve. Ji bo civaka sivîl qada tevgerê ya herî berfireh e. Her diçe zêdetir anarşîst û alîgirên sosyalîzma pêkhatî dikişîne nava xwe. Di pozîsyoneke welê de ye, herî zêde dijbertiya xwe ya sîstemê dide hiskirin. Ji ber ku tevahiya civakê eleqedar dike, wesfê tevlîbûnan rengekî jor çîn û jor-neteweyan girtiye. Li vir jî bi awayekî zêde mirov dikare şopên hegemoniya îdeolojîk a lîberalîst bibîne. Lîberalîzm weke di her mijara civakî de dike, di pirsgirêka ekolojîk de jî aliyê bi cewherê avabûna wê re têkildar ditepisîne, hewl dide teknolojiyê, sotemeniyên fosîl û civaka zêdexwer berpirsyar nîşan bide. Lê ya rastî, ev aliyên behsa wan tê kirin berhemên sîstema (bê sîstemtiya) modernîteya wê ne. Ji lewra tevgera ekolojîk jî weke tevgera femînîst ji aliyê îdeolojîk ve hewcedariya xwe bi zelalbûna îdeolojîk heye. Divê rêxistinî û çalakvaniya xwe ji kolanên teng ên bajar derbasî nava tevahiya civakê, nexasim jî nava civaka gund û cotkariyê bike. Ekolojî bi awayekî bingehîn rêberê çalakiyê yê jinan, civaka gund û cotkariyê, tevahiya koçer û bêkaran e.

Ev rastiyên bingehê moderniteya demokratîk jî pêk tînin, di xebatên jinûveavakirinê de bi awayekî eşkere nîşan didin ku ekolojî wê bi roleke çiqasî girîng rabe.

## e- Tevgerên Çandî: Tolhildana Rêûresmê Ji Dewleta Netewe

Tevgerên çandî tevahiya serdemên şaristaniyan ti carî kêm nebûn. Di dema postmoderniteyê de bi awayekî gelekî berfireh behsa wan tê kirin, sedema vê jî bi jihevketina sînorên dewleta netewe re têkildar e. Mirov tevgerên çandî bi gotineke din weke serîrakirina rêûresmê bi nav bike wê di cih de be. Dewleta netewe bi etnîsîte, dîn û mezhebekî yan jî xwesipartina diyardeyeke din a komî, civak û netewe bixe pêvajoya homojenkirinê, hewl dide gelek rêûresm û çandan yan bi rêbaza qirkirinê yan jî bi rêbaza asîmîlasyonê tine bike. Bi hezaran ziman, zarava, qebîle, eşîr û qewm tevî çandên wan anîn ber tinekirinê. Gelek dîn, mezheb û terîqet hatin qedexekirin, folklor û rêûresmên wan hatine asîmîlekirin, yên nehatin asîmîlekirin neçarî koçberiyê hatin hiştin, hatin marjînalkirin, yekparebûna wan hat parçekirin. Di vê pêvajoyê de ku nêzî dused salî bi tevahiya leza xwe dewam kir, hebûnên dîrokî, rêûresm û çand hemû kirin qurbanê hin hêmanên moderniteyê yên ji aliyê civaka dîrokî ve ti maneya xwe nînin. Di tehlîla dawî de hêmanên behsa wan tê kirin di bin perdeya milletperestiya 'tek ziman, tek al, tek netewe, tek welat, tek dewlet, tek surûd, tek çand' de bi yekdestdariyên fînansî, îndustriyel û bazirganî û bi yekdestdariyên desthilatdariyê, weke dewleta netewe zêdebûna moderniteyê, vedişêrin. Ev pêvajo belkî jî pêvajoya herî dema dirêj a dîrokê û dema şerên herî dijwar e, zirar û ziyana xwe ya herî mezin da rêûresm û çanda bi hezarê salan. Hêrsa karê ya yekdestdariya xwe herî zêde birêxistinkirî, dilê xwe bi ti çand û rêûresma pîroz neşewitand.

Hin tevgerên bê sîstem ên ji wan re postmodernîte tê gotin dema 'zirxê dewleta netewe' yê moderniteyê kun kirin an jî 'qefesa wê ya hesinî' parçe kirin, rêûresm û çandên mehkûmî jiyana marjînalbûnê hatibûn kirin û li ber tinebûnê bûn, mîna kulîlkên piştî barana li çolê vedibin, ji nû ve rûyên

wan vebûn û zêde bûn. Di vê de hilweşîna sosyalîzma pêkhatî jî bandora xwe girîng bû. Tevgera ciwanan a 1968’an jî bû fitîla agir bigihîne vê pêşketinê. Herweha tevahî qonax û meylên tevgerên rizgariya neteweyî yên nebûn dewletên netewe û li ber mêtingeriya kapîtalîst têkoşiyan di vê de bandora xwe hebûn. Jixwe çand û rêûresm bi xwe têne maneya berxwedanê. Yan wê bêne tinekirin an jî wê bijîn, ji ber ku teslîmbûnê nas nakin. Xisleteke wan a bi vî rengî heye. Dema firsend û keysê bibînin gelekî xurt li ber xwe didin û ev ji cewherê wan e. Rastiya ku faşîzma dewleta netewe nikare bihesibîne, ev e. Tepisandin, heta asîmîlekirina wan nayê wê maneyê ku hatine qedandin. Berxwedana çandan dişibe kulîlkên zinaran diqelêşin û hebûna xwe didin pejirandin. Betonên modernîteyê yên bi ser wan de hatibûn kirin, parçe kirin û ji nû ve rûyê rojê dîtin, ev jî vê rastiyê ispat dike. Tevgerên em behsa wan dikin, em dikarin dabeşî çend koman bikin:

## 1- Etnîsîte û Tevgerên Neteweya Demokratîk

Di serê tevgerên çandî yên dewleta netewe tepisandî û tam nikarîbûye bihelîne milletgiriya mîkro ya diyardeyên etnîk tê. Ji milletperestiya dewleta netewe cuda ye. Naveroka wê ya demokratîk bêhtir xwedî giranî ye. Ji lêgerîna dewleteke nû zêdetir, armanca wan a herî girîng ew e, li dora çanda xwe bibin pêkhatineke siyasî ya demokratîk. Ji xweseriya herêmî yan jî xwecihî cuda ye. Bi sînorê mekan ve girêdayî nîne, ango ji sînoran wêdetir be jî yekîtî û piştgiriya yên hebûna heman çandê parve dikin, îfade dike. Li dijî etnîsîteya serdest parastina hebûna xwe, ji armancên wan ên girîng in.

Ji aliyê sosyolojîk ve têra xwe rast û manedar e ku mirov ji tevgera etnîsîteyên cuda yên bindest re, bi gotineke din, ji tevgera wan gelan re ku di bin zordestiyê de ne, bêje Tevgera Neteweya Demokratîk. Gelekî zor û zehmet e, weke etnîsîteya bi tenê ya bindest li ser piya mayîn û hebûna xwe dewamkirin. Tevgera yên ziman û zaravayên çandên bi heman rengî, heman sînorên siyasî û cografî parve dikin, ji ber çend sedeman divê weke

Tevgera Neteweya Demokratîk were wesifandin. Ya pêşî, ji hedefa gera li dewleteke cuda zêdetir li rêveberî û pêkhatineke siyasî ya demokratîk digerin. Li bin banê heman dewletê pêkhatineke siyasî ya demokratîk, şêweyekî hebûnê yê siyasî ye ku di dîrokê de gelek caran em dibînin. Dîrok hema hema bi giranî bi pêkhatinên siyasî yên hebûnên çandên cuda tijî ye. Di nava sînorên her dewlet an jî împaratoriyê de bi qasî ku were xwestin bi şêweyê pêkhatinên siyasî jiyan şêweyekî normal ê rêveberiyê ye. Ya anormal ew e, tine hesibandina van pêkhatinên siyasî ye yan jî tepisandina wan e. Asîmîlasyon jî pirr zêde ji wan rêbazan nebû serî lê bê dayîn. Împaratoriyên Roma, Bîzans, Osmanî, Pers-Sasanî, Ereb-Ebasî bi sedan yekeyên cuda yên siyasî û îdarî sedema hebûna xwe hesibandine. Bi tenê şert ew e, rewabûna împarator an jî siltan nas bikin. Ya esas ew bû, ziman, dîn, folklor û rêveberiyên xwe biparêzin û bijîn. Lê cinawirê dewleta netewe (Levîathan) ev nîzam ji holê rakir. Li ser vî bingehî jî çû faşîzmê. Encam gelek qirkirinên fizîkî û çandî bûn.

Mafê netewebûnê yê etnîsîte yan jî gelan bi tenê weke dewleta netewe şîrovekirin bi xwe berevajîkirin û felaketeke mezin hem a lîberalîzm, hem a sosyalîzma pêkhatî bû. Ev rewş encamê milletperestiya faşîst û totalîtaryanîzmê ye. Rêya rast ew e, divê mirov netewebûyîna normal mehkûmî nava sînoran neke, li ser bingehê çandî û hîmên rêveberiya demokratîk ava bike û ev ji bo xwezaya mirovî û civakî ya herî di cih de ye. Rastiyên dîrokî jî zêdetir vê rê eşkere dikin. Hêrsa daneheva sermayeyê bi lez a sermayeya yekdestdar a li pey kara herî zêde diçe, di girtina vê rê de hêmana herî girîng e. Rêya ne normal dewleta netewe ye, lê bû rêya normal a netewebûnê, rêya netewebûna demokratîk a normal jî weke ne normal, heta weke rêyeke tine hesibandî, dan fêhmkirin. Berevajîkirina mezin jî ev bû.

Piştî ku ji gelek aliyan ve çaresernekirina dewleta netewe (şerên herêmî û dinyayê, bi hevketinên neteweyî, sermaye li dîwarên neteweyî qelibî) derket holê, rêya normal ango netewebûnên demokratîk destpê kir gelekî pêk hatin. Li tevahiya Ewrûpayê ya ku piştî Şerê Cîhanê yê Duyemîn pêk hat ew bû, Ewrûpa ji dewletdariyên neteweyî vediguherî netewetiya

demokratîk. Jixwe Dewletên Yekbûyî yên Emerîkayê her tim karîbû weke neteweyê neteweyên demokratîk bimîne. Tevî berevajîkirina gelek dewletdariyên neteweyî yên yekdestdariyê, Yekîtiya Komarên Sovyeta Sosyalîst dewletdariya neteweyî û netewetiya demokratîk di zikhev de pêkanî. Li Hindistanê jî meylên neteweyî yên demokratîk bi hêz in. Li Efrîka û Başûrê Emerîkayê meylên neteweyî yên demokratîk her tim giraniya xwe hebûn. Kêm hejmareke dewletdariyên neteweyî yên hişk, di serî de Rojhilata Navîn, li hin mekanan bi sînor man. Ev dewletdariyên neteweyî jî bi lez di pêvajoya jihevdeketinê de ne.

Ya diduyan, wexta netewebûna desthilatdar û dewletdar esas neyê girtin, hingê yan hin saziyên ji serdema navîn mane yên weke axatî, şêxtî, terîqet û serektiya eşîrê, bi pirranî rêveberên taşeron ên hevkar ên xwe disipêrin berjewendiyên malbatê wê esas bêne girtin û wê bi modernkirina wan dewam bike, yan jî wê rêveberiyên demokratîk bêne pêşdebirin. Rêya yekemîn, rewşa modern a hevkartiya klasîk e ku dîrokê jî ji vî şêwazî re gelekî şahidî kiriye. Rêya duyemîn jî rêya esas hedefa modernîteya demokratîk bû. Rêveberiya berxwedanê ya li dijî dewleta netewe û hevkarên wê bi tenê dikare demokratîk bibe. Ev jî rêya wekhevî û azadîxwaz a herî têkûz e ku diçe netewebûna demokratîk.

Ya sisiyan, karektera pirranî ya çand, ziman û zaravayan netewebûna demokratîk ferz dikir. Li gorî cewherê wê nebû, mîna dewleta netewe tehekuma çand, ziman û zaravayên etnîsîteya serdest esas bigire. Alternatîfa bi tenê ew netewebûn e ku ji pirr ziman, çand û siyasetê pêk tê. Ev jî eşkere ye ku maneya netewebûna demokratîk e. Heta rê lê vekiribû ku ji çend neteweyên demokratîk neteweyeke demokratîk pêk bînin. Li Spanyayê, li Hindistanê, li Komara Efrîka Başûr a gelek kes naecibînin, heta li Endonezya û gelek welatên Efrîkayê ya pêk tê, bûyerên bi heman rengî ne. DYE û YE jî bi awayekî mirov dikare weke neteweya neteweyên demokratîk pênase bike. Federasyona Rûsyayê jî mînakeke din a girîng a bi heman rengî ye.

Ya çaran, ji ber ku cudatiyên ekonomîk, civakî, siyasî, zêhnî, ziman, dîn û çandî zêdetir dixwazin werin parastin, wê yekser were fêhmkirin ku ev

yek bi neteweya demokratîk dibe. Her cudatî weke cihêtiyê were fêhmkirin, wê ev yek zirarê bide hemûyî. Lê ya rastî, ji bo hemûyî ya îdeal 'di nava yekîtiyê de cudatî' ye. Ji bo vê jî netewebûna demokratîk şêweyê herî di cih de ye. Bi serê xwe bi tenê jî ev potansiyela çareseriyê jî hêza çareseriyê ya mezin a tevgera netewebûna demokratîk û avabûna wê ya alternatîf li dijî dewleta netewe têra xwe rave dike.

Dewleta netewe ya di warê çareseriyê de asê bûye, ji aliyekî ve tevgerên sermayeyê yên global ji jor ve, ji aliyê din ve jî tevgerên xweser ên bajar, xwecihî û herêmî tevî tevgerên dînî û neteweya demokratîk ji binî ve wê tengav bikin û ev jî dihêle ji vê kaosê sîstemên nû yên namzet derkevin. Gelek delîl û nîşaneyên vê ji niha ve derketine holê.

Lîberalîzm ji aliyekî ve hewl dide ji dewleta netewe ya klasîk bibihure û ji nû ve ava bike, ji aliyekî din ve jî bi girîngî û nazenînî hewl dide vê çalakiya xwe bi maskeya pêşdebirina demokrasiyê nîşan bide. Dewletdarên netewe yên hişk jî di nava paşverûtî û muhafezekariyekê de diperpitin, xweziyê bi ya muhafezekarên berê tînin. Hêzên behsa wan tê kirin, bi awayekî ketine pozîsyonekê bi rola muhafezekarên rastî radibin. Dîndar jî li ummeta ji rêûresmê digerin. Îhtîmaleke xurt e ku modernîzmê di bin navê dîn de pêk bînin û li ser bingehê dîn dewlekteke netewe ava bikin. Îran di vî warî de mînakekî hêja ye ku mirov jê hîn bibe.

Alternatîfa netewebûna demokratîk di roja me ya îro de ji bo pirsgirêkên tevlîhev ên îdeolojîk û avabûnê bi potansiyela xurt a çareseriyê ji bo paşerojê xwedî gotin e. Nexasim qonaxên YE ji wan bihurîye balkêş in. Gelekî girîng e ku modernîteya demokratîk hem ji aliyê îdeolojîk ve hem jî ji aliyê avabûnê ve weke yek ji şaxên bingehîn ên alternatîfa netewebûna demokratîk were dîtin. Ev nêzîkatî hem alîkariyê dide şaristaniyê hem jî şensê rizgariyê dide. Modernîteya demokratîk xebatên jinûveavakirinê wê bi neteweya demokratîk pêk bîne. Xebatên jinûveavakirinê di çareserkirina pirsgirêkên bingehîn ên civakî û hawîrdorî de ew proje ne ku herî zêde hêviyê didin.

## 2- Tevgerên Çandî yên Dînî: Zindîbûna Rêûresma Dînî

Em dibînin rêûresma dînî ya modernîte û nexasim jî dewletdariya netewe bi têgîna laîktiyê dixwazin wê bikin mêtingeh, mîna vejîna etnîsîteyê, zindî û geş dibe. Bêguman bi fonksiyona xwe ya berê ya civakî ji nû ve di heman astê de zindî nabe. Çi bi hêmanên xwe yên radîkal çi jî bi bazkên xwe yên nerm bi mohra modernîteya fermî çavên xwe ji nû ve li heyatê vedike, zindî û geş dibe. Ya rastî, mijar hinekî din jî tevlîhev e. Herçiqasî laîktî weke destkişandina dîn ji jiyana dinyewî nexasim jî weke bi temamî destkişandina wê ji karûbarên dewletê were pênasekirin jî têgîneke şîlo ye. Çawa ku tê gotin, laîktî bi temamî ne dinyewî ye, ne jî bi temamî dewlet ji dîn şuştiye. Ji vê jî girîngtir, dîn ti carî jiyana axîretê tenzîm nakin. Karûbarên tenzîm dikin dinyewî û civakî ne, nexasim jî fonksiyonên dewletî û desthilatdariyê ne.

Di serdema navîn de hostayên avakirinê yên Cihû ji bo hegemoniya dinya Katolîk bişkînin laîktî weke mezhebekî (masonîk) pêk anîn. Herçiqasî mirov dibîne bi zanistên pozitîv re di zikhev de bi pêş dikeve jî bêguman ji hêmana Rebbanîk a îdeolojiya Cihû zêde bûye. Ev xusûs heta baş neyê fêhmkirin, çi laîktî çi jî pirsgirêkên rê li ber wan vekirine nayên fêhmkirin. Herî kêm bi qasî rêûresmên din ên dînî bi hêmanên Rebbanîk (Xwedayî; bi zimanê Cihûtiyê maneya wê ‘efendî’ ye) bar kiriye. Lê belê vê rastiyê divê bi awayekî gelekî bidizî û ambalajên taybet ava bike. Zordestiya xedar a Katolîktiya serdema navîn ew neçar hiştine ku rêbazên bi vî rengî bi kar bînin. Laîkên bi Şoreşa Hollanda û Ingilîz pêngaveke mezin avêtin, ji Şoreşa Franseyê hê bêtir sûd wergirtin. Bi avakirina dewleta netewe re, di navê de xwe wisa bi rêxistin kirin, naskirina wan, xwe gihandina hebûna wan di nava sîsika dewletê de û ji desthilatdariyê anîna wan a xwarê beşê herî zehmet e. Ji wê demê ve heta roja me ya îro vê serdestiya xwe dewam dikin. Diyardeya dewleta kûr bi aliyekî xwe ve vê rastiyê îfade dike. Li dinya me ya îro dewletên netewe yên hejmara wan ji dusedî derbas dibin her yek ji wan çiqasî laîk be, ewqasî jî masonîk e. Mason hêza bingehîn a hegemoniya îdeolojîk a modernîteya kapîtalîst e.

Bandora wan global e. Ev statuya xwe hê jî xurttir û dewam dikin. Navendên din ên têde bi bandor in, di serî de yekdestdariyên medya û endamên hîndekariya zanîngehan, gelek saziyên civaka sivîl in ku di rêveçûna stratejîk a dinyayê de xwedî pareke girîng in. Xwedî cihekî welê ne ku ji modernîteyê re ya jê re 'Dinya laîk' dibêjin aqilmendî û kontrolmendiyê dikin. Fonksiyona wan a jê re dinyewî û sekuler dibêjin di vê çarçoveyê de ye.

Di serî de Katolîktî, Îslama Sunnî û rêûresmên dînî yên hişk ên din bi bandora modernîteyê birizin, laîktî jî wê weke îdeolojî û bernameyeke siyasî girîngiya xwe nemîne. Ji nû ve zindîbûna rêûresma dînî, nexasim jî di nava komên Îslamî de yên bi awayekî xurt di bin bandora rêûresmê de guftûgoyên dîn û laîktiyê sor bûne. Ev bûyer di cewherê xwe de ji ber şerê desthilatdariya polîtîk û îdeolojîk ê têgihiştina dewleta netewe û ummetgiriyê diqewime, lê bi tenê weke xwe li hev rakişandina li ser şêwazê jiyanê yê modern, nîşandana vê yekê rast nîne. Têkoşîneke mîna ya di navbera Xiristiyantî û Musewîtiyê de êdî bi heman rengî di navbera cîhana Îslam û Musewîtiyê de pêk tê. Li Rojhilata Navîn di binê şerên mezin de ev rastî heye. Dixwazin şêweyekî Ewrûpa û DYE'yê lihevhatineke Musewî û Îslamê pêk bînin. Hêmanên radîkal û şerker li dijî lihevhatinê, hêmanên nerm jî zêdetir nêzî lihevhatinê xuya dikin.

Dîsa jî gelekî girîng e ku mirov ji nû ve zindîbûna çanda dînî ya ji rêûresmê bi temamî weke hişyarbûna tehlûkeya paşverûtiyê nebîne. Bi qasî ku serî li ber moderníte û dewletdariya netewe rakin xwedî naverokeke demokratîk in. Herweha divê mirov ji nedîtî ve neyê, damar û rayên xurt ên exlaqî temsîl dikin. Çanda dînî yek ji wan çandan e ku moderníteyê gelek pê lîstiye û kiriye mêtingeh, ji lewra gelekî girîng e ku moderníteya demokratîk ji nêz ve bi bûyerên vê rêûresmê re eleqedar bibe. Zindîbûna bi heman rengî li cem her rêûresma dînî û çanda hatiye tepisandin tê dîtin. Mijar global e. Ji lewra bi tenê xwelihevrakişandina Îslam û Cihûyan nîne bi bûyerên di asta golbal de diqewimin têkildar e.

Çawa ku mirov dikare çandên etnîk ên cuda di çarçoveya neteweya demokratîk de li cem hev bigire, gelekî girîng e ku mirov naveroka

demokratîk a çanda dînî jî di nava neteweya demokratîk de weke hêmaneke demokratîk, azadî û wekheviyê binirxîne û di çareseriyê de cih bidiyê. Moderníteya demokratîk divê têgihiştina xwe ya hevgirtinê ya lihevkirinê, çawa ku ji bo tevahiya tevgerên dijberê sîstemê bi pêş xist, divê ji bo çanda dînî ya xwedî naveroka demokratîk jî bi pêş bixe û ev jî ji aliyê xebatên jinûveavakirinê ve erkeke têra xwe girîng e.

## 3- Tevgerên Xweseriya Herêmî, Xwecihî û Bajarî

Di dîrokê de her tim rêveberiyên xweser ên di çarçoveya bajarî, xwecihî û herêmî de giraniyeke xwe ya mezin hebûn, di nava rêûresmên çandî yên gelekî girîng de cih digirin ku dewletdariya netewe ew kirine qurban. Di tevahiya rêveberiyên dewletî û civakî yên têne pêkanîn de rêveberiyên xas ên bajar, xwecih û herêmê, her tim xweseriya wan hebû. Jixwe wekî din mumkîn nebû, nexasim jî dewlet û împaratoriyên mezin bêne rêvebirin. Bi awayekî bingehîn navendgiriya hişk weke karekterê yekdestdariya moderníteyê nexweşiyeke dewleta netewe ye. Weke pêdiviyeke qanûna kara herî zêde hatiye ferzkirin, ji bo burokratên bûrjûwa yên çîna navîn ên weke girêkan mezin dibin û bibin desthilatdarî hatiye tenzîmkirin, ne bi tenê ji bo yekê, ji bo bi hezaran nîzamên qraltiyê bêne avakirin weke modeleke bi tenê bi faşîzmê re bimeşe, hatiye pêşdebirin.

Bi awayekî lezgîn di jihevdeketina moderníteya klasîk de û di pêşketina tevgerên çandî yên pirraniya wan bi wesfê lîberal ên cureyê postmoderníte têne maneya qutbûneke radîkal de para herî mezin tevgerên xwesertiyê yên bajêr, yên xwecihî û herêmî hilgirtin. Bi awayekî bingehîn, li çanda xwe ya tevahiya serdeman di asta siyasî, ekonomîk û civakî de bi hêz jiyan, vedigerin û bi vî awayî çandên wan ji nû ve zindî dibin. Di serê wan tevgeran de yên ku maneya xwe ya gelekî girîng a civaka dîrokî hene tên, û pêdivî bi van tevgeran heye. Bêyî rizgariya bajar, xwecih û herêmê, rizgariya ji nexweşiya dewleta netewe mumkîn nîne. Hêzên ev herî baş fêhm kirine û bi cih tînin endamên YE'yê ne. Hem barbartiyên çarsed salî yên di bin navê moderníteyê de pêk anîn û hem jî Şerên Cîhanê

yên Yekemîn û Duyemîn têra xwe ders dane çanda Ewrûpayê. Xweber nîne ku di gavên xwe yên pêşî avêtî de cih dan qanûnên xweseriya bajar, xwecihî û herêmî; ji ber ku fêhm kiribûn, dewleta netewe ji bo tevahiya hebûnên çandî û neteweyî çi qirkirinek û belayeke mezin e.

Li Yekîtiya Ewrûpayê, îro xebatên herî hêja di çarçoveya xebatên çanda bajar, xwecihî û herêmî de pêk tên û ev di warê çareserkirina tevahiya pirsgirêkên global de li serê hêmanên herî girîng tên. Herçiqasî zêde radîkal nebe jî tevgereke çandî ya girîng û hewce ye. Jixwe li tevahiya parzemînên dinyayê homojentiya rêveberiya navendî bi temamî hat ferzkirin, lê ji ber ku pêk nehat, xweseriya gelek bajar, xwecihî û herêmî zindîtiya xwe diparêzin. Ji Federasyona Rûsyayê heta bi Çînê û Hindistanê, ji tevahiya parzemîna Emerîkayê (DYE federal e, li Kanadayê xweserî bi hêz e, Başûrê Emerîkayê jixwe di statuya xweseriya herêmî de ye) heta bi Efrîkayê (Li Efrîkayê rêveberiyên eşîr û herêman ên ji rêûresmê nebin dewlet nikarin pêk bên û werin rêvebirin) statuyên xweser û xebatên xwesertiyê mijarên herî çalak û aktuel in. Navendgiriya hişk a ku nexweşiyeke dewletdariya netewe ye, bi tenê li ser çend dewletên Rojhilata Navîn û dîktatoriyên din tê pêkanîn.

Hêmanê herî girîng ê modernîteya klasîk avahiyên dewleta netewe yên navendgira hişk, ji jor ve ji aliyê sermayeya global, ji binî ve ji aliyê tevgerên çandî ve tê tengavkirin û bi vî awayî ji hev de dikeve û lewma hewl didin li şûna wan zêdetir rêveberiyên xweser ên bajar, xwecihî û herêmî bi cih bikin. Ev meyla ku roja me ya îro her diçe bi hêz dibe, divê bi tevgerên neteweya demokratîk re di zikhev de pêş bikeve. Neteweya demokratîk weke şêweyê rêveberiyê zêdetir nêzî konfederalîzmê ye. Konfederalîzm bi awayekî şêweyê rêveberiya siyasî ya neteweyên demokratîk e. Bajarê bi hêz bi tenê dikare bi rêveberiyên xweser ên xwecihî û herêmî hebûna xwe bi dest bixe. Ji aliyê şêweyên rêveberiyan ve herdu tevger divê wekhev bin û bigihîjin hev. Netewebûna demokratîk û netewe, bêyî xweseriyên bajar, xwecih û herêman nikarin hêza rêvebertiyê bi dest bixin. Yan wê bikeve kaosê ji hev belav bibe yan jî wê bi modeleke nû ya dewletdariya netewe li dawiyê were hiştin. Ji bo neketina herdu

rewşan, divê tevgera neteweya demokratîk ji sedî sed li bajar, xwecihî û herêmî bi xweseriyên demokratîk were pêşdebirin. Li beramberî vê, ji bo rêveberiyên xweser ên bajar, xwecihî û herêmî bi derbekê neyên daqurtandin û karibin hêzên xwe yên ekonomîk, civakî û siyasî tam bi kar bînin, hewcedariya wan pê heye ku weke neteweya demokratîk bi tevgera neteweyî ya demokratîk re bi yek bin. Dewleta netewe ji bo herdu tevgeran yekdestdariyên hêzê yên zêde navendgir timî li ber derî radigire û li ser wan ferz dike; ew bi hevgirtineke têkûz dikarin ji vê bibihurin. Ne wisa be, çawa ku berê pirr hate serê wan, heta bi rengê xwe yê diyardeyî jî herdu tevger wê neçar di bin tehlûkeya homojenbûnê de tesfiye bibin û bihelin biçin. Şert û mercên dîrokî çawa ku di sedsala 19. de para bêtir li gorî dewletên netewe bûn, di şert û mercên roja me ya îro de jî ango li gorî rastiyên sedsala 21. jî li gorî neteweyên demokratîk û di her astê de li cem rêveberiyên xweser ên bajar, xwecihî û herêmî ne.

Çawa ku di dîroka xwe de gelek caran kiriye, ji bo lîberalîzm careke din van meylên erênî yên demokratîkbûnê di bin hegemoniya xwe ya îdeolojîk û maddî de nerizîne û nehelîne, eşkere ye ku divê mirov gelekî bi baldarî tevbigere. Wezîfeyeke herî girîng a stratejîk a modernîteya demokratîk ew e ku bi qasî tevahiya dijberên sîstemê, meşa civaka dîrokî ya bi bajarvanî, pêkhatinên siyasî yên xwecihî û herêmî bi avahiyeke nû ya îdeolojîk û siyasî bike yek. Li ser vî bingehî, divê xebatên berfireh ên teorîk bi xebatên bername, rêxistin û çalakiyan di zikhev de bi pêş bixe. Şert û merc gelekî li cih in ku ji bo aqûbeta avahiyên konfederal ên di nîvê sedsala 19. de ji aliyê dewleta netewe ve hat tesfiyekirin di sedsala 21. de careke din dubare nebe, berevajî şert û merc gelekî li cih in ku ji bo rê li serketina konfederalîzma demokratîk vekin. Di dema kapîtala fînansê ya modernîteyê de pêxîrtengî gelekî zêde kûr û dewamî bûye û bi tenê bi birêvebirina krîzan li ser piyan tê girtin û dikare dewam bike. Ji bo mirov modernîteya demokratîk ji vê rewşê bigihîne serketinê, gelekî heyatî ye ku di xebatên jinûveavakirinê de em erk û wezîfeyên xwe yên entelektuel, polîtîk û exlaqî bi awayekî serketî bibin serî.

# 11- WEZÎFEYÊN JI NÛ VE AVAKIRINA MODERNÎTEYA DEMOKRATÎK

Armanca min a ji van şîroveyan ne ew e ku ez bîranînên rabihuriyê yên weke ‘serdema zêrîn’ têne binavkirin geş û zindî bikim, ne jî armanca min ew e ku ez ‘utopyayeke’ nû ya paşerojê tesewir bikim. Der barê herdu mijaran de jî manedar nabînim ku hêza tesewirkirinê nîşan bidim. Zêhniyetên civakî ji vî alî ve bi fikrên hûrûkûr barkirîbin jî ev ji wan vegotin û ravekirinan nînin ku alîkariyê bidin rastiyên civaka exlaqî û polîtîk ên ez hewl didim şîrove bikim. Herçiqasî em bi tevahî alîkariyên wan nikaribin înkar bikin jî divê haya mirovî ji fikarên der barê wan de hebe û bi vê serwextbûnê li ser wan bisekine û ji hin vegotinan re bike mijar.

Ji van aliyan ve têgîna modernîteya demokratîk ne hewldaneke xebardana ji ‘serdema zêrîn’ e, ne jî ‘utopyayeke cennetê’ ya der barê paşerojê de ye. Herweha şêweyeke civakî û serdemên dîrokî yên zanista pozitîvîst gelekî behsa wan dike jî nîne. Çi bi rêbazên metafizîk çi jî bi yên pozitîvîst hatibin bikaranîn, ez vegotinên civak û dîrokî yên bi vî rengî weke rêbaz qebûl nakim û tevî vê yekê divê kêm zêde ez ji aliyê xwe ve bibêjim, encamên yek mîna ya din diafirînin, şîroveyên rastî û heqîqetê berevajî îddîayên wan, hevdu nagirin. Ji bo fikirîna li tecrûbeyên malzemeyên dîrokê ez vê ji sedî sed hewce dibînim. Ne bi tenê malzemeyên dîrokê, li gorî min malzeme û tecrûbeyên xwezayî jî pêwîst in. Di vê mijarê de nêzîkatiya min mîna ampirîstekî tîpîk (ceribkar) nîne. Weke dijberê vê xwedî nêzîkatiya îdealîst (fikirkariya mutleq) a îddîa dike ji ceribandin û malzemeyên xwezayî û dîrokî serbixwe dikare fikrê çêke jî nînim. Ez dizanim bi van rêbazan tevahiya dîroka şaristaniyê kulliyatên gelekî mezin hatine çêkirin. Tevî ku ez bawer dikim, divê haya mirov ji van hebe, lê ez îqna nînim ku di şîrovekirina heqîqetê de dest ji wan nabe. Ez

hez dikim, diyar bikim ku bêyî van jî mirov dikare heqîqetê şîrove bike. Nexasim jî ekola lêkolîner a pozitîvîst a di nava pirrbûna malzemeyên dîrokê de xeniqî ye, di rewşeke pirr belengaz de ku dilê mirov pê bişewite dibînim. Herweha bi heman awayî şêxên gelekî bê malzeme û kerametên wan ji wan menqûl ên ji xeybê xeberê didin jî ez yeqîn nakim ku zêde têkiliya wan bi heqîqetê re heye. Ew di rewşeke gelekî sefîl û belengaz de ne.

Bi tenê rexnekirina nêzîkatiyên ampîrîk û îdealîst têrê nake. Gelekî girîng e ku mirov bi nêzîkatiya rexnekirinê bi ser şêweyên cuda yên van herdu rêbazan de biçe, ew jî rêbazên gerdûngirî, li ser xeteke rast pêşketin û îzafiyet in. Bi giştî heqîqet ne li ser xeteke rast a pêşketinê, ne jî bi rêbaza îzafiyetê tê avakirin û keşifkirin. Bêguman asta bilind a mejiyê nerm ê xwezaya civakî di avakirina rastiya civakî de alternatîfeke berfireh a azadiyê pêşkêş dike. Lê ev rewş weke ku rêbaza îzafî îddîa dike “Herkes çawa dixwaze wisa dikare rastiya xwe bi xwe ava bike” xwedî mane nîne. Heman rastî weke îdealîst jî yeqîn dikin “Her tişt çawa ku di Lewha Mehfûzê de hatiye nivîsandin wê pêk bê” xwedî mane nîne. Avakirina rastiyên civakî (xwezayên civakî ji klan heta netewe, çîn, dewlet û hwd.), weke rastiyên nû bi fikrên nû bi malzemeya civakî ya di nava şertên zeman û mekan ên heyî de were çêkirin weke rêya zêhnî û rêbaza herî rastî xuya dike yan jî dikare wisa were pejirandin.

Dubare bibe jî rêbaza hewl didim rave bikim ji sedî sed divê xwe bisipêre xwezaya civakî, nexasim jî rewşa hebûna wê ya bingehîn civaka exlaqî û polîtîk e ku ez jê bawer dikim û jê piştrast im. Ez hewl didim rave bikim ku bi tevahî ekolên fikrê yên têkiliya wan bi civaka exlaqî û polîtîk re nîne, berhemên zanist, felsefe û hunerê bivênevê wê seqet bên dinê, zû dereng wê rê li ber rewşên bi fikar vekin. Tevahiya pirsgirêkên rêbazê yên divê mirov bi wan ve girêdayî bimîne û berhemên wê yên agahî, etîk û estetîkê ji sedî sed divê civaka exlaqî û polîtîk esas bigirin, ez vê weke şertê pêşî diyar dikim. Ez dixwazim balê bikişînim ser wê rewşê ku li derveyî vî şertê pêşî rêbaz, agahî, etîk û estetîka pêk bê hemû seqet e, û bawerî bi wan nayê, bi şaşiyan barkirî ne, bi krêtî û xirabiyan tijî ne. Ez bi

israr rave dikim ku xusûsên behsa wan dikim bi tenê fikir û qenaetên min ên şexsî nînin, li ser rêya heqîqetê di asta nirxên bingehîn de ne.

Piştî ku min dubare nêzîkatiya xwe ya rêbazê der barê modernîteya demokratîk de rave kir, wê baş were fêhmkirin ku ez bi analîzên heta niha hewl didim ji du aliyan ve nêzîkatiyê pêşve bibim. Xusûsa yekemîn a ez hewl didim di analîzên xwe de bi israr bînim ziman ew e, sîstema şaristaniyê civaka bi wesfê exlaqî û polîtîk a ku rewşa heyî ya xwezaya civakî ye, timî rizandiye, îstîsmar kiriye, li serê yekdestdariyên mêtinkarî û desthilatdariyê ava kirine û bi pêş ketiye. Ev xusûs gelekî girîng e, û divê ji sedî sed were fêhmkirin û ji bo vê jî pêşkêşkirina analîzên hewce ferz dike. Min jî hewl da vê bikim. Li gorî şert û mercên ez di wan de, bi sînor be jî min hewl da malzemeyên di dest de bi kar bînim, lê belê bi awayekî bingehîn min rêya bivênevê ya heqîqetê ango jiyan, jiyana xwe bi vî malzemeyî re di zikhev de şîrove kir û hewl da sîstema şaristaniyê analîz bikim. Li gorî min zêde pêşkêşiya malzemeyê hewce nedikir. Tehlûke hebû ku min mijar di nava detayan de bifetisanda. Lê belê, bi daneyên min pêşkêşkirî jî bi awayekî eşkere min xwest li pêş çavan raxim ku bi tevahî jî bê malzeme nabe.

Encam ev bû: Gelo serdemên şaristaniyê yên dêwane, li gorî pêdiviya diyalektîkê, li hemberî kê hatibûn pêşxistin? Têkilî û nakokiyên xwe bi kê re, li ku derê û çawa hûnandibûn? Herçiqasî bi malzeme û hêza şîroveyê ya herî hindik be jî min xwe jê neda alî ku ez jî peyvên tên zanîn weke ’demos’ bi maneya yekûna têkîlî û dijberiyên wan, û ‘kratya’ jî bi maneya rêvebirinê bikim yek û bi vî rengî wan pêşkêş bikim, ji ber ku bi giranî di cîhana entelektuel de têne zanîn û bikaranîn. Bêgûman Demoskratiya tevahiya yekeyên civaka exlaqî û polîtîk nagire nava xwe. Belkî jî tam ‘Konfederasyona Eşîran’ îfade dike, çawa ku di serdemeke Îonyayê de pêk hat. Ji lewra dibe ku yekeyên civaka exlaqî û polîtîk yên jêrtir, jortir û yên din ên cudatir negirtibin nava xwe. Ya rasttir, ji dibeyê wêdetir nagire nava xwe. Lê ji ber ku ez yeqîn dikim ku ji bo niha ev peyv dîsa jî di nava yên heyî de ya herî di cih de ye, min ji bikaranîna wê xwe neda alî û dûr negirt. Eger dema pêş termînolojiyeke hê bêtir di cih de were peyda kirin,

bêgûman di warê bikaranînê de ez ê dudilî nebim. Ya girîng, naveroka wê ye; mebesta me jî naverok e.

Peyva duyemîn jî 'modernîte' ye, û zêde hewce bi ravekirina wê nîne. Çawa ku gelek caran tê gotin, dem, serdem û qederek dema pêkhatî û normên wan ên diyar îfade dike. Hingê em dikarin bibêjin, çiqasî serdemên şaristaniyan hebin bi qasî wan heta qatbiqat ji wan zêdetir demoskratiya û modernîteyên demokratîk jî hene. Ji ber ku gelek yekeyên civakê yên exlaqî û polîtîk hene ku sîstemên şaristaniyê bi tevahî xwe negihandine wan û nikarîbûne wan bixin yekdestdariya xwe ya mêtinkarî û desthilatdariyê. Dîrok di vî warî de têra xwe malzeme pêşkêş dike. Min jî di asta mînak de hewl da hinekan ji wan bînim ziman.

Duyemîn xusûsa girîng a der barê modernîteya demokratîk de ew e, xwe weke çanda maddî û îdeolojîk bi qasî sîstemên şaristaniyan bi rêxistin nekirine yan jî nikarîbûne bikin. Şaristanî ji ber ku neçar in rojane amûrên xwe yên yekdestdar ên mêtinkar û desthilatdar bixebitînin hem ji aliyê îdeolojîk ve têra xwe bi rêxistinî û gurçûpêç in, hem jî weke avahiya maddî divê di nava çalakî û yekîtiyê de bin. Di vê mijarê de dîrok têra xwe xwedî malzeme ye. Yê dixwaze dikare bi qasî dixwaze peyda bike. Lê yekeyên modernîteya demokratîk ji vî alî ve di heman pozîsyonê de nînin. Ya rastî, ji ber ku timî di navbera pozîsyona berxwedan û mêtingehbûnê de diçin û tên, hê bêtir li keviyan cih digirin, yekeyên wê yên serbixwe yên li serê çiyan û nava çolan jî ji ber ku pirr zêde pêş neketine nikarin bibin xwedî heman avahiya sîstematîka maddî û îdeolojîk. Ez naxwazim bibêjim hîç nikarin sîstem, avahî û îdeolojiyê pêş bixin. Bêguman bi avahiyên çandî yên maddî û îdeolojîk ên hê dewlemendtir pêşkêş kirine û dîrok bi wan tijî ye. Ji ber hegemoniya îdeolojîk a şaristaniyê zêde wan nadin der û divê mirov ti carî guman neke ku ji vî alî ve dîrokê gelek daneyên dewlemend pêşkêş kirine.

Min hewl da, bi xetên sereke serê herdu şaristaniyan heta roja me ya îro bişopînim. Ez yeqîn dikim ku tevî hemû birêkûpêkirina min a çor, kêm be jî min meylên sereke nîşan dan. Nexasim wê were dîtin ku min hewl daye modernîteya weke kapîtalîst tê binavkirin bi awayekî berfireh analîz

bikim. Dîsa çavdêrekî baş dikare bişopîne ku min li beramberî vê di dema heman modernîteyê de rewşa dijberan jî bi berfirehî tevî hin rexneyan pêşkêş kir. Encama divê mirov ji van rexneyan derxe ew e, modernîteya demokratîk ji bo xwe ji nû ve ava bike bi wezîfeyên bi çi rengî re rûbirû ye. Em dizanin, hêzên modernîteya kapîtalîst a fermî bi pêşengiya lîberalîzmê, çi xwe nûkirîbin çi jî xwe nûnekirîbin, gelekî jêhatî û bi tecrûbe ne, bi tevahiya hêz û derfetên xwe, xwe di her şikil û şibêtî de pêşkêş bikin. Lê heman xusûsan em nikarin ji bo hêzên modernîteya demokratîk diyar bikin. Çi ji aliyê dîrokî ve çi jî ji aliyê tecrûbeyên dema nêz a rabihurî ve, em dibînin ji aliyê îdeolojîk ve çawa hatine helandin û naveroka xwe ji dest dane û em vê di helwesta wan a li dijî lîberalîzmê de dikarin bi hêsanî bişopînin. Bi qasî ku ji dest bê divê mirov nekeve van rewşan, herî kêm divê careke din firsendê nede rewşên têra xwe trajîk ên rabihuriya nêz, lewma gelekî girîng e ku mirov erkên ji nû ve avakirinê yên yekeyên modernîteya demokratîk zelal bike.

Dema ez yeke dibêjim, mebesta min tevahiya tevger, ferd û koman e, ku kêm zêde bi rewşa dijber a sîstemê dizanin û di vê rewşê de ne. Ev hebûnên ku bi giranî xwezaya civakî pêk tînin, mixabin berevajî hejmara xwe ya zêde ji aliyê naverokê ve hêzeke kêm in. Armanca ji nû ve avakirinê divê beriya hertiştî ew be, pirraniyên ji aliyê hejmarê ve bigihîne hêzeke xwedî naverok. Eger kêliyek be jî em ji bîr nekin ku şebekeyên yekdestdariyê yên bazirganî, sinaî, fînansî, îdeolojîk, desthilatdarî û dewleta netewe yên di asta global de çiqasî berfireh, di zikhev de û li dijî hedefên xwe çiqasî tineker û tevlîhevker tevdigerin, herî kêm ji bo bê tewazuniya gelekî mezin a di navberê de were rakirin, bi jinûveavakirina yekeyên modernîteya demokratîk li gorî pirraniyê divê tewazuneke hêzê pêk bê û eşkere ye ku ev jî wezîfeyek e ku paşve nayê xistin. Mirov dikare van erk û wezîfeyan di bin sernavên sereke de diyar bike. Ev hersê erkên hişk bi hev ve girêdayî ne; hêmanên entelektuel, exlaqî û polîtîk in. Lê hişk bi hev ve girêdayîbûna wan, nayê wê maneyê ku weke sazî misoger pêdiviya wan a serbixwe ji holê radibe. Berevajî her sazî weke qadekê çawa di dîrokê de bû, di roja me ya îro û paşerojê de divê pozîsyona xwe

ya serbixwe biparêze. Yan na nikarin bi qasî divê bi kêr bên. Divê mirov erk û saziyên têkildarî van qadên wezîfeyê yên di dîrokê de têra xwe di zikhev de bûn, zelal û birêkûpêk bike bê ka wê çawa hevkariyê bikin û ev yek ji wan xusûsan e ku divê were analîzkirin.

Ji vî alî ve mirov dikare pêvajoya dîrokî bi hin mînakan rave bike û ev jî dikare pêşiya me rohnî bike. Di yekeyên qebîleyan de wezîfeyên entelektuel, exlaqî û polîtîk bi giştî di zikhev de têne pêkanîn. Pisporî û xweserî zêde pêş neketiye. Konfederasyonên eşîran bi giranî bi wezîfeyên polîtîk re têkildar in. Rêûresma exlaqî ji aliyê pîran ve tê temsîlkirin, fikirîn û rewşenbîrî jî zêdetir ji aliyê şaman, jîrik, şêx an jî mekanîzmeyên rahib ve tê temsîlkirin. Hersê wezîfeyên di asta exlaqî û polîtîk de dînên Brahîmî di demên dirêj ên dîrokê de girtin bi sazî dibin. Di Îslamê de medrese zêdetir bi rola saziya entelektuel radibe, mizgeft bi ya exlaqî, seltenet jî bi rola saziya polîtîk radibe. Lê ji ber ku gelekî zêde ketine zikhev, vê yekê rola wan a afirîner asteng kiriye. Herî kêm bi qasî Xiristiyantî û Musewîtiyê pêşneketina wan ji nêz ve bi vê rastiyê ve girêdayî ye. Statuya wan a ekumenîtî an jî ummetê şêweyê serwer ê girêdana di navbera wan de ye, bi awayekî enternasyonalîzma wan temsîl dike.

Di şaristaniya Greko-Romen de entelektualîzm hinekî serbixwe dibe. Ekolên felsefeyê zêdetir saziyên entelektuel in. Serbixwebûna wan gelekî pêşketî bû. Exlaq li perestgehê, polîtîka pêşî li meclîs û senatoya komarê bi sazî bû, paşê jî bi pêşketina împaratoriyê re derbeke mezin xwar. Împaratorî bi awayekî di asta navendî de înkara sazîbûna polîtîkayê ye. Reşkujiya J. Sezar ji nêz ve bi vê rastiyê re têkildar e.

Di modernîteya serdema nêz de entelektuelîzm di nava pencê zanîngehan de asê ma, exlaq derbeke mezin dixwe û bi tinebûnê re rûbirû dibe. Dixwazin li şûnê huqûqa pozitîv deynin û bi vî awayî hewl didin rola exlaq a di civakê de tesfiye bikin. Di bin navê parlementerîzmê de cih li polîtîkayê jî tê tengkirin û di bin îdareya burokrasiya dewleta netewe de hema dikin ku bitevize, nexebite. Mîna exlaq bi awayekî rastî nikare bi rola xwe rabe. Di yekeyên modernîteya demokratîk de pêşketinên saziyan ên cûrbicûr û tevlîhev pêk tên. Rêxistinên biratiyê bi awayekî hersê

wezîfeyan jî di şexsê xwe de dikin yek. Utopîk jî di rewşeke bi heman rengî de ne. Wezîfe û xisletên entelektuel, exlaqî û polîtîk bi awayekî li dora heman şexsî bi şêweyê terîqetekê fonksiyonel dibin û têne bicihanîn. Nexasim di pêvajoya sosyalîzma pêkhatî de li cem Lîga Kominîstan, Enternasyonala I., II. û III. ev hersê sazîbûn di zikhev de pêk hatin. **Manîfestoya Kominîst** weke bernameya hevpar a van sazîbûnan e. Bi heman rengî wan meyla asîmîlasyonîst a modernîteya kapîtalîst a der barê qada hersê wezîfeyan de parve kiriye. Polîtîka weke sazî kirine qurbanê mekanîzmayên îdarî yên dewleta netewe ya xwedayî, exlaq jî di nava heman mekanîzmayê de kirine qurbanê huqûqa pozitîv a ku esareta welatî pêk tîne. Wezîfeya entelektuel jî li zanîngehên bi rola perestgeha nû ya dewleta netewe radibe, fedayî entelektueliya sermayedar û hemal (kerê barhilgir ê zanînê) hatiye kirin an jî ew dane înkarkirin.

Ev agahiyên kurt ên der barê dîrokê de jî nîşan didin ku yekeyên modernîteya demokratîk naxwazin weke civak bi temamî ji hev belav bibin, divê xwe bi şêweyên tevn û torên dijber bi van hersê erk û wezîfeyan gurçûpêç bikin.

Berî ku ez yek bi yek li ser van hersê erk û wezîfeyan rawestim, divê bi kurtî ez behsa mijarên yeke, tevn û torê jî bikim, bawer dikim ku bi vî awayî em ê karibin ber xwe bibînin. Ji yekeyê mebest her cure koma dijberê yekdestdariyê ye. Ji neteweya demokratîk heta bi komeleyeke gund, ji konfederasyoneke navneteweyî heta bi şaxekî kolanê her kom yekeyek e. Ji qebîleyê heta bi bajêr, ji xwecihî heta bi neteweyî her organa rêveberiyê jî yekeyek e. Di nava vê dewlemendiya maneyê de mirov li têgînê binêre mirov ê bêtir karibe jê hîn bibe. Lê li vir a girîng ew e, yeke hemû, her yek ji wan weke civaka exlaqî û polîtîk bêne nirxandin. Ji lewra di asta prensîbê de ye ku her yek di wezîfeyên entelektuel, exlaqî û polîtîk de paydar bin. Ji bo yekebûnê hewcedarî bi civakbûna exlaqî û polîtîk heye, ji bo civakbûna exlaqî û polîtîk jî pêdivî bi girêdana wezîfeyên entelektuel, exlaqî û polîtîk heye. Rewşa tevn û şebekekebûnê jî têkiliya xwe bi rewşa rêveberî û avabûna rêxistinî ya qutbê dijber re heye. Herweha yekîtiyên hundirî dikarin bi tevnên herî baş yek bi ya din re xwe bi rêxistin bike.

Rêxistiniya hişk a navendî û hiyerarşîk a bi fermanê û rêveberiya wê, bi temamî berevajî prensîbên rêxistinî û birêveberiya yekeyên modernîteya demokratîk e.

## A- Wezîfeyên Entelektuel

Ez divê pêşî bibêjim ku ez ê wezîfeyên entelektuelî weke ji rêzê pêkanîna têgihiştinê û veguhestina yeke yan jî komikan diyar nekim. Ya pêşî divê were kirin ew e, divê mirov entelektueliyê bi xwe binirxîne. Gelek caran tê gotin 'serdema Rohnîbûnê' (Ewrûpaya sedsala 18.) modernîte diyar kiriye. Di serî de qirkirina Cihûyan, bê hejmar qirkirinên çandî û fizîkî yên bi awayekî sîstematîk ji aliyê dewleta netewe ve hatin pêkanîn derbên kuştinê li îdeaya rohnîbûnê ya modernîteyê dan. Ev ew kêlî ye ku entelektuel Adorno ji bo wê gotiye divê tevahiya xwedayetiyan bêdeng bibin. Di heman demê de qonaxa dawî ye ku şaristanî gihiştinê. Ev kêliya herî girîng e; eger neyê analîzkirin û ji hev neyê derxistin, mirov nikare gavekê jî pêşde biavêje. Em behsa kêliyeke dîrokî ya îflas, derew û qirkirinê dikin. Entelektuelî weke çalakiya rohnîbûn, zanebûn, serwextbûn û têgihiştinê nikare xwe ji vê kêliyê bişo. Divê weke yek ji gunehkarên sereke were dadgehkirin. Mirov vî gunehî bi tenê li çend Hîtleran bar bike, propagandaya herî rezîl a lîberalîzmê ye. Eger sîstema ku Hîtler ji dergûşê heta bi gorê xwedî kir neyê ravekirin, heqîqet ê neyê ravekirin; herî zêde ev ê bibe xiyanet li heqîqetê. Wezîfeya bingehîn a entelektueliyê ew e, 'li ser şopa heqîqetê be', lê eger li vê xiyanet hatibe kirin, hem jî ev xiyanet têra xwe ji aliyê hemalî û sermayedariya entelektuel ve hatibe kirin, hingê xusûsên divê ji binî ve di ber çavan re bêne derbaskirin wê hebin. Di qada entelektuelî de heta mijarên divê di ber çavan re bêne derbaskirin neyên analîzkirin, statuya pêk bê wê ji bûna hemal û entelektuelên sermayedariyê yên nû wêdetir ti encamê nede.

Eger krîza global a sîstemîk bi tenê bi rêveberiya krîzê ya awarte bê rêvebirin û mirov behsa krîza entelektuelî neke yan ev ji ber korbûnê ye yan jî ev ji ber îflehnebûniyeke hemaltî û entelektueliya sermayedariya

sîstemê ye. Entelektuelekî ji rêzê yê bi rûmet, zehmetiyê nakişîne ji bo fêhm bike krîz bi awayekî bingehîn ji ber asêbûna di warê zêhniyetê de ye. Jixwe di navbera avahiyên sîstemê zêhniyetên wê de têkiliyeke weke ya di navbera ruh û beden de heye. Ji aliyê avabûnê ve krîza bedenê, weke ruh krîza zêhnî tenê hewce nake, krîza zêhnî dike pêşeng. Pêşektî ne ya bedenê ye, ya krîza ruhî ye. Çawa ku mirina mejî mirina bedenî misoger dike û delîlê wê ye, krîza zêhniyetê jî dikare bibe delîlê krîza avabûnê. Ya rastî, krîzeke kûr a entelektueliyê vebirrî heye. Ji ber ku bi nûkirinên li hin qadan wê çareser nebe, divê bersiva mirov bide krîzê kûr be; ango têkildariya wê bi veguherîna sîstemê re hewce dike. Krîza entelektuel a sîstemê bi jêbihurînê ango bi 'şoreşa entelektuelî' mumkîn e. Berî ku ez behsa şoreşa entelektuelî ya roja me ya îro bikim, divê ez qala hin mînakên dîrokî bikim, ji ber ku wê bihêlin em ber xwe bibînin û baştir li mijarê serwext bibin.

Bi qasî ku mirov dikare şîrove bike, di dîrokê de şoreşa mezin û pêşî ya entelektuelî li Mezopotamyayê di navbera demên 6000-4000 B.Z. de pêk hat. Ev dem ew dem e, cara pêşî ye ku hêza dînamîkên xwezayî û civakê bi berfirehî çavdêriya wan tê kirin û di asteke gelekî mezin de encamên wê yên pratîk têne dîtin û Gordon Childe dibêje mirov dikare vê demê bi tenê bi Ewrûpaya piştî sedsala 16. re bide ber hev. Hê jî pirraniya destketiyên hem ji aliyê zêhnî û hem jî ji aliyê amûran ve, ji wê demê mayî ne. Duyemîn şoreşa mezin, dema damezrandina şaristaniyên Sumer û Misrê ye. Di dema pêşî de wê ji wan bê ku karibin destketiyên şoreşê yên hem ji aliyê zêhnî û hem jî ji aliyê amûrî ve veguherînin sîstema şaristaniyê. Di serî de nivîs, matematîk, wêje, tib, astronomî, teolojî û biyolojî di qadên cûrbicûr de gelek îcad û vedîtin berhemên pêşketina vê dema entelektuelî ya şoreşgerane ne. Dîrok ê paşê heta bi şoreşa Grek-Îonyayê bi hînbûna van pêşketinan û dubarekirina wan re mijûl bibe û dema xwe bibihurîne.

Şoreşa entelektuelî ya Grek-Îonya sêyemîn gava mezin teşkîl dike. Dema 600 B.Z. hem ji aliyê zêhniyeta felsefî hem jî ji aliyê zanistiyê ve demek e ku gelekî dewlemend e. Ji dînên bi mîtolojiyê têkel gavavêtina felsefeyê, bêguman şoreşeke mezin a entelektuelî ye. Herweha di qada nivîs, wêje,

fizîk, biyolojî, mentiq, matematîk, dîrok, huner û polîtîkayê de pêşketinên şoreşî pêk hatin. Heta bi sedsala 16. dîrok bi tenê bi veguhestin û dubarekirina berhemên van şoreşan pêk hat. Bêguman li gelek zeman û mekanên din gelek pêşketinên entelektuelî pêk hatine. Lê ev şoreşên mezin nayên hesibandin. Mirov dikare derketina dînên yek xwedayî weke şoreşên girîng ên zêhniyetê şîrove bike. Herweha şoreşa exlaqî ya Zerdeştî şoreşeke mezin a entelektuelî ye. Li Çînê Konfuçyûs, li Hindê Bûda xwedî nirxekî girîng ê entelektuelî ne. Di sedsalên 8.-12. de çirîskên entelektuelî yên di Îslamê de girîng in. Heyf û xisareke mezin bû ku ev veneguherîn şoreşê.

Bêguman şoreşa entelektuel a Ewrûpayê bi kok û berfireh e. Lê rastiyek e ku çavkaniyên wê şoreş û çirîskên me behsa wan kirî ne. Ez divê tavilê bînim ziman ku bi tevahî şoreşên entelektuel ti têkiliya xwe bi yekdestdariyên mêtinkarî û desthilatdariyê re nînin. Berevajî ji ber van yekdestdariyan bi awayekî hêja pêş neketin, ji rê hatin derxistin, korkirin û van yekdestdariyan ew hê bêtir bi xwe ve girêdan û kirin sermaye. Di şoreşa mezin a entelektuel a Ewrûpayê de ev rastî hê bêtir eşkere û balkêş e. Ji bo şoreşên entelektuel asteng bikin, ji rê derxin û bi desthilatdariyên xwe ve girê bidin, weke yekdestdsariyên dewletê û yekdestdariyên kapîtalîst sîstemên mutlaqiyetê û dewleta netewe gelekî hewl dane û ev ji karên xwe yên sereke hesibandine. Di vê mijarê de têkoşînên mezin hatine kirin. Zanyar û şexsiyetên mîna Brûno, Erasmûs, Galîleo, Thomas Moore û yên weke wan ji bo serxwebûna xwe ya entelektuelî biparêzin û rûmeta xwe binpê nekin, ji engîzîsyonan heta bi dadgehên şoreşê yên Franseyê li dijî zilma bê eman û xedar a desthilatdariyê li ber xwe dane û şewitandina xwe jî dane ber çavên xwe.

Di sedsalên 19. û 20. de çawa ku di her qad û koma civakê de hat dîtin, di qad û koma entelektuel de jî hegemoniya yekdestdariya sermayeyê û dewleta netewe xwe bi hêz nîşan da. Zanist, felsefe, huner û heta dîn bi desthilatdariyan, nexasim jî bi avahiyên dewletên netewe ve bi giranî hatin entegrekirin. Yekdestdariyê di herdu qadan de jî derbeke mezin li serxwebûna entelektuel da. Entelektueliya di bin hewcedariyê de yan

veguherî entelektueliyeke sermayedariyê yan jî bi pirranî li zanîngeh û sîstemên din ên dibistanan veguherî hemalê zanînê. Di serî de zanîngeh, avahiyên dibistanan bûn perestgehên nû yên her dewleta netewe. Mejî û ruhê nifşên nû li van deran tên şuştin; bi qasî ku bi ti demê re mirov nikaribe bide ber hev, kirin ku welatî-evd ji xwedayê dewleta netewe re serê xwe xwar bikin. Bêguman tektûk rewşenbîrên heysiyeta xwe ya entelektuelî diparêzin hene. Lê bi qasî ku pîvana giştî xira nekin îstîsnayî ne.

Ya ji vê jî girîngtir, bi bûyerên di naveroka şoreşa entelektuel a Ewrûpayê de têkildar in. Berê pêşî divê mirov diyar bike ku dîn, zanist, felsefe û hunerên serdemên berê baş dawerivandine û qebûl kirine. Eşkere ye ku alîkariyên xwe sipartine van dawerivandinên xwe. Divê mirov qebûl bike ku entelekteulên Ewrûpayê di warê nêzîkbûna heqîqetê de ji gelek qonaxan bihurîn. Di warê rêbaz û bicihanînê de serketina wan misoger e. Nexasim ji aliyê Xwezaya Yekemîn ve (di warê fizîk, kîmya, biyolojî û astronomiyê de) serketina wan bi vî rengî ye. Lê weke Xwezaya Duyemîn der barê civakê de ji aliyê nêzîkatiyên wan ên zanistî, felsefî, hunerî û exlaqî ve mirov nikare behsa heman xusûsan bike. Daxuyaniyên mezin û manedar (manîfesto), disiplînên zanistî, ekolên felsefî, meylên hunerî û doktrînên etîk pêşde birin. Lê bi qasî ku karibin karekterê exlaqî û polîtîk ê civakê biparêzin serketî nebûn. Berevajî, çiqasî bi yekdestdariyên sermaye û desthilatdariyê ve hatin girêdan, heta ku civaka exlaqî û polîtîk anîne ber îmhayê hevpariya guneh kirin, bêguman ev hevkariya wan a guneh bi tenê bi kêmasî, şaşî û qelsiyan nabe were ravekirin. Krîza entelektuel bi vî awayî destpê kir.

Bêguman ne bi tenê di warê civakê de, di heman demê de ji ber ku hawîrdor jî ket hedefa îmhayê, ji sedî sed dîsa berpirsiyariya entelekteulan heye. Jixwe ji ber ku krîz muşterek e, ji krîza global muştereken berpirsiyar têne girtin. Li vir xusûsa divê were rohnîkirin ew e, têkçûn, xirabûn û çeloxwarîbûna entelektuel weke stratejîk û taktîk çawa pêş ketiye. Nexasim ji pêşketina têkçûn, xiyanet û hengameya mezin a di qada zanistên civakî de (Ez divê berê pêşî bîrûbaweriya xwe bînim ziman ku

zanistên der barê Xwezaya Yekemîn de bi wesfê civakî ne yan jî divê welê bin) divê em çi berpirsiyar bigirin? Gelo bi tevahî der barê paradîgmaya wê ya zanistî de nexweşiyek heye? Gelo mirov li para mezin di hin disiplînan de bigere? Gelo nexweşî binyewî ye yan jî arizî ye? Gelo dermankirina wê pêkan e? Rê û rêbazên dermankirinê divê çawa bêne pêşdebirin? Divê nîşaneyên sereke yên şoreşa zanistî ya nû û paradîgmayê çi bin? Ji aliyê stratejîk ve divê em ji ku destpê bikin? Kengî me bi xwe bersiva van pirsan û yên weke wan da, bi qasî xelasiya ji krîza entelektuel, em ê ewqasî jî karibin wezîfeyên xwe yên nû yên paradîgmatîk û zanistî diyar bikin.

Krîza zanistê ya navend şaristaniya Ewrûpa, binyewî ye. Bi bûyer û pêşketinên dema destpêka şaristaniyê re têkildar e. Zanist li perestgehê navendî dibe û ev jî tê wê maneyê ku bi desthilatdariyê re bûye yek. Gelek mînak hene ku piştrast dikin, zanista di dema şaristaniya Sumer û Misrê de wer bi desthilatdariyê re bûye yek jê nabe. Rahibtiya ku zanistê bi rêkûpêk dike jixwe yek ji hevparê girîng ê desthilatdariyê ye. Lê di dema neolîtîkê de avahiya zanistê cuda bû. Zanîna jinê der barê nebatan de belkî jî bingehê biyolojî û bijîşkiyê bû. Herweha çavdêriyên wê yên meh û demsalan hesabkarî derdixist holê. Bi hêsanî mirov dikare pratîka jiyanê ya hezarê salan a komên gund û cotkariyê weke xizneke mezin a zanînê şîrove bike. Di dema şaristaniyê de ev agahî hatin birêkûpêkkirin û kirin parçeyek ji desthilatdariyê. Li vir bi awayekî neyênî ji aliyê naverokê ve veguherînek pêk hatiye.

Di civakên beriya şaristaniyê û civakên dijber ên dema wê de zanist û agahî, parçeyên civaka exlaqî û polîtîk in. Heta ku berjewendiyên heyatî yên civakê ferz nekin, gengaz nîne ku zanist bi awayekî din were bikaranîn. Armanca bi tenê ya zanîn û zanistê dikarîbû dewamkirina hebûn, parastin û debara civakê bûya, wekî din li armanceke din nedihat fikirîn. Şaristaniyê ev rewş ji binî ve guhert. Li ser zanîn û zanistê yekdestdariya xwe danî û ew ji civakê qut kirin. Civak ji zanist û zanînê hat mehrûmkirin, hêzên dewlet û desthilatdariyê bi zanîn û zanistê têra xwe bi hêz bûn. Afirînerên zanînê û barhilgirên wê bi xanedanî û qesran ve

girêdan û bi vî awayî yekdestdariyên xwe qehîm û tekûz kirin. Bi vî awayî, ev dihat wê maneyê ku zanist ji binî ve ji civakê, nexasim jî ji jinê dihat qutkirin ango ji jiyan û hawîrdorê dihat qutkirin. Di heman demê de têkiliya mejiyê analîtîk ji mejiyê hisî dihat qutkirin û vê yekê jî dikir ku misêwa ji hev dûr bikevin.

Maneya zanistê di xwezaya civakî de xwedatî ye. Civak asta zanîn û zanista der barê xwezaya xwe de weke îfadeya nasnameya xwe dike xwedayî bi xwedatiyê re yek dihesibîne. Şaristaniyê ev rewş jî guhert. Kengî zanist ket destê xanedan û hevparên wan, xwedatiyê jî rewşa xwe guhert. Ji civakê re êdî evdîtî û payeyên ne yên xwedatiyê, ji xanedan û yên nêzî wan re jî payeya esilzadeyên xwedayan hêja hat dîtin û bi vî awayî di mîtolojî û dîn de cih girtin. Qralên xwe kirin xweda û esilzadeyên xwe kirin xwedayî berhemên pêvajoyeke bi vî rengî ne. Bi vî awayî qutkirina têkiliyên barhilgir û afirînerên zanîn û zanistê tevahiya serdemên şaristaniyan dewam kir. Herçiqasî yên li ber vê rabûn derketin holê jî pirr bi hêsanî hatin tesfiyekirin. Zanîn û zanistê bi awayekî kastek pêk anî. Di dema şaristaniya Ewrûpayê de, nexasim ji ber xwe li hev rakişandina qraltî û dêrê û dîsa ji ber qismê hewaya xweser a keşîşxaneyan afirînerên zanîn û zanistê demeke serbixwe ya bi sînor dîtin. Şerên zêde yên desthilatdariyê bêyî ku zirarê bide lêkolînên wan, firsend û keys dida wan ku bi hêsanî parêzvanan bibînin. Ronesans, Reform û Rohnîbûn bi van şerên desthilatdariyê yên rê li rewşeke xweser vedikirin ji nêz ve têkildar in. Tinebûna mutlaqiyeteke bi şêwazê Çîn û Osmaniyan alîkariya xweseriyê dikir. Di encamê de şoreşa felsefî û zanistî pêk hat. Lê ji aliyekî ve bilindibûna hegemonîk a kapîtalîzmê, ji aliyê din ve jî pêkhatina dewleta netewe, di sedsala 19. û 20. de damezrandina yekdestdariya sermaye û desthilatdariyê li ser zanistê bi xwe re anî. Zanist êdî parçeyekî sermaye û desthilatdariyê bû ku ji wan nedibû. Jixwe ev rewşa ku tevahiya dîroka şaristaniyê li dijî civaka exlaqî û polîtîk pêş ket, bi modernîteya Ewrûpayê re derket asta herî jor.

Ev tê wê maneyê ku paradîgmayên zanistî yên navenda wan Ewrûpa ji mêj ve ji civakê qut bûne. Yên bi zanîn û zanistê re mijûl dibûn bi giranî

xwedî perspektîfa sermaye û desthilatdariyê bûn. Civaka exlaqî û polîtîk ji zû ve bê qîmet bûbû. Bi têkçûna dêrê re ev pêvajo bi leztir bû. Zanista ku fikara wê ya bingehîn civaka exlaqî û polîtîk nîne, êdî ji hedefên sermaye û dewletê pêve ti qadeke xwe ya mijûlbûnê tineye. Zanist êdî desthilatdarî û sermayeyê diafirîne, sermaye û desthilatdarî jî zanistê gelekî baş dikin malê xwe. Zanist heta dawiyê têkiliya xwe bi exlaq û polîtîkayê re qut dike û ev jî dihêle ku derî heta dawî li her cure şer, pevçûn, bihevketin û îstîsmarê vebe. Jixwe dîroka şaristaniya Ewrûpayê di heman demê de dîroka gelek şeran e. Rola didin zanistê ew e, divê êdî amûrên şer ên bêqusûr û wan bibe serketinê îcad bike. Bi vî awayî di encamê de gihiştin heta çêkirina sîlehên nukleer. Di civakekê de ku pîvanên civaka exlaqî û polîtîk serwer bin, ne sîlehên nukleer, patpatkek jî nayê îcadkirin. Bihata îcadkirin jî bi kêmanî li dijî civakê nedihat bi karanîn.

Hilweşîna exlaq, hêmanê bingehîn e ku ji bo şer destpê bikin. Qutbûna têkiliya zanist û exlaqê bingehê vedîtina her cure amûrên hilweşîner e. Ne pêkan bû ku ev têkiliya di navbera zanist, desthilatdarî û civakê de xwe di rêbaz û paradîgmaya bingehîn de nîşan nedaya. Ji dewreyê derxistina civakê dihat wê maneyê ku civakê dikin obje. Çawa ku berê jin û kole kirin obje. Piştre cihêkirina obje û sûbje ya bi Bacon û Descartes destpê kir, derbasî nava zanistan hemûyan bû. Di zanistê de pesnê objebûnê gelekî tê dayîn. Lê ya rastî, kengî navbera objetî û sûbjetiyê gelekî vebû, derî jî li felaketa herî mezin vebû. Piştre ev navber bi jihevkirina ez û yê din zêdetir mezin bû. Paşê ev veguherî seriyên diyalektîk ên hevdu tine dikin. Ev dualîte ji sedî sed navbervebûna civaka exlaqî-polîtîk û sermaye-desthilatdariyê nîşan dide. Kolekirina xwezayê, piştre ya jin û koleyan, herî dawî jî kirina obje ya tevahiya civakê, di zanistê de weke ‘pîvana objektîviyê’ ya navdar a hê jî tê bikaranîn derket pêşiya me. Têkiliya berê ya xweda û evd, vê carê vugeherî têkiliya obje û sûbje. Li şûna têgihiştina gelekî berê ya xwezaya zindî, têgihiştina objeya mirî xweza ye, û li ser wê sûbjeya xwedayî mirov cih girt.

Ev nêzîkatiyên paradîgmatîk bandora wan li ser zanistê nexasim jî li ser zanistên civakî hilweşîner bûye. Mînak, fizîknas ên li ser xwezaya fizîkî ya

bi temamî objektîv e, analîzan dikin, bawer dikin ku azad in, li ser xwezayê bê sînor ceribandinan û tesarufê bikin. Xwe azad dibînin ji ceribandinên nukleer heta bi her cure otodînamîkan bixin nava tevgerê. Wexta ku vê yekê dikin fikareke wan a exlaqî nîne. Kengî têgihiştina xwezaya objektîv mafê bê sînor ê tesarufê li ser maddeyê bide, encam ê heta bi bombeya atomê biçe. Zanista xwedayî veguhere zanista amûrî wê ti têkiliya xwe bi civakê re nemîne. Di destê desthilatdarî û sermayeyê de wê veguhere amûrekî qanûna kara herî zêde. Bi awayê xuya dike fizîk bi temamî bê alî ye û zanistek e ku bi xwezaya objektîv re mijûl dibe. Lê eşkere ye ku bi xwe yek ji çavkaniyên hêza bingehîn a sermayeyê ye. Di rewşeke berevajî de zanista fizîkî nikarîbû rewşa xwe ya heyî biparasta. Veguherîna wê ya hêzeke dijberê civakê nîşan dide ku zanisteke objektîv a wisa bê alî tineye. Li gorî tehlîla dawî têkiliyên hêzê yên weke qanûnên fizîkê têne binavkirin ji bilî nîşandana hêza mirov ti maneyê îfade nakin. Mirov jî em dizanin ku ji sedî sed hebûneke civakî ye.

Dema em felsefeya pozitîvîst a mohra xwe li tevahiya avahiya zanistî ya moderníteyê xistî şîrove bikin, em ê karibin rûyê rastî yê têkiliya şaristanî-desthilatdarî-zanistê baştir derxin holê. Em dizanin felsefeya pozitîvîst bi diyardeyên objektîv ên vebirrî dikeve rê û ji bilî vê rê nade ti nêzîkatiya zanistî. Dema ku mirov ji nêz ve lê binêre, mirov ê karibe fêhm bike ku zanista weke têkiliya objeyan ji tevahiya pûtperestiyên berê pûtperesttir û ji hêzên metafizîk zêdetir pûtperest û metafizîkperestir e. Di vê mijarê de eger em diyalektîka dîrokî bi kurtî bi bîr bixin, em ê zêdetir serwext bibin. Çawa ku dînên yek û mucered xwedayî li ser bingehê rexnekirina paganîzmê (pûtperestî, bi awayekî dînê diyardeyan dike xwedayî) derketin holê û xwe bi gewde kirin, pozitîvîzm jî bi awayekî weke êrişeke dijber bi şêweyê pûtperestiya nû derket holê. Rexnekirina dîn û metafizîkê weke pûtperestiya nû (heqîqetgiriya xwe disipêre diyardeya vebirrî paganîzm e), weke neo-metafizîkê bi gewde bûye. Gelekî girîng e ku F. Nietzsche ji wan fîlozofan e, ev rastî pêşî tespît kiriye û nirxandinên wî ji bo lêkolînên heqîqetê di wê astê de ne ku alîkar bin. Gelekî girîng e ku tespît kiriye têgîna diyardeya objektîv têgîneke ji heqîqetê dûr e. Diyarde

bi serê xwe der barê heqîqetê de yan ti agahiyeke manedar nadin an jî bidin rê li ber gelek encamên şaş vedikin.

Me gotibû, eger diyarde di çarçoveya têkiliyên tevlîhev de maneyê nebînin, yan hîç agahiyê nadin an jî bidin dikarin rê li ber encamên herî şaş vekin. Em diyardeyên fizîk, kîmya û biyolojiyê bidin aliyekî. Em bi tenê li ser mînakeke diyardeya civakî rawestin û ji nêz ve binêrin ka rê li ber çi encaman vedike. Li gorî pozitîvîzmê dewleta netewe diyardeyek e. Hêmanên wê pêk tînin jî bi tevahî her yek ji wan diyardeyek e. Bi hezaran sazî û bi mîlyonan mirov jî her yek ji wan diyardeyek e. Em dema têkiliyên di navbera wan de jî li vê zêde bikin resim temam dibe. Li gorî pozitîvîzmê me têgîna zanistî pêkanî. Êdî em bi heqîqeteke mutleq re rûbirû ne: Heqîqeta dewleta netewe! Pozitîvîzm weke şîroveyekê li vê pênaseyê nanêre weke diyardeyeke heqîqetê lê dinêre. Li tevahiya diyardeyên zanista civakî bi vê têgihiştinê dinêre. Mîna yek ji diyardeyên fizîk, kîmya û biyolojiyê, ev jî yek ji diyardeyan e. Pênaseya wê ya heqîqetê bi vî awayî ye. Bi awayê xuya dike, ev nêzîkatî gelekî bê guneh xuya dike û ti tehlûkaya wê nîne, lê ev welê nîne, nexasim jî di tevgerên qirkirin û kokqelandina etnîkî de em li tevahiya vê xeternakiyê hayil bûn. Ji Hîtler bigirin heta bi lîderê dewleta netewe yê qaşo herî nerm wê hemû bibêjin, ya dikin li gorî zanistê heta dawiyê rast e (li gorî zanista pozitîv), rastiya netewe dadiwerivînin, neteweyeke hê homojentir bi tenê ne heq, li gorî qanûna beridîna xwezayê pêşketineke di cih de ye. Li gorî zanista esas digirin rast dibêjin. Vê hêza xwe ji felsefeya pozitîv û zanistên pozitîv digirin. Jixwe di tevahiya demên modernîteyê de bi vê têgihiştina pozitîv xwe li welat, millet, dewlet, etnîsîte, îdeolojî û şerê sîstemê yê bê sînor rakişandin. Ji ber ku ev têgîn hemû pîroz bûn û diviyabû di rêya wan de heta dawiyê şer bihata kirin. Çawa ku tê zanîn di encama vê têgihiştinê de dîrok bû derya xwînê. Pozitîvîzma bêguneh xuya dike, bi xwe rûyê wê yê xwînrij bi vî awayî dimirijî û qîlê xwe beş dikirin.

Em hewl bidin mijarê hinekî din rave bikin. Li dinya me ya îro nêzî dused dewletên netewe hene. Eger bi girseya welatî û saziyên me li jor diyarkirî û yekûna têkiliyan ev dewlet hemû bêne hemberî hev, wê

nîzamek an jî rewşeke hercûmerc a herî kêm bi dused xwedayî, bi hezaran perestgeh û bê sînor terîqetî bivênevê derkeve holê. Ji ber ku bi tevahî diyardeyên temsîl dikin pîroz in, û hêja ne ku mirov di rêya wan de bimirin. Em bala xwe bidinê, li hemberî me bi nav jî ji civaka exlaqî û polîtîk a xwezaya civakî bi rastî nîşan dide ti eser nîne. Bi rastî ya li êrişê rast bê û di rêya wê de hêja be mirov xwe bide kuştin, rastiya civaka exlaqî û polîtîk e. Di dewleta netewe de herkes li ser navê pûtê bi destê xwe çêkirî û yan jî pûtên diyardeyî yên ji wan re hatine pêşkêşkirin, şer dikin. Em bi demeke şerên di ber pûtan de rûbirû ne ku ji şerên berê yên di ber pûtan de hezar qatî çavsortir in. Di encamê de qanûna kara herî zêde ya yekdestdariyên dewleta netewe û sermayeyê dimeşe; jiyaneke firewnan jî nikarîbû bibînin ji hindikayiya bextewar re tê pêşkêşkirin. Ya jiyana modern jê re tê gotin, ji vê rastiya pozitîvîzmê, ya rastî ji encamên qetilkirina rastiyan wêdetir, tiştekî din nîne. Em îro gihiştine civaka ferazî. Ti rastî bi qasî civaka ferazî nikare pozitîvîzmê rave bike. Civaka pozitîvîst civaka ferazî ye. Civaka ferazî rûyê rastî yê civaka pozitîvîst, ji rûyê wê jî wêdetir heqîqet bi xwe ye. Bêmanebûna diyardeyan (ya rastî serşoka bi xwînê, civaka xeyalî, di bêmanebûna civaka xwire de mane) bi civaka ferazî derketiye asta herî jor. Civaka medyatîk, civaka şowê, civaka magazînî, ev hemû heqîqetên têgihiştina pozitîvîzm, objektîv û diyardetiyê ne, derketine holê. Ya rastî, ev jî înkara heqîqetê ye.

Li gorî mijara me, bêyî ku lêkolînê bikim, encamên bi vî rengî hê jî dikarim rêz bikim. Têgînên weke civaka Îslam, Xiristiyan, Musewî, Bûdîst, kapîtalîst, sosyalîst, feodal û koledar dîsa rastiyên heman nêzîkatiyê ne. Rûyê metafizîk ê pozitîvîzmê di vir de jî derdikeve pêşiya me. Erê, civaka Îslamê, civaka kapîtalîst encamên heman nêzîkatiyê ne. Ango ev têgînên diyardeyî ne; bi gotineke din têgînên zahirî û pêvedanînê ne. Mirov heman tiştî dikare ji bo aîdiyetên netewe jî bibêje. Têgînên neteweya Elman, Fransî, Ereb, Tirk û Kurd di karektera pozitîvîst de her yek ji wan heqîqetek e. Lê bi xwe, dîmenên matbûyî yên heqîqetê ne. Baş e, mirov hingê dikarin bipirsin ka heqîqet çi ye. Li gorî min bersiv gelekî hêsan e. Di çarçoveya rastiya civakê de heqîqeta civaka exlaqî û polîtîk û heqîqeta

şaristaniya timî dixwaze wê birizîne heye. Ez nabêjim nav û sifetên ji bilî van ti rastiyê temsîl nakin. Ez dibêjim, ne heqîqetê bi xwe, zahirê wê, forma wê ya hêsan û tim guherbar temsîl dikin.

Mînak em li rastiya neteweya Ereb binêrin. Herçiqasî gelekî qels bibe jî li mekanekî bi navê Erebistanê civakeke bi xisletên exlaqî û polîtîk û rastiya desthilatdariyê ya bi hezarê salan li ser pişta vê civakê silteya xwe meşandî û roja me ya îro ew aniye ber rizînê heye, ji bilî vê rastiyê Erebtî pirr kêm tiştan îfade dike. Bi hezaran erebên cuda, bi nakok, heta dijminên hevdu yên sondxwarî hene. Ango bi hezaran heqîqetên bi nakok! Li gorî pozitîvîzmê divê welê be. Lê em baş dizanin ku rastiya Ereb bi xwe diviyabû ev nebe. Mînakeke din a mirov ê karibe baştir jê fêhm bike dar in. Darek weke diyardeyekê bi hezaran guliyên wê û bi qasî neyên jimartin pelên wê hene. Eger dareke fêkiyên tê zanîn û hêja be, li gorî wê maneyeke xwe heye; ne li gorî gulî û pelên wê. Pozitîvîzm ew korî ye ku bi heman giraniyê nêzî hemûyan dibe. Belê, pel û gulî jî rastiyek in. Lê rastiyeke manedar nînin. Goşiyek, kîloyek tirî nirx û maneyek xwe heye. Lê pelekî mêwê bi tenê zahiriya wê ye, wê bi xwe nîşan nade, rastiyeke diyardeyî ye ku şêweyekî bi çavan were dîtin didiyê.

Ji ber ku zanist di nava diyardeyan de têne xeniqandin, her roj disiplîneke zanistî derdikeve û hemû xwe bi heman giraniyê heqîqet dihesibînin, ev yek dibe sedema sereke ya krîza zanistiyê. Me ji destpêkê ve têkiliya wê bi sîstemê re diyar kir. Heqîqet dewamî û her diçe bi şêweyên dualîteyên her diçin kûr dibin ên weke obje-sûbje, em-yên din, ruh-beden, dîn-zanist, mîtolojî-felsefe, xweda-evd, bindest-serdest, hakim-mehkûm û hwd. parçe dibe. Ev bi xwe encama çalakiya mêtingehkirin û rizandinê ya şebekeyên yekdestdariya şaristanîparêz in ku li ser serê civaka exlaqî û polîtîk piçikîne. Modernîteya kapîtalîst ev dualîteya şaristaniyê bi awayekî bê sînor zêde kiriye û îro civak aniye vê asta ji hev belavbûn û rizînê. Di vê de pareke mezin a zanista bi sîstemê re hevkariyê dike, heye. Kengî nakokiya di navbera îdeolojiyê bi xwe û avabûna amûrî de diperpite, hingê rewşa mirov lê hayil dibe û pê dihise, krîz e, û ev jî bi

bêkarî, şer, birçîbûn, xizanî, zordestî, qirkirin, newekhevî û neazadbûnê xwe di goşt û ruhê pirraniyan de vegudiherîne qêrînê.

Ez dema pozitîvîzmê rexne dikim, ji bo hin tişt şaş neyên fêhmkirin, ez hewce dibînim di hin mijaran de hişyar bikim. Ya pêşî, ez nabêjim diyarde ti qîmeta xwe nînin û ti têkiliya wan bi rastiyê re tineye. Ez bi tenê dibêjim gelekî bi sînor in. Ez diyar dikim ku pozitîvîzm bigihîje asteke felsefeyê dikare rê li ber fikarên mezin veke. Di sîstema fikrê ya Ewrûpayê de ev rewş bi zêdeyî derketiye holê û ez vê destnîşan dikim. Duyemîn xusûsa şaş fêhmkirinê, dibe ku ez bêm rexnekirin ku ez bi aliyê Eflatûngiriyê ve diçim. Dema ez dibêjim cewher diyarker e, nexasim jî dema ji bo vê mînaka darê didim, dibe ku ev rexne li min were kirin. Lê tişta ez dixwazim diyar bikim îdea û fikra 'darê' nîne. Ez rastiya darê ya ji bo civakê di nava xwe de digire, tînim ziman. Ez nêzîkatiyeke keysperest, feydeperest jî pêşkêş nakim. Dar dikare ji bo ferdekî yan jî komekê gelekî kêrhatî be. Ya ez dixwazim bibêjim ew e, eger ev rewş bi heman awayî ji aliyê civaka exlaqî û polîtîk ve jî neyê şîrovekirin, bi awayekî rastî qîmeta xwe ya kêrhatinê nîne.

Lîberalîzm felsefeyek xwe heye dibêje "Ferd weke fîlozof, zanyar, esker, siyasetvan, sermayedar û hwd. derdikevin û çi heqîqî be wî dibînin û dijîn." Ez vê felsefeyê ji sedî sed li derveyî civakbûna exlaqî û polîtîk dibînim û rexne dikim. Ez dixwazim bibêjim ev ew îdeolojî ye ku dîroka şaristaniyê rê li ber vekiriye û sîstema kapîtalîst dixwaze bi civakê hemû bêde daqurtandin; ev îdeolojî bê exlaqiyeke mezin e, û di heman demê bê polîtîka hiştin e. Ya rastî, vegotineke mîtolojîk a hemdem e ku sîstema kapîtalîst bi propagandayê daye qebûlkirin û kirasê moderntiyê lê kiriye.

Hingê pirs û pirsgirêka girîng dibe ev e: Em ê heqîqetê li ku û çawa bibînin? Ez dixwazim pîvaneke hêsan bi bîr bixim û bersiva xwe bidim: Te tiştek li ku wenda kiribe, tu dikarî li wir lê bigerî û bibînî. Naxwe li deverên din, tu li tevahiya dinyayê jî bigerî û lêbikolî tu nikarî bibînî. Ji ber ku rêbaz şaş e. Rêbaza gerê ya ne li cihê te lê wendakirî, lê li devereke din, bi tenê dibe sedem zeman û enerjî  badilhewa biçe. Ez lêgerînên heqîqetê yên serdema me jî dişibînin vê mînakê. Tevî laboratuarên mezin ên lêkolîn û

lêgerînê, fonên mezin ên ji bo vê têne veqetandin, rastiyên xwe digihîninê, mîna ku min diyar kiribû bi krîz û êşê barkirî ne. Eşkere ye ku heqîqeta mirovatî wê li pey bi bez e, wê ne ev be. Bersiva min wê weke gelek caran dubareya dubareyê be. Heqîqet bi tenê dikare civakî be. Di pêvajoya şaristaniyê de dema civaka exlaqî û polîtîk hat rizandin û xistin bin serweriya hişk a yekdestdariya desthilatdarî û mêtinkariyê, ev hat wê maneyê ku heqîqeta civakî ji dest hatiye dayîn. Ya ji dest hatiye dayîn, tevî nirxên exlaqî û polîtîk ji dest hatiye dayîn. Eger tu dîsa dixwazî bibînî, divê tu li devera te lê wendakirî lê bigerî. Ango tu yê li dijî şaristanî û modernîteyê li civaka exlaqî û polîtîk, li rastiya wê bigerî, bibînî. Tu yê bi vê jî qîma xwe neyînî; tu yê hebûna xwe ya kirine ku neyê naskirin jî ji nû ve çêkî. Hingê tu yê bibînî ku tu tevahiya heqîqetên di buhayê zêr de yên ku tevahiya dîrokê te ew wenda kirî, yek bi yek tab û peyda dikî. Li ser vî bingehî tu yê bextewar û şadtir bibî û tu yê fêhm bikî ku ev jî bi civaka exlaqî û polîtîk dibe.

Em dema qada entelektuel ji nû ve tenzîm bikin, di çarçoveya wezîfeyan de divê ez hewl bidim hin pêşniyaran bikim û li ser bingehê rexneyan di asta prensîban de wan pêşkêş bikim:

**1-** Hewldanên entelektuel û xebatên li ser zanîn û zanistê divê bêne pêşdebirin di çarçoveya civaka exlaqî û polîtîk de ya awayê hebûna bingehîn a xwezaya civakî ye. Tevahiya dîroka şaristaniyê ji vê rastiya civakî mirovatî hatiye qutkirin û ev rastî hatiye rizandin, bi serdema modern a kapîtalîzmê mohra xwe lê xistî ev rastiya civakî hatiye parçekirin, bi rizînê re rûbirû hatiye hiştin û anîne ber tinebûnê.

**2-** Wê wextê berê pêşî divê ev hewldanên entelektuel, xebatên li ser zanîn û zanistê armanca xwe rawestandina vê rêveçûnê be. Ji ber ku tiştekî hatibe tinekirin zanista wî nabe. Belkî bîranîna wî bibe, lê bîranîn jî zanist nîne. Zanist bi ya heyî bi ya dijî re têkildar e. Civaka di vê rewşê de eger naxwaze bi tevahî tine bibe, divê li dijî modernîteya kapîtalîst tevî hemû hêmanên xwe li ber xwe bide. Berxwedan êdî bi hebûnê re li ser heman rê ye, û wekhev e. Eger dixwaze ne weke hemaltî û sermayeya entelektuel, belê bi rûmeta lêkolînerekî rastî bijî û li ser piyan bimîne, divê di hemû

hewldanên xwe yên entelektuel de hem li ber xwe bide hem jî divê hêmanên lêkolînê di asta berxwedanê de bin. Di vê çarçoveyê de hem entelektuel hem jî zanista wê li ber xwe didin û têkoşer in. Ya bi awayekî din, yan xwe xapandin e, an jî veşartina nasnameya sermayeyê yan jî hemaltiyê ye.

**3-** Zanista were pêşdebirin berê pêşî divê weke 'zanista civakî' were birêkûpêkirin. Divê zanista civakî weke qralîçeya sereke ya tevahiya zanistan were qebûlkirin. Ne zanistên din ên der barê Xwezaya Yekemîn de (fizîk, astronomî, kîmya, biyolojî) û ne jî zanist û zanînên din ên beşerî yên Xwezaya Duyemîn (wêje, felsefe, huner, ekonomî û hwd.) dikarin bi mîsyona pêşengiyê rabin; ev ti carî nikarin bi heqîqetê re têkiliyeke manedar deynin. Eger herdu qad bi zanista civakî re bi awayekî serketî têkiliyê deynin hingê dikarin ji heqîqetê para xwe bigirin.

**4-** Zanista civakî divê mijara xwe ya sereke ango civaka exlaqî û polîtîk ne weke objeyekê, ne jî weke dualîteyên di bîrbirina mirovî de navbera wan gelekî hatiye vekirin û kûrkirin yên weke obje-sûbje, em-yên din, ruh-beden, xweda-evd, mirî-zindî lêbikole, ya divê esas be lêkolîna civaka exlaqî û polîtîk bi rêbaza ku ji van dualîteyan bihurîbe. Cudabûn şêwazê jiyanê yê gerdûnê ye, di xwezaya civakê de jî hê bêtir dimeşe û bi nermî, azadî û zêdebûyî heye. Lê mirov vê cudabûnê rabe daxe asta obje-sûbje ya ku şaristanî û moderníteyê ew kirine bingehê tevahiya avabûnên xwe yên îdeolojîk, ji sedî sed wê ev bihêle ku hem heqîqeta gerdûnî hem jî ya civakî parçe bibe û ji dest bê dayîn.

**5-** Pozitîvîzm di moderníteya Ewrûpayê de derket asta xwe ya herî jor. Felsefeya xwe bi giştî objektîvîzm e ku bi giştî zanist bi taybetî jî zanista civakî li ser wê mezin dibe û ev hê jî pirr dijwar dewam dike. Eger ev pozitîvîzm li ser bingeha rexneyan cihê xwe li ser sergovê dîrokê nebîne, paradîgmayeke manedar a zanista civakî ango felsefeyeke bi kok a zanista antî-şaristanî pêş nakeve. Zanista navend Ewrûpa, nexasim jî zanista civakî herçiqasî gelekî ji hev parçe bûbe û tehlûke hebe heqîqetê ji dest bide, şert e ku mirov para wê ya di heqîqetê de û destketiyên wê fêhm û qebûl bike.

Pozitîvîzm herçiqasî di rewşa rexnekirinê de be û divê mirov ji wê karibe bibihure jî ewqasî jî divê mirov para wê ya heqîqetê qebûl bike. Di lêkolîn û lêgerînên heqîqetê de bi tevahî antî-Ewrûpagirî herî kêm bi qasî bi tevahî Ewrûpagiriyê dikare rê li ber encamên neyênî veke.

**6-** Herçiqasî ev lêkolîn û lêgerînên heqîqetê yên ji wan re postmodernîzm tê gotin pozitîvîzmê rexne dikin û zanista civakî ya navend Ewrûpayê red dikin jî ev nêzîkatiyên wan bi hêsanî dikarin bêne lîberalîzekirin û weke antî-Ewrûpagiriyeke hê bêtir antî-heqîqetgirî ye, bi gewde bibin. Ev lêkolînên postmodern ên ji rewşa bi krîz a zanista civakî sûdê werdigirin herçiqasî bi temamî neyên redkirin jî gelekî girîng e ku mirov heta dawiyê bi rexnegirî nêzîkî wan bibe. Perspektîv û rêbaza pozitivîzma modernîst a gerdûnger û li ser xeteke rast a pêşketinê çawa dibe sedema ji rê derketinê, rêbaza xelekwarî ya zêde îzafî ya gelek postmodernîstan jî bi kar aniye rê li ber heman rêderketinan vekirî ye. Ji bo mirov ber bi bayê yekê ji van seriyan nekeve, şert e ku prensîbên bingehîn ên em hewl didin rêz bikin divê baş bêne fêhmkirin û qebûlkirin. Rewşa bi krîz hema hema ji her kesî re li gorî wan rêyeke heqîqetê pêşkêş dike û ji bo vê rewş di cih de ye, ev xusûs bi serê xwe jî dikare ji gelek aliyan ve lêgerînên heqîqetê ji rê derxe, wan pûç û tewş bike.

**7-** Di lêgerîna heqîqetê de rêbaza me ya sereke ne objektîvîzma pozitîvîst e, ne jî kirdartiya îzafî ye. Herdu bi xwe jî du rûyên lîberalîzmê ne, têra xwe ew tevlîhev kirine û pêşkêşî piyaseyê kirine, bi vî awayî di çêkirina hemaltî û sermayeya entelektuel de enflasyona rêbazê ye ku bi kar tîne. Aliyê herî bi tesîr ê nemumkinkirina heqîqetê, ev enflasyona rêbazê ye. Ev jî bi tevlîhevkirina rêbazên objektîv û sûbjektîv dibe û maneya vê jî hema hema bi qasî serê kesan bereketa rêbazan e. Ev çalakiyek e ku heqîqetê mîna pereyên xurde ji qîmetê dixin û ji lewra girîng e ku mirov bi vê bereket û çirikbûna rêbazan nexape. Bêguman aliyê rastiyê yê objektîv û sûbjektîv hene. Di tehlîla dawî de zanîn û heqîqet gihiştina hev a dualîteya çavdêr û ya çavdêriya wê tê kirin îfade dikin (Mebesta min hemanbûna wan nîne, zêdetir weke wekhevbûnê bêne fêhmkirin dikare erênî be). Di vê mijarê de mirov çiqas kûr bibe û biponije

ewqasî parên heqîqetê derkehevin holê. Di vê rewşê de ne yê çavdêr sûbje, ne jî yê çavdêriya wî tê kirin obje ye. Di vir de ya dibe ew e, herdu nêzîkî hev dibin, herçiqasî nebin heman tişt jî wekhev dibin. Pêvajoya heqîqet herî zêde dibe, derfet û îmkanên wekhevbûnê tên bidestxistin. Ez niha hewce nabînim navekî lê bikim û dixwazim mijara rêbazê bi vî awayî bidim naskirin. Bêguman em di ti zeman û mekanî de ji nedîtî ve nayên ku yekeya sereke ya çavdêr û çavdêriya wê tê kirin civaka exlaqî û polîtîk e.

**8-** Di serî de zanîngeh, mekanên lêgerînê yên bingehîn nabe ku saziyên fermî yên şaristanî û modernîteyê bin. Di dema bihurî û roja me ya îro de desthilatdarkirina zanistê û li saziyên fermî yên dewletê çêkirina wê, kir ku têkiliya wê bi heqîqetê re qut bibe. Eger têkiliya zanistê bi civaka exlaqî û polîtîk re were qutkirin û bikin ku bi kêra civakê neyê, berevajî wê ev were wê maneyê ku di pêşdebirina yekdestdariya mêtinkarî û zordestiya li ser civakê de alîkariyê bike. Çawa ku jin li mala taybet an jî giştî (kerxane) tê girtin rastiya xwe ya azadiyê, heqîqeta xwe ji dest dide, zanist û entelekteulên li saziyên fermî têne girtin ewqasî azadiya xwe, nasnameya xwe ya rastî ji dest didin. Ya divê were fêhmkirin, zanist û entelektueliya dibe desthilatdar ji armanca xwe ya vedîtin û lêgerîna rastiyên civakî qut dibe. Kêm berhemên di asta zanistî û entelektuelî de derdikevin holê, lê ev rewşên îstîsnayî rastiya sereke nikarin biguherin.

**9-** Ji bo zanista civakî şoreşa bi sazîbûnê, bi gotineke din ji nû ve avabûn şert e. Çawa ku di rohnîbûna Grek-Îonyayê de akademiyên serbixwe yên felsefe û zanistê çêbûn, dîsa serdema navîn di rêûresma hem Îslam hem Xiristiyantiyê de dergah, keşîşxane û tekke bi roleke bi heman rengî rabûn, eger tevgerên Ronesans, Reform û Rohnîbûnê yên Ewrûpayê di heman demê de her yek ji wan şoreşeke entelektuel û zanistê bin û ev rastî be, ji bo derketina ji krîza heyî di roja me ya îro de hewcedarî bi şoreşên bi heman rengî heye. Hegemoniya îdeolojîk a çarsed salî ya modernîteyê herî kêm bi qasî hegemoniya çanda maddî di wê qabîliyetê de nîne ku ji krîza dewamî û kûr dibe bibihure. Ji aliyê şêwe û naverokê ve modernîteya demokratîk dest wernede, bivênevê krîz ê bi rola rizandin û ji hev belavkirinê rabe. Ji sosyolîstên utopîk heta bi sosyalîstên zanistî, ji

anarşîstan heta bi Dibistana Frankfûrtê, ji gavavêtina felsefî ya duyemîn nîvê sedsala 20. heta bi şoreşa çandî ya ciwanên 1968'an û herî dawî jî piştî salên 1990'î heta bi gavavêtinên postmodernîst, femînîst û ekolojîk ji vî alî ve mîrateyeke dewlemend a entelektuel û zanistî heye. Moderniteya demokratîk divê hem li şoreş û çirîskên entelektuel ên dema şaristaniyê, hem jî divê ji gavavêtinên entelektuel ên li dijî moderniteyê xisletên erênî bigire û li ser vî bingehî şoreşa xwe ya entelektuel û zanistê pêk bîne.

Bisazîbûn yek ji şertên vê şoreşê ye. Ji bo serketina şoreşa entelektuel di asta global de li ser bingehê dersên ji tecrûbeyên navê wan ketine dîrokê werin girtin, pêdivî bi navendeke saziya dinyayê heye. Ji bo bersivdana vê pêdiviyê mirov dikare Konfederasyona Çand û Akademiyên Dinyayê ava bike. Ev konfederasyona li ser cografyayeke azad were avakirin, wê bi ti desthilatdarî û dewleta netewe ve girêdayî nebe û divê li ser bingehê dijberiya yekdestdariyên sermayeyê were pêkanîn. Serxwebûn û xweseriya wê bingeh e. Di asta çanda xwecihî, akademiyên herêmî û neteweyî de her sazî bi dilê xwe di çarçoveya prensîbên bername, rêxistin û çalakiyê de dikare beşdar bibe. Di asta xwecihî, herêmî, neteweyî û parzemînî de konfederasyon dikare saziyên wezîfedar ava bike.

**10-** Akademiyên çand û siyaseta demokratîk dikarin ji bo vê wezîfeyê sazîbûnên di cih de bin. Ji bo pêdiviya ji nû ve avakirina yekeyên civaka exlaqî û polîtîk desteka zanistî û entelektuel a hewcedarî pê heye, ev akademî dikarin pêk bînin. Li şûna ku saziyên yekdestdar ên fermî û taybet ji xwe re bikin mînak, gelekî di cih de ye ku xwe bi awayekî orjînal ava bikin. Teqlîdkirina saziyên moderniteyê dikare bibe sedem ku bi bin kevin. Dikarin xwe bi awayekî xweser û demokratîk ava bikin, bername û kadroyên xwe bi xwe pêk bînin, dikarin mamostetî û xwendekariya bi dilê xwe esas bigirin, gelek caran mamoste wê karibe bibe xwendekar, xwendekar jî wê bibe mamoste, ji şivanê li serê çiyê heta bi profesorî her kesê bi qasî îdea û armanca xwe karibe beşdar bibe û li gorî destpêkê mirov dikare bi vî awayî qebûl bike. Akademiyên bi giranî jin bin, tevî ku bi heman naverokê bin, dikarin aliyên xwe yên xweser bi awayekî zanistî pêk bînin û dibe ku bi vî awayî di cih de be. Ji bo bi tenê teorîk nemînin divê ji

gelek aliyan ve tevlî pratîkê bibin û ev jî yek ji xisletên têne xwestin e. Li gorî zeman û mekan pêdivî li ber çavan têne girtin, û akademî têne avakirin û xebitandin. Çawa ku di dîrokê de mînakên van saziyan gelek têne dîtin (ateşgedeyên Zerdeşt ên li ser çiyan, baxçeyên Eflatûn û Arîsto, peyarêyên Sokrates û Stoagiran, keşîşxane û tekkeyên serdema navîn û hwd.), saziyên sade û bi dilê xwe xebatê dikin. Ji serê çiyan bigirin heta bi quncikên kolanan her mekan dikare were hilbijartin. Bêguman mirov çavê xwe li avahiyên bi heybet ên mezinahiya desthilatdariyan tînin bîra mirov, nagerîne. Çawa ku ji keşîşxane û medreseyan jî tê zanîn, dema perwerdeyê li gorî rewşa beşdaran û kêm-zêde hatina wan dikare were diyarkirin. Mîna saziyên fermî hewcedarî bi sînorên hişk ên demê nîne. Bi tevahî jî divê ji şikil û pîvana mehrûm nebin. Ji sedî sed divê pîvanên xwe yên etîk û estetîkê hebin.

Di xebatên ji nû ve avakirina yekeyên modernîteya demokratîk de alîkariya zanistî û entelektuel şert e. Eşkere ye ku mirov ê nikaribe bi sermayeya entelektuel a di piyaseyê de vê hewcedariyê tedarik bike. Zanist û kadroyên çavkaniya xwe akademiyên nû, bi tenê dikarin vê pêdiviyê tedarik bikin.

Ev nirxandina kurt û prensîbên çareseriyê ku min hewl da di çarçoveya wezîfeyên entelektuel de bikim, bêguman di asta pêşniyaran de ne, û hewcedarî bi guftûgoyê heye. Bi tenê bi gavavêtinên nû yên zanistî û entelektuelî mirov dikare ji şert û mercên krîzê bibihure û ber bi aliyê erênî ve biçe. Krîza em behsa wê dikin, krîzeke avabûnê, global û sîstematîk e, wexta mirov van xisletên wê li ber çavan bigire, eşkere ye ku divê destwerdanên wê jî avabûnî, global û sîstematîk bin. Ji bêhejmar tecrûbeyên şoreşger ên pêkhatî tê zanîn ku êdî bi teqlîdkirina qalib, sazî û zanistên berê yan jî bi pevekirina wan tiştek bi dest nayê xistin û mirov dersa vê dikare ji tecrûbeyên berê bigire.

Yek ji dersên sereke yên modernîteya demokratîk ji demên bihurî bigire ew e, divê xwe bi şoreşeke rohnîbûnê ya bi kok di zikhev de ava bike. Tevî vê, divê ez yekser destnîşan bikim ku rabihurî niha ye. Herçiqasî em bi temamî behsa rabihuriya civaka exlaqî û polîtîk a ku şêweyê hebûna

bingehîn xwezaya civakî ye, nekin jî (lê divê em ji bîr nekin ku nexasim civaka neolîtîk, civaka gund û cotkariyê, koçerî, qebîle, eşîr û cemaetên dînî xisletên xwe yên jiyanê bi rik dewam dikin) ji bo nirxên xwe yên di pênc hezar salên dawî de ji aliyê yekdestdariyên daneheva sermaye û desthilatdariyê ve hatine têkbirin ji nû ve bi dest bixe, di asteke şoreşî de afirêneriya zanist û entelektueliyê ya gelekî pêdivî pê heye wê bibe desteka herî mezin. Ji bo vê pêdiviya ku bivênevê divê pêk bê, ji her demê zêdetir heyatî û girîng e ku em li ser wezîfeyên xwe yên entelektuelî biponijin, analîz bikin û hewl bidin çareser bikin.

## B- Wezîfeyên Exlaqî

Exlaq di serê wan saziyên civakî de tê ku li ser gelekî tê axaftin û hê nehatiye analîzkirin. Di bin navê etîk de tevî hemû hewldanên teorîzekirinê, yên di pratîkê de diqewimin hêviyên mirovî dişkînin. Tespîteke hevpar a çavdêriya zanistê ye ku hebûna civakî her diçe ji exlaq mehrûm dibe. Lê belê sedem û encamên vê yekê têra xwe nehatine ravekirin. Ew kirine rengê sazî û statuyeke ku her çûye piçûk xistine. Lê exlaq weke sazî û mijar ji texmînan wêdetir gelekî girîng e. Mirov krîzên tevahiya dîrokê pêk hatine û krîza global a roja me ya îro bi giranî dikare weke encameke bêparmayîna ji exlaq bifikire. Di dîrokê de wijdanê civakî, lavên ji çiyayê volkanîk ê pijiqîn ser bajarên Sodom (Di serdema pêşî de bajareke li peravên Gola Lût) û Pompei'yê bi zêdebûna bêexlaqiyê rave dike û bi vê, mîna ku dixwaze ji heqîqetekê xeber bide! Rizîna exlaq civakan hildiweşîne. Ya rastî, ya jê re lanet û xezeba xwedayan tê gotin, bi xwe cezakirina bêexlaqiyê bi destê wijdanê civakî ye (exlaqê) ku bi şêweyekî çalakiya ezmanî nîşan dide. Eger em Xwedê weke nasnameya herî mezin û pîroz a danasîna civakê şîrove bikin, lanetkirin jî dibe çalakiyeke cezakirinê ya tîpîk a xas bi destê civakê.

Hêsan e ku mirov exlaq weke têgîn bide nasîn. Mirov dikare exlaq weke jiyana li gorî adet, hînbûn, rêûresm û rêzikan pênase bike. Lê ev ravekirin têra xwe şiklî dimîne. Fîlozofên serdema antîk û serdema nû (di serî de

Eflatûn, Arîsto û Kant) analîzên xwe di bin navê etîk de li wan rakişandin, ji ketina teoriya dewletê zêdetir ti alîkarî nedane. Ya rastî, weke amadekariyên pêş in ku ji bo ferd ji endambûna civakê qut bikin û derbasî endamtiya dewletê bikin. Mîna ku wezîfeya exlaq ew e, ferd ji bo dewleta xwe çawa kêrhatî bike, eşkere mirov nêzîkatiyeke bi vî rengî dibîne. Bi kurtî şîroveyên exlaqî alîgirên şaristaniyê ne.

Çawa ku di her mijara civakî de mirov serî li dîrokê dide, di vê mijarê de jî mirov heman rêbazê bişopîne wê gelekî kêrhatî û hînker be. Em dizanin ji sedî 98'ê serdemên civakî ne bi huqûqê, bi rêzik û pîvanên exlaqî pêk hatine. Ji ber vê yekê jî em civaka exlaqî dibêjin. Ji lewra mirov heta nizanibe exlaqê vê dema dirêj bersiva çi daye, mirov rabe exlaq şîrove bike, wê kêm bimîne. Eger em xwezaya civakî weke xwezaya bi mejiyê nerm barkirî pênase bikin dibe ku mijarê rohnî bike. Mebesta me ji mejiyê nerm ew e, zêdetir bi fikirkirinê karkirin e. Têkiliya di navbera fikirkirin û kar de bivênevê wê rêzik û pîvanan ferz bike. Ji ber ku ya diyar dike ka divê kar çawa were kirin, jixwe rêzik û pîvan bi xwe ne. Em vê çalakiya pêşî ya der barê kar de dikarin weke pîvana pêşî ya exlaq diyar bikin. Em dema kar jî dibêjin, mebesta me her cure çalakiya civakî ye. Ji xwarinê heta bi razanê, ji meşê heta bi peydakirina xwarinê, ji dostbûna bi heywanan re heta bi şerkirina bi wan re, eleqedarbûna bi nebatan re heta masîgiriyê her çalakî kar e. Ev kar jî bêyî rêzik û pîvan bi ser nakeve. Serneketin jî mirina civakê ye.

Di vê nuqteyê de dabeşkirina civakê weke bingeh ekonomîk û joravahî exlaq têgînên beredayî ne. Ekonomiya exlaq mirov dikare weke rêya herî baş a ji bo tedarikkirina pêdiviyên bingehîn ên jiyanê pênase bike. Exlaq weke adet û usûl, şêwazê ekonomî yan jî bidestxistina pêdiviyên bingehîn e. Ji lewra cihêkirina civakê bi têgînên weke joravahî û jêravahî ji ravekirinê dûr in. Exlaq di serî de hewldanên ekonomîk şêwazê pêkhatinê bi awayekî baş ê tevahî çalakiyên civakî îfade dike. Ango her tiştê civakî exlaqî ye. Her tiştê exlaqî jî civakî ye. Mînak bi qasî ekonomî exlaqî ye, dîn jî exlaqî ye. Siyaset weke demokrasiya rasterast exlaq bi xwe ye.

Wê wextê diyarkirina pîvana pêşî ya kar ango exlaqê wê, ji destpêkê ve ji bo civakê mijareke heyatî ye. Kar çawa herî baş tê kirin, ew çawatî weke pîvana herî baş a exlaq di zêhnan de bi cih dibe. Ev, di nava pêvajoyê de hê bi tesîr dibe û weke rêûresmeke têkûz dibe malê hafiza civakî. Êdî mirov dikare bibêje, exlaq pêk hatiye. Bûyera em jê re tore, adet û rêûresm dibêjin ev e. Di vir de xusûsa girîng a divê were analîzkirin ew e, exlaq bi qasî ku çalakiyeke zêhnî ye, bi karê civakî re jî têkildar e. Hem pêdiviya xwe bi çalakiya civakê, hem jî bi hewldana zêhn heye. Ez bi xwe tercîh dikim ku ji rewşê re bibêjim, rewşa pêşî û orjînal a demokrasiyê ye. Di vê rewşê de demokrasiya orjînal û exlaq dibin wekhev. Li gorî ku civak misêwa bi pey karên heyatî dikeve, bivênevê ev jî pêdiviya pirr fikirîn û guftûgoyê ferz dike. Bi vê jî qîma xwe nayîne; li ser awayê herî baş yê biserxistina kar ango birêvebirina wî serê xwe diêşîne û ev jî bivênevê şertekî jiyanê ye ku destê jê nabe. Di herdu rewşan de jî hem fikirkirin, guftûgo û biryardan heye hem jî birêvebirina biryarê, xwe gihandina serketinê heye û ev jî şêweyê herî sade û rastûrast ê demokrasiyê ye. Eşkere ye ku demokrasiya rasterast û beşdarbûnê ev e. Di heman demê de ev tê wê maneyê ku civak ji aliyê exlaqî ve bilind bûye ango bûye xwediyê jiyana exlaqî. Ji vê jî mirov fêhm dike ku çavkaniya exlaq û demokrasiyê yek e. Ew jî qabîliyeta karkirin û zêhnê kolektîv ê pratîka civakî ye. Jiyana civakê, ne bi tenê ji sedî 98 beşekî wê bi demokrasiya orjînal û exlaq derbas bûye; komikên civakê yên di halê xwe de hatine hiştin û heta roja me ya îro parçe bûne jî bi giranî di nava xwe de ne huqûqê, lê exlaq pêk tînin. Divê mirov baş zanibe ku herçiqasî xira bûbin jî ji malbatê heta bi etnîsîteyê, heta bi qada kar a saziyên huqûqê kitebikite ew bi rêkûpêk kirine jî exlaq nebe jiyan nameşe. Huqûq perdeyek e, nixumandin e. Bi awayekî bingehîn, ez yeqîn dikim ku hê jî hêza dimeşîne exlaq e.

Em dema li pêvajoya şaristaniyê dinêrin tespîta pêşî ya der barê mijarê de em bikin ew e, li dijî exlaq timî hewl dane normên dewletê bikin xwedî hukim. Pîvanên pêşî yên huqûqê yên navê qanûnên Hemmûrabî li wan hatî kirin û li ser stelan (tehtên tîk ên nivîskî) bi rêkûpêk hatine nivîsîn vê rewşê têra xwe rave dikin. Dikare were gotin exlaq têrê nekiriye ji ber vê

yekê hewcedarî bi huqûqê çêbûye; lê nêzîkatiyeke bi vî rengî şaş e. Pirsgirêk qîmnekirina exlaq nîne, civaka exlaqî tê rizandin. Me gelek caran diyar kir ka çawa exlaq tê rizandin. Yekdestdariyên sermaye û desthilatdariyê destpê dikin xwe li ser civakê ava dikin. Nirxên civakî yên têne hilberandin têne desteserkirin. Di vê rewşê de em nikarin behsa qîmnekirina exlaq bikin, em dikarin behsa tehekuma li ser civakê tê danîn bikin, behsa mêtinkarî û zordestiya dewletê ya li ser civakê bikin ku li gorî wê rêzikên huqûqê yên ji wan re rêzikên rêveberiyê yên dewletê tê gotin, tên pêkanîn. Ji lewra exlaq pêve girêdayî demokrasiya rasterast, her diçe dor li wan teng dibe. Li beramberî vê qad li rêveberiya dewletê û huqûqa wê fireh dibe. Ya aliyek ji dest dide, aliyê din bi dest dixe. Ya rastî, bi darê zorê yê dewletê bi exlaq ji dest didin dayîn. Vê rewşê bi dorlêtengkirin, zehmetkirina pêkanîna wê pêk tînin. Di tevahiya civakên şaristaniyan ên wê bihata de qada exlaq (demokrasiya rasterast jî) dihat tengkirin û para huqûqê her wê bihata zêdekirin. Jixwe şaristaniya Romayê ya ku bi awayekî kurtasî û dawiya şaristaniyên serdema destpêkê ye, rêveberiya herî baş a dewletê bû ku huqûq pêk anî, û ev jî vê rastiyê piştrast dike. Huqûqa Romayê hê jî yek ji hîmên bingehîn ê huqûqan e. Di şaristaniya Ewrûpayê de, bi gotineke din di modernîzmê de civak mîna ku ji aliyê huqûqê ve tê dagirkirin. Bi awayekî mêtingeriya huqûqê mewzûbehs e. Cihê exlaq dibe nava şekelan, huqûqê jî dike mêvanê serê tevahiya quncikan.

Ev rastî çi nîşan dide? Ev nîşan dide ku giraniya desthilatdarî û yekdestdariya sermayeyê li ser civakê zêde bûye. Em dema li çarsed salên dawî yên modernîteyê dinêrin bê ka ya pêk hatiye çi ye, ya em dibînin pirrbûna desthilatdarî û kombûna herî zêde ya sermayeyê ye. Ya rastî, kombûna kumulatîf a herduyan di zikhev de ye. Ji aliyê exlaq ve jî ya mirov karibe bibêje ew e, ne bê fonksiyon hatiye hiştin, ji destê civakê hatiye stendin. Civaka ku exlaq di binyeya wê de bi cih were anîn, hatiye têkbirin. Ji lewra ravekirina pirrî caran a weke, bi sedema ku civak rewşa wê tevlîhev bûye, êdî bi exlaq rêvebirina wê pêkan nîne, lewma hewcedarî bi huqûqê dibe, ev vegotin dereweke mezin e, û ewqasî jî hukmekî bêexlaq e.

Ji sedî sed ne mewzûbehs e ku ji ber tevlîhevbûna civakê, exlaq qîm û têrê nekiribe û bi ser neketibe. Di vir de pîvaneke hêsan a hegemoniya îdeolojîk a lîberal tê bikaranîn: Pîvan ev e; ji bo reqibê xwe têk bibe têra xwe wî bi propagandayê bihilhilîne. Di nêzîkatiya hemdem a der barê exlaq de rola hegemoniya îdeolojîk a lîberalîzmê gelekî eşkere ye. Ma kî nizane ku huqûqa li şûna exlaqê hatiye bicihkirin, bi rastî nikare rêve bibe, bi rêzik û pîvanên li derveyî aqil û wijdan barkirî ye! Bê sedem nehatiye gotin “Yên dikevin dadgehê ya bi serê wan de tê bi serê mirîşka xeşandî de nayê.” Li deverekê, li saziyekê çiqasî rêzik û pîvanên huqûqê hebin, ewqasî li wir yekdestdariyeke bi tesîr a zordestî û mêtinkariyê heye. Rastiyên pratîkî, vê xusûsê di her saziyê de ku lê gavên pêşî têne avêtin, piştrast dikin.

Pirseke girîng a der barê mijarê de divê were pirsîn ev e: Exlaq an jî huqûq baştir rêve dibe? Erê, vegotina me di naveroka xwe de bersiva vê pirsê dide, belê bi tenê ji ber ku huqûq rêveberiyeke bi darê zorê ye, vê rastiyê têra xwe rave dike. Çawa ku tê zanîn pênaseya huqûqê ew e: “bi zora dewletê rêvebirina qanûnan e.” Lê di exlaq de bi darê zorê rêvebirin nîne. Jixwe rêzik û pîvaneke ji dil nehatibe qebûlkirin jê re rêzik û pîvana exlaqî nayê gotin. Dema rêveberiya bi darê zorê ya huqûq û rêveberiya exlaqî mirov bide ber hev, eşkere ye ku wê giraniyê li aliyê qenciyê be û ji sedî sed kefeya wê jî wê ya exlaqê be.

Têkiliya dîn û exlaq pirsgirêkeke girîng e ku divê were analîzkirin. Çawa ku mirov dikare di navbera demokrasiya rasterast û exlaq de têkiliyeke wekhevbûnê deyne (ji bo civakên dijber û li derveyî şaristaniyê), mirov dikare bi heman rengî têkiliyeke wekhevbûnê di navbera dîn û exlaq de jî deyne. Di şert û mercên dîn hê mohra şaristaniyê nexwarî de exlaq, dîn û demokrasiya rasterast di zikhev de pêk tên. Exlaq saziyek e ku berî dîn pêk hatiye. Wer tê fêhmkirin ku dîn zêdetir bi aliyên tabû yên exlaq, pîroztî, bi heybetbûn, di manedanê de zehmetî kişandin, fikir û hisa nikarîbûna kontrola hêzên xwezayê re pêwendîdar e. Civak xwezaya li derveyî xwezaya xwe nas dike û qebûlkirina wê îdrak dike, ev hem hisa tirs û hem jî hisa rehmê hişyar dike. Lê hayil dibe ku ev hêz û xwezaya jiyan gelekî pêve girêdayî ye, neyênî û erêniyên wê hene, ji lewra fikra divê xwe ji

neyêniyan dûr bigire û ji erêniyan sûdê werbigire çêdibe û ev weke çavkaniya rêûresm û saziya dîn a resen û fikra wê ya pêşî xuya dike.

Dîn saziyeke beriya şaristaniyê ye, û ev ne ya guftûgoyê ye. Xusûsên exlaq ên zêde qedexeker û yên divê mirov ji wan dûr bisekine, yên merhamet û bexşîner digire nava xwe. Di nava pêvajoyê de hê zêdetir vediguhere rêûresmeke hişk. Di vê çarçoveyê de bi rêkûpêkiya rêzik û pîvanên hişk û pîroz ên exlaq, dîn pêk tînin. Tevî ku ji nava exlaq derdikeve û di destpêkê de parçeyekî ji wî ye, bi guhertina şert û mercên zeman û mekan re bi hêz dibe, sazî û rêzikên xwe dike qanûnên gelekî hişk ên divê ji sedî sed mirov guh bidin wan (nîzamê tîpîk ên Deh Fermanên Mûsa) û bi vî awayî serxwebûn û serektiya xwe îlan dike. Mirov dikare gavavêtina huqûqê jî bi heman rengî qiyas bike. Rêzikên huqûqê ku berê beşek ji rêzikên exlaqî bûn, bi dewletbûnê re veguherîn qanûnên bi darê zorê têne pêkanîn û bi vî awayî huqûqa em nas dikin hat çêkirin. Bi pêşketina pêvajoya şaristaniyê re, di dîn de cudabûneke din pêk hat; bi alî û hêmanên xwe yên ku veguherandin berjewendiyên hêzên mêtinkar û desthilatdariyê, ew kirin hêzeke xwedatiyê ya ku dikare bi awayê herî dijwar ceza bike. Berjewendiyên yekdestdariyê yên ku huqûq bi destê dewletê dimeşîne, dînê mohra şaristaniya nû li ser hewl da bi destê xwedê bimeşîne.

Herdu veguherîn jî girîng in. Du kêliyên girîng ên şikestina dîrokê temsîl dikin. Otorîteya desthilatdarî û qraltiyê ya bilind dibe, xwe bi têgînên xwedayî bi wesif dikin û bi vî awayî xwe bi hêz dikin û ev pîvana bingehîn a hegemoniya îdeolojîk e. Mirov her ku binê têgîna xwedê dikole, her carê ji binê wê zordestî û mêtinkariya yekdestdaran, zordariya amûrên dewlet û desthilatdariyê, talana wan û hêza bi darê zorê ya xebitandina kolewarî derdikeve. Lê xusûseke girîng e ku mirov tespît bike, aliyên dîn ên demokratîk û civakî bi exlaq re wekhev in. Bi vî awayî, mirov dikare dîn tevahiya dîroka şaristaniyê weke çand, rêûresm û nasnameyeke bi du xisletan manedar bike. Xweda û dîn weke nasnameya hêzên şaristaniyê, çiqasî bi têgînên tirs, ceza, avêtina cehennemê, birçî hiştinê, tinekirinê, bêrehmiyê, şer, tehakum, hukimranî, xwedîtî û perestinê (divê mirov ji bîr

neke ku ev têgîn herî zêde wesfên hêzên şaristaniyê ne) barkirî be, nasnameya dîn û xwedê ya hêzên civaka exlaqî û polîtîk jî bi têgînên wêrekî, efûkirin, bexşandin, hêvî, bê rizq nehiştin, merhamet, hezkirin, aştî, gihiştin, afirênerî û xwebûnê barkirî ye.

Hingê mirov tevahiyê dîrokê dîn bi van du nasnameyan pênase bike, mirov ê karibe gelekî jê hîn bibe. Dînên Brahîmî xwedî wê xisletê ne ku van herdu meylan bi awayekî tîpîk di nava xwe de digirin. Nûnerên asta jor a dînî (rahib, haham, şêxulsilam, ayetullah û hwd.) çiqasî meyla şaristaniyê nîşan bidin, ehlê ummetê yê asta jêr jî meyla şaristaniya demokratîk nîşan didin. Meyl dikarin li gorî zeman û mekan bikevin tewazunekê û serektiyê. Dînên Brahîmî bi vê rewşa xwe sosyal demokratên modernîteyê bi bîra mirovî dixin. Çawa ku sosyal demokratên modernîteyê di dema xwe de lihevkirina çîna karker û bûrjûwaziyê temsîl dikirin (bêguman di hegemoniya yekdestdariyên sermaye û desthilatdariyê), dînên Brahîmî jî tevahiya dîroka şaristaniyê lihevkirina hêzên şaristaniya demokratîk û hêzên sermaye û desthilatdariyê (dîsa hegemoniya hêzên desthialtdariyê giraniya xwe hene) temsîl dikin.

Di dîrokê de, di têkiliya dîn û exlaq de weke kesayet û doktrînekê em Zerdeştî û Zerdeşt bi awayekî îstîsnayî dibînin. Lêkolîn Zerdeşt û doktrîna pêve girêdayî weke şoreşeke exlaqî ya mezin pênase dikin. Li qûntara çiyayê Zagrosê di nava çandeke civakî ya bi heywan xwedîkirin û cotkariyê de (çanda ji neolîtîkê ve 12000 B.Z. heta rabûna dema çaremîn a qeşayî 20000 B.Z.), li dijî hegemoniya mîtolojîk û dînî ya şarisaniya Sumer (3000 B.Z. – piştî wê) ji pîroztiyê wêdetir ev şoreşa exlaqî ya weke meyleke exlaqê sekuler û dinyewî diparêze bi pêş ket herçiqasî li ser navê Zerdeşt weke Zerdeştîzmê hatibe binavkirin jî hê bêtir xwedî reh û kokên kevn e. Zerdeşt bi gotina xwe ya navdar a bi xîtaba “Bêje, tu kî yî?” eşkere ye ku xwedatiya dînî û mîtolojîk a şarisaniya Sumerê dixe ber lêpirsînê. Ji lewra ev rexneya wî ya pêşî ya exlaqî li xweda û dînên şaristaniyê gelekî girîng e. Fîlozof F. Nietzsche navê “Zerdeşt Wisa Ferman Kir” li berhema xwe ya navdar kir û nava wê bi hukmên exlaqî yên Zerdeştwarî tijî kir û ev ne bê sedem bû. Ji vî alî ve ew bi xwe weke kesê şaristaniyê herî bi hêz şîrove

dike tê naskirin. Heta carnan ji bo xwe leqeb û namûçikê “Şagirtê Zerdeşt”, “Şagirtê Dîonysos” bi kar tîne û ev yek mirov difikirîne.

Di Zerdeştiyê de hêmanên şaristaniya demokratîk giraniya xwe hene. Di malbatê de nêzî wekheviya jin û mêr e. Eziyetê li heywanan nake; bi pirranî goştê wan nayê xwarin, ji berhemên wan sûdwergirtin esas e. Di Zerdeştiyê de zireat û cotkarî bi nirx û qîmet e. Têgînên qencî û xirabiyê yên ji pîroztiyê hatine şuştin, derdikevin pêş. Şêwazê fikrê yê dualîteyê (hêzên rohnî û tariyê) ku tovên pêşî yên diyalektîkê bi bîra mirov dixe, di Zerdeştiyê de gelekî diyar e. Têde hewldanek heye dixwaze bi awayekî diyalektîkî li gerdûnê serwext bibe. Birêvebirina civakê bi rêzik û pîvanên exlaqî yên xurt dike esas. Gelekî eşkere ye ku bi van aliyên xwe hemûyan li dijî Sumeran û şaristaniyên koka xwe ji wir digirin, şoreşeke bi hêz a exlaqî nîşan dide. Çawa ku tê zanîn herçiqasî hatibe berevajîkirin jî berhemê herî mezin ê vê şoreşê Konfederasyona Med û ya jê dewr girtî Împaratoriya Pers (mixabin wê gelekî were berevajîkirin) in. Herçiqasî Manî (salên 250’î P.Z.) wê hewl bide di vê doktrîna exlaqî de şoreşeke duyemîn bike jî împaratorên Sasanî yên gelekî riziyayî û genîbûyî wê vê asteng bikin. Manî bi xwe bi dijwarî tê cezakirin. Şerê du nasnemeyên exlaqî û dînî mewzûbehs e.

Ji Rojhilata Navîn heta bi Hindistan û Ewrûpayê şopên (Mecûsî, Êzîdî) rêûresma exlaqê Zerdeşt-Manî yê dewam dike, heye. Gotina Zendiq bi koka xwe Zerdeştî ye, îro jî bi maneya zanist weke koka peyva ‘Science’ tê bi karanîn. Divê mirov bi girîngî diyar bike ku çi di dema mişextkirina Babîlê de (600-546 B.Z.) pêxemberên Cihûyan, çi jî di dema Împaratoriya Med-Pers de fîlozofên Grek-Îonya û tevî herdu milan yekser oryantalîstên Ewrûpî têra xwe bi rêûresma Zerdeştî xwe xwedî kirin. Divê mirov bi heman girîngiyê bîne ziman ku Konfuçyûs, Sokrates û Bûda yên di heman dema Zerdeşt de hebûn (sedsalên 6. û 5. B.Z.) doktrînên xwe sipartin civaka exlaqî û li dijî gefxwarina şaristaniyê ya li exlaq nûneriyeke xurt a parastinê kirin. Di serdema navîn de hêmana exlaqê di doktrînên Îslam û Xiristiyantiyê de cihekî girîng digire. Di dema şaristaniya Ewrûpayê de

ango di dema modernîteya wê de jî exlaq zêde dirizînin. Me sedemên vê bi awayekî gelekî berfireh anîbûn ziman.

Ev dîrokên em bi kurtî tînin ziman jî nîşan didin ku civaka exlaqî gelekî zêde li ber xwe daye. Exlaq heta weke exlaq maye xwe radestî hêzên şaristaniyê ne kiriye. Li dijî huqûq û dînê şaristaniyê ferz kirî, Demosê israra xwe ya di exlaq de ti carî kêm nekiriye. Di roja me ya îro de wezîfe û pirsgirêka bingehîn a der barê exlaq de ew e, mirov ê wê çawa bi cih bike. Etîk (teoriya exlaq) weke şaxekî zanista civakî bêguman divê bi girîngî were pêşdebirin û ev wezîfeyeke qada entelektuel e. Ya girîng ew e, etîk ê bi civakê re çawa bi yek be; civaka exlaqî ya hatiye rizandin wê çawa ji nû ve û li ser bingehên bi hêz ên exlaqî were gurçûpêçkirin. Wezîfeya ji nû ve avakirina exlaq ne bi tenê wezîfeya sedsalê û modernîteyê ye, pirsgirêka dewamkirin an jî dewam nekirina civakê ye jî. Eşkere bûye ku bi darê zorê yê huqûqê nabe mirov ji krîza global bibihure. Ji nû ve vegera li oldariyê jî hêvî têde nîne. Heta mirov komik û çaviyên exlaqî yên bi hêz ên xwezaya civakê dîsa fonksiyonel neke, divê mirov baş fêhm bike ku modernîte bi ti rêyeke din nikare ji krîza global derkeve. Krîza heyî sîstema şaristaniyê ya pênc hezar salî tevî hemû hêzên dijberî civakê li beramberî civaka exlaqî afirandine. Ji lewra jî divê mirov derketina ji vê krîzê di civaka exlaqî de bibîne (ji ber wekhevbûna exlaq û demokrasiya rasterast a di civaka polîtîk de) û ev li gorî diyalektîkê ye. Mirov heta weke prensîb li ser vê tespîtê hemfikir nebe ti wezîfeya exlaqî rast nayê diyarkirin.

Hingê em dikarin ji bo derketina ji krîza global a modernîteyê sîleha herî mezin a modernîteya demokratîk wezîfeyên exlaqî di xebatên jinûveavakirinê de careke din weke prensîban diyar bikin, û di vê çarçoveyê de em dikarin van xalên li jêr îfade bikin;

**1-** Hêzên şaristaniyê yên pênc hezar salî di encama xebatên xwe yên hilweşîner ên li beramberî civaka exlaqî de rê li krîza global a modernîteyê vekirin (krîza avabûn û sîstemîk a roja me ya îro) û li gorî diyalektîkê jî xelasiya ji krîzê bi avakirina ji nû ve ya civaka exlaqî dibe û ew alternatîfa sereke ye.

**2-** Civaka exlaqî û polîtîk weke yekeya bingehîn a modernîteya demokratîk tevî hemû hewldanên rizandin, pûçkirin û tinekirinê yên hêzên şaristanî û modernîteyê, weke xwezaya civakî bi giranî hebûna xwe dewam dike. Hêzên şaristaniyê şebekeyeke elît a teng in, lê hê tevahiya netewe, gel, etnîsîte, jin, civakên gund û cotkariyê, bêkar, koçber, ciwan, komên marjînal ên bindest û mêtingeh û hwd. pirraniya esas pêk tînin.

**3-** Bi awayekî bingehîn ê civakê li ser piyan digire û wê dewam dike, ne nîzama dewletê ya huqûqê ye, tevî hemû hewldanên qutkirinê yên ji civakê û qels mabe jî hêmana exlaqî ye. Heta civak neyê tinekirin exlaq jî nayê tinekirin. Di civakekê de kûrahiya krîzê bi ketina exlaqî ve têkildar e. Zû dereng, ne bi tenê ji bo xelasiya ji krîzê, ji bo civak bi awayekî bextewar hebûna xwe dewam bike, exlaq divê weke sazî û çaviya civakî ya bingehîn bi rola xwe rabe.

**4-** Xebatên etîk wezîfeyên qada entelektuel û xebatên siyaseta demokratîk jî wezîfeyên qada polîtîk in, û heta bi civaka exlaqî re nebin yek nikarin bi rola xwe rabin. Exlaq rastiya civakî ya wezîfeyên herdu qadan lê pratîze dibin, îfade dike. Di çarçoveya wê ya demokratîk de di navbera dîn û exlaq de wekhevbûn heye. Ji lewra cihên îbadetê divê bibin saziyên herî zêde lê exlaqê civakî pêk tê. Di serî de dêr û mizgeft divê îbadetxane weke saziyên exlaqî yên pratîk bêne nirxandin û ya herî rast ew e, di avakirina civaka exlaqî de werin bikaranîn. Nexasim gelekî girîng e ku mizgeft weke di dema Hz. Muhammed de bi awayekî berfireh bi rola xwe ya navendî ya exlaqî rabin û fonksiyona xwe bi cih bînin. Mizgeft bi tenê cihê rîtueleke gelekî besît a mîna nimêjê nîne. Di dema Hz. Muhammed de mizgeft bi awayekî bingehîn navendên jinûveavakirina civaka exlaqî û polîtîk bûn. Weke rîtuela erêkirina vî karî li nimêjê fikirîbûn. Paşê rîtuelê şûna esas girt. Avakirina civaka exlaqî û polîtîk esas bû, lê esas hat jibîrkirin, ew dan jibîrkirin.

Modernîteya demokratîk weke saziyên exlaqî yên lê civaka exlaqî û polîtîk ji nû ve tên avakirin, eger hewce bike ji aliyê şêwazê bername, xebat û rêxistiniyê dikare were reformekirin û weke şêwazê bername, xebat û rêxistinî ji nû ve were birêkûpêkirin. Malên Cemê yên Elewiyan

tevî zêdetir bi rola saziyên civaka exlaqî û polîtîk radibin, divê ew jî di xebatên jinûveavakirinê de ji nû ve di asta pêşengiyê de bêne birêkûpêkkirin. Li beramberî dijîtiya dewlet û desthilatdarî ferz bikin, yekeyên civaka exlaqî û polîtîk mafê xwe yê pîroz û exlaqî yê berxwedanê hene. Eger hewce bike wê vî mafê xwe bi kar bînin. Herweha azadiya dîn û wijdan (exlaq) vê ferz dike.

**5-** Çi laîsîzma bi şêla modern tê ferzkirin, çi jî li ser navê rêûresmê dînperestiya radîkal an jî ya nerm ên têne ferzkirin, weke tê zanîn du meylên dijberî hev nînin, weke du versiyonên îdeolojîk ên pevekerî yên lîberalîzmê nikarin bi rola civaka exlaqî û polîtîk rabin. Ji bo mirov nekeve van xefik û dafikan gelekî girîng e ku mirov naveroka demokratîk a dîn û hinekî be jî hêmanên sekuler û azad ên di laîktiyê de xwe nîşan didin, qebûl bike û pêşde bibe. Herdu hêman jî di xebatên jinûveavakirina modernîteya demokratîk de bi tenê di vê çarçoveyê de dikarin rol bigirin. Bi qasî ku mirov di şer û lîstikên sedsalan ên navbera wan de nebe alî, divê ji mirov were, hewldanên exlaq dirizînin, pûç dikin, li ser bingehê berjewendiyan ji nû ve bi moderniteyê re entegre dikin, bê tesîr bike.

**6-** Huqûq bi darê zorê yê dewletê terorê li ser civakê dimeşîne û divê mirov bi vê nexape. Exlaq esas e, huqûq talî ye. Huqûq heta bi edalet be mirov dikare jê re rêzê bigire. Di rewşeke berevajî de şert e ku mirov heta dawiyê di civaka exlaqî û polîtîk de israr bike. Divê hîç neyê jibîrkirin ku rêya bingehîn a parastin û dewamkirina civakê di helwesta exlaqî re derbas dibe.

**7-** Ji bo nûneriya global weke saziya exlaqê ekumeniyên bi cureyê Katolîk ên Vatîkanê û saziya xelîfetiya berê ya nûneriya (ekumenîk a) ummeta Îslamê û yên mîna wan (di vê navberê de dikarin rêûresmên dînî û exlaqî yên weke Musewîtî û Bûdîstiyê jî lê zêde bikin) dikarin li bin banekî hevpar ji nû ve xwe bi sazî bikin û ji teolojiyê zêdetir li ser xebatên etîk bisekinin û li ser navê tevahiya mirovatiyê di xebatên jinûveavakirina civaka exlaqî û polîtîk de bi roleke mezin rabin. Bi awayekî çawa dewletên netewe li bin banê Neteweyên Yekbûyî têne cem hev, şert e ku ew jî li dijî

êrişên modernîte dibe ser doktrînên exlaqî yên bingehîn, bêne cem hev û xwe bi sazî bikin, ev ji bo serketina wan şert e. Li dijî cinawiriyên (Levîathan) şaristanî û modernîteyên dixwazin tevahiya doktrînên exlaqî û muqedesatan daqurtînin, divê konfederasyona hîndekariya exlaqî û muqedesatên global weke pêdiviya vî şertî were damezrandin.

**8-** Hêzên modernîteya demokratîk heta wezîfeyên xwe yên der barê qada exlaqî de qebûl nekin û bi cih neyînin divê zanibin ku li dijî êrişên ku hêzên şaristanî û modernîte bi sîlehên berfireh ên îdeolojîk û çanda maddî dimeşînin, wê nikaribin bi awayekî serketî yekeyên civaka demokratîk biparêzin û dewam bikin.

Ev nirxandina kurt a li ser pênasekirina sazî û mijara der barê exlaq de weke pêşniyarên çareseriyê hatine pêşkêşkirin û hewce dike ku hê bi awayekî gelekî berfireh bêne guftûgokirin. Civaka exlaq di şemayên avakirinê yên jor û jêr de bi cih nabe, xwezaya civakî jî li gorî şemayên bi vî rengî nîne. Her yekeya civakî heta her ferd divê baş zanibe ku ji exlaq para xwe nestîne nikare bijî. Ya girîng ew e, divê ferd û civak bi exlaqekî baş xwe gurçûpêç bikin. Cinawiriyên (Levîathan) şaristanî û modernîteyê çiqasî êriş bikin û hewl bidin wê tine bikin, em jî neçar in ku ewqasî civaka exlaqî biparêzin. Yê/ya nikaribe civaka xwe biparêze mafê wî/wê yê jiyaneke bi rûmet û anor nîne. Lê exlaq nebe jî parastina civakê nabe. Di xebatên jinûveavakirina modernîteya demokratîk de, serketina ku tevahiya yekeyên civakê di wezîfeyên xwe de nîşan bidin, ji bo bi awayekî serketî rizgarbûna ji krîza sîstema global pîvana bingehîn e.

## C- Wezîfeyên Polîtîk

Têgîna polîtîkayê jî weke têgîna exlaqê peyvek e ku herî zêde tevlîhevî û germoleya têgînî li ser tê kirin. Maneya wê ya gotinê gelekî besît û hêsan e. Bi koka xwe ji Yewnaniya kevn tê, eger em bibêjin tê maneya hunerê rêvebirina bajêr, wê were fêhmkirin. Lê mirov bi pey maneya gotinan bikeve û bi vî awayî li heqîqetê bigere ev dibe rêbazeke gelekî kêm û dikare li nîvê rê bihêle. Bi awayekî giştî têgînên der barê xwezaya civakî de

gelekî şîlo û nediyar in. Dikarin îşaret bi rastiyê bikin, lê bi anîna cem hev nikarin rastiyê pêk bînin. Divê hinekî jî mirov ji têgînan wêdetir li rastiyê bigere. Mixabin, dîsa ev kar jî bi saya têgînan pêkan e. Hingê bi tenê hêza şîroveyê di dest de dimîne. Mirov maneya polîtîkayê bi xwe weke hunerê azadiyê diyar bike, dikare mebestê baştir îfade bike. Azadî bi xwe nêzîkbûna li heqîqetê bi bîra mirov dixe. Bêguman wexta ku em têgînên polîtîka, azadî û heqîqetê bi kar bînin, dîsa yekeya bingehîn a lêkolîna me civaka exlaqî û polîtîk e. Ya rastî, ez dûr disekinim ji ravekirinên ferdî yan jî ravekirinên din ên mesafeyê dixin navbera xwe û yekeya sereke ango navbera xwe û ya civakî. Dema ez li têgînên mêtinkarî, pevçûn û şer ên hema hema bi navê polîtîkayê re wekhevbûne difikirim fikarên min zêdetir dibin. Ya reşbîniya mirov zêdetir dike, polîtîka û polîs (dewlet) jî wekhev têne hesibandin.

Di mijareke bi îddîa ya mîna wezîfeya polîtîk de bi awayekî serketî gavavêtin weke xuya dike hêsan nîne. Ji gavneavêtin û xwelêranekişandinê ya çêtir ew e, mirov bi ceribandineke dilnizmî rabe qenebe ji bo pêşdebirina guftûgo, lêkolîn û lêgerînê baştir e. Ez yeqîn dikim ku divê berê pêşî ez hinek karên weke polîtîka nahesibînim, diyar bikim. Ya pêşî, divê mirov baş fêhm bike ku karûbarên dewletê karên polîtîk nînin, karên îdarî ne. Bi xwesipartina dewletê polîtîka nayê meşandin, îdare tê kirin. Ya dudiyan, karûbarên berjewendiyên heyatî yên civakê eleqedar nekin polîtîkaya bingehîn pêk nayînin. Asta wan weke ya karên din ên rûtîn e ku saziyên din yên civakî wan pêk tînin. Ya sisiyan, karûbarên bi azadî, wekhevî û demokratîktiyê re pêwendîdar nebin, bi awayekî bingehîn têkiliya xwe bi polîtîkayê re nînin. Berevajiyê van karan jî ji binî ve polîtîkayê eleqedar dikin: Berjewendiyên heyatî yên civakê ev in; debar, ewlekarî, jîndarî, demokrasî, wekhevî û azadiyên dewlet û desthilatdarî wan asteng dikin. Çawa ku tê dîtin, karûbarên polîtîk bi karûbarên dewletê re heman tişt nînin, heta bi hev re nakok in. Di vê rewşê de dewlet çiqasî mezin û berfireh bibe, polîtîka jî wê ewqasî teng û sist bibe. Dewlet rêzik û qaîde ne, polîtîka jî afirênerî ye. Dewlet a heyî bi rê ve dibe, polîtîka jî pêk tîne û bi rê ve dibe. Dewlet zenaet e, polîtîka jî huner e.

Têkiliya desthilatdarî û polîtîkayê hê bêtir şîlo û nediyar e. Belkî jî desthilatdarî ji dewletê bêtir tê maneya înkara polîtîkayê. Desthilatdarî her tim ji dewletê gelekî zêdetir di nava civakê de bicihbûyî ye. Ev jî nîşan dide ku di nava civakê de polîtîka meşandin çiqasî zehmet û çiqasî derfetên wê kêm in. Di encamê de têkiliyên polîtîka û desthilatdariyê timî tengezar û bi çalakî derbas dibin.

Çareya me nîne, divê em bi awayekî berbiçav nêzî mijarê bibin. Ji ber ku polîtîka heta pratîk nebe maneya xwe namîne. Me hewl da civaka exlaqî û polîtîk bi gelek mijarên têkildar re analîz bikin. Herçiqasî me gelekî hewl da em dubare nekin jî em dîsa mecbûr dibin. Çawa ku civak di exlaq de diyarde û xwezayek e, di polîtîkayê de bi heman rengî ye. Weke ku yeqîn tê kirin, ne di çarçoveya xebatên dewleta fermî de, belê weke xwezaya civakî polîtîk e. Eger fonksiyona exlaq, kirina herî baş a karên exlaqî be, fonksiyona polîtîkayê jî peydakirina karên herî baş e. Bala xwe bidinê, polîtîka hem naveroka xwe ya exlaqî heye, hem jî jê zêdetir. Peydakirina karên baş hêsan nîne. Ji ber ku ji bo peydakirina karên baş, naskirineke baş divê, ango jê re zanîn û zanist, wekî din jî dîtin yanî lêkolîn û lêgerîn divê. Kengî têgîna başiyê jî li vê zêde dibe, hingê zanîna exlaqê jî ferz dibe. Çawa ku tê dîtin, polîtîka hunerekî gelekî zor û zehmet e. Xusûseke mirov pê dixapin ew e, bi têgînên hecmên wan mezin ên weke dewlet, împaratorî, xanedan, netewe, şîrket, çîn û hwd. di zikhev de li polîtîkayê difikirin. Eger bi diyardeyên bi vî rengî û yên weke wan re di zikhev de mirov li polîtîkayê bifikire, dibe maneya wê kêm bike. Polîtîka rastî di pênaseya xwe de veşartî ye: ji bilî demokrasî, wekhevî û azadiyê ti koma têgînan nikare berjewendiyên heyatî yên civakê rave bike. Hingê mirov dikare bibêje, bi awayekî bingehîn polîtîka ew e, di her şert û mercî de ji bo vî wesif an jî dewamkirina hebûna civaka exlaqî û polîtîk çalaktiya azadî, wekhevî û demokratîkbûnê ye.

Dema em behsa civaka exlaqî û polîtîk dikin em qala beriya dîrokê nakin. Em behsa xwezaya civakî ya dewamî pêk tê û heta hebûna wê bi dawî nebe wê timî dewam bike dikin, em qala vê rewşa wê ya xwezayî ya wê dewam bike dikin. Herçiqasî were rizandin, pûçkirin û parçekirin jî

civaka exlaqî û polîtîk wê her hebe. Heta xwezaya civakî hebe wê ew jî her hebe. Rola polîtîkayê jî ew e, bêyî ku vê hebûnê bide rizîn, nehêle were parçekirin û pûçkirin divê wê hê pêşde bibe û ji bo vê jî wê azad, wekhev û demokratîk bike. Her civaka exlaqî û polîtîk a bi vê rewşê rabe, ew civaka herî baş e; ev pêkanîna wê civakê ye ku mirov kiriye armanc.

Ji bo naveroka têgînê baştir were fêhmkirin divê em careke din serî li dîrokê bidin. Ji bo vî karî jî şaristanî wê dîsa têgîna me ya sereke be. Şaristanî, ne bi tenê ji ber ku desthilatdarî û dewletê digire nava xwe, di çarçoveya çînayetî û bajartiyê de jî tevnên çanda maddî û îdeolojîk ên li ser civakê dewamî û zêde dibin û her ku xwe li civaka exlaqî û polîtîk dialînin, rola polîtîkayê kêm dibe. Dortengbûna li polîtîkayê tê wê maneyê ku azadî, wekhevî û demokakratîkbûna civakî paşve dikeve yan jî înkarkirina wê bi xwe re tîne. Dîroka şaristaniyê bi bûyerên bi vî rengî tijî ye. Civaka di bin hakimiyetê de çiqasî were kolekirin, serfkirin û proleterkirin, hakimiyet ber bi derve ve bi ser civakên azad, wekhev û demokratîk de wê biçe û pêvajoya mêtingehkirin û zordestiyê bi vî awayî wê dewam bike. Qanûna kara herî zêde ya yekdestdarên sermaye û desthilatdariyê vê ferz dike. Di vê rewşê de polîtîka wê weke berxwedana yekeyên şaristaniya demokratîk manedar bibe. Ji ber ku bêyî berxwedanê ti gava azadî, wekhevî û demokratîkbûnê wê neyê bi ser xistin, pêşî li rizîn, parçebûn û pûçbûna asta exlaqî û polîtîk neyê girtin, mêtingehkirinê neyê astengkirin, li ber mêtinkariya yekdestdariyan ti kes ê nikaribe bisekine. Ji ber vê rola di dîrokê de pê rabûye, polîtîka weke hunerê azadiyê tê pênasekirin. Her çîn, bajar, gel, qebîle, cemaeta dînî, qewm-neteweya nikaribe polîtîkayê bike yan jî nehiştibin polîtîkayê bike, hêza wê ya gotin û îradeyê derba herî mezin xwariye. Li cihê ku îrade û gotina kolektîf a civakê nebe bi tenê bêdengiya mirinê heye.

Roma û Atînaya serdema antîk navê xwe ji hêza xwe ya polîtîk digirtin. Demokrasiya Atînayê û Romaya komarê tevî kêmasiyan hemûyan jî eger îro hê bi heyranî têne bibîranîn di vê de hêmana bingehîn polîtîka bajêr e ku bi mehareteke mezin hat meşandin. Atînayê bi polîtîka bajêr Împaratoriya Pers a dêwane ne tenê rawestand, herweha têkçûna wê jî

amade kir. Roma jî bi polîtîkayên xwe yên komarger karîbû bibe navenda dinyayê. Ji vê jî girîngtir, di pêşketina çanda Greko-Romen de polîtîkvaniya herdu bajaran bi roleke diyarker rabû.

Mînaka Babîlê hê balkêştir e. Belkî jî mirov dikare weke mînaka herî mezin û pêşî ya xweserî û serxwebûna bajêr pêşkêş bike. Babîl ji bo nekeve bin serweriya hêzên dewlet û desthilatdariyên hê bi hêztir ên dewrûberê hostayî û mehareta hemû polîtîkaya xweserî û serxwebûnê pêşkêş kiriye. Ji Asûran heta bi Hîtîtan, ji Kassîtan heta bi Mîtanniyan, ji Persan heta bi Skender di demên xwe de li dijî tevahiya împaratoriyên navdar ên dîrokê bi van polîtîkayên xwe yên hosteyane karîbû li ser piyan bimîne. Bi zanist, huner û îndustriya pêşde bir karîbû bibe navenda balkêşiyê ya şaristaniya herî dema dirêj a dema xwe (ji 2000'î B.Z. – heta bi salên mîladî). Bêguman di vê de para polîtîka bajêr a dişopand û pêk dianî bi awayekî diyarker hebû. Eşkere ye ku di serê wan mînakên balkêş de tê, piştrast dike ku polîtîka azadî û afirînerî ye. Em di vê çarçoveyê de dikarin Kartaca û Palmyrayê ji van mînakan bihesibînin. Kartaca li dijî hegemoniya Romayê demeke dirêj bi polîtîkaya berxwedanê li ser piyan ma û herweha pêşketina xwe ya afirîner dewam kir. Kengî mîna Romayê xwe li eşqa împaratoriyê rakişand, hingê neçar bi bin ket. Ji ber ku împaratorbûn bi polîtîka berxwedanê re ters e. Heta înkara polîtîkayê ye. Encam têkçûneke trajîk e. Palmyra jî di pêvajoyeke bi heman rengî re derbas bû. Belkî jî li herêmê piştî Babîlê ya herî zêde mezin bû û demeke dirêj (300 B.Z.-P.Z. salên 270'î) karîbû xweser û serbixwe bimîne Palmyraya navdar e ku li çolê cennetek afirandibû. Kengî li dijî împaratoriyên Pers û Sasanî dev ji polîtîkayên tewazun û xweseriyê berda û xwest bi serê xwe bibe împaratorî (di dema qralîçeya navdar Zennûbiyayê de salên 270'î P.Z.) nikarîbû xwe ji encama trajîk xelas bike. Berxwedana ji bo azadiyê diçe serketinê, ji bo desthilatdariyê jî diçe felaketê, trajediya Palmyrayê yek ji wan mînakên balkêş e ku ev rastî pêşkêş kiriye.

Di serdema navîn de polîtîkayên bi heman rengî yên xwesertiya bajaran hê bi awayekî berfirehtir hatine meşandin. Mîna ku em bi cîhana stêrk a bajarên li dijî împaratoriyan li ber xwe didin rûbirû ne. Ji împaratoriyên

Îslamî (Emewî, Abbasî, Selçûkî, Tîmûr, Babûr, Osmanî) heta bi Împaratoriya Cengiz, ji Împaratoriyên Xiristiyan (Bîzans, Spanî, Awisturya, Rûsya Çartiyê, Brîtanya) heta bi Împaratoriyên Çînê, bi sedan bajarî (ji Okyanûsa Mezin heta bi Okyanûsa Atlasê heta bi Parzemîna Emerîkayê, ji Sahraya Mezin heta bi Sibîryayê) li ser navê polîtîkayên xweseriyê li ber împaratoriyan rabûn û wexta hewce kir di berdêla tinebûna xwe de li ber xwe dan. Mînaka dişibe Kartacaya kirin zevî, bajarê Otrar e, yê ku li dijî Cengiz Xan li ber xwe da. Ew jî kirin zevî ango bi erdê re kirin yek. Ji bo bajarên Ewrûpayê yên hem li ber hêzên împaratoriyê rabûn, hem jî li dijî navendgiriya dewletdariya netewe li ber xwe dan bi sedan mînak hene mirov bide. Nexasim baş tê zanîn ku bajarên Îtalya û Elmanyayê heta nîvê sedsala 19. ji bo avahiyên xwe yên xweser biparêzin gelekî xurt li ber xwe dan. Ji van bajaran Venedîk û Amsterdam mînakên navdar in.

Di sedsala 19. de dewleta netewe li her deverê bi ser ket û ev bû derbeke mezin û li xweseriyên di dîrokê de bi hezarê salan dewam kiribû ket. Lê postmodernîte û xweseriyên bajaran ji nû ve zêde dibin. Polîtîkvaniya bajaran derdikeve pêş.

Di dîrokê de li dijî hêzên şaristaniyê ne bi tenê polîtîkvaniya bajêr heye, belkî jî ji wan zêdetir qebîle, eşîr, cemaetên dînî, ekolên felsefî û hwd. komên sereke û diyar ên civakî hene ku ji bo weke hêza polîtîk a xweser bimînin bê hejmar berxwedan kirine. Çîroka xweseriyê ya sê hezar û pêncsed salî (ji 1600 B.Z. – heta roja me ya îro) ya qebîleya Ibrî belkî jî mînaka herî navdar e. Di afirênerî û zêde dewlemendiya Cihûyan a dîrokê û roja me ya îro de polîtîkaya xweseriyê ya qebîleya Ibrî bi roleke diyarker rabûye. Tevî ku Îslam veguherandin amûrê desthilatdarî û dînê împaratoriyê jî li beramberî vê berxwedanên gelekî mezin ên mezheban derketin holê. Mezhebên Elewîtî û Xaricîtiyê polîtîkayên jiyana xweser a qebîle û eşîran nîşan didin. Li dijî rêûresma hukimraniya sunnî û siltantiyê di binya her qewmî de bi awayekî belav mezhebên muxalif derdikevin û ev bi xwe encama polîtîkayên berxwedan û azadîxwaziya qebîle û eşîran e. Bi awayekî li dijî mêtingeriya Îslama Sunnî tevgerên pêşî yên azadîxwazî û serxwebûnê ne. Di Xiristiyantî û Musewîtiyê de hejmareke zêde mezhebên

berxwedanê yên bi heman rengî hene. Seranserê serdema navîn bi têkoşînên cemaetên dînî û qebîleyî yên xwecihî û bajarî yên ji bo polîtîkayên xweserî û azadiyê tijî, derbas bûye. Jiyana keşîşxaneyan û berxwedana nîv bi dizî ya sêsed salî ya cemaetên pêşî yên Xiristiyan di amadekirina şaristaniya hemdem de bi rola sereke rabûye. Polîtîkayên xweser ên ekolên felsefî yên Serdema Antîk A Yewnan di amadekirina zanistê de bi rola bingehîn rabûye. Netewe û gelên karîbûne bigihîjin heta roja me ya îro, vê rastiyê herî zêde denydarê pêşiyên xwe yên qebîle û eşîran in ku bi hezarê salan li serê çiyan û nava çolan li ber xwe dane.

Tevgerên rizgariya neteweyî yên serdema hemdem dewama vê rêûresmê ne. Herçiqasî weke dewleta serbixwe ji rê hatibin derxistin jî armanca ku hemû li pey dibeziyan serxwebûna polîtîk bû. Lîberalîzmê serxwebûna polîtîk veguherand serxwebûna sexte ya dewleta netewe û herçiqasî bi vî awayî ew ji fonksiyona wê ya rastî dûr kiribe jî dîsa jî maneya wê ew e ku rêrûresma berxwedaneke gelekî girîng a polîtîk dewam dike.

Di dîrokê de polîtîkayên xwecihî û herêmî her hebûn û di dewamkirina hebûna civaka exlaqî û polîtîk de bi roleke girîng rabûn. Di serî de deverên çol, daristan û çiya li cografyayeke berfireh a ser rûyê erdê netewe û gelên weke civakên qebîle, eşîr, gund û bajar dijîn bi polîtîkayên xweser û serbixwe timî li dijî hêzên şaristaniyê li ber xwe dane. Ji ber vê sedemê em dibêjin rêûresma konfederal a demokratîk di dîrokî de giraniya xwe heye. Em dibêjin di tevahiya dîroka şaristaniyê de meyla serdest serî tewandin nîne, berxwedan e. Eger wisa nebûya dinyayê bibûya Misra Firewnan. Eger em nizanibin ku ti navçe û herêma mirov nemaye ku têde berxwedan û polîtîka çênebûye, em ê nikaribin dîrokê bi awayekî rast şîrove bikin. Eger gelên Emerîkaya Latîn, Efrîka û Asya hîn jî bi reng û çandên xwe hemûyan li ber xwe didin, ev tê wê maneyê ku dîroka wan jî wisa ye. Ji ber ku dîrok ‘niha’ ye.

Mirovahiyê di dîrokê de ne bi tenê di asta civak û herêmên cografî de berxwedana polîtîk kiriye û bi vî rengî hebûna xwe û anora xwe parastiye; wê di heman demê de di asta ferdî de jî kesayetên polîtîk ên li ber xwe

dane û têkoşiyane dîtine ku carna bi qasî neteweyekê giraniya wan hebû. Dîrok bi van mînakan tijî ye.

Mirovên weke ferd ên bi qasî ku neyên jimartin, ji Bûda heta Sokrates, ji Zerdeşt heta Konfuçyûs û heta pêxemberan hemûyan ku ji Hz. Adem destpê dikin heta Nûh û Eyûb û ji Brahîm heta Mûsa, Îsa û Muhammed bi xelekên sereke dewam dikin hejmara wan di Pirtûka Pîroz de ji 120 hezarî zêdetir tê nivîsîn; herwisa ji Xwedawend Înannayê heta Hz. Eyşeyê, ji Zennûbeyê heya Hypatîayê, ji Kîbeleyê heta Meryem û ji jinên Cadû heta Zeyneb û Rosa, dîsa ji Brûno heta Erasmûs, karîbûne berdêla wê mirin be jî li ber xwe bidin ji bo karibin azad, birûmet û anor bimînin. Civak eger di roja me ya îro de hê jî bi awayekî exlaqî û polîtîk dewam dike, bi herhalî gelek nirxan deyndarê van ferd û kesan e. Naxwe wê cudahiya civakê ji keriyên koleyan nemana.

Di roja me ya îro de şîrovekirina polîtîkayê bêguman hê bêtir girîng e. Lê dîsa jî divê mirov diyar bike ku di roja me ya îro de jî dîrok bi giranî hebûna xwe dewam dike, heta mirov vê diyar neke nikare polîtîkayê şîrove bike. Di warê dortengkirina li polîtîkayê de ya şaristaniyê carekê kiriye moderniteya kapîtalîst hezar carî kiriye û hê jî dike. Em jî bi israr vê kirina wê misêwa diyar dikin. Ez dixwazim analîza me ya der barê dewleta netewe de bi bîr bixim, min di wir de gotibû, civaka modern bi tenê ji jor ve di bin serweriya dewletê de nîne, bi tevahî çaviyên wê yên jiyanê ji aliyê amûrên desthilatdariyê ve hatine dagirkirin, mêtingehkirin û ketine bin bandorê. Girîng e ku mirov serwext bibe, civaka di asta global de bi vê rastiyê dor lê hatiye girtin, fetihkirin û mêtingehkirin. Ez tenê qîma xwe pê tînim ku bi bîr bixim hegemoniya çanda maddî û îdeolojîk çawa tevna xwe berfireh û belav dike. Ev rewşeke nû ye. Em navê wê çi hegemoniya super a global, çi împaratorî çi jî nîzama Neteweyên Yekbûyî deynin, cewherê mijarê bi xwe naguhere. Herweha me gotibû sermayeya fînansê mohra xwe li hegemoniya global daye û me destnîşankiribû ku di heman demê de krîza avahî û sîstemîk heye û her diçe dewamî dibe.

Dema em dipirsin ka di van şert û mercan de ji ber civaka exlaqî û polîtîk çi ma, divê em polîtîkayê bixin ber lêpirsînê ka di wê hêzê de bû ku

bi çi rolekê rabe yan na. Em dibînin ku tabloya heyî gelek caran rê li neyênîtiyê û bêhêvîbûnê vedike. Ha tam di vê nuqteyê de bi ber bêhêvîbûn û neyênîbûnê ketin ne tenê li cih nîne, di heman demê de bê mane ye û mirov dikare vê ji jêpirsîna hûrûkûr a polîtîk a rewşê fêhm bike. Çawa ku têra xwe tê zanîn, nuqteyên mînîmûm û maksîmûm ên trend, ekol û astên pêlan (gerdûnî heqîqet e) hene. Bi tevahî nîşane didin xuyakirin ku rewşa heyî ya desthilatdariya şaristanî û modernîteyê ji zû ve ji maksîmûmê derbasî serberjêrçûnê bûye. Desthilatdariya li civakê belav bûye, mîna pêleke ku giraniya xwe ji dest dayî hêza xwe ji dest dide. Çawa ku kevirekî mezin ji serê gir bigindire û li jêr parçe bibe, giraniya xwe nemîne, desthilatdariya heta bi çaviyên civakê ketî û parçebûyî jî ji giraniya wê tiştek namîne.

Mirov dikare maneya sosyolojîk a vê rastiyê çareser bike. Desthilatdarî çiqasî li ferd û yekeyên civakê belav bibe, ewqasî li berxwedana ferd û yekeyan rast tê. Desthilatdarî li her ferd û yekeya lê belav dibe rê li ber berxwedanê vedike. Ji ber ku wexta bi zordestî, mêtinkarî û êşkenceyê barkirî xwe li ser her ferd û yekeyê ferz dike, eger rê li berxwedanê venebe, ev yek li gorî meş û herikîna gerdûnî ya xwezayê nîne. Rastiya desthilatdariya modern ji rastiya desthilatdariya serdemên dîrokî gelekî cuda bûye. Kapîtalîzm weke yekdestdariya sermayeyê tevna xwe ya li ser ekonomiya dinyayê hemû di asta kara herî zêde de temam kiriye, quncikeke bi tenê ya lê belav nebûbe nehiştiye. Herweha eger em krîza ekolojîk jî li vê zêde bikin, bi kûrahî malbat û klaneke bi tenê ya xwe negihandibiyê nehiştiye. Encamên qanûnên kapîtalîstîk ên îndustriyalîzmê, hilweşîna di avahiya hundir û derve ya civakê de kirî, gihandine asta felaketê. Dewleta netewe weke hêza xwedayî ya herî bi hêz welatiyekî bi tenê nehiştiye neçizîribe navê û hegemoniya li ser çênekiribe. Di dîrokê de demeke din a bi vî rengî nîne. Anthony Giddens wexta dibêje ‘wekhevê wê nîne – bêhemta ye’ di vê nuqteyê de gotina wî di cih de ye.

Li hemberî vê rastiya desthilatdariyê (kapîtalîzm, îndustriyalîzm û dewleta netewe), weke qutbê dijber di dîrokê de bi qasî ku bi ti demê re mirov nikaribe bide berhev, polîtîka neçarî cudabûnê ye. Li gorî ku em ne

di dema berî û piştî şaristaniyê de ne, avabûna polîtîkayê ya xweserî modernîteyê jî neçar e ku rengekî cuda bigire. Eger em bi kurtî formule bikin, li gorî ku tevna desthilatdariyê li her deverê heye, polîtîka jî neçar e ku li her deverê hebe. Li gorî ku desthilatdarî xwe disipêre her yeke û ferdê civakî, polîtîka jî divê xwe bisipêre her yeke û ferdî.

Desthilatdariyê li ser tevahiya civakê tevna xwe vedaye, lewma mirov dikare fêhm bike ku divê polîtîka jî tevna xwe hem li ser tevahiya civakê vede hem jî berfireh deyne. Eşkere ye ku bi avahiya rêxistinên berê bersiva vê nayê dayîn. Jixwe modelên rêxistiniyê yên berê navend dewlet bûn. Beriya her tiştî divê polîtîka li dijî desthilatdariyê weke berxwedanê destpê bike. Li gorî ku desthilatdarî armanca xwe fetihkirin û mêtingehkirina her yeke û ferdê civakî ye, polîtîka jî hewl dide her yeke û ferdê xwe disipêriyê azad bike û bi dest bixe. Li gorî ku her têkiliya yekeyî û ferdî desthildarî ye, dijberê wê jî polîtîk e. Li gorî ku desthilatdarî rê li ber îdeolojiya lîberal, îndustriyalîzm, kapîtalîzm û dewleta netewe vedike, polîtîka jî divê îdeolojiya azadiyê, eko-îndustrî, civaka kominî û konfederalîzma demokratîk çêke û ava bike. Li gorî ku desthilatdarî di her asta yeke û ferd, gund û bajar, xwecihî, herêmî, neteweyî, parzemînî û global de xwe bi rêxistinî dike, polîtîka jî divê di her asta ferdî, yekeyî, bajarî, xwecihî, herêmî, neteweyî, parzemînî û global de xwe bi rêxistin bike. Li gorî ku desthilatdarî di van astan hemûyan de propaganda û her cure şêweyê çalakiyê (şer jî di navê de) ferz dike, polîtîka jî li beramberî van hemûyan divê propaganda û şêweyên çalakiyê ferz bike.

Ev rastiya desthilatdariyê ya modernîteyê ku me hewl da bi xetên sereke pênase bikin heta rast neyê naskirin em li ser ti wezîfeya polîtîk rast nikarin bixebitin. Em ezmûna Sovyetê, heta qonaxên berê yên sosyalîzma pêkhatî bînin bîra xwe. Li dijî kapîtalîzmê sendîkalîzma karkeran (parsekiya heqdestiyê), li dijî îndustriyalîzmê îndustriyalîzma hê bêtir pêşketî, li dijî dewleta neteweyî ya navendî dewletdariya neteweyî ya navendî ya hê bêtir pêşketî. Bi kurtî li dijî desthilatdariyê desthilatdarî, li dijî agir agir, li dijî dîktatoriyê dîktatorî, li dijî kapîtalîzma taybet kapîtalîzma dewletê. Evçend amûrên desthilatdariyê yên dêwane yên

mirovatî nikaribe ji binî rabe, kir ku ji hundir ve hilweşîn destpê bike. Sosyalîzma pêkhatî ya bû mezhebê kapîtalîzmê (kapîtalîzma çepgir) bi vê rê bi tenê li dijî desthilatdariyê polîtîka nekir, li dijî polîtîkayê jî desthilatdarî pêkanî. Ji bo dîtina vê, têrê dike ku mirov bi tenê dîroka partiyan bixwîne. Mezheba sosyal demokrat (kapîtalîzma rêya navîn), bi reformekirinê desthilatdarî hê bêtir mayînde kir û ji bo dîtina vê jî têrê dike ku mirov mînakên Ewrûpa yên dîrokên partiyan bixwîne. Mezheba tevgerên rizgariya neteweyî (kapîtalîzma rastgir) jî yekser bû dewleta netewe û di belavbûna kapîtalîzmê li dinyayê de bi rola sereke rabû. Li derveyî van sê mezheban min dijberên din ên sîstemê şîrove kiribûn. Kêmasî û şaşiyên wan ên herî mezin ew bûn, yan li dijî desthilatdariyê xwe bi parçeyekî desthilatdariyê girtin (dewleta netewe), yan bi tevahî li beramberî desthilatdariyê meydan vala hiştin (nexasim anarşîst), yan jî bi rêxistinên civaka sivîl xwe mijûl kirine. Ji yên me behsa wan kirî, ji yekê ji wan jî nehatiye li desthilatdariyê bi awayekî sîstematîk serwext bibe û weke polîtîka alternatîfê wê biafirîne û pêdiviya vê jî his nekiriye. Polîtîka di her astê de ji taşeronên desthilatdariyê re hiştine û haya wan ji wan nîne ku ji duaya pêk nayê re amîn gotine. Ji vir û pêve ya dimîne hewardanîn û xeberdana ji krîza kapîtalîzm û globalîzmê ye, ev jî eşkere ye ku ji ti derdî re ne derman e, û wê nebe derman.

Zimanê modernîteya demokratîk, polîtîk e. Tevahiya avabûna xwe ya sîstematîk bi hunerê polîtîk dihûne û ava dike. Zanistên bingehîn naveroka xwe bi civaka exlaqî û polîtîk re ne desthilatdariyê, polîtîkayê tîne bîra mirov. Rastiya civaka exlaqî û polîtîk di roja me ya îro de ango pirsgirêka wê ya pêştir ji azadî, wekhevî û demkrasiyê wêdetir hebûnî ye. Ji ber ku hebûna wê di tehlûkeyê de ye. Êrişên modernîteyê yên ji gelek aliyan ve beriya her tiştî li ser wê parastina hebûna wê ferz dike. Bersiva modernîteya demokratîk li beramberî van êrişan di çarçoveya xweparastinê de berxwedan e. Civak neyê parastin polîtîka nayê kirin. Ez dubare destnîşan dikim ku civak tek e, ew jî civaka exlaqî û polîtîk e. Pirsgirêk beriya her tiştî ew e, civaka şaristaniyê têra xwe rizandiye, desthiltadarî û dewletê ew kirine mêtingeh û dagir kirine, di şert û mercên

pêşketîtir yên moderníteyê de jinûveavakirin e. Tevî xweparastinê, siyaseta demokratîk polîtîkvaniya demê bi xwe ye. Siyaseta demokratîk civaka exlaqî û polîtîk pêşde dibe, bi xweparastinê jî ji êrişên desthilatdariyê yên li ser avahiya hebûn, azadî, wekhevî û demokratîkbûna wê diparêze. Em ne behsa cureyekî şerê nû yê rizgariya neteweyî, ne jî şerê civakî dikin. Em li ser bingehê cudatiyan behsa parastina nasname, azadî, wekhevî û demokratîkbûnê dikin. Eger êriş nebin hewcedarî bi parastinê jî namîne.

Hêzên dijberî şaristaniyê di dîrokê de meyla wan a sereke ya şêweyê jiyana polîtîk, konfederal e. Tevahiya yekeyên civakî pevgirêdana wan bi tayên sist bi tenê bi şertê ji xweseriya wan re rêz were nîşandan, wê qebûl bikin. Ji hêzên dewletdar û desthilatdariyê yên şaristaniyê re jî bi tenê bi vî şertî razî dibin. Şertên têde razîbûn nebe, rewşa şer a misêwa ye. Dema riza hebe jî ya pêk tê aştî ye. Prensîba rêveberiya civakî ya karibe bersivê bide tevahiya avahiya dewleta netewe û diyardeya desthilatdariyê ya civaka serdema modern hemû zevt kiriye, polîtîka û konfederalîzma demokratîk e. Polîtîka weke siyaseta demokratîk tê îcrakirin, yekeyên civakî hemû jî weke hêzeke federe wê tevlî pêvajoya konfederal bibin. Ev sîstem dinyayeke nû ya polîtîk e. Şaristanî û moderníteyê timî bi fermanê îdare dikin, şaristaniya demokratîk û modernîte jî bi lihevkirin, guftûgo û polîtîkaya bi rastî rêve dibin. Rastiyên dîrokê û roja me ya îro çiqasî bêne berevajîkirin û sergirtin, bûyerên civakî yên esasî bi pêşengiya hunerê polîtîkayê pêk hatine. Kapîtalîzm ê di şertên krîzê yên global de hewl bide desthilatdariya xwe li ser bingehê jinûveavakirina dewleta netewe biparêze, bi tevahî hêzên moderníteya demokratîk jî divê sîstema konfederal a demokratîk a armanca wê bergirî û pêşdebirina civaka exlaqî û polîtîk e, pêşde bibin û bi vî awayî bersivê bidin krîzê ku ev wezîfeya wan a bingehîn e.

Li ber rohniya van ravekirinan em dikarin prensîbên giştî yên der barê wezîfeyên polîtîk ên hêzên moderníteya demokratîk de bi kurtasî li dora xusûsên li jêr pêşkêş bikin:

**1-** Xwezaya civakî bi awayekî bingehîn hebûn û pêkhatineke exlaqî û polîtîk e. Civak heta hebûna xwe dewam bikin, wesfên wan ên exlaqî û polîtîk jî wê dewam bikin. Civakên wesfên xwe yên exlaqî û polîtîk ji dest bidin mehkûmî ji hev belavbûn, rizîn û tinebûnê ne.

**2-** Eger mirov civakan li ser xeteke rast weke civakên destpêk, koledar, feodal, kapîtalîst û sosyalîst pêş dikevin tesewir bike, ev yek ê xizmetê ji serwextkirina mirov li heqîqetên wan neke, zêdetir wê wan berevajî bike û ser wan bigire. Daxuyanî û ravekirinên bi vî rengî propaganda barkirî ne. Rengê exlaqî û polîtîk karekterê bingehîn ê civakan e, mirov li gorî pileya hebûna van civakan bi wesif bike, ya herî rast e. Hem wesfên çîn û dewletê, hem jî astên pêşketinê yên îndustriyel û cotkariyê diyardeyên demî ne ku di wê astê de nînin karketerê civakê diyar bikin.

**3-** Pirsgirêka civakî bi mêtinkarî û tehekuma desthilatdariyê ve girêdayî derdikeve holê. Desthilatdarî û mêtinkarî çiqasî pêş bikevin pirsgirêkên civakî jî ewqasî pêş dikevin. Dewletên bingeha xwe çînî ne, û weke amûrê çareseriyê têne ferzkirin, tevî kapasîteya xwe ya çareseriyê ya bi sînor bi awayekî bingehîn vediguherin çavkaniyeke nû ya pirsgirêkan.

**4-** Polîtîka ne bi tenê di çareserkirina pirsgirêkên civakî de, di diyarkirina tevahiya berjewendiyên heyatî de, di bergirî û dewamkirina wan de amûrê bingehîn ê çareseriya civakî ye. Ji bo bergiriya civakê pêdivî bi xweparastinê heye û ev xweparastin weke hêza eskerî dewama polîtîkayê ye.

**5-** Şaristaniyan tevahiya dîrokê her ku hewl da civakê bi îdareya dewletê rêve bibin, fonksiyona polîtîkayê di nava civakê de teng bû. Heta hebûna wan dewam bike, civak bi berxwedanê bersivê didin vê dorlêtengkirinê. Dîrok di bin van du hêmanên sereke de ne tam îdareya şaristaniyê ye, ne jî tam rêveberiya polîtîka demokratîk e. Şerên di dîrokê de ji karekterê nakok ê van herdu hêmanên bingehîn pêk tên.

**6-** Di dîrokê de demên aştiyê heke hêzên şaristaniyê û hêzên demokratîk hevdu nas bikin, ji nasname û berjewendiyên hev re rêz

bigirin pêk tên. Şer û agirbestên di rêya desthilatdariyê de têkiliya xwe bi aştiyê re nînin.

**7-** Di dema moderníteya kapîtalîst de, desthilatdarî ji hundir û derve dor li tevahiya civakê digire û bi awayekî vediguhere mêtingeriya hundir. Desthilatdarî û weke forma bingehîn a dewletê dewleta netewe timî bi civakê re di nava rewşeke şer de ne. Polîtîka berxwedanê çavkaniya xwe ji vê rastiyê digire.

**8-** Ev rewşa şerê topyekûn a moderníteya kapîtalîst li dijî civakê, alternatîfa moderníteya demokratîk zêdetir lezgîn û mecbûrî dike. Moderníteya demokratîk weke hebûna hêzên şaristaniya demokratîk di roja me ya îro de, ne bîranîneke serdema zêrîn a rabihuriyê ye, ne jî utopyayeke der barê paşerojê de ye; helwest û hebûna tevahî ferd û yekeyên civaka berjewendî û hebûnên wan bi sîstema kapîtalîst re nakok in.

**9-** Têkoşîna dused salên dawî ya hêzên dijberê sîstemê yan ji ber perspektîfa desthilatdariyê ya hildigirtin an jî bi sedema qada polîtîk vala hiştin bi serneketin û bê çareserî man. Tevî ku mîrateyeke bi nirx hiştine jî bi avahî û zêhniyetên berê, ne dikarin li dijî moderníteyê bi xwe, ne jî li dijî krîza sîstemîk dikarin alternatîfekê pêk bînin.

**10-** Alternatîfbûn bi tenê bi pêşdebirina sîstema xwe li dijî sêlingên moderníteyê ango kapîtalîzm, îndustriyalîzm û dewleta netewe, mumkîn e. Mirov dikare civakparêziya demokratîk, eko-îndustrî û konfederalîzma demokratîk bi navê moderníteya demokratîk weke sîstema dijber pêşniyar bike. Dijberên sîstemê li ser mîrateya şaristaniya demokratîk bigihîjin hev şensê serketinê wê zêde bibe.

**11-** Konfederalîzma demokratîk şêweyê bingehîn ê polîtîka moderníteya demokratîk e, û di xebatên jinûveavakirinê de roleke heyatî îfade dike. Dewleta netewe forma dewletê ya bingehîn e, û timî rê li pirsgirêkan vedike. Konfederalîzma demokratîk a şêweyê bingehîn ê polîtîka moderníteya demokratîk e, li dijî dewleta netewe alternatîf e, û ji bo rêvekirina li çareseriyê amûrê herî di cih de yê siyaseta demokratîk e.

**12-** Di civakên exlaqî û polîtîk de ku siyaseta demokratîk li ser kar e, azadî li ser bingehê cudatiyan bûyerên wekhevî û demokratîk bi rêya herî têkûz têne pêkanîn. Bi tenê bi hêza guftûgo, biryar û çalakiya civak bi hêza xwe ya zêhnî û wijdanê xwe bike, azadî, wekhevî û demokrasî dikarin pêk bên. Bi ti hêza muhendisiya civakî mumkîn nîne mirov vê bike.

**13-** Modernîte bi destê dewleta netewe modela civaka tek reng a faşîst, homojen û monolîtîk dimeşîne. Ji ber vê pirsgirêkên etnîk, dînî, bajarî, xwecihî, herêmî û neteweyî rû didin. Konfederalîzma demokratîk weke amûrê bingehîn ê çareseriya van pirsgirêkan alternatîfa neteweyê demokratîk pêşkêş dike. Di neteweya demokratîk de mafê her etnîsîte û têgihiştina dînî, rastiyên bajar, xwecih, herêmî û neteweyî ye ku bi nasnameya xwe û avahiya xwe ya federe ya demokratîk cih bigirin.

**14-** Li beramberî Neteweyên Yekbûyî alternatîfa yekîtiya global a neteweyên demokratîk, Konfederasyona Neteweyên Demokratîk a Dinyayê ye. Qadên mezin ên çandî û parçeyên parzemînî dikarin di astên jêr de Konfederasyonên Neteweyên Demokratîk pêk bînin. Eger Yekîtiya Ewrûpayê di vî warî de hegemonîk tevnegere mirov dikare wê weke gava pêşî bihesibîne. Gavavêtinên li dijî desthilatdariya hegemonîk a global û herêmî di vê çarçoveyê de mirov dibîne.

**15-** Hêzên şaristaniyê û hêzên demokratîk çawa ku di dîrokê de gelek caran kirine, hêzên modernîteya kapîtalîst û hêzên modernîteya demokratîk jî dikarin hebûna hev, nasnameyên hev qebûl bikin û rêveberiyên hev nas bikin û li ser vî bingehî bi hev re di nava aştiyê de bijîn. Di vê çarçoveyê de û di bin van şertan de, di nava hundir û derveyî sînorên dewleta netewe de pêkhatinên siyasî yên konfederal demokratîk bi pêkhatinên dewleta netewe re bi hev re di nava aştiyê de dikarin bijîn.

Prensîbên der barê wezîfeyên qada polîtîk a modernîteya demokratîk de hatine tespîtkirin, mirov dikare kêm jî û dikare zêde jî bike. Ya girîng diyarkirina esasên naverok û pêkanînê ne. Ez yeqîn dikim ku bi vî awayî rêzkirineke prensîban bersiva armancê dide. Guftûgo û rastiyên azadiyê yên jiyanê wê encamê diyar bikin.

Heman xusûs ji bo prensîbên min hewl da der barê sê qadên bingehîn ên modernîteya demokratîk de tespît bikim jî di cih de ne. Ez divê bi girîngî diyar bikim ku xebatên jinûveavakirinê weke pêkanîn û prensîb çawa ku di Şoreşa Franseyê de gelekî hatine guftûgokirin ne projeyeke komarê ye, ne jî plana dewleta Sovyetîk a di Şoreşa Rûsyayê de ye. Heta Projeya Civakî ya Medînê ya Hz. Muhammed jî nîne. Xusûsa min gelekî hewl da rave bikim û fikara min a bi tenê ew e, analîza heqîqetê ya der barê xwezaya civakî de û esasên pêkanîn û rêbazê der barê çareseriya azadiya civakî de çawa ku di dîrokê de gelekî caran bûye, rê li ber xwexapandinên kûr û pê re di encamê de rê li gelek şaşiyan û sergirtinan veneke.

Armanc bi xebatên jinûveavakirinê ew e, hêzên di çarçoveya berjewendiyên xwe de dijberên sîstemê ne, û hêzên divê dijberê sîstemê bin, bêyî ku mîrateya xwe ya dîrokî înkar bikin, bi zanebûn an nezanî divê nekevin xefik û dafikên lîberalîzmê, li ser esasên pêkanîn û têgihiştina sîstematîk (paradîgma) nêzîkî tevahiya ferd û yekeyên civakê bibin, wan bi rêxistin bikin û wan bixin nava çalakiyê. Di navê de yên weke şoreşgeran bixebitin jî dikarin cih bigirin, yên li pey reformê diçin jî. Giş xebatên bi nirx in. Modernîteya kapîtalîst bi xwe dema herî bi krîz a sîstema şaristaniyê temsîl dike. Wekî din serdema hegemonîk a global a herî pêşketî ya sermayeya fînansê ye, dema avabûna sîstematîk e, ya ku têde krîz domdar dibe. Sîstem ji bo ji krîzê bi zirar û ziyanên sîstematîk dernekeve, rojane li pey gelek proje û pêkanînan e. Bi îdeolojiyeke pevekirî ya lîberal a gelekî berfireh tevdigere. Li pişta wê mîrateyeke mezin a dîrokî heye. Wekî din şebekeyên rêxistinî yên elektronîk kêlî bi kêlî bi kar tîne û ew derxistine asta herî jor. Kîjan taktîkan bixwaze dikare di kêliya dixwaze de pêk bîne. Heta, weke amûrê rêveberiya stratejîk dikare dewleta netewe jî rexne bike û hewl bide xwe di gelek qadan de li jinûveavakirina wê rakişîne. Şîrket bi xwe ji hêzên dewleta netewe bihurîne. Saziyên civaka sivîl ên bûne rêxistinên mode, çawa dixwaze welê rê dide ber wan.

Di van şert û mercan de dijberên sîstemê ji bilî pêşdebirina têgihiştina xwe ya sîstemê û pêkanînên wê ti çareyeke wan a din nîne. Şoreşên Franse

û Rûsyayê (bêhejmar tevger û şoreşên din ên li ser şopa wan çûn) bi temamî di çarçoveya modernîteya kapîtalîst de û li ser rêya armancên wê nebûn. Heta gelekî pê re di nava nakokiyê de bûn û bi îddîaya sîstema nû radibûn. Yên awarte jî di navê de ji bo van îdeayên xwe gelek pêkanînên demî derbas kirin. Lê di encamê de kapîtalîzmê karîbû di demên kin û dirêj de van şoreşan di nava kirin û têgihiştinên xwe yên modern de bihelîne. Bêguman di serî de ya van şoreşên mezin, mîna tevahiya mîrateya dîrokî, wezîfeya pêşî ye ku mirov li mîrateya azadî, wekhevî û demokratîk a şoreşên hemdem xwedî derkeve. Lê eşkere ye ku divê mirov ji nuqteyên pê xapiyaye jî dersan bigire. Di vê xebatê de wê bê dîtin ku min giraniya xwe daye ser vê mijarê. Bêguman dersgirtina ji tecrûbe û ezmûnên pêkhatî, ji bo rêxistin û kesên xwedî heman îdealan wezîfeyek e, ku dest jê nabe.

Krîz dewam bike yan jî neke, wezîfeyên bingehîn her tim li pêşiya me ne. Wezîfeyên entelektuel, exlaqî û polîtîk jî divê her tim bi cih bêne anîn. Cudatiyên demî bêguman wê di nêzîkatiyên cuda yên stratejîk û taktîk de xwe nîşan bidin. Lê wesfê bingehîn ên wezîfeyan naguhere. Ez yeqîn dikim ku xusûsên min der barê prensîb û ravekirina wezîfeyên sê qadên wezîfeyan de diyarkirî gelekî girîng in. Ev di heman demê de rexne û xwerexnekirina min a li hemberî her sazî, kesayet, têkilî û bûyera jê berpirsiyar im. Heta ku serdema me heta şaristaniya me bi awayekî berfireh neyên analîzkirin û rexnekirin, haya min jê heye ku rexne û xwerexnekirinên ferdî wê nirxeke xwe ya bi hêz nebin. Li ser vî bingehî min hewl da nêzîk bibim.

Ez neçar bimînim û pirr dubare bikim jî divê ez careke din bibêjim, xebatên der barê wezîfeyên entelektuel, exlaqî û polîtîk de esas e ku di zikhev de bêne meşandin. Qadên xebatê çiqasî di nava xwe de serbixwe bixebitin jî berhemên derxin holê kengî qadekê xizmeta qada din temam kir di cih de ye. Ji aliyê entelektuel ve rohnîbûn nebe qada exlaqî nikare qencî û başiyê pêşde bibe û bivênevê wê vê qadê li xirabiyê veke. Li zeman û mekanê exlaqê baş nebe, exlaqê xirab heye. Qada polîtîk rewşa pêkanîna rojane ya rohnîbûn û exlaqîbûnê îfade dike. Polîtîka di vê çarçoveyê de

rastiya rojane ya pêkanîna rohnîbûn û exlaqîbûnê ye; rohnîbûn û exlaqîbûn bi xwe ye. Herweha li devera polîtîka û exlaq nebe mirov nikare behsa rohnîbûnê ango bi awayekî ciddî behsa hebûna xebatên entelektuelî bike. Entelektuelîzma têkiliya xwe bi exlaq û polîtîkayê re qutbûyî, mîna entelektueliya sermayeyê dikare tiştekî din be. Lê nabe ku ev weke wezîfeyeke entelektuelî were nirxandin. Ji ber ku ji bingehê exlaqî û polîtîk bêpar e.

Ji bo civaka exlaqî û polîtîk kengî wezîfeyên entelektuel, exlaqî û polîtîk di zikhev de hatin bicihanîn hingê azadî, wekhevî û demokratîkbûn ê di asta herî jor de pêk bên. Ji ber vê sedemê pîvana serketinê ya hêzên dijberê sîstemê ew e, wezîfeyên di sê qadan de divê di zikhev de bi cih bînin.

# 12- ENCAM

Serwextî, bîrbirin bi heyîna gerdûnî re têkildar e. Nîzama gerdûnî ya heyî bi tenê bi têgîna serwextî-bîrbirinê mirov dikare rave bike. Ya balkêş şêwazê bîrbirinê yê xwe anîna ziman e. Wer tê fêhmkirin ku bi tevahî cûrbicûriya gerdûnî encama xwesteka xwe anîna ziman a bîrbirinê ye. Em der barê pirr serwextbûna serwextiyê ango bîrbirina bîrê de bi ti tiştî nizanin. Lêgerîna bîrbirinê ya li cûrbicûriya hema hema bêserûbinî, pirsek e ku li sedemê dide fikirîn. Pirsa çima, gelekî şîlo û nediyar dimîne. Hin fîlozofên navdar, heta hin ji Pirtûkên Pîroz van pirsan bi arezûya gerdûnê ve ya dixwaze bi bîr were yan jî bi arezûya xwedê ve ya dixwaze ji aliyê evdên xwe ve were zanîn, girê didin. Gotina hayjêbûn ji bo min hê bi heybet û raveker e. Ji zerreya herî piçûk heta bi hebûna herî kozmîk hayjixwebûn, dikare bibe bersiva pirsên çima û sedemê. Maneya em ê li hayjixwebûnê bar bikin, ji bilî jiyanê bi têgînên din nayê pênasekirin. Mirov dikare pênaseya jiyanê ya herî nêzî rastiyê weke hayjixwebûnê diyar bike. Ji vê jî girîngtir, hayjixwebûn çima evqasî girîng dibe? Em dizanin bêyî hayjixwebûnê jî jiyan mumkîn e. Lê wexta em bi kûrî hewl didin pê bihisin, em fêhm dikin ku ev mumkînbûna zêde mumkîn xuya nake. Mirov dikare bibêje dema dirêj a jiyanê ya haya mirov jê nabe û dibihure nirxê wê yê jiyanê kêm dibe, heta dihele diçe. Diyardeya mirinê jî ji sedî sed hayjêbûna ji jiyanê ango ji bo mumkînkirina jiyanê weke hostatî yan jî lîstikeke xwezayê xuya dike. Mînak hebûneke bi jiyaneke bêserûbinî hatibe cezakirin, gelo çi cudahiya xwe ji trajediya Sîsyphos (ew kes e ku xwedawendan ew ceza kiriye, cezayê wî jî her kevir tam dibe serê gir kevir digindire jêr û dîsa diçe wî tîne) dimîne? Liberketina mirinê bi tenê nirxê jiyanê zêde dike û bi bîr dixe.

Ji bilî hayjêbûnên der barê jiyanê de, zanîn nayê maneyeke din. Tişta tê zanîn, tişta hayjêçêbûyî ye. Em ji bo hebûnên fizîkî nikaribin tiştekî bibêjin jî ma mumkîn e ku mirov his neke di hebûnên biyolojîk de eşqeke ber bi

zanînê ve diçe heye. Em wexta ber bi cureyê mirov ve tên mîna ku ev eşq pêk hatiye. Rewşa gelekî pêşketî ya zanîn û bîrbirinê, herî baş gotina eşqê dikare pênase bike. Lê mirov hebûneke welê ya seyr û sostret e, xisletên wî hene em dibînin der barê zanînê de ji kirina xiyanet û berevajîkirinên mezin paşve namîne. Mirov vê rastiya mirov bi bûyerên di nava xwezaya civakî de - em jê re Xwezaya Duyemîn dibêjin- diqewimin rave bike, hê rastir xuya dike.

Civaknasî weke têgîn bi şaristaniya navend Ewrûpayê re pêş ket. Bêguman tevahiya xwezaya civakî, disiplîneke em dikarin weke cureyekî zanista civakî bi nav bikin, her hebû. Em ji zanista civakî ya beriya dîrokê re bi hêsanî dikarin bibêjin anîmîzm. Anîmîzm (zindîgirî) têgîneke zanista civakî ya navend Ewrûpayê ye, gelo bi qasî ku tê gotin zanîna destpêkê ya mirovên destpêkê ye? Kî fitûyê dide ku avahiya zanista civakî ya îro ya obje û sûbje cihê dike, di ser anîmîzmê re ye? Dîsa heman zanyarên civakî! Lê her ku diçe baştir tê fêhmkirin ku ekola zindîgiriyê paradîgmayek e, ji cihêkirina obje-sûbjeyê ango bêcankirina objeyê bi nirxtir e. Eşkere ye ku bi zindîtî pênasekirina gerdûnê ji pênaseya wê ya bi bêcaniyê, encamên rasttir dide. Pêşketinên zanistî hemû vê xusûsê piştrast dikin. Eger tevgerên perçikên jêr-atoman ên hê sirr in, û balkêş in, nebûna, me yê nikarîbûya ji bilî anîmîzmê bi ti awayê din rastiya pêknehatina yekcuretiyê rave bikira. Pozitivîzmê (zanistperestiya diyardeyan) weke cureyekî pirr bi tehlûke yê metafizîkê (herçiqasî berevajiyê wê îdea bike jî) birîneke kûr di gewdeyê zanista civakî de vekiriye.

Pêvajoya şaristaniyê ya em jê re serdemên dîrokê dibêjin, ji anîmîzmê ber bi mîtolojiyê ve şêwazekî zanistê jî bi xwe re aniye. Herçiqasî mîtolojî bi temamî weke malê şaristaniyê neyê hesibandin jî ji gelek aliyan ve mohra şaristaniyê lê heye. Berevajîkirina pêşî ya zanînê û xiyanetxistina nava zanista civakî bi hegemoniya îdeolojîk a pêvajoyên şaristaniyê re têkildar e. Yekdestdariya sermaye û desthilatdariya li ser xwezaya civakî hat avakirin bê derew, bê berevajîkirin û bê xiyaneta li gotinê nabin. Mîtolojî bi giranî bi anîmîzmê barkirî ye, û bi nirx e. Lê wexta sîstema hiyerarşîk û nîzama ji sêberiya rahib + rêveber + fermandar pêk hatî bi

çîrokên mîtolojîk ên qehremankirin (nîv-xwedatî) û xwedakirinê ketin dewrê, rizîn û berevajîkirin bivênevê pêk hatin. Mîtolojî bi şertê ev wesfê wê yê dualî li ber çavan were girtin, dîsa zanisteke civakî ye ku mirov dikare gelekî jê hîn bibe. Ez yeqîn dikim ku wê her biçe girîng bibe. Ji sedî sed di hînbûna dîrokê de wê hê bêtir bi roleke mezin rabe.

Kengî mîtolojî weke dîn hişk bû, rê li ber duyemîn cureyekî zanista civakî vekir. Bêguman dîn bi tenê mîtolojiyê weke mîrate nagire. Dogmayên wê bi xwe jî hene. Herçiqasî bi giranî mohra hêzên şaristaniyê li ser hebe jî şîroveya dînî ya hêzên dijberê sîstemê zelaltir e, û ji ber xwezayîtiya wê rastir e. Yek ji erdkolanerê bingehîn ê rêya diçe zanista hemdem e. Di dînên yek xwedayî de mirov dikare nîşaneyên herdu hêzên dijber bişopîne. Şaxê fermanker, ceza dide, teolojiya mirovan dike evd hêzên şaristaniyê nîşan dide; şaxê mirovan beşdar dike, xelatê dide û azad dike jî fikir û baweriyên hêzên dijberê şaristaniyê nîşan dide. Serdema navîn bi şerên di navbera dîn û mezhebên van herdu têgihiştinan de tijî derbas bûye. Eger şerê van dîn û mezheban nebûya, ji sedî sed wê zanista civakî ya Ewrûpayê jî pêk nehata. Em bi tenê li bandora Îslamê bifikirin jî têrê dike ku ji bo em li vê rastiyê serwext bibin. Wekî din jî tevahiya serdeman zanyar û fîlozofên mîna çirîskan hene. Şik û guman nîne ku van kesan çavkaniya bi nirx a zanista civakî pêk anîne.

Zanista civakî (modernîteya) serdema şaristaniya Ewrûpayê hem weke berhema tevahiya mîrateya vê dîrokê, hem jî weke pêdiviyeke têkoşîna mezin a civakî derket holê. Bi awayekî bingehîn weke amûrekî disiplînê yê çareserkirina pirsgirêkan lê fikirîn. Sîstema zordestiyê û îstîsmara bêsînor a kapîtalîzmê rê lê vekir, ji destpêkê ve modernîte neçar kir ku bi krîzê barkirî pêk bê. Bi giştî zanist hemû, bi taybetî jî zanistên civakî ji aliyekî ve kirin xizmeta sîstema zordestî û îstîsmarê, ji aliyê din ve jî wekî din rola rewakirinê ango bi awayekî erênî ravekirina sîstemê dan zanistên civakî. Retorîka yekdestdariya desthilatdarî û sermayeya nû mohra xwe li zanista civakî da.

Sosyolojiya pozitivîst ji destpêkê ve kir ku zanista civakî seqet pêk bê. Fikara bingehîn a sosyologên pozitivîst ew bû ku ji Şoreşa Franseyê

komareke xwedî li berjewendiyên bûrjûwayê derdikeve pêk bînin. Polîtîkvanên ekonomiya Ingilîz hewl didan kapîtalê rasyonel û rewa bikin. Îdeologên Elman di her qadê de bi pêkanîna dêwane ya dewleta netewe ya Elman re mijûl dibûn. Ya ku damezrênerên sosyalîzma zanistî û serkêşên dijberên sîstemê K. Marks û F. Engels dixwest bikin ew bû, ji retorîka sê sermayeyan zanisteke bi mohra proleter biafirînin. Dijbertiya kapîtalîzmê û li ser vî bingehî analîzên di **Das Kapîtal**ê de dikarîbûn alîkariya zanista civakî bikirana. Lê ji ber çavkaniyên wan jê gav diavêt û ji ber ku dijbertiya xwe ya sîstemê bi dijbertiya kapîtalîzmê bi sînor dikirin, tevahiya avahiyên sîstemê li hemberî modernîteya kapîtalîst bêparastin dihiştin. Analîzên anarşîstan li ser desthilatdariyê herçiqasî gaveke li pêş bû jî lê qada polîtîk mîna ku vala hiştibûn. Zanista civakî ya Ewrûpayê ji aliyê herdu bazkan ve jî ji lêkolîna xwezaya civakî bêhtir bi pirsgirêkên sîstem bûyî sedema wan re mijûl dibû. Bi awayekî zend û bendên xwe li pisporiya çareserkirina pirsgirêkan badabûn. Dinya û dîrok di dereceya duyemîn de dihatin. Divê mirov matmayî nemîne ka çima zanista civakî navenda xwe Ewrûpa ye. Mirov nikare li bendê be ku pirsgirêkên bi sedsalan ketine ser hev û kombûne bi carekê jê bibihurin. Ji nava wan, îdeolojiya lîberal a herî zîrek bû. Bi ser wê rêyê ve bû ku hemûyan bi sîstemê ve entegre bike. Ne bi tenê Şoreşa Franseyê, Şoreşa Rûsyayê jî di navê de zanîbû tevahiya şoreşên serdemê û dijberên sîstemê bêtesîr bike; zanistê bi awayekî serketî veguherîne zanista desthilatdarî û sermayeyê.

Lê mirov nikare bifikire ku modernîteya Ewrûpayê weke sîstema herî desthiltdar û îstîsmarkar a pêvajoya şaristaniyê, dijberên xwe bi temamî tine û bêdeng bike. Bi pêşveçûna wê re ev modernîte ne bi tenê di bereya îdeolojîk de, di bereya exlaqî û polîtîk de jî li berxwedanên mezin rast hat. Dijbertiya sîstemê jî herî kêm bi qasî sîstemê xwe nû dikir. Sîstem çiqasî global dibû, dijberên sîstemê jî global dibûn. Hegemoniya wê ya li ser zanistê her ku diçû dişkiya. Hêdî hêdî dihat fêhmkirin ku dîrok dibe bi tenê ya dinyayê be, hegemoniya Ewrûpayê ya demeke kin ajotî bi tenê dikare parçeyekî piçûk ê dîrokê be.

Fîlozofiya Fransî ya piştî Şerê Cîhanê yê Duyemîn, Şoreşa Çandî ya Ciwanên 1968an, ji hundir ve jihevdeketina sîstema Sovyetîk, têkçûna dewleta xweşhaliyê, lêgerînên postmodernîst û tesfiyeya mêtingeriya klasîk derfet û îmkan didan ji bo zanista civakî demeke nû bide destpêkirin. Bi awayekî ji astengiya pozitivîzmê û navendîtiya Ewrûpayê rizgarbûyî, lêkolînkirina heqîqetan ketibû rêyeke erênîtir û baştir. Zanista civakî dema ku xwezaya civakî bi tevahî li zeman û mekanan hemûyan bike mijara lêkolînê, divê bi tenê qîma xwe bi çareserkirina krîz û pirsgirêkan neyîne, ji aliyekî ve fizîk, kîmya, biyolojî û kozmolojiya bi awayekî bingehîn têkiliya xwe bi civakê re hene û li aliyê din jî ji zanistên beşerî yên weke felsefe, wêje û hunerê re pêşengiyê bike da ku bi rola xwe ya zanista qralîçe rabe. Şecereya zanistê bi tenê bi zanista civakî mirov dikare şaxan jê bibe. Bi vî awayî mirov ê hem wê ji zêde parçebûnê xelas bike, hem jî mirov ê fikaran neke ku zêde ji her tiştî şuştî ye. Tevî krîza giştî ji krîza di qada zanista civakî de bihurîn, wezîfeyeke pêştir divê were bi cih anîn e. Zanisteke civakî ya hayjêbûna jiyanê weke azadî, lêgerîna azadiyê jî weke heqîqetê şîrove bike, rêberê pêşketin û rohnîbûna civaka exlaqî û polîtîk e ku dest jê nabe.

Di vê xebatê de min zanista civakî berî her tiştî nirxand û ev jî têkiliya xwe bi naveroka xebatê re heye. Retorîka sosyalîzma zanistî ya demeke dirêj diceribînim êdî li min teng dihat. Retorîka lîberal jî ez bi temamî li dijî wê bûm. Ji nêz ve naskirina min a anarşîzmê tesîreke erênî kir; lê ji çareserkirina pirsgirêkên li pêşiya min, dûr bû. Hin civaknasên di destpêkê de min ew diyar kiribûn gelekî hêja ne, alîkariyên wan girîng bûn. Lê dîsa jî diviyabû min rêya xwe bi xwe bidîta. Min heta têgihiştina xwe ya zanista civakî cîbicî nekirana, gavavêtin û ketina mijarên bi îddîa wê rast nebûya. Çawa ku min ji destpêkê ve got, ya ez dikim ceribandinek e; lê bi rexnekirinê wê cihê xwe yê rast bibîne. Ez ji xwe piştrast im ku ez ji wan dogmatîkên pozitivîst û metafizîk nînim ku her tiştî ji zanistên civakî dipên. Ji lewra min zanista civakî ji gelek aliyan ve da naskirin, ji ber ku hem min nexwest bikevim heman tehlûkeyê, hem jî li pêşberî yên eleqedar hişyar û durist bim. Piştî ku min ev pêk anî, beşa din a sereke ya xebatê

şaristaniya demokratîk û modernîte bû. Ji bo baş naskirina sîstema şaristaniyê û ji bo rast bingehdanîna dijberên sîstemê, min pêşî cih da pirsgirêka civakî. Ez yeqîn dikim ku ez bi awayekî berfireh li ser sekinîme. Min dijberên din ên sîstemê rexne kirin, ev ji bo xwe gihandina nirxandineke yekpare bû. Sosyalîzma zanistî dijbertiya xwe ya zanistî disipêre du çînan. Tevî ku di dîrokê de cihekî teng digire û ji analîzkirina civakê gelekî dûr e, ez bi temamî vê rêbazê red nakim. Lê min hewl da bi sîstema şaristaniyê ya çemê sereke û mezin a pênc hezar salî jê bibihurim.

Eger li dijbertiyeke diyalektîk bê gerîn –bi ya min divê were gerîn-, divê bivênevê di çarçoveya sîstemê de were pêşdebirin. Ez dizanim mijara şaristaniyê ji bo gelek fîlozof û sosyologan mijara lêkolînê ye. Ya min xwest bikim ne ew bû ku yeke nû li wan zêde bikim; min xwest ya nehatiye kirin an jî ya belawela hatiye kirin bi awayekî sîstematîk û berfireh ji bo guftûgoyê pêşkêş bikim. Ez divê bi girîngî diyar bikim ku di vê mijarê de min rêbaza K. Marks ji bo **Kapîtal**ê bi kar aniye ango diyalektîk min jî ji bo şaristaniyê bi kar aniye. Di vê xusûsê de min gelekî xem xwarin û min got, xwezî Marks ev pêk anîbûya û me jî jê sûd wergirtiba. Lê bi herhalî desteka herî baş a ji hosteyekî bihata girtin manedana rêbaza wî bû. Pratîkên civakî û rexneyên pêwendîdaran wê diyar bikin ka di vê de ez çiqasî bi ser ketime. Çawa ku di Kapîtalê de jî hatiye diyarkirin, bi rastî şaristanî kom û komên dijber ên li seriyan cih digirin diafirîne. Dijbertiya bûrjûwa û proleteryayê jî dikare bi tenê yek ji gelek dijbertiyên şaristaniyê rê li wan vekirî be. Ji lewra ez rast dibînim xebata min di vê çarçoveyê de ne weke dijbertiya Karl Marks, li ser bingehê rexneyên ciddî weke hewldana pêşdebirin û temamkirina xebata wî were şîrovekirin. Min ji gelek aliyan ve (yekdestdarî, kapîtal, dewlet, îdeolojî, pozitivîzm, dîrok, şaristanî, bazar, ekonomî, demokrasî, şoreş, zanista civakî, dewleta netewe, hegemoniya, analîzên sîstemê û hwd.) şaşî û kêmasiyên wê danîn holê û divê ev weke dijbertiyê neyê şîrovekirin. Ez yeqîn dikim şîroveya rasttir wê weha be, tevî ekolên din ên dijberên sîstemê ez nirxa heq kiriye didimê û ji bo vê jî alîkariyê dikim..

Di beşên berê yên xebatê de bi hişkeberî be jî min hewl da bazkên îstîsmarkar û tehekumkar ên şaristaniyê (mêtinkar û mêtinger) analîz bikim. Di van beşên li ber dest de bi qasî ku mumkîn bû ez kêm li ser wan sekinîm û min xwest giraniya xwe ya esas bidim ser qutbê dijber demos'ê, ango hêzên şaristaniya demokratîk. Min bi hêza xwe hemûyî hewl da vê qutba dîrokî rave bikim. Li gorî min dîrok herî zêde di vê mijarê de bi kêmasî û şaşiyan tijî ye. Qet nebe bi xetên sor û stûr bal kişandina ser wan girîng bû. Şerê esas ê di dîrokê de ne weke ku pirr tê gotin (mînaka herî dawî Saumel P. Huntington e) di navbera komên serdest ên şaristaniyê de ye, di navbera du qutbên dijber de ye. Bêguman di navbera komên serdest de jî têra xwe şer û nakokî hene. Yekdestdarî timî di navbera xwe de li ser pasteyê şer dikin. Lê ya girîng ew e, ka ev paste ji kê û çawa tê desteserkirin. Li gorî diyalektîkê şer û nakokiya rastî, divê di navbera yên pasteyê çêdikin û yên dixwazin desteser bikin de pêk bê. Ev mijara ku hewcedariya wê hûrûkûr bi lêkolîna dîrokî heye, bi tenê min dikarîbû bi xetên sor bal bikişanda ser wê. Min welê jî kir. Kî çiqasî dixwaze dikare lêbikole û lê bigere. Ez bawer dikim ku encamên bigihîjinê wê hêviyên wan neşkîne.

Min hewl da cihekî berfireh bidim dijberên modernîteyê. Min ev kir da ku di xebatên sîstema nû de cihê xwe rast bigirin. Tevlîheviya bi hilweşîna Sovyetê bi lez bû, diviyabû bi awayekî manedar li cihekî rast bihata danîn. Bêhêvîbûn bi tevahî bêmane bû, ne lazim bû. Sosyalîstên-reel û anarşîst divê karibin xwe nû bikin. Femînîst û ekolojîstan diviyabû zanibin bêyî pêkanîna sîstemê pêşveçûn nabe û ji avbirina ser aşê lîberalîzmê wê nikaribin xwe xelas bikin. Hem polîtîka nekirin, hem jî sîstem pêknenanîn, bêyî van herduyan hedefek e ku mirov bigihîjiyê nîne. Herî zêde ya li benda wan aqûbeta sosyalîstên reel û tevgerên anarşîstan bû. Ez yeqîn dikim ku ez bi awayekî çareserker nêzî tevgerên çandî bûm. Ev tevgerên hewl didin ji nava pencê cinawirê dewleta netewe rizgar bibin, naveroka wan a demokratîk girîng bû. Di çarçoveya modernîteya demokratîk de dikarîbûn bi roleke dîrokî rabin.

Min hewl da ez bi îhtîmam nêzî wezîfe û pirsgirêkên jinûveavabûnê yê modernîteya demokratîk bibim ango di çarçoveya teorî û pratîk de bi awakî analîzker û çareserker nêzîk bibim. Ez yeqîn dikim ku bi awayekî bi tesîr min encamên gihiştimê pêşkêş kirin. Eşkere ye ku modernîteya demokratîk ne weke lêgerîna serdema zêrîn a rabihurî, ne jî weke projeya utopîk paşerojê hatiye pêşkêşkirin. Têra xwe malzemeyên dijberê sîstemê hebûn, lê sîstem bi xwe tinebû. Min bawer dikir ku divê ji sedî sed mijar bigihîje vegotinên têrûtijî. Modernîteya demokratîk weke nav ne girîng bû; naveroka wê girîng bû. Diviyabû bihata sîstematîzekirin. Naxwe wê ji felsefeya sefaletê û sefaleta felsefeyê wêdetir neçûya. Armanca analîzan rohnîkirina van rewşan û çareserkirina wan bû. Min hewl da qadên wezîfeyên entelekteul, exlaqî û polîtîk jî ji bo çareseriyên pratîk diyar bikim. Ji ber ku tevlîheviya li van qadan têra xwe zêde bû. Ez yeqîn dikim ku min têra xwe zelal kir, mirov ê çawa bi ser pratîkê de biçe. Nexasim ez bawer dikim ku rêzkirina prensîbî wê di pratîkê de rê li ber xebatên nû û afirîner veke.

Mijareke din a girîng a vê xebatê der barê wesfên yekeya bingehîn a lêkolînê de bû. Zanista civakî ya pozitivîst di vê mijarê de xwedî wê pozîsyonê ye; civakê jî mîna ojbeyên din bike obje û bi vî awayî qîma xwe bi bersivdanê bîne. Sosyalîzma zanistî weke siya vê têgihiştinê bi gewde bûbû û ji lewra jî hê bêtir diyardeperest û hişk bû. Di çarçoveya alîkarîdayînê de civak li gorî şêwazên hilberînê tesnîf û dabeş kir. Pozitivîzma gerdûnparêz a li ser xeteke rast a pêşve diçe mîna rastiyeke mutleq hat qebûlkirin û bicihanîn. Şikildayîna dîrokê bi awayê serdema hov ! (serdema destpêkê), koledar, feodal, kapîtalîst û sosyalîst-komînîst bi vî awayî derket holê. Di vê de hinekî jî qederperestî heye. Ma ne, dereng zû, dor ê bihata sosyalîzmê. Ev helwestek bû ku aliyê wê yê dogmatîk eşkere bû. Bi vê zêhniyetê nêzîkbûna tevahiya çalakiyên civakî, encamên wê ji texmînan wêdetir gelekî giran bûn. Ya pêkhatîbû ne sosyalîzm, belê kapîtalîzma global bû ku wê ew gelekî rexne kiribû û bêyî ku haya wê jê hebe gelekî jê re xizmet kiribû. Kapîtalîzma dewleta Rûs herî kêm

sedsalekê temenê sîstemê dirêj kir û bi herhalî ev jî vê rastiyê piştrast dike.

Min tevahiya xebata xwe xwezaya civakî (xwezaya duyemîn) weke yekeya bingehîn a lêkolînê esas girt. Min hewl da wê tespît bikim û min bawer kir ku ew bingehê heyînê ye. Ji lewra min civaka exlaqî û polîtîk a hewl da pênase bikim, weke alternatîf destnîşan kir. Delîlên (arguman) min weke şêwazê hilberînê, çîn, dewlet, îdeolojî û yên mîna teknîkê timî diguherin û diyardeyên di her civakê de bi awayekî cuda pêk tên herçiqasî para wan a rastiyê hebe jî di wê giraniyê de nebûn ji bo lêkolînê bibin mijara bingehîn.

Min analîzên li ser şaristanî û sîstema dinyayê jî weke şîroveyên çemberên girtî yên yekalî rexne kirin. Min hewl da ez analîz bikim û nîşan bidim ku heta cinsê mirov hebûna wî dewam bike wê timî wesfên xwezaya civakî ya civaka exlaqî û polîtîk her bijî û neçar e ku bijî, nikare ji vê bigere, eger jê bigere wê parçe û ji hev belav bibe. Di tevahiya dîroka şaristaniyê de civaka exlaqî û polîtîk di nava tevn û torên desthilatdarî û sermayeyê de gelekî hatibe keritandin, ji rizîn û belavbûnê re hatibe hiştin jî, qels be jî civakan her tim rêyek dîtiye, bi wesfên xwe yên exlaqî û polîtîk li ber xwe dane û bi vî awayî hewl dane bijîn, min xwest vê yekê bi lîsteyeke dirêj a mînakan piştrast bikim. Dîsa bi awayekî berfireh min hewl da analîz bikim ku kapîtalîzmê (modernîteyê), bi tevn û torên sermaye û desthilatdariyê xwe xist çaviyên herî hûrik ên civakê (bi hêmanên weke dewleta netewe, îndustriyalîzm, nexasim amûrên medyayê, îdeolojiyên pevekirî, teşkîlatên qaşo ewlekariyê, ji hundir ve mêtingerî, zêde bi ser jinê de çûn û hwd.) û lê belav bû, li beramberî vê di heman astê de bû sedema nerazîbûnekê, li cem her ferd û yekeya civakî rê li alternatîfên jiyanê û derfetên berxwedanê vekir an jî neçar kir vebin. Bêguman civaka exlaqî û polîtîk sabit nîne, min diyar kir ku ji berî dîrokê ve pêşketina xwe dewam dike.

Klan, qebîle, malbat, konfederasyona eşîran, rasthatina li hiyerarşiyê, dabeşbûna dewletê, ji civaka gund-cotkariyê derbasbûna civaka bajêr, gavavêtina civaka neteweyî-îndustriyel, ev bûyerên bi awayê kêm an jî zêde qutibbûyînê/dubendbûyînê bê navber bi vî rengî pêk hatine.

Pêvajoya şaristaniyê jî bi karektereke bê navber a bi awayên krîzê yên navend-hawîrdor, hegemoniya-reqabet û bilindbûn-daketin pêşde çû. Ez tevlî van fikrên der barê pêvajoya şaristaniyê de jî bûm. Herweha min hewl da ez analîz û çareser (weke terorîk-pratîk) bikim ku tevî van bûyeran hemûyan jî civaka exlaqî û polîtîk ji holê nayê rakirin; meyla xwe ya azadî, wekhevî û demokratîkbûnê timî diparêze; û eger wezîfeyên entelektuel, exlaqî û polîtîk di zikhev de bêne fêhmkirin û bi cih werin anîn, ev wesf ê di jiyanê de bi zêdeyî bêne pêkanîn.

Modernîteya kapîtalîst li ser bingehê sermayedarî, îndustriyalîzm û dewletdariya neteweyî hebûna xwe ava dike, li beramberî vê modernîteya demokratîk jî weke komintiya demokratîk, eko-îndustriyal û neteweya demokratîk dikare hebûna xwe ava bike û min ev yek bi berfirehî hewl da ji hev derxim û çareser bikim. Komintiya demokratîk ne weke wekhevîtiyeke homojen, belê ji kesekî heta bi mîlyonan kesî dibe xwedî wesif û min hewl da wê weke her cure koma (ji jinan heta bi komên mêran, ji spor û hunerê heta bi îndustriyê, ji entelektuelan heta bi şivanan, ji qebîleyan heta bi şîrketan, ji malbatê heta bi neteweyan, ji gundan heta bi bajaran, ji xwecihiyê heta bi globaliyê, ji klanê heta bi civaka global her cure civak) bi wesfên civaka exlaqî û polîtîk radibe pênase bikim. Min hewl da rastiya civaka eko-îndustriyel weke komên civaka gund-cotkariyê û ya îndustriya bajêr hevdu xwedî dikin û bi awayekî vebirrî li gorî eko-îndustriyê ne, pênase bikim. Neteweya demokratîk jî min hewl da bi vî awayî ji hev derxim û çareser bikim, li dijî cinawiriya dewletdariya netewe pêkhatinên pirrnasname, pirrçandî û pirrsiyasî neteweya demokratîk e, ango li ser pêkanînên konfederalîzma demokratîk a şêweyê bingehîn a polîtîkayê ye, ji etnîsîteyê heta bi dîn, her cure heyînên çandî yên bajar, xwecihî, herêmî û neteweyî bi pêkhatinên siyasî yên xweser ên demokratîk cureyekî nû yê netewe pêk tînin û ev jî neteweyê demokratîk e.

Min hûrûkûr û bi awayekî gelek caran dubare hewl da pêşkêş bikim ku moderniteya demokratîk li ser bingehê van saziyên avahiyê pêk tînin tevî

mîrateya xwe ya dîrokî alternatîfek e ku xwedî hêzeke mezin a çareseriyê ye, dikare tecrûbeya dijberên sîstema dema modernîteyê bigihîne hev.

Qutibbûna şaristanî û modernîteyê li derveyî şer û îstîsmarê (mêtinkarî û mêtingerî), herweha min hewl da ji aliyê îhtîmala rewşa bê şer û aştiyê ve jî ji hev derxim. Nirxandina şert û derfetên aştiyeke karibe dewam bike mijareke girîng e, û jê re gelek nazikî divê. Tê zanîn pêvajoya şaristaniyê ji vî alî ve xwedî mîrateyeke gelekî dewlemend e. Di dîrokê de dem û dewran hene têde ji şer zêdetir aştî hatiye mezinkirin û pîrozkirin. Di dema modernîteyê de jî şer û aştî mîna pêkanînên rojane yên di zikhev de gelekî qewimîne. Nexasim îhtîmala ku li şûna têgihiştina diyalektîka tineker têgihiştina diyalektîka hevduxwedîker hebe, qenebe têgihiştina ku îfade dike pêvajoyên diyalektîk ne bi tenê tine dikin ne jî bi tenê hevdu xwedî dikin, di navbera herdu têgihiştinan de yan jî di navbera herdu rastiyan de guhereke berfireh û tevlîhev dikare pêk bê, bûye têgihiştinek û hêmanek ku alîkariya pêvajoyê dike. Em bi saya zanista bi pêş dikeve hê baştir û rasttir fêhm dikin ku rastiya xwezayî ne bi felsefeya jiyanê ya yên bi hêz a Darwînîst a ji kapîtalîzma hov mayî, ne jî bi qalibên metafizîka berê ya jiyana bê nakokî, dimeşe, berevajî naverokeke gelekî dewlemend, tengezar û pêkhêner pêşkêş dike.

Çawa ku bi temamî weke beridînê şîrovekirina pêvajoyên aştiyê şaş e, ewqasî jî şaş e ku pêvajoyên şer ji bo civaka nû ji nava sîstema kevin biwelide weke pîriktiyê dike bêne şîrovekirin. Şerên di navbera yekdestdariyên sermaye û desthilatdariyê de bi mezinkirin an jî piçûkkirina pasteya li bin destê wan re têkildar e. Bi aştiyê re zêde pêwendiya wan nîne. Aştiya rastî di navbera du hêzên dijber ên şaristaniyê de (Ev, di navbera du çînan de destpê dike, li guhereke berfireh di navbera komên cuda yên qebîle, eşîr, qewm, netewe, tebeqe, cemaetên dînî, ekolên çandî û komên ekonomîk de pêk tê) li ser bingehê qebûlkirina heyîn, nasname û mafên rêveberiya xweser a hev, pêk tê. Dema ku tê qebûlkirin şer zirar û ziyanê dide herdu aliyan serê îhtîmala aştiyê xuya dike, diyar dibe. Ji niyetên lihevhatin û diyalogê hewl tê dayîn encam were girtin. Tê zanîn, çi di asta xwecihî û global de, çi jî di asta navneteweyî û nava netewe

de gelek şer bi aştiyê bi encam bûne. Ya girîng ew e, alî di şert û mercên derfetê didin nasname û anora hevdu de li hev bikin. Piştî ku ev bû, di her astê û her hecmî de, di navbera kom û heta ferdan de aştî mumkîn e.

Wexta ku me hewl da dîroka şaristaniyê ya pênc hezar salî weke du qutbên dijber analîz bikin, me fêhm kir ku wê du qutbî hê demeke dirêj bi hev re dewam bikin. Di demeke kin de mirov pêşbîniya hevdu tinekirina qutban nake. Herweha ev ji aliyê diyalektîkî ve jî weke rastbîn xuya nake. Sosyalîzma pêkhatî di vî warî de bi lez tevgeriya û bêyî ku analîza modernîte û şaristaniyê bike xwe li sîstemê ceriband û ev jî bi jihevdeketina wê bi encam bû. Ya girîng ew e, divê mirov di tevahiya xebatên teorîk û pratîk de duqutbiyê timî li ber çavan bigire, di nava qutba îstîsmarker de nehele, weke sîstematîka xwe şaristanî û modernîteya demokratîk di nava wê de gav bi gav bi xebatên avaker timî pêşde bibe. Em bi rêbazên şoreşî û beridînê çiqasî sîstema xwe pêşde bibin û ewqasî jî pirsgirêkên xwe yên ‘dem’ û ‘mekan’ bi awayekî erênî çareser bikin, em ê sîstema xwe mayînde bikin.

Modernîteya demokratîk û hêmanên wê yên bingehîn sîstemek e ku li gorî aştiyê ye. Têgihiştina neteweya demokratîk ji komeke herî piçûk heta bi neteweya dinyayê deriyên xwe li çareseriyê vekirî ne, û di heman demê de bi vê xisleta xwe alternatîfeke qîmeta wê zêde ya aştiyê heye. Bi hêmana xwe ya eko-îndustriyê hem dike ku îndustriya di nava civakê de bi awayekî kêrhatî were bikaranîn û di serî de bêkarî, xizantî û birçîtî pirsgirêkên civakî yên giran ên bi awayekî encamên şerê modernîteyê li dijî civakê ne, dikevin rêya çareseriyê; hem jî şerê îndustriyalîzmê li dijî hawîrdorê daye destpêkirin bi dawî dike û bi vî awayî aştiya civak û hawîrdorê pêk tîne. Hêmana komintiya demokratîk jî ji her yeke û ferdê civakê re derfeta alternatîfbûna civaka exlaqî û polîtîk pêşkêş dike û bi vî awayî nêzîkatiya herî radîkal a aştiyê nîşan dide. Eşkere ye ku modernîteya demokratîk weke sîstem çiqasî bi pêş bikeve wê îmkanên aştiyeke bi anor û rûmet jî hê zêdetir bi pêş bikevin.

Di vê nuqteyê de divê ez hem hişyarkirinekê, hem jî lêborînekê careke din diyar bikim: Ez têgînên civaka exlaqî û polîtîk bi têgînên komintiya

demokratîk û civaka demokratîk wekhev û hemnirx dibînim. Ji bo dewlemendiya maneyê wexta hewce kir, bê fikar, min serî li hersê têgînan jî da û min xwe ji vê paşve neda. Eşkere ye ku civaka exlaqî û polîtîk bi komintiya demokratîk re zêdetir sosyalîzma demokratîk û wekhevîtiya civakî (lê li ser bingehê cudatiyan wekhevî) tîne hişê mirov. Têgihiştina li ser bingehê cudatiyan wekhevî, ji maneya sosyalîst-reel a homojentiyê îfade dike cudatir e. Ji bo ez balê bikişînim ser vê yekê, min xwe hewce his kir ku ji vê re Sosyalîzma Firewnan bibêjim. Bi têgîna civaka demokratîk min hewl da karektera civaka exlaqî û polîtîk a hem wekhevîtî, hem jî azadiyê destnîşan bikim. Bêguman herçiqasî naveroka van têgînan wekhev e jî divê mirov wan nexe kefa destekî û heman tişt nehesibîne. Mebesta min ji vê dewlemendî ye. Mirov bike wekhev û bixe kefa yek destekî, bi vê xizan û feqîr dike. Ez kesên bi mijarê re pêwendîdar hişyar dikim ji bo der barê van têgînên misêwa têne bikaranîn de nekevin nakokiyê û ji ber ku min nikarîbû termînolojiyeke bi awayekî din pêşde bibim jî lêborîna xwe dixwazim û hêvî dikim ku vê bi serwextî û têgihiştî qebûl bikin.

Min qîma xwe neanî ku ez modernîteya demokratîk li beramberî sê hêmanên bingehîn ên modernîteya kapîtalîst (kapîtalîzm, îndustriyalîzm û dewleta netewe), bi civaka exlaqî û polîtîk a xwedî sê hêmanên bingehîn e, weke komintiya demokratîk, sosyalîzma demokratîk, civaka demokratîk, civaka eko-îndustriyel û civaka konfederal a demokratîk bi wesif bikim. Çawa ku min hewl da di beşa pêwendîdar de nîşan bidim, min xwest bi qevd û desteyeke gelekî dewlemend a wesfan **pênase bikim**. Duwanzdeh pirsgirêkên bingehîn ên min der barê pirsgirêka civakî de jimartin, di heman demê de duwanzdeh wesfên çareseriyê yên modernîteya demokratîk rave dikin.

Min gelek caran diyar kiribû ku ev xebata min dikare bi navê **Sosyolojiya Azadiyê** were weşandin. Min bi girîngî gelekî destnîşan kir ku dema ez hewl didim zanista civakî pênase bikim, armanca min a bingehîn weke alternatîf pêşdebirina azadiyê ye. Jixwe çareserkirina pirsgirêkan bi awayekî pêkanîna azadiyê ye. Wexta mirov vê jî li pênaseyê zêde bike, min şaş nedît û fikar nekir ku di çarçoveya armancê de ji zanista civakî re

bibêjim Sosyolojiya Azadiyê. Eşkere ye ku wê di cih de be, herî kêm beşekî wê yê mezin ê xebatên sosyolojîk di asta çareseriya pirsgirêkan û pêşdebirina hayjêbûna jiyanê de bi vî navî were weşandin. Bêguman çarçoveya sosyolojiyê bi tenê bi azadiyê bi sînor nîne. Tê zanîn ku divê bi guhereke civakî ya tevlîhev re (civaka berî dîrokê, hiyerarşî, çîn, dewlet, bajar, şaristanî, sermaye, ekonomî, desthilatdarî, demokrasî, huner, dîn, felsefe, zanist, polîtîka, şer, stratejî, rêxistinbûn, bi sazîbûn, îdeolojî, ekolojî, jineolojî, teolojî, eskatalojî û hwd.) mijûl bibe. Dîsa min bi vê xebatê bîrûbaweriya xwe anîbû ziman ku dabeşkirina gelek parçeyan a civaka exlaqî û polîtîk û bi vî awayî lêkolîna wan dikare bibe sedema fikarên mezin û ji encamên erênî zêdetir dikare rê li ber encamên neyênî veke. Min diyar kiribû ku ez bi xurtî pê re me ku mirov di nava dîrokî û yekparetiyê de xwezaya civakî bigere û lêkole. Ev rêbaza herî rast e.

Ez vê beşa parêznameya xwe bi dawî dikim, lê ez hez dikim ku wê bi du şîroveyan bi şîroveya Sokrates û Zerdeşt temam bikim. Çawa ku tê zanîn, gotina Sokrates timûtim dianî ziman wisa bû “Xwe Bizane!” yan jî “Xwe Binase!”. Bi herhalî xwestiye bi vê gotinê bibêje, yên xwe nizanibin û xwe nas nekin nikarin ti tiştî hîn bibin û zanibin. Li gorî zanist îdea dike, beriya panzdeh mîlyar salan teqîna mezin (bîg-bang) pêk hatiye û rastiya em dibînin li gerdûnê belav bûye, ez bawer dikim ku mirov tevahî û yekûna vê rastiyê îfade dike. Ez vê dizanim û his dikim. Di vê çarçoveyê de xwezanîn û xwenasîn bi zanîn û nasîna tevahiya zeman û gerdûnê re wekhev e. Sokrates di parêznameya xwe ya navdar de ne ji xwedayan, ji periyên îlhamê ango ‘daîmonan’ yên carinan têne cem behs kiriye. Ev bi pêhesîn û ponijînê xwenaskirin û xwezanîn e. Bi awayekî şêwazê pêxemberan ê hînbûn û xeberdayînê ye. Eşkere ye ku ev şêwazekî hînbûnê yê ji pûtperestiyê pêşketîtir e. Ê min jî piştî ku hêza min a pêhesîn an jî ‘daîmonên’ min ez hişyar kirim û gotin “Tu li çi bigerî di xwe de bibîne”, min xwe negirt û giraniya xwe da ser nivîsîna van rêzan.

Şîroveya Zerdeşt hê bi tesîrtir bû. Rîwayet tê kirin ku Zerdeşt wexta li çiyayê Zagrosan e ku gelekî aşiqê wan e, dema roj hiltê û bi tevahî rohniya xwe dide dinyayê dengekî dibihîse. Ew welê bi ser wî dengî de diqîre:

“Bêje, tu kî yî?” Ev şîroveyek e ku nîşan dide çawa li Xwedê rast hatiye, pê re danûstendiye û hesab pirsiye. Ez yeqîn dikim ku Ew bi hebûna qralên xwedê yên Sumerîk ên bi hezarê salan berê xwe dane azadiya gelê Zagrosê re ketiye nava hesabpirsînê û Wî xwe li wan rakişandî ye. Bi awayekî ev qralên xwe xwedê hesibandine yên ku şaristanî bi xwe ne, pîroztiya wan xistiye ber lêpirsînê û şoreşa exlaqî ya Zerdeştî pêk aniye. Ev şoreş bi şêweyê dualîteya ronahî-tarîtî, qencî-xirabî ye.

Ez hez nakim ku werim mezin kirin, ji sedî sed ez ji vê nefret dikim. Ji bo min arezûyek e ku ez bi hemû sadetî û zelaliya xwe bêm fêhmkirin û bibim dost. Her roja derbas bû min baştir fêhm kir ku kesayeta min a jiyan bi dilnizmî û zelalî weke şahî û merasîma dostaniyê bi arezû pêşwazî dikir, kî bi ser de hat li berê rabû. Dema bi ser min de hatin, min ew hinekî bi awayê Zerdeştwarî xistin ber lêpirsîn û jêpirsînê: “Hûn kî ne?” Ev tê wê maneyê ku ev rêzên ez dinivîsînim bi xwenaskirina min û bi jêpirsîna “Hûn kî ne?” ji yên bi ser min de hatin, koma zanîn û bîrbirina min a pêkhatî nîşan dide.

Dema ez hem xwe û hem jî şaristaniya bi hezar û yek kirasî û şêlî analîz dikim, ev tê wê maneyê ku şert û mercên zor û zehmet jî têne çareserkirin. Pîroztiyên şaristaniyê dema hewl didin bêyî ku sînorên exlaqî û polîtîk nas bikin di ser min re derbas bibin, min bi van rêzan ew xistin ber lêpirsîn û jêpirsînê û vê di nava şahiyeke bi arezû de ez bi kesayet, rêûresmên min, gelê min, herêma min, mirovatiya min û gerdûna min da naskirin. Naskirin hayjixwebûn e. Ev jî bêtirs jiyîn û xurt parastina jiyanê di nava tevahiya dewlemendiya wê de ye!

**Abdullah Ocalan**

**Girtîxaneya Îmraliyê**